VIII

Mehmed Uzun • Bîra Qederê



*SEL

BÎRA QEDERÊ*

MEHMED UZUN, (1953-2007) nivîskarê pirzimanî, pirçandî û wergêr. Di sala 1953'an de li Sêwrega Rihayê hatiye dinê. Wî çîrokbêjiya Kurdî ya qedîm bi zimanê nivîskî li hev anî û bi vî awayî hem ji zimanê Kurdî re û hem jî ji Çand û Hunera Mezopotamyayê re xizmeteke mezin kir û herweha bû yek ji hûmê edebiyata kurdî ya modern. Piştî Muxtiraya 12'ê Adarê bi hincetên siyasî hat hepiskirin. Di Girtîgeha Leşkerî ya Amedê de bi beralîkirin û şîretên Mûsa Anter bala xwe bêhtir da ser zimanê bav û kalan. Di 1974'an de bi hevkariya heval û derdora xwe, Weşanxaneya Komalê ava kirin. Dema ew Rêvebirê Weşanê yê Giştî yê *Kovara Rizgariyê* bû, ji ber nivîsên xwe careke din hat girtin û hê di pêvajoya darizandinê de bû, wekî koçberekî çû li Swêdê bi cih bû. Di 1981'î de ji ber nivîsên xwe yên li ser girtina Sendîkaya Nivîskaran a Tirkiyê û hepiskirina nivîskaran a piştî derbeyê, ji hemwelatiya Tirkiyê hat biderxistin. Ji wê û bi şûn de li sirgûniyê ma. Di sala 2006'an de vegeriya welêt.

Piştî ku li Swêdê bi cih bû û hingê di rojnameyên wekî *Dagens Nyheter* û *Aftonbladet'ê*, di kovara edebî ya bi navê *90-tal* de, *Rizgariya Kurdistan*, *Kurdistan Press*, *Kurmancî*, *Berbang* û di kovara Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, *Hêvî* de, nivîsandina xwe domand. Bi navê mustear ê M. Ferzend Baran helbest û nivîsar nivîsandin. Endametiya Lijneya Rêvebiriya Yekîtiya Nivîskarên Swêdê kir û paşê di Klûba PEN a Navneteweyî û ya Swêdê de cih girt û bi awayekî çalak xebitî. Herweha ew, Endamê Yekîtiya Rojnamegerên Swêdê û Cîhanê bû. Di avakirina PEN a Kurd de wî kedeke mezin da. Di nav gelek xebat û afirînên xwe de, wî donzdeh berhem bi kurdî, yên din jî bi tirkî û swêdî nivîsandin. Hemû berhemên wî –hema çi bigire– di serî de zimanên wekî îngilîzî, fransizî, tirkî, swêdî, farisî, alemanî û hwd, li bîst zimanên cîhanê hatin wergerandin.

Ji ber pirtûkên xwe yên bi navên, "*Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê*, 1998" û "*Nar Çiçekleri*, 1996" di bihara sala 2001'î de li Tirkiyê hat darizandin, lê ber'et bû. Bi dû re, çapkirin û weşandina pirtûkên wî yên bi navên "*Bir Dil Yaratmak*" û "*Destpêka Edebiyata Kurdî*" hatin qedexekirin. Heman salê, Yekîtiya Weşangerên Tirkiyê, xelata ku her sal dida, ya bi navê "Xelata Raman û Ravekirinê" û ji ber ked û xebata wî ya pêşvebirina romanê, Enstîtuya Kurdî ya Berlînê "Xelata Edebiyatê" danê. Ji ber helwesta wî ya di warê azadiya edebiyat û gotinê de, wî xelata herî girîng û bi prestîj a Skandînavyayê "Torgny Segerstedt" a bi navê "Xelata Pênûsa Azadiyê" û di sala 2002'yan de, ji bo keda ku di ber çanda Swêd de daye, xelata Akademiya Swêd a bi navê "Xelata Erik Lundeberg" stand. Di sala 2005'an de xelata rûmetê ya Herêma Kurdistan a Iraqê û xelata rûmetê ya Şaredariyên Diyarbekirê stand. Di 11'ê cotmeha 2007'an de, ji ber nexweşiya pencegêra mîdê, li Diyarbekirê wefat kir.

Berhemên Mehmed Uzun ên çapkirî:
TU, Roman, 1985; *Mirina Kalekî Rind*, Roman, 1987; *Siya Evînê*, Roman, 1989; *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê*, Roman, 1991; *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Lêkolîn, 1992; *Hêz û Bedewiya Pênûsê*, Pexşan, 1993; *Mirina Egîdekî*, Destan-Zêmar, 1993; *Världen i Sverige* (Li Swêdê), Antolojî, digel Madeleine Grivê, 1995; *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, Antolojî, 1995; *Bîra Qederê*, Roman, 1995; *Nar Çiçekleri*, Pexşan, 1996; *Ziman û Roman*, Hevpeyvîn, 1997; *Bir Dil Yaratmak*, Hevpeyvîn, 1997; *Dengbêjlerim*, Pexşan, 1998; *Ronî Mîna Evînê– Tarî Mîna Mirinê*, Roman, 1998; *Zincirlenmiş Zamanlar Zincirlenmiş Sözcükler*, Pexşan, 2002; *Hawara Dîcleyê*, Roman, 2003; *Ruhun Gökkuşağı*, Vegotin, 2005; *Küllerinden Doğan Dil ve Roman*, Hevpeyvîn, 2005; *Ölüm Meleği ile Randevu*, Pexşan-Hevpeyvîn, 2007; *Bir Romanın Hatıra Defteri*, Rojnivîsk, 2007.

*SEL YAYINCILIK
Kuloğlu Mahallesi, Turnacıbaşı Caddesi,
No: 17, Beyoğlu – İstanbul
Tel. (0212) 516 96 85

http://www.selyayincilik.com
e-posta: halklailiskiler@selyayincilik.com

SATIŞ – DAĞITIM:
Çatalçeşme Sokak, No: 19/1
Cağaloğlu – İstanbul
e-posta: siparis@selyayincilik.com
Tel. (0212) 522 96 72 Faks: (0212) 516 97 26

*SEL YAYINCILIK: 1061
ISBN 978-605-772-869-2

BÎRA QEDERÊ
Mehmed Uzun
Roman

© Zozan Uzun, 2020
© Sel Yayıncılık, 2020

Genel Yayın Yönetmeni: İrfan Sancı
Yayına hazırlayan: Ferhadê Mihemed
Kapak tasarımı: Aslı Sezer
Sayfa tasarımı: İklime Yılmaz

Birinci Baskı: Ekim, 2020

Baskı ve Cilt: Yaylacık Matbaası
Fatih Sanayi Sitesi, 12/197-203
Topkapı-İstanbul, 567 80 03

Sertifika No: 44865

Mehmed Uzun

Bîra Qederê

Roman

NAVEROK

Êdî fotograf ê bipeyivin 11
FOTOGRAF 1 17
FOTOGRAF 2 35
FOTOGRAF 3 63
FOTOGRAF 4 85
FOTOGRAF 5 103
FOTOGRAF 6 121
FOTOGRAF 7 143
FOTOGRAF 8 161
FOTOGRAF 9 183
FOTOGRAF 10 199
FOTOGRAF 11 219
FOTOGRAF 12 241
FOTOGRAF 13 263
FOTOGRAF 14 285
FOTOGRAF 15 309
FOTOGRAFA DAWÎN 337

Mehr licht (hinekî din ronahî)...

GOETHE

Ez vê romanê pêşkêşî
Xanima hêja û delal
Rewşen Bedirxan'ê dikim...

M. Uzun

Êdî fotograf ê bipeyivin...

"Nav: *Bîra Qederê*
Gengre (çeşn): *Roman*
Tarîxa destpêka nivîsînê: *15 Tîrmeh 1951*
Destpêk: *Herkes dimire; bira û birazî, yar û evîndar, heval û dost, hogir û rêger, nêz û nas... hemû wefat dikin. Dora min jî hat, niha jî dora min e.*"

Di rûpela yekemîn a deftereke biçûk de, bi destnivîseke gelek xweşik û xwar, weha hatiye nivîsîn. Di vê şeva kesertijî de, nivîs bi ronahiya çirayeke biçûk, bi zehmetî dixuyin. Rêz, berî niha bi hefteyekê, hatine nivîsîn û rêzên herî dawîn in ku li pey Celadet Alî Bedirxan, neviyê mîrê dawîn ê mîrekiya kurdî Cizîra Botanê, Mîr Bedirxan, lawê kurdperwerê navdar Emîn Alî Bedirxan, mane.

Şev e. Îşev 22'ê tîrmehê ya 1951-an e. Şev, şeva ku dora romana Bîra Qederê rapêçaye, bi giranî daketiye. Dinya germ e. Şam, bajarê sirgûnê, warê derd û keseran, goristana malbata Bedirxanan, şahîdê mirina Celadet Alî Bedirxan, westiyayî, dikeve xewê. Şeva giran û westiyayî rûniştevanên bajarê kevn û navdar Şamê dixe nav hêlekana xewê û dilorîne. Xalîçeya ji stêrikan pêkhatî, li jor, li esmanan, bi rengên xwe yên xas ên welatê rohelatê, li xewa şeva Şamê nobedarî dike.

Lê li Şama miqedes û şerîf a misilmanan, jineke navsal ranezaye; Rûşen Bedirxan, keça Salih Bedirxan, jina Celadet Bedirxan, diya sê zarokan, Huseyma, Sînemxan û Cemşîd. Xew jê dûr

e. Ev bûye hefteyekê ku xew neketiye çavên wê. Belê, bi temamî hefteyekê... Ew dixwaze, pir dixwaze ku razê, her tiştî ji bîr bike, deng, pejn, hîs jê bi dûr bikevin û bikeve nav xewa bêdawîn û here da ku xwe bi hevalê xwe yê jiyanê Celadet Beg bigihîne. Lê nabe, xewa ku hertim li kêlekê bû, hertim dihat û çavên wê digirtin, niha winda bûye. Reh û damarên wê vekişiyayî, xwîna wê miçiqî, devê wê kilîtbûyî, bêhereket û bêlebat, ji hefteyekê û vir ve, ew hişyar e. Ji heş, bîr û mêjî pê ve, her derê wê miriye, winda bûye. Bi tenê mêjî, heş û bîr jîndar in, ji her carî bêtir û xurtir jîndar in. Roj û bûyerên bihurî, gotin û xeberdanên do, tahm û bîhnên jibîrbûyî, niha, yek bi yek, tên û li dora Rûşen Xanimê digerin. Umrekî dirêj, jiyaneke rengîn, niha, digel her kitekitê, bi ser wê de tê. Her tişt, her alî, her gotin, her gav, her rêz û rûpela jiyana Celadet Beg, niha, bi awayekî ecêb, tên bîra Rûşen Xanimê.

Niha, di vê şeva germ û kambax de Rûşen Xanim jî dixwaze bikeve pey Celadet Beg, pê re bikeve nav xewa ebedî, here ba wî. Lê çawan?

Celadet Beg niha tune ye, winda ye. Meriv çawan hîrî windabûn û windakirinê dibe? Kursiya wî ya ku ew hertim li ser rûdinişt, niha, vala ye. Ken û dengê wî yê navdar di nav dîwaran de, li derekî, veşartî ne. Peyv û gotinên wî yên kîbar nayên bihîstin. Masa wî ya xebat û nivîsînê, bêzar û ziman, li hêviya wî ye. Pênûs, defter û kitabên wî, peregende, li ser mase û refan, li hêviyê ne. Pakêtên wî yên cixarê, plakên wî yên musîka klasîk li hêviyê ne. Kinc, cil û bergên wî li hêviyê ne. Zarokên wî li benda bavê xwe ne. Ehmedê Fermanê Kîkî, dengbêjê wî, nexweş, di nav nivînan de, li hêviyê ye. Kewên wî yên yekta, çavgirtî, li benda fîtika wî ne... Lê ew nayê, ew tune ye. Ne li vê odê, ne li oda razanê, ne li hewşê, ne li kêleka bîrê, ne li çapxanê, ne li klûba tucaran a bajêr, ne li qahwexana taxa Muhacirîn û ne jî li tu derekî din...

Niha, bi tenê hîsa windabûnê ya biquwet û xurt heye. Meriv çawan fêrî vê hîsê dibe? Mirinê hat, Celadet Beg û bedena wî bir

û li pey xwe jî ev hîsa kambax xiste nav malê. Vê hîsê niha mal vegirtiye. Malê reşa xwe girêdaye. Ji roja mirinê û vir ve ye, mal, Rûşen Xanim, zarok, nas û xizm, meriv û dost li şînê rûniştine. Roj bi girî dest pê dikin û diqedin. Bi sedan, bi hezaran kes tên. Rûşen Xanim, herçî ew e, bûye dîla hîsên bêdeng. Ew li oda rûniştinê ya mezin, navenda jiyana wan a ku ew hîn bûbûn, li erd, dîwar, têkber, xalîçe û kursiyan dinihêre û bêdeng difikire.

Zarok razane, heye ku ew ranezane, lê ji jûrên wan deng nayê. Mêvanên ku ji bo şîn û tahziyê hatine, hin di odên mêvanan û hin jî di malên nas û dostan de razane. Rûşen Xanim ne li ser kursiyê, lê li erdê, herwekî ku Celadet Beg pirî caran dikir, rûniştiye. Na, ew rûneniştiye, li ser kêlekê dirêj bûye: Li kêlekê du xwelîdank tijî xwelî û cixare hene. Li berê çaydankeke biçûk, qedeheke nîvtijî û şekirdankek hene. Li kêleka wan, nameya ku Celadet Beg, berî mirinê nivîsîbû, heye, "Yavrum Ruşen..." Hema li ber, deftera ku Celadet Beg ji bo nivîsîna romanê hilbijartibû, vekirî, li pêşiyê ye. Li doraliyê jî tiştên ku li pey Celadet Begê mane, peregende, li vê derê, wê derê, belavbûyî hene; kaxiz, defter, kitab, kovar, rojname, name, pênûs û resim... Bi taybetî jî resim, şahîdên umrekî balkêş û zimanê romana Bîra Qederê. Her yek li derekî, di wexteke bihurî de, hatiye kişandin. Niha, di vê bêdengiya şîn û keseran de, bi rengên şevê rapêçayî, resim, bi zimanê xwe yê taybetî, dipeyivin.

Gelo ev jiyana Celadet Begê, jiyana ku mîna romaneke pir balkêş e, dê, êdî, bi windabûna Celadet Beg re, winda be? Jiyana wî, xebat, berhem û eserên wî dê ji bîr bibin? Ev kovarên wî Hawar, Ronahî ku wî bi hezar zehmetî û dijwariyan derdixistin ê di nav refan de birizin? Wexta malkambax ê her tiştî bide jibîrkirin? Şopên wî dê, mîna berfa ber tavê yan jî nivîsarên li ser qûmê, hêdî hêdî bihelin û winda bibin?.. Yek Xwedê û yek jî Rûşen Xanimê dizanî ka wî çiqas eziyet dikişand da ku bikaribe berhem û eserên xwe biafirîne. Ew xebat, neçarî, êş, feqîrî û eziyet... Ma ew ê niha winda bibin?

Dîsan girî dikeve çavên werimî yên Rûşen Xanimê û hêstir hêdîka resimekî ku li berê ye û li Stembolê, atêlya fotografî ya "Abdullah Freres", hatiye kişandin, şil dikin.

Ew cixareyeke nû, bi cixara ku di destê wê de xelas dibe, vêdixe, li dora xwe dinihêre û difikire. Fikir, hîs, pejn û guman li dora roniya çirê difirin. Gotin û peyv qediyane, winda bûne. Mixabin, hezar mixabin ku ev weşan û resimên ku li berê ne, napeyivin. Çima ew rêzên xweşlihevhatî yên Celadet Beg ji nav rûpelan dernakevin û dest bi peyivînê nakin? Ev şiîr, ev çîrok, ev serpêhatî, ev nivîsar... çima ev jî mîna Rûşen Xanimê bi tenê bêdeng in?

Ya ev resim û wêne? Nemaze ev resimên ku şahidê jiyaneke dirêj û qedereke balkêş in? Ma ev fotoyên ku niha li berê ne û li pey jiyaneke dijwar û rengîn, kesertijî û bedew mane, dê weha bêdeng û stûxwar bimînin û birizên? Ev ê, bêzar û bêziman, biqulibin ser rengê zer û mîna pelên zer ên payizê biweşin? Ma ev ê bi tenê bibin xewneke wexta bihurî? Ma ev ê nepeyivin û xwe li hember herikîna wextê ranegirin?..

Rûşen Xanim li resimekî kêlekê dinihêre. Ew xwe dide hev, li erdê rûdine, resim digire destê xwe û bi hizr û dîqet lê dinihêre; Celadet Beg, sal divê 1926 be. Enî vekirî ye, çav mîna çavên teyrê elo bi xwe bawer û vekirî ne. Porê wî yê ber bi paşiyê şehkirî û reş, dibiriqe. Poz, pozê nas ê Bedirxanan e; mezin, dirêj û xweş. Kincekî nû û reş, bi gotina fransizan kostumek ku diyar e, ji destê terziyên yekta derketiye, lê ye. Qirawateke xweş a hewreşîmî û bi nixtik, mîna her gavî, kincan û gomlega spî xweş li hev tîne. Yêlegê wî ku perçeyekî ji kincan e, bi şeş qumçikan e û qumçik hemû, heta sîngê, girtî ne. Celadet Beg hinekî xwar sekiniye û herdu destên wî di bêrîkên pantolonê de ne. Rû hinekî gulover e. Simbêl û rîh nîn in. Heye ku loma hinarikên rû mezintir û gilovertir dixuyin. Enî û pêşcênik gelekî vekirî ne. Biriyên çavan, ji hevûdu baş veqetî, dirêj û reş in. Bijang di bin reşahiya biriyan de winda bûne. Lê bîbik mîna du lûlûyên reş in û dibiriqînin.

Niha? Ew ê niha bi tenê di nav van resiman de bimîne? Gelo qedera wî, ev bû? Rûşen Xanim radibe ser piyan, fotografên ku li dora wê peregende belavbûyî ne, yek bi yek, dide hev û dîsan tê li erdê, li cîhê xwe rûdine. Ji çilî zêdetir resim. Ji çilî zêdetir kurte-demên bihurî û qeyitkirî. Li vir û li wir. Hin ji wan bi hunermendiya fotografkêşên hoste hatine kişandin. Di hinan de jî ne huner û ne jî hostahî heye, ew bi tenê ji bo îspatkirina jiyan, wext û demên bihurî hatine veşartin. Hemû jî bi rengên reş û spî ne. Bêguman çeşnên reş û spî jî tê de ne; hin vekirî ne, hin jî girtî. Hinên wan portre ne, nîşana jiyana Celadet Begê ne. Di hinan de jî gelek kes bi hev re ne, îspata yekbûn, hevgirtin, hevkarî, dostî, merivahî û biratiyê ne. Hin jî bi tenê bergeh in, cîh û warên ku jiyanek tê re bihuriye.

Rûşen Xanim li rû û bedenên kesên fotografan dinihêre. Ew hinan ji wan dinase, lê hinan jî nas nake. Hin bi simbêl û rî ne. Rûyê hinan bi ken e, yê hinan jî sert, hin jî westiyayî, matmayî û şaşbûyî li objektîfa makîna resiman dinihêrin. Rûyê hinan mîna heyvekê spehî ye, yê hinan jî çelmisî û qermiçî ye. Hinan çavê xwe girtine, mîna ku ew di xewê de bin. Hin jî li derekî din, li dûrahiyê dinihêrin. Hin rûtirş in, hin jî rûnerm. Rûyên ji hev cihê; li pey her yekî qedereke cihê û balkêş. Ya çav? Çavên reş, çavên belek, çavên kentijî, çavên kesertijî, çavên kal, çavên pepûk. Çavên jîndar û kûr... Çavên kurdan, eynî mîna qedera wan.

Her tişt niha di nav van resiman de veşartiye. Wext, dem, dewran, jiyan, serpêhatî, bûyer, pêwendî, evîn, şer, têkoşîn, êş, keser, hesret, hîs, pejn... her tiştî niha xwe veguhezandiye nav van fotografan, xwe kiriye beşekî biçûk ê fotografan da ku Rûşen Xanim her tiştî bibîne û bi bîr bîne. Bêguman, eger Celadet Beg weha ji nişka ve neçûya û bikaribûya romana xwe Bîra Qederê binivîsiya, wî dê li van resimên ku nîşana dewreke dirêj û jiyaneke bedbext in, binihêrta. Lê mîna her daxwaz û xwesteka wî, daxwaza nivîsîna romanê jî qurmiçî û nîvçe ma...

– Kî dê niha pêşî li van resiman binihêre û paşê wan bîne ziman? Kengê ev fotograf ê dest bi peyivînê bikin?..

Rûşen Xanim li resiman û deftera romana Bîra Qederê ku Celadet Begê dest pê kiribû û bi tenê çend rêz nivîsîbûn, dinihêre û weha difikire.

FOTOGRAF 1

Ceco; zarokê welatê xerîbiyê, neviyê Mîr Bedirxan

1 Herwekî ku hatiye gotin, meriv pêşî dibîne û dinihêre, paşê jî dipeyive û dibêje. Romana ku Celadet Begê dixwest binivîse, dikare bi vê wêneyê dest pê bike, ev wêne dikare bibe fotografa yekemîn a romana Bîra Qederê; Salut de Constantinople, Vue de Moda a Cadi-Keuy. Silav ji Constantinoplê, bergehek û dîmenek ji Modayê, li Kadıköyê. Pêşî bergeh û nêrîn, paşê gotin û qise... Sal, 1893 ye. Demsal, bihar, ji mehan Gulan, ji rojan rojeke germ, vekirî û xweş e. Bihar û gulan hatine; der û ber hêşîn, dinya germ, esman gewher e. Stembol û Kadıköy di nav govenda rengan de ne. Reng bi ser ketine, dinya ji nû ve vedije. Jiyaneke nû dest pê dike.

Di bergehê de tiştê herî ber bi çav, zerya (derya) ye. Zerya di nav rengekî kesk û şîn de hemû wêne rapêçaye. Tonên rengê şîn lê ne. Li aliyê dûr spiyekî qerqaş desthilat e. Li der û dorên qeraxên zeryayê tarîtiyeke qer li ser avê dixuye. Di navbera herduyan de jî hin celebên din ên rengê şîn hene. Esman çîkvekirî ye. Li cîhê ku zerya û esman bi hev re dibin yek, komên ewran çîlspî ne. Lê li jorê, cîhê ku êdî ewr diqedin, esman bi rengê şîn xemiliye. Rengê spî xwe qulipandiye ser rengê şîn. Ewr di nav hev de ne, lê nerm û sade dixuyin. Ne sawa berf û baranê, ne jî tirsa ba û bahozê lê ne. Ew di nav spehîtiyeke zarîf de ne, mîna ku ew mizgîniya jiyana nû bi dinyayê digihînin.

Li dûr, li cîhê ku zerya û esman digihên hev, berpala girekî ku dirêjî avê bûye, xwe bi zeryayê digihîne. Qirax û ax li wir dest pê dike. Gir bilind û asê ye. Ew bi carekê noqî avê bûye, rûyê wî kevir e û mîna piyekî dirêj ê axê dixuye. Li ser gir dar hene. Ji bergehê fahm nabe ka ew çi texlît dar in, lê stûr û dirêj in. Li cîhê ku dar dest pê dikin, rengê kesk zora rengên spî û şîn dibe. Keskahiyeke bedew li rengên wêneyê zêde dibe. Keskahî hemû milê jor ê bergehê dadigire. Daristaneke xweş û bedew li wir hevaltî li zerya û esmanan dike. Jiyana merivan jî li wir dest pê dike. Ji ber ku li ser gir, di nav daristanê de xanî xuya dikin. Di ser daran re, banên qesreke pir mezin dixuyê. Qesr spî ye û welê dixuye ku ew ji çend beşan tê pê. Hema di binî banên xaniyan de pencereyên dirêj û mezin dixuyin. Meriv ji penceran dikare hemû rengên roja xweş a gulana 1893-an bibîne. Digel ku qesr di wêneyê de jî pir li dûr e, dîsan jî meriv ji avasaziya wê derdixe ku qesr di dema osmaniyan de lêbûye. Mîmariya wê ne ya bîzansan e. Xwediyê qesrê jî binemala osmaniyan, sultan û şahzadeyên wan in. Qesr li ser pozê gir ava bûye û eynî mîna malbata osmaniyan, nêrevanî li erd û esmanan, dewr û dewranan dike.

Ji qesrê hinekî dûr, lê li ser eynî rêzê, çar qonax, bi gotina osmaniyan çar koşk hene. Ew bi qasî qesrê baş naxuyin, bi tenê banên wan û hin aliyên wan dixuyin. Ew ji qesrê pir biçûktir in, lê tevî vê, qonaxên spehî ne. Banên wan sor dike; bi lehîtên sor lêbûne. Qonax li kêleka hev in û di nav daran re meriv dikare pencera yekê ji wan bibîne. Ew qonaxa ku pencera wê dixuye, li kêlekê ye, ji qesrê dûr e. Ew ji qonaxên din jî hinekî dûr e... Ew qonax, hebûna wê, reng û avahiyên wê, ode û meclîsên wê, bîr û bexçê wê, ji bo romana Bîra Qederê pir girîng û pir pêwist e. Ji ber ku tovên romanê li wê qonaxê tên avêtin: Qonax, yek ji malên malbata Mîrê kurd ê Cizîra Botan Bedirxan Beg e. Lawê wî Bedrî, paşa û sereskerê osmaniyan, tevî mala xwe tê de dijî.

Li kêleka qonaxa Bedrî Paşayê Bedirxanî, gir bi şikêrekê xelas dibe. Tê re gewriyek derbas dibe û xwe digihîne zeryayê. Piştî

gewriyê jî girekî nû ku hinekî berztir e, dest pê dike. Lê di navbera herdu giran de, li cîhê ku gewrî xwe digihîne zerya, lengergeheke dirêj heye. Welê dixuye ku lengergeh bi qasî 100-120 mîtroyî dirêj e. Li herdu aliyên lengergehê çend kelek, qayik, kod û keştiyên biçûk ên bayê hene. Ji wan hinekî dûr jî keştiyeke mezintir lenger avêtiye û rawestaye. Û hema li qiraxê lengergehê, du qonaxên biçûk ên bansor ku pir bi qonaxên din dişibin, dixuyin. Wan berê xwe dane zerya û pişta xwe dane gir. Girê nû û berztir jî bi daran tijî ye û li cîhê ku wêne xelas dibe, nîvê qesreke mezin xuya ye. Avasaziya vê qesrê jî mîna ya din e.

Li ser vê wêneyê tiştê herî balkêş, hebûna merivekî ye. Di wênê de, li aliyê pêş, giraveke pir biçûk heye. Girav hema bi qasî bihustekê ji qirax û gir veqetiyaye. Lê meriv dikare bi hêsanî xwe bigihîne giravê. Û hemû girav ji çend lat û kevirên mezin û bilind hatiye pê. Ew ne cîhê jiyîn û rûniştinê ye. Lê ji wir mîna teyrê baz, meriv dikare hemû alî bibîne. Di wênê de, merivekî li ser kevirê herî bilind ê giravê rûniştiye û li kamerayê dinihêre. Ew kî ye, çi kes e, çi dike? Meriv vê yekê ji resim nikare derxe. Digel ku ew di wênê de, pir li pêş e, dîsan jî rûyê wî baş naxuye. Ew mêr e, porê wî reş, gomlegê wî spî û kincên wî reş in. Wî hinekî stûyê xwe xwar kiriye û li aliyê objektîfa makînê mêze dike. Pêşî ew li fotografkêş dinihêre û paşê jî, bi îhtimaleke mezin, weha dibêje: "Ez jî heme, ez li vir im, perçeyekî vê wêne û bergehê me..." Hebûna vî merivî wênê yekcar diguherîne; ruh û can dikeve wênê, hest û pejna jîn û jîndariyê direşe ser bergehê. Di fotoya yekemîn a romana Bîra Qederê de, hebûna merivekî weha gelek girîng e. Ji ber ku romana Bîra Qederê, tevî bergehên cuda û xweş, li ser însan ava dibe. Meriv û hebûna wî esas e.

Ev merivê ku li ser kevir rûniştiye, pişta xwe daye girê jorîn ku qesr û qonax lê ne. Pişta meriv, bi temamî, ber bi qonaxa Bedrî Paşa ye. Eger meriv xêzekê ji pişta wî bikişîne, xêz ê rasterast xwe bigihîne qonaxê. Di qonaxê de, ji 40 zêdetir meriv dijîn. Hemû jî Bedirxanî ne. Bedirxanî, bi gotina osmaniyan Bedirxanpaşazade,

pir in. Ji vê qonaxê pê ve, çend mal, xanî û qonaxên wan ên din hene. Hemû jî li aliyê rohelat ê Stembolê, li milê Anatoliyê, li Kadıköyê bi cîh bûne; li Moda, Fenerbahçe, Cevizlik, Bostancı, Mühürdar, Göztepe û Kızıltoprakê dijîn. Piştî Kurdistanê, Stembol û Kadıköy bûye welatê wan ê duyemîn.

Fotokêş kî ye? Li ser fotoyê, ev ne diyar e. Lê belê, eger kî be, ew fotokêşekî hoste ye. Li ser fotoyê hem dîmenên vekirî yên Kadıköyê, bi rengên xwe yên taybetî, hene, hem jî di navenda hemûyan de însan. Ne însan ji ber çavan direve ne jî bergeha Kadıköyê... Bergeh, perçeyekî ji xweşî û dewlemendiya Kadıköyê, tevî însanê wê, berpêş dike. Zerya Marmarayê bi pêlên xwe pişta qirax û girên Kadıköyê mist dide. Dar û ber bi rengên xwe yên demsalan hawirdor dineqişînin. Qesr û qonaxên Kadıköyê esaleteke yekta didiyê. Bender û lengergehên Kadıköyê ku ew rapêçane, mîna pencereyekê li dinyayê vedibin. Keştiyên ku li doraliyên Kadıköyê ne, ahengeke lêhatî didinê. Daristan û hêşinahiyê Kadıköy kiriye cîhê ger, geşt û seyrangehê.

Di rojeke biharê ya gulana 1893-an de, Kadıköy, taxa wê Moda û qonaxa Bedrî Paşayê Bedirxanî, li ser resimekê weha xweş û rengîn dixuyin.

2 Li mala Bedrî Paşayê Bedirxanî, di rojek ji rojên gulana 1893-an de, lez û bez û endîşe heye. Zarokek di rê de ye. Jina Emîn Alî Bedirxan, Samîha Xanim li ber welidandinê ye. Qonax tijî meriv e. Roj xweş, dinya germ, dan êvar e. Ji axê bîhna gul û kulîlkan difûre. Zerya çîk şin e û mîna neynikekê zelal û aram e. Li esmanan komên spî yên ewran, bi aramî, xwe dilivînin. Li dûr, du keştiyên dirêj û stûr ên dûkelî zikê ava paqij diqelişînin û hêdî hêdî, li pey hev, derin. Dûya wan, bi giranî, ber bi esmanan hildikişe. Ro di ser ewran re li Kadıköyê dinihêre û tîrêjên wê li ser eniya pêşî ya qonaxa Bedrî Paşa şewq didin.

Qonax, sê qat e û li gora avasaziya osmanî hatiye lêkirin. Du qatên jêrîn, ji herdu aliyan, fireh in. Lê qata jorîn, bi tenê dirêj e. Loma, ne sê qat, lê meriv dikare bibêje ku qonax du qat û nîv e. Qata jorîn ji navenda xênî ber bi jor dibe û estetîkeke taybetî ya avasaziyê dide qonaxê. Li rûyê pêşîn ê qata jorîn pencereyeke dirêj û fireh heye ku xweşiya avasaziyê dineqişîne. Li ber pencerê jî balkoneke, bi gotina kevn, şaneşîneke biçûk heye. Ji wê derî meriv dikare hemû pêlên zerya, yek bi yek, bijmêre. Ji wir ebediyeta ewr û esman, av û zeryayê, mîna tabloyeke resamekî hoste, baş, pir baş dixuye. Bana qonaxê, ji herdu milan ve, ber bi jêr, xus dibe û bi qermîtên sor raxistî ye. Ev qermîtên sor pir xweş li rengên xênî û hawirdor hatine. Rengê qonaxê spî ye û hawirdor jî di nav rengên kesk û şîn de ye. Gava rengê sor jî li wan zêde dibe, cumbuşa rengan temam dibe û rengên herî xweş ku li ber dilê kurdan pir ezîz in, derdikevin holê; kesk, sor, zer û gewher. Niha di vê danê êvarê de, gava tîrêjên tavê li ser qermîtên banê govend girtine, di eynî wextê de, govenda rengan e jî. Ban, bi kêranên têkûz, bi dîwarên depîn ên qonaxê ve hatine girêdan. Ev kêran, di avasaziya osmanî de, hem pêwistiyeke lêkirinê ye, hem jî neqş e.

Mîna hemû qonax, qesr û xaniyên li doralî, qonaxa Bedrî Paşa jî xeşap e, ji max, qab, cax, kêran, karîte, spartek û stûnên textîn ava bûye. Li eniya pêşîn a qonaxê, ji nav daran, 9 pencere dixuyin, çar li qata binî, çar li qata navîn û yek jî li qata jorîn. Caxên penceran bi hostehî hatine neqişandin. Li ber deriyê mezin ê qonaxê derenceyek bi pênc pêlikan heye. Li herdu aliyên derî darên biçûk ber bi jor dibin. Bexçeyekî biçûk û xweş ê qonaxê jî heye. Niha, li bexçê tiştê herî girîng ê romana Bîra Qederê, bîra bexçe ye. Hema li kêleka çepê xênî, di bin dareke dirêj de, bîrek heye. Bîrek ku hem ji bo romana Bîra Qederê, hem jî ji bo şêniyê malê girîng e.

Herçî aliyê hundir ê malê ye, berî her tiştî meriv divê bibêje ku 18 odeyên malê hene. Du salon, mutfexeke mezin, deh

odeyên razanê, kitabxaneyek, odeyeke xebatê, serderiyeke dirêj, dalaneke fireh, du banyo... Lê dîsan jî, digel vê mezinahî û pirbûna odeyan, xanî têrî şêniyên malê nake. Malbata Bedrî bi xwe ji bîst kesan zêdetir e. Eger meriv mêvanên wan ên ku hertim tên jî bihesibîne, hejmar hîn pirtir dibe. Niha, ji mehekê zêdetir e ku birayê wî Emîn Alî Bedirxan Beg jî, tevî jin û zarokên xwe, hatine û bûne mêvanên wan.

Belê, mêvaniyek ku ji bêgaviyê hatiye pê. Agir û şewatên Stembolê navdar in. Her roj derek, taxek, aliyekî Stembolê dişewite. Gulokên agiran bi esmanan dikevin, mal wêran dibin, malbat li kuçan dimînin. Her roj tulumbaciyên taxên Stembolê, sîtil û depoyên avê li ser milên wan, bi qîreqîr, li kolanên Stembolê dibezin da ku xwe bi agirên kambax bigihînin û vemirînin. Lê heyhat!.. Ne agir vedimire ne jî qîre qîra tulumbaciyan bi kêrî tiştekî tê. Mal dişewitin, tax kavil dibin, jiyana rojane têk dere... Berî niha bi qasî mehekê, mala Emîn Begê jî ku li aliyê Kadıköyê, Kızıltoprakê bû, şewitî. Wan jî têkber û feraqên malê berhev kirin û hatin qonaxa Bedrî Paşa.

> Nivîskarê Bîra Qederê, herwekî ku tu dizanî, kitekit û detay ji bo afirîn û avakirinê gelek girîng in. Kitekit û detayên reng û bergehan ji bo resamekî, yên dengan ji bo musîkjenekî, yên peyv û gotinan ji bo nivîskarekî girîng in. Belê, hê berî ku ez werim dinê, agirê Stembolê mala me wêran kiribû... Ew agir û bi gotina te, tulumbaciyên Stembolê, mîna kitekit û detayeke jîna min, tê bîra min jî. Li milekî ew agir û şewat, li milekî jî qîreqîr û xirecir, rû û rûçik, cil û bergên wan tulumbaciyan... Meriv nizanîbû çi bike, bikene yan bigirî... Li taxa me Kızıltoprakê jî komeke tulumbaciyan hebû. Qîrîna wan hê jî di guhê min de ye; "Hayyyy!.. Kara babam, hayyy! Yolumuzu kesenin haline vayyyy!.. Bu gelen Kızıltoprak köleleri!.." Kumê wan xwar, simbêlê wan boq, lingên wan xwasî, pazûyê wan şidayî, ew fedakar, pêxas û berdûşên Stembolê bûn. Hebûna wan, nîşana jînê bû; li milekî axîn, girîn û qîrîn, li milekî jî ken, henek û zirtîn...

Îro, di vî danê êvarê de, gava roja romantîk a biharê ya Modayê hêdî hêdî winda dibe, li qata dudiyan a qonaxa Bedrî Paşa, di odeyeke fireh de, Samîha Xanim di nav êşeke mezin de ye. Mêr li qata jêr, li salonê rûniştine, jin jî li jor. Zik lê giran bûye. Êşa wê yekcar zêde ye. Nefes lê diçike. Ev çi hal e!..

3 Ev çi hal e!.. Eger weha here, Samîha Xanim wê bimire. Danê êvarê bû êvar, êvar qulipî ser şevê, şev ber bi berbangê dihere, lê hê jî zarok nehat dinê. Êşên Samîha Xanimê pir zêde bûne. Êş pêl bi pêl tên. Nalenala Samîha Xanimê ye, ji şerma nikare biqîre jî. Ew bi tenê kûr-kûr dinale. Rûşen Xanim, diya Bedrî Paşa û Emîn Beg, du jinên Bedrî Paşa û hin jinên din jî li ser Samîha Xanimê ne. Her yek, ji aliyekî ve, dixwaze alîkarî bike. Rûşen Xanima porspî û xwedantecrube dike, nake, nikare serê zarok ji bedena dê derxe.

– Min evçend alîkarî li jinên me kirine, lê tu carî ecêbeke weha nedîtiye, ew dibêje... Li gora vê êşê û vebûna bedenê diviya zarok ji zû ve bihata. Serî dixuye, lê ber bi jêr nabe. Ev çi hal e? Tirsa min ew tirs e ku Samîha min here. Çareyek divê, çareyek divê...

Çare çi ye? Mêr, Bedrî Paşa, Emîn Beg û çend birayên wan ên din, di salona fireh de, li qatê jêr in û li benda xebera xêrê ne. Lawê Emîn Beg, Sureya ku nû ketiye sala xwe ya dehan, heta berî niha bi bîskekê jî, li kêleka bavê xwe, li erdê rûniştibû û li hêviya hatina bira yan jî xwişka xwe bû. Lê gava çavên wî giran bûbûn, xizmetkareke malê ew biribû jor û xistibû xew.

Emîn Beg wê dîsan bibûya bav. Lawekî wî hebû; Sureya. Diya Sureya zû wefat kiribû. Sureya hê nebûbû du salî, diya wî bi nexweşiya seretanê ketibû û di demeke kurt de wefat kiribû. Du mehên dawîn ên nexweşiya wê Emîn Ali Beg gelekî êşandibû. Diya Sureya ku Emîn Ali Begê jê ewçend hez dikir, li ber çavên hemûyan, bi êş û janeke mezin, vedimirî û dimir. Ne Emîn Ali

Begê, ne jî kesekî din, nikarîbûn tu tiştî bikin. Di rojên dawiyê de, diya Sureya bi qasî mistekê mabû. Û gava wê wefat kir, Emîn Ali Beg bi rojan li şîna wê rûnişt, bi mehan pê êşiya û di şevên tarî yên zivistana Kadıköyê de, bi dizî, ji bo delaliya xwe giriya. Diya Sureya jineke bedew a çerkez û ji malbateke navdar a arîstokratên osmaniyan bû. Ew, evîna yekemîn a Emîn Ali Begê bû. Wan hê di xortiyê de hevûdu nas kiribûn. Di nav daristan û bexçeyên Moda de, ew pêşî ji dûr ve, bi çavan peyivîbûn, paşê jî dest di destan de. Hingê mirin tu carî nedihat bîra wan. Piştî zewacê lawekî wan ê mîna topa zêr jî çêbûbû. Pêşerojê tiştên nû, xweş û serfiraz waadî wan dikir. Lê di wê dema ku ne mumkin bû ku wan bîr bi mirinê bibirana, mirin hatibû...

Bi dû mirina yara wî ya dil û can re, Emîn Ali Beg dil tunebû ku bizewiciya. Lê lawê mîrê gorbihuşt ê kurdan Bedirxan, yek ji serokên herî girîng ên kurdan wê çawan mala xwe bê jin bihîşta? Niha lawê wî jî hebû, na, nedibû... Xwişkên wî Melek, Ayşe û Sariye û bi taybetî jî dapîra wan hemûyan Rûşen Xanim ketin qirika wî da ku ew bizewice. Dîsan zewac... bi kê re û çawan? Lê li ser gotin û israrên "jinên malê", ew hêdî hêdî dîsan ket ser riya zewacê. Îcar jî dîsan bi yeke gelekî nas re; Samîha. Samîha ku li ber destê diya wî mezin bûbû û ji diya wî re cariyetî dikir. Samîha ku mîna çilkeke zêr û dilopeke av bû. Samîha ku dilê wê nerm, heşê wê xurt û wîcdanê wê tam bû.

> Her çi tişt û kesê xweş û rind e, ew muqedes e. Ev, yek ji qayideyên min ên jînê bû. Xweşahî, spehîtî û bedewî divê felsefa jînê be. Û xweşî û rindî divê bi xweşî û rindî bête zimên... Eger ez weha difikirîm û dijiyam, ez bawer im, tê de tesîra diya min pir bû. Diya min abîda xweşî û rindiyê bû ku bi gotinan naye saloxdan. Ew jî mîna dêmariya min a rehmetî ku min nedît, çerkez bû. Lê tiştekî diya min ji dêmariya min zêde bû; diya min bi kurdî jî dizanîbû û li malê bi kurdî dipeyivî û ez vê yekê jî bibêjim; kurdiya diya min ne kêmî kurdiya metên min û dapîra min bû. Herwekî tu jî dizanî, bedewiya çerkezan bi nav û deng e.

Ew hemû bedewî hatibû û li ser rûyê diya min diçirûsî. Di jînê de, meriv rastî gelek rûyan dibe. Piraniya wan ji bîr dibin, lê hinên wan di bîr û heşê meriv de, her û her, dimînin. Rûyê diya min, yek ji wan rûyan bû ku mîna siya meriv, hertim, bi merivan re bû. Rûyekî gulover, spî, xweş lihevhatî û bihîstiyar...

Lê niha halê Samîhayê ne tu hal e. Jê re çare divê... Rûşen Xanim ji derencên textîn û neqişkirî ku di navbera herdu qatên qonaxê de ne, hêdî hêdî peyayî jêr bûye û niha li salona mezin a qonaxê, li nik "mêran" e. Mêr divê çareyekê bibînin. Çavên mêran bi endîşe û meraq li Rûşen Xanimê dinihêrin. Gelo çi bû, çima zarok nayê, digel ku evçend wext derbas bû? Rûşen Xanima westiyayî û bêxew napeyive, bi tenê bi çavan li civatê mêze dike û dîsan bi çavan bang li Bedrî Paşa dike. Herdu bi hev re, Rûşen Xanim li pêşî, Bedrî Paşa li paşî, derbasî mitbaxa mezin û fireh a kêlekê dibin. Maseyeke xwarinê ya dirêj û li doralî jî donzde kursiyên rûniştinê, li aliyekî mitbaxê ne. Mase û kursî ji darê gûzan çêbûne û rengê wan, rengê qahwê ye. Rûşen Xanim bi destê Bedrî Paşa digire û bi hev re derin li ser herdu kursiyên li koşa masê rûdinin. Stêrk, ji pencereyên fireh ên mitbaxê, ronahîyeke qels direşînin hundirê mitbaxê.

– Yadê, ev çi hal e, xêr e? Çima zarok weha bi derengî ket? Bedrî Paşa dipirse.

– Kurê min, min heta niha pîrikiya bi dehan zarokên malê kiriye, lê min ecêbeke weha nedîtiye. Ji êvarê de ye ku zarok nayê xwar. Em dikin nakin, nikarin zarok bikişînin. Heke hinekî din weha dewam bike, em ê Samîha reben winda bikin... Divê doxtorek were û alîkarî bike. Wekî din çare nîn e. Min nexwest ji Emînê xwe re bibêjim. Heke min jê re bigota, wî ê bigota na. Tu jê re bibêje û wî ji bo doxtor îkna bike. Hûn çi dikin bikin, zû doxtorek bînin.

– Yadê, di vê nîvê şevê de, em ê doxtor ji ku bibînin. Tu dizanî, em ji bajêr gelekî dûr in.

Rûşen Xanim gotina dawîn, bi dengekî sar û qetî, dibêje;

– Lawê min, ma heke çare hebûya, min doxtor dixwest? Rast e, em ji bajêr gelekî dûr in, lê erebe li ber derî ye, ji seyisê xwe re bibêje, bila ew hespan bîne û bi erebê ve girê bide... Hûn divê xwe bi doxtorekî bigihînin.

4 Me xwe bi doxtor Esad Paşa gîhand. Xwedê jê razî be, wî yeka me nekir dudo.

Gava Bedrî Paşa û bijîşk Esat Paşa dikevin hundir, aliyê salonê, Bedrî Paşa weha dibêje. Emîn Beg û kesên din jî radibin û xêrhatinî li Esad Paşa dikin: "Hoş geldiniz, buyurun, oturun." Ew kursiyeke fireh a rûniştinê didin Esad Paşa. Lê Esad Paşa rûnane, destê xwe yê rastê davêje riya xwe ya dirêj û spî, li dora xwe û li Bedrî Paşa û Emîn Beg dinihêre û bi ken dibêje,

– Hayır, oturmayayım. Sağolun. Elbette Bedri Paşa ve sizleri kıramazdım... Ancak bildiğiniz gibi, ben göz tabîbiyim. Ama elimden geleni yapacağım...

Esad Paşa ku bi eslê xwe arnawid e, tevî mal, zarok û neviyên xwe, li Kadıköyê, Modayê rûdine. Piştî ku seyis hesp û erebe hazir kiribû û deriyê erebê vekiribû, Bedrî Paşa, birayê xwe yê herî biçûk Murat jî girtibû ba xwe û ew bi hev re çûbûn mala Esad Paşa. Esad Paşa ne bijîşkê zarokan bû ne jî aletên wî yên bijîşkiya zarokan hebû. Lê wî tikaya Bedrî Paşa venegerandibû. Ew bi hev re pêşî çûbûn nexweşxana Haydarpaşayê da ku hin alet û firaq werbigirin û bi dû re jî, bi lez, hatibûn malê.

– Hemen işe koyulalım... Hastamız nerede?

Bi van gotinên Esad Paşa re, Rûşen Xanim rê nîşanî wî dide û ew bi hev re derdikevin qata jor, odeya Samîha Xanimê. Jinên ku li odê ne, xwe didin alî. Textê razanê ku Samîha Xanim li ser e, li ber pencereyekê ye. Li herdu aliyên text du maseyên dirêj ên text hene ku ji herdu aliyan ve xwe bi dîwêr digihînin. Li ser wan jî du çirayên mezin vêketî ne. Li ser dîwarê kêlekê lewhey-

eke mezin heye û tê de bi destnivîseke gelekî bedew, bi erebî, Bismîllahî Rehmanî Rehîm hatiye nivîsîn. Destnivîs neqişkirî ye û diyar e ku ew ji destê xetatekî hoste derketiye... Esad Paşa tê ser Samîha Xanimê û lê dinihêre. Çavên wê girtî ne. Diranên wê yên jorîn li ser lêva wê ya jêrîn in û ew gez kiriye. Rûyê wê yê spî yekcar bûye mîna xwelî û jê êş û jan dixuye. Bi tenê ji xwîdana ser enî, meriv fahm dike ku Samîha Xanim dijî. Esad Paşa destê xwe dide ser enîya wê. Enî, mîna cemedê, sar e. Esad Paşa, bi destê xwe, bi zehmetî, çavê Semîha Xanimê vedike. Hingê, ji nişkê ve, bedena wê, mîna ku ew ketibe ber zelzeleyekê, pihêt diheze û nalîneke kûr pê dikeve. Pêlên hezînê li pey hev û pir xurt tên. Esad Paşa, bi carekê, li Rûşen Xanimê û jinan vedigere:

– Çabuk, çok çabuk, sıcak su, bez vesaire getirin, çabuk...

Jin, hema bi lez, jê re du misîn ava germ, satileke ava sar, leganeke mezin, hin pêşgîr tînin. Ew bi lez destên xwe dişo û dîsan dere ser Samîha Xanimê.

> Feylesofan weha gotiye; rû, ruh û giyanê bedenê ye. Tiştê ku meriv li ser rû dibîne, haletê ruhiya bedenê ye. Rû, nîşana fikir, hizr, pejn, hîs, gumanên dil û mêjî ye. Tu dikarî van hemûyan li ser rûyekî bibînî û bixwînî. Ma me kurdan jî weha negotiye; li rû binihêre, merivê xwe binase. Di destê wê sibê de, li ser rûyê diya min Samîha Xanimê jî mirin hebû. Bi tenê mirin. Mirinê hê hingê mohra xwe lê xistibû. Ew êş, jan û zehmetiya berbanga wê sibê hem nîşana jîneke nû hem jî ya mirinê bû. Di berbanga sibeheke bihara 1893-an de, jîn û mirin ketibûn nav hev. Tu kesî nikarîbû ew ji hevûdu veqetandina. Cezbê mirinê bi ser herkesî de hatibû. Kesî nikaribû tovên jiyanê tê de bidîta...

Çaxa dunya ronî dibe û tav bi tîrêjên xwe yên pêşîn mizgîna rojeke nû dike, Esad Paşa, Rûşen Xanim, Melek Xanim û du cariye ji derencên qata jor peya dibin. Di hembêza cariyekê de, di nav pêşgîreke spî de tiştek heye. Pêşgîr di nav xwîna sor de ye.

Esad Paşa, Rûşen Xanim û Melek Xanim ber bi salonê, herdu cariye jî ber bi deriyê derve derin.

Gava Esad Paşa û yên pê re dikevin salonê, Bedrî Paşa û Emîn Beg ji kursiyên xwe radibin. Ji kesî deng dernakeve. Bira û biraziyên din hemû çûne, li salonê bi tenê Bedrî Paşa û birayê wî Emîn Beg mane. Yên nû hatî jî li kursiyên kêlekan rûdinin. Hemû westiyayî ne, ji rûyên wan xemgînî dixuye.

– Acı kahveniz var mı? Sabah sabah acı kahve iyi gelir.

Esad Paşa qahwa tahl dixwaze. Di destpêka sibê de, qahwa tahl baş û xweş e, ew dibêje. Xeberên wî hem xweş, hem nexweş in. Emîn Beg, destê wî li ser riya wî, bi hizr li Esad Paşa guhdarî dike.

– Samiha Hanımı güç bela kurtardık. Ancak çocuğu kurtaramadık. Hacmi çok büyüktü. Zorla ana karnından çıkardık. Çok zor oldu. Ölü doğdu...

Rûşen Xanim gotina Esad Paşa didomîne. Semîha, Semîha delal û reben, di nav hêlekana mirin û jînê de çend caran çûye û hatiye. Wan bawer nekiribûn ku ew ê xelas bibûya, şikur ji Xwedê re ku ew xelas bûye. Herçî zarok e, wê hê zarokekî ewçend mezin nedîtibû û zarok kurekî qerqaşî bû.

Emîn Beg bi tenê li wan guhdarî dike û difikire. Ew çi bibêje û hîs bike? Samîha ji mirinê xelas bûye. Lê lawê wî miriye. Wî navê lêwik jî hazir kiribû. Eger zarok kur bûya, navê wî dê Celadet bûya, na eger ew keç bûya, navê wê dê Meziyet bûya. Lê ew çi bike?.. Mirin û jiyan bi hev re hatibûn.

5 Mirin û jiyan bi hev re hatibûn. Samîha Xanim li jorê, qata diduyan, razaye. Perçeyê beden û jiyana wê, zarokê mirî, li jêr, li kêleka bîrê ye. Cariye zarok, di nav pêşgîr û pêçekekî bi xwîn de, danîne ber devê bîrê da ku wî bişon û tevî xanimên malê, veşêrin. Ew li der, bêruh û bêpejn, tenê, li kêleka bîreke sar, dirêj bûye.

Pariyeke zarok, misteke can... Hatin û çûna wî bû yek. Ji qonaxê deng dernakeve. Mala mezin, di nav xewa sibê de, bêdeng,

li neheqiyên jiyanê difikire. Kî dê zarokê mehrûm bibe, wî bişo û ji xwîna jiyanê paqij bike? Kî dê kefenekî spî û biçûk li bedena wî ya biçûk rapêçe? Bêyî hêstirên çavan, kî dê bikaribe li ser wî melayikê biçûk, bilorîne û stranên şînê bibêje? Kî dê wî bi temamî ji jiyanê bi dûr xîne û bixe bin axa reş û sar? Kî dixwaze pergî rûyê sar ê mirinê bibe, xwestekên mirinê qebûl bike, stûyê xwe li ber mirinê xwar bike, ji xwe re nebe xweyî û bide ber sistiyê? Kî? Jiyan û zehmetiyên jiyanê li aliyekî. Lê ev mirin, mirina ku dora romana Bîra Qederê rapêçaye. Mirina ku berî jiyanê hatiye û zarokekî nûbûyî dixwaze.

Mirina ku rêzika dinyayê digerîne, niha li mala Bedrî Paşa çerx dibe. Rûşen Xanim, Melek Xanim, Bedrî Paşa û Emîn Beg jî çûne odeyên xwe yên razanê. Bi westa şevê û sawa mirinê, ew dixwazin çavên xwe nerm bikin. Bi tenê çend cêriyên malê li piya ne. Yek li ber serê Samîha Xanimê rûniştiye, yek li jêr têkberên salon û odeyan dide hev, yek jî li mitbaxê avê germ dike, ji bo zarokê li ber devê bîrê.

> "Ji bo zarokê li ber devê bîrê"... Hin gotin û peyv hene ku tê de jînek, umrek veşartiye. Çaxa meriv li wan hûr dibe, umrekî dirêj, mîna neynikekê, li merivan dinihêre. Heye ku haya te jê tune be, lê di gotina te ya jorîn de umrê min veşartiye. Peyva bîrê û bîrên ku di hin gehînekên jîna min de bûn pardarên qedera min, hê wê roja biharê, li ber bîra qonaxa mamê min Bedrî Paşa, xwe bi kûrahî bera nav rehên jîna min dan. Jîna min a ecêb, bi awayekî ecêb, bi wan dest pê kir û bi wan xelas bû... Bîra mala Bedrî Paşa ku li kêlekê jîn û mirin di nav şerekî bêeman de bûn, bîreke pir xweş bû. Doraliyê wê bi qasî pênc bihustan, mîna dîwarekî, bi qermîtên sor hatibû lêkirin. Devê wê zêde ne fireh bû. Ew ne kûr bû jî. Di nav bîrê de, bi dîwaran ve, pêbaskên wê hebûn. Meriv dikarîbû bi wan pêbaskan daketa nav bîrê. Ava wê hinekî şor û hertim hênik bû. Dara behîvan ku li kêleka bîrê bû, xweşiyeke yekta dida bîrê. Gava meh dibû adar û kulîlkên spî yên darê dibişkovîn, di bin dara spî de bîr dibû mîna bergehek ji çîroka "Hezar û şevekê..."

Cêriya li mitbexê, ku eslê wê îtalî ye, straneke îtalî ya zîz li ser lêvên wê, hêdî hêdî, karê xwe dike. Wê ji qata herî jorîn, ji oda binê banê ku ji bo dirûn û hûninê ye, cawekî dirêj ê spî aniye. Ev caw wê bibe kirasê mirinê, yanê bibe kefen û bedena biçûk rapêçe. Av li ser argûnê germ dibe. Gelo zarok wê li ku were şuştin? Mal, mala misilmanan e. Adet ûûsil divê baş bi cîh bên. Lê kî dê bi cîh bîne? Cêrî dê çima serê xwe bi van pirsiyaran biêşîne. Ji ber bextê rind, Rûşen Xanim, stûna mala Bedirxaniyan li vir e. Bêguman, ew ê her tiştî, bi rê xîne...

Cariye dere ser beroşa li ser êgir û li avê dinihêre. Na, av hê germ nebûye. Gelo av ne kêm be? Cariye satila ber argûnê digire û dere derve da ku ji bîrê avê bikişîne. Dinya êdî ronî bûye. Ji dûr dengê pêlên zeryayê, ji ser darên bexçê jî dengê çivîkan tê. Bayeke sivik hêdî hêdî pelên daran dilivîne. Rojeke nû ya bûyerên însanî dest pê kiriye. Zarokê mirî di nav paç, xawlî û pêşgiran de, li wir, li ser qermûtên ku li dora bîrê hatine raxistin, dirêj bûye. Jiyan çiqas ecêb e!.. Gelo vî mehrûmî, hema bi qasî kêlîkekê be jî, jiyan dît û hîs kir? Gelo rûyê wî çawan bû? Ji ber xwîna boş, kesî ne rûyê wî ne jî serçavê wî dîtibû. Niha, piştî bîskekê, gava ew vî mehrûmî bişon, Rûşen Xanim ê, îlam, li rûyê wî binihêre.

Lê ew çi ye! Dengek tê. Dengê zarokekî tê. Dengekî zirav ji zarokê mirî tê guhê cêrî. Ev çi ye!.. Cêrî, li kêleka bîrê, di cîhê xwe de, mat dibe. Na, ne rast e. cêrî, ji xofan, hinekî xwe ji ber bîrê vedikişîne. "Mama mia, mama mia..." Ma ev ne cin bin? Sihirên cin û periyan li van deveran navdar in. Ev ne lîstikeke periyan be? Ji dûr ve, ew dîsan, bi dîqet, li pêçeka zarok dinihêre û guhê xwe didiyê. Deng e, deng tê... belê, deng tê... Ew vediciniqe.

– Signore, signori, signore, signori!..

Cêrî ji nişkekê ve, bi tirs û qîrîn, direve hundir. Cin in, cin hatine. "Signore, signore!" Cariyên din li mitbaxê, li ser serê wê dicivin. Yek ji wan tasek av tîne û didiyê. Ew diheze û matbûyî li cariyên dora xwe dinihêre. Murat Beg ku li qata jêrîn razayî bû, bi deng û qîrînê radibe û bi heyecan, pîcema lê, tê mitbexê.

– Ne oldu, ne var? Franceska, ne oldu?

Ew bi tirkî ji cêriyan û cêriya ku diheje dipirse. Lê cêrî nikare bipeyive. Ew bi tenê, bi tiliyan bexçe nîşan dide û dibêje: "Piccola, piccolo.."

6 *Mio piccolo, mio picollo.* Cêrî, Rûşen Xanim, Melek Xanim, cariyên din li ser serê zarok in û wî dişon. Hêdî hêdî, bi dîqet. Wan zarok anîne hundir, mitbaxê. Tiştê nebûyinê qewimiye; zarok dijî. Ew di nav xwînê de ye û hê jî ji serê wî xwîn tê. Lê ew dijî. Di pêveçûna jiyan û mirinê de, jiyan bi ser ketiye. Li qonaxa Bedrî Paşa, di roja nû ya biharê de, bêdengiya mirinê, bi carekê, qulipiye ser dengên jiyanê. Samîha Xanima ku ji mirinê xelas bûye, niha dibihîse ku lawê wê jî ji mirinê xelas bûye. Bask nîn in ku ew pê bifire. "Yarebî, şukir, şukir ji te re. Heke tu nekujî, nakujî", ew dibêje. Ew nikare ji cîhê xwe bilive û dakeve jêr, lê ji cêrî dixwaze ku ew werin û her gav xeberên lawê wê jê re bibêjin.

Kêf, kêfa Rûşen Xanimê ye, jê re payan nîn e. Di vî umrî de, wê dê ev roj û ev ecêb jî bidîtina! Berî niha bi demeke kurt, ew bi keserkûrî çûbû oda razanê û ketibû nav cîhê xwe yê ku li erdê raxistî bû. Wê dê zarokê mirî bişuşta, kefenê spî lê rapêça, li serê bixwenda û ew bikira nav gorê û axa reş li serê bireşanda. Lê niha zarok hatiye, ji mirinê vegeriyaye û hatiye. Perda reş a mirinê rabûye. Di roja ronî de, jiyana ronî dest pê kiriye.

Rûşen Xanima ku umrê wê li ser 80 salan e, lê hê jî li ser xwe ye û di tevgerên xwe de xurt e, bi hêdîka, bi xawliyeke spî ya şil, xwîna zarok jê paqij dike. Zarok digirî, qîreqîr dike û xwe dilivîne. Bedena wî, li gora zarokekî nûbûyî, mezin e û bejna wî jî dirêjtir e. Rûşen Xanim rûyê zarok paqij dike. Rû hêdî hêdî derdikeve holê. Porê wî reş, birûyên wî geş, rûyê wî gilover e.

Li vî pozî, li vî difnî fekin, Rûşen Xanim bi ken dibêje. Poz, mîna pozê beranan e. Xwedê star bike. Enî, mîna eniya çiyayê

Herekolê ye. Xwedê bihêle, ew tevde li bapîrê xwe rehmetî Bedirxan Beg çûye, tevde kalik e.

> Min dapîra xwe Rûşen Xanim, bi gotina te "stûna malbata Bedirxaniyan", hezar mixabin, nas nekir. Bîr û hafiza meriv heta katekê ye. Piştî wê êdî perda nezaniyê ye. Heta katekê, zaroktiya min tê bîra min. Lê, ne dapîra min. Bi dû bûyina min re ew dîsan vedigere Şamê, nik keçên xwe û li wir jî dere rehmetê. Wê li kêleka mêrê wê Mîr Bedirxan defn dikin... (Jixwe li gora gotinan, gava ez têm dinê, ew bi mêvanî ji Şamê hatiye Stembolê û demek jî ji bo min li Stembolê maye.)
> Tu dizanî, di jîna xerîb de, meriv hene ku çêyiyeke mezin li te kirine û mohra xwe li jîna te xistine. Lê tu wan nas nakî. Tu dikî, nakî, tu nikarî xwe bi wan bigihînî û wan binasî û bi awayekî ji bin çêyiya wan derkevî. Tu bi wan dizanî, li wan difikirî, lê nikarî wan bibînî. Çêyiya wan dibe hesreteke xedar û bi canê te dikeve. Hesret gav bi gav te, bedena te, can û ruhê te, mêjî û dilê te vedigire. Hesreta dîtina dapîra min jî, hesreteke weha bû; wê ez vegirtibûm. Di her gava nû ya jîna min de, wê hesretê riya min li ber min rast dikir. Min li gora wê gav davêt. Bav û diya min, mam û metên min bi dirêjî behsa wê û zimanê wê yê şêrîn dikirin. Li gora wan, tu kes mîna dapîra min xweş û zelal bi zimanê kurdî nepeyiviye. Eger ez paşê bi xurtî li ser zimanê kurdî hûr bûme û min bi kurdî nivîsiye, bawer bike, tê de para hesreta dîtina dapîra min pir e.

Rûşen Xanim zarok baş dişo, xweş dipêçe, serê wî yê birîndar girê dide û wî bi cariya îtalî re dişîne cem diya zarok Samîha Xanimê.

– Fransê, lêwik bibe nik diya wî, bila ew şîr bidiyê. Çavreşê min birçî ye, ew dibêje û tevî Melek Xanimê vedigere salonê.

Emîn Beg û birayê wî yê biçûk Murat li salonê rûniştine. Cixare di destan de, rûyê Emîn Beg dikene. Gava ew Rûşen Xanimê dibîne, radibe ser piyan û ber bi wê dere.

– Yadê, çavê me ronî, lingê te bi xêr hat, lawik jî xelas bû, ew dibêje.

– Emînê min, tu lêwik bibînî, pariyekî şekir e; çavreş, pozberan, enîvekirî ye. Ew eynî bavê te rehmetî Bedirxan Beg e.

– Yadê, helbet lawê min ê li bapîrê xwe were. Celadetê min neviyê Mîr Bedirxan e. Ew ê dewsa bapîrê xwe bigire.

– Te got çi?

Rûşen Xanim, bi heyirî, ji Emîn Beg dipirse. Ji ber ku wê tu carî ev nav nebihîstiye. Navê ku dê hertim di romana Bîra Qederê de derbas bibe, cara yekemîn, hingê bi ziman dibe.

– Celadet, Yadê. Navê neviyê te dê Celadet be. Yanê xurtî û bawerî. Yanê li hember mezinahî û serdestiyê xwe ragirtin... Ji mêj ve bû ku min navê wî danîbû. Ew li welatê xerîbiyê hatiye dinê, lê neviyê Mîr Bedirxan wê bibe tîmsala xurtî û baweriya bapîrê xwe. Tu bi vê bawer be, Yadê.

– Cedad, Cedet... Ceced... Te got çi, navê wî çi bû?

Rûşen Xanim nikare navê lêwik bi lêv ke. Emîn Beg bi destê Rûşen Xanimê digire û wê dibe li ser kursiyekê dide rûniştin. Ew destê xwe dibe riya xwe, pê dilîze û bi ken dibêje,

– Yadê tu pir westiyayî, hinekî bîhna xwe veke û... Celadet, Yadê, Celadet.

– Cela... na, ez nikarim bibêjim, zimanê min lê nagere. Heyra ez ê jê re bibêjim Ceco. Cecoyê min...

FOTOGRAF 2

Bedirxanî; mîrên kurdan, xwedanşan, lê bindest

1 Ev fotograf di wan salan de ku êdî gotinên "Ceco, Cecoyê min" li ser lêvan in, tê kişandin. Sal 1895 e, ji deman payiz e. Li hemû Kadıköyê du fotografkêşên hoste hene; Th. Servanis û R. Xendamian. Yê yekemîn cihû, yê duwemîn ermen e. Mîna her tiştê Kadıköyê, fotografkêşî jî di destê endamên miletên têkel de ye. Fotograf û fotografkêşî, hem li Stembol û Kadıkoyê hem jî di nav hemû tixûbên dewleta Osmanî de, nav û tiştên nû ne. Nav û tiştên nû ku pir bala xelkê, lê bi taybetî jî pir bala giregir, dewlemend û paşayên dewleta Osmanî dikişîne. Berê lewhe û wêne hebûn, niha jî fotograf. Berê wênekêş û resam radihiştin pênûs û firçan û li ser kaxiz û cawan bi rojan, mehan, dixebitîn da ku resimek, wêneyek bînin pê. Lê niha fotografkêş, bi alîkariya makîna xwe, di nav kêliyekê de, xebateke demeke dirêj tîne pê. Meriv, rû, çav, dev, nihêrîn, awir di nav bîskekê de direşin ser kaxizên taybetî yên spî û dibin nemir.

Fotograf nemiriyê direşîne ser kaxizan. Fotograf rehetiyeke nû, bi riyeke pir erzan, dide merivan. Meriv çi jî bike, çiqas hoste be jî, resim tu carî bi eslê xwe namîne. Hin tişt, hin xêz, hin reng yan kêm in, yan jî zêde. Lê fotograf, ev îmkana nû, ne welê ye; her tişt mîna eslê xwe ye. Fotografkêş makîna xwe datîne ser sêpiyê, kêlîkê ji çavika makînê, li kesê ku dixwaze bibe nemir dinihêre, dibêje "dîqet" û pê li qumçika makînê dike. Ew kurte-dema ku fotografkêş pê li qumçikê dike, êdî kurte-demek e

ku tu carî ji bîr nabe; fotograf hatiye kişandin, kopiyek ji eslê wê hatiye pê û ya girîng, ew kopiye dê her û her bimîne. Ne wext û herikîna wextê ne jî mêjî û kalbûna mêjî êdî dikare wê kurte-demê bide jibîrkirin. Kopiya ku eynî mîna eslê xwe ye, dê li ser dîwaran, di nav bêrîkan de, di nav kaxiz, defter û kitêban de bên parastin. Meriv dê car bi car, dem bi dem, li wan binihêre û kesê li ser fotografê bi bîr bîne. Ew kes êdî ne winda ye, bêdeng û bêziman be jî, ew her û her heye.

"Fotograf û fotografkêşî şoreşeke yekta ye." R. Xendamian, fotografkêşê yekta yê Kadıköyê li ser qerteke danasînê ya hunera xwe, bi fransizî, weha nivîsiye: Şoreş... Ew, ne neheq e. Hem wî hem jî fotografkêşê din ê Kadıköyê Servanis xwendina xwe li Fransê, Parîsê kirine. Haya herduyan jî ji guherînên cîhanê, dîtinên nû yên civakî û pêşketinên teknîkî heye. Herdu jî baş pê dizanin ku dinya ketiye nav heyameke nû ya guherînên welê ku her yek bi serê xwe şoreşeke mezin e. R. Xendamian li Parîsê hîn bûye ku fotograf di warê pêşketina merivahî û teknîkê de şoreşeke mezin e. Şoreşeke mezin li hember wext, herikîna wextê, dewr û tarîxê... Fotografek ku îro tê kişandin, sibê û dusibê jî dimîne. Fotografek ku li vir tê kişandin, li her aliyê dinê nemiriya xwe diparêze û didomîne. Ji ber vê yekê ye ku R. Xendamian, li ser eynî qerta danasînê, weha didomîne; "ev şoreşa mezin a pêşketinê ku sala 1839-an keşif bû, niha hatiye nik me Stembol û Kadıköyê. Eger hûn dixwazin, ev şoreşa li ser zimanan alîkarî li we û nasên we bike, kerem bikin... fotograf wê we bike nemir..."

Stembolî, bi taybetî jî Kadıköy hê nû bîr bi nemiriyê û hunera fotografê dibin. Ew yek bi yek, rêz bi rêz derin atolyên Servanis û R. Xendamian û xwe dikin nemir. Ew fotografên xwe nîşanî hev didin, wan mîna kitêbeke muqedes di paşilên xwe de vedişêrin û bi serbilindî, car bi car, li kopiya xwe dinihêrin. Şoreşa nû xwe gîhandiye Stembolê û pêl bi pêl fireh dibe. Meriv bi hêsanî dikare bibêje ku eger di destpêka salên 1890-an de, li hemû Kadıköyê, du kesên ku şixulê wan herî baş be hene, ew jî Thedo-

re Servanis û Rafael Xendamian in. Belê, pêşnavê wan Thedore û Rafael e. Lê belê tu kes wan bi pêşnavê wan bi nav nake, ew monsiuer Servanis û Xendamian in. Atolyên wan hertim tijî ne. Paşa, zabit, dewlemend, nivîskar, rojnamevan, beg, jin, zarok, pîr û kal hemû tên, xwe didin hev, li hember makîna reş a ecêb rûdinin, li qulika biçûk dinihêrin û tiştekî pir nû û xweş li jiyana xwe zêde dikin; fotograf.

Monsiuer Servanis û Xendamian hem hevalên hev in hem jî raqîbên hev. Bala wan pir li ser xweşî, zelalî û dewlemendiya fotografan e. Kî di van waran de bi ser keve, ew, bêşik dibe hoste û yekta. Li gora gotinan û xweşî û mezinahiya atolyê û neqşên qertên fotografan, meriv dikare bibêje ku R. Xendamian hîn bêtir biserketî ye. Li pişta qertên herduyan jî hin neqş û wêne hene. Li pişta qertên Servanis, stêrkeke şeşkoşe heye. Stêrk li herî jor e. Tîrêjên stêrkê bi xetên xuya ber bi jêr dibin. Tîrêjên ku ji zikê stêrkê derdikevin, her ku dere ji hev vediqetin û navbera wan fireh dibe. Ji nav tîrêjan nivîsarek bi tîpên erebî derdikeve. Li vir bi tîpên erebî weha hatiye nivîsîn; Fotografhane-i T. Servanis – Kadıköy. Di binê vê nivîsarê de, îcar ji jêr ber bi jor, bi tîpên latînî weha hatiye nivîsîn; Th. Servanis, Photografhe – Cadi-Keuy. Herçî qertên Xendamian in, li pişta wan, berî her tiştî, du zarok dixuyin. Zarok li hember hev in. Umrê wan, mîna Celadet, lawê Emîn Beg, ne zêdeyî du salan e. Yek ji wan tazî, yê din bi pêşgîrekî xwe dipêçe. Li ber zarokê tazî makîneyeke fotografê, li ser sêpiyê, heye. Destên zarok li ser sêpiyê, çavê wî li ser qulika makînê ye. Ew haziriya kişandina fotografê dike. Li hember wî jî, zarokê din, bi rûkenî, li kamerayê dinihêre. Kêfa vî zarokê pir li cîh e, wî pişta xwe daye stûneke xweş a kevnar, bi destan herdu milên pêşgîrê girtiye, piyên xwe di ser hev re birine û bi ken li hember dinihêre; sûretê wî dê, niha, li ser kaxizan derkeve, ew ê, di nav kêlîkê de bibe nemir. Ev herdu zarok, bi hev re, wê kurte-dema ku şoreşa nû dike nemir, dijîn. Doraliyê zarokan jî bi pel û gulan rapêçayî ye. Li ser serê zarokan jî, bi tîpên erebî yên

mezin, Fotografhane-i R. Xendamian – Kadıköy hatiye nivîsîn. Îcar li ber lingên zarokan jî, bi tîpên mezin û neqişkirî yên latînî û bi fransizî Photographie, Raphael Khendamian – Cadi–Keuy hatiye nivîsîn.

Ji van neqş û nivîsaran jî baş dixuye ku R. Xendamian hîn bêtir hosteyê karê xwe ye. Motîvên zarokan kêf û rehetiyekê didin, nivîsar xweş xuya ne û neqişkirî ne, doralî ji bîr nebûye û lihevhatî ye. Di ser de jî R. Xendamian fotografên ku reş û spî ne, bi pênûsine taybetî xweş reng dike. Pêwendiya R. Xendamian û romana Bîra Qederê li vir dest pê dike, R. Xendamian hem fotografkêşekî hoste ye, hem jî ew dostê malbata Bedirxaniyan e. Ji mêj ve ye ku pêwendiya Bedirxaniyan bi ermenan re xurt e. Bedirxanî ermanan mîna cîran û pismamên xwe dibînin. Li hember ermenan, ew xwediyê germahiyeke boş in. Kadıköy, warê miletên têkel, niha bûye stariya kurdan û ermenan jî. Li wir bi qasî kurdan, ermen jî hene.

Mala R. Xendamian nêzîkê qonaxa mamê Celadet, Alî Şamîl Paşa ye. Ew qata yekemîn wekî atolye û herdu qatên din ên xênî jî wekî mal bi kar tîne. Fotografa duwemîn a romana Bîra Qederê ji destê R. Xendamian derketiye. Wî ew kişandiye. Fikra kişandina vê fotografê jî, dîsan, ya wî ye. Mîr Bedirxan ku binemala Bedirxaniyan navê xwe jê digirin, hem li Stembolê, hem jî di nav tixûbên fireh ên dewleta Osmanî de navdar e. Ew bi gotin, jiyan, kirin, serpêhatî û serhildana xwe tê nasîn. Li ser wî çîrok hatine gotin, stran çêbûne, pesn lêbûne. Difn û bîfila wî, enî û porê wî, dev û lêvên wî, poz û çengê wî, çav û birûyên wî, bal û bejna wî bûne rêzikên gewher ên dengbêj û çîrokbêjan. Lê belê, ne resim û wêneyek ne jî lewhe û bergehek jê maye. Kesî bîr nebiriye û lewheyeke wî çênekiriye. Kesî di salên 1850 û 60-an de fotografeke wî nekişandiye. Ew bi tenê bûye lehengekî navdar ê serpêhatî û destanan... Ji herkesî bêtir jî R. Xendamian, ji ber karê xwe, bîr bi vê kêmaniyê dibe û li ber vê kêmaniyê dikeve. Loma, ew car bi car ji law û keçên Mîr Bedirxan re, behsa vê kêmaniyê dike.

Loma jî law û keçên Mîr Bedirxan, hema çi bigire her roj, derin nik cîranê xwe R. Xendamian û kêmaniya ku li pey bavê wan maye, bi sûretên xwe dadigirin. Li pey bavê wan tu sûret û wêne neman, lê qet nebe, bila ew bê sûret û wêne nerin...

Fotografa duwemîn a romana Bîra Qederê yek ji wan fotografan e ku hingê, li ba R. Xendamian tê kişandin. Li ser fotografê du kes, jinek û mêrek, hene; Emîn Alî Bedirxan û jina wî Samîha Xanim. Yanê bav û diya Celadet. Di wê kurte-dema ku ev fotograf tê kişandin de, gelo Emîn Beg û Samîha Xanim çi difikirin, çi dijîn, çi hîs dikin, çi dibêjin? Bêguman e ku tu gotin, bi çi awayî dibe bila bibe, nikare wê kurte-demê ji nû ve vejîne. Rû û sûret, bi alîkariya kamera fotografê, ji nû ve, eynî mîna eslê xwe, tê vejandin. Lê ne hîs û jiyana ku mîna lehiyekê diherike... Digel vê hindê, fotografên bêzar û bêziman dikarin alîkarî li taswîr û salixdana hîs û jiyanê jî bikin. Di fotografa Emîn Beg û Samîha Xanimê de tiştê ku berî her tiştî bala merivan dikişîne, çavên wan in; du cot çavên reş, mezin, germ ku dikenin. Meriv li ser rûyê wan ken nabîne, rû bi qasî xwe cîddî ne. Lê çavên germ dikenin. Keneke kîbar, ne boq, lê bi pîvan. Meriv dikare ji vê kenê derxe ku hem Emîn Beg hem ji jina wî ziravbihîstiyar û diltenik in. Ew bi xwe bawer û têgihîştî ne. Ew ji jiyanê hez dikin, lê bîr bi zehmetiyên wê jî dibin.

Di wênê de tiştê duwemîn ku hema bala merivan dikişîne, destên wan in. Herduyan jî destên xwe, bi awayekî serbest, danîne ser çogên xwe. Ew li ser du kursiyan rûniştine. Pişta wan rast, sîng û rûyê wan li pêş e. Emîn Beg serê xwe jî hinekî hildaye. Di destê rastê yê Emîn Beg de tomareke kaxiz heye. Wî herdu destên xwe jî kirine mîna gurmist û ew anîne ser herdu çogên xwe. Samîha Xanimê jî kêm, zêde, bi vî awayî, destên xwe danîne ser çogên xwe. Di destên Samîha Xanimê de cotek lepikên reş hene û di destê wê yê çepê de jî desmaleke spî heye. Meriv dikare bibeje ku tiştê spî yê hemû fotografê, ev destmal e. Ji awayê rûniştin û danîna destan, meriv têdigihê ku Emîn Beg û jina wî

hînî fotografkêşanê nebûne. Bi gotina R. Xendamian, ew hê baş nebûne fotojenîk. Lê belê, ev awayê rûniştinê, di eynî wextê de nîşan dide ku hurmet û giramî, rêz û rêzdarî, ji bo wan, qayideyên esasî yên jiyanê ne. Li Stembolê, di nav Osmanî û girgirên wan de adet e, gava meriv bixwaze bi hurmet û rêzdarî rûne û vê yekê nîşan bide, hingê meriv destên xwe, bi ûsil, datîne ser çogên xwe û rûdine. Ji wênê jî baş dixuye, Emîn Begê ku bi terbiya rêz û rêzdarî, qedr û qîmet rabûye, bi hurmet jî dijî.

Cil û bergên herduyan jî reş in. Li ser Emîn Beg taximeke kincên reş hene. Qumçikên çakêtê wî heta berstû girtî ne. Li berstû qirawatek dixuye. Kincên ku Emîn Beg li xwe kirine, ne ew kinc in ku herkes dikare li xwe bike. Ew buha ne û bi tenê kesên ku hal û wextên wan di cîh de ne û pêwendiya wan û saraya Osmanî heye dikarin li xwe bikin. Çaxa R. Xendamian, fotografkêşê bîrbir, dibêje, "Ji kincan meriv dikare derxe ka ew kes ji kîjan aliyê civata rengîn a Osmanî ye", ew ne neheq e. Kinc, nîşana çîn, kom û gelên civata Osmanî ne. Li ser serê Emîn Beg jî kumekî ku Osmanî jê re dibêjin fes heye. Ev fes jî baş li kincan hatiye û hîn xweştir nîşan dide ka Emîn Beg kî ye.

Cil û bergên Samîha Xanimê jî, ji serî heta lingan, reş in. Fîstanekî dirêj û reş ku heta lingan tê, lê ye. Jorê fîstan bi sermaleke dirêj ê reş ve hatiye pêçandin. Sermal ji serî heta ber çogan tê û hemû stû, mil û pî vedigire. Di binê sermalê de jî, dîsan reş, dolbendek heye ku ser û porê Samîha Xanimê baş radipêçe. Lepikên reş, reşahiya wênê temam dike. Meriv ji reşahî û pêçandinê fahm dike ku Samîha Xanim dilpak, hezkira mala xwe, sade û dîndar e. Di nav sermal û dolbendê re, tayeke porê wê yan jî ya cênikê wê naxuyê. Bi tenê rûyê wê yê gulover, mîna heyveronê, dibiriqe. Çavên wê yên reş, di bin bijangan re, li hember dinihêrin û bi germahiyeke xweş dikenin. Gumên wê mezin û gulover in. Pozê wê, li gora pozê Bedirxaniyan, pahntir e. Devê wê fireh, lê lêv girtî ne. Lêv, ne lêvên kesê ku pir dipeyive, ne. Samîha Xanim li kêleka mêrê xwe, bi giramî, bêdeng, çavbiken, porgirtî, rûve-

kirî, rûniştiye. Samîha Xanim, alîgir û piştgira Emîn Beg, dilsoza mala Bedirxaniyan, bi aramî û bawerî, li kamerayê dinihêre.

Herçî Emîn Beg e, ew jî, bi bawerî û çavkenî, li kamerayê dinihêre. Lê di nêrîna wî de tiştekî zêde heye; maxrûrî û asalet. Wî serê xwe hinekî ber bi jor kiriye û li makîna fotografê dinihêre. Ew ji jor ve li hember xwe dinihêre. Wî di wê kurte-dema kişandina fotografê de jî ji bîr nekiriye ku ew, lawê Mîr Bedirxan e, lawê serokê mîrekiya Cizîra Botan û rêberê welatê Kurdistanê ye. Ji nêrîna wî dixuye ku ew xwediyê berpirsiyariyên mezin û zehmet e. Nerîna wî, nerîna serok û rêberan e. Kaxizên di destan de jî nîşan dide ku ew merivê heyama xwe ye, ne paşdemayî, lê pêşketî ye. Ew bîr bi guherînên mezin ên civakî yên cîhanê dibe û bala wî li ser şoreşên teknîkî ye. Heye ku loma ew di vê fotografa duwemîn a romana Bîra Qederê de dibe pardarê şoreşa ku R. Xendamian di qertên xwe de behs dike. Di welatê Osmaniyan de zû bi zû meriv rastî kesan nayê ku di destê wan de kaxiz hene. Bi tenê komeke biçûk a civata Osmanî bi karên kaxiz, xwendin û nivîsînê rabûne. Ronakbîrî, lebatên çandî, edebî, hunerî û felsefî, bi tenê karê komekê ye. Komek ku di bin tesîra pêşketinên Awrûpayê de maye û bi Awrûpê re di nav pêwendiyeke xurt de ye. Kaxizên ku di destê Emîn Begê de ne, nîşan didin ku Emîn Beg jî mensûbê koma bijarte ye.

Rûyê Emîn Beg, li gora rûyê Samîha Xanimê, dirêjtir e. Poz, pozê Mîr Bedirxan e; pozê beranan. Riya wî ku êdî spî dike, xweşiyeke taybetî dide rûyê wî. Rî hem asaleta nerînê temam dike hem jî germahiya çavan dineqişîne. Lê belê, di fotografê de cîhê hema bala merivan dikişîne, çav in. Meriv pêşî li çavan dinihêre, paşê çavên xwe li ser rû, beden û kincan digerîne û bi dû re dîsan li çavan vedigere. Çav, navenda fotografê ne. Çav mezin û vekirî ne; ew mîna du libên stûr ên tiriya reş dibiriqin. Li ser çavan ken û germahiyeke însanî dixuye. Lê ne bi tenê evçend, tevî ken û germahiyê, êş û nermahiyeke şexsî jî dixuye. Çav dipeyivin û saloxdana hîs û jiyana Emîn Beg dikin. Ew êş û

nermahiya şexsî ku li ser çavan dixuyin, du stûnên jiyana Emîn Beg in. Wî çavên xwe bi wan vekirine û bi wan dijî. Wî çavên xwe li welatekî xerîb, li sirgûnê vekirin. Sal, 1851 bû. Sal, xedar û dijwar bû; bi ser têkçûna serhildana bavê wî Mîr Bedirxan re, bi tenê pênc sal derbas bûbûn. Bi dû têkçûna serhildanê re, bavê wî, dê û dêmariyên wî, mam û metên wî, kek û etên wî, hemû kesên malbata Mîr Bedirxan, zaro û zêç, kal û pîr, ji welatê Cizîra Botanê hatin bidûrxistin. Rûyê wan ber bi welatên nenas û xerîb hate zivirîn. Mîr Bedirxanê ku ji bo heyîn û hebûna welatê xwe serî hildabû ji welatê xwe bûbû. Ew pêşî li Stembolê hatin bicîhkirin, paşê jî Mîr Bedirxan sirgûnî girava Girîtê bû, dan û standina wî bi hemû dinê re hate birîn û vegera wî ya welêt hate qedexekirin. Emîn Beg, lawê mîrê kurdan, çavên xwe, rojek ji rojên zivistana Zerya Spî ya bi ba û baran, ji welatê bav û kalan pir bi dûr, li girava tenê û bêkes, li dinyayê vekir. Xerîbiya welatên nenas û hesreta welatê bav û kalan ji roja bûyinê ve mohra xwe li jiyana wî xist. Jiyana wî bi xerîbî û hesretê hate rapêçandin. Ew êş û nermahiya ku li ser çavan in, meriv dikare bibêje, xerîbî û hesret e.

2 Cecoyê min, kurê min, ew êş û nermahiya ku ji çavên bavê te dixuye, meriv dikare bibêje, xerîbî û hesret e. Tu hê pê nizanî, derdên xerîbî û hesretê dijwar in.

Samîha Xanim lawên xwe Celadet û Kamuran li kêleka xwe dane rûniştin, li pêlên Zerya Marmarayê dinihêre û ji zarokan re behsa bav û kalikê wan dike. Ji salan 1898 e. Celadet ketiye sala pêncan, birayê wî yê biçûk ku du sal bi dû wî re hatiye dinê, nû ketiye sala sisiyan. Birayekî wan ê din jî nû hatiye dinê; Hîkmet.

Dinya havîn e, esman çîk sayî ye. Hawirdor di nav hêşînahiyeke gelek xweş de ye. Zerya Marmarayê, hêdîka, xwe dilivîne û pêlên xwe yên spî û qels, bi zehmetî, radigihîne qiraxa avê. Li ser ava ku mîna cawekî hewreşîmî dixuye, keştî, bot û

qayik giran giran digerin. Ji dûr ve keştiyeke dûkelî yê mezin dûyê xwe berdide û avê diqelişîne, dere. Samîha Xanim, tevî lawên xwe û du cêriyan, li Büyükada, girava havîngeha malbata Bedirxaniyan e.

Li Büyükadayê, li milê bakur, li ber quntara Girê Îsa ku tirk jê re dibêjin İsa Tepesi, du xaniyên havîngeh ên malbata Bedirxaniyan hene. Herdu xanî jî mîna hev, lê ji hevûdu hinekî dûr in. Ew bi du qatan, ji ber û keviran lêbûne û bi siwaxeke spî hatine siwaxkirin. Xanî fireh in, lê bêguman ew têrî malbata mezin a Bedirxaniyan nakin. Loma jî endamên malbatê bi dorê tên Büyükadayê. Büyükada, xweştirîn havîngeha Stembolê, lûlûya Marmarayê, warê duwemîn ê Bedirxaniyan e. Ew bi hêsanî xwe radigihînin Büyükadayê. Jixwe Kadıköy û Büyükada ne zêde dûrî hev in. Ji lengergeha Kadıköyê, bi keştiyê, di bîskekê de, meriv xwe digihîne Büyükadayê. Loma jî endamên malbatê kengê bixwazin, hingê derin Büyükadayê.

Büyükada û çend giravên din, mîna yaqûdên zumrudî, gewriya Zerya Marmarayê dineqişînin. Giravên Kinali, Burgaz, Kaşik, Heybeli, Büyükada, Pide, Tavşan û Sedefê bûne cîhê starê, cîhê bîhnvedan û îstirehetê. Stembola kevnare, Konstantinopolisa cîhana xiristiyanan, navenda tevgera ronakbîrî û çandî ya dewleta Osmanî êdî roj bi roj teng dibe. Ji her aliyên tixûbên bêser û bêber ên Osmanî, ji her milet û gelî, bi hezaran kes tên li Stembolê bi cîh dibin. Stembol, payitextê dewleta Osmanî êdî ji kargerînendeyên dewletê re biçûk tê. Ew xwe davêjin cîhê havingeh û seyrangehan. Girav, bi av, plaj, çem, rûbar, ger, hêşinahî, daristan, bax, baxçe, rez, gelî û girên xwe, bûne koşeyekî bihuştê. Bi taybetî jî Büyükada. Büyükada, girava kulîlkan e. Sal donzdeh meh girav bi rengên gul, binevş, şîlan, nîlufer, sosin, nêrgiz, qerenfîl, berbiro, gulale û beybûnê dixemile. Rengek winda dibe, yekî nû tê dewsê. Büyükada, girava rengên dewlemend e. Girav hemû zerya direngîne. Rûniştevanên giravê yên esasî, hema çi bigire hemû, masîvan in. Ew adet û ûsilên hezar salan,

ji dem û dewrên Bîzansê, didomînin. Ew ji zeryayê werdigirin û dîsan didinê. Büyükada, girava tarîxî, bi qasî ku havîngeh e, ew parêzgeh e jî. Ew, di nav zerya de, adet û ûsilên kevnare, li hember wext, dewr û dewranê diparêze.

Xaniyê ku Samîha Xanim û lawên wê tê de ne, li kêleka avê, li ser kaşekî, ava bûye. Wî pişta xwe daye girê İsa. Li dora xênî darên spîndar û bî hene. Şaneşîneke fireh û dirêj a xênî heye. Dora şaneşînê bi caxên textîn rapêçaye û ji şaneşînê hemû Marmara bi rengê xwe yê yaqûdî li ber lingan e. Li herdu koşeyên şaneşînê du mêwên stûr ên tirî hene. Qurnên mêwan fireh in û ta û çiqilên wan, mîna banekê, hemû jorê şaneşînê dagirtiye. Mêw mîna holikekê, bi dûzan, taldeyekê dide şaneşînê. Çaxa dinya germ û xweş e, şêniyên xênî li wir rûdinin. Samîha Xanim û lawên wê Celadet û Kamuran li wir, li ser cilên raxistî rûniştine. Dinya çikronî ye, danê sibê hêdî hêdî diqulipe ser danê êvarê. Celadet ku pir zû mezin dibe, niha ketiye heyama xwe ya pirsiyaran. Ew her tiştî meraq dike, her tiştî dipirse, dixwaze her tiştî bizanibe.

– Yadê, ka kekê min Sureya li ku ye? Yadê, em çima narin Cizîra Bota? Yadê, em çima li malê bi tirkî napeyivin? Yadê, çima çavên bavê min carina kelgirî dibin? Yadê, ez dikarim hilkişim ser vê darê û xwe jê bavêjim? Yadê, leglega ku bebîş Hîkmet anî, çû ku? Yadê, çima mam û metên min evçend pir in?..

Samîha Xanim jî hêdî hêdî bersîva wî dide. Ne bi tenê Samîha Xanim, lê Emîn Beg, cariyên malê, ap û met jî bersîva pirsên Celadet didin. Pirs pir in, têra hemûyan dikin.

> Bêguman pirsên min nayên bîra min. Piştî demek pir dirêj, bi alîkariya feylesofên alınanî, ez hîn bûm ku pirs û pirsiyar lehiya ava zelal e. Lehî hertim, pihêt, diherike. Ava zelal û paqij dibiriqe. Lê gava lehî bi kar were, ew hêja ye. Gava meriv bikaribe ji quwet, zelalî û paqijiya wê destketî bibe, ew giranbiha ye. Pirs jî, gava bersîv hebin, hêja ne. Gava bersîv hebe, pirs dibin lehiya ava zelal û

diherike. Ez bawer im ku Yadê bîr bi vê yekê dibir. Me jê çi jî bipirsiya, wê bi aramî û pir sakîn bersîva me dida. Wê dixwest pirsên me biqulibîne ser lehiya ava zelal.
Ew havîna ku tu niha behs dikî, mîna xewnekê tê bîra min. Sûretên wê havînê li pey mij û dûmana umrekî dirêj û westiyayî ne. Lê paşê Yadê ji min re, bi kitekit, gotibû; wê havînê ez derketibûm ser wê çardaxa ku tu behs dikî. Min bi gotina xwe kiribû, ji ser çardaxê re jî min li Marmarayê nihêrîbû. Ez çiqas li wir mabûm, min li wir çi kiribû? Kes bi vê yekê nizane. Lê çaxa ez daketime jêr, ew bûyera ku hemû malê her qal dikir, diqewime; ez ji jêr heta jor diqelişim. Belê, te çewt nebihîst, ez diqelişim. Gava ez xwe bera jêr didim. Ez rastî koşeyekî tûj ê stûna hesinî yê ku qurnê mêwê pê hatiye girêdan, têm û ji nav şeqan heta ber sîngê diqelişim. Çîroka vê bûyerê ku şopên wê her û her li ser bedena min diyar bûn, dirêj e. Ez serê te neêşînim, lê, li gora gotina Yadê, ez ji mirinê xelas dibim, çend car, çend gavan ber bi aliyê mirinê jî davêjim, lê bi dû re jê vedigerim. Vegera min kêfa bav û diya min û hemû malbatê tîne. Lê bîrînên min jî zêde dibin; li birînên serê min ku ji roja hatina dinê yadîgarî min bûne, birînên berzik, zik û bersîngê jî zêde dibin. Wê havînê, li Büyükadayê, ez ji bêgaviyê dibim hevalê cîh û nivînan. Pirsiyarên min jî hingê hîn pirtir dibin. Pirs li ser pirs, gotin li ser gotin... Yadêya reben... kî dizane wê ji ber pirsên min ên lûç û pûç çi kişandiye û çiqas hewl daye ku wan biqulibîne ser lehiyeke xurt, zelal û delal...

Celadet û Kamuran li herdu aliyên Samîha Xanimê rûniştine. Kamuran li ber çogên wê ye. Siniyeke fireh a zebeşekî sor ê hûrkirî li ber wan e. Samîha Xanim perçeyekî biçûk dide Kamuran, destê xwe yê din di ser porê wî re dibe û gotina xwe didomîne,

– Cecoyê min, çavreşê min, ez li ber destê dapîra te û li mala Bedirxanpaşazadeyan mezin bûm. Ez wan baş nas dikim. Evîn û hesreta welatê Kurdistanê bûye kozeke agir û ketiye dilê wan. Nemaze evîn û hesreta bavê we... Ew lawê mîrê mezin Bedirxan Beg e û îro jî mezinê malbata mezin a Bedirxan Beg e. Jê gelek

tişt tên xwestin.

Celadet li diya xwe guhdarî dike û zebeşê ber xwe dixwe. Ew perçeyekî biçûk dixe devê xwe û perçeyekî biçûk jî, piştî ku dendikên wî jê derdixe, dide destê Kamuran. Kamuran perçe dixe nav lepê xwe û ew jî wî dide diya xwe. Samîha Xanim û Celadet dikenin. Samîha Xanim serê Kamuran maç dike û jê re dibêje;

– Eferim kurê min, ji niha ve tu nîşan didî ku tu neviyê Mîr Bedirxan î. Comerdiya wî bi te re heye. Eferim, Kamoyê min, eferim.

Celadet hinekî din nezîkî diya xwe dibe û dîsan jê dipirse,

– Yadê, çavên min jî, mîna yên Bavo, reş in? Çima rîha wî heye û rîha min tune? Yadê, tu dê ji min re ji kincên bavo bidî dirûn? Kincên Bavo pir spehî ne...

3 Bavo, kincên te pir spehî ne, gava ez mezin bim, ez ê jî kincên te li xwe bikim.

Emîn Beg bi gotina lawê xwe Celadet dikene. Wî herçar lawên xwe, Sureya, Celadet, Kamuran û Hîkmet dane dora xwe û bi hev re li çayxana seyrangeha Modayê rûniştine. Emîn Beg û lawên wî Sureya û Celadet çay, Kamuran û Hîkmet jî leymonata vedixwin. Murebiya zarokan Madam Stella jî bi wan re ye. Sal ber bi 1900–an dere. Ji 1900'î re hê şeş meh hene. Wext mîna avê diherike. Celadet hinekî din mezin bûye. Kamuran bi tirkiyeke wisan xweş dipeyive ku mezin diheyirin. Hîkmet, bi lez û bez, li dora xwe çerx dibe. Herçî Sureya ye, simbêlên wî êdî reş dikin.

Seyrangeha Modayê ku Osmanî jê re dibêjin Moda Çayırı, cîhekî ji cîhên herî xweş ên Stembolê ye. Moda Çayiri ji qonaxa Bedrî Paşa hinekî bi dûr, li ser çend giran, bi dar û ber tijî, li peravên Marmarayê, bihuşteke bira ye. Ew di navbera Moda Biçûk û Moda Mezin de, lê bêtir nêzîkî Moda Mezin e. Moda Çayiri, nemaza bihar û havînan, dibe seyrangeheke yekta. Hingê her der di nav hêşînahiyeke bêpayan de ye. Gul û kulîlk bi

rengên xwe yên cuda hemû hawirdor dixemilînin. Ji ser daran dengê bilbil û şalûran tê. Dengê ava coyên biçûk li dengên çûk û teyran zêde dibe. Li seyrangehê çend çayxanên havînê hene ku hertim tijî ne. Ji çayxanan, Marmara mîna xweştirîn bergeha cîhanê dixuye. Rojên înîyan, çaxa ku xelk ji kar û şixulên xwe vala ne, ew pêl bi pêl tên seyrangehê. Hingê, rojên înîyan, ne îşê aqil e ku meriv were seyrangehê. Lê niha, di vê roja sêşemiyê de, seyrangeh û çayxane hinekî sakîntir e. Emîn Beg merivekî bi qayide ye. Wî gelek tişt ji xwe re kirine adet. Ew divê her roj îşligekî paqij li xwe ke, her roj serê sibê bi meqes û mûçikê simbêl û riya xwe çêke, bi xwarina firavînê re li rojnama Icmal-î Ahval binihêre, ken û henekên ku dibîse yan jî tên bîrê di defterekê de binivîse, heftê carekê hin bira û xwişkên xwe yên ku li Stembolê dijîn ziyaret bike, heftê carekê êvarekê yan jî danekî lawên xwe li dora xwe bicivîne û bi wan re bipeyive, ders û şîretan bide wan û bi wan re bi kurdî bipeyive...

Hatina seyrangeha Modayê jî yek ji adetan e. Gava dinya bihar yan jî havîn be, her çaxa ku ew tê serdana birayê xwe Bedrî Paşa, ew tê seyrangehê jî û du qedeh çay vedixwe. Îcar wî zarok û murebiya wan Madam Stella jî bi xwe re birin mala Bedrî Paşa, cîhê ku Celadet lê hate dinê. Sebebê çûyinê jî tiştekî pir pîroz bû; birayê wan Mîthed, li Misirê, rojnama kurdan a yekemîn Kurdistan derxistibû. Gerçî wan bihîstibûn ku rojnamê dest bi weşanê kiribû, lê wan rojname bi xwe nedîtibû. Rojekê berê, serê sibê, dostekî wan ê malbatê ku bi keştiyê ji Kahîrê, Misirê hatibû, du nusxeyên rojnamê bi xwe re anîbûn û ew dabûn Emîn Begê. Dostê Emîn Beg hatibû Kızıltoprakê, mala wan. Gava Emîn Beg rojname dîtibû, ji kêfan, hêstir ketibûn çavên wî. Mîna ku ji wan re zarokekî nû çêbe, eynî welê, Emîn Beg, bêpayan, kêf kiribû. Wî dostê xwe, ji kêfan, hembêz kiribû, ew dabû rûniştin û di bîskekê de hemû rojname xwendibû. Ne bi tenê carek jî, du caran. Ew bûbûn xwediyê rojnameyekê. Kurd êdî ketibûn defteran. Navê Kurdistanê bûbû navê rojnama birayê wî. Navê welatê kurdan

wê êdî li ser lêvan bûya. Xewn û xwestekên wan êdî bi cîh dihatin... Wî ji dostê xwe hal û hewalê birayê xwe yê biçûk Mîthed pirsîbû, li ser rewşa rojnamê jê agahî wergirtibû. Wan bi hev re firavîn jî xwaribûn û piştî firavînê wî bang zarokên xwe kiribûn û ew bi hev re, bi faytonekê, ber bi qonaxa Bedrî Paşa, ketibûn rê.

Wê şevê ew li qonaxê mabûn. Birayên Emîn Beg ên din Alî Şamîl Paşa, Evdirrehman, Zubeyir, Husên, Mistefa, Kamil, Mirat û biraziyê wan, lawê Necîb Paşa Avdurrezak jî hatibûn qonaxê. Ew bi birayê xwe Mîthed serbilind bûn. Belê, Mîthed li ser şopa bavê wan Mîr Bedirxan bû. Wî kurd kiribûn xwediyê rojnameyeke kurdî û mîllî. Li ser rûpela yekemîn a rojnamê bi tîpên reş û mezin Kurdistan hatibû nivîsîn. Di binî de jî bi tarîxa Hicrî 1315 hatibû nivîsîn. Li kêlekê jî weha hatibû nivîsîn; "Heçî kaxizek vê rêke, divê rêket Misirê ser navê xweyiyê vê cerîdeyê lawê Bedirxan Paşa Mîqdad Mîthed Begê... Her car du hezar cerîdeya bêpere ez ê rêkim Kurdistanê, de bidin xelkê... pazde roja carekê têt nivîsandin." Rojnameyê bi "Bîsmîllahîrrehmanîrrehîm" dest bi nivîsê dikir. Di rûpela dawîn de jî, "Li Misrê Metbeet El-Hîlal de tebî' bîye" hatibû nivîsîn. Wan wê şevê heta destê sibê rojnama xwe û serfiraziya birayê xwe Mîthed pîroz kiribûn û li ser halê malbatê û kurdan peyivîbûn. Dotira rojê, piştî nîvroyê jî, Emîn Beg zarok wergirtibûn û hatibû seyrangeha Modayê.

Bask tune bûn ku Emîn Beg bi wan bifire. Li hemû dinê, merivê herî mesûd û bextiyar niha ew e. Ew seriyekî şekir dixe nav qedeha çayê, bi kevçî çayê tev dide, jê qultekê vedixwe û li zarokên xwe dinihêre. Ev çaya diduyan e ku ew vedixwe. Madam Stella alîkarî li Hîkmet dike da ku ew lîmonata xwe vexwe. Rojnama Kurdistan'ê, vekirî, li kêleka qedeha Emîn Begê, li ser masê ye. Danê êvara Modayê bi aramî dadikeve. Aso bi sorahiyeke vekirî hatiye neqişandin. Tîrêjên jar ên tavê li ser ava paqij a Marmarayê dikenin. Ji doraliyên coyên avê, niha, dengê beqan jî tê. Sureya ku bi qelafetê xwe êdî ne kêmî bavê xwe ye, li kêleka bavê xwe rûniştî, li dara mezin û qehîm a çinarê ku ew li binî rûniştine, dinihêre. Dara bedew hêlîna çivîkan e, jê dengên

ewçend xweş tên ku meriv pê mest dibe. Celadet, bi heyranî, li çavên bavê xwe dinihêre. Kamuran, pantolên kin li lingan, li ser kursiyê rûniştî, lingên xwe ba dide û lîmonata xwe vedixwe. Emîn Beg çend qultên din ji çaya xwe vedixwe û rojnama li ber xwe dixe destê xwe. Ew carek li rojnamê, carek jî li Celadet û Sureya dinihêre û bi ken dibêje;

– Sureya û Celadetê min, lê guhdarî bikin, binihêrin ka mamê we yê zîrek, bi zimanê xwe yê spehî, çi dinivîse.

Bi gotina xwe jî, ew rûpela duwemîn vedike û bi dengê xwe yê gur dest bi xwendinê dike; "Gelî mîr û axano! Gunehê zarûyên we wê stûyê we be. Ûn jî zarûyên xwe rêkin bidin xwendin. Dewlemendên we bila gunda de mekteba çêkin, riya Xwedê de xêra bikin... Gelî mîr û axa û Kurmancno! Dinya zane kurd camêr in. Lê vê zemanê ha de şer bi camêrî tenê nabitin... Hekî we guh neda van nesîhetên min, hekî dîsa hûn şivanî û rêncberiyê tenê bikin, zemanek hindik de Kurdistan wê yekcar xira be..."

Xwendin bi vî terhî demekê dewam dike. Ji xwendin û dengê Emîn Begê fahm dibe ku ew kêfxweş e. Serê Sureya ber bi jor, ber bi dara çinarê ye. Celadet, bi dîqet li bavê xwe û xwendina wî dinihêre. Piştî ku Emîn Beg xwendina xwe diqedîne, ew bi ken, yek bi yek, li zarokên xwe dinihêre. Ev zarok heyina wî, rûmet û pêşeroja wî ne. Ev ê bidin ser şopa bav û kalan û mirazên bav û kalan bi cîh bînin. Loma jî ew divê bixwînin, perwerde bibin, têbigihên, jîr û zana bin, desthilat û bîrbir bin, welatevîndar û bîrewer bin. Ew çaya li ber xwe vedixwe û wê diqedîne û paşê jî li Celadet vedigere û dibêje;

– Ceco, kurê min, li min guhdarî bike, ez, bi qewlê mêrê qenc, soz didim te. Eger tu jî mîna mamê xwe Mîthed jîr bî û di rojên bê de mîna mamê xwe rojnameyeke weha bijarte derxînî û serê me pê bilind bikî, ez ê ji te re ne taximek, lê çend taxim kincên ji yên min jî xweşiktir bikirim.

– Bavo, ez ê derxim, tu dê bibînî, ez ê cerîdeyeke pir spehî derxim.

Belê, rast e, min hingê weha got... Qewl û soz mîna tovan in. Meriv wan di zikê dewr û dewranê de diçîne da ku ew di pêşerojê de hêşîn werin. Lê herwekî ku ji tov re ax, av, tav, germahî û hewa divê, ji qewl û sozan re jî rûmet, xebat, sebat, lêgerîn, xîret û evîn divê. Di ser her tiştî re jî evîn. Evîn reh e. Evîn ruh e. Tov li ser rehan hêşîn tê. Ma heta tov xwe bi rehan bernede nav kûrahiyên axê, ew dikare bibişkove, zîl bide û bejn bavêje?.. Min jî, bi evîna ku ez ji mala xwe, bav û diya xwe hîn bûbûm, soz da bavê xwe ku ez rojnameyeke spehî, mîna rojnama mamê xwe, biweşînim. Ez bûm rojnamevan. Min rojname jî derxist û ne bi tenê yek, dudo. Ez nizanim ka ew di hêjahiya rojnama mamê min de ne, lê min bi aşq û evîn ew derxistin û yadîgarî miletê xwe kirin. Gava umrê min hinekî mezin bû û min êdî bîr bi çerxa gerdûnê û qesta felekê bir, bavê min ji min re çend taxim kinc dan dirûn. Lê bêyî ku ew rojnamên min bibîne... Belê, wî rojnamên min nedîtin. Gava her hejmareke rojnamên min derdiketin, min jî mîna bavê xwe hejmara nû vedikir, rûpel bi hêdîka diqulipandin û ez, bi dengekî berz, difikirîm û min digot, "Xwezî niha bavo vê hejmarê bidîta." Mixabin, wî ew nedîtin.

4 Mixabin ku wî ew nedîtin, lawên Mîrê me yê gorbehîşt niha bûne paşa, wezîr, aqilmend, zabit, muteserif û ew karê dewletê digerînin. Ew li ser lêvan in, herkes qala wan dike, bi hezaran, sed hezaran kes bi navê wan sond dixwe. Lê gelek heyf ku Mîr Bedirxan ew nedîtin... Ma ez çi bibêjim, xwezî we kalikê xwe bidîta!

Amojna Sitî, bi axîn bîhna xwe berdide û weha dipeyive. Pêwendiya Amojna Sitî û romana Bîra Qederê li ser zimanê romanê ye. Celadet Beg dixwest romana xwe bi kurdî binivîsiya. Romana Bîra Qederê bi kurdî tê nivîsîn. Eger meriv li reh û sebebên vê yekê bigere, meriv divê xwe bi Amojna Sitî bigihîne. Amojna Sitî, dilgira malbata Bedirxaniyan, zarşêrîna zarokan û çîrokbêja meclîsan e. Ew ji dem û dewra Mîr Bedirxan maye.

Bav û diya wê li qesra Mîr Bedirxan, mîna seyis û berdestên mîr jiyane. Ew botî û kurdên êzîdî bûne. Bavê Amojna Sitî di serhildana mîr de jî hertim li ba mîr bûye. Gava serhildanê ji aliyê Osmaniyan şikest xwariye û mîr mecbûr bûye ku xwe vekişîne keleha Erûhê, bav, dê û Amojna Sitî jî pê re bûne. Umrê Amojna Sitî hingê 7-8 sal bûye. Bi dû serîhildanê re jî sirgûn û koç hatiye. Hemû malbat, tevî herkesî, ji Cizîra Botan hatiye bi dûr xistin. Hingê ew jî, bavê Amojna Sitî Apê Xelef, diya wê Gulîzer û ew bi xwe, ketine ser riya welatê xerîbiyê. Sala 1846-an, bi hespan û di bin çavdêriya ordiya Osmaniyan de, piştî rêwîtiyeke çend mehan, ew gihîştine bajarê Zerya Reş, Samsûnê. Ji wir jî, ew bi keştiyeke mezin, ji zeryayê, çûne Stembolê, payitextê dewleta Osmanî. Roj û mehên wan ên Stembolê pir dijwar bûne; Mîr Bedirxan, çar jinên wî û sê zarokên wî ji wan tên veqetandin û ew li koşkeke biçûk tên bicîhkirin, lê yên mayî hemû qor bi qor di nezareta Zaptiyê de hepis dibin. Ro û tav li wan dibe heram, nan û ava wan tê birîn, dinya li wan dibe zîndan. Bi dû zîndana Zaptiyê re, ew dîsan, bi keştiyeke mezin ber bi girava yewnanî Girîtê tên şandin. Mîr Bedir Xan, çar jin û sê zarokên wî û malbatê, tevî Apê Xelef û mala wî, li bajarê Xaniyayê tên bicîhkirin. Lê belê Osmanî malbatê perçe dikin û gelek endamên malbatê jî li Stembolê, li aliyê Anatoliyê, Kadıköyê tên bicîhkirin.

Amojna Sitî heta sala 1862-an jî li Girîtê dijî. Piştî ku bavê wê wefat dike û diya wê jî tevî Mîr Bedirxan dere Şamê, ew jî tevî hin endamên malbata Bedirxaniyan, tê Stembolê û li ba Bedirxaniyan bi cîh dibe. Rojekê li vê malê, rojekê li wê malê, di navbera malên Bedirxanan de, ew porê xwe spî dike. Hemû zarokên malbatê ku li Stembolê tên dinê, ji ber destê Amojna Sitî derbas dibin. Amojna Sitî kûpa gotinên kurdî ye, gencîneya stran, dîlan, çîrok, çîrçîrok, methelok û mamikên kurdan e. Ew şahîda tarîxa malbatê û serpêhatiya Mîr Bedirxan e. Ew rû û zimanê adet ûûsilên kurdî ye. Ew dengbêj û çîrokbêj e. Serpêhatiya Mîr Bedirxan, sirgûna wan, salên Xaniyayê, deşt û zozanên welatê

kurdan, çemên Dîjle û Firatê, çiyayên Cûdî û Herekolê, şikeftên spehî û xweşbergeh, jiyana eşîrî û koçerî ya welêt... ev hemû bi zimanê Amojna Sitî dibin lehîyeke zelal û diherikin, dibin berfendeyeke spî û hawirdor vedigirin, dibin destaneke bêdawîn û mêjiyê guhdaran dineqişînin. Ma meriv li welatê xerîbiyê, li Stembolê dikare ji Amojna Sitî çêtir mamostayeke hêja bibîne? Ma kî dikare ji wê çêtir zimanê bav û kalan, kurdiya welêt hînî zarokan bike?

Digel ku Amojna Sitî nêzîkî çil salan li Stembolê, di nav navenda zimanê Osmanî de jiyaye, ew hê jî bi gotineke tirkî nizane. Mîna ku ew ne li dinya îro, lê ya do dijî. Bedena wê li Stembolê, lê bîr û heşê wê li welatê zarokiya wê ye; welatê salên zarokiyê bihuşteke rastîn û nemir e. Ew gorîcana Malbata Bedirxaniyan, pîrika zarokên wan e. Zarokên Bedirxanî, ji kijan bav û diyê dibin bila bibin, ew hemû nevî û torinên wê ne. Niha jî, di vê roja xweş a payiza 1902-an de, ew li Kızıltoprakê, li mala Emîn Begê, li nik torinên xwe Celadet, Kamuran, Hîkmet, Tewfîk û Safter e. Belê, niha Tewfîk û Safter jî hene. Hejmara lawên Emîn Alî Bedirxan gihîştiye şeşan. Lawê herî biçûk Safter, bi gotina Amojna Sitî, çilkeke zêr e, melayikekî bêbask e, ronahî û çira mala Emîn Beg e.

> Tu dizanî, her mirov cîhaneke xweser e. Her mirov, tevî jîn, serpêhatî, tecrube, hîs û pejnên xwe, hêjayî cîhanekê ye. Nasîna mirovekî, keşfkirina cîhaneke nû ye. Lê nasîna Amojna Sitî, keşfkirina sed cîhanan bû. Di umrê wê yê keserkûr de sed cîhan gihabûn hev; cîhana bedew a zimanê kurdî, cîhana spehî ya mîrekiya bapîrê min Mîr Bedirxan, cîhana kambax a xerîbiyê... cîhan dikarin weha heta û heta dirêj bin. Min tahma zimanê kurdî ji gotinên wê wergirt, hest û heyecana stran û çîrokan, hez û evîna welatê Cizîra Botan ji çîrokên wê yên ku şevên dirêj ên zivistanan têrî nedikirin, wergirt. Amojna Sitî meşaleyek bû ku li mala me û li malên mam û metên min ronahî direşand. Di wan rojan de ku tu niha qal dikî, min û birayê xwe Kamuran li dibistana taybetî Halîle-i

Mahmudiye ku ji mala me hinekî bi dûr li Fenerbahçê bû, dixwend. Dibistan, ya herî baş a hemû Kadıköyê bû. Xaniyê wê nexweş bû, xaniyekî textîn ê sêqat Lê ders baş bûn û mamostayên wir jî bijarte bûn. Bi taybetî jî dersên fransizî, ziman, tarîx û zanîna welêt ku jê re "Malûmat-i Vataniye" digotin, pir baş bûn. Bavê min perene mezin didan dibistanê da ku em li wir bixwînin. Heftê du caran jî em diçûn aliyê din ê Stembolê, Beyoğluyê û li wir, nêzîkî Cade-i Kebir, me ji Signori Giovanni Parovel dersên musîkê digirtin. Signori li dibistana îtalî Giuseppe Garibaldi mamoste bû, lê dersên taybetî yên musîkê jî li mala xwe dida.

Em hertim bi xwendinê mijûl bûn. Lê belê, gava ku Amojna Sitî dihate mala me, êdî min xwendin dida aliyekî, min xwe li nexweşiyê datanî û ez li malê dimam. Mala ku bi stran, çîrok, serpêhatî û gotinên Amojna Sitî diqulipî ser qesra Birca Belek a welatê bav û kalên min...

– Ma ez çi bibêjim, Amojna Sitî çavên xwe li zarokan digerîne û dibêje, xwezî we kalikê xwe nas bikira. Gotin têrî pesindana wî nakin. Ma ez rebena Xwedê çawan wî bidim nasîn?.. Bejna wî dirêj, laşê wî gir bû. Dengê wî gur, gotinên wî xweş bûn. We digot qey, ew şêr û pilingê çiyayên Şengalê bû. Çavên wî, mîna çavên teyrê simîr ê çiyayê Sîpanê Xelatê, spehî û dûrbîn bûn. Çaxa wî gava xwe davêt, erd li bin lingên wî dihejiya. Çaxa wî serê xwe ber bi jor dikir û rîha xwe şeh dikir, stûyê wî dibû mîna stûyê hespê Bozê Rewan ê Memê Alan. Hertim kincên spî yên neqişkirî û hewreşîmî lê bûn. Ew dostê feqîran, dijminê neyaran bû. Ew bi pişta xwe xurt, bi gotina xwe mêr bû. Çar jinên mahrkirî û şanzde jî cêriyên wî hebûn. Ev mam û metên we yên bêhesab hemû ji pişta wî ketine. Wî bi şîrê teyrê baz dest bi xwirîniya xwe dikir û bi şîrê şêrê dirende paşîva xwe diqedand. Mîna îro tê bîra min, çaxa em ji welêt hatin bidûrxistin, em bi qasî salekê li ser riyan man. Hingê li ser wan riyan, ji mîrê me re, sê zarok çêbûn, Yezdanê Pak sê zarok danê. Şûrê wî jî, mîna pişta wî, xurt bû. Lê qewlê wî nerm, wîjdana wî paqij bû. Lo, zarokno

lo, çavreşên mino lo, ma ez çi bibêjim, Mîr Bedirxan şêrê welatê Kurdistanê bû.

Kamuran ku heta hingê bi dîqet li Amojna Sitî guhdarî dike, xwe ranagire û gotina wê dibire,

– Amojnê, tu dibêjî "şêr û piling û teyr." Ma meriv qet dibin şêr û piling û teyr? Şêr heywan e; însan, însan e...

Celadet û Amojna Sitî bi gotinên Kamuran pir dikenin. Amojna Sitî û zarok ne li ser kursiyan, lê li erdê li ser xalîca raxistî ya salona malê rûniştine. Safter li ser çoga wê ya çepê rûniştiye, Tewfîk jî li kêleka wê ya rastê. Celadet, Kamuran û Hîkmet jî li hemberê. Amojna Sitî bang Kamuran dike. Kamuran, bi çarpiyan, tê ba Amojna Sitî. Amojna Sitî bi destê xwe yê rastê porê wî mist dide û ji herdu çavên wî radimûse û paşê dibêje,

– Kamoyê min, aqilfahmê min, gotina te ye, lê eger te bapîrê xwe bidîta, te dê hingê şêr nas bikira. Ew rêberê kurdan, şêrê welatê Kurdistanê bû.

5 Teyar Begê Ertûşî, tevî Emîn Beg, birayê wî Alî şamil Paşa, biraziyê wî Evdirezaq Beg, serokê eşîra Hevêrkiyan Samed Axa û lawên Emîn Beg Sureya û Celadet, ber bi kursiya rûniştinê ya kêleka masa xwarinê dibe û dibêje,

– Mîr Bedirxan rêberê me hemû kurdan, şêrê welatê Kurdistanê bû. Hûn lawên wî jî rêber û serekên me ne. Bi sedhezaran meriv, bi gotineke Mîr Bedirxan, dikaribûn biçûna mirinê. Li jor gotina Rebbil Alemîn, li jêr jî gotina Mîr Bedirxan bû.

Mala Emîn Begê dîsan şên e. Axa, beg, şêx û giregirên welatê kurdan hertim tên Stembolê ji bo serdana Bedirxaniyan. Ew, piraniya caran, derin qonaxên fireh ên Bedrî Paşa, Alî şamîl Paşa, Osman û Husên Paşa. Lê carina jî, mîna vê êvarê, ew tên mala Emîn Begê. Zarokên Mîr Bedirxan ji welatê Mîr Bedirxan hatine veqetandin û vegera wan qedexe ye, lê dewlemend û desthilatên welêt tên Stembolê nik wan. Bûyerên berî 52 salan wan bi hev re

girêdide. Tarîxa wan a hevgirtî dibe pira navbera wan û welêt û xelkê kurd. Mîr Bedirxan jî ji Goristana Kurdî ya Şamê rêberiya wan hemûyan dike.

Eger giregirên kurdan zêde nayên mala Emîn Begê, ji ber ku mal, li gora malên din, biçûk e. Mal, li Kızıltoprakê, hinekî ji taxê bi dûr e, ew ji bexçeyekî fireh û xaniyekî duqatî tê pê. Her qatek çar ode hene. Odeyên qata jorîn, yên razanê ne; oda Emîn Beg û Samûha Xanimê, oda Sureya, oda Celadet û Kamuran û oda Hîkmet, Tewfîk û Safter. Di qata jêrîn de jî saloneke fireh û dirêj ku ji du milan tên pê, odeyeke fireh a xebatê, odeyeke mêvanan û odeyeke mezin a hizmetkarên malê hene. Oda xebatê, odeyeke fireh e û li bexçê dinihêre. Li aliyê bexçê, li ber pencerê maseyeke dirêj û li koşeya rastê ya masê sandûqeke biçûk heye. Li kêleka sandûqê jî pênûsin û du murekebdank, bi dûzan, hatine rêzkirin. Li ber sandûqê jî kitêbek, di nav bergekî çerm de, mîna remzê masa xebatê, hertim bal dikişîne. Kitab, destnivîsa Mem û Zîn a şaîrê navdar û milî yê kurdan Ehmedê Xanî ye. Kitab ji kitabxana Mîr Bedirxan a welêt maye. Bedirxanî wê mîna kitabeke miqedes diparêzin. Zarokên Mîr Bedirxan bi vê kitabê dest bi dersên xwe yên zimanê kurdî û hesta Kurdistanê kirine. Hecî Qadirê Koyî, şaîrê kurd û perestişkarê Ehmedê Xanî ku li Stembolê, di salên 1860-70-an de, mamostayê Emîn Beg û birayên wî bû, li ser rûpela yekemîn a destnivîsa Mem û Zînê şiîreke dirêj nivîsiye. Di şiîrê de ew qala mezinahiya Ehmedê Xanî û esera wî Mem û Zînê dike û dibêje; "Eman qedrê bizane em kitêbe / Le dinya êstekî hemtay nemawe / Le eyamî heyatî şêxî Xanî / Le ser nisxey xet ew nûsirawe..." Ji bilî kitab, pênûs û murekebdankan, li ser masê tu tişt nîn e. Ser masê her gav paqij e. Lê herdu aliyên dîwarên odê heta jor bi kitab, kovar, rojname û kaxizan ve tijî ne. Refên kitêban heta banê ber bi jor bûne. Li aliyê rastê odê, li ber refan nêrdewaneke dirêj heye da ku meriv pê hilkişe û kitabên ku meriv nikare xwe bigihîniyê, daxe jêr. Ji pencerê aliyê paş ê bexçê dixuye. Ev alî tevî dar in, lê di nav daran de,

dareke çinarê bi qurnê xwe yê stûr û qehîm hemû dar xistine bin bandûra xwe. Li ser qurnê dara çinarê, hin rêz, bi çaquyan, ji aliyê zarokan, hatine kolandin. Yek ji rêzan, bi tîpên latînî, weha ye; Kurdi... Yek jî, bi tîpên erebî, navê Safter e. Lê tîpa dawîn r nehatiye nivîsîn. Bi tenê Safte hatiye kolandin. Hêlekaneke zarokan jî ji çiqilên darê ber bi jêr dibe.

Mitbaxa mala Emîn Begê jî li qata jêr e, lê ew biçûk e, bi tenê meriv dikare tê de xwarinê çêbike. Loma jî aliyekî salonê ji bo xwarinê hatiye veqetandin. Di vê êvara zivistana 1903-an de, malbat û mêvan li wî milê salonê, li ser sifra şîva êvarê rûdinin. Samîha Xanim, Amojna Sitî, Madam Stella û Şehrîban, berdesta Samîha Xanimê, li mitbaxê bi haziriya xwarinê mijûl in. Mêvan ji Cizîra Botan in, bi xwe re bîhn û tahma welêt anîne. Loma jî vê êvarê xwarinên Cizîra Botanê divên. Ji danê sibê ve ye ku Amojna Sitî li mitbaxê rûniştiye û xwarinan hazir dike. Xwarinên vê êvarê, yên wê ne; sê celeb kutilk, kutilkê mêlakê, yê bi dew û yê kulindê zer. Du celeb xwarinên bi goşt; singûsîr, merga mêlakê. Du celeb savar; savara tûzikê û ya kerengan. Du celeb jî şîrinahî; birinêşîr û tilolik.

Masa xwarinê gelekî dirêj e. Rûmaseyeke spî û neqişkirî li ser e. Mazûvan û mêvan li herdu aliyên masê rûniştine. Tayar Beg li hember û Samed Axa jî li kêleka Emîn Begê rûniştine. Li kêleka Tayar Begê, Alî Şamîl Paşa û li kêleka wî jî Sureya rûniştiye. Celadet jî li hember birayê xwe ye. Jin li dora masê nîn in. Amojna Sitî, Madam Stella û Şehrîban xwarinan tînin ser sifrê. Li ser sifrê her tişt bi dûzan û di wexta xwe de ye. Li vê malê qayide gelek girîng in.

> Ma te di bexçê mala me de tiştekî ji bîr nekir?.. Bîr... bîra ku bi qasî çend gavan ji dara qehîm bi dûr bû. Devê birê girtîbû, ava wê miçiqîbû. Ew bîr û doraliyên wê cîhê lîstikên me bû. Em li dora bîrê, mîna hevya li dora dinê, dizivirîn. Bi taybetî jî ez. Ez her li dora bîrê dizivirîm û dor dibûm...

Herçî qayide, yanê bi gotina fransizan prensipe in, ew mîna zeviyê ne. Wexteke wan a çandinê û wexteke wan a kemilandinê heye. Ew pêşî tên çandin, paşê jî, bi wextê, dikemilin. Kê ew çinara bexçê mala me çandibû? Min kir nekir, ez bi vê yekê negihiyam. Lê eger kê jî ew çandibe, berî her tiştî ew dara qaîm, toveke biçûk bû. Bi dû re, bi wextê, ew kemilî. Qayide sitûnên mala me bûn. Bav û diya min, Amojna Sitî, Madam Stella, Şehrîban, ew hemû ji bo çandina qayidan dixebitîn. Em zarok bi roj û şev perwerde dibûn. Amojna Sitî, bi bejna xwe ya dirêj û zirav, zimanê kurdî bû. Madam Stella ku bi eslê xwe yewnana Stembolê bû, bi bejna xwe ya kin û bedena xwe ya gulover, zimanê yewnanî, fransizî û hinekî jî îtalî bû. Gava wê her serê sibê digot "kalimera" û dîsan bi yewnanî halê me dipirsî û digot "tikanis", hingê em têdigihîştin ku rojeke nû ya perwerdeyiyê dest pê dikir. Şehrîban, Şehrîbana bedew jî zimanê jîn û bedenê bû. Em zimanên cihê, cihêtiya jînê, jîna kurdî, kurdîtiya bîr û hestan, bîr û hestên tarîxî û tarîxa xwe ya keserkûr hîn dibûn... Wext, wexta çandina qayidan bû...

Bi qasî çil salan bi dû wan rojan re, birayê min Kamuran di kovara me Hawar'ê de bi navê "Rabûn û Rûniştin" bendek weşand. Bendê weha dest pê dikir; "Kurd gelek bi edeb û terbiye ne. Rabûn û rûniştina wan, danûstandina wan bi rêz û tertîb e. Kurd nazik, giran û bi edeb in. Xwediyê gotina xwe ne; paşgotiniya xelkê nakin; dostê dostê xwe, dijminê neyarê xwe ne. Pir naxivin, gotina xwe bê sebeb dirêj nakin, gava erê dibêjin, erê ye û gava no dibêjin no ye..." Bend bi vî terhî dirêj dibû. Belê, bend, halê kemilî yê tovên qayidan bû.

Ji salonê bîhna xwarinên kurdî difûre. Mase bi xwarinên cihê xemiliye. Ji milekî ve xwarin tê xwarin, ji milekî ve jî sohbeta li ser welêt û halê welêt germ dibe. Celadetê ku ji kutilkan pir hez dike, giran giran, bi kêr û çetelê, kutilkên teyfika xwe dike du perçe û hem wan dixwe hem jî guhê xwe dide xeberdanan. Û ew ji bin çavan ve, bi dîqet, li Samed Axayê ku kutilkan bi destan

dixwe, dinihêre. Bav û mamê Celadet, ji peyivînê zêdetir, dipirsin û li mêvanan guhdarî dikin. Kurmamê wî û birayê wî Sureya bi germî dipeyivin û doza welatê Kurdistanê dikin. Kurmamê wî Evdirezak ku bi umir ji Celadet pir û pir mezintir e, bîskeke dirêj, li ser pêwistiya yekîtiya eşîrên kurdan û hişyarbûna welatê kurdan dipeyive. Tayar Beg, bi nermî, gotina Evdirezak dibire û berî ku kevçiyê savarê bibe devê xwe, dibêje,

– Gotina te rast e, mîrê min. Lê kar û şixul bê serî nameşe. Her tişt bi rêber û pêşewan dikeve rê. Eger Mîr Bedirxanê rehmetî nebûya, xelkê û eşîrên kurdan xwe li dora serhildanê nedicivandin. Rewş li welêt aloz e. Li aliyekî zordariya Osmaniyan, li aliyekî jî şerê navbera kurdan û ermenan û navbera eşîrên kurdan... Welat li hêviya law û neviyên Mîr Bedirxan e. Welat hewcedarê kar û şixulên we ye.

6 Emîn Alî Bey, Osmanlı ülkesi ve İslam dininin sadık evladı Bedirhan Bey'in değerli oğlu, Osmanlı vatanı her zaman size, çalışma ve hizmetlerinize muhtaçtır. Hayırlı, uğurlu olsun...

Emîn Beg spasî wezîrê ku weha dipeyive dike, rûyê xwe ber bi textê Sultan Evdilhemîd dizivirîne û du caran xwar dibe û spasiyên xwe berpêşî Sultan Evdilhemîd jî dike. Sultan Evdilhemîd jî bi ken, hêdîka serê xwe xwar dike û silavan li Emîn Beg vedigerîne. Piştî silavên rêzdariyê, Emîn Beg li wezîr vedigere û radiweste. Wezîr ji zabîtê kêleka xwe nîşanek werdigire û bi rêzdarî, bi aliyê çepê yê sînga Emîn Beg ve dike. Paşê eynî tiştî dubare dike û nîşaneke din jî pê ve dike. Du nîşan, nîşana liyaqatê û nîşana Osmanî li ser redîngota reş, li ser sînga Emîn Beg dibiriqin.

Celadet, bi kêfxweşî, li nik mamên xwe, ji nav mêvanan, li bavê xwe dinihêre. Di vê roja ronî ya payiza 1903-an de, li Saraya Dolmabahçe, salona Muayedê, bavê wî bi merasîmekê, nîşanên dewleta Osmanî ji Sultanê dewletê werdigire. Bavê wî ew jî bi

xwe re aniye merasîmê. Bask nîn in ku Celadet pê bifire. Ew li Dolmabahçê, di salona bedew a Muayedê de ye û li bavê xwe û Sultanê dewleta Osmanî dinihêre! Wê şevê qet xew neketibû çavên wî. Di nav lihêfan de, wî mîna şujiyekê, xwe badabû û bi zehmetî kiribû sibe. Destê sibê jî, berî herkesî, ew rabûbû, dest û rûyê xwe şuştibû, kincên xwe yên nû ku ji bo wê rojê hatibûn dirûtin, li xwe kiribûn û li hêviya bavê xwe mabû. Diya wî û Şehrîbanê jî, xweş, porê wî şeh kiribûn û qirawata papyonê pê ve kiribûn. Herçî bavê wî bû, gava ew li dora saet heyştan ji qata jor peyayî jêr bûbû, redîngoteke dirêj û coteke pantolê reş li serê dibiriqîn. Ew jî ji bo merasîmê hazir bû. Merasîm di saet dehan de bû. Piştî xwirîniyê, paytona mamê Celadet, Elî Şamil Paşa hatibû ber derî, ew lê siwar bûbûn û tevî Elî Şamil Paşa, Murad Beg, daketibûn lengergehê. Ji wir jî, bi keştiyê, bi hevaltiya teyrên zeryayê, ew derbasî aliyê din ê Xalîçê bûbûn. Li wî alî jî paytona mezin a mamê Celadet, Osman Paşa ku li ber destê Sultan Evdilhemîd dixebitî, li hêviya wan bû. Birayên din ên Emîn Beg ên Serasker Bedrî Paşa, Necîb Paşa, Husên Paşa, Mehemed Elî Beg û kurmamê Celadet, lawê Necîp Paşa Evdilrezak jî li Dolmabahçê li hêviya wan bûn. Gava ew gihîştin Dolmabahçê, Evdilrezak Beg li ber deriyê bexçê Dolmabahçê li benda wan bû. Evdilrezak Beg li Sarayê, mîna wergervan û teşrîfatvan, dixebitî û gelekî nêzîkê Sultan Evdilhemîd bû. Celadet heyranî kinc û lixwekirinên wî bû. Wê rojê jî kinceke nû ya frengî û fesekî sor ê nû ahengeke taybetî dabû wî û bejna wî ya dirêj. Simbêlê wî badayî, rûyê wî bi ken bû. Wî ew biribûn hundir.

Li gora gotinan, salona ku ew niha lê bûn, Salona Muayede, ya Dolmabahçê, salona herî xweş û mezin a hemû Awrûpayê bû. Salon, tîmsala xweşî, mezinahî û spehiyê bû. Li erdê xalîçên mezin, fireh û rengîn raxistî bûn. Kêlekên deriyê mezin ên salonê bi mehfûrên rengîn ku ji her aliyên welatê fireh ê Osmanî hatibûn, raxistî bûn. Dîwar û banê salonê bi neqişên naqaşên herî hoste hatibûn rengandin. Çira û şamdankên zêrîn û zîvîn

xweşahiya dîwaran temam dikirin. Pencerên salonê fireh û dirêj bûn û bi rengên keskesorê hatibûn xemilandin. Ji hemû salonê bîhneke mîna bîhna gul û emberê difûrî. Niha, Celadet, tevî bav û mamên xwe, li vê salonê bû!

Îro, ji bo Emîn Beg û Bedirxaniyan, rojeke tarîxî ye. Ji mêj ve bû ku zimanên hesûd û zikreş li Stembolê belav dikirin ku Sultan dê malbata Bedirxaniyan ji Stembolê derxe û sirgûnî deverên dûr bike. Wan zimanan belav dikirin ku Bedirxanî li dijî Sultan di nav dek û dolaban de ne û haziriya serhildanekê dikin û dixwazin axa Kurdistanê ji dewleta Osmanî rizgar bikin. Dewleta Osmanî û rêberên dewletê, malbata Osmanî, kar û şixulên dewletê, ji mêj ve, bi awayekî gelek taybetî ku hîç li ba dewleteke din nîn bû, digerandin. Osmaniyan kar û şixulên xwe bi wezîr û paşayên ku ji gelên bindest ên dewleta Osmanî bûn, digerandin. Loma jî li dora sultanên Osmanî hertim wezîr û paşayên ji milletên din, kurd, ereb, çerkez, laz, yewnan, bulgar, arnawit, boşnak hebûn. Bêguman van wezîr û paşayan jî kar û şixul li gora menfaetên xwe û milletên xwe digerandin û ji hêzbûna wezîr û paşayên din hez nedikirin. Hertim di navbera wezîr û paşayan de dijîtî û berberî hebûn û ji Sultan re hevûdu gilî dikirin. Îro jî ev wezîr û paşayên li dora Sultan Evdilhemîd ji pirbûn, mezinahî û quweta malbata Bedirxaniyan gelekî ditirsiyan û dixwestin pêwendiya Bedirxaniyan û Bab-i Aliyê xirab bikin. Loma jî wan li dijî Bedirxaniyan gelek tişt ji Sultan re digotin û li der û doran belav dikirin. Sultan bi tenê li wan guhdarî dikir û bêdeng dima. Kesî nizanîbû ka ew çi difikire. Lê li gora mamê Celadet Osman Paşa ku li Sarayê dixebitî û gelekî nêzîkê Sultan bû, Sultan Evdilhemîd li gotina wezîr û paşayên doralî guhdarî nedikir. Dîsan li gora Osman Paşa, Sultan Evdilhemîd li her derî weha digot; "Kurd û Bedirxanpaşazade birayên me yên misilman in. Em yên hev in..."

Jiber vê yekê jî, îro rojeke tarîxî bû. Îro Sultan Evdilhemîd, bi vê merasîm û nîşandanê, hem şexsî, qedrê Emîn Beg digirt û

dilê Bedirxaniyan xweş dikir hem jî nîşanî herkesî dida ku kurd û Bedirxanî dostên wî ne. Lê di eynî wextê de, wî rê li ecizî û serhildanên navdar ên Bedirxaniyan digirt.

Celadet, di vê roja tarîxî de, bi kel û coş, li dora xwe, li Sultan û bavê xwe dinihêre. Sultan li serê salonê, li cîhê bilind, li ser textê xwe, bêdeng, çavên wî li ser merasîmê, rûniştiye. Textê wî yê zêrîn dibiriqe. Li herdu kêlekên text, kevirên lûlû û yaqûd ku bi textê zêrîn hûnandî ne, rengên têkel ên spehî didin têxt. Rûyê Sultan, rûyekî hinekî direj û nûranî ye. Rîh û simbêlên wî dibiriqin. Keneke tenik û bi ûsil li ser rûyê wî ye. Ew qet napeyive, bi tenê li merasîmê û li şêniyên salonê, bi aramî dinihêre. Tevî bavê Celadet bi qasî bîst kesan li kêleka hevûdu di rêzê de û nîşanên xwe werdigirin. Sultan ji textê xwe peya nabe, bi wan re napeyive, xwe nalivîne, – bi tenê serê xwe hêdîka li ba dike û silav dide wan. Hemû karên din ên merasîmê bi destê wezîr û zabitan bi rê dibe. Hema çi bigire hemû wezîr, aqilmend û merivên Sultan bi simbêl û rîh, zabît jî tenê bi simbêl in. Rîha hinan tenik yên hinan jî bitr e. Simbêlê zabîtan jî qît î badayî ye. Li salonê tiştê herî balkêş fesên Osmanî yên sor in. Li wir zeryayek ji fesan hatiye pê, li serê herkesî fesekî sor ê spehî heye. Fesan, mîna helaleyên sor, hemû salon tijî kirine.

> Hingê salê min deh bûn. Meraqa min pir, mêjiyê min zarok bû. Di wê salona yekta de min ji kurmamê xwe Evdilrizak Beg û ji mamên xwe her dipirsî; ev çi ye, ev çi ye, ev çi ye... Wan jî bi ûsil, mîna her merivê têgihîştî, bersiva min didan; ev, ev e. Ev, ev e. Ev, ev e. Bi nerîna zarokekî dehsalî, min ew hemû tişt, avahiyên stûr, ode û salonên bedew, zêr, zîv, text, sultan, wezîr, paşa, şûr, fes, zimanê tirkî, pêwendiya wan bi min, bavê min, mamên min re di heşê xwe de nivîsîn. Lê gava ez mezin bûm û pêrgî dek û dolap, êş û zehmetiyên jînê bûm, careke din ez li xwe vegeriyam û min ji xwe pirsî; gelo ew çi bû, ew çi bûn?.. Bêguman, bersivên van pirsên min ên cara dawîn ne mîna yên berê bûn. Şekil û sûretên ku berê di mêjiyê

min ê zarok de çêbûbûn, bi temamî guherîn û qulipîn ser yên nû. Li milekî din, ew şekil û sûret, tu carî, bi her awayî, zelal nebûn... Lê belê, pêwendiya me kurdan û dewleta Osmanî (û bi dû re dewleta Tirkiyê) û pêwendiya malbata me Bedirxanpaşazadeyan û rêberên dewleta Osmanî her û her mîna navenda jîna min ma. Hem bi başî hem jî bi xirabî. Mîna gelek kurdên din, min jî kir, nekir, nikaribû xwe, bîr û heşê xwe, hîs û pejnên xwe jê xelas bikira. Di destpêka salên hezarî de eşîrên tirkan hatibûn û welatê me kurdan vegirtibûn. Ji wê rojê û vir de, em û tirk bi hev re, mîna cîran, dijiyan. Lê cîraniyeke newekhev. Ew hertim xwedî dewlet, em bêdewlet, peregende û bindest. Lê tevî vê yekê jî, em di nav hev de bûn, bi hev re dijiyan, ji hev dizewicîn, bi tirkî perwerde dibûn. Ez çi bibêjim... Pêwendiya me hem pir baş hem pir xirab bû, hem çê hem neçê bû. Ez çi bibêjim?..

FOTOGRAF 3

Galata; pira dewr û dewranê, cihê evîn û mirinê...

1 Pira Galatayê; yek ji navendên romana Bîra Qederê, hem bi çêyî hem bi neçêyî... Meriv ji ku dest pê bike? Fotografa sêyemîn a romana Bîra Qederê li ser Pira tarîxî ya Galatayê ya Stembolê ye. Fotografa reş û spî di destpêka salên 1900-an de, yanê di dema ku êdî Celadet bîr dibe de, tê kişandin. Belê, di wan deman de ku êdî Celadet der û dora xwe dinase û bi serê xwe dikare derbasî aliyê din ê Stembolê bibe...

Fotograf bergeheke xweş a Pira Galatayê nîşan dide. Hemû pir, doraliyên wê, meriv, hemal, ker, erebe, fayton tê de ne. Fotograf ji ber devê aliyê Galatayê tê kişandin. Ev ne bêsebeb e. Jiber ku kesên fotografê dikişînin, li aliyê Galata yê pirê dijîn. Ew wê ji aliyê xwe dikişînin. Fotograf bi devê pirê yê aliyê Galatayê dest pê dike û hema çi bigire, dev hemû pêşiya fotografê dadigire. Bi dû re, pir û herdu aliyên wê, her ku diçe, tengtir dibin. Li aliyê din ê Pirê, mizgeft, minareyên wan ên dirêj, qonaxên li ber avê, banên xaniyan û çend ewrên nîvreş, bi hev re, panoramayeke spehî tînin pê. Hem însan hem jî bergeheke xweş a Stembolê di vê fotografê de dixuye. Yekîtiya însan û bajêr, kes û civatê tê de heye. Hejmara merivan pir e. Pêşî pênc nobedar û tehsîldarên pirê, pir xweş, heta simbêlê xwe, dixuyin. Sisê ji wan li aliyê çepê, yên din li aliyê rastê rawestane û di nav kincên xwe yên çîk î spî de nobedarî dikin. Tehsîldarê ku li ber devê aliyê rastê sekiniye, destê xwe yê rastê vekiriye û heqê derbasbûnê ji

merivekî distîne. Yên din jî, çavên wan li ser şêniyan, rawestî ne. Li kêleka tehsîldarê herî rastê, çend kes, bi kincên reş ên spehî, di destên wan de sîwanên reş, ber bi aliyê Galatayê tên. Du barkêş, barên giran li ser pişta wan, derin. Du jin, di nav kincên xweş de, li kêleka hev, derin. Du mêr, fes li serê wan, bi dest û piyan dipeyivin û tên. Du ker bi barên bilind û li pey wan jî du hemal tên. Kes û komine biçûk, li herdu aliyên pirê, xwe dane ber caxên pirê û li avê dinihêrin. Li jor, du payton li pey hev, derin. Dîsan li jor çend kes û çend sîwan dixuyin. Eger meriv bixwaze bihijmêre, li ser Pirê ji sed û pênceyî zêdetir meriv derin û tên û radiwestin. Yanê hejmar, li gora pira Galatayê kêm e.

Sebebê vê kêmaniyê ev e; rojê hê nû dest pê kiriye, bajar hê baş şên nebûye, kar û şixul, hatin û çûyin hê baş germ nebûye. Û baraneke sivik hêdî hêdî dibare. Di fotografê de destpêka lebata jiyanê û hişyarbûna bajarekî mezin heye. Baran, av, ewr, sîwan, mizgeft û minareyên dirêj aramiyekê direşîne ser wênê. Li milê din, tehsîldar, hatin û çûyin, şênî, ker, payton jî jîndareyekê didinê. Deng û bêdengî, jîndarî û aramî, bajar û însan... ev hemû perçeyên esasî yên Pira Galatayê ne. Pira Galatayê jixwe bê van nabe. Lê belê, kî dikare van li ser wêneyek û fotografekê bineqişîne û diyar bike?

Abdullah Freres, bêguman Abdullah Fréres, yanê Evdillahên bira. Di bin fotografa siyemîn a romana Bîra Qederê de navê wan, di nav çarçeweyeke neqişkirî de, bi tîpên mezin, heye. Ew û fotografxana wan navdar e. Herçend R. Xendamian fotografkêşê navdar ê aliyê Kadıköyê ye, ewçend Abdullah Fréres jî fotografkêşên navdar ên aliyê Galatayê ne. Meriv dikare, bi misogerî, bibêje ku nîşana "Abdullah Fréres", nîşana hostehî û bedewiya hunera fotografkêşînê ye. Nebi tenê li Stembolê, lê herweha li hemû aliyên dewleta Osmanî û li Awrûpayê jî, ew navdar in. Ew, navdartirîn fotografkêşên Stembolê ne. Ew fotografkêşên Stembolê û yên sultan, wezîr, paşa, ronakbîr, nivîskar, lewanten, jinên societé yên bajarê Stembolê ne. Nîşana Abdullah Fréres ji navê birayê me-

zin Abdullah Şukrî Efendî tê. Navê birayê biçûk nayê gotin. Ew bi tenê "birayê Abdullah Şukrî Efendî" ye û ew herdu bi hev re Abdullah Fréres in. Fotografxana wan li Beyoglu, di nav kuçeyeke teng a Beyoğluyê de ye. Fotografên herî spehî yên Beyoğlu û Galatayê ji destê wan derketine û bi makînên wan hatine kişandin. Ew fotografkêşên Beyoğlu û Galatayê ne; fotografkêşên herî hoste, herî kal û bi tecrube. Fotografxane, salona rûniştinê û studyoya wan hertim tijî meriv in. Li dîwarê salonê çend fotografên Beyoğlu û Galatayê ku wan kişandine di nav çarçeweyên spehî de daleqandî ne. Di nav çarçeweyeke zêrhêlî de jî seneda ku wan ji Sultan Abdulezîz wergirtiye, "îrade-î seniye", dibiriqe. Bi vê senedê ew bûne "Ressam-i Hazret-î Şehriyari" û bi kêfxweşî, bi serbilindî vê payeyê nîşanî xelkê didin. Bi dû Sultan Abdilezîz re, gava Evdilhemîd dibe sultan, Abdullah Şukrî Efendî û birayê wî îcar dibin fotografkêşên Hunkar...

Li gora Kadıköyê, li aliyê Galata û Beyoğluyê fotografxane û fotografkêş hîn zêdetir in; Vucio û Fettel, Mathiu Papazyan, xwediyê "Photo Phebusê" Paul Tarkulyan, Theodor Bilbilidis, Constantin Sofiano, xwediyê "Photo Parnassê" Gregoire Derarsene, Gülmez Fréres û hîn çendîn wênekêşên din... Lê ev hemû hosteyên Galata yê wargehê milletên têkel li aliyekî, Abdullah Fréres li aliyekî. Cîh û hostehiya Abdullah Fréres di ser hemûyan re ye. Bi destê wan Stembol dibe bûkeke nazenîn, Galata û Beyoğlu dibe bihuşteke rengîn, jinên bedew û spehî yên Cade-î Kebîr dibin horiyên bira.

Mîna vê fotografa sêyemîn a romana Bîra Qederê, hem yekseriya fotografên wan hem jî kitekitên fotografan lihevhatî ne. Hem hemû fotograf hem jî aliyê wê yê herî biçûk bala merivan dikişîne. Li ser fotografa pira Galatayê ku gelek caran mîna Cesr-i Cedid, Pira Ecelê yan jî mîna pira Siratê bi nav dibe, meriv kitekitên Pira Galatayê jî baş dibîne; caxên herdu aliyên pirê û neqşên wan, çirayên neqşkirî yên li ser caxan daçiqandî, textên raxistî yên Pirê, bizmarên textan, dûkan û gazînoyên li herdu

kêlekên aliyê jor, kinc û pêşgîrên spî yên nobedaran, kincên cûr bi cûr yên li ser şêniyên ku di pirê re derbas dibin, awayê rêçûyina barkêşan.

Ji fotografê û kitekitên wê baş dixuye ku pir navendeke girîng a jiyana Stembolê ya rengîn û dewlemend e. Ne bi tenê evçend; ew xwediyê tarîxeke taybetî, qedereke balkêş e. Û li dora tarîx û qedera wê gelek tarîx û qederên şexsî jî hatine hûnandin. Gelek evîn li ser textên wê yên jihevketî û riziyayî hatine pê, gelek hêstir li wir barîne, gelek dil hilavêtine. Gelek ruhên şikestî ji wir li pêlên avê û ewrên aso nihêrîne. Digel tarîx û qedera Pira Galatayê, ev aliyên wê jî, ji bo romana Bîra Qederê, girîng in. Roman, bêyî pira Galatayê nabe roman. Germahiya boş a evînê, cara pêşîn, li ser pira Galatayê, ruh û bedena Celadet vedigire. Çirûskên hebûn û xwebûnê, ewçend bi xurtî, li wir, li dora wî, bi firê dikevin. Ew mirinê li wir, cara pêşîn, bi rûçikê wê yê saw û xoftijî, dibîne û dijî.

Belê, Galata, pira evîn û evîndariyê, xwenasîn û xwebûnê, mirin û kuştinê ye.

2 Di vî danê êvarê yê payiza 1905-an de, pira Galatayê, pira evîn û evîndariyê, xwenasîn û xwebûnê, mirin û kuştinê, di nav dengên rengîn û heydadaneke şêrîn de ye. Bi gotina cihûyên Galatayê, eger meriv derziyê bavêje erdê, ew nakeve. Ewçend qelebalix e, ewçend şênî heye. Hin derin, hin tên, hin rawestane. Hin diqîrin, hin dikenin, hin digirîn. Hin bi lez in, hin jî, mîna Evdilrezak Beg, Sureya û Celadet, kêfa vî danê êvarê, bi kêfxweşî dadiqultînin. Ji her derî deng tê; ji merivan, ji pirê, ji textên pirê, ji erebe û paytonan, ji keştî û qayikên doralî, ji aliyên Galatayê. Bi gotina kurdên Kadıköyê, dê weledê xwe avêtiye. Roj, roja mahşerê, roja axirzemanê ye. Ziman ketine nav hev, tirkî, kurdî, erebî, romî, îtalî, fransizî, slawî, bulgarî, îngilizî rabûne govendê.

Rojeke din ji rojên bêhesab diqede. Ro, hemû giranî û westa rojê li ser milan, diçe ava. Roja payizê, bi rengên xwe yên cuda û taybetî, hêdî hêdî xatir dixwaze. Bajar û şêniyên bajêr haziriya êvareke nû dikin. Ji dûr ve, du keştiyên dûkelî, bi mij û dûmanê, xwe berdidin nav zikê zerya Marmarayê, çend keştiyên biçûk ên bayî, xêliyên wan bi ba tijî, li ser avê, hêdî hêdî, xwe dilivînin û derin. Esman çikî sayî ye, bi tenê tîrêjên tavê yên sor, li cîhê ku tav dere ava, rengekî sor û zer dide gewheriya esman. Li ber lingên pirê jî, masîvan di nav qayikên xwe yên biçûk de, ku bi pêlên avê hêdî hêdî xwe dilivînin, hem li pey masiyan in hem jî masiyên ku girtine, li ser agirê komirê, bi gotina wan, "duqulipînin ser masiyên biraştî."

Bîhneke têkel ê boş hemû Pira Galatayê vegirtiye. Bîhna zerya û avê, masî û agir, xwîn û xwîdanê ketiye nav hev. Bîhna lewantên xanimên Galatayê û xwîdana hemalên Stembolê bûne yek, bi hev re dimeşin... Celadet ku êdî bûye donzde salî, ji danên êvarê yên Galatayê pir hez dike. Avaçûna rojê, bi reng, tahm û bihnên xwe, xwe berdide nav ruh û canê wî. Ew dixwaze her danê êvarê li vir be û bi çavan bibîne, bi guhan bibihîse, bi dil û ruh hîs bike. Kekê wî Sureya ew hînî "nerîn, bihîstin û hîskirinê" kiriye. Mîna vî danê êvarê, pirî caran jî ew bi hev re tên Galatayê. Ev deng û şêniyên têkel, ev reng û bîhnên têkel, ev sûret û bergehên têkel kela dilê xort ê Celadet hildide, kêf û coşeke taybetî didiyê. Gotinên straneke barkêşekî, qîrîna zarokekî, dengê xêliya keştiyekê, bîhna masiyê biraştî, wîcewîça teyrekî avê, kincê neqşkirî yê xanimekê, simbêlê badayî yê tehsîldarekî, fesê sor ê begzadeyekî... ev hemû dibin rengên jiyana wî ya ciwan. Yan jî meriv dikare weha bibêje; ev hemû ruh û jiyana wî ya ciwan dineqişînin.

Vî danê êvara payiza sedsala nû, Celadet tevî kurmamê xwe Evdilrezak û kekê xwe Sureya, li ser Pira Galatayê, li ber caxên pirê sekiniye û deng û bîhnan werdigire. Kekê wî Sureya ku ji niha ve, di vê xortiya xwe de, bûye xwediyê rû û zikekî gulover,

li nêzîkê Pira Galatayê, li dibistana herî navdar a dewleta Osmanî Mekteb-i Sultani dixwîne. Jiber nêzîkahiya dibistanê, gava Celadet ji Kadıköyê dadikeve vî aliyê Stembolê, ew tê dibistanê û ji wir, herdu bira, bi hev re tên ser Pira Galatayê. Îro kurmamê wan Evdilrezak, "mutercîm û teşrîfatçiyê" Sultan Evdilhemîd, ku ji wan pir mezintir e, bi wan re ye. Wî xwestiye herdu birayan bibîne. Wî nivîsareke direj li ser tarîxa kurdan û tarîxa Bedirxaniyan nivîsiye û dil dike nivîsara dirêj nîşanî Sureya ku ji nivîsînê hez dike, bide. Ew ê bi hev re, bi keştiyê derbasî aliyê Kadıköyê bibin û Evdilrezak Beg ê îşev bibe mêvanê wan. Lê berî çûyinê, pêşî Galata divê, bêyî Galatayê divê roja Stembolê neqede!.. hersê kurmam, hersê Bedirxanî, sê metelikên xwe dane tehsîldaran, derbasî ser pirê bûne û niha li doralî temaşe dikin.

– Galata, pira dewr û dewranê ye, Evdilrezak Beg, bi tiliya xwe, li aliyê din ê pirê, paytoneke şikestî nîşan dide û ji kurmamên xwe re dibêje. Tiştên ku li ser vê pirê qewimîne, ne şixulê hesab û gotinê ne. Tekerên gelek paytonan, çîpên gelek ker û bergîran, lingên gelek beg û xaniman, stûyê gelek hemal û barkêşan li vir şikiyane. Bizmarên textên raxistî jê derdikevin, text radibin û her cara ku pir ji bo çûyin û hatina keştiyan, bi şevan, vedibe, hemû dûzana wê xirab dibe. Sîwanek û du bastonên min bi xwe li ser vê pirê şikiyane. Lê eger ew neşikiyabûna, niha yan lingê min yan jî stûyê min şikestî bû.

Taximekî kincê nû yê reş li ser Evdilrezak Beg e. Simbêlê wî badayî, porê wî şehkirî ye. Îro wî fes nedaye serê xwe. Bejna wî dirêj, bedena wî lihevhatî ye. Tevî ku umrê wî ji Sureya gelekî mezintir e, ew ji wî ciwantir dixuye. Celadet hem ji kekê xwe hem ji kurmamê xwe hez dike. Ew xwe bi wan re pir kêfxweş û serfiraz hîs dike. Ji wan tiştên nû hîn dibe, jiyanê dinase, bîr bi qîmeta zanîn û perwerdeyiyê dibe. Celadet, di navbera herduyan de, destên wî li ser caxan, bi kêfxweşî li avaçûna tava sor û tîrêjên wê yên bêçare û jar dinihêre.

Gotina te rast e; min ji wan hez dikir. Gotina te aliyekî rastiya min e; kekê min Sureya û kurmamê min Evdilrezak ku ji bo min mamekî yekta bû, ji wan kesên ji bo min bijarte bûn, ku min ji wan hez dikirin. Ew hem hevalên min, hem mamostayên min bûn. Ez ji wan hem hînî kêf û henekê hem îlim û zanînê bûm. Bi xêra wan dîqet û haydariya zaneyan, jîrî û zîrekiya şerwanan, nermahî û henûniya delaliyan, serhildan û berxwedana bîreweran, daxwaz û xwesteka xortan, girîn û nalîna belengazan, tahm û bîhna deman ketin jîna min. Rê li ber min vebûn, deriyên dilê min ji bo rengên aso û keskesorê vebûn. Pêlên evînê bi ser min de hatin, ez bi ser pêlên windabûn û mirinê de çûm. Şer û pevçûn, berberî û dijîtî, derketî û xerîbî, zîzî û melûlî, stran û şiîr, av û bîr, êvar û şev bûn para jîna min. Ew bûn qedera min. Û li ser riya qedera min, kekê min û kurmamê min her bi min re bûm. Carina ew bi xwe, carina siya wan. Gotina te rast e; min ji wan hez dikir...

Di nav dengan de dengekî, ji nêz ve, tê guhê wan,

– Pis Kürd, alçak...

Ew hersê, bi carekê, serê xwe dizivirînin û li paş xwe dinihêrin. Li paş wan, li ser pirê, hema çend gav bi dûrî wan, barkêşekî simbêlqît, bar li piştê, ketiye erdê, lingê wî yê çepê heta ber çogê ketiye navbera du textên pirê. Ew dike, nake, nikare lingê xwe jê derxe. Barê pişta wî li erdê belav bûye. Çend kîsên kaxizî ketine erdê, sêv, porteqal û sewzên tê de jê pengizîne û belav bûne. Ew li milekî dixwaze lingê xwe rizgar bike li milekî jî dixwaze xwe bi meywe û sewzên belavbûyî bigihîne û wan berhev bike. Ew bi dengekî bilind, bi kurdî, dinale. Merivekî rîtenik, bejndirêj û kincxweş li ser wî sekiniye, diqîre ser wî û bi bastonê destê xwe zextan didiyê. Keçikek bejndirêj ku di umrê Celadet de ye, bi tirs û xof, li kêleka mêrik rawestaye û dixwaze alîkariya barkêş bike. Şênî hêdî hêdî li ser wan kom dibin. Merivê rîtenik diqîre û dide xeberan.

Evdilrezak Beg û Sureya hema xwe bi barkêş digihînin. Evdilrezak Beg, bi leza birûskê, destê xwe yê rastê hildide û destê xwe yê vekirî, bi hemû quweta xwe li ser rûyê merivê rîtenik dixîne.

– Pis ve alçak sensin, utanmaz adam!..

Kes fahm nake ka çi bû. Merivê rîtenik, bi lez û quweta gurmista Evdilrezak Beg, dikeve erdê û li ser barkêş gêr dibe. Keçik jî diqîre, dibe "baba, baba"ya wê û ew xwe davêje ser mêrik. Celadet bi tesîra bûyerê diheje. Dilê wî bi barkêş, merivê rîtenik û keçikê dişewite. Xelk li dora wan dicivin, ji çavên kurmamê wî agir diçirûsin. Ew bi hêdîka destê xwe davêje pişta keçikê û wê radike. Çavên wê bala Celadet dikişînin; coteke çavên badem bi şewqeke boş dibiriqin. Sureya û hinên din jî merivê rîtenik radikin û barkêş ji wê rewşa neçar rizgar dikin.

– Menşeyinden dolayı bir insana nasıl hakaret edebilirsiniz? Utanmıyor musunuz?

Hêrsa Evdilrezak Beg daneketiye. Merivê rîtenik xwe dide hev, pêşî li Evdilrezak Beg, Sureya û Celadet dinihêre paşê jî li dora xwe. Ew keçika kêlekê ber bi xwe dikişîne û porê wê mist dide.

– Özür dilerim, Abdulrezzak Bey, sinirlilik halimle, haddim olmadan telafuz ettim.

Mêrik ji Evdilrezak Beg dixwaze ku ew lê bibore, bi demargirî wî hin tiştên tewş gotine. Ew Evdilrezak Beg û Sureya nas dike. Ew jî li aliyê Kadıköyê dijî û cîranê mamê wan Murat Beg e. Navê wî Ali Siûd e, keçika li kêlekê, keça wî Canan e. Canan, bi çavên xwe, bi beden û endama xwe, bi evîn, jiyan û serpêhatiya xwe ya balkêş, li vir, li ser pira Galatayê dikeve nav rûpelên Bîra Qederê. Awirên wî li ser çavên keçikê, ji ber tesîra bûyerê, bêdeng, Celadet li dora xwe dinihêre.

3 Awirên wî li ser çavên zabit, ji ber tesîra bûyerê, bêdeng, Celadet li dora xwe dinihêre. Çend zabît û gelek esker vî danê êvarê yê xweş û aram ê 1906-an , hatine mala Emîn Alî Bedirxan. Piraniya wan li bexçê û dora malê ne, du zabît û du seresker jî hatine hundir û bi rêzdarî, li salonê, bi Emîn Alî Beg re dipeyivin. Celadet û Kamuran jî li nik bavê xwe ne. Jin li aliyê mitbaxê ne. Emîn Alî Begê ku ji mêj ve bû, li benda vê rojê bû, bi aramî, li zabitê ku pê re dipeyive, guhdarî dike.

Belê, ew roj hatibû, roja ku di jiyana Bedirxaniyan û Celadet de rûpeleke nû ye û rûpelên romana Bîra Qederê ber bi cîh, war û diyarên nediyar dibin. Çare nîn bû; ew roj dê bibûya perçeyekî qedera Celadet û rûpelên Bîra Qederê... Zabitê li pêşiyê rawestiyayî ji Emîn Alî Beg re sebeba hatina xwe îzeh dike. Di destê wî de jî kaxizeke zer û dirêj heye ku li serê biryara Sadrazam a sebeba hatina eskeran hatiye nivîsîn. Zabit bi rêzdarî biryarê dide Emîn Alî Beg. Emîn Alî Beg, tiliya mezin a destê çepê li ser simbêlê wî yê şehkirî, li biryarê dinihêre. Di binê biryarê de mohra nas a Sadrazam heye. Kêliyeke dirêj, ew li kaxizê dinihêre û difikire, paşê ew li Celadet û Kamuran ku hema li kêleka wî ne, dinihêre, bêyî ku tiştekî bibêje yan jî bide diyarkirin...

Heke te îzin hebe, bihêle, ez bi xwe behsa wê rojê bikim. Min ew roj dît, lê te bihîstiye û li serê xwendiye. Dîtin û xeyalkirin ne mîna hev in. Bihêle, çavên ku ew roj dîtine, bila bi zimanê bûyerê (ne bi zimanê romanekê) behsa wê rojê bikin... Fermana me rabûbû. Roj, roja fermanê, fermana me kurdan û Bedirxaniyan bû. Riyên welatên dûr û nenas, dîsan, li ber me vebûbûn, dîsan me dê xatir bixwesta û berê xwe bida welatên xerîbiyê. Hingê, wê rojê, salê min sêzde, yê Kamo yandzde bûn û diya min, piştî Hîkmet, Tewfîk, Safter û Meziyetê, zarokekî nû dipa.
Hingê, di wan rojan de, êdî haya min ji her tiştî hebû û bejn û bala min di cîh de bû.
Ew roj, tevî her kitkitê, tê bîra min. Her tişt bi mirina serekê belediyê, bi gotina hingê, şehremîniyê Stembolê

Ridwan Paşa dest pê kiribû. Danekî êvarê, li aliyê me yê Stembolê, Kadıköyê, Ridwan Paşa ji aliyê çar kurdan, bi demançê, hatibû kuştin. Kurd, kurdên me bûn. Hatin û çûyina wan a malên me, bi taybetî mala mamê min Alî Şamîl Paşa hebû. Alî Şamîl Paşa, bi dû kuştina Ridwan Paşa re, li wan kurdan xwedî derketibû. Ridwan Paşa... Ridwan Paşa'yê ku bû sebeba fermana me, mîna gelek kargerên dewleta Osmanî ku ji miletên din dihatin, dijminahî li me Bedirxaniyan dikir. Sadrazam hingî arnawd bû. Ew ji giranî, tesîr û nifûza Bedirxaniyan a li ser dewletê û Siltan Evdilhemîd ditirsiyan û li pey dek û dolaban bûn. Hemû Bedirxanî, lê berî hemûyan jî kurmamê min Evdilrezak û mamê min Alî Şamîl Paşa stiriyên çavên wan bûn. Evdilrezak Beg, bi gotina hingî, "Mabeyn mütercimî ve Şûra-yi Devlet Azası" bû. Alî Şamîl Paşa jî kumandarê qişla eskerî ya Selîmiyê, Üsküdarê û cîgirê "Hazretî Şehriyari" bû. Yanê li Stembolê gotina wan ferman, kirina wan qanûn bû. Ango ew li ber wezîr, paşa û kargerên mezin ên dewleta Osmanî kosp bûn.

Herkesî bi dijîtî û dijminahiya Evdilrezak Beg û Ridwan Paşa dizanîbû. Lê gava Evdilrezak Beg qonaxa xwe ya Şîşli'yê ava kir, dijîtiya wan hîn kûrtir bibû. Evdilrezak Beg dixwest rê heta ber mala wî ya nû were. Ridwan Paşa "şehremînî" bû, riya ku Evdilrezak Beg dixwest, nedida çêkirin... Çîrokeke evçend basîd bi vî awayî dest pê kir û dirêj bû. Teşqele, qîreqîr, şer û pevçûn li pey hev hatin û di dawiyê de jî, gava Ridwan Paşa û kurê wî Reşad, danekî êvarê, ji trêna Göztepeyê peya bûn, Ridwan Paşa bi heyşt guleyan kete erdê, ser axa rehmetê. Ew heyşt guleyên ku li canê Ridwan Paşa ketin, bûn sebebên fermana me jî. Wan heyşt berikan fersendeke welê da destê Sadrazam û neyarên din ên kurdan ku êdî tu kesî nikaribû rê li dek û dolabên wan bigirta. Êdî rê vebûbû; ew ê bi ser ketina, em ê jî ber bi sirgûniyê biçûna... Siltan Evdilhemîdê ku nîşan dabûn bavê min, mam û kurmamên min parastibûn û gotibû ku kurd û tirk bira ne, mohra xwe li bin biryara sirgûna me xist. Ne bi tenê Evdilrezak Beg, Alî Şamîl Paşa û kesên ku Ridwan Paşa kuştibûn, dê biçûna sirgûnê, em hemû, belê em hemû

Bedirxanî dê biçûna. Ne bi tenê Bedirxanpaşazade, lê çi kurdê ku bi awayekî pêwendiya wî û wê bi me re hebû, dê biçûya sirgûnê. Ne bi tenê ew jî, cîran, heval û dostên Bedirxanpaşazadeyan jî dê biçûna. Kerwana sirgunê pir dirêj bû. Em Bedirxanpaşazade bi qasî sedûşest kesî û kurdên ku bi me re têkiliyên wan hebûn, bi qasî sê hezar kesî, belê, sêhezar kesî, diketin ser riya welatên dûr. Em ji welatekî xerîbiyê ku lê hatibûn bicîhkirin, dîsan, diçûn welatekî din ê xerîbiyê. Bi gotina bavê min, "dewra felekê li ser me kîn bû", em lawên welatê xerîbiyê bûn, xerîbî qedera me bû.

Eger em dîsan werin ser wê rojê, zabitan wezîfa xwe dikirin; wan biryara fermanê ku bavê min bihîstibû, ji bavê min re gotin. Em ê heta sibê hazir bûna, wan ê jî li ber deriyê bexçê nobet bigirtana û berbanga sibê, em ê di bin çavnêriya wan de biçûna Galatayê. Belê, riya welatê nû yê xerîbiyê ji Galatayê dest pê dikir; ew herdu keştiyên ku dê me bibirana sirgûnê, keştiya "Mekke" û "Şewketî Derya" li wir, li benda me bûn. Şewket-î Derya, keştiyeke navdar bû, li Stembolê herkesî navê wê bihîstibû. Ew keştiyeke kevnare ya sirgûnê bû. Ji mêj ve bû ku wê muxalîfên dewleta Osmanî û Siltan Evdilhemîd dibirin welatên germ ên mixrib û ereban, cîhê sirgûn û windabûnê. Niha jî ew keştiya navdar û ya Mekkê ku jê nûtir û çêtir bû, ji bo me hatibûn hazirkirin.

Hin ji mamên min li Stembolê dijiyan, lê hinên wan jî li derveyî Stembolê. Gelek kesên ji malbata me ya fireh, bi wezîfên cihê yên dewleta "Osmanî Alî", li deverên cihê dijiyan. Lê biryara sirgûnê ji bo me hemûyan bû û her kesê ku Bedirxanpaşazade bû, diviya, bi gotina biryarê, li cîhê xwe "derdest" bûya. Evdilrezak Beg û Osman Paşa li Mabeynê, çend gav ji Siltan Evdilhemîd bi dûr, hatin girtin. Alî Şamîl Paşa li Qişla Selîmiyê, Husên Kenan Paşa li Yozgatê, cîhê ku ew lê miteserif bû, Kamîl Paşa li Hayfayê, Mihemed Elî û Mehmûd Beg li Beyrûdê, Mîthed, Murad, Hesen, Evdirehman û Bedrî Paşa li malên xwe hatin "derdest" kirin. Kekê min Sureya jî li xwendegehê, Mekteb-î Sultaniyê... Ew Mekteb–î Sultaniye ku mektebeke bijarte bû û serek û kargerên pêşerojê yên Dewleta Osman-i Âlî

digihandin û hema çi bigire cîhekî muqedes bû, wê rojê tijî esker û zabît bûbû, ji bo kekê min.
Heye ku haya te jê hebe, di wan rojên sirgûnê de, kitêbokek bi navê "Emîr Bedirxan" derket. Kitêbok ji aliyê zanayên kurdên Stembolê û bi îmza "Lutfi" weşiya. Li wir behsa kuştina Ridwan Paşa û sirgûna me jî dibe. Hingî li ser kuştin û sirgûnê gelek tişt di cerîdeyên osmanî û fransizî de hatin nivîsîn. "Le Figaro" bi dirêjî li ser bûyerê nivîsî. Kurdan jî bi kitêbokê bûyer îzeh kirin û Siltan mîna curimdarê vê sirgûna ku mala gelek û gelek kurdan şewitan, îlan kirin. Herwekî ku wan jî digot, sirgûn, ne ya çend kesan bû, ew ya zar û zêç, kal û pîr, jin û pîrejinan bû. Sirgûn, ne ya cezakirina kuştinekê û mêrkujan bû, ew a kavilkirina malan, şewitandina dilan bû. Sirgûn, sirgûna me kurdan bû. Galata dê îcar jî bibûya şahîda bûyereke nû ya tarîxî; Galata, pira evîn û evîndaran, şahida tarîx û bûyeran, pira ku min jê ewçend hez dikir, dê niha li pey me, li pey keştiyên ku dê ji Marmarayê ber bi Zerya Spî giran giran xwe li ba bikirana, zikê avê biqelişandina û em, bi sedan meriv; zarok, jin, kal, pîr, paşa, zabit, karmend, xwende, bibirana deverên dûr, wê dê desmal hilda û bi zîzî strana veqetînê bigota.
Di berbanga dotira rojê de Galatayê destmal hilda. Qayiqên eskerî hatin û em birin keştiyan ku hinekî ji Galatayê dûr lenger avêtibûn û li benda me bûn.
Ez çi bibêjim?.. Galatayê strana zîz a veqetînê digot... dewra felekê li ser me kîn bû...

4 "Dewra felekê li ser me kîn e / Bextê me reş e, kezeb birîn e; / Mesken ji me re niho nivîn e, / Binve kezeba min binve lo! lo!.."

Li bajerekî dûr, pir dûr, Akkayê, di keleheke kevn û qaîm de, li bexçeyekî biçûk, Emîn Alî Bedirxan li kêleka bîra bexçê rûniştiye. Li lawê xwe yê biçûk Bedirxan ku li ser ejnûwên wî dirêj bûye, dinihêre. Jina wî Samîha Xanim û zarokên wî, ji Sureya pê ve, li dora wî ne. Bedirxan hê zarokê berşîr e. Ew zarokê sirgûnê

ye, li sirgûnê hatiye dinê. Di vê jiyana nû ya dijwar a sirgûnê de bi tenê bûyina wî kêfxweşiyek daye malbatê. Bi gotina Emîn Alî Beg, di sala 1906-an de, divê bi tenê bûyina Bedirxan bi bîr were. Ne tiştekî din, ne bûyereke din. Hatina Bedirxan şênahiyek û kêfxweşiyek xiste nav zarokan. Samîha Xanim pê şa bû, zarok pê bûn xwediyê kahniya kêf û lîstikê. Emîn Alî Beg jî li serê şiîr nivîsîn û Mezoya biçûk, keça malê, Meziyetê jî li dorê, bi zimanê xwe yê hûrik û şêrîn, stran gotin.

Niha, di vê roja payiza 1906-an de, Bedirxan nexweş e. Çavên wî venabin. Şênahî û kêfxweşiya malê, bêhal bêhereket, mîna çira ber destê sibê, vedimire. Ji dengê zîz ê Meziyeta biçûk pê ve, tu deng dernakeve. Bi tenê ew, li kêleka bavê xwe, li "Berxo" dinihêre û hêdî hêdî şiîra bavê xwe dinehwirîne. Di jiyana kesertijî de, vî danê êvarê jî, li kêleka bîrê, dîsan keser heye.

Jiyana sirgûniyê ya Emîn Alî Beg û mala wî, piştî rêwîtiyeke dijwar, di keleha bajarê Akkayê de dest pê kir. Bedirxanî her yek bi derekê de hatin şandin. Keştiyan ew, mîna pelên payizê ku yek bi yek ji darê diweşin, li dever û bajarên nenas peya kirin; Evdilrezak Beg, Alî Şamîl Paşa, Osman Paşa, Mithed, Hesen, Xelîl Beg li Trablusgarbê hatin peya kirin û zîndankirin. Yên din jî li Rodos, Nablus, Şam, Akka, Yemen, Tayif û hin bajarên din hatin belavkirin. Cîhê jiyana sirgûniyê ya Emîn Alî Beg û malbata wî bajarê Anatoliyê Sparte bû. Ew li keleha Akkayê, di bin çavnêriya ordiyê de, li benda çûyina Spartayê man. Rêwîtiya wan dewam dikir. Lê jiyan, jiyan bû. Jiyana nû li rêwîtiyê guhdarî nedikir, Bedirxan, di berbangekê de hatibû û bûbû pardarê jiyana wan. Bi hatina wî re, Emîn Alî Begê jî dest pê kiribû, piştî nîvroyan, li kêleka bîra bexçê rûne û şiîran li ser "berxê xwe" binivîse. Tu tiştê ku wan di wê kelehê de bikira nîn bû. Piştî nîvroyan Celadet û Kamuran ji bîrê av dikişandin û pê bexçe av didan, kursî û masa bavê xwe tanîn û li kêleka bîrê datanîn. Samîha Xanimê jî sêv û porteqal perçe dikirin, ew dikirin sêniyekê biçûk û datanî ser masa mêrê xwe. Hîkmet, Tewfîk, Safter û Mezo jî bi Bedirxan re dilîstin û ew dilorandin.

Lê niha Mezo dinehwirîne; "Ne mal û ne saxî û ne rahet, / Talan kirine hemî ji mîhnet; / Dijwar e gelek belayê xurbet, / Binve kezeba min binve lo! lo!.... Hewqas tu mebêje ev çi hal e / Bê sebr mebe welê menale; / Ewn û kerema Xwedê heval e, / Binve kezeba min binve lo! lo!..." Ew hem digirî, hem dibêje. Samûha Xanima ku li kêleka mêrê xwe rûniştiye, jî bêdeng digirî. Vî danê êvarê ji bîrê av nehatiye kişandin, Ceco û Kamo bexçe av nedane, li ser masê sêv û portakal nîn in, kes li esmanan nanihêre, teyr li esmanan naxuyin.

Bedirxan, Berxoyê mala me, mir. Li ser ejnûyên bavê min, bi dengê zîz ê xweha min... Xurbet bû, jîneke dijwar û kirêt bû, bêgavî û bêçaretî bû. Şiîra bavê min ku navê wê "Delaliya Zarowan" bû, lorînek bû, qîrînek bû. Dengekî nerm mîna hewreşîn, xurt mîna pola bû ku li dijî bêgavî û bêçaretiyê bilind dibû. Bi dû re, sala 1932-an, min ew şiîr di HAWAR'ê de weşand, tevî nivîsareke kurt. Navê nivîsarê "Loriya Bedirxan" bû. Di şeveke ronî ya havîna germ a Şamê de, ez firiyam û çûm nik bav û bapîr, dê û birayê xwe Berxo û min ew nivîsar nivîsî. Min di nivîsarê de weha digot; "Bi vê loriyê ne bapîrê min Bedirxan, lê neviyê wî, birayê min Bedirxan dinivînand û dilorandin. Ev loriya ha ko bi xwe, bi ziman û mana xwe ve hêja ye, ji bona min, ji hêleke din bîreke mezin û zelûl e. Pê bapîr, bav, dê û birayê min -ko her car ji zûda gehîştine rehmeta Xwedê- têne bîra min.

Ji ber ko Bedirxan navlêkirî ye, tê de navê bapîrê min heye. Ew Bedirxanê ko bi xurtî û mezinahiya xwe ve navê xwe, li şûna navê malbatekê xistiye. Ew Bedirxanê ko ji bona yekitiya Kurdistanê xebitiye, ji bona serxwebûna Kurdistanê ketiye şer û qrênan û her tiştên xwe di vê riyê de feda kiriye û ji bona wê jî miriye.

Ev lorî bavê min ji birayê min re gotiye. Ew bavê ko ji min re ne tinê xwîna xwe a pak daye -ew xwîna kurdî ko bi hezar salan ve di zozanên Botan de bi bayên bakurî honik dibû û di Cizîrê de di nav germiya lat û zinarên Burca-Belek de dikeliha û her gav di meydanên şer û rûmetê de ji sîngên dahatiyên malbata Azîzan dihat rêtin û ji rayên

wan vedimîzt -lê ez ji dil û hişê kurdanî bi xwedî kirim û xistim wê riya ko ew bi xwe û bavê wî tê de mirin.
Ev lorî, diya min distrand û pê birayê min dinivînand. Ev diya ko gava ez hejdeh, niwanzdeh salî bûm û min dil kir ez bikevim mekteba herbiyê, ji min re gotibû: -Ma ji te re ne namûs e? Tu çawan bikevî mekteba herbiyê û bibî zabitê tirko. Ev tirko ko welatê te ji destê te standine, miletê te xistine xulamiyê, bapîrê te dîl û malbata te pêrîşan kirine û hon avêtine zîvariyê.
Ev loriya ha ji birayê min ê kiçîk Bedirxan re dihat gotin. Ev birayê ko Xwedê di menfayê de da û di menfayê de standibû. Ev birayê kiçîk û delal ko di nav sê çar saetan de ser ejnûwên bavê min, di keleha Akkayê de mir..."
Bibore ku min weha dirêj kir. Lê carina veguhezandina nivîsarên kevn dikarin xweş alîkarî li yên nû bikin û saloxdanên çêtir bînin pê.

Xwîdan li ser eniya Emîn Alî Beg civiyaye. Ew li lawê xwe yê biçûk dinihêre. Bi destê xwe yê rastê serrûyê lêwik, bi hêdîka, mist dide. Dilopên xwîdanê û giriyê bi ûsil dikevin nav hev. Dilopên avê yên li ser kevirên bîrê, bi aramî û rêzdarî, hevaltî li dilopên din dikin. Kerba bêçaretî û kesera veqetînê, bi ûsil, dilên li dora bîra keleha Akkayê diguvişînin. Bîra bêdeng ku bûye pardarê jiyana rojane ya dilên derketî, niha jî, bi ûsil, bi wan re li şînê rûdine.

5 Bîra bêdeng li Spartayê ku bûye pardarê jiyana rojane ya mala Emîn Alî Begê, niha jî, bi ûsil, bi wan re di şînê de ye. Şîn ji malê kêm nabe. Her gav ew xebereke nexweş dibihîsin, xebera mirina yekî hezkirî bi wan digihê. Digel ku malbata Bedirxanî li her aliyên tixûbên dewleta Osmanî hatine belavkirin, ew xeberên xwe digihînin hev. Xeberên jiyana menfayê, xeberên keser û hesretê. Berî niha bi du rojan, di vê zivistana 1907-an de, xebereke nû ya nexweş gihiya wan; Alî Şamîl Paşa li zîndanên Trablusgarbê wefat kiriye.

Emîn Alî Begê her xeberên nexweş ên Alî Şamîl Paşa û Evdilrezak Begê dibihîst. Dewlet bi taybetî li ser herduyan disekinî. Jixwe Evdilrezak Beg bi îdamê hatibû cezakirin, lê di deqa dawîn de Padîşah cezayê wî qulipandibû ser hepsa muebed. Herçî jiyana wan a zîndanê bû, gotin têrî kirêtî û dijwariya wê nedikirin. Evdilrezak Begê, bi alîkariya zabitekî dostê wan, xeberên xwe yên zîndanê bi "dinya derve" gihandibû. Li gora vê xeberê, ew di odeyeke tarî de hatibû zîndankirin, wî, bi mehan, ji nobedarê ku jê re xwarin tianî pê ve, tu kes nedîtibû, ew derneketibû derve, odeya wî ya zîndanê ewçend tarî bû ku wî roj û şev tevî hev kirine, mişkên mezin bûne hevalên wî yên zîndanê. Rewşa girtiyên din jî, kêm-zêde, weha bû.

Dilê Alî Şamîl Paşa yê maxrûr û serbilind dê çawan li hember vê rewşa nizm û kirêt xwe rabigirta?.. Mirina Alî Şamîl Paşa bû darbeyeke xedar û mîna zompekî giran, li ser sînga Emîn Begê ket. Alî Şamîl Paşa kekê wî bû, bi dû Hemîd Tellî Begê re, mezintirîn lawê Mîr Bedirxan bû. Ji ber ku Hemîd Tellî Beg kor bû û ji wan bi dûr, li Şamê, dijiya, mezinê malbatê li Stembolê Alî Şamîl Paşa bû. Ew nexwende, lê bîrewer û xurt bû. Qehremaniyên wî yên şer û pevçûnan li ser zimanan bû. Mîr Bedirxan, malbata Mîr, Bedirxanîbûn, welatê bav û kalan Cizîra Botan her tiştê wî bû. Lê wî niha çavên xwe li welatekî pir dûr, di zîndanekî tarî de girtibûn û dewletê rê nedabû ku meyitê wî bişînin Cizîra Botanê yan jî Stembolê. Ew mîna kesekî bênas, bêheval, bêkes, bêpişt, li axeke nenas hatibû veşartin. Şîna wî nehatibû girêdan, xwişkên wî di şîna wî de li ser xurtiya wî nelorandibûn, birayên wî li ser gora wî fatîhe nexwendibûn. Ew her yek li derekî belav bûn. Bi taybetî jî vê yekê Emîn Alî Beg gelekî diêşand.

Niha ew li şîna birayê xwe rûniştibû. Bi kê re? Hema bi tu kesî re. Li Spartayê, hema çi bigire, qet nasên wan yan jî kurd nîn bûn. Bi tenê li derveyî Spartayê, nêzîkê Yalvaç û Gelendostê

çend malbatên kurd hebûn. Berî niha bi 50-60 salan, di navenda 1800-an de, ew ji deverên Hakkarê hatibûn sirgûnkirin. Çaxa wan bihîstibû ku Emîn Alî Beg, lawê Mîr Bedirxan, hatibû Spartayê, ew hema hatibûn serdana wî. Pêwendiyên wan û Emîn Alî Begê bi hev re hebûn. Niha jî di şîna Alî Şamîl Paşa de, ew derin û tên mala Emîn Ali Beg.

Mala ku Emîn Alî Beg û zarokên wî tê de dijiyan, di navenda Spartayê de, maleke du qatî û bi bexçe bû. Kes û nasên wan li bajêr nîn bûn. Emîn Alî Beg hertim li malê bû, bi tenê carina diçû "Tüccarlar Klubü" ya bajêr û li wir ji eşraf û begên bajêr kesin didîtin û bi wan re li ser hal û hewalê dewleta osmanî û bûyerên rojane dipeyivî. Dewletê her meh maeşekî biçûk didayê û malbatê bi wî maeşî, bi zehmetî, debara xwe dikir. Gava ew nû hatibûn Spartayê û ev xanî peyda kiribûn, hingê xanî ne ewçend têkûz bû; bexçe xirbe, bîra li bexçê miçiqî û devgirtî, kevirên nêrdewanên herdu qatan şehetî, siwaxa odeyan rijiyayî û her der gemarî bû. Avakirina xênî ji bo malbatê bû meşgaleyeke baş. Tevî du karkerên ermen ên bajêr, wan di nav çed mehan de mal kirin mîna qesrekê. Banê xênî ji nû ve hate raxistin, siwaxeke spî li dîwaran hate reşandin, mitbax bi carekê lêbû, serşokeke nû çêbû, kevirên pêpîlokên nêrdewan bi kirêca spî hatin qaîmkirin, devê bîrê vebû û gemariya tê jê hate derxistin û bîr ji nû ve hate vejandin û bexçe bû bexçeyekî kesk û şîn, tê de lemên xiyar, qitik, firengî, îsot û bacanan bejn avêtin. Di avakirina van hemû tiştan de Celadet û Kamuran mîna du mûriyên karker her alîkarî li karkeran kirin û bi şev û roj xebitîn. Heta katekê Hîkmet jî alîkariya wan kir.

Wan li Akkayê, li kêleka bîrekê, jiyaneke pepûk winda kiribûn. Lê bîra mala wan a Spartayê jiyan dida bexçê. Karkerên ermen dora devê bîrê bi du qor kevirên nehît, pir xweş, mîna birceke kelehekê lêkiribûn, bîreke genî û xetimî qulipandibûn ser avahiyeke spehî.

Tu dizanî, gotineke birayên me asuriyan heye, dibêjin, "Ava bîran bi tedbîr e." Me jî ava bîra xwe bi tedbîr bi kar tanî, lê digel vê, wê têra her tiştê me dikir. Destê bavê min pir teng bû. Bi xêra bîrê, me sewzên malê hemû li bexçê diçandin. Em li Spartayê mêvan bûn. Em ê, îro, sibê, biçûna. Lê belê, herçend em mêvan bûn, ewçend jî em li wir dijiyan. Bavo û me jîneke rojane diviya. Menfa bêyom bû, xeber nexweş bûn, li bajêr xêrxwaz kêm bûn, best û kêf nîn bûn, coş dûr bû. Bi kurtahî, jîn xerîb bû, jîna xerîbiyê bû. Digel vê hindê, ew jîn bû.

Sparte bajarekî kevnare û biçûk ê têkel bû, tê de tirk, rûm û ermen hebûn. Hin dibistanên tirk, ermen û rûman li bajêr hebûn. Ji nav wan dibistana Aramyan a ermenan hem pir xweş hem jî navdar bû. Me di dibistanên tirkan de dest bi xwendinê kir. Li malê jî bav û diya min û Şehrîban ku bi me re hatibû, tevî bira û xweha min, rojên wekhev li hev zêde dikirin. Herwekî te got, hin mal û eşîrên kurdan jî li der û dorên Spartayê hatibûn cîwarkirin. Carina bavê min diçû serdana wan. Gava çûyina wî dihat rojên îniyan, ku hingî em nediçûn dibistanê, ez û Kamo jî pê re diçûn. Em ji Deşta Spartayê dibihurîn û diçûn nav eşîrên kurdan, konên wan ên reş. Carina jî bavê min hemû mal bi xwe dibir seyrangehê, Gola Kovada û Geliyê Aksu. Li dora golê darên kevn, qehûm û xweş ên gwihîz, bî û spîndaran hebûn. Me mehfûrên xwe li binê daran radixistin, xwarinên ku diya min û Şehrîbanê hazir kiribûn, derdixistin û ew dixwarin. Mîna niha tê bîra min; hingî bavo pişta xwe dida darekê û rojname û kitabên xwe dixwendin. Mezo jî bi dengê xwe yê xweş stran digotin. Ez û Kamo û Hîkmet li nav daran digeriyan û Tewfîk û Safter jî li dora diya min û Şehrîbanê dibeziyan.

Îro hin serekeşîrên kurdan hatine û sersaxî ji Emîn Alî Beg û kurdan re dixwazin. Ew li kêleka Emîn Alî Beg li ser doşek û mehfûrên rengîn rûniştine, qahwa tahl vedixwin û dibêjin;

– Bila serê we, serê me, serê kurdan sax be. Rehma xwedê lê be, Alî Şamîl Paşa, lawê mîrê me yê mezin î gorbehîşt çûye re-

hmetê, lê ruhê wî yê şad bijî. Li menfayê şîn dijwar e. Lê menfa mêvanî ye. Qey Xwedê dê rojekê vegera me jî bike nasîbî me. Çavê me li rê, li benda wê rojê ye...

6 Xwedê ev roj jî kir nasîbî me, çavê me li rê, li benda vê rojê bû... Ji kêfa Amojna Sitî re payan tune. Emîn Alî Beg, tevî jin û zarokên xwe, vegeriyaye Stembolê, mala xwe. Amojna Sitî zarok û neviyên xwe, dîsan, bi çavan, dîtine. Bedirxanî yek bi yek, ji deverên dûr, vedigerin. Derketî û muxalifên Siltan Evdilhemîd ku ketibûn ber xezeba wî, vedigerin. Heyameke nû dest pê kiriye, ba û pêlên nû hawirdor vegirtine. Bîhna serbestî û azadiyê ji Stembolê û deverên dewleta Osmanî difûre. Sala 1908-an bi coş û heyecaneke boş, bi rûdan û bûyerên tarîxî diqulipe ser sala 1909-an.

Belê, li gora "waqa'nûser" û tarîxnasan, rûpeleke nû ya dewleta Osmanî vebûye; Meşrûtiyeta Duwemîn dest pê kiriye. Êdî Siltan Evdilhemîd ne desthilat e. Gerçî ew hê jî siltan û serekê dewletê ye, hê jî li saraya Dolmabahçê, Yıldız Sarayıyê mîna padîşeh, li ser textê zêrîn rûniştiye, lê nema "hakîmê mutleqê" dewletê ye. Êdî sadrazamên wî nîn in, hukumetên wî nîn in, teşkîlata wî ya îstîxbarat û sîxuriyê nîn e, ordiya wî nîn e. Stêrkên ku di esmanên Boğazîçiyê de dixurûcin, yên wî nîn in. Karîna dewletê û çerxa gerandina karên wê ketiye destê komeleyekê ku jê re dibêjin "İttihat ve Terakki Cemiyeti." "Ittihat ve Terakki" ku xwe mîna "Nigehbân-i Meşrutiyetê" dibîne û dê di rûpelên bê de gelekî tesîr li rê û xaçeriyên romana Bîra Qederê bike, piranî ji zabit û sereskeran hatiye pê.

Kes, hêz û quwetên ku ji hukimdariya Siltan Evdilhemîd nerazî bûn, gihîştin hev û di rêberiya "İttihat ve Terakki Cemiyeti" de li dijî Evdilhemîd serî hildan. Û niha serhildan bi ser ketiye; Evdilhemîd hemû şertên serekên serhildanê qebûl kirine. Sadrazam guheriye, hukimet guheriye, gelek ji paşa û sereskeran

guherîne. Kanûn-i Esasî ku ji sala 1876-an û vir ve bi kar nedihat, qebûl bûye, Qanûna Tatîl-î Eşgal ku pêwendiya karker û karbidestan bi rê dixîne, derketiye. Azadiya çap û çapemeniyê qebûl bûye. Hilbijartina giştî çêdibe, Meclis-î Mebûsan ku daxwaza herî girîng a serhildanê bû, vedibe.

Jiyana siyasî ya dewleta Osmanî ji binî ve diguhere. Bi gotina rojnamên Times û Ikdam'ê, dewlet û Stembol diçelqe. Li her derê civîn, xwepêşandan, meş û xeberdan heye. Hemû çîn û komên civata Osmanî li pê ne û li pey mafên xwe ne. Gelên netirk yên Dewleta Osmanî li hêviya mafên xwe yên neteweyî ne. Meydan vebûne, qîrîna serbestî û azadiyê bilind dibe; "Yaşasın hüriyyet!.. yaşasın adalet!.. yaşasın eşitlik!.."

Navenda van hemû guherîn, bûyer û rûdanên tarîxî jî, bêşik, Galata û doraliyên Galatayê ye. Li milekî Cade-î Kebîr, Beyoğlu, taxên ermen, cihû, yewnan, îtalî û balyozxanên dewletên Rojava, li milekî jî Bab-i Alî û Cağaloğlu, Galata dîsan bûye şahîdeke bêhempa, dîsan bûye hoste û tarîxeke nû dihûne, bûye zêrker û wextê dineqişîne, bûye waqa´nûser û her tiştî derbasî defteran dike.

Keştî tên û hinekî ji Galatayê bi dûr lenger davêjin û bi qayikan derketiyên azarkêş ên do dişînin Galatayê da ku Galata wan hembêz bike, xêrhatinî li wan bike, birînên wan bicebirîne, wan ji nû ve têxe nav jiyana Stembolê ya tevlihev.

> Stembol; qedera min, navenda jîna min. Stembol; warê hatin û hebûna min, siya min. Stembol; li welatê xerîbiyê welatê min, welatê xerîbekîli welatê xerîbiyê, ji Kurdistanê dûr Kurdistana min... Em dîsan vegeriyabûn Stembolê, mala xwe. Kekê min Sureya jî, ji Misirê, hatibû. Mal şên dibû, malbat geş dibû. Her roj Bedirxanpaşazadeyekî, bîranîn û tecrubên kirêt û nexweş ên menfayê pê re, dihat. Evçend tecrubên mezin, fireh û kûr. Evçend rengîn û pirali. Kîjan gotin dikarin têrî taswîrkirina wan bikin? Ax ev gotinên bêkêr, bêkeys û bêruh!.. Tu jî, mîna herkesê ku

xwe dispêre gotinan û dixwaze ji wan jîneke nû bîne pê, dixwazî (yan jî em bibêjin, hewl didî) ruh bidî gotinan, can bidî wan rojan... Lê tu dê bi kîjan gotinan bikaribî vegera me û wan rojên şoreşê yên Stembolê vejînî?

Em vegeriyabûn. Mal li hêviya me bû. Metên min, Amojna Sitî ku taqeta wê nîn bû, bi me re bihata menfayê û li nik meta min Melekê dijiya, li hêviya me bû. Kadıköy, Stembol û Galata li hêviya me bû. Heyama nû ya tevîhev, jîna nû ya nenas li hêviya me bû. Lê pêşî me miriyên xwe ziyaret kirin û ew defn kirin. Madame Stella, yan jî bi gotina min Madame Tikanis, kahniya germahiyê, wefat kiribû. Ez, Dayê, Şehrîban, Kamo û Mezo çûn Goristana Yewnanan û me gora wê ziyaret kir. Alî Şamîl Paşa li menfayê wefat kiribû. Bav û mamên min cenaza wî dan anîn û me ew li Goristana Karacaahmet ku gelek Bedirxan-paşazade lê razayî bûn, veşart. Mihemed Begê Wanî ku Ridwan Paşa kuştibû, li zîndanên Trablûsgarbê di bin îşkencê de wefat kiribû. Cenazê wî hat û me ew li Goristana Üsküdarê defn kir. Dapîra me hemûyan Rûşen Xanim li Şamê wefat kiribû. Ji bo wê, me li bexçê mala xwe şitleke dara henaran çand.

Menfa bêşop nebihurîbû.

Piştî miriyên me, em çûn Galatayê, pêşiya derketiyên xwe. Ew dihatin, ji Behra Spî, mîna pêlên wê. Rojekê ez, Bavo, kekê min Sureya, Kamo û hin ji mam û metên min, em çûn pêşiya mamê min Husên Paşa. Ew ji Taifê dihat. Mewlanzade Rifat Beg ku dê di rojên bê de bibûya mamoste, hoste û hevalê min, pê re bû. Ew jî ji Yemenê dihat. Galata dîsan bûbû roja mahşerê, deng digihiyan esmanan. Her celeb însan, her celeb erebe û payton li wir bûn. Bi hezaran kes hatibûn û li hêviya derketiyan bûn. Derketiyên ku di bêdengiya berbangên sibê de çûbûn, niha di mahşera danên êvarê de dihatin. Ew deqa ku mamê min hat, mîna tabloyeke rengîn tu carî ji bîra min neçû. Bavo dest da wî, ew, bi alîkariya Bavo, ji qayikê peya bû. Dest di destan de, bîskekê, bi çavên kentijî û şil, li hev nihêrîn û paşê hevûdu pihêt hembez kirin. Hingî wext sekinî...

Amojna Sitî ku êdî bi zehmetî digere, heta bi zehmetî xwe dilivîne, ji bo law û neviyên xwe, vê êvarê, nanê tîrê pijandiye û xwarinên welêt, yên Cizîra Botanê, çêkirine. Bîhneke ecêb xweş ji xwarinên singûsîr, pelezîz, eprax û epraxê sîran difûre. Tevî Samîha Xanim û Şehrîbanê, Meziyet, Safter, Tewfîk û Hîkmet jî li mitbaxê, li dora wê ne. Ew hem li xwarinan dinihêre û hem jî bi zarokan re, bi kurdiya xwe ya paqij, dipeyive. Bask nîn in ku ew pê bifire. Zarok, melayikeyên rastîn li dorê ne, geşiya ruhê wê dîsan hatine.

– Epraxê sîran bidin pîran. Epraxê birincan bidin law û gencan... Amojna we li dora we bigere, berxikên min, rindikên min, ew dibêje û Safter maç dike.

Mîna ku straneke nû ya osmanî dibêje; dinya xweş e, wext û dewran xweş e.

FOTOGRAF 4

Evîndarê evînê, şagirtê Ovidius; Celadet

1 Dinya xweş e, wext û dewran xweş e. Ji salan 1909, ji mehan nîsan, ji rojan jî 10 e. Bihar bi kirasê xwe yê kesk, bi rûyê xwe yê gewher hatiye. Galata, Beyoğlu û Cade-î Kebîr bi şênî û alên Osmanî tijî bûne. Beroşa siyasî ya dewleta Osmanî dûkel e, bûyer li pey hev tên, guherînên mezin her li dar in. Îro jî dîsan guherîneke mezin hatiye pê; Siltan Reşad hatiye ser hukim û li ser textê zêrîn ê padîşahiya dewleta Osmanî rûniştiye. Bi vê guherînê, herkes bawer dike ku rûpeleke nû vedibe. Û dewlet û Stembol vê rûpela nû pîroz dikin û di kêfa vê rûpela nû de ne.

Tevî vê rûpela nû ya dewleta Osmanî, navekî nû û girîng ê romana Bîra Qederê jî, îro, dikeve nav rûpelên romanê; Rûşen, yan jî bi gotineke din Rewşen... Belê, ji xwarziyê Emîn Beg û pismamê Celadet, Mihemed Salih re keçek bûye. Mihemed Salih ku tevî bermaliya xwe li Qeyseriyê dijî, mizgîniya bûyina keçikê, hema di cîh de, bi telgrafê, bi Stembolê gîhandiye. Ew di telgrafa xwe de bi kurtî weha dibêje; "Saadetli Emin Beyefendi Hazretlerine... Bir kızım oldu. Hepimizin gözü aydın. ismini merhum ninemizin hatırasına Ruşen koyduk..."

Îro, di vê roja tarîxî de, Celadet, tevî birayê xwe Kamuran û çend hevalên xwe, li ser Cade-î Kebîr, li studyoya "Apollon Fotografhanesi" ne. Berî îro bi du hefteyan, Celadet li vir fotograf daye kişandin û îro jî, di nav vê hatin û çûyina boş de, ew hatiye fotografa xwe werbigire. Ew, Kamo û hevalên wî, bi hev re, li fotografê, kaxiza nemir, dinihêrin.

Fotograf reş û spî ye. Celadet ku niha şanzde salî ye, li kamerayê dinihêre. Bedlekî kincên reş lê ye. Digel ku ew hê gelekî xort e, nêrîn û rawestina wî, awir û lixwekirina wî ya peyayên gihîştî ye. Ew, li piyan, mîna aktorekî ku hay ji xwe û ji karê xwe heye, hinekî xwar sekiniye. Hemû rûyê wî dixuye, lê ne herdu guh, bi tenê guhekî. Porê wî, pir xweşik, bi paşî de şeh bûye. Ji aliyên herdu cênîkan por kurt jêbûye. Guhê çepê ku li ser kaxiza nemir dixuye, dirêj e, ji guhekî normal dirêjtir e. Enî mîna asoyeke zelal yan jî heyveroneke spî, vekirî ye. Li ser enî tu xêzên qermiçî yan jî siyên umir û jiyanê nîn in, jiyanê hê enî bi şopên xwe yên kûr neneqişandiye. Enî mîna kaxizike spî ku hê tiştekî lê nebûye, dixuye. Enî jî mîna beden, rû, mil û sîng fireh e. Navçav jî her weha ye, ew mîna giravekê ku di navbera du lehiyan de ye, dixuye. Birûyên wî mîna lehiyan ewçend dirêj, reş û gur in. Birû û di navbera wan de navçav firehiya enî temam dikin. Herçend firehiyek di navbera por û birûyan de heye, ewçend jî navberiyeke ji normalê zêdetir di navbera birû û çavan de jî heye. Piştî enî tiştê herî balkêş ê li ser rû çav in. Çav reş in; mîna du kahniyên kûr, mîna du stêrkên çirûsî dixuyin. Çav li pêşiyê, li kamerayê dinihêrin. Cîddî û giran, kûr û manedar. Germahî û balkêşî, tesîr û nermî ji çavan dixuyin. Meriv xwe ranagire û li çavan dinihêre. Poz jî, mîna çavan, balkêş e. Herwekî hemû pozên Bedirxaniyan, pozê Celadet jî gir û dirêj e. Lê dirêjahiyeke lihevhatî û xweş. Bi gotina dapîra wî Ruşen Xanimê, pozê Celadet mîna pozê beranan e. Tevî ku fotograf ne ewçend mezin e, dîsan jî difnên poz jê baş dixuyin. Difn jî fireh in. Hinarik û gum jî li gora rûyê gulover in; fireh.

Dev ku li gora enî, çav, guh û poz, pir biçûktir e, girtî ye. Lêv bi awayekî rehet û serbest li ser hev in. Kortahiyeke biçûk di navbera lêvan û çenê de heye. Ji vê kortiyê jî hîn biçûk, kortiyeke din jî di çenegehê de dixuye. Guloveriya rû bi çenegehê temam dibe.

Belê, rû esmer, gulover û dirêj e. Li ser rû hê ne simbêl ne jî rîh heye. Rû, rûyê xortekî nûhatî, jiyaneke teze, ruhekî geş e.

Ewçend paqij û rind, masûm û hêvîdar, ewçend ji şopên derd û keseran bi dûr. Lê eger meriv pir baş li fotografê binihêre, heye ku meriv di kûrahiya çavan de hin nîşandekên keserê bibîne.

Rû nakene, awirekî cîddî li serê ye. Cîddiyeta li ser rû ji xortiya rû pir zêde ye.

Herçî stû ye, qut û qaling e. Jixwe gomleg heta ber devê qirikê hatiye. Stû zêde ne xuyaye. Gomleg spî ye û li gora moda salên 1900-an e. Qirawateke reş pê ve ye. Gomleg û qirawat ahenga kincan temam dikin. Kincên reş, êlegê reş, gomlegê spî û qirawatê reş. Reş û spî, pir bi zanîn, li hev hatine anîn. Yaxeyên gomleg û çakêt jî li hev in, herdu jî dirêj in. Pêşiya çakêt vekiriye û jê êleg xuyaye. Êleg perçeyê "kostymê" e û ew bi şeş qumçikan heta jor girtî ye. Çakêtê kriwazor, gomlegê stûdirêj, êlegê pirqumçik, qirawat... ev hemû nîşanî daxwaza mezinbûyin, zilambûyinê ne.

Tiştê herî balkêş ê fotografê, tevî rawestina Celadet, destên wî ne. Wî pêşiya çakêt vekiriye, ji herdu aliyan hinekî ber bi paş biriye û destên xwe ji ser re xistine bêrîkên pantolonê xwe. Bi van destên di bêrîkan de, tablo temam dibe; xortekî ji xwe bawer, emîn, razî, maxrûr, têgihîştî, jîr, bikêr, xurt, lê di eynî wextê de saf, bi heyecan, ziravbihîstiyar.

Ew di fotografê de serbest sekiniye. Serî û stû hinekî xwar, pêşiya çakêt vekirî, dest di bêrîkên pantolon de. Lê ev serbestiya rawestinê ne li gora cîddiyeta rû ye. Rawestin û awir di nav berberiyekê de ne. Heye ku ji ber vê be, mîna ku li pey fotografê kesekî din jî heye ku meriv nikare binase. Mîna ku Celadet, ne bi tenê yek e, ew pir in, ne bi tenê şexsiyetekê ye, ew pirşexsiyet e.

Ev fotografa ku îro, di nav van bûyerên tarîxî de, umrekî xort û dilekî ciwan nîşan dide, meriv dikare bibêje, destpêka tarîxa jiyana gihîştî ya Celadet jî nîşan dide. Ma jixwe fotograf jî ne tarîx e, ne kurtedemeke tarîxê ye? Ma Celadet, ji bo îspatkirin û nîşandana destpêka jiyaneke gihîştî, ev fotograf nedaye kişandin? Ne ji bo vê yekê ye ku wî bala xwe dayê ku di vê kurtedema tarîxî de her tiştê wî lihevhatî be?

Celadet, Kamo, hevalên wan li fotografê dinihêrin. Sultan Reşad hatiye ser hukim, Rûşen hatiye dinê. Ji derve deng tên. Celadet, bi ken, li xwe, li fotografa umrê xort, dilê ciwan dinihêre.

2 Celadet, bi ken, li fotografa umrê xort, dilê ciwan dinihêre. Li malê, li mitbaxê, ew li ser kursiyekî rûniştiye û li fotografa Şehrîbanê dinihêre. Mîna herkesî Şehrîban jî li pey nemiriyê ye, ew jî dere ser fotografkêşan û xwe dide ber kamerayan da ku kurtedemeke jiyana xwe bike nemir.

– Pir xweş derketiye, Celadet bi ken dibêje, bi gotina fransizan, te pir xweş "poze" daye.

Li mitbaxê ew bi tenê ne. Li malê jî. Ji bo serdana meta Celadet, Melek Xanimê ku nexweş e, malbat derbasî aliyê din ê Stembolê bûye. Emîn Beg, bi wezîfeyên girîng ên dewletê, çûye derveyî Stembolê. Kamo çûye Moda Çayiriyê da ku bi hevalên xwe re gogê bilîze. Li malê bi tenê du dilên ciwan mane. Du dilên ciwan ku bi germî û xurtî hildavên. Ji rojan yekşem e. Celadet bi hênceta dersan, Şehrîban bi hênceta paqijiya malê li malê mane.

– Lê te çima ev guliyên xwe, mîna her carê, ber bi jêr bernedane?

Celadet bi ken û bi germahî jê dipirse. Şehrîban ku bi qasî pênc salan ji Celadet mezintir e, lê ji aliyê bejn ji niha ve jê kintir e, ji aliyê paşve, li kêleka wî rawestaye û li wî û fotografê dinihêre.

– Ma ew ne ber bi jêr in? Şerîban dibêje û xwe xwarî wênê dike.

Gava ew xwe xwarî Celadet dike, guliyên wê rûyê wî radimûsin. Bîhneke taybetî, nerm, germ û xweş ji Şehrîbanê difûre. Celadet hemû bedena zirav a Şehrîbanê û bîhna wê, bi kel û germî, hîs dike. Bêyî ku ew hay jê hebe, ew hinekî dilerize û nefeseke kûr dikişîne. Germahiyeke boş bi ser wî de tê. Ew hinekî din, bêdeng, li fotografê dinihêre.

– Naxêr, gulî ne li jêr in, te ew li paş veşartine. Bi ya min, gava tu guliyên xwe ber bi jêr berdidî, tu hîn xweşiktir dixuyî. Ew awa hîn bêtir li te tê.

– Tu rast dibêjî, naxwe haya min jê nebûye...

Şehrîban hinekî din nêzîkî li Celadet dike û di serê re li fotografê dinihêre. Porê reş ê hinekirî ê Şehrîbanê rûyê Celadet mist dide. Ew niha nermahiya memikên wê jî li herdu aliyên milên xwe hîs dike. Hemû bedena wî germ dibe, dilê wî pihêt hildavê, ew pihêt nefes digire û dide. Gotin hew ji devê wî derdikevin. Celadet nizane çi bike. Ew û Şehrîban bîstekê wisan dimînin. Paşê, da ku Celadet bala xwe biqulibîne ser tiştekî din, ew ji pencerê li daran û pelên wan ên rengîn ên payizê dinihêre. Rengên pelan têkel in. Piraniya wan zer dikin, hin mor, hin jî sor in. Payiz di eynî wextê de payiza umrê pelan e jî. Piştî demeke kurt ew ê biweşin, dar ê rût bimînin, dinya dê kirasê xwe biguherîne.

Payiza umrê pelan û bihara umrê Celadet... Umir û dilê Celadet hê nû hişyar dibe. Bêyî tu gotinan, Şehrîban fotografê ji destê wî werdigire û hinekî jê bi dûr dikeve. Nermahiya beden û memikan hinekî jê bi dûr in, lê germahiya bîhna wan hê jî li dora Celadet hilawestiye.

– Min ava serşokê germ kiriye, ew hazir e. Eger tu bixwazî ku ez pişta te kîs bikim, hingî bang bike...

Berî ku Şehrîban ji mitbaxê derkeve, jê re weha dibêje û bêdeng dere. Celadet deng nake, kêliyekê wisan bêdeng rûdine û li pelan dinihêre. Çare nîn e, zagona tabîetê weha ye; piştî demekê pel ê ji jiyanê xatir bixwazin, biweşin û winda bin, herin. Çare nîn e, ji zayin û mirin, rabûn û ketin, xew û hişyarî, payiz û biharê re çare nîn e. Di vê roja payizê de, bedena Celadet, bi hemû xurtî û xortiya xwe, hişyar dibe.

Celadet, bi hêdîka, radibe, hinekî li dora xwe, li mitbaxê dinihêre û dîsan bi hêdîka, kincên xwe ji xwe dike, wan datîne ser kursiya kêleka xwe û tevî kiras û derpî, ber bi serşokê dere.

Çare nîn bû; beden hişyar dibû. Wext, wexta dîtin, nasîn û keşfkirina bedenê bû. Wext, wexta kitekitên ruh û can, hîs

û pejnan bû. Wext, wexta cennet û dojeha evînê, agir û germahiya şehwetê, dînî û dilgermiya hezkirinê û baran û hûrikahiya kêfê bû.
Di wan salan de, min xwe û bedena xwe, ji nû ve, lê îcar bi awayekî din, nasî. Ez divê li xwe mukir werim; Şehrîbanê, Şehrîbana ku bi beden û zimanê xwe zimanê bedenê bû, di nasîn, dîtin û keşfkirinê de, gelekî alîkariya min kir. Şehrîban stêrka gelawêjê bû, rê nîşanî min dida. Şehrîban stêrka kerwankujê bû, dil û bedena min diçirûsand...
Wê rojê ku tu niha qal dikî, di dawiya dawîn de, min deriyê serşokê vekir û bang Şehrîbanê kir. Ew hat. Min bedena xwe, bi hez, coş û heyecaneke mîna serê çiyayê Agiriyê bilind, pir bilind, teslîmî wê kir. Ew bi hez û hezkirin, bi qedr û qîmet li min û bedena min xwedî derket. Destên wê yên nerm, tilî û pêçiyên wê yên dirêj, mîna ku ew nexşeyeke nû keşf bikin, li ser bedena min geriyan. Hingî birûskên evînê di ruh û canê min de vedan. Hingî min, bi rastî, bîr bi evîn û evîndariyê bir, min fahm kir ku hez û hezkirin quwet e, lê di eynî wextê de qelsî ye...
Heta wê rojê jî, ez sunet nebûbûm. Pêşî ew birînên serê min ku ji dayikbûnê yadîgarî min bûn, rê li sunetê girtibûn. Paşê jî ew birînên ku ji Büyükadayê yadîgarî min mabûn. Zikê min qelişî bû, sunet nedibû. Lê dotira roja serşokê, ew roja ku zelzeleyeke mezin bi bedena min qewimî, ez çûm nexweşxana Cerahpaşayê û min li wir zêdahiyeke din ya bedena xwe ji ser xwe da avêtin.
Min gaveke nû ber bi dinya mêr û mêraniyê avêtibû...

Celadet di nav piştemalan de ji serşokê derdikeve. Şehrîban li wir dimîne. Ez ê herim binivim. Bila kes bang neke. Bila Kamo jî neyê odê.

Celadet jê re weha dibêje, dere mitbaxê, kincên xwe werdigire û ber bi oda xwe dere. Ew dixwaze bi tenê bimîne, li zelzela îro bifikire, ji nû ve wê biqultîne û bijî. Li odê, gava ew dikeve nav nivînan, ew, bi deng, weha difikire; evîn... diyar e, evîn û hezkirin huner e.

3 Bêgumman e ku evîn û hezkirin huner e, hunereke zehmet û dijwar, zirav û bihîstiyar e... Welê dixuye ku dilê te yê xort ketiye ber pêlên evîn û hezkirinê... Matta, matta...

– Signore, hûn bi halê xortiyê dizanin... Hûn kîjan kitêban tawsiye dikin?

Îro, li aliyê Perayê, nêzîkê Mekteb-î Sultaniyê, li ser Rue de Pera, yanê Cade-î Kebir, di dûkana kitêbfiroş a Signore Rionaldi de behs li ser evîn, hez û hezkirinê ye. Signore ku sahafekî yekta yê nas e, ne bi tenê hosteyê kitêban, ew hosteyê ders û şîretan e jî. Hema çi bigire li ser her babetî, bi her şêweyî. Bi alîkarî û rênîşandayina Evdilrezak Beg ku ji welatê xerîbiyê vegeriyaye û li pey tevgerên nû û nûjen e, Celadet riya dûkana Signore nasiye. Signore merivekî kal, lê hê jî li ser xwe ye. Rûha wî qît, simbêlên wî boq û badayî ne. Porê wî weşiyayî û ber bi paş şehkirî ye. Ew bejnkin û hinekî piştxoz e. Signore Rionaldi lewantenekî dewr û dewrandîtî yê Stembol û Perayê ye.

Dûkana Signore biçûk û teng e, tarî û kevn e. Çend mist ronahî, bi zehmetî ji derî û pencera fireh a pêşiyê, xwe bi hundirê dûkanê digihîne. Hemû aliyên dûkanê, heta dêv, bi kitab, kovar û weşanan tijî ye. Serê maseya ku li ber devê derî ye, bi çend qorên kitêban dagirtî ye. Bîhn û hilma taybetî ya rûpelên zer û rizyayî bi ser dûkanê ketiye. Nêrdewaneke kevn bi çend pêpîlokan, li aliyê hundir rawestaye. Signore destekî xwe daniye ser pêpîlokekê û bi Celadet re, bi zimanê xwe yê taybetî ku ji îtalî û osmanî hatiye pê, dipeyive.

– Bono Begzadeyê min ê biçûk, bono... Don û donna... bono, bono... Amore... Evîn, tu dizanî, di umrê însaniyetê de ye. Eger jê ne mezintir be, ciwanxorto... Ez niha ji te re çi bibêjim, ji ku dest pê bikim? Ez behsa kîjan kitêban, bûyer û serpêhatiyan bikim? Romeo û Julia? Ferhad û Şîrîn? Yan destana we kurdan a navdar Mem û Zîn? Yan jî destpêka me hemûyan, destpêka însan û însaniyetê Adem û Hawa? Ax dîno, evîna dîn... dînîtiya evînê...

Celadet li kêleka masê sekiniye û dikene. Signore pê re dipeyive, yan bi dengekî berz difikire, yan jî bi xwe û tarîxê re dipeyive? Lê her çi be jî, Signore kalekî xweş e, zanîna wî kûr, gotina wî balkêş e.

– Signore, min bi tenê dixwest kitabek yan jî dudiyan li ser vî babetî bixwînim...

Bono, xortê dîn, bono... dînîtiya xortiyê... Ma evîn û hezkirin şixulê çend kitaban e? Reçete, reçeteya wê çend rêz in? Û ji bîr meke, her reçeteyekê fatûrayek heye... Li van kitêban, yên li ser refan, li ser dîwar û masan binihêre. Ev hemû li ser reçete û fatûrayê ne. Di nav rûpelên hemûyan de jin û mêr, mê û nêr, evîn û berberî, cennet û dojeh hene. Heta îro her çi hatiye nivîsîn, li ser hal û hewalê evîn û evîndariyê ye, li ser kirasê germ ê evînê ye, hem diparêze hem dişewitîne... Fermo dîn ê biçûk, rahêje yekê, rûpelên wê veke, eger te tê de evîn û hezkirinê nedît, hingî ez ê van kitêban hemûyan belaş bidim te. Fermo rahêje yekê...

– Na, min dil dikir... heye ku tu bikaribî kitabekê bidî min...

– Ez... kitêbek... Amores... Mantinuta...

Signore li dora xwe, li jor, li kitaban dinihêre, ji refan kitêbin derdixe, li wan dinihêre, rûpelên wan vedike û wan datîne ser pêpîlokeke nêrdewanê. Li milekî jî ew, bi lêhûrî, li Celadet dinihêre. Dawiyê ew dere ber masê çaviyeke masê dikişîne û jê kitabeke biçûk derdixe.

– Fermo, vê werbigire. Xwe bispêre rehmeta vê... Tu bi fransizî dizanî, si?

– Si...

Celadet li bergê kitaba biçûk dinihêre. Navê kitêb Ars Amatoria ye, navê nivîskarê kitabê jî bi tîpên mezin hatiye nivîsîn; OVID...

> Ovidius... hosteyê hunera evînê, mamostayê min ê yekem û yekta, rêberê riya qeder û jîna min... Signore Rionaldi, lewantenê qedirgir û bîrbir, bi karê xwe dizanîbû. Wî

kitabek ku berî wê rojê bi hezaran sal hatibû nivîsîn, dabû min. Lê kitabeke nûjen ku tu carî ne kevn, ne jî winda dibû; Ars Amatoria yan jî bi navê wê yê din Ars Amandi, yanê Hunera Evîn û Hezkirinê...

Wê rojê, bi saya pêşniyara Evdilrezaq Beg, min gelek tişt qezenc kirin; min Signore û dûkana wî nasî. Min bîhna rûpelên tarîxî, dewr û dewranên bihurî nasîn. Li Perayê, min warekî din ê germ û xwendegeheke din a dewlemend nasî. Û min Ovidius û eserên wî yên bêhempa nasîn. Pêşî Ars Amatoria, paşê jî Amores, Heroides û Metamorphoses... Min ew nasîn, berî ku qedera min jî bibe mîna qedera Ovidius û ez jî bikevim ber pêlên derketin û sirgûniyê.

Min rûpela yekemîn a kitabê li nik Signore vekir û ew rêzên pêşîn bi deng xwendin; "S'il est quelqu'un de notre pouple a qui l'art d'aimer soit inconnu, qu'il lise ce poéme, et, instruit par sa lecture, qu'il aime... Yanê... Hezkirin huner e. Eger di nav we de hê jî kesekî heye ku derneketiye seyrangeha vê hunerê, hingî ew kes divê vê berhemê bixwîne û piştî ku wî ev xwend, tiştên ku jê hîn bûye, biceribîne..." Destpêk, mîna her destpêka berhemeke bedew, xweş û spehî bû. Belê, Signore kitabek yekta dabû min, bersivên dilê min ê xort ku dê dilê min hîn dewlemendtir û geştir bikirana, tê de hebûn...

– Gracia Signore, pir spas. Ez ê hefta were, dîsan bêm. Di xweşiyê de bimîne.

Celadet kitêb dike bin çengê xwe, ji dûkana biçûk derdikeve û di vî danê êvarê de berê xwe dide ber bi Galatayê da ku li wir, li aliyê din ê Galatayê, li Helebê, keştiya ku di navbera Kadıköy û Stembolê de sefer dike, siwar be û here Kızıltoprakê.

Celadet kêfxweş e, deriyên nû yên hînbûn û zanînê li ber wî vedibin.

4 Celadet kêfxweş e, deriyên nû yên hînbûn û zanînê li ber wî vedibin. Sedsala bîstan, qirn û babilîska nû, bi xurtî dest pê kiriye; her roj, hertim bûyerên nû û girîng, îcadên nûjen û balkêş tên pê. Fikir û raman, hîs û pejnên nû civatan vedigirin. Dewleta Osmanî û payitextê wê Stembol bûne mîna hêlekanekê û li ber ba û bahozên guherînan bi vî alî û bi wî alî de derin û tên. Bûyer û şoreşên Awrûpayê, nemaze yên Fransa û fransizan, pêl bi pêl, bi ser Stembolê de tên. Stembolî, xwenda û zane, bîrewer û ronakbîr, ramangîr û bîrbir, karger û rêberên dewletê di nav pêlên dîtin, bîr, fikir û hîsiyatên nû de, mîna hêlekanekê, derin û tên. Herkes hewl dide da ku pêlên nû yên pêşketinê têbigihê.

Sal, 1911 ye, Celadet ketiye hîjdehan. Celadet ketiye nav rûpelên kitaban, hem li xwendegehê, hem li mal û kitabxanê. Hertim çend kitabên bi osmanî, fransizî û kurdî di bin çengê wî de yan li ber serê wî ne. Zanîn bûye kahniyeke hênik û Celadet, tevî bira û hevalên xwe, jê vedixwe û tîhna xwe dişkîne. Ew peyv û gotinên nivîskî vedijîne, ruh dide wan, bi wan re dipeyive, fikrîn û peyivînê, ev herdu kirinên cihê, bi hev re dike yek. Hê di vî umrê xort de ku ji tecruban bi dûr e, bi alîkariya bira, ap, met û biraziyan, wî bîr bi hêz û quweta gotina nivîskî biriye. Wî bîr pê biriye; tecrubên nû dê bi neqşên gotina nivîskî dewlemendtir, xweştir, kûrtir û zelaltir bibin.

Îro, Celadet û çend hevalên wî, li ser gotina mamostayê wan ê edebiyatê, hatine Şehzadebaşi'yê, salona tiyatroyeke mezin. Li gora gotina mamostayê wan, îro wê li vê salonê konferanseke "girîng", ji aliyê du kesên "girîng", li ser babetekî "girîng" bihata pê. Celadet ku li pey pêt û çirûskên zanînê ye, hevalên xwe jî dane pey xwe û hatiye konferansê. Piraniya şêniyên ku hatine, xort û xwendevan in. Hema çi bigire, salon nîvtijî ye. Li ser dîwarên salonê, bi tîpên erebî û ermenî, lê bi zimanê osmanî, gotinên edebî hatine neqişandin. Li ser perdeyên şano ku ji cawên sor çêbûne, çend wêneyên zer dixuyin. Hema li pêşiya perdan, li ser şano maseyeke dirêj û sê kursiyên text hatine danîn.

Celadet û hevalên xwe li rêza herî pêşîn a kursiyan rûniştine. Celadet li milekî bi hevalên xwe re dipeyive, li milekî jî li dora xwe û paş xwe dinihêre. Piraniya kesên ku hatine, jê re, rûyên nas in. Beşdar di nav xwe de dipeyivin. Lê gava ji paş perdeyên şano merivekî navsale, navzirav û navdar derdikeve û tê ber masê, deng jî hêdî hêdî tên birîn. Kesê ku li ber masê rawestaye û ji jor li guhdaran dinihêre, yek ji bîrbir û rêberên partiya Ittîhad we Terakkî ye; Yusuf Akçora. Ittihad we Terakkî ku îro hemû karên dewletê bi dest xistiye û wan digerîne, digel hebûna malbata Osmanî û Siltan Reşad, siyasetên ku ji bo dewleta osmanî nû ne, dimeşîne.

Yusuf Akçora, bi dengekî giran û berz, xêrhatinê li beşdaran dike û gotarbêjê konferansa îro bi wan dide nasîn. Gotarbêj ji welatê Kafkasyayê, tirkekî zana Ismail Gansperenski ye. Piştî ku Yusuf Akçora navê wî dibêje, ew jî, ji paş perdê, herdu aliyên perdên girtî vedike û tê ber masê. Herdu hevûdu hembêz dikin û bi hev re rûdinin.

Celadet bi meraq li wan dinihere û di rûpela deftera xwe ya biçûk ku di destan de ye, weha dinivîse; 10 Temmuz'un ikinci sene-i devriyesinden 10 gün evvel... Şehzadebaşı...

> Belê, gotina te ye, min welê nivîsî... Min ne bi tenê bîr bi quweta gotina nivîskî biribû û ew dixwendin, herweha min ew bi pênûsa xwe ya xort û nehoste dianîn pê jî. Wext mîna hespekî seglavî li bezê ye. Ji gotinên nivîskî pê ve kî bi lez û beza wextê dikare? Ew kîjan heş û bîr, mêjî û zanîn e ku dikare xwe li hember lehiya wextê rabigire?... Loma, carina min pênûsa xwe ya bêziman li ser kaxizên spî digerand û bûyer dianîn ziman.
>
> Wê rojê jî welê bû; Yusuf Akçora û Ismaîl Gansperenskî Beg... Bi dû wê rojê re, bi qasî bîst û du salan, 8'ê kanûna sanî, 1933-an, li Şamê, bi alîkariya wan gotinên ku min li Şehzadebaşiyê nivîsîbûn, min ji serekkomarê Tirkiyê, Mistefa Kemal Paşa re nameyeke dirêj nivîsî. Di nama ku min bi zimanekî xweş, bi rêz û rêzdarî, nivîsîbû de, min

rexne li siyaseta Tirkiyê ya li ser kurd û Kurdistanê girt û ew siyaset mîna nijadperestî û tirkîtî bi nav kir. Di namê de, min mîsala roja Şehzadebaşiyê jî da. Ji lewre, tovên dijminahî û berberiyê, tirkîtî û nijadperestiyê hê di salên 1910-an de dihate çandin.

Wê roja Şehzadebaşiyê, Ismaîl Gansperenskî, merivekî ku ji welatên xerîb hatibû û hê baş bi tirkî nizanîbû, di konferansa xwe ya dirêj de, her û her behsa tirk û tirkîtiyê kir. Wî, bi tirkiya xwe ya ecêb ku me bi dijwarî jê fahm dikir, her digot "türk we gayri türk". Gava konferans qediya, me jê bi tenê tiştekî fahm kir; li ser axa dewleta Osmanî bi tenê tirk hene, herkes tirk e û herkes wê tirk be... Bi gotina birayên me yên kurdên soran, gotinên wî qor bûn. Hema di wê salonê de, kesên ku tirk bûn, bawer bike, bi tiliyên destekî dihatine hejmartin. Ez û hevalên min, em şeş kes bûn; du kurd, çerkezek, arnawitek, gurciyek û rûmek. Belê, em osmanî bûn, lê ne tirk. Hurmeta me ji bo "Halîfeyê rûyê zemîn" bêdawîn bû, em misilman bûn, lê ne tirk. Em bira bûn, lê ne tirk... Hingî me li xwendegehê rojnameyek diweşand. Ez gerînendeyê wê bûm. Dotira roja konferansê, min ji bo rojnamê, li ser kurd û Kurdistanê, bendeke çandî û tarîxî nivîsî û di rojnamê de weşand.

Herçî ew qisên qor, digel ku ew qor bûn, bûn sebebê perçebûn û hilweşîna Dewleta Osmanî, bûn sebebê ax û axîn, qîrîn û hawar, kîn û nefret, mirin û kuştinê. Welat bû gundekî xirbe, jê dû û dûman bi esmanan ket. Riyên welêt bi cendekên miriyan tijî bûn, teyr û tûr li serê veniştin... Min ev hemû, digel her kitekitê, bi hêz û quweta gotina nivîskî, ji Mistefa Kemal Paşa re nivîsîn. Lê heyhat... kesên ku bi fort û hêza şûrê xwe bawer bin û bîr bi quweta gotina nivîskî nebin, guh nadin gotina nivîskî heta ku ew bi xwe, bi tecrubên xwe, nebînin ku hêza şûrê xwînrêj ne bi qasî îlim û zanîn, peyv û gotina nivîskî ye...

Bi dû konferansê re, li ber deriyê tiyatroyê, Celadet û hevalên wî li hev dinihêrin. Ji kesî deng dernakeve. Tirk û tirkîtî... "Herkes Türk olmak mecburiyetinde... Bu ülke Türklerindir" Celadet lal bûye, nikare bipeyive, kerr bûye, hew dengan dibihîse, mîna

ku yek dilê wî diguvişîne. Ew, bêdeng, bîhnteng, ji hevalên xwe xatir dixwaze, serê wî di ber de, dest di bêrîkên pantolon de, hêdî hêdî, ji wir bi dûr dikeve. Di mêjiyê wî de dengê Ismaîl Gansperenskî, dilê wî, pihêt, hildavê.

5 Dilê Celadet pihêt hildavê. Di êvareke ronî ya havîna 1912-an de, Celadet, Kamuran û çar hevalên xwe li aliyê Kadıköyê, Fenerbahçê, li bexçê Otel Belvu rûniştine û şîva êvarê dixwin û bi qaseyên zîvîn meya sor a Belvuyê vedixwin. Wan hemûyan bi serfirazî xwendina xwe xelas kirine û vê yekê pîroz dikin. Bexçê Belvu, mîna her carî, tijî ye. Aliyê hundir, gazîno û otêl jî. Êvar mîna êvareke çîroka Şehrezadê ya Hezar û şevekê ye; ro nû li aliyê din ê zeryayê çûye ava, stêrk hê hilnehatine, refekî teyran li ser Boğazîçiyê bi nazdarî difire, garson çirayên bexçe ku aheng û rengekî taybetî didin der û dorê, yek bi yek vêdixe, dengekî tenik ê pêlên avê xeberdanên mêvanên bexçe temam dike, ji hundir, aliyê gazînoyê dengê saz û neyê tê, ji der dengê simên hespên faytonan tê, bîhna zerya û xwarin û şîvên taybetî yên osmanî bi ser bexçe ketiye... û li masa Celadet û hevalên wî jî, bîhna lewantên bedenên xort û şîvên navdar ên osmanî yekîtiyeke lihevhatî tînin pê.

Celadet, Kamuran û hevalên wan li hêviya vê şevê bûn. Îşev kêf û henek divê, xwarin û vexwarin divê, musîk û dans divê. Berî îşev bi du heftan, Celadet li Belvu, ji bo heft kesan cîh veqetandibû û ji menu'yên Belvu şîv û xwarin hilçandibûn. Lê hevalekî wan ê rûm ku nasê xwediyê Otel Belvu bû, nexweş ketiye û nikare were. Ew şeş kes li ser xwarinê ne. Garson di destên wan de tebax û teyfik, li dora masa wan derin û tên. Ew ê vê êvarê heta derengê şevê bixwin û vexwin. Pêşî ji wan re zeytinyağlı kereviz dolması hat, paşê karides güveç. Niha jî ew di nav tebaxên zîvhêlî de şîva êvarê Teşrifat-ı Naim Efendi sığır külbastısı kağıtta tevî çiroz salata dixwin.

Celadet tîkeyên biçûk ên goşt bi hêdîka dibe devê xwe, kêliyeke dirêj di devê xwe de dicû û paşê dadiqultîne. Tahma şîvê ne ya gotinê ye. Xwediyên Belvu, ji bav û kalan, rûmên Stembolê ne. Wan ahengeke xweş a osmanî û cîhana rojava dane hemû Belvu. Xwarinên wan bêtir osmanî ne, musîka gazînoyê hem osmanî hem a la franga ye. Avahî û mîmariya otel, gazîno, restoran û bexçê jî her wisan e. Bexçe li peravê Zeryayê, di nav daran de ye û bi lengergeheke biçûk xwe digihîne avê. Carina mêvanên bijarte, les gentil hommes ên Belvu bi qayikan tên Belvu.

– Guhê xwe bidin vê stranê... we ew nas kir?

Ji hundir, aliyê gazînoyê dengê musîka osmanî û dengbêjekî navdar ê osmanî tê. Kamuran ku ji musîk û musîkjeniyê pir hez dike, hema çi bigire hemû stranên osmanî, fransizî û rûmî jiber dizane. Ew guhê xwe dide stranê; yeter ey gözleri sevda dolu esmer güzeli...

– Guhê xwe bidinê, ev çi dengekî nerm mîna qedîfê, ev çi straneke xweş mîna şiîrên Xeyam!..

Bexçe hinekî zirav û dirêj e. Hema li pêşiyê, li aliyê çeperastê masa wan, maseyeke din a dirêj heye. Li wê masê, meriveki rûdirêj û rîtenik jî dibe şirîkê stranê û bi alîkariya destan, distrê, "ey esmer güzeli..." Dengê mêrik ne tu deng e. Celadet û hevalên wî dikenin. Mêrikê rîtenik, bi kêf, dest li wan dike da ku ew jî pê re bibêjin. Li aliyê rastê mêrik jineke rûxweş a navsal rûdine, li aliyê çepê jî keçeke ciwan û çavxweşik.

Çavxweşik... Celadet bi dîqet bala xwe didiyê. Gelo ew vê çavşêrînê nas nake? Ji kû, gelo ji kû, ew van çavan dinase? Çavên Celadet hew derekî din dibîne, ew her li ser çavên keçikê ne. Keçik vê yekê dibîne, ew jî li çavên Celadet dinihêre, lê bi dû kêliyekê re, ew çavên xwe jê direvîne. Awir û nêrîna Celadet bala Kamuran û hevalên din jî dikişîne. Ne bi tenê bala wan, bala masa din jî. Lê Celadet nikare xwe rabigire, çav li kûrahiya çavên spehî dinihêrin. Merivê rîtenik ji masê radibe û bi stran û ken tê ber masa wan. Bîskekê ew li hev dinihêrin. Bejna wî dirêj, kincên wî spehî, awirên wî nerm e. Ew destê xwe dide Celadet,

– Siz Bedirhanpaşazadelerden olmalısınız?

Celadet bi serî dibêje, belê. Herê, ew ji Bedirxanpaşazadeyan e. Yê li aliyê din ê masê rûniştî jî birayê wî ye, yên din jî heval in.

– Buyurmaz mısınız?

Bi gotinê re, Celadet cîh nîşanî wî dike. Mêrik li kêleka Celadet rûdine û silav dide yên masê.

– Ben Murat Bey'i tanıyorum. Komşuyuz... Bundan birkaç yıl önce de Abdulrrezak Bey'le tatsız bir olayımız olmuştu...

Bi ser gotinên mêrik re, ji nişka ve, keçik tê bîra Celadet; Galata, li ser Galatayê. Ew danê êvarê... Ew, Sureya û Evdilrezak Beg... bûyera nexweş... çav, çavên bademî... Canan, belê, Canan...

– Tamam hatırladım, ben de oradaydım, Galata'da... Yalnız isminizi unuttum.

Alî Siud, navê wî Alî Siud e. Alî Siud Beg û ew dikevin nav sohbetê, qala wê rojê, Kadıköyê, hal û hewalên dost û nasên hev dikin. Lê çavên Celadet li ser çavan in. Piştî demekê, Ali Siud Beg ji wan xatir dixwaze û dere masa xwe. Celadet jî pê re radibe û wî heta masê dibe. Li wir Celadet silav dide yên masê û vedigere ser keçikê,

– Sizi tanıdım, Pederinizle birlikteydiniz, Galata'da.

Keçik, bi hêdîka, dikene û serê xwe bi ûsil dihejîne. Celadet bi ken lê dinihêre.

– Sizi dansa davet etsem, acaba terbiyesizlik mi etmiş olurum?

Keçik, bi hêdîka, dikene, bi ûsil radibe ser piyan, li Celadet dinihêre û berê xwe dide aliyê hundir, cîhê dansê.

> Ma Ovidius weha negotibû? "Heke tu bi gotinên min bawer î, heke bayên zeryan gotinên min nedin ber xwe û nebin, şîretekî din li te: Heke tu bi xwe ne bawer î û di biryara xwe de ne qehûm î, hingî tu carî dest bi aventurê meke..."
> Ez bi xwe bawer, bi biryara xwe qaîm bûm. Wê şevê me dans kir, ez bûm çira, Canan bû pepûla dora çirê. Canan bû heyv, ez bûm stêrkên dora wê. Me dans kir, demeke dirêj, ji xwe ve çûyî, bi ronahiya kahniya çavan, bi pêta agirê dilan...

Piştî ku Celadet û Canan ji hundir vedigerin, Canan li cîhê xwe rûdine û Celadet jî spasî wê dike, silav dide Alî Siud Beg û yên din û vedigere masa xwe. Derengê şevê ye. Kamuran û hevalên wan şîrinahiya xwe jî xwarine. Ya Celadet, şîrinahiyeke kevn a osmanî fıstıklı hünkar muhallebisi, kuru kayısı ezmesiyle, di nav teyfikeke neqişkirî de, li hêviya wî ye. Celadet dest bi şîrinahiyê dike, lê li milekî jî li çavên Cananê dinihêre.

Celadet li çavên Cananê dinihêre. Xwedayo... du lib lûlû, du stêrk, du kahnî, du lehî, Dîjle û Firat... Canan bi ken rûyê xwe jê badide. Celadet rûyê wê ber bi xwe dike û dîsan li çavan dinihêre, bi çavan dipeyive, bi çavên wê re dipeyive. Di çavên wê de jiyaneke ciwan, straneke bedew, evîneke yekta, hîseke germ dixuye. Çavên wê jiyan e. Jiyan li ser çavên wê dikene.

Canan, hinekî bi şermokî, dikene, devê xwe vedike ku tiştekî bibêje. Lê Celadet bi destê xwe devê wê digire, bi çavan jê re dibêje ku îro bi tenê çav wê bipeyivin. Bi tenê çav û beden. Ne tiştekî din... Celadet herdu çavên wê radimûse û bi destê xwe yê rastê qirik, sîng û ber û bedena wê mist dide. Beden mîna hewreşîmê tenik û nerm e. Dest hêdî hêdî li ser bedena wê digere.

Beden westiyayî ye, beden westiyayî ne. Di nav cîhan de, li ser çarşefên peregende, bedenên tazî û xwîdandayî li kêleka hev dirêj bûne û bi bîhna hev bîhna xwe vedidin. Celadet û Canan li aliyê Bab-i Aliyê, nêzîkê Cağaloğluyê, navenda rojname, kovar û weşanên hemû Dewleta Osmanî, li odeyeke fireh a pansiyonekê ne. Pansiyon, ya bavê hevalekî Celadet e. Hevalê Celadet bi xwe jî, di rojên tatîlan û dawiya heftan, ji pêncşemiyê heta şemiyê, li pansiyonê dixebite. Celadet û hevalê xwe li hev hatine, gava hevalê wî dixebite, ew û Canan tên pansiyonê, kilîta oda ku ji bo wan hatiye veqetandin, werdigirin û derin odê. Ji wan kurte-demên pir pêwist pê ve, ew ji odê dernakevin.

Mîna îro...

Pansiyon sê qat e. Di her qatê de sê ode hene. Celadet û Cananê odeyek li qata herî jêrîn, lê li aliyê paş, hilbijartine. Ji ber ku oda wan li kêleka bexçê aliyê dawîn e. Bi hêsanî û bêyî ku ew kesekî bibînin yan jî kesekî wan bibîne, ew dikarin derkevin bexçê biçûk.

Oda wan îro jî, mîna her car, tevlihev e; ode, odeya evînê û hezkirinê ye, her kursiyek li derekê, li ser kursiyan cil û bergên Celadet û Cananê, bahlîf û lehîf li erdê, li ser masê jî xwarin û vexwarin û şûşeyên mey û araqê. Ew jî li ser textê razanê, di nav cîhan de, peregende, dirêj bûne. Destê Celadet sîng, pêsîr û berê Cananê, bi nermahî, mist dide. Çavên Cananê vekirî li Celadet dinihêrin, lê heşê wê li derekî din e. Bi hez û coşa hezkirinê, ew ketiye nav xewn û xeyalên şêrîn. Bîhnek mîna bîhna barana biharê, mîna bîhna sêv, xox û biyokên teze ji bedena Cananê difûre. Bîhneke mîna pûngê hinekî tirşokî, lê xweş û ne giran. Bîhnek ku Celadet jê hez dike. Yanê bîhna piştî zelzela hezkirinê. Tiliyên qaling ên Celadet li ser memik, sermemik û navmemikên Cananê, bi ûsil, derin û tên. Bi tevgera tiliyan, sermemik jî hêdî hêdî radikêşin. Canan bi axîneke tenik çavên xwe digire û xwe hinekî ji Celadet bi dûr dixîne. Celadet li hemû bedenê, bedena ciwan û lihevhatî, li sîng û ber, memik, navteng, zik, berzik, mûyên pir hûr û kêm ên berzikê, hêt û çîpan dinihêre. Tu kêmaniyên bedenê nîn in, her alî li yên din hatiye. Her alî bi serê xwe mîna bihuştekê ye.

Celadet nêzîkê Cananê dibe û stû û qiriqa wê maç dike. Canan jî destê xwe davêje ser serê wî û porê wî mist dide. Rawest navê. Bîhna bedenan hevûdu dikişînin. Beyî ku Celadet lêvên xwe yên şil û germ bigire yan jî ji qirikê vekişîne, ew hêdî hêdî ber bi jêr, binçengê dibe. Binçeng şil e, jê bîhna xwîdanê tê. Celadet kêlîyekê binçeng bîhn dike û radimûse. Bi dû re, lêv vedigerin ser navmemik û memikan. Celadet bi herdu destên xwe memikan nêzîkê hev dike û lêvên xwe li ser herdu sermemikên qahweyî û mezin bi hev re digerîne. Sîng û bedena Cananê, tevî axîneke nerm, bi xurtî, radibe. Hêt û şeq vedibin. Canan bi herdu destan serê Celadet ber bi jêr dike. Lêv hêdî hêdî ber ji jêr dibin...

Min navê ku ez li ser evîn û evîndariyê, hez û hezkirinê bipeyivim. Mîna her tiştê nazik û narîn, ev jî dikarin li ber tava gotinên zêde biçilmisin. Meriv divê jê haydar be... Cananê deriyên dil û canê xwe, ruh û bedena xwe ji bo min vekiribûn. Heşê min ji serê min çûbû. Evînê li min û mêjiyê min guhdarî nedikir. Dilê min bûbû hespekî rewan û di deşta evînê de serî girtibû û diçû. Ez bûbûm evîndarê keçikeke... belê, keçikeke çawan? Û kî? Eger ez bibêjim ku ew keçikeke tirk bû, na ne welê bû, kurd bû, na. Ne tirk bû, ev jî na. Bavê wê Alî Siud misilmanekî arnawidên Kosowayê bû. Diya wê boşnakeke Bosna Hersekê bû ku li Stembolê hatibû dinê. Bavê Cananê li şeremîniya Stembolê memurekî mezin bû. Ew merivekî ehlîkêf, medenî, ji siyasetê dûr, merivê her dem û heyamê bû. Diya wê jî jinekek di halê xwe de, hebûn û nebûna wê nediyar, bêdeng bû. Cananê li Modayê, li sultaniyeke fransizî dixwend. Xwendegeh leylî bû, Canan dikaribû bi şev jî li wir bima. Lê li dewsa xwendegehê, gelek şevan ew li wê oda me ya fireh, bi stranên fransizî, serê wê, li ser sînga min, radiza.

Ez, neviyê Mîr Bedirxan, lawê welatê Kurdistanê, bûbûm evîndarê Cananê, keçikek ji war û diyarên xerîb, ji aliyê din ê tixûba Osmanî, Ewrûpayê. Ez pê re digihîştim kata herî bilind a mesûdî, serfirazî, kêfxweşî û hezkirinê. Bedena min pê re digihîşt kata herî kûr a coş û heyecanê. Lê haya min hê ji bayê felekê û lîstikên dewr û dema kambax nîn bû...

Lê, heçî ode û bexçe bû, te dîsan tiştekî ji bîr kir; bîra li bexçê. Ew bîr muhûm bû. Gava bîhna beden û xwîdanê bi ser me û odê de diket, ez derdiketim bexçê, min ji bîrê çend satil av dikişand û me bedenên xwe pê hemamişk dikir. Bîrê û çêyiyên bîrê ji bîr meke...

Herdu beden dibin bedenek, ew di nav bêdengiyeke germ de, dîsan, dikevin nav hevûdu. Celadet, ji jor ve, bi çavan, pê re dipeyive; le tempe d'amure, de la fatalîté... toujours, toujours... Canan, ji binî ve, bi reh û demarên rakişiyayî yên gewriyê, serê xwe hinekî radike û bi çavan bersîv didiyê; oui, oui... Belê, belê...

FOTOGRAF 5

Şerê cîhanê; heyama mirin û kuştinê, şewat û rehmetê

1 Belê, belê... mirin e, ba û bahozên mirinê ne, dû û dûmana mirinê ye. Fotografa pêncemîn a romana Bîra Qederê ya mirinê ye. Di nav fotografên romanê de, ya herî zêde li mirinê tê, ev fotograf e. Fotograf jiyanê dikuje, jê kêliyekê digire û wê demê sabît dike, dike nemir. Jiyana jîndar, wê kêliyê dimire da ku bibe nemir. Di fotografê de mirin û nemirin di nav hev de ne, mîna cêwiyan, bi hev re ne.

Mîna vê fotografê.

Fotograf reş û spî ye. Reş û spî û kitekitên van herdu rengên bira û neyar. Fotograf ku bergehek e, bi riyekê dest pê dike. Ne rê, lê ji rê zêdetir ew şiveriyek e. Şiveriyek fireh, bi fetlok û dirêj. Meriv dikare bibêje ku ew navenda wênê ye. Rê, riya mirinê ye; ew di navenda wênê re derbas dibe û wêne dike du bir. Birê aliyê rastê û yê çepê. Di aliyê rastê de du gund dixuyin. Yek li pêşî, yek jî li pey wî. Gundê pêşiyê mezin e û xanî tê de pir in. Yê paşîn biçûk e, bi tenê çend xanî ne. Li aliyê din ê şiverê bi tenê zevî ne. Lê di dawiya zeviyan de, li berpala çiyan kon dixuyin. Belê, di dawiya wênê de zencîreçiyayên asê dixuyin. Tiştên ku bergeha fotografê tînin pê, kêm-zêde, ev in. Yanê tiştên ku meriv dikare di hemû fotografan de bibîne. Bergehek ku zêde tiştekî îfade nake.

Lê belê, tiştên din ku bergeha fotografê temam dikin, mana wê jî didinê. Li pêşiyê, li ber devê rê, li herdu aliyan cendekên

merivan dixuyin. Li gundê nêzîk bi tenê du seg û çar ga yan jî çêlek dixuyin. Meriv nîn in. Li gundê aliyê jor ê li ber quntara çiyan, bi tenê dûman heye, dû û dûmaneke zirav ber bi esmanan dibe. Li aliyê din ê şiverê, li ber konên reş, bi qasî heft, heyşt hesp –heye ku ew qantir in– dixuyin. Ji konan hinekî bi dûr û hinekî nêzîkê rê, çar topên eskerî, lûleyên wan ber bi gundan, dixuyin. Li pey van hemû tiştan jî çiya hene, serê wan di nav ewran de, bi hev ve girêdayî, bêyî rê û bihur. Çiya rût û tazî ne, ne devî û dahlek, ne dar û berek, ne giya û hêşînahiyek û ne jî av û kahniyek. Ewrên li ser çiyan jî, bergeha çiyê temam dikin.

Fotograf weha ye. Sar, bi xof, kesertijî. Û bêdeng. Ji cendekên devê rê pê ve, tê de tu însanên zindî naxuyin. Nîşana merivan tê de hene. Lê ew bi xwe tune ne. Meriv dikare bibêje, siya wan tê de heye. Tevî siya wan, xof û sawa wan jî tê de heye. Ne bi tenê sî û sawa wan, herweha sî û sawa ruhistîn jî di vê wênê de heye. War, warê şer e. Dem, dema şer e. Merivên ku di wênê de naxuyin, heye ku mîna cendekên kêlekên rê, kuştî ne, heye ku reviyane û xwe spartine çiyan, heye ku êrîş birine ser ciyekî din, heye ku ji şer û pevçûnê westiyayî, di nav xeweke neşêrîn de ne, heye ku ew li şînê rûniştine, -eger wexta wan ji bo şînê hebe. Her çi be jî, merivên nediyar ên vê wêne, war û demê, di hembêza ruhistîn de ne. Ew dîlên mirin û kuştinê ne. Cendekên bêkes, heywanên tiral, gundên bêxwedî, şewata gund, topên lûlemezin rewşê baş nîşan didin; şeneyê ruhistîn li vî cîh û warê fotografê li kar e.

Ne diyar e ka kê ev fotografa ku dibe fotografa pêncemîn a romana Bîra Qederê kişandiye. Lê hostetiya wî jê baş diyar e. Wî, her mîna siya merivên zînde yên wênê, tiştên nediyar jî reşandine ser wênê. Di fotografê de tu nîşanên ba û bahozê nîn in, lê meriv ba û seqemên bayekî hişk jê hîs dike. Sar û seqemên bayê mirinê... Tevî sar û sermê, meriv haletên însanî yên mîna xof û tirsê jî hîs dike. Bêdengiyê jî, meriv welê bawer e, kirasê xwe yê sar rakêşandiye ser bergehê. Meriv bawer nake ku hespên wênê

dihîrin, seg diewitin, teyr û tûrên nediyar dixwînin. Fotograf ya bêdengiyê ye, ya keserê ye, ya hilweşînê ye, ya windabûnê ye. Jiyanek di warê fotografê de heye, hebûna heywanan û şewata gund nîşan dide ku jiyaneke nexweş li wir hatiye jiyîn û jiyaneke nexweş ê dîsan were jiyîn. Fotografkêş hoste ye, wî hemû wextên jiyanê, do, îro û sibê xistine nav bergeha xwe.

Fotografa ku mirinê dike nemir, dike siya romana Bîra Qederê, bergeheke pir biçûk a şerekî pir mezin e. Ew nîşaneke biçûk a îspata yekîtiya mirin û nemiriyê ye. Ew nîşan dide ku mirin li dar e, li rê ye.

2 Mirin li dar e, li rê ye, Canan. Mirin li dora me ye, em ber bi mirinê derin, Canan, Canan...

Celadet û Canan, bi gavên pihêt, dilezînin. Ew ji Bab–i Alî Caddesi ber bi jêr dibin. Du rojên hilavêtina dil û yekitiya bedenan li pey mane. Ew li cîhana ku wan ji bo du rojan li pey xwe berdabûn, vedigerin. Canan wê here sultaniyê, nik ezîzeyên xwe yên fransiz. Celadet jî wê here malê, Kızıltoprakê, nik germahiya nas a malbatê. Sal destpêka 1913´ê, danê êvarekê yê zivistanê ye. Ew divê bigihên ser Basrayê, keştiya ku dê here Kadıköyê. Celadet bi gavên fireh dimeşe, Canan jî dilezîne ku xwe bi Celadet bigihîne.

– Canan, ev kevirên ku em pê lê dikin, bi xwîn in, Celadet dibêje. Hemû der û dorên Bab–i Aliyê, Cada Bab–i Aliyê bi xwîn e.

Canan dengê xwe nake, bêdeng, li pêşiya xwe dinihêre û dilezîne. Dinya sar e, bayekî sar û hişk tê. Baran nîn e, lê erd ewçend celb e ku meriv pir bi zehmetî dimeşe. Li doralî, ji esker û zabitan pê ve, kes naxuye. Esker di nav paltoyên xwe yên dirêj, li ber derî û caxên avahiyên Bab–i Aliyê di nobetê de ne. Cağaloğlu û Bab–i Alî ku dilê siyaset û weşanên dewleta osmanî ne, mîna eskerên nobedar, îro stûxwar in...

Ne bi tenê wê rojê, ji demekê ve bû ku ew stûxwar bûn. Dewleta Osmanî westiyayî û nexweş bû. Ewrên reş esmanên Osmanî vegirtibûn. Dewleta Osmanî bûbû mûna wazoya şikestî, ew carekê, bi qetl û kuştinan, şikiyabû, êdî hew dicebirî. Ittîhad ve Terakkî Partîsî li ser hukim bû. Hukimdarê dewletê Siltan Mihemed Reşad li ber destê wan mûna leyistokekê bû, wan her tiştê xwe bi Siltan didan qebûlkirin û pê dilîstin. Piraniya "Ittîhatçiyan" zabit bûn, di şer û lecan de mabûn, destê wan bi xwîn, mêjiyê wan mucrîm bû. Ew hem xeyalperest hem nîjadperest bûn. Tirk, tirkî, tirkîtî ala wan, vegirtina hemû Asyayê, welatê bav û kalên tirkan armanca wan, qirkirina gelên din ên osmanî mirazê wan bû. Şûr zar û zimanê wan, demançe edet û ûsila wan bû. Her çiqas kesên li derveyî wan, dijî wan, dûrî wan hebûn, ew neyarên wan bûn. Herkes diviya tirk bûya, ne bi tenê tirk, "tirkçî" jî bûya. Islamiyet, osmanîtî, biratiya gelên osmanî... ev hemû winda bûbûn. Siyaseteke zordar, darê zorê, tifing û demançên kuştinê li dar bûn... Tovên kîn û nefretê, mirin û kuştinê dihatin çandin.

Ez bawer nakim ku te dil hebe ku tu rûpelên romanê bi kuştin û mêrkujiyên wan tijî bikî û romanê biqulipînî ser bûyerên tarîxî. Lê behsa çendine ji wan pêwist e. Di behsa sûretê 3-an de, te jî, min jî qala Pira Galatayê kir. Galata ku di umrê min de bûbû neqşeke esasî û di muhaciriya min a dirêj de bûbû siya xeyalên min, di eynî wextê de, bû warê yekemîn ê kuştinan. Li ser textên riziyayî yên Pira Galatayê, di tarîxa 6 Nîsan 1909-an de (ez dizanim, tu ji bikaranîna tarîxên weha hez nakî, lê ev jî pêwist in), Hasan Fehmî, sernivîskarê rojnama Serbestî, bi destê Ittîhatçiyan hate kuştin. Zabitekî ittîhatçî ji aliyê paşve hat û çend gule bera sîng û serê wî dan, hevalekî wî jî birîndar kir. Rojnama Serbestî ku bi destê dostê bavê min (û paşê jî dostê min) Mewlanzade Rifat derdiket, gelekî li dijî hukmê ittihatçiyan bû. Rojname ku ez jî paşê tê de xebitîm, li ser xeteke medenî û bi gotina ewrûpayiyan lîberal bû. Lê ittîhatçiyan bê xwe kes nedixwestin û loma jî Hasan Fehmî di nav xwînê de gevizandin... Lê ew

guleyên ku li sîng û serê wî ketin, di esasê xwe de, li sîng û serê dewleta Osmanî ketin. Bi wê cînayetê, mîna Hasan Fehmî, dewlet jî li ser cogan ket. Û wê cînayetê rê li cînayetên din vekirin.

Cinayeta herî mezin jî, di wan rojên ku tu niha behs dikî de hate pê. Hema çend hefte berî wan rojan, serekên ittîhatçiyan avêtin ser Bab–i Alî, yanê dilê gerandina karên dewletê Saadaretê. 23'ê çiriyê yê wê salê, ittîhatçî, çek di destên wan de, ketin hundir û li ber salona civînên hukimetê, saet 2 û 45'ê piştî nîvro, Nazirê Herbiyê Nazim Paşa, dîsan bi demançê, kuştin. Tevî wî, wan du kargirên din ên mezin ên dewletê jî kuştin û careke din dewlet, bi zora çekan, xistin destê xwe.

Ew roja ku tu niha behs dikî, em ji ber Bab–i Aliyê, Saaderetê derbas dibûn. Mîna her gavê, wê rojê jî, li ser wan kevirên ku di bin lingên me de dilîstin, gava em ji berê derbas bûn, kuştin bi bîra min ketin. Hukim ketibû destê xedaran. Her roj hin kuştin çêdibûn. Dewlet pir bi lez, ji leza me ya wê rojê pihêtir, ber bi deverên tarî gêr dibû.

Celadet dilezîne, destên wî di berîkên paltoyê wî de, serê wî li ber, hem li keviran dinihêre hem jî dipeyive û ber bi jêr dibe.

– Ah, Ceco, biraz yavaş yürüyemez misin?

Canan dikeve erdê. Celadet lê vedigere, tê ser wê û ji erdê radike, bi ken, wê hembêz dike. Demeke kurt ew welê di hembêza hev de dimînin û li hev dinihêrin. Celadet wê hinekî din ber bi xwe dikişîne û diguvişîne.

– Mon amoure, eger tu dixwazî, em vegerin pansiyonê? Celadet, bi henekî, jê dipirse.

Canan serê xwe dihejîne û aliyê din ê rê, aliyê keştiyê nîşan dide. Lê ew nagihên Basrayê. Gava ku ew xwe bi lengergehê digihînin, Basra jî hêdî hêdî avê diqelişîne û dere. Celadet bi hîdet destê xwe li ba dike û dide çêran. Lê keştî dere, mîna nazdareke spehî xwe li ba dike û di nav pêlên avê de ji wan bi dûr dikeve. Pêl wê dibin...

Tiştekî ku Celadet û Canan bikin, nîn e. Ew jî ji Basra rû badidin û hêdî hêdî berê xwe didin Galatayê, restorana Cenyo da ku li wir tiştekî vexwin, -heta ku keştiyeke nû bê.

3 Celadet, Canan û herdu birayên Celadet, Kamuran û Tewfîk berê xwe didin Galatayê, restorana Cenyo da ku li wir tiştekî vexwin, -heta ku keştiya saet pêncê danê êvarê tê. Cenyo mîna îstasyona keştiyan e, kesên ku li hêviya hatina keştiyan in, tên vir, çendek rûdinin, tiştekî dixwin û vedixwin û paşê derin. Kesên ku tên, bêtir rojnamevan û nivîskar in. Haya wan baş ji guherîn û pêşketinên cîhanê, rewşa dewletê û lîstikên siyasî yên li pey deriyan heye. Piraniya wan di rojname û kovarên Cağaloğluyê de dixebitin û alîgirên hêz û komên siyasî ne. Ji ber vê yekê ye ku navê Cenyo bûye "beroşa gotin û paşgotinê." Nûçeyên herî dawîn ên her tiştî, pêşî ji Cenyo tê bihîstin û paşê belav dibe.

Di van rojên dawiya tebaxa 1914-an de, nûçe û xeberên pir giran û girîng, bi leza birûskê, li pey hev tên. Şerekî pir mezin ê cîhanê dest pê kiriye, dewletên herî mezin û desthelatdar ên cîhanê ketine hev. Fransiz, ingilîz û îtalî li aliyekî ne, aleman, nemseyî û rûs jî li aliyekî ne. Herdu alî jî bi xurtî derin ser hev û bi xurtî hewl didin ku eniya xwe, bi dewletên dost û alîgir, fireh bikin. Ji bo herdu aliyan jî hebûn û piştgiriya Dewleta Osmanî pir girîng e û herdu alî jî li pey dostiya Dewleta Osmanî ne. Lê belê, Dewleta Osmanî ku di destpêkê de ne xwediyê siyaseteke diyar bû, niha siyaseta xwe diyar kiriye; ew piştgirî li eniya alemanan dike. Dewletê bi alemanan re peymaneke dostiyê îmze kiriye, generalekî alemanî kiriye serokê hêzên eskerî yên dewletê, seferberî îlan kiriye, hemû peymanên kevn ên bi dewletên din ên ewrûpî re, bi serê xwe, fesh kiriye û niha jî di nav haziriyên nû de ye.

Nûçeya herî dawîn a Cenyo ev e; ittîhatçî ku dewlet bi dest xistine û karên dewletê dimeşînin, haziriya êrîşekî mezin dikin.

Ew ê, bi îhtimaleke mezin, bavêjin ser Rûsyayê. Û ew ê herçi kesên ku dikarin çek hildin, bikin esker.

Di nav van xeber û haziriyan de Celadet û Canan jî haziriyekê dikin; ew ê di demeke nêzîk de destgirtî bin. Ew ê di Cenyo de hem hinekî rûnin û hem jî biryara xwe ya nû ji Kamuran û Tewfîk re bibêjin. Canan, bi bejna xwe ya dirêj, bi porê xwe yê dirêj, bi çavên xwe yên hunguvîn, îro, di nav fîstanekî binevşî de, bûye mîna jineke xewnan. Çavên wê yên kilkirî, mîna esmanê îro, dibiriqin. Rûyê wê yê xweş û sade dikene, mîna vê roja germ, germ e, dilê doralî germ dike.

Gava ew li kêleka maseyeke dirêj rûdinin, Kamuran dest li garsonê li ber derî dike û bi ken ji yên dora xwe re dibêje,

– Em ê vê xebera pîroz, bi qedeheke meya spî ya cemidî, pîroz bikin.

> Pênûsa te riya xwe vedike, tu bi qîma xwe yî. Min navê ders û şîretan li te bikim. Lê tu jî dizanî, riya qederê ne raste-rast e, fetloke ye, tê de gelek xaçerê hene û ew hemû qeder in, qederê tûnin pê. Ez dinihêrim, bala te gelekî li ser şexs û serpêhatiyên şexsî ye. Tu hin tişt, bûyer û pêwendiyên doralî ku li ser riya qederê ne, ji bîr dikî, yan jî nikarî li hûnandina romana xwe bînî. Em bibêjin, rewşa kurdan a wan salan, nemaze rewşa wan a li bajarê me Stembolê... Bi aliyekî ve, qedera min bi vê jî girêdayî bû, ev jî hîmekî esasî yê qedera min bû.
>
> Di nav wan teşqele û geremolên xurt ên siyasî û civakî de, kurdan jî xwe dilivandin. Destpêka salên 1910-an, ji bo kurdan jî girîng bû. Sala 1912-an, wan yekîtiyek bi navê Hêvî ava kirin. Amanca Hêvî'yê reşandina hêviyê bû. Kurd hewcedarê hêviyê bûn. Kurdan, bi taybetî jî xortên kurdan, xwe li dora vê yekîtiyê girtin. Mam û pismam, ap û biraziyên min jî tê de, bi xurtî, xebitîn. Wan bi navê Rojî Kurd, bi gotina wê rojê, muceleyek derxistin. Pismamê min Mihemed Salih Bedirxan sernivîskarê wê bû. Ew bavê Rewşenê bû. Belê, Rewşena ku dê paşê di rojên min ên teng û tarî yên jîna min a muhacir de, bibûya hevala

jîna min û diya zarokên min. Min Rewşen jî, cara yekemîn, di wan rojên Rojî Kurd de dît. Salih Beg, ji bo kovarê, bi navê "Hişyar Bûn" bendek, bi kurdî, nivîsîbû û dixwest wê nîşanî me bida. Ez jî li nik mamên xwe bûm. Ew li mala mamê min Mirad Beg bû. Rewşen û diya wê jî pê re bûn. Bi gotina Amojna Sitî, Rewşen hingî pariyekî zarok bû. Umrê wê ne li ser 4-5 salan bû. Ji wê rojê, porê wê yê gurmişkî û fîstanê wê yê rengîn di heşê min de man.

Heçî kurd bûn, benda Salih Beg rewşa wan baş nîşan dida. Benda Salih Beg weha dest pê dikir; "Ji birayên me kurdan re hişyarbûn divê. Heke ji paş niho jî em çavê xwe venekin û ji wê xewa giran hişyar nebin, ji me re kurdaniya me nahêlin û ê me ji nav holê bavêjin." Ev rêzên Salih Beg ku min jî paşê car bi car, ji nû ve, bi gelek hêncetan, nivîsîn, hewcedariyên herî bingehîn ên kurdan bûn. Kurdan yekitî, zanîn, hişyarî û hêzbûn diviya. Kurdên Stembolê bi vî karî rabûbûn. Malbata me bi xurtî di nav vî karî de bû, ez jî ketibûm nav refên wan...

Min dirêj kir. Min jî ceribandiye, ez dizanim, meriv çi jî bike, di neqişandin û avakirina xewn û xeyalên romanêkê de, nikare xwe bi her tiştî, bi her kitekitê, bigihîne. Lê gotina min ev e; di wan rojên tevîhev û bi lez de, li ser riya qedera min, li milekî evîn, hezkirin, coş, kêf, haziriyên destgirtiyê hebûn, li milekî jî amanc û hedefên mezin hebûn.

– Careke din, ji bo xebera pîroz, ji bo serfiraziya Canan û kekê me Celadet.

Canan, Celadet û herdu birayên wî dilopên dawîn ên piyanên xwe vedixwin û radibin pê da ku herin. Êdî wexta çûyinê ye.

Êdî wexta çûyinê ye. Wext, wexta barkirin û çûyina şerê giran e. Celadet û hevalên wî yên din ên zabit radibin ser piyan û ber bi konan belav dibin da ku xebera çûyinê bi eskeran bigihînin û li ser wan bin, wan îdare bikin. Ro hêdî hêdî li pey zincîrê çiyayên Torosê hil tê. Dinya çiksayî, hinekî hûnik e. Dinya hê nû

hişyar dibe, hê nû çile û zivistaneke xedar li pey xwe dihêle û ber bi germahiyê bi rê dikeve. Îro li vir, her tişt mîna xewnekê, mîna kitekitên efsaneyekê, yan jî yên romaneke nûjen, dixuyin...

Celadet di nav qapûtê xwe yê eskerî de, bi aramiya destê sibê, li dora xwe dinihêre. Çiyayên giregir û bi heybet, zozanên hêşîn û hûnik, esmana paqij û gewher, tîrêjên rengîn ên royê, refên teyr û qulingan, keriyên pezê gundiyan, dengê seg, rûvî û wawîkan, hîrehîra mehîn û hespan, dengê stranên zîz ê eskeran, bergehên yekta yên Torosê... ev hemû, perçeyên roja nû, mîna mehfûreke rengîn û tarîxî, li ber Celadet dixuyin.

Na, ne welê ye. Ew ne mehfûrên tarîxî bûn, ne jî kitekitên efsane û romanekê. Ew rastiya wê rojê, perçeyên rastî yên jîna min, yên romana Bîra Qederê bûn. Em li ser riya dûjehê, yanê li ser riya mirinê bûn. Dewleta Osmanî ketibû ser riya mirinê û em ber bi mirinê diçûn...

Dewleta Osmanî, bi dek û dolabên aleman û itîhatçiyan, êdî pir vekirî bûbû hevalbendê alemanan û ketibû nav şerê mezin. Stola Osmanî, bi alîkariya alemanan, di behra reş de girtibû ser wapûr, noqar û keştiyên Rûsyayê û ew dabûn ber topan. Paşê jî stolê avêtibû ser bajarê Odesayê. Êdî tîr ji kevanê firyabû... Siltan Mihemed Reşad, ew hukimdarê bêdeng û nazik, bi zora ittîhatçiyan, "Cîhad-î Muqedes" îlan kiribû. Cîhada ku li gora wacibên îslamê diviya ji bo "Ilay-î Kelîmetulah" îlan bibûya, niha ji bo piştgiriya alemanan îlan bûbû. Dewleta Osmanî û ordiyên wê êdî ketibû nav gulokên agir ên dûjehê. Êdî li ser hemû tixûbên wê şer hebû. Êdî hemû kesên osmanî, çi tirk û kurd, çi ereb û arnawid, çi çerkez û boşnak, di nav şer de bûn.

Şer, şerê man û nemanê bû, yê agir û şewatê, yê li ser Pira Siratê bû. Şer xurt û bêeman, xedar û kambax, bi bahoz û tofan bû. Wî herkes, her welat û dewlet, her gel û netewe, her kes û şexs dabû ber xwe û ber bi gorê dibir. Wê rojê, wî em jî dibirin.

Rastiya wê rojê weha bû. Lê ji aliyekî ve jî gotina te ye; şer xewnek e, kabûsek e. Tê de heş û mêjî, mantiq û wîjdan nîn e. Tê de hîsên xweş ên biratî, wekhevî û dostiyê nîn in. Bi

tenê tê de berberî û dijminatî, lêdan û xirakirin heye. Belê, ew kabûs e, bi ser merivan de tê, beden û canan dikuje, giyan û ruhan dişewitîne, însanan û însanetiyê kavil dike û dere. Û gava kesên ku li pey kabûsê mane, jê hişyar dibin, ew hew dikarin mûna berê bijîn. Nîvmirî, zîz, kesertijî, çavê wan li ser riya mirinê, ew jî êdî bi tenê rojên xwe yên "mayî" temam dikin da ku bikevin pey kabûsê û herin...

Wê roja zozanê çiyayên Torosê, em li ser riya eniya şer, bi gotina osmaniyan "Şark Cephesi" bûn. Sal 1915 bû. Şer pir germ bûbû. Agirên şer pêl bi pêl bi ser welêt de dihat. Welat bûbû dûjeh, meriv tê de difetisîn, dişewitîn. Herkesî ji xwe û ji der û dora xwe dipirsî; çima? Ji bo çi? Ji bo kîjan amanc û hedefan? Bi sed hezaran, bi milyonan meriv dihatin kuştin, xwîn diherikî, bajar dişewitîn, xirbe dibûn... Lê çima? Ji bo min û me kurdan jî bersîv nediyar bûn. Em ne ji rewşa welêt û kargirên wî ittîhatçiyan razî bûn ne jî ji rewşa kurdan û Kurdistanê. Siyaseta ittîhatçiyan hem li dijî welatê Osmanî hem jî li dijî Kurdistanê bû. Lê çare nîn bû. Em di nav şer de bûn. Welatê Osmanî welatê me bû jî. Diviya me ew biparasta. Loma kurdan jî, ji bo parastina welêt, çek hildan û ketin nav refên ordiya Osmanî. Em, kurd û bi sedan endamên malbata Bedirxanpaşazade, ketin ber bayê şer û her yek bi derekî de çûn. "Şark Cephesi" bû para min. Min cilên eskerî li xwe kirin û ez bûm zabît. Di destpêka şer de, Stembolî, rûniştevanên Stembolê, nediçûn şer. Lê gava xeberên nexweş ên eniya Çanaqalê hatin û hejmara miriyên wê eniyê gihîştin sed hezaran, birîndar bûn çar sed hezar, hingî çek û pûsad bi Stemboliyan jî hate girêdan û ew jî ketin nav refên şer.

Wê roja çiyayên qaîm û kevnar ên Torosê, em li rê bûn, ber bi "Şark Cephesi", ber bi qeda û bela, ber bi mirinê, diçûn. Stembol, bav û diya min, mal û malbata min, Şehrîban, Canan, bîhna beden û hêtên wê û gustîlên me li pey mabûn. Gotineke kurdan heye, dibêje; me berê xwe da oxirê, pişta xwe da felekê. Lê belê, wê rojê me bervajiyê vê gotinê dikir; me pişta xwe dida oxirê, berê xwe dida feleka xayin û fetbaz...

Tabûra ku Celadet pê re ye û ji bo bîhnvedana çend rojan, li zozanên Torosê, li quntara çiyan, kon vedaye dê niha, dîsan, bikeve rê. Topên giran ku ew dibin eniya şer, hinekî ji konan dûr, rêzkirî ne. Ker û hêstir, ga û gamêş, qantir û bergîrên tabûrê, li ber devê qelîşekeke çiyan, diçêrin. Ji konan dûr, li jêr, gund, xanî, rê û xaçerê dixuyin. Jiyan îro, hê nû, bi aramî û bi hemû bedewiya xwe, hişyar dibe. Mîna ku jiyan ne di nav şer de ye, mîna ku roj ne ya şer e. Jê ewçend bi dûr, ewçend cihê, jiyan li vir xwe li rojeke nû digire.

Lê Celadet û tabûra wî dê bikevin rê, tabûr xwe dide hev, kon radibin, çek tên girêdan, heywanên barên giran tên şidandin, zîn li hespên kumêt û qemer dikevin, teng û qûş li wan tên şidandin. Tabûr li rê ye, ew ê xwe li eniya şer bigire, xwe dirêjî aliyê din ê şer, şewat û mirinê bike... Mirin dikeve rê...

5

Mirin dikeve rê...

Çare nîn e, Celadet û hevalên doralî çi jî bikin, hew dikarin eskerê birîndar ji mirinê vegerînin. Birîna esker xedar e, hûr û rûviyên wî derketine der, ji eniya wî xwîn tê, çermê aliyekî rûyê wî rabûye, hestiyên spî yên rû dixuyin. Libasên eskerî yên li ser vî eskerê xort lîme lîme bûye. Jê bîhna xwîn, xwîdan, herî û barûdê tê. Jê bîhna mirinê tê. Çare nîn e, ruhistîn li ser qirikê siwar bûye. Eskerê bênav, bênîşan û bêsiûd li ber candanê ye.

Esker, bi xîreta xwe ya dawîn, çavên xwe, hêdîka vedike, li çavên ku ji jor lê dinihêrin, mêze dike. Çavên wî yên kelgirî, bi zîzî, bi hawar, li Celadet dinihêrin. Agir bi dilê Celadet dikeve, kezeba wî dişewite. Celadet dikare çi bike?.. Ew jî li kesên doralî dinihêre. Tu kes nikare tu tiştî bike; ne bijîşk û kargerên tenduristiyê hene, ne derman heye, ne alet hene, ne wasiteyên guhastinê hene û ne jî quwet û taqeta alîkariyê... Mirin ketiye rê, ew ê

vî eskerê ciwan jî, mîna bi sed hezaran eskerên din, bide ber xwe û bibe. Mirinê dora wan girtiye, ji her derî, her wext, bi ser wan de tê.

Çavên eskerê bênav, hêdîka, tên girtin. Sînga wî giran giran radibe. Zimanê wî derdikeve û bi giranî li ser lêvên zuwa digere.

– Ev tî ye, em hinekî av bidinê, yek ji kesên li ser esker sekinî dibêje. Dilê wî dişewite, hinekî av bidinê, bila tiya wî bişkê.

– Na, na, av jê re ne baş e, yekî din dibêje.

– De dirêj mekin, avê bidinê, Celadet, bêyî ku çavê xwe ji esker bizivirîne, dibêje. Avê bidinê, jixwe ew li ber mirinê ye, qet nebe, bila ew tî nere diyarê rehmetê.

Celadet hê weha dipeyive, ji aliyê derve dengekî din tê;

– Cîh vekin, cîh çêkin, sê birîndarên giran tên.

Tu wan rojên min ên ku bi rengên mirinê hatibûn risandin, bi bîra min tûnî. Tu nefesa mirinê, hilma mirinê bi bîra min tûnî. Hingî ez kumandarê qerergahê bûm. Konê me yê eskerî navenda îdara şerê kambax bû. Lê ne bi tenê weha, kon cihê razanê, xwarinê û dermankirinê bû jî. Hertim li wir çend birîndar hebûn û hertim piraniya wan çend birîndaran bi axîn û nalîn, li ber çavê me, dimirin.

Li qerergahê, yanê bi qewlê kurdên me yên başûr, li meqerê, zêde kes nîn bûn. Herkes çûbû qada şer. Lê çûn û hatin pir bû. Nemaze hatin û çûyina birîndar û miriyan. Qîmeta meriv ketibû bin lingan, bûbû pênc pere. Roja ku miriyên me hezarek yan çend hezar bûna, hingî zabitên giregir kêf dikirin û digotin; ""Müthiş bir şey, zayiatımız bugün çok az." Belê, te fahm kir, miriyên wan wê rojê pir kêm bûn!..

Mixabin e ku min bîranînên xwe yên wan rojan nenivîsîn. Û min ew kurte-notên xwe yên ku min li vir û li wir nivîsîbûn, şewitandin... Eger ew niha hebûna, wan ê gelekî alîkarî li te bikirana. Ji wan rojan bi tenê çend rêz di rûpeleke kovarên min de hene. Niha nayê bîra min ka ew kîjan kovar û kîjan hejmar bû, lê li wir min behsa birîndarekî kiribû. Birînên birîndar xedar bûn û tu kes nîn bû ku

alîkarî lê bike. Kurdan gotiye, "konê reş kêmaniyê qebûl nake." Lê li wî konê me tu tişt nîn bû. Şer, mîna hûtekî, her tişt xwaribû, qedandibû. Ez bi kêr û meqesan ketim ser birîndar, min birînên wî derman kirin, bi derzî hûr û pizûrên wî "dirûn" û ew danî aliyekî da ku ez vegerim ser birîndarekî din. Belê, ez bûbûm bijîşk!.. Min bi tenê ew birîndar ji mirinê xelas kir. Birînên wî cebirîn û ew hate ser xwe. Di nav wan sê salên şer de, hingî, bi tenê hingî, min xwe mesûd hîs kir û ez bi bijîşkiya xwe serbilind bûm.

– Korkunç yorgunum, şöyle on-onbeş dakika uzanacağım...

Celadet westiyayî ye. Bêrawest, du roj û du şevan xew neketiye çavên wî. Êdî tu taqeta wî nemaye ku ew bixebite. Ew xwe ji textê ku esker li serê dirêj bûye, dide alî û ber bi quncikeke kon dere. Li wir çend text li kêleka hev rêzkirî ne. Celadet ber bi yê herî koşê ku li kêleka singekî ye, dibe. Lê berî ku ew xwe li ser text dirêj bike, ew ji berîka hundirîn a qapûtê xwe nama ku bavê wî jê re şandiye derdixe. Ew, tevî qapût û potînên xwe yên eskerî, xwe li ser text dirêj dike û dest bi xwendina nama bavê xwe dike. Nama Emîn Alî Beg bi zimanekî xweş ê osmanî hatiye nivîsîn û gelekî dirêj e. Ew di namê de behsa diya Celadet Semîha Xanimê, zarokên din ên malê, ap û metên Celadet ên kal û pîr ku li Stembolê mane dike. Ew hemû baş in, "Di sihet û afiyetê de ne." Safter û Meziyet mezin bûne. Safter danên êvaran kursiyekê davêje ber devê bîra bexçê û li wir rûdine û klasîkên fransizî, bi fransizî, dixwîne. Wî şihîra Charles Baudelaire "le Balcon" û şihîra Alfred de Vigny "La mort du loup" jiber kirine û wan ji malê re dixwîne. Heçî Meziyet e, bûye stranbêjeke yekta. Ew stranên kurdî, osmanî, fransizî û farisî, "bi dengê xwe yê mîna qedîfe" dixwîne. Gava ew stranên xwe dixwîne, hemû Kızıltoprak lê guhdarî dike.

Emîn Alî Beg di nama xwe de hin gotin û henekên wê rojê yên Stembolê jî nivîsîne. Celadet bi ken, car bi car, wan gotinan dixwîne; "Kadıköy vapurlarında tenha yer bulmak için ya sihirli

kıyafetine girmeli yahut bol sarmısak yemelidir." Emîn Alî Beg hin henekên li ser şer jî nivîsîne; "Denizleri kurutmak suretiyle düşman taht-il bahirlerinin elde edilmesi meselesi müfekerat-ı avam kamarasında mevki-i müzakereye konulmuştur.... Suya düşen sulh kelimesini taht-ı bahirler çıkaracaktır..." Bavê Celadet bi rewşa wî û hewcedariya wî ya bîhnvedanê dizane. Celadet pir bi henekên ku bavê wî nivîsîne, dikene.

– Bavo, ax Bavo, ew bi keser dibêje.

Di namê de, piştî henekan, li ser rewşa Stembolê jî hin rêz hene. Emîn Alî Beg nivîsîna rewşê ji bîr nekiriye. Jiyan pir biha bûye, wapûrên Kadıköyê niha gelek tenha û bêkes bûne, kolanên Stembolê bêdeng bûne, buhayên tiştan pir û pir zêde bûne. Bihayê zêr di sedî de dusedpêncî zêde bûye, bihayên tiştan, bi gelemperî, hezarûşest caran zêde bûye, li bazarê dirav nemane, kirîn û firotin pir kêm bûye, xwarin û vexwarin nayên dîtin, hema çi bigire li her malê şîn heye. Stembolê reşa xwe girêdaye...

Celadet weha namê dixwîne û hêdî hêdî di xew re dere. Çavên wî tên girtin û name bi hêdîka dikeve ser sînga wî. Li kêleka xewa mirinê, ew jî dikeve nav xeweke kûr û giran.

6 Celadet ji xeweke giran hişyar dibe. Ber destê sibê ye, dinya nû ronî dibe. Celadet ku bi kincên xwe yên eskerî razaye, hêdî hêdî xwe dilivîne û li dora xwe dinihêre. Li odê, ji wî pê ve, kes nemaye. Roja eskerî û şer, ji bo esker û seraskeran, ji zû ve ye ku dest pê kiriye. Ji derve dengin tên. Welê dixuye ku zabit û seraskerên ordiya Osmanî xwe didin hev û haziriya roja nû dikin.

Roja nû... ku Ruhistîn wê çend hezar eskeran bide ber xwe û bibe?..

Gava Celadet radibe ser piyan û destemala xwe ya dirêj davêje ser milê xwe û ber bi derî de dere, ew, bi deng, weha difikire. Gelo qûtê Ruhistîn ê wê rojê dê çiqas be? Belê, qût ne tiştekî din... Lê êdî Celadet jî hînî vê jiyanê bûye. Ew jî êdî bi aramî li mirî û

birîndaran dinihêre, bi aramî behsa mirinê dike. Gava nûçeyên mirin û kuştinê tên, ew, hew mîna berê, li ber wan dikeve.

Celadet deriyê mezela eskerî vedike û derdikeve der. Bi qasî bîstekê, ew li ber derî radiweste, dest û milên xwe diguvişîne. Textê wî yê razanê, mîna teht hişk û sert e. Ew carina, bi qewlê fransizan "gymnastique" dike, lê ew zêde nikare xwe bilivîne, bilebitîne. Kar û şixulên wî her li garnîzona navendê ye. Tevî ku ew gelekî bala xwe dide xwarina xwe, ew qelew dibe. Ew hinekî li dora xwe dinihêre. Hewşa garnîzonê gelek fireh e. Garnîzon mîna keleheke biçûk hatiye lêkirin. Li ser dîwaran cîhên nobedaran hene, deriyê mezin ê garnîzonê ji hesin e. Hinekî ji mezelên zabitan bi dûr, bîreke mezin li hewşê heye. Di destpêka şer de, eskeran ew bîr vedaye. Bîr bûye navenda garnîzonê; ava vexwarinê ji bîrê tê kişandin, esker li kêleka wê kincên xwe yên tijî kêç û sipî dişon, zabitên mezin ên kuştî li wir tên şuştin û kefenkirin, danê sibê û êvaran, zabit li kêleka wê dicivin û sohbeta rojê dikin. Bîr bûye bîra qederê ya enî û qada şer.

Celadet, bi gavên giran, ber bi bîrê dere da ku dest û rûyê xwe bişo. Li aliyê din ê bîrê, çend zabit li pê, paşiya wan li Celadet, bi dengekî berz, sohbet dikin. Ew Celadet nabînin. Celadet radihêje dewla ber devê bîrê da ku ji bîrê avê bikişîne. Lê dewl tijî av e, yekî av kişandiye û welê hîştiye. "Bextê çê", Celadet bi ken dibêje, li ser totikan rûdine û dest û rûyê xwe dişo. Kêliyekê, bi herdu destan, ew bi ava sar rûyê xwe dişo. Ava sar hinekî wî zînde dike û xewa li ser çavên wî davêje. Serşoka mala wan a Kızıltoprakê û ew demên rengîn ên serşokê tên bîra wî. Niha? Niha ew çiqas ji wir, ji wan bi dûr ketiye!.. Ew ê bikaribe, dîsan, xwe bi wir û bi wan deman bigihîne?

Celadet bi hêdîka radibe ser piyan, bi destemala dirêj dest û rûyê xwe zuha dike. Di wê navberê de çend gotinên sohbeta zabitên li aliyê din ê bîrê bi ber guhê wî dikevin. Di sohbeta wan de gotinên "lo, lo... zo, zo" derbas dibin. Celadet bi dîqet guhê xwe dide wan û ber bi wan dere.

Belê, lo kurd bûn, zo jî ermen... Wan zo qir kiribûn, dor hatibû loyan... Wan zabîtên wê rojê qala qirkirin û mirinê dikirin. Dewletên mezin ew dikuştin, wan jî zo kuştibûn, lo li dorê bûn.

Hingê em li Bakuyê, li eniya Qevqesê, bi gotina osmanî li "Kafkas Cephesî" bûn. Havîna 1917-an bû. Şer bi awayekî boş dewam dikir lê êdî xuya bûbû ka kî dê zora kê bibe. Yekîtiya Dewletên Amerîkayê, ji bo piştgirtiya ingilîz, fransiz û îtaliyan, ketibû qada şer. Bi vê biryara Amerîkayê, êdî serketiyên şer baş diyar bûbûn. Dewleta Osmanî şikestên xedar xwaribû, hew dikaribû li ber xwe bide. Li her cepheyê şikest hebû û hejmara miriyan digihîşt sed hezaran. Li welatê Qefqesê jî, bi deh hezaran esker, bêyî ku tu tiştî bikin, di nav berf, sar û seqemê de, bêzar û bêziman, bê gor û goristan, li welatekî xerîb, serê xwe danîn. Ittihatçî bi ser ketibûn; dewlet ji hev diket, têk diçû. Itîhatçî bi armanca vegirtina hemû Qafqasê û Asyayê, welatê bav û kalên xwe, ketibûn rê. Mirîşkên birçî di xewna xwe de garis didîtin... Lê xewna wan qulipî ser kabûseke ewçend xedar ku pê hemû welatê Osmanî leqiya, hejiya û di dawiya dawîn de jî winda bû, çû.

Di gel vê hindê, ittîhatçî hê jî dev ji fortên xwe bernedabûn. Ew ne ji kera xwe peya dibûn ne jî ji pozê xwe mû dikişandin. Ew leheng û qehreman bûn... Wan di hatinê de zo qir kiribûn, niha di vegerê de, dor a loyan bû... Heçî qetliyama ermenan bû, rast bû. Bi sed hezaran ermen, kal û pîr, zar û zêç, jin û mêr, bi dek û dolab, bi plan û bernamên itîhatçiyan, ji mal û warên xwe hatibûn veqetandin û di riyên dirêj, asê û çetin ên koçan de, bi destê çeteyên itîihatçiyan hatin kuştin... Pêl bi pêl, li ser hev, bi hovîtî. Serekên ittîhatçiyan ji diz, keleş, pêxwas, mêrkuj û nezanan, bi navê "Teşkîlat-i Mahsusa", çeteyên çekdar ava kiribûn da ku bi wan ermen qir bikin, reh û rêçên wan biqelînin. Ittîhatçî di vê plana xwe de bi ser ketibûn.

Gava em ji çiyayên Torosan, ber bi qada şer dihatin, min bi xwe, bi çavên xwe, li ber devê riyan, di kort û çahlên şikêran de, bi sedan cendekên ermenên mirî dîtin... Min ev tişt hemû ji Mistafa Kemal Paşa re, di nama ku min jê

re şand de, bi kitekit, behs kir. Dawiya mirin û kuştinê heye? Payanên kîn û nefretê hene? Ma xwîn bi xwîn tê şuştin? Merivên ku rê û rêçûna xwe li gora kîn û nefretê bi rê dixin, bivê-nevê, di nav kîn û nefreta ku wan çandiye de digevizin...
Ittîhatçiyan xwîn rijandibû û wan xwîn, ne bi avê, bi xwînê dişuştin.

Celadet dere nik zabitan û bêdeng li wan guhdarî dike. Gotin li ser ermen û kurdan e. Zabitekî simbêlqît, bi ken, dibêje;

– Tıpkı Zo'lar gibi Lo'lara da iyi bir ders vermek lazım...

– Nasıl verecekmişsin, ver bakalım... Ben de Lo'yum...

Bêyî ku Celadet xwe bilivîne, yan jî xwe eciz bike, bi ken, bersiva zabit dide. Zabit hinekî şaş dibin. Zabîtê ku qala zo û loyan dike, hinekî xwe dilivîne ku bersivekê bide, lê ew nizane çi bibêje.

– Estagfirullah, ew dibêje, Celadet Beg, em dizanin, tu stembolî yî...

– Belê, ez Stembolî me, lê kurd im jî... Celadet destê xwe yê çepê datîne ser kevirên dîwarê bîrê û bi aramî dibêje... ji bîr mekin, merivên ku rê û rêçûna xwe, li gora mirin û kuştinê, bi rê dixin, bivê-nevê, di nav xwîna xwe de digevizin...

FOTOGRAF 6

"Jeladet Alî; he suffers from the inevitable effects of long residence and training in constantinople, but he has the makings of a good man..."

1 Şer, şerê cîhanê ê mezin, careke din, qayida xwe ya esasî diyarî însan û însaniyetê kir; merivên ku rê û rêçûna xwe li gora mirin û kuştinê bi rê dixînin, di nav xwîna xwe de digivizîn. Dûzan û ahenga cîhanê, ji binî ve guherî, dewletên biserketî, Ingilîstan, Franse û Italya, niha, dûzaneke nû, li gora armanc, hedef û xwestekên xwe, didin cîhanê. Alemanya, Rûsya, Dewleta Osmanî û alîgirên wan têk çûne, dûzana wan hilweşiyaye, ax û tixûbên wan ji hev ketine. Nalîna şînê û bîhna dû û dûmanê ji wan radibe.

Di nav vê agir û şewatê, dû û dûmanê de, qîmeta fotograf û wêneyan, yekcar zêde bûye. Pevçûn û şer, mirin û windabûnê, yekcar, fotograf kirine tiştekî esasî yê jiyana civakî. Bi hezaran, deh hezaran, sed hezaran û milyonan meriv di şerê bêhempa de, di berî û deştan, newal û geliyan, kort û kozikan de, di çiya û dahlan de, bê gor û goristan, bê kefen, mirin û hatin kuştin. Ew bê nav û nîşan, bê şop û şûv, bê wêne û foto çûn. "Qet nebûya, hin wêneyên wan hebûna..." Bi dû şer re, însaniyetê ji sed hezaran malên xwedî mirî û kuştî qîrîn û nalînên weha bihîstin. "Qet nebûya hin fotoyên wan hebûna, ew li ser dîwar, mase û refên kitêban li yên mayî binihêrtina... Yên mayî jî li wan binihêrtina û bigotina, bavê me, mêrê me, birayê me, mamê me, xalê me ev e... ew weha bû, jiya û mir..."

Mirinê nemiriya fotografê bi bîr aniye. Însan û însaniyetê niha baş bîr pê biriye ku, fotograf vejandina miriyan e, herwekî ku filîsofekî fransiz gotiye, vegera miriyan e. Fotograf di navbera herdu cîhana de çûyin û hatin e, hem bîr bi nemiriyê, hem bi mirinê birin e. Fotograf rawestandina wextê, dewr û dewranê ye, li dijî dem û wextê şerekî bêhempa ye.

Loma jî, niha, meriv li her aliyê dinê, li ber deriyên studyoyên wênekêşan, di rêzê de ne. Miriyên wan, bêyî ku li pey xwe tiştekî bihêlin, bê nav û nîşan, bê rû û sûret çûn. "Qet nebe, bila ew welê nerin..." Loma jî foto û fotokêşê, niha, yek ji meslegên herî baş, herî bi qezenc, herî maqbûl û herî bi "sewab" e. Niha, piştî şerê kambax, herkes li pey rû û rûçikê xwe yê nemir e. Herweha rêzên dirêj li ber deriyên studyoyên fotografkêşên Stembolê jî hatine pê. Stembol, payitextê Dewleta Osmanî ya têkçûyî, jî, piştî mirina dewletê, niha ketiye pey nemiriyê û xwe li ser kaxizên reş û spî "qeyid" dike.

Mîna herkesî ku xwedî îmkan in, malbata Bedirxanpaşazadan jî xwe li ser kaxizan qeyd dikin. Hem mêr, hem jin, lê pirî caran ji hevûdu cihê. Ew ji deverên şer, mirin û kuştinê vegeriyane û li milekî xwe ji nû ve didin hev û li milekî jî, bi qasî ku ji destê wan tê, xwe dikin nemir û wêne li ser wêne zêde dikin.

Fotografa şeşemîn a romana Bîra Qederê di wan rojên hilweşîn, keft û leftên dûzana nû û demên rêzên dirêj ên li ber studyoyên fotokêşan de tê kişandin. Lê ne li Stembolê, li Kurdistanê. Ne di studyoyeke fotokêşekî de, li bexçê maleke kurdî. Ne ji aliyê osmanî yan jî kurdekî, lê ji aliyê zabitekî ingilîz, Major E. M. Noel.

Li ser fotoyê du kesên nas hene; Celadet û birayê wî Kamuran Alî Bedirxan. Herdu li pê, li kêleka hevûdu, li ber sitûneke stûr a şaneşînekê sekinîne. Dar û berên bexçe bergeha fotografê dixemilînin. Celadet li kamarayê, Kamuran li aliyê bexçê dinihêre. Herdu jî bi simbêl, bi kincên siwaran, lê bi qirawat in. Porê herduyan jî, bi paş de, şehkirî ye. Celadet bi qasî çend tiliy-

an ji Kamuran dirêjtir e û bi qasî çend tiliyan li pêş wî rawestaye. Şivekî siwaran di destê Celadet de ye. Kamuran, dest ber bi jêr, bi awayekî serbest sekiniye. Ji rawestana herduyan dixuye ku Celadet bêtir xwedî berpirsiyarî û gotin e. Herdu bi rêz û rêzdarî sekinîne. Awirên wan cîddî, nêrîna wan kûr e.

Kincên ku wan li xwe kirine, nû ne û ji kincên siwar, rêwî, nêçîrvan û seyidvanên îngilizan in. Çaketên herduyan jî, ji navtengê, bi kemerekê, hatine şidandin. Pantolon ji jor fireh, ber bi delingan teng in. kincên herduyan jî mîna hev in. Kinc ne yên mintiqê ne, ne yên welatê Osmanî ne jî. Kincên wan yên ewrûpayiyan in. Yanê du kurdên ji maleke navdar a kurdî, bi cil û bergên ewrûpayî, li welatê bav û kalan in. Du Stemboliyên kurd li welatê kurdan in.

Ji awir û nêrîn, cil û bergên wan, ji şiva destê Celadet dixuye ku ew bi wezîfene girîng rabûne û rêwî ne. Ew, hazir, xwe şidandî, ciddî, li ser rê ne. Di geremola piştî şer de, di keft û lefta avakirina dûzana nû ya cîhanê de, ew jî li ser hin riyan in, li pey hin doz û dawan in. Fotografa şeşemîn a romana Bîra Qederê, bi qasî mistekê be jî, rewş, alozî, dawe û dozên piştî şerê cîhanê nîşan dide. Fotograf, bi bergeha xwe ya xuyayî û bi aliyên xwe yên nexuyayî, hem riyên nû yên li ber Celadet û Kamuran nîşan dide hem jî riyên nû li ber romana Bîra Qederê vedike.

Tiştekî din ê bergehê jî heye ku meriv divê, ji bo temamkirina saloxdanê, behs bike; ji ber û pelên daran xuyaye ku dinya germ e, wext, wexta dar û ber, gul û kulîlkan e.

2 Dinya germ e, wext, wexta dar û ber, gul û kulîlkan e. Tîrêjên tava danê êvarê yên Stembolê, ji pencera oda otêlê, bi ûsil, xwe digihînin hundir.

Canan, hêdîka, ji ser cîhan radibe û bi gavên nerm ber bi pencerê dere. Celadet, di nav cîhan de dirêjbûyî, lê dinihêre. Rojeke havînê ye. Celadet û Canan li otêla navdar a Stembolê Pera

Palasê, di odeyeke fireh de ne. Hema çi bigire, ew hemû roj li odê, di nav cîhan de mane. Bi tenê, destê sibê, ew derketine û li kolanên teng ên Pera û li ser Rue du Pera ya fireh geriyane. Bi tenê, bêdeng û bêyî qîreqîra şêniyan. Bi rêberî û hevaltiya seg û pisîgên kolanan. Ji vê gera sibê pê ve, ew her li odê mane. Di nav cîhan de, tazî, peregende, bi kel û coş. Bêyî gotinên zêde.

Celadet, kêlîkekê, li Cananê dinihêre. Paşê ew xwe dirêjî ser masa biçûk a kêleka textê razanê dike, şûşa şaraba spî ya taybetî ya Pera Palasê werdigire û jê çend dilopan bera piyana xwe dide û wê vedixwe. Tahmeke tirşokî a xweş û hênik devê wî tijî dike. Tahm di dev de, ew serê xwe datîne ser bahlîfê û bîskekê çavgirtî dimîne. Dinya niha çiqas sakîn û aram e! Ew çiqas xweş e! Mîna ku ew rojên şer berî niha bi sedan sal bûn. Ew niha ewçend dûr, ewçend li pey mij û dûmanê, li pey perda xewn û xeyalan mane... Dinya çi ecêb e! Tahma tirşokî ya vê şarabê û ya xwînê çiqas ji hev cihê ne. Bîhna xwîdana vê odê û ya kozikên şer çiqas ji hev dûr in! Lê meriv van hemû tiştên ji hev pir cihê, li gora şert û mercan, qebûl dike û dijî. Bi qasî dinê, însan jî ecêb e.

Celadet dîsan xwe dirêjî masê dike û îcar ji serê cixareyekê ku bi pelekî taybetî ya fransizî "la paix" pêçayî ye, digire û wê bi heste vêdixe. Celadet bi destê xwe yê çepê bahlîfa xwe dikişîne ber dîwêr, pişta xwe didiyê û hem cixara xwe dikişîne hem jî li Cananê û tîrêjên rengdayî yên li pey pencerê dinihêre. Pelên cixarê yên la paix,yanê yên aştiyê li van rojên piştî şer û qiyametê tên. Digel ku hêlekana nediyariyê hê jî dere û tê, dinya westiyayî îro aş bûye. Dengê top û tifingan hatiye birîn, ordî vekişiyane kozikên xwe, dûmana barûdê bi esmanan nakeve, xwîn mîna lehiyê naherike, îro ji şînên ku hê jî dewam dikin pê ve, dengê nalîn û qîrînan hatiye birîn, ruhistîn ketiye xeweke sivik. Herkes sakîn, birîndar, westiyayî û aram, li xwe vegeriyaye û birînên dil, beden û ruhê xwe dicebirîne. Celadetê ku bi pelê cixarê yê la paix cixara pêçayî dikişîne, li Stembolê, mal û malbata xwe, yar û dostên xwe, li evîn û evîndarên xwe vegeriyaye.

Gava ew hê di nav seqem û berfên sar û refên germ ên şer de bû, hê hingê, wî xeyala Stembol, Pera Palasa navdar, roj û şevên germ û nerm ên Pera Palasê kiribûn. Hê hingê wî soz dabû xwe, eger ew sax û silamet ji şer, sar, serma û pûka Qafqasê xelas bûya, wî dê, çend roj li ser hev, bêyî ku derkeve, tevî evîndara xwe, li Pera Palasê derbas bikira. Mirinê, şert û mercên kambax ên şer soz û qewlên weha xweş pê dabûn dayin. Wî niha, bi coş û daxwaz, qewlê xwe bi cîh danî.

Digel ku Pera Palas niha hertim tijî bû û bi taybetî serokên hêzên dagîrker ên Stembolê li wir bi cîh bûbûn, wî odeyeke xweşik ku ber bi aliyê zeryayê bû, ji bo sê roj û şevan, veqetandibû, Canan jî wergirtibû û hatibû.

> Herê, Pera Palas... ev avahiya spehî ku berî min bi salekê hatibû dinê û ji bo rêwiyên ewrûpayî ku bi Orient-Expresê dihatin Stembolê amade bûbû, navenda Rojava û Rojhelatê bû. Hemû "kor-diplomatique" welatên Ewrûpayê li wir bûn. Paşa, kumandar, wezîr û sadrazamên welatê Osmanî li wir bûn. Karên dewletan û çerxa felekê li wir digeriya. Qedera gel û miletan li wir dihate pê. Xwarin û vexwarinên herî xweş li wir bûn. Meyên "Medoc Superior, Hochheimer, Chianti" û şampanyayên "Cordon Vert, Veuve Clicquot" li wir bûn. Musîka Osmanî ya yekta û balo, dans û valsên bêhempa yên ewrûpî li wir bûn. Asansora yekemîn a bi elektrîk li wir bû. Bergeha xweştirîn a Boğazîçiyê, bi gotina ewrûpayiyan Bosporê, li wir bû...
> Hevrê û rêberê min ê evîn û evîndariyê Ovidius li derekî jî weha gotibû; "Meriv gurên hev in..." Di wan rojên tarî yên nêçîra ruhistîn de, ez gelek caran li vê gotinê fikirîm. Meriv, bi rastî, gurên hev bûn, mîna guran diketin gewriya hev û cîh li hev dikirin gola xwînê. Hê hingî, ez li Pera'yê, cîhê gurên mezin difikirîm. Hem ji bo qesta felekê hem ji bo fahmkirina çerxa dinê û şerê guran.
> Lê, wê roja ku tu niha bi kurtî behs dikî, ez li gotineke din a Ovidius difikirîm; "Evîn bi jîna şervanekî dişibe, ew ne karê tirsokan e." Jîn bi xwe, ger di şer de, ger di aştî de, şer bû, jê re şervanî diviya. Bi tirsokî û dudilî jîn nedibû jîn...

Canan, tazî, li kêleka pencerê sekiniye û li dever dinihêre. Celadet jî li wê. Ew wê ji kêlekê dibîne. Canan hinekî din xwe xwar dike. Şeq û hêtên wê yên spî û zirav hinekî din vedibin. Canan mîna sitûneke romî lihevhatî, mîna Afrodîteke jîndar spehî ye. Tîrêj zerahiyeke vekirî didin bedena wê ya ciwan. Pûrtên bedenê rengîn dixuyin. Porê wê ji mil û stû ber bi jêr dibe. Memik, bi gotina stranên kurdî, mîna purtaqalê, tijî û rakêşiyane. Navpişt, xêzeke xwar dikişîne û heta ber gurmikê tê. Gurmik, mîna kevaneke vekişiyayî, mîna îspata gotinên Ovidius, bi hemû bedewiya xwe, li hêviya dest û tiliyan e. Gurmik, mîna navenda cîhanê, li wir, li ber pencerê ye. Ewçend ji Celadet dûr, ewçend li Celadet nêzîk!..

Piştî ku Celadet cixara xwe di xwelîdanka li ser masê de vedimirîne, ew radibe û dere nik Cananê. Ew wê, bêdeng, ji paş ve, hembêz dike. Boğazîçî, yanê zerya, bi rengê xwe yê keskeşîn li ber wan e. Li milê din ê Boğazîçî´yê, li aliyê Anatoliyê, warên Celadet û Cananê dixuyin. Ji kêlekê ve jî, saraya kevnare ya sultanên Osmanî Topkapi, li ser gir û di nav hêşînahiyeke boş de, dixuye. Li ser avê, keştiyeke direj û mezin, hêdî hêdî, ber bi aliyê jor, Zerya Reş, dere. Tîrêj li ser avê diçirûskin. Dinya di nav rengên vekirî de, çikvekirî ye.

Stembol, bi hemû xweşî û bedewiya xwe, li ber lingên wan e. Stembol, bajarê xwediyê ewr û esmanên şîn û av û behrên şîn; bajarê xwediyê mizgeft, dêr û sînagogên bedew û rengîn ên herî xweş; xwediyê ziman, ol û çandên dewlemend û cihê; xwediyê keleh, birc û sûrên bilind, direj û bêdawîn; xwediyê qesr û qonax, saray û koşkên medeniyetên cihê; xwediyê kuçe û kolanên teng, minarên bilind, sûk û bazarên gemarî, xan û hemamên tarî; xwediyê çayxane û meyxanên germ, esrar û heşîşxanên dûmantijî; xwediyê mal û kerxanên kufikî, medrese û kitabxanên zîvhêlî û neqişandî; xwediyê tava germ, tîrêjên sor, heyva ron û stêrikên çirûsî... Celadet li Stembolê dinihêre.

– Canan, mon cherie, li Stembolê binihêre, Celadet dibêje, bêyî ku xwe bilivîne û destên xwe jê bikişîne. Li îspata jînê binihêre. Di nav sînga şer de, ez her li vî bajarê ku gelekî bi min û qedera min dişibe, ku huwiyeta wî jî bi huwiyeta min dimîne, difikirîm. Ez welê bawer bûm ku min ew dinasî, min her alî, tişt û milê wî keşf kiribûn. Lê ez dibînim ku ez hê jî wî nas nakim, min hê jî ew baş keşf nekiriye. Min, piştî şer, hîn çêtir fahm kir ku ez nikarim bêyî Stembolê bijîm. Ev ne mumkin e. Stembol bajarê min e, qedera min e, ez im...

3 – Dewleta Osmanî nikare bêyî Stembolê bijî, Mewlanzade Rifat Beg dibêje. Ev ne mumkin e, Stembol bajarê me osmaniyan e, ew em in... Lê, binihêrin ka ew îro ketiye çi halî...

Mewlanzade Rifat Beg, rojnamevanê lîberal ê navdar ê hemû welatê Osmanî, dostê Bedirxaniyan, muxalifê desthilatî û zordestiya rejîma Ittîhatçiyan, li Cağaloğluyê, li buroya rojnameya xwe "Serbestî", tevî çend dostên xwe, rûniştiye û ji wan re, bi dengekî ecizbûyî, bi tirkî, behsa rewşa dawîn a Stembolê dike. Celadet jî li wir, li wan guhdarî dike.

Oda ku ew tê de rûniştine, biçûk e. Mewlanzade Rifat Beg li pey maseyeke dirêj a kevn, di destan de pênûsek, Celadet û yên din li pêş masê, li ser kursiyên çermîn rûniştine. Serê masê tijî kaxiz, kitab, rojname û kovar in. Ode tijî dixan e. Herkes cixare dikişîne. Esebiyeteke eşkere dixuye.

– Belê, mutareka Mondrosê çêbû, lê ev halê îro, ne tu hal e. Diyên ku lawên xwe, jinên ku mêrên xwe li eniyên şer şehîd dane, îro, ji bo nanekî sed dîrhemî ku jixwe nayê xwarin, bi saetan, di serma û pûkê de, li dorê disekinin. Hê jî, hebûn û zexîrên xelkê, bi navê "teklîf-î harb" ji destê wan, bi darê zorê tên standin. Hê jî xelkê reben û bêçare di bin nîrê cendirme û polîsan de dinale. Hebûn, zexîre û tiştên ku ji xelkê tên standin, di nav zabitan de winda dibe. Ew mîna malên bavê xwe wan

dixwin... Herçî dewlet e, îflas kiriye. Pereyên ku di dema Sultan Evdilhemîd de derketibûn, îro xelas bûne. Di dema şer de sedûpêncî milyon lîrayên kaxiz derkete piyasê, lê bêyî buhayê wan ê zêr... Ez çi bibêjim, pere nîn e, îdare nîn e, hukim nîn e, gerandina karê dewlet û welêt nîn e, yekitî û yekbûn nîn e, azadî û serbestî nîn e, demokrasî û însaniyet nîn e û Stembol jî, dilê welêt, mêjiyê dewletê, ji dest çûye. Hêzên çekdar ên dewletên serketî, bi quwetên xwe Stembol îşxal kirine...

Çaxa ew dipeyive, rîha wî ya dirêj û simbêlên wî yên badayî, ber bi jor û jêr, dilivin. Ew berçavikên xwe yên zirav ji çavên xwe derdixe, wan datîne ser masê, yek bi yek li dostên xwe dinihêre û paşê çavên xwe li ser Celadet radiwestîne.

– Celadet Bey, îro, rojnamevanê me yê herî baş, herî xurt e, ew dibêje. Wî do bendek nivîsî û anî, lê guhdarî bikin ka ew di derekî bendê de çi dibêje.

Ew dîsan berçavikên xwe dibe çavên xwe, ji nav tomara kaxizan çend rûpelan werdigire, rûpel bi rûpel li wan dinihêre, li derekî radiweste û dest bi xwendinê dike;

"Kendileri kürklere büründüler, milletin derisini soydular. Kasalarına altın doldurdular, bizim ceplerimize kağıt tıktılar..."

Bi vî terhî, ew demeke dirêj beşina ji benda Celadet ji wan re dixwîne.

> Ew rêzên pêşîn ku Mewlanzade Rifat Beg, bi tirkiya xwe ya gelekî xweş, xwendibûn, ne rêzên min bi xwe bûn. Min ew ji nivîskarekî tirk wergirtibûn. Wî nivîskarî li dijî curumkarên şer Ittîhatçiyan bendeke gelekî xweş nivîsîbû û min jî çend rêz ji benda wî wergirtibûn... Mewlanzade Rifat Beg, her mîna ku te got, rojnamevan û siyasetvanekî hêja û navdar bû. Merivekî lîberal, bi serbestî û azadiyê, heq û hiqûqê bawer bû. Ew gelekî dostê malbata me û bavê min bû. Piştî derketina me, li welatên xerîbiyê jî, em bi hev re bûn. Me bi hev re kar û şixul gerandin, bi hev re derd û keserên welatê xerîbiyê kişandin. Û gava wî di destpêka salên 1930-an de, li Helebê wefat kir, bila yeqîna

te ji Xwedê hebe, ew di nav bêkesî, neçarî, belengazî û rebeniyeke ewçend zîz de wefat kir ku ez bi salan pê êşiyam, dilê min pê şewitî. Ew alîm û ronakbîrê ewçend hêja û navdar di bin perda reş a bêkesî, nenasî û tenêtiyê de serê xwe danî axa rehmetê. Haya kesî jê nebû, şîneke layiqî wî çênebû, civateke hêjayî wî nehate gerandin, mîna gelek zane û ronakbîrên me, ew ji bîr bû û çû. Mêr dimirin, li pey wan nav diman, lê li pey Mewlanzade Rifat Beg ne nav, ne şan, ne şop, tu tişt nema...

Ez vegeriyabûm Stembola tev li hev. Rojên şer li pey mabû, lê şerekî nû dest pê kiribû. Min kar, şixul, mal, dezgeh, pêwendî, hedef û armanc diviyan. Min ê çi bikira, berê xwe bida ku? Kurdan gotibû; teyr baş e, bi refê xwe re. Ez ê bibûma hevalê kîjan rêz û refan? Min xwendin û nivîsîn, îlim û îrfan, rojname û kovar hilbijartin. Min da ser vê riyê. Ez nikarîbûm bibûma paşa, zabît, tucar, dûkandar, karmend, hembal, berdevk, peyayê malê û xemxwurê karên rojane. Ev kar û tişt li min nedihatin. Ne bala min li ser wan bû û ne jî wan heyecanek dida jîna min... Lê nivîskarî, rojnamevanî, kar û dozên mezin, hedef û armancên bilind û pîroz heyecaneke bêpayan didan min. Ez, yan jî ez bira, mam û merivanên xwe jî bihesibînim û bibêjim em, bi bîr û dîtinên Roussaou, Dîderot, Voltaire û feylesof û nivîskarên din ên şoreşên Fransayê, bi şiîrên Ehmedê Xanî û Omer Xeyam û bi ders, tecrube û serpêhatiyên Mîr Bedirxan perwerde bûbûn. Ma me qîma xwe bi karên rojane dianî? Min refê xwe hilbijart... Hingî du mecmua hebûn ku li ber dilê me hemûyan pir ezîz bûn; Içtîhad a Abdullah Cewdet Beg û Serbestî ya Mewlanzade Rifat Beg. Gava min daxwaza xwe ya xebatê, li cîhê Serbestî, ji Mewlanzade Rifat Beg re got, wî berçavikên xwe derxistin, ez hembêz kirim, "mükemmel, mükemmel" got û ez li aliyê din ê buroyê, li ber maseyeke biçûk dam rûniştin. Bi vî awayî, min dest bi xebata rojnamevaniyê kir.

Serbestî, ji bo min, bû xwendegeheke bêpayan. Ew odeyên teng, tarî, sar û kevn ên Cağaloğluyê bûn kahniya ronahî û zanînê, bûn warê bikaranîna ziman û hînbûna nivîsînê. Ez qayide û prensîbên rojnamevanî û rojname-

geriyê, hîmên ehlaqê wan, şêwe û awayê xebatê, çeşn û ûslibên cihê yên nivîsînê, li wir hîn bûm. Li wir, ez bêtir ketim nav fikir û baweriyên azad û serbest, min ferq xistin navbera xwe û her celeb fikrên zordest... Rojnamevanî, herwekî nivîskariyê, huner û hunermendî ye. Meriv divê bi hunera wê bizanibe. Meriv divê bi zimanê gotinên bêziman bizanibe, zimanekî jîndar bide wan, wan bi xwîn û goşt, reh û hestî bikemilîne, bala xwendevan bikişîne, wî zimanê lêkirî bi xwendevanan bigihîne, bikaribe kêm û kurt binivîse, di navbera yên girîng û yên negirîng de, yên girîng û pêwist hilbijêre, kalîte û hêjahiyê bîne pê, êrîşker nebe, xwe ji neheqiyan bide alî, nebe sebebê şer, bîhntengî û xirabiyan, rojnamê ne ji bo hesûdî, zikreşî, paşgotinî, xirabî, xirecir, xirakirin û îspata cehaletê, lê ji bervajiyê, ji bo perwerdekirin, pêşxistin û çêyiya meriv, gel, netewe û welat, bilindkirina qada agahî û zanînê, pêkanîna awayekî baş ê biratî, samîmiyet û afirînê biweşîne. Dergaha Serbestî'yê ev qayide û yên mîna van ên rojnamevaniyê hînî min kirin. Di wan rojên nanezik, nexweş ên yan pir sar, yan pir germ de, ruh û mêjiyê min bi tecrubên nû dewlemend bûn.

Serbestî rê li min vekir ku ez bikaribim rojname û kovarên ku min paşê, li welatên dûr û xerîb derxistin, biweşînim. Eger ew tecrubên rojên Stembolê nebûna, ne Hawar û kitabên wê ne jî Ronahî derdiketin. Ez ne bawer im ku ew ê bikaribûna derketina...

Piştî ku Mewlanzade Rifat Beg xwendina xwe temam dike, ew dîsan berçavikên xwe derdixe û ji dostên xwe dipirse,

– Azizim, aynen böyle değil mi? Celadet Bey'in hal ve ahval ile ilgili söyledikleri doğru değil mi?

4 – Azizim, aynen böyle degil mi? Emin Alî Bey'in hal ve ahwal ile ilgili söyledikleri dogru degil mi?

Kurdên bijarte yên Stembolê li cîhê Kürt Teali Cemiyetî, li salona fireh a Behçet Paşa Konağı rûniştine û li gotara Emîn Alî

Begê Bedirxanî guhdarî dikin. Gotar li ser hal û hewalê welatê osmanî û rewşa kurdan e.

Salon tijî ye. Zane, rêber, serek, paşa, zabit, dîplomat, alîm, nivîskar, rojnamevan, mîr, serekeşîr, axa, şêx û gelek kesên din ên ji cîh, war û meslegên cihê yên kurd li wir civiyane. Kurdan li Stembolê rêxistineke nû ya siyasî ava kirine; Kürt Teali Cemiyeti. Hemû kurd tê de ne û heye ku cara yekemîn kurdan, li wir, xwe dane hev. Serekê Cemiyetê Seyid Evdilqadir e, kurê serekê mezin ê kurdan Ubeydullah Nehrî ku rêberiya serîhildaneke mezin a kurdan kiribû. Serekê duwemîn ê cemiyetê bavê Celadet, Emîn Alî Beg e, kurê serekê mezin ê kurdan Mîr Bedirxan ku rêberiya serhildana mezin a kurdan a 1846-an kiribû. Heyeta wan a îdarî jî, ji navên mezin û qedirgir ên kurdan hatiye pê.

Kurd li Stembolê gihîştine hev da ku bi doz û dawa kurd û welatê kurdan rabin, da ku di van rojên nezelal ên avakirina dûzana nû de, ji bo kurdan jî, çare û rê bibînin. Ew bi coş û heyecan ketine nav xebatê, civîn û civatan li dar dixînin, kaxiz û belavokan dinivîsin, heyet û merivan dişînin welêt û nik serekên dewletên biserketî yên li Stembolê, liq û komeleyên xwe li welêt ava dikin, rojname û kovar diweşînin... Têkçûna dewleta Osmanî, li milekî, ew xemgîr kirine, li milekî jî, hêviyên nû dane wan da ku ew bikaribin ji bo welatê xwe hin heq û hiqûqan bi dest xînin. Cemiyetê, avabûn û xebatên wê, çirûskeke nû ya ronahiyê vêxistiye.

– Aziz dostlar, Emîn Alî Beg dibêje û ji cîhê ku maye, xeberdana xwe, bi tirkî, didomîne. Gotinên ku em dibêjin, dikarin rast bin. Ev ne girîng e. Ya girîng ew e ku em ê, li gora van gotinên rast, çi bikin... Em divê li ser vê yekê li hev bikin. Hê jî dewletek, hikumeteke Osmanî heye. Lê belê, hemû hikum û desthilatî di destê çar dewletan de ne; Amerîka, Ingilîstan, Franse û Îtalî. Eger me dil heye, em, li gora gotinên xwe, bi ser kevin, hingî, bi baweriya min, em divê pêwendiyeke gelekî xurt bi van dewletan re bînin pê. Yek ev. Ya duwemîn jî, ev dewlet kar û şixulên

xwe, li gora prensîbên President Wilson, bi rê dixin. Ev prensîb li hal û hewalê me, li rewşa welatê me tên. Em jî divê, kar û şixulên xwe, li gora van prensîbên pir esasî û pir girîng, bi rê xînin...

> Welê dixuye ku ev halê mirov û mirovahiyê ye; gava tiştekî li ber çavê mirovan dibe û diqewime, mirov baş bala xwe nadiyê, wî baş nabîne. Paşê, piştî bûyerê, mirov wî çêtir dibîne, paşê qîmet û giringiya wê fahm dike. Lê hingî jî, mirov nikare, wî tiştî, digel her kitekitê, ji nû ve, eynî mîna berê, bibêje yan jî binivîse. Herwekî xewnan... her çawan ku mirov nikare xewnan, eynî mîna wan bi xwe, ji nû ve, bîne zimên, bûyerên bihurî jî, ji nû ve, mîna xwe venagerin. Mirov lê zêde dike, li gora rewşa xwe ya roja vegotin û salixdanê, bi alîkariya bîr û xeyalan, wî li hev tîne û "çêdike."Herwekî ku tu niha wan li hev tînî û çêdikî.
> Ew roj û ew civîn niha baş tê bîra min. Lê gotinên bavê min baş nayên bîra min. Hingî bala min, ji gotara bavê min zêdetir li ser awirê guhdaran bû. Min bêtir li tesîra gotara bavê xwe dinihêrî. Herkes li wir bû; Seyid Evdilqadir, Abdillah Cewdet, mamên min, birayê min Kamuran, Fuad û Hemdî Paşa, Şukrî Babanzade û gelek kesên din ên bijarte yên civata kurdî. Di nav guhdaran de, gelek hevalên min ên pêşerojê, hevriyên min ên qederê jî hebûn; Dr. Şukrî Mihemed, Memduh Selîm, Hemzeyê Mukisî, Mewlanzade Rifat... Hemû li wir rûniştibûn, bêyî ku haya wan ji bûyerên kambax ên rojên bê, mirin, sêdar û sirgûnê hebe...
> Gotina te ye, di wan rojan de, "qayide û prensîbên Wîlson" ji devê kurdan nediketin. Bi dû şer re, serekê Dewletên Yekgirtî yê Amerîkayê Thomas Woodrow Wîlson, ji bo çareserkirina mesele û gelşên piştî şer prensîbine gelekî hêja û demokrat îlan kirin. Li gora wan prensîban, kurd jî dikarîbûn bibin xwedan der û dewlet. Ew prensîb, bi gotina bavê min, gelekî li rewşa kurdan dihatin. Loma jî kurd, bi hemû hebûna xwe, li wan xwedî derdiketin û behsa wan dikirin.
> Hingî rêber û pêşewayên cemiyetê kovarek jî, bi navê "Jîn" diweşandin. Dostên min Memduh Selîm Beg û

Hemze Begê Mukisî gerînendeyên kovarê bûn. Mixabin, min wext nebû tê de binivîsa, lê birayê min ê biçûk Kamo ku êdî jê re digotin Kamuran Beg, tê de, bi pênûsa xwe ya pir delal, dinivîsî. Hem Kamo hem jî biraderên din, di Jînê de, gelek bendên hêja û balkêş li ser Prensîbên Wîlson nivîsîn. Benda Kamo niha ji wan rojan çêtir tê bîra min. Hingî bala min baş ne lê bû, lê niha kitekit jî tên bîra min. Rojekê, danê êvarê, li malê, li bexçê, ez li kêleka bîrê rûniştibûm, Şehrîbana nazik û hertim alîgir ku min, mixabin, êdî mîna berê nikarîbû hertim bidîta, çayeke bi dem çêkiribû û jê qedehek dabû min û min kitabek li ser wezîr-i azamên Osmanî ku bi destê sultanên Osmanî hatibûn kuştin, dixwend. Nivîskarê wê niha nayê bîra min, lê kitabê li ser mêjiyê kargerandina Dewleta Osmanî gelek tiştên balkêş digotin. Sorahiya çayê, rengê tava danê êvarê û xwîna ku ji nav rûpelan diherikî, li hev dihatin. Lê benda Kamo, yanê Kamuran Beg, ew aheng xira kir. Hingî ew bi heyecan ji hundir hat û kaxizên destê xwe rêberî min kirin. "Müthiş bir makale yazdım.", wî got. Min bi ken lê nihêrî. Wî nû simbêl berdabûn. Simbêlên wî yê zirav lê hatibûn. "Simbêl li te hatiye", min jê re, bi ken, got. "Li vê bendê binihêre, lê binihêre..." wî bi israr got. Min kitaba destê xwe danî ser masê û bi lez, li benda Kamo nihêrî. Navê benda wî "Kürdistan İçin" bû. Wî di nivîsara xwe de qala serbestî û azadiya kurdan dikir û li derekê jî, mîna niha tê bîra min, wî behsa hêjahiya 14 qayideyên Wîlson dikir. Wî bendek ji bejn û umrê xwe mezintir nivîsîbû. Bend bi zimanekî xweş, li ser mijarekî balkêş û bi zanîneke kûr hatibû nivîsîn. Lê ji bo ku ez wî hêrs bikim, min jê re got; "Tu vê bendê bigire û bavê nav vê bîrê... ew ne tiştekî ye..." Lê Kamo dûrbîn bû, wî benda xwe navêt bîrê, bêdeng, ew wergirt û çû. Benda wî di Jîn'ê de weşiya.

Bavê min rast digot, huner ne gotina tiştên rast e. Huner ew e ku mirov bikaribe tiştên rast çêke jî. Prensîbên Wîlson ku ji devê kurdan nediketin, rast bûn, hêvî û hedef bûn. Lê kurdan nikarîbûn ew bi cîh bianiyana, ew ketin hev û li pey xelkên din man...

Emîn Alî Beg bi destê xwe yê rastê riya xwe mist dide, li guhdaran dinihêre. Tiştên ku ew bibêje, hê jî, pir in. Lê ew dil dike, hevalên wî jî bipeyivin û ew bi hev re li çareyan bigerin.

– Aziz Dostlar, ew dibêje, eger we îzin hebe, ez ê rûnim. Ez westiyam. Û ez dixwazim, hûn jî bîr û reyên xwe bibêjin.

Bêyî ku ew li hêviya bersiva wan bisekine, ew bi hêdîka li ser kursiyê kêleka masê rûdine. Bedena wî ya giran û fireh kursî dadigire. Ew ji berîka xwe ya hundir a çakêt destmalekê derdixe û pê eniya xwe pak dike.

5 Emîn Alî Beg destmalekê ji bêrîka xwe ya hundir a çakêt derdixe û pê eniya xwe pak dike. Ew westiyaye. Di nav van çend salên dawîn ên dijwar û kesertijî de, ew ketiye û kal bûye. Tevî ku ew hê jî baş li xwe dinihêre, dixwe, vedixwe û li xwe dike, ew gelekî qelew bûye, bedena wî gelekî giran bûye.

– Welê dixuye, kalîtî êdî zora min dibe, ew, bi ken, ji civatê re dibêje. Em çawan bikin, halê dinyayê ye... Lê tirsa min ew tirs e ku ez nikaribim herim welatê bav û kalan û ez serbestî û azadiya axa bav û kalan nebînim... çavvekirî, bi vê hesreta kambax, herim diyarê rehmetê...

Civat li ber van gotinan dikeve, ji kesî deng dernakeve. Ew, bêdeng, li hev dinihêrin. Haya wan ji zehmetî û aloziyên li ber kurdan heye. Kurd ne dewlet in, nebûne dewlet û tu dewlet jî, bi dil û can, xwe nade ber doza kurdan. Yekîtiya wan nûn e, şiûra yekîtî û yekbûnê dûrî wan e. Welatê wan ê westiyayî, ji ber pêlên şer, li ber lingan çûye, bûye kavil û ji hev ketiye. Lê tevî van, kesên vê civatê û rêberên din ê kurdan, her, dixebitin, dilebitin û dilezînin da ku tiştekî bi dest xin, şertên jiyaneke aza û hêja bînin pê. Jiyaneke aza û hêja... lê çawan, çawan?..

Civat, mîna her carê, li mala Emîn Alî Beg geriyaye. Bedirxanî li salona malê civiyane. Emîn Beg, birayên wî Evdilrehman, Mihemed Elî, Mirad, Xelîl, xwişkên wî Nazlî, Adeviye, Edîbe, Belkis, herdu lawên wî Celadet û Kamuran hatine civînê. Bedirxanî,

jin û mêrên wan ên temsîlkar, heftê carekê li mala Emîn Beg, ji bo kar û şixulên malbatê, dicivin. Malbata ku xwe mîrên kurdan û rêberên welatê kurdan dihesibîne, pir fireh û mezin bûye, hejmar gihîştiye hezaran. Niha ew ne bi tenê li aliyê Kadıköyê, lê li herdu milên Stembolê belav bûne. Barên malbatê pirtir, karên welêt girantir, nîrê bindestiyê dijwartir, daxwaza azadiyê kûrtir bûye. Kurd xwe li navê Xwedê, li navê wan digirin û tên nik wan. Ew jî xwe li prensîbên Wîlson digirin û geh derin nik niwênerên dewletên serketî geh nik karbidestên dewleta Osmanî ya bêquwet. Endamên malbatê, nemaze endamên vê civatê her li civînan in. Rojên wan bi civîn, hevûdudîtin, çûyin, hatin, nivîsîn û peyivînê derbas dibin.

Emîn Beg, çavên wî li ser civatê, tiliyên herdu destên xwe derbasî hev dike û destên xwe datîne ser zikê xwe û dibêje,

– Eger em kurd di vê geremolê de nikaribin xwe bi derekî bigihînin, hema ji niha ve, ez ji we re bibêjim, sibê dê dereng be, pir dereng be.

> Navê wî niha nayê bîra min, lê nivîskarekî gotibû; armanc û hedefên mezin û bilind, her gav li pey perdeyekê ne. Tu bîr bi wan dibî, tu wan xeyal dikî, tu dizanî ku ew hene. Tu ji bo wan jî dixebitî, her tiştî dikî. Lê belê, ew li pey perdê ne. Te ew nedîtine, tu wan nabînî û tu nizanî ka tu dê wan bibînî. Armanc û hedefên kurdan jî, hinekî, weha bûn. Kesî ew nedinasîn, nedîtibûn, nejiyabûn. Mîrê dawîn ê kurdan ku li ser axa xwe, hinekî, serbest jiyabû, bapîrê min Mîr Bedirxan bû. Ew jî di salên 1830-40-an de bû. Ji wan rojan û pê ve, kurd di bin perda bindestiyê de jiyabûn û armanc û hedefên wan li wî aliyê perdê mabûn. Ew kesên ku piştî şer, em jî tê de, xwe bi armanc û hedefên pîroz girtibûn, hemû, zarokên bindestiyê, neviyên menfa û xerîbiyê bûn.
>
> Em, ew kesên ku beşdarî wan civînan dibûn jî, zarokên xerîbiyê bûn. Lê digel her tiştî, me dil dikir xwe bigihanda vî aliyê din ê perdê. Ew civîn... ax ew civîn... min gelekî ji

wan hez dikir. Tu ji wan re dibêjî "civîn." Me ew bi "içtima" bi nav dikirin. Her hefte, her roja înîyê, içtima me hebû. Bavê min serekê içtimayê em jî aza bûn. Piraniya caran, min zabitên içtimayê dinivîsîn, carina jî Kamo, yan bavê min. Roja înîyê, bi gotina hingî badê zewal, yanê piştî nîvro, em li mala me diciviyan. Içtima saetek, du saetan dewam dikir û li dora saet pêncê danê êvarê diqediya. Paşê jî xwarina êvarê û şîv bû. Diya min, Şehrîban, xwînga min, metên min, eger hebûna jinên mêvanan, wê rojê li mitbaxê bûn. Wê rojê bîhnên xweş ji mitbaxa me difûrîn, hemû Kızıltoprak bi bîhnên xweş ên xwarinên taybetî yên Botanê mest dibû. Rojekê bîhna kutilkê sefayîh, mêlaka qelandî, merge û savarê, rojeke din jî bîhna kipe, serûpê, dîzik û birincê ji malê difûriya.
În roja bîhnvedanê bû, rojeke mubarek û xweş bû. Bi xêra içtimayan, em jî diciviyan ser hev. Rojek, du rojan berî içtimayê, Şehrîban, Mezo, Hîkmet, Safter bi hev re dadiketin bazarên Kadıköyê û haziriyên roja înê dikin. Li malê hew zarok mabûn, em hemû mezin bûbûn û karên malê êdî bi destê Şehrîbana delal û xweha me ya dengxweş dihate gerandin. Safter, Hîkmet û heta radeyekê jî Tewfîk alîkariya wan dikirin. Diya min jî, mîna bavê min, êdî ketibû, pîr bûbû. Kekê me Sureya li Misirê, Kahîrê, serekiya tevgera kurdî dikir. Wî jî, ji wir, dixwest xwe bi wî aliyê din ê perdê bigihîne...
Gava dinya xweş bû, sifra mezin li bexçê, li kêleka bîrê, dihate raxistin, di rojên sar de, li mitbaxê. Bi germahî û evîneke bêpayan em li ser sifrê rûdiniştin, piştî şîvê jî, heta derengê şevê, sohbetên germ, peregende, li salon, mitbax û kitabxanê geş dibûn. Sohbetên min bêtir bi dotmama min Saadetê re bûn. Saadeta çavxezal, gerdendirêj û gelekî bedew û têgihîştî ku heta niha ne te ne jî min qal kirê, di nav malbatê de hevala min a herî nêzîk bû. Ew, bi umir, çend salan ji min mezintir bû û min jê re digot "abla." Saadet Abla dosta min, hevriya sirên jîna min bû. Gava me wext dibû, em, carina, bi hev re, derdiketin girên Çamlica û Üsküdarê, nav dar û dehlan, gerê... Di rojên içtimayan de, ew jî, her dihat malê û alîkariya me dikir.

Em zarok û neviyên Mîr Bedirxan, di wan rojan de, li hember hev nerm û kîbar, germ û ziravbihîstiyar bûn. Mîna ku me bîr bi rojên bê yên xedar biribû û me fahm kiribû ku malbata me, yekîtiya me, dê belav be, em ê ji hev bikevin û her yek bi derekî de herin. Ew rojên me, mîna germahiya berî ba û bahozê bûn...

– Heke bi dilê we be, Kamuran, pênûs di destan de, dibêje, ez notayeke din li ser mafên me Bedirxanpaşazadeyan û kurdan ji sefîrên Amerîka, Fransa, Îtalya û Ingilistanê re binivîsim?

– Erê, çima na, ma çi zirara me tê de heye? Evdirehman Beg dibêje. Lê em nusxeyek ji notayê ji Sureya Beg, Mısır İstiklâl Komitesi re jî bişînin.

Ew, bi dengdanê, pêşniyara Kamuran dipejirînin. Kamuran vê biryarê jî, bi destnivîsa xwe ya xweş, di deftera ber xwe de dinivîse. Ew hê biryarê dinivîse, ji der, ber derî, dengê diya wî tê;

– Me sifre li bexçê raxistiye, kerem bikin.

6 – Me sifre li ber kon raxistiye, kerem bikin. Celadet, Kamuran, Ekrem Begê Cemîlpaşa, Ebdilrehîm Efendî, Yakup Paşa, Major Noel û çend kesên din radibin û ber bi kon derin. Dinya hê ronî ye, bi tenê yek-du stêrk li aliyê rojhilat, bi nermahî, diçûrisin. Komik, Yakup Paşa li pêşî, yên din li pey wî, hêdî hêdî, ber bi konê reş dere.

Celadet, Kamuran, Ekrem Begê Cemîlpaşa, Ebdilrehîm Efendî û Major Noel mêvanên Yakup Paşa ne. Yakup Paşa ku umrê wî li dora 30-35-an e û nû zewiciye, serekê eşîra Atmiyan e. Sifreyeke dirêj, li ser mehfûrên kurdî yên koçeran, li ber konekî reş ê kurdî hatiye raxistin. Sifre têra xwe dirêj e. Bi qasî bîst kesî li dora sifrê li pê, li hêviya Yakup Paşa û mêvanên wî ne. Ew, bi giramî silav li wan dikin. Yakup Paşa û mêvanên wî jî silavên wan werdigirin û li wan vedigerînin.

– Kerem kin ser sifra koçer û eşîran, Yakup Paşa, bi kurdiya xwe ya zelal, dibêje û cîh nîşanî mêvanên xwe dide.

Mêvan, li kêleka hev, li ser kulav û doşekan rûdinin. Piştî mêvanan, Yakup Paşa û yên din jî li dora sifrê rûdinin. Kesên ku li ser sifrê rûniştine, ji sîhî zêdetir in. Ji sifrê bîhna goşt û savarê difûre. Li navend û herdu aliyên sifrê, sê siniyên mezin û fireh hene. Sinî heta dêv bi savarê tijî ne û li ser savarê jî berxên birajtî hene. Di navbera siniyan de, bi qasî heft-heyşt beroşên fireh, bi xwarin û şîvên cihê, hene. Di nav çend tawan de qelî, di nav çend tebaxên fireh de jî sewze û salate hene. Li ber her mêvanî jî tabexeke vala heye. Piştî rûniştina hemû mêvanan, çend kes radihêjin xizmetê. Yek goştê berxan lîme dike û li mêvanan belav dike, yekî din savarê belav dike, yek dew dixe tasên mêvanan, yekî din jî kêmaniyên sifrê temam dike.

– Eger kêmaniyên me hebin, li me mêgirin, Yakup Paşa dibêje, ev sifre ne hêjayî mêvanên mîna we ezîz e, gelekî bi lez bû.

– Min sifreyeke weha zengîn, rengîn û xweş li tu derî nedîtiye, Major Noel, bi kurdî, dibêje û tîka goştê destê xwe dibe devê xwe. Ev sifre bi rastî sifra kurdî ye, ev mêvanperwerî, bi rastî, ew mêvanperwerî ye ku min her dibihîst...

Ji sifrê hinekî bi dûr agirekî gur vêketiye û çend kes bi êzingan agir geş dikin. Ji agir hinekî dûr jî bîrek heye. Çend jin bi dewlê avê jê dikişînin. Koçerên eşîra Atmikan, zarok, jin, mêr, pîr û kal, li dor û navbera konan derin û tên. Eşîra Atmikan, mîna her salê, îsal jî derketine zozanan. Ew zivistanan li deştê, havînan jî li zozanan in. Ew havînan tên û konên xwe li dora vê bîrê vedigirin. Major Noel û hevalên wî, li ser riya xwe, îşev, bûne mêvanên wan. Kurdan hatina wan bihîstiye û dixwazin wan bibînin, bi wan re bipeyivin û bizanibin ka çi dê bi serê kurdan de were. Yakup Paşa ku nû jî zewiciye, çi ji destan tê, texsîr nake da ku kêfxweşî û mêvanperweriya xwe nîşan bide.

Ne bi tenê Yakup Paşa, em jî kêfxweş bûn. Ji kêfa me re payan nîn bû. Em li welatê bav û kalan, li ser axa kurdan bûn. Ew kurdên ku me li Stembolê, ewçend behs dikirin, li wir, li nik me, li ber çavên me bûn. Ew gera me ya Kurdistanê, bi serê xwe, bûyereke girîng a jîna min e. Tu bawer bike, heke min keys, wext û îmkan hebûna, min ê li ser wê gerê romanek binivîsa. Wê gerê ez nêzîkî welatê min kirim. Wê gerê ez ji welatê min bi dûr xistim. Belê, ev herdu jî bûn. Wê havînê, havîna rengîn a 1919-an, mohra xwe li jîna min xist, heta bi heta...

Bi dû xebat, daxwaz û tevgera fireh a neteweyî ya kurdan re ku ji Kurd Tealî Cemiyetî heta hemalên Stembolê, ji beg û tucarên Diyarbekirê heta gundiyên Botanê, ji elewiyên Dêrsimê heta soranên Suleymaniyê, bi awayekî peregende, tê de bûn, Ingilistan û hevalbêndên wan, hatibûn ser riya fikra mafên kurdan û êdî behsa war û welatekî ji bo kurdan dikirin. Ji bo wê fikrê wan dixwest heyetek, bi serokatiya Major E. M. Noel, ku bi kurtî me jê re digot, "Mecir Nowil", bişandina welêt. Piştî ku ew bi Kurd Tealî Cemiyetî û bavê min re peyivîn, me biryar da ku ji kurdên Stembolê ez û Kamuran, ji Diyarbekirê jî Ekrem Begê Cemîlpaşa di heyetê de bin. Ez û Kamuran ji Stembolê ketin rê û 23'ê tîrmehê em gihîştin Helebê. Major Noel ku bi herdu zaravayên kurdî, kurdiya jor û jêr, baş dizanîbû û serê xwe gelekî bi doza kurdî diêşand, li wir, li otêlê, tevî kaxiz, pênûs û makîna xwe ya fotografê, li hêviya me bû. "Hûn bi xêr hatin", wî bi kurdiyeke têgihîştî got. "Vous êtês oussi bienvenu", min jî, bi fransizî jê re got. Ingilîziya min û Kamuran ne ewçend baş bû, loma me dil kir, em pê re bi fransizî bipeyivin. Lê wî dil hebû bi kurdî bipeyiviya. "Ji bo min weha hîn çak e.", wî got. Piştî ku Ekrem Beg jî hat, em ji Helebê, ber bi aliyê welatê bav û kalan, ketin rê. Ez ê niha çawan behsa wan rojan bikim?.. Ez û Kamuran gelekî bi heyecan bûn. Coş û kela me, meraq û daxwaza dîtin û zanîna me bê payan bû.

Em ketibûn nav kurdan... heta 20'ê îlona 1919-an em di nav wan de man. Me axa û beg, peya û siwar, eşîr û koçer, deşt û zozan, bajar û gund, newal û gelî, dar û dehl, çem

û çiyayên kurdan dîtin. Em di bin esmana ronî û bi silavên stêrk û heyva ronî ya welatê kurdan de razan. Di berbangên çîkesor ên zozanan de, me xwirîniya xwe, bi xizmeta pîrejinên porspî û bêrîvanên xama, bi şîr, firo, to, mast, mastê kilanê, nivîşk, penêr, penêrê ter, helandî, sîrikê û pûngê kir. Tevî siwar û çekdarên eşîrên kurdan, em di dehl, newal û bihuran re derbas bûn û hilkişiyan çiya û zozanên serî li esmanan. Me bîhna xwe bi hawa paqij veda, rûyê xwe bi ava kahniyên sar şuşt, kiras û goreyên xwe li ber devê çem û lehiyên zelal şuştin. Li ser hesp û mehînên kumêt, qemer û şînboz, geh bi rewan û loq, geh bi gurloq û çargavî, me xwe ji tixûbên eşîrekê gîhand tixûbên eşîreke din. Li ber konên reş ên bi mû risandî û li ser donzdeh sitûn û singan vedayî, em rûniştin û me li bergehên hêşîn û zer ên warên kurdan temaşe kir. Heta ber destê sibê, li ber agirên gur, me li dengbêj û stranbêjên navdar ên ku rêzên stranan mîna zêr, zîwer û lûlû li pey hev rêz dikirin, guhdarî kirin. Em bi dengên mirîşk û dîk, salûr û bilbil, teyr û kew, seg û tajî, mehîn û cahniyan hişyar bûn. Li Malatyayê ku mamê me Xelîl Ramî Beg li wir mutesarif bû, me, li mal û koşkên kurdan, axayên simbêlbadayî, şêxên rîdirêj û seyidên simbêlpalik dîtin. Zabit û eskerên tirk, bi çek û pûsat, li quntarên çiya û zinaran kemîn û dahfik danîn, derketin ser riya me, xwestin me, nemaze min û birayê min, bigirin, bikujin. Me rêwîtiyeke bi qasî du mehan, bi bîhn, hilm û tahma welatê kurdan, bi alozî û dijwariyên welatê asê ku her roj, her deqe, li dora me bû, anî pê. Me hem dostî û mêvanperweriya bêpayan a kurdan dît, hem jî îxaneta wan a navdar... Paşê em, dîsan, vegeriyan Helebê û ji wir jî Stembolê...

Di rêwîtiya me de, me her çaran jî defter hebûn, mîna şagirtên mektebê, me çi bidîta dinivîsî. Min û Major Noel bi kurdî, Kamuran û Ekrem Beg bi tirkî dinivîsî. Belê, wî jî bi kurdî û ji min jî çêtir dinivîsî. Ji deftera min, Kamuran û Ekrem Beg tu şop li pey neman, ew li derin, mîna gelek tiştên me yên din, winda bûn û çûn. (Bi tenê min, di salên 30-an de, li derekê, bi hênceta tiştekî din, bi çend rêzan, di

ser re, behsa wê gerê kir...) Lê Major Noel, dostê me, notên xwe yên gerê, bi dû re, sala 1922-an, li Basrayê, mîna kitab, bi ingilîzî, weşand. Wî di kitaba xwe de behsa malbata me, bavê min, mamên min, min û Kamuran jî dikir. Li ser min, wî weha dinivîsî; "assistant editor of newspaper Serbestî at Constantinople..." û weha, li gora bîr û reya xwe, didomand; "He suffers from the inevitable effects of long residence and training in Constantinople, but he has the making of a good man." Wî gunehê xwe bi min dianî, lê bawer bû ku ez li ser riyeke rast û baş bûm. Ez ê bibûma mirovekî rind û baş. Hîsên min, pêwendiyên min ên piralî û rengîn, welatê min ê xewn û xeyalî, bajarê min ê ku ez tê de dijiyam... van bala wî nedikişandin. Wî li ser Kamuran jî weha digot; "Barrister at Constantinople. Knows no Kurmanji. Sensible quiet individual - has not so far come to the fore..." Ew bi Kamuran gelekî bawer bû, lê gava wî digot ku Kamuran bi kurdî nizane, ew ne rast bû. Kamuran bi kurdî dizanîbû, lê ne ewçend baş û xweş. Loma jî Kamuran, ji bo axaftinê, tirkî tercîh dikir. Lê paşê, Kamuran bû yek ji pisporên herî mezin ên kurdî û şîîr, bend, nivîsar û kitabên hêja û nemir bi kurdî nivîsîn. Rêwîtiya me, gereke geş û balkêş ji xewn û xeyalan bû...

Piştî xwarinê, sifre bi lez ji erdê radibe, doşek û bahlîfên nû, dîsan li ber kon, tên raxistin û pêşiya kon ku mîna meydaneke biçûk e, vedibe. Niha wexta dîlan û govendê ye, dîlana êvarên ronî û govenda kurdî. Major Noel û Kamuran li milekî, Celadet, Ekrem Begê Cemîlpaşa û Evdirehîm Efendî li milekî Yakup Paşa rûniştine. Yakup Paşa, simbêlbadayî, rûgeş, ji rewşê razî, milekî wî li ser bahlîfan, dest dike da ku govend bê gerandin.

Pêşî def û zirne tê. Bi qasî bîskekê, def û zirne lêdikevin, bi dû re komeke govendkêşan, jin û mêr, di milên hev de, bi dîlan û stran, ji pey agirê gur, hêdî hêdî, tên ber kon, kêleka bîrê û bi aheng xwe dilivînin û dilîzin. Govend û stran pêşî nerm û giran in, lê pey di pey, ew geştir û pihêttir dibin. Mêr û jin ên govendkêş ku hemû jî xort û ciwan in, di nav cil û bergên xwe

yên taybetî yên koçeran de, mîna ku bi firê ketibin, mil bi mil, li dora bîrê govendeke nedîtî û bêpayan digerînin. Bîr dibe navend, ro û govenkêş dibin stêrk, heyv û li dora wê çerx dibin, her çerx dibin.

– My God, my God, Major Noel dibêje, ez divê resmê vê bergeha ecêb û nedîtî bikişînim. Eger we icaze hebe?

– Ma ew jî gotin bû? Yakup Paşa dibêje, icaze ya te ye, kerem bike.

– Na, te dît... jin û keç jî hene... ka heye ku hûn eciz bin.

– Na bavê min! Jinên me ne mîna jinên xelkê ne, tu resimên xwe bikişîne...

Major Noel flaşa xwe ya nû bi makînê ve dike, radibe ser piyan, ber bi bîrê dere û dest bi kişandina fotografan dike.

FOTOGRAF 7

"Derketî; terka welatê xwe da û kete dinyayê xwedê rêberiya derketiyan bike!.."

1 Fotografa heftan a romana Bîra Qederê, meriv dikare bibêje, fotografa keserê ye. Yan jî, eger meriv bixwaze hinekî dûrbîn be û bikaribe xwe bigihîne "pey" fotografê, meriv dikare bibêje; fotografa heftemîn a Bîra Qederê destpêka riya kambax a keserê ye. Fotografa ku hinekî tarî ye û nîşana tarîtiyê ye, welê bi keser dixuye. Keser hatiye û ev wêna ku di kurte-demeke jiyanê de ew kurtedema kambax kiriye nemir û bi dû re jî ew kurte-dem kiriye fotografa vê romanê, bi her awayî, vegirtiye...

Keser, stirîhên jiyanê, stirîhên ku dora gulê rapêçane, hatiye û dora vê wênê rapêçaye...

Li ser kaxizê riziyayî yê nemir lehengê vê romanê, yan jî kesê ku bûye sebeba afirîna vê romanê, Celadet Alî Bedirxan dixuye. Di nav reşahiyeke tenik de, bi tenê ew dixuye. Wî destê xwe yê rastê daniye ber pencereyeke trênekê û li der dinihêre. Di nav kompartimaneke tirêneke bênav û bênîşan de, ew, hinekî stûxwar, li cîhana derve ku pencera trênê ew jê veqetandiye, dinihêre. Foto ji aliyê kêlekê hatiye kişandin. Loma jî bi tenê aliyekî Celadet dixuyê. Kompartiman hinekî tarî ye, eger meriv kesê nexuyayî yê ku ev foto kişandiye nehesibîne, ji Celadet pê ve tu kesê din naxuyê. Aliyê din ê pencerê yê derve ronî ye. Reş û spî li kêleka hev in, bi tenê pencere wan ji hevûdu vediqetîne. Meriv dikare, bi zimanekî basîd, weha bibêje; ji çara sisiyê vê wênê tarî ye, ji çara yek jî ronî.

Trên ber bi ku de dere? Ew li ku ye, çawan e, cîh û warên ku Celadet bi kûrahî lê dinihêre, çi dever in? Di wênê de, ev ne diyar in, jê fahm nabe. Lê reşahî û hinekî jî ronahiyê wêne vegirtine.

Rûyê Celadet ê xort bi xem û keser e. Xem û kesera li ser rû baş dixuyê. Di wênê de bi tenê çavekî dixuyê. Ji aliyê din ê rû bi tenê birû û bijangên çavê din dixuyin. Lê belê, tevî ku herdu çav, bi hev re, baş, naxuyin, navenda fotoyê çav e. Di navbera hemû fotografên Celadet de, heye ku ev fotografa yekemîn be ku tê de çav û nerîna Celadet evçend kûr û manîdar e. Celadet li ku dinihêre? Bi îhtimaleke pir mezin, bêyî ku haya wî jê hebe, ev fotograf tê kişandin. Bi gotina îlmê fotografê, ew bê hazirî tê girtin. Ew, sade, rehet, rûniştiye, milê xwe yê rastê daniye ber devê pencerê û li der, bi hemû kûrahiya nerînê, li dûr dinihêre. Belê, ew pir li dûr dinihêre, lê nerîna wî ne nerîneke diyar, misoger û têkûz e. Ji bervajiyê, nerîna wî nerîneke vala ye. Ew kûr li dûr dinihêre, lê heşê wî li dereke din e. Çavên wî li ser roniya derve ye, lê heşê wî li ser pejn û hîsên ku di hundirê wî de pêl didin e. Çav li der dinihêre, lê ew li dinya hundirê xwe difikire. Trên dere, yan jî ew ê here. Trên ê wî û rûpelên romana Bîra Qederê ber bi ku de bibe? Heta kengê, çawan? Ev çûyin ê kîjan riyên nû li ber wî veke? Ma her çûyinekê vegerekê jî navê? Hingê veger kengê ye? Çawan û di kîjan şert û mercan de? Ya jiyana ku li pey dimîne? Kes û nasên ku li pey vê çûyinê dest hildidin? Ew ê wan, dîsan, kengê bibîne? Ji nerîna çav baş dixuye ku Celadet di nav hîsên weha dè ye.

Çav nerm û aram, melûl û zîz e. Çav nîvçe vekirî ye, heye ku ew giriyaye, yan jî kelgirî bûye, yan jî bi pêlên hîsan sermest bûye... Kî dizane? Eniya fireh û poz, ew pozê ku dapîra Bedirxaniyan Rûşen Xanimê mîna "pozê beranan" bi nav dikir, nerîna kesertijî ya çav temam dikin. Pêşiya eniya fireh û dirêj, hinekî, dibiriqe. Heye ku tîrêjeke ronahiya derve xwe gîhandiyê û bi germî wê radimûse. Porê ku bi qasî sê tiliyan dirêj e û ber bi paş, bi hostehî û bi huner, hatiye şehkirin jî, mîna enî, hinekî dibiriqe.

Lê ronahî xwe bi cênîkê ku zêde ne dirêj e, nagihîne. Cênîk, hinarik û guhê mezin û dirêj perçeyên aliyê tarî yê wênê ne. Gelo danê sibê ye, yan danê êvarê ye? Tava wê kurte-demê li ku ye, li esmanan, li pey asoyan û li ber avaçûnê, li ku?..

Herçî pozê dirêj e li rûyê dirêj tê. Poz, mîna nikulê teyrê eylo, ber bi jêr dibe. Simbêl her mîna xwe ye, qemerî, kin û kurt. Devê dirêj girtî ye, lêvên qelaw li ser hev in.

Stûyê îşligê girtiye û qirawateke zirav û reş pê ve ye. Xêzên zirav û dirêj ên reş ên li ser îşligên spî moda salên 20-an nîşan dide. Ev celeb îşlig, îşligên stûkurt û xêzdirêj mensûbiyeta xwediyan baş nîşan dide; ronakbîr, nivîskar, rojnamevan, arîstokrat, siyasetger...

Ev hemû tişt û hîn tiştên din di nav vê wênê de dixuyin. Lê gelek tiştên din jî hene ku di vê wênê de ne, lê veşartî, ne xuyayî. Herwekî ku hatiye gotin, fotograf bi herdu milên xwe, milê xuyayî û yê nexuyayî, hêja ye. Gava aliyê veşartî li aliyê xuyayî zêde be, yan jî pê temam be, hingê ew fotograf dibe balkêş û hingê ew dest bi peyivînê dike.

Di vê fotografa heftemîn a Bîra Qederê de ku rûpelên nû li romanê zêde dike û wê ber bi derine nû dibe, şopên salên xem û keserê hene. Sal, salên 20-an in, salên piştî şer, salên tevlihevî, hilweşîn û ketinê, salên kul û derdan, şik û gumanan, rê û rêwîtiyê...

Çav li der, li cîh û warên ku li pey dimînin, dinihêrin. Rêwîtiyê dest pê kiriye, wext, wexta veqetînê ye.

2 Rêwîtiyê dest pê kiriye, wext wexta veqetînê ye. Roja nû ya çarşemiya îlona 1922-an hê nû dest pê kiriye. Dinya zelal û çiksayî ye. Kızıltoprak hê baş hişyar nebûye. Dengên çivîkên darên bexçê Emîn Alî Beg alîkarî li hişyarbûna Kızıltoprakê dikin. Ji dûr ve dengên çend dîkan û paytonan tên. Darên bexçê mala Emîn Alî Beg hê pelên xwe neweşandine, daran, neynika

dewr û dewranan, dem û demsalan, hê kirasê xwe yê bihar û havînê ji xwe nekirine. Wan, bi hemû rengînî û bedewiya xwe ya payizê, dora kesên ku li bexçê, li kêleka bîrê rawestane, girtine.

Di vê destê sibê de, hemû mal, Emîn Alî Beg, Samîha Xanim, Şehrîban, Celadet, Kamuran, Hîkmet derketine bexçê. Mamê Celadet, Murat Beg, metên wî Adeviye û Edîbe Xanim û dotmamên wî Saadet Ablạ û Perîxan ku wê şevê li nik wan, li malê razane, tevî wan derketine bexçê. Wexta rêwîtiya Celadet û Kamuran hatiye, ew ê, îro, êdî bi misogerî, herin, ber bi deverên dûr pir dûr. Niha wexta xatirxwestin û hevûdu hembêzkirinê ye, wexta dua û mirazan e. Lawên malê, Celadet, Kamuran û Hîkmet rûgeş û bi ken in, yan jî ew dixwazin welê xwe nîşan bidin. Yên din bêdeng û zîz in. Hemû li nik hev, li kêleka bîrê, li pê rawestane û rûyê xwe ber bi rojhilat kirine, ber bi tîrêjên qels ên tavê ku hê nû li wan hiltên û bi zehmetî, xwe di nav çiqil û pelên daran re diseridînin...

Rûyê wan ber bi ronahiya tîrêjan, çavê wan li ser çavika makîna fotografê ye. Wan, ji bo roja rêwîtiyê, daxwaz ji studyoya Mr. Xendamian kirine ku ew werin û roja veqetînê, lê beriya wê, endamên malê, bi hev re, li ser kaxizên fotografê, bikin nemir. Çi dibe, çi nabe, çûyin heye, heye ku veger nebe... Ji studyoyê şagirtekî jîr, tevî makînê hatiye û ew, mîna eskeran, li kêleka hev rêz kirine û dest bi karê xwe yê îspat, nîşandan û nemiriyê kiriye.

– Hikmet Bey, biraz daha içeriye doğru kayabilir misiniz? Şagirt, serê wî di nav cawê reş ê makînê de, dibêje. Biraz daha, biraz daha...

Hîkmet hinekî din jî xwe nêzîkî komê dike. Hemû li makînê dinihêrin. Emîn Alî Beg her du lawên xwe, Celadet û Kamuran, dane her du aliyên xwe. Li kêleka Celadet jî diya wî ya kin, bi poşeyeke reş sergirtî, rawestaye. Li kêleka Samîha Xanimê jî du jinên din ku di jiyana Celadet de xwedî şop in, Şehrîban û Saadet, rawestane. Li kêleka birayê Celadet, Kamuran jî xwişka biçûk a Saadetê, Pêrîxan ku bi bedewiya xwe nav daye û Kamuran,

di danên êvarê yên yekta yên perên ava Kızıltoprakê de, jê re rêzên li ser Baxê Îrem ên Omer Xeyyam dixwendin, rawestaye. Li kêlekên wan jî yên mayî yên malbata fireh a Bedirxanpaşazade ku êdî ji hev belav dibe, rawestane.

– Dikkat, çekiyorum!

Fotograf tê kişandin. Careke din, lê îcar, hinekî din têkeltir, ew pişta xwe didin devê bîrê û li kêleka hev rêz dibin. Fotografeke din jî tê kişandin. Êdî wext tê, Celadet û Kamuran, li pey hev, derin destê bavê xwe. Emîn Alî Beg wan, yek bi yek, pihêt, bi qasî kêliyekê, hembêz dike û bêdeng, bêyî ku tiştekî bibêje, ji eniya wan radimûse. Paşê ew derin destê diya xwe. Samîha Xanim hew dikare xwe rabigire, tevî çend dilopên hêstirên ku ji çavên wê ber bi jêr dibin, ew wan demekê hembêz dike.

– Bila Xwedê bi we re be, kurên min, bila oxira we ya xêrê be, Xwedê mezin e, ew bi dengekî pir hêdî û zîz dibêje û hedîsin dixwîne, mala we vekirî û zimanê we şêrîn be...

Celadet û Kamuran yên din jî, yek bi yek, hembêz dikin û ji wan xatir dixwazin. Paşê ew her du û Murat Beg û Hîkmet, bêdeng, bi hêdîka radihêjin walîzên ku li ber deriyê malê ne û bi hev re, ber bi paytona ku li kolana biçûk li hêviya wan e, derin. Yên din li kêleka bîrê disekinin û li wan dinihêrin. Celadet û Kamuran jî dane rê û derin... Berî ku ew ji deriyê mezin derkevin û xwe bi paytonê bigihînin, ew careke din vedigerin û li yên mayî dest dikin.

– Bi xatirê we, Kamuran dibêje, bi xatirê we, gava em gihîştin cîh, bi leza birûskê, em ê haya we pê bigihînin. Em ê hertim binivîsin... em ê di demeke pir kin de, dîsan bigihên hev...

> Hay Kamuran, birayê min ê ziravbihîstiyar, birayê min ê romantîk... Em diçûn, ji Stembola ku min ê hew terk bikira, derdiketin, dibûn derketî, me rûyê xwe dabû ber bi dever û welatên nediyar û nenas û diçûn. Me dizanîbû; heye ku çûyin hêsan bûya, lê vegera wê çûyinê dê zehmet bûya. Lê em diçûn, ji bêgaviyê û bêçaretiyê. Li ber me du

rê hebûn; riya mirinê û riya derketinê. Kîjan ji van çê bû? Bêguman ne yek jî. Yek ji yekê kirêtir bû. Lê me diviya ji her du riyên kirêt ya kêmkirêt hilbijarta. Dinya hê jî aloz bû, ba û bahozên xedar ên piştî şer, hê jî, bi gumegum, li dar bûn. Lê li welatê Osmanî û li payitextê wî welatê hilweşiyayî tiştekî êdî bi zelalî diyar bû; Mistafa Kemal û hevalbendên wî bi ser ketibûn, dewleteke nû, li ser kavilên dewleta Osmanî, gav bi gav ava dibû. Tiştekî din jî êdî diyar bû; kirasê vê dewleta nû li me nedihat, tê de cîhê me nîn bû. Gazî Mistefa Kemal ew gera me ya welêt di devê xwe de kiribû benîşt û her qal dikirê. Wî her, bi neyînî, behsa gera me, me, bavê me û Major Noel dikir û li pey me bû. Tevgera kurdî ku me ewçend jê hêvî hebû, mîna her carê, îcar jî, ji ber sebebên her carê, bêkesî, bêpiştî, nezanî û dijîtî û berberiyên navxwe, bi derekî negihabû, -tevî ku hê tevger xurt û xîret qaîm bû... Lê hevalbendên Gazî Mistefa Kemal Stembol jî gav bi gav vedigirtin û cîh, bi her awayî, li me teng dikirin. Wekî din rê nemabû; me diviya terkî Stembol bikira. Pêşî em, bi dû me re jî bavê min ê kokim û diya min a pîr. Lê ber bi ku? Ber bi kekê me Sureya ku li Kahîrê serekiya gerandina karên tevgera kurdî dikir? Ber bi mamêm me yên ku li axa germ a Lubnan û Sûriyê rûniştî bûn? Ber bi birayên me Safter û Tewfîk ku ji bo xwendinê çûbûn welatê rojava, Munîxa navdar a navenda çanda rojava? Ber bi ku?
Lê dawiyê, em gihîştin biryarekê, bi qewlê birayên me yên Behdînî biryareke misoger; wê roja zer û sahî ya îlonê me dabû ser riya welatê rojava û em diçûn...

Piştî nîvroyê, hema bi qasî kêliyekê bi dû nîvro re, keştiya bulgarî Serivia ji lengergeha Stembolê lenger hildide û bi giranî, ber bi Zerya Reş, bi rê dikeve. Keştî, çend caran, bi dengekî tîz ji Stembolê xatir dixwaze. Ava Bospore'yê li pêşiya keştî vedibe, bayekî sivik pişta pêlên zelal û spî yên avê ku keştî li pey xwe dihêle, mist dide. Ba bi hêdîka porê Celadet û Kamuran ku li keştiyê, li aliyê pêşiyê, li ser pozê wê rawestane û bi bal û dîqet, bi hîsên pir têkel, li herdu qiraxên Bospore'yê dinihêrin, li ba

dike. Minare, keleh, birc, qesr, qonax, saray, dar û daristanên nas, li her du aliyan, mîna ku ew rabûbin govendê, li ber wan, yek bi yek, xwe diyar dikin û winda dibin. Stembola ku ew di hembêza xwe de gir kirin, hewandin, perwerde kirin, mana jiyan û umrê wan da, sirên wan veşartin, bi dewlemendiyên xwe evîn û eşqên wan rengandin, bi şevên xwe yên spî xewn û xeyalên wan neqişandin, niha, li ber wan rabûye dîlan û dansa veqetînê. Celadet û Kamuran derin, Stembolê, bajarê xwe û umrê xwe, bajarê bi bîranînên ebedî tijî, bajarê keysarê bajaran li pey xwe dihêlin û derin.

– Kamuran, baş li Stembola nazdar binihêre, heye ku em careke din wê nebînin, Celadet dibêje...

– Çawan em ê wê nebînin? Umrê min, bihîst û heft salên min, li vî bajarê derbas bûn. Çawan em ê vî bajarê ku em, digel her tiştî, her lê vegeriyane, careke din nebînin?

3 "Wiyana... umrê min, bajarê qedera min... çawan ez ê te, careke din, nebînim?.."

Kamuran ji rojnama li pêşiya xwe, Neue Freie Presse, bi alemanî, şiîreke şaîrekî nenas dixwîne.

– Nasîna me û zimanê alemanî dê xurt be, Kamuran, rûpelên rojnamê di destan de vekirî, ji Celadet re dibêje, em ê dakevin kûrahiyên alemanî, dilê wî...

Celadet û Kamuranê ku ber bi dilê welatê rojava derketine rêwîtiyeke dirêj, niha xwe gîhandine Wiyana'yê. Ew li Café Continentale ya rengîn û neyniktijî rûniştine û li hêviya şîva êvarê ne. Herduyan jî ne xwarineke aleman, lê xwarineke nas, "Café du Paris" helbijartine. Lê şaraba sor ku ew bi hez hêdî hêdî vedixwin, otrîşî ye. Êvar daketiye, jiyana germ a şeva sar a Wiyanayê hê nû dest pê kiriye. Salon hêdî hêdî tijî dibe. Otrîşî, kom bi kom, jin û mêr, di nav kincên xwe yên ewrûpî de, tên û maseyên salonê vedigirin. Pir vekirî dixuye ku ew hatine cîha-

neke nû, medeniyeteke cihê. Ev cîhana Wiyanayê ji ya Stembolê û welatê osmaniyan, bi her tiştê xwe, pir cihê ye. Paqijiya bajêr, dûzan û rêkûpêkiya jiyana rojane, aramiya civatê, lixwekirina şêniyan, aheng, neqiş û lihevhatina avahiyan û hejmara pir a rojname, kovar û weşanan gelekî bala wan dikişîne. Lê bêtir jî jinên Wiyanayê. Ew jinên Wiyanayê, bi bejna dirêj, por û guliyên dirêj, kirasên teng, fîstanên dirêj û fireh û bi kena periyan û bîhnên buhiştî, ne bi tenê bala wan dikişînin, heşê wan jî bi firê dixînin. Ew jinên ku bi kena periyan dibin periyên bê perwaz, niha, bi gavên nazenîn, tên, li maseyên dora wan rûdinin û germahiyeke bêpayan û bîhnên xweş ku Celadet û Kamuran baş nenasin, direşînin salonê.

Piştî du saet û nîvê, saet deh û nîvê êvarê, ew ê bi trêna êvarê, dîsan, bi rê kevin û herin. Herdu jî westiyayî ne. Hemû roj, ew li pê, gav bi gav, li kolan û kuçeyên Wiyanayê geriyane, bajarê nû keşf kirine. Ew di berbanga sibê de daketine Wiyanayê.

> Belê, em li ber destê sibê, saet 7.15, gihîştin Wiyanayê. Saet 10.30-an trênek hebû. Lê em bi wê trênê neçûn. Em hatibûn Wiyanayê, bajarê du hezar salan, bajarê medeniyet û musîkê. Hê di dewr û dewrana Roman de, gava wan ev bajar ava kiribûn, navê wî lê kiribûn; Cortigiano. Yanê mîsala zerafet û kîbariyê. Em hatibûn bajarê mîsalên xweş ku em li pey bûn. Bêguman e ku me nikaribû vî bajarî, weha, bêyî ku bibînin, terk bikira. Me biryar da ku em dakevin bajêr û bi trêna êvarê rêwîtiya xwe bidomînin.
> Tevî ku bayê şerekî kambax ew hejandibû,Wiyana hê jî ji bedewî û spehîtiya xwe tu tişt winda nekiribû. Ew gotinên te yên jor ku te li ser Wiyanayê gotin, mîna gotinên kitêbokên rêwiyan in ku hingî di gera me ya bajêr de, di destê me de bûn jî. Her çawan ku gotinên weha nikarin ruhê bajarekî salix bidin, ew têrî taswîra ruhê bajarê Wiyanayê jî nakin. Wiyanaya ku me ava wê vexwar û nanê wê xwar, bajarekî yekta ye çandê bû. Bi qewlê fransizan, ew bajarekî "civile" bû. Mîna Stembolê, ew

heta dev tijî esker, cendirme û zabit nebû. Bîhna musîk, huner, çand û edebiyatê jê difûriya. Avahiyên bajêr ên kevnare ku digel hezar salên ku bihurîbûn, hê jî bi asalet bilind dibûn, kelehên qaîm ên huner û musikê bûn. Musîkjenên mezin Gluck, Haynd, Mozart, Beethowen, Schubert, Brahms û Strauss ku me dê bi dû re pir lê guhdarî bikirana, ji wî bajarî ronahiya musîkeke nû bi dinyayê gîhandibûn. Li wî bajarî ruh, hîs, deng û pejnên çand û miletên cihê, mil bi mil, bi hev re, piyase dikirin. Di wî bajarî de zêde rê nîn bûn ku meriv bikaribiya ji bo jîna xwe, şixul û meslekê hilbijarta. Meriv li wir, bêgav, mecbûr bû bibe musîkjen û musîkşînas, nivîskar û nivîsevan, evîndar û evînhez...

Em, ez, Kamuran û fransizekî jêhatî yê bajarê Wiyanayê, ku me bi tesadufî li Wiyanayê nasî, bi hev re, çûn qonaxa Lichnowsky ku Beethoven tê de eserên xwe yên yekta îcra kiribûn, me Saraya Mezin ku mazûbanî li Napoleon kiribû, ziyaret kir, me avahiya Esterhaziler ku hê jî jê dengên musîka Haynd dihat, dît, me tiyatroya Burgê ku hertim tê de klasîkên mederiyeta roava dilîstin, dît. Em çûn taxên derveyî bajêr ku ordiyên osmaniyan heta wê derê hatibûn û mecbûrî jê vegeriyabûn. Me donzdeh saetên jibîrnebûyî, li wî bajarê Ewrûpa Navîn bihurandin. Û gava em bi trêna êvarê ji bajêr derketin, min ji bo bajêr, bi tirkî, weha nivîsî; Viyana cidden muazam ve muhteşem bir şehir...

Min ev rêz li ku nivîsîn? Te behs nekirê, lê ji bo ahenga reng û neqşên rûpelên Bîra Qederê, ez behs bikim. Berî derketina me bi çend rojan, roja ku min û Cananê êdî ji hev xatir dixwest, li Stembolê, Kadıköyê, Cananê, yara şevên dirêj û xewnên rengîn, kelgirî, deftereke biçûk yadîgarî min kir. Defterek ku min êdî bi hêsanî têdixist berîka çaketê xwe û gava pejnên fikrekê di serê min de diçûn û dihatin yan jî pêlên hîsekê li ser dilê min radibûn, yan jî bayê germ ê hesretê li min dihate xezebê, bi eynî hêsaniyê, min ew ji berîka xwe derdixist û ew deng, pejn û hîs dikirin rêz... Bergên deftera min a biçûk, mîna şevên kar û şixulên min ên pêşerojê û gotinên stranên ku min jê hez

dikirin, tarî bûn. Min rûpelên spî yên deftera xwe ya bergtarî, bi pênûseke reş, bi rêzên şahîdên jîn û umrê min, tarî dikirin... Di wê defterê de, çend rêzên pêşîn ên rûpelên pêşîn şahîdî li gera me ya kurt a bajarê Wiyanayê dikin.

– Tu dizanî, herî zêde, kêfa min ji çi re tê, Kamuran dibêje û tîkeyeke goşt jêdike, wê dibe devê xwe û bîskekê dicû, ez ê Goethe bi alemanî, bi zimanekî rewan, bixwînim!.. Bifikire!..

Fikra xwendina Goethe heyecan dide herduyan jî. Herdu, bi ken, li hev dinihêrin. Celadet radihêje qedeha xwe ya şarabê ya krîstal û dibêje,

– Hingî em divê ji bo te û Goethe, ji bo hevaltiya we binoşînin.

– Noş, noş ji bo te û Goethe jî, eger te jê re wext hebe...

Herdu, Celadet û Kamuran, birayên hev, hevriyên qedera hev, bi dû vexwarinê re, li hev dinihêrin û dikenin.

– Êdî wexta çûyinê hat, Celadet dibêje, ka dest bike, bila garson hesabê me bîne.

Lê çavên Kamuran ne li ser garson in, ew li masa kêlekê dinihêre. Du jinên bedew di nav cil û bergên sade, lê lihevhatî de, hatine û li masa kêlekê rûniştine. Porê yekê, li gora modayê, kurt hatiye birîn, porê ya din gelekî dirêj e. Lêvên wan ên sor bi ken in. Çavên jina ku, ji kêlekê, li hember Kamuran rûniştiye jî, vedigerin ser Kamuran. Kamuran bi keneke sivik û bi rêzdarî, serê xwe ber bi jêr dike û silav didiyê,

– Guten abend...

4

Guten abend!

Li kompartimana ku Celadet, Kamuran û hevalê wan ê fransiz dikevinê, mêrek û jineke pîr, li kêleka derî, rûniştine. Kamuran silav dide wan, li bilêta destê xwe dinihêre û derbasî hundir, ber pencerê dibe. Cîhên wan li ber pencerê ne. Ew walîzên xwe yên biçûk dixin bin kursiyên rûniştinê, xwe hinekî didin hev û li hember hev, li kêleka pencera fireh, rûdinin. Fransiz jî li ser

kursiya kêleka Celadet rûdine. Kompartimana hinekî tarî ji bo şeş kesan e.

– Ez hêvîdar im ku kesê êdî neyê nik me, Celadet dibêje û ji berîka hundir a çakêtê xwe deftereke biçûk û pênûsekê derdixe.

Kamuran jî pêşî sê bîrayên Munîxê, Lövvenbräu, ji walîza biçûk derdixe, şûşeyekê dide Celadet, yekê dide fransiz û ya xwe jî datîne ser textê biçûk ku bi pencerê ve ye, paşê jî kovareke bi zimanê alemanî, "Gesellschaft" ji walîzê derdixe û lê dinihêre.

Ew, vê êvarê, li ser riya Alemanyayê, Munîxê ne. Ew ê herin nik birayên xwe yên biçûk, Tewfîk û Safter ku li Munîxê dixwînin. Niha, piştî bîskekê, trên ê, dîsan, di nav êvara tarî û sar de, berê xwe bide welatê Alemanyayê û bi rê keve. Ew, gav bi gav, ji welatê xwe bi dûr dikevin û gav bi gav nêzîkî li îstasyona dawîn a rêwîtiya xwe dikin.

Celadet lingên xwe davêje ser hev, deftera biçûk datîne ser çoga xwe, jê rûpeleke nû vedike û bi tirkî, giran giran, weha dinivîse;

Pazartesi - 2. Teşrîn-i evvel. 1338 Yanê, duşemî, 2. Çirî. 1922... Duşemiyeke payiza 1922-an, di pêsîra êvareke sar de, ew ji Wiyanayê xatir dixwazin.

"Me, min û birayê min, yan jî ez weha bibêjim, dostê min ê qedîm Kamuran, bi meya sor a yakûtî, serî û dilê xwe germ kiribû. Meya sor, dosta xewn û xeyalan, barana havînên germ, leylana li pey rastiyên tahl ên jînê, ez xistibûm nav hêlekanekê û di navbera Stembol û Munîxê de dibir û dianî. Heşê min geh li nik diya min a bêdeng û çavbigirî, bavê min ê mîna heykeleke roman stûr û dengberz, Mezo, xweha min a deng ji şalûr û bilbilan çêtir, mam û metên min ên bêhejmar, Şehrîbana delal, Saadet Ablaya mîna teyreke mader dilgerm û zarşêrîn, Canana bedenmasî, lêv û zimanxweş, lê kêmgotin, heval û dostên min ên rojên çê û neçê bû. Geh jî heşê min li pêş, rojên nediyar ên bê, jîna nezelal a piştî rêwîtiyê, kar û şixulên pêşerojê, evîn û hezkirinên nû yên xerîb û balkêş bû. Ez di

nav filûqeyeke biçûk de, li ser pêlên xurt ên hîsên têvel, ber bi vî alî û ber bi wî alî diçûn û dihatim. Ez bîhnteng, zîz û melûl bûm. Min ew însan, ew dever, ew mekan, ew dewr, ew dewran, ew tişt û ew kes û pêwendiyên ku ez kiribûm "ez" , li pey xwe hîştibûn. Ew germahiya zanîn û nasînê li pey mabûn. Min û Kamuran, cêwiyê siûda min, nezanîn û nenasînê dabû ber xwe, di payizek ji payizên bêhejmar ên umrê me de, em ji dinyayeke germ ber bi dinyayeke sar û sermayê hildikişiyan. Gav bi gav, tiştên nas kêmtir, yên nenas zêdetir dibûn. Dinya û heyama nenas hembêza xwe vekiribû û bangî me dikir.

Hema çi bigire meha me ya dawîn a Stembolê, bi hevûdudîtin, xatirxwestin û haziriyê derbas bû. Mamên min Evdirehman, Mihemed Elî, Xelîl, Murat û kurmamên me yên bêhejmar ku niha êdî ne hewce ye, ez navê wan, yek bi yek, li vir bibêjim, her, bi me re bûn. Met û dotmamên me hertim dihatin malê. Li aliyên Cağaloğlu û Perayê, li buroya Serbestî û warên kurdan, heval û dostan em bi tenê nedihîştin. Hevalên me yên kurdperwer, bi hêviya ku rêwîtiya me dê di doza kurdayetiyê de bi kêr biya, em hembêz dikirin. Sahne-yî weda pir bûn...

Em ji Stembolê çûn Burgazê, ji wir jî, dîsan bi eynî keştî, li ser pişta ava Zerya Reş, em çûn Warnayê. Ji wir, me terkî avê kir û ber bi Sofyayê, bi trêneke giran, kevn û şerpeze, ketin rê. Ji wir, dîsan bi trênê, lê îcar bi yeka hîn çêtir, di bin baraneke boş de, em çûn Belgradê. Li Belgradê me bihîst ku kaxiz û pasaportên nû yên hukimeta Osmanî hew bi kar tên. Lê em, bi pasaportên xwe yên nenû, rehet, ji Belgradê çûn Zagrebê, bajarê navdar ê Hirwatistanê. Ji wir jî, em çûn... tu êdî pê dizanî... Yanê dinya û heyama nenas ku hembêza xwe vekiribû, em, gav bi gav, ber bi xwe radikêşand. Gelo ew dinya û heyama nenas periyeke bedew a destanan bû? Yan jî ew keça pîr a şêxê cinan bû? Li milekî jî, em li vê yekê, li pêşeroja xwe ya avis difikirîn.

Gava trên bi rê dikeve, deriyê kompartimanê vedibe û keçikeke bejndirêj û porzer dikeve hundir û li jimara kursiyan dinihêre. Di desteke keçikê de bilêta wê, di destê din de jî walîzeke biçûk heye. Celadet û Kamuran, her du bi hev re radibin pê da

ku alîkariya wê bikin. Keçik bi ken li wan dinihêre, bi alemanî, dibêje "spas" û tê, walîza destê xwe datîne ser kursiya kêleka Kamuran; cîhê wê ew der e. Celadet û Kamuran li cîhê xwe rûdinin. Piştî ku keçik cîhê xwe rast dike û walîzê dixe binê kursiyê, ew jî rûdine. Celadet û Kamuran, bi balkêşî, li keçikê dinihêrin. Bîhneke xweş ji keçikê difûre. Eger meriv bi tenê, bi gotinekê, wê salix bide, ew pir xweşik e. Hem çavên Celadet hem ên Kamuran li ser keçikê radiwestin. Keçik li wan dinihêre, bi şermokî dikene û çavên xwe ji wan direvîne.

– Te dixwest ku bila kes neyê nik me. Niha jî hê tu welê difikirî? Kamuran, bi ken, bi kurdî, ji Celadet dipirse. Lê bêyî ku ew bersiva Celadet bipê, ew vedigere ser keçikê, bi kîbarî, jê re dibêje, "guten abend..."

Keçik bersivê didiyê. Bersiva keçikê rê li Kamuran vedike. Ew dest pê dike, bi alemanî, jê re behsa xwe û Celadet û kurdan dike. Bîsteke dirêj, keçik, bi dîqet, li Kamuran guhdarî dike. Celadetê ku hew dinivîse û defter xistiye berîka çakêtê, her, li keçikê dinihêre. Gotina Ovidius tê bîrê; nêzîkî li wê bike, wext, wexta gotinê ye, guh mede aheng û lihevhatina gotinan, bipeyive, dest pê bike, destpêk, destpêk, bi dû destpêkê re dawî tê... Celadet nahewe, ew xwe ranagire û dest bi axaftinê dike,

– Fräulein?..

– Karlfeld, Monica Karlfeld, keçik dibêje.

– Fräulein Karlfeld, ich will ihnen etwas sagen... Celadet dibêje û radiweste.

Keçik û yên din li Celadet dinihêrin da ku ew gotina xwe temam bike. Lê gotina ku wî dixwest bibêje, bi alemanî, nayê bîrê. Ew kêliyekê difikire, lê dike, nake, gotin nayê. Dawiyê, ew, bi heyecan, ji Kamuran dipirse, "bedew, spehî, xweş, belle?.."

– Schön, Kamuran bi ken dibêje, schön...

– Richtig... Sie.... schön...

Keçik dikene, kêfa wê ji gotin û şêweyê gotina Celadet re tê û

ew bi deng dikene.

5 Gava Safter ji derî dikeve hundir, Celadet û Kamuran radibin pê, ber bi wî derin û dikenin, ji kêfan, ew bi dengekî bilind dikenin.

– Kekên min hatine, keko Celadet, Kamuran hatine... Safter dibêje û bi heyecan dere rûyê birayên xwe.

Bihêle, ez, dîsan, bi alîkariya dengên qels û dîmenên nezelal ên rojên bihurî, bêm alîkariya te... Malesef, ji jîneke xurt bi tenê dengên qels, siyên nediyar û bergehên nezelal li pey dimînin. Tu jî dizanî, vejîn û şixulê vejandinê bi alîkariya van deng, sî û bergehan tê pê, lê ne mîna xwe ya berê. Jîn û vejîn, bêguman e, ne mîna hev in. Lê di vejînê de, hertim ders û tecrube, tahm û bîhn, tov û şopên jînê hene. Meriv dikare bibêje, vejîn siya jînê ye ku hertim diguhere, carina dirêj, carina kin dibe. Pireke zirav mîna Pira Siratê di navbera jîn û vejînê de heye. Meriv dikare ji wê pirê re jî bibêje, "Pira xewn û xeyalan."
Çima ez, niha, weha behsa tiştên, bi qewlê ewrûpayiyan, "abstrac" dikim? Ji ber Safter, ji ber bi bîr anîna birayê min ê biçûk... Safter, jîrtirîn û zîrektirînê me hemûyan... serwextirîn û dûrbîntirîn, germtirîn û geştirînê me hemûyan... lê di eynî wextê de, bêmiraztirîn û bêsiûdtirînê me hemûyan... Niha, piştî umrekî, gava ez di ser pira xewn û xeyalan re gav dikim û xwe digihînim aliyê vejandinê, ew danê sibê yê Munîxê mîna guleke nûbişkovî tê bîra min. Heye ku ne hemû ew danê sibê, lê tiştine jê, mesela kena Safter, mîna guleke sor a bîhnvedayî tên bîra min. Ez dibêjim, ne hemû danê sibê, ji ber ku ew danê sibê pir sar bû.
Min û Kamuran, bi navnîşana destê xwe, di wê sar û pûkê de, bi zehmetî, xwe gîhand mala ku Safter tê de dima. Lê ew ne li malê bû. Gava xwediyê malê, profesorekî navsal, fahm kir ku em birayên Safter in, wî em ezimandin hundir. Jixwe piştî bîskekê jî Safter hat. Belê, hingî kena Safter mîna gulên sor ên bexçê mala me ya Kızıltoprakê bû; geş,

nûbişkovî û boş.. Bi dû Safter re jî, birayê me yê din Tewfîk hat. Em çar bira li welatekî xerîb û dûr gihîştibûn hev.

Çar bira di oda mezin a Safter de, li hember hev rûniştine û bi kêf û henek qala herdu dinyayên ku ew di navberê de derin û tên, dinya rojhelat, Stembol, welatê Osmanî, Kadıköy, Kızıltoprak, mala wan, bav û diya wan, bira û xwişka wan, mam û metên wan û dinya rojava, Munîx, xwendegehên Munîxê, jiyan û civata wê, keç û jinên wê, tiyatro û sînemayên wê dikin.

– Hûn ê îşev me bibin ku? Kamuran ji Safter û Tewfîk dipirse. Ez bawer im, we dil nîn e, di şeva me ya yekemîn de, hûn me li vê odê hepis bikin?

– De hûn bibêjin, em herin ku, hûn çi der dixwazin? Tiyatro, konser, sînema, restorant, gazîno? Çi? Tewfîk dibêje.

– Konser, Kamuran dibêje, em hatine Munîxê ku tê de dilê musîkê hildavê, me bibin konsereke musîka klasîk.

– Îşev konsereke musîka Mahler, Gustave Mahler heye... lê, we kincên germtir divê, Safter lê vedigerîne. Hûn bi van kincên li ser we ve, nikarin herin tu derî. Hewa pir hişk e, dinya sar e.

6 Hewa pir hişk e, dinya sar e. Digel ku çila Alemanyayê hê bi xurtî dest pê nekiriye, dinya serma ye. Celadet, carekê-du caran, xwe dilivîne ku rabe, lê ew nikare. Bedena wî, bi gotina diya wî, bûye mîna ço. Bedena wî jan dike, serê wî diêşe. Ew divê dakeve bajêr, Munîxê û here serdana Safter ku bi sermayeke xedar ketiye û di nav cîhan de radizê. Lê ew di xwe de wê taqetê nabîne ku ji nav cîhan derkeve. Welê dixuye ku ew jî bi sermayê dikeve.

Oda wan, wî û Kamuran, a mezin tu carî germ nabe, ew çi jî bikin, ode germ nabe. Ji binê derî, ji aliyê rojava, pencera mezin, her ba, bayekî sar û tûj, tê. Ew li saeta li ser masa kêleka xwe

dinihêre. Saet ber bi nîvroyê hêdî hêdî dizîvire. Çare nîn e, ew nikare rabe. Ew xwe hinekî din dixe bin lehîfa germ û wê dikişîne ser xwe.

Di wan rojên çileya me ya pêşîn a Alemanyayê de, di oda me ya mezin û sar de, ez bi tenê bûm. Kamuran, ji xwe re, kincin û paltoyekî germ dabû dirûtin û ji me xatir xwestibû û çûbû Berlînê, nik dostekî xwe. Min jî kincine germ kirîbûn û kincên min ên şevê û lehîfa min a bi hirî ya alemanî jî germ bûn. Lê çi feyde! Dinya sar, oda me seqem bû. Mîna ku em ne li odeyekê, lê li zozanan bûn!
Me li Munîxê nikarîbû tu cîh, ode, pansiyon peyda bikira. Ji ber rewşa piştî şer, xelkê gundan û doralî koçî bajêr kiribûn û bajar vegirtibûn. Bi alîkariya birayê me Tewfîk, me li gundekî biçûk ku nêzîkê Munîxê bû, Obermazing, li nik qesabekî, odeyeke fireh peyda kir. Xaniyê qesab bi du qatan lêbûbû. Qata jêrîn dûkana wî ya qesabiyê bû. Qata jorîn jî mala wî bû. Li paş xênî, bexçeyekî fireh û direj ê malê hebû. Li kêleka bexçê jî bîreke arteziyenê hebû. Di qata jorîn de, odeyeke mezin vala bû. Me ew ode, mehê bi hezar û sêsed markan, kirê kir û walîzên xwe û tiştên xwe yên hûr ku me ji Stembolê bi xwe re anîbûn, tevî kemança Kamuran, birin odê û em li wir bi cîh bûn. Ode fireh bû, lê em, nemaze Kamuran, hînî bi hev re, di odeyekê de mayinê, nebûbûn. Lê çare nîn bû, ne cîhên din hebûn, ne jî êdî quweta me dest dida.
Ji Stembolê, em bi tevdîr derketibûn. Me pere û zêrên xwe qulipandibûn ser markên alemanî, me bi deh hezaran mark xistibûn berîkên xwe da ku em çar bira, çar neviyên Mîr Bedirxan, li Alemanyayê, muhtacî tu kesî, tu tiştî nebûna. Li Stembolê em welê fikirîbûn. Çaxa em gihîştin Munîxê, me dît ku hesabê me yê Stembolê şaş bû, ji binî ve şaş bû! Markên me, ez nizanim, di sedî de çend sed, belê çend sed, ji qîmeta xwe, winda kiribûn...Vê yekê jîna me, bi carekê, guherand, jîna me xist ser riyeke gelekî kirêt û dijwar. Bi dû hatina me re, bavê min bihîst hezar markên din ên alemanî, ji me re, şandin. Lê mark bêqîmet û jîn buha bû. Di ser de jî, markê her roj qîmet winda dikir.

Kurdan gotibû; pere xulamekî qenc, lê axayekî xirab e. Pereyê ku heta hingî xulamê me bû, di wan rojên sar ên çila Alemanyayê de, êdî dixwest axatiyê li me bike. Jîna me, bi carekê, bi her awayî, guherîbû. Em ketibûn, em bûbûn derketî.

Celadetê ku tevî kincan ketiye bin lehîfê, ji xewa giran, hişyar dibe. Ziman û gewriya wî zuha ye. Qirika wî dişewite. Ew hinekî xwe dilivîne û li dora xwe, li saetê dinihêre. Saet ber bi êvarê, hêdî hêdî, dizîvire. Ew bi hêdîka ji nav cîhan derdikeve, cixareyek û hestê ji ser masê werdigire û ber bi pencera fireh dere. Êşa serê wî hinekî kêm bûye, lê ew pir bêtaqet e. Ew li der, li darên bexçê, ewrên girtî, dinya girtî dinihêre. Wî hê li vî welatî misteke tav nedîtiye. Tav her li pey ewrên girtî ye. Ew li vî gundî, li vê odê çi dike? Eger niha tiştekî bi serê wî de bê, haya kê dê jê hebe? Heta kengî ew ê li Alemanyayê be? Li Stembolê, li welêt ku ew carina, gava Mezo û Hîkmet ji wan re rojname dişînin, hay jê dibin, niha çi dibe, çi diqewime?

Cixare di dev de, ew vedigere ser textê razanê yê Kamuran, radihêje kemança ku li ser cîh e, kemançe û kevanê wê ji sandûqa wê derdixe û dîsan vedigere ber pencerê. Bi qasî demeke dirêj, ew, hêdî hêdî, heşê wî li derekî din, gewrî zuha, çav li ser bexçê û bîra li kêleka bexçê, li kemançê dixîne. Ew, bi kemança Kamuran a neakordkirî, dengên musîka çend stranên nîhawend û kurd-î hicazkar ên osmanî, bi bexçê digihîne. Paşê, piştî demekê, ew diweste, bêgav, dest ji kemançê berdide û dîsan tê ser cîhê xwe. Ew li ser cîhê xwe rûdine û cixareyeke din vêdixe. Wext ê niha çawan here? Tewfîk ku bi qasî nîv saetê ji gund dûr dixebite, çima nayê?

Bi bîhntengî, ew radihêje kitabek ji kitabên ser masê û rûpelên wê diqulipîne. Kitaba zirav û dirêj ku rûpelên wê zer bûne, bi fransizî ye. Tê de şiîrên şaîrên navdar ên fransiz hene. Di rûpelekê de şiîreke Victor Hugo "A ceux qui sont morts pour la patrie" heye. Ew wê, bi deng, dixwîne. Piştî şiîra Victor Hugo,

şiîrên Lamartine "le poete mourant" , ya Alfred du Vigny "La mort du loup" û ya Charles Boudelaire "le balcon" hene. Celadet wan jî, li ser textê xwe dirêjbûyî, bi deng, dixwîne. Bi dû van re jî şiîreke Lamenneais li ber çavê wî dikeve. Navê şiîra biçûk bala wî dikişîne; l'exilé... Bi gotina osmaniyan sirgûnkirî. Celadet hêdî hêdî wê dixwîne. Careke din, careke din, bi dengekî berz... Ev şiîr ku tê de behsa xerîbî û hîsên xerîbiyê dibe, şiîra jiyana wan e. Mîna ku Lamenneais ew li ser wan nivîsiye. Celadet ji berîka çakêtê xwe pênûseke reş derdixe û stêrikek li ser rûpel, li kêleka şiîrê, çêdike. Celadet divê vê şiîrê wergerîne kurdî, zimanê bav û kalan.

Ma çima ew niha dest pê nake? Kaxiz? Ew di xwe de nabîne ji ser cîhan rabe. Ew li ser rûpelê, sernivîsa şiîrê, bi fransizî, dinivîse; exilé... Lê exilé bi kurdî çi ye? Xerîbî? Sirgûnbûyî? Çi? Mana exil'ê derketin e. Ma çima ne derketin û derketî?.. Belê, derketî... Celadet bi qasî kêliyekê difikire û dîsan, li ser rûpela kitabê, bi tîpên pir biçûk herdu rêzên şihîrê, lê bi kurdî dinivîse: Terka welatê xwe da û kete dinyayê... Xwedê rêberiya derketiyan bike!..

Celadet hin rêzên din jî, giran, dixwîne û difikire. Lê na, ew nikare, êşa serî dîsan zêde dibe. Ew kitab û pênûsê datîne ser masê, lehîfa germ vedike û dikeve nav cîhan. Ew li kêranên dirêj ên bana odê dinihêre û li gotina xwe ya kurdî difikire û wê dubare dike; derketî, derketî...

FOTOGRAF 8

"Also sprach Zarathustra..." oder "uns umspülen hunderttausend wogen/alles reizt uns, manc herler gefaelt..."

1 Çar derketî, çar bira; Celadet, Kamuran, Tewfîk û Safter. Li welatekî xerîb, li bajarekî xerîb, her çar li kêleka hevûdu rawestane û bi ken li hevûdu dinihêrin. Sal, destpêka salên 1920-an in. Wext, wexta serûbinî, tevlihevî û geremolê ye. Cîh, navenda geremoliya dinê, deriyê do û îro, Munîx e.

Çar bira, çar lawên Emîn Alî Begê Bedirxanî, çar neviyên mîrê kurdan Bedirxan, li pê, li nik hevûdu rawestane û bi hev re dipeyivin. Welê dixuye ku haya wan ji fotokêşê nîn e. Fotokêş, destgirtiya birayê biçûk Safter, Pelikan, bêyî ku haya wan jê hebe, pê li qumçika makînê dike û fotografeke din li fotografên romana Bîra Qederê zêde dike, -bêyî ku haya wê jê hebe.

Di hemû umrê wan ê dirêj, balkêş û ji hevûdu pir cihê de, heye ku bi tenê ev fotograf, her çar birayan li nik hevûdu nîşan dide. Bahoza şerê cîhanê û aloziya destpêka salên 1920-an, ew li Munîxê anîne nik hev. Lê dewr û dewranên bê dê wan, yekcar, ji hev veqetîne. Veqetin û hesreta ku du stûnên esasî yên cîhana kambax a derketinê ne, dê, bi her awayî, mohra xwe li jiyan û qedera wan xîne. Lê di vê fotografê de, tu şopên rojên bê naxuyin. Haya wan hê ji rojên bê nîn e. Ew li kêleka hevûdu sekinîne û bi ken dipeyivin. Safter destê xwe ber bi Tewfîk kiriye û bi ken jê re tiştekî dibêje. Singa wî derketî, serê wî hinekî li pêş e. Tewfîk destê xwe yê rastê rakiriye û bi tilî Safter nîşan dide. Ew jî dike-

ne. Kamuran destê xwe biriye ser serê xwe û bi porê xwe dilîze. Ew jî bi ûsil dikene. Herçî Celadet, birayê mezin e, wî jî, mîna piraniya caran, herdu destên xwe xistine bêrîkên pantolonê, xwe hinekî ber bi pêş xwar kiriye û li Safter dinihêre. Kenekî geş li ser rûyê wî ye jî.

Ken, kêfxweşî û geşî hakîmî vê wênê ye. Mîna ku ew ji mirinê, şewat û hilweşînê nereviyane. Mîna ku mirin, bêgavî û zehmetiyên nedîtîyên derketinê ne li pêşiya wan e. Pelikan, keça dilsoz û porzer, evîna man û nemanê ya Safter, bi makîna xwe ya nûkirî, nêrîn û kena wan a boş dike nemir.

Her çar birayan hevûdu, ji nû ve li Munîxê dîtine. Munîx, bajarê medeniyeta germanî, navenda çanda Awrûpa Navîn, ji wan re bûye qonaxek. Belê, qonaxeke nû ku li ser riyeke dirêj e. Ew ji welatê rojhilatê, ji şerekî xedar ku ew ji hevûdu veqetandibûn, ji doz û têkoşîneke biserneketî tên. Di heyama do de, wan zêde wext nîn bû ku bi hev re bûna, hevûdu bidîtina. Her yek li derekî, bi şixulekî mijûl bû. Ji lewre, ew hevûdu zêde baş nas nakin. Ji bilî terbiye û perwerdeyiya malê, edet û ûsilên malbatê, tiştên wan ên yekgirtî ne zêde ne. Ew li Munîxê, ji nû ve, digihên hev, hevûdu dinasin... Lê piştî Munîxê? Bi dû qonaxa Munîxê re?

Ji kena wan dixuye ku ew zêde li vê yekê, li qonaxên bê nafikirin. Bervajiyê bûyer û serpêhatiyên Munîxê, ev fotograf çar birayên jixwerazî, bextiyar û kenê wan ê ku hemû fotograf vegirtiye, nîşan dide. Bi kincên xwe yên modern, bi rawestana xwe ya serbest, bi nerîna xwe ya bawertijî, mîna ku her çar bira dixwazin, di vê fotografê de, bi ken, vê yekê bibêjin; dinya bi dor e, rojekê geş e, rojekê zor e. Îro dora me ye, pêr dora Mîr Bedirxan bû, do ya bavê me bû, îro ya me ye. Digel her dijwariyê, em îro bi hev re ne, gihîştine hev, bi hev re quwet in; dest destan dişo, vedigere rûyan dişo. Bêguman e ku berî îro jî wexteke jiyayî hebû, piştî îro jî dê hebe, lê îro, esas e, navend e.

Li ser hemûyan cil û bergên nû û modern hene. Hemû bi gomlegên spî û bi qirawat in. Ji yên Safter pê ve, kincên

hemûyan, kincên klasîk ên ewrûpayî ne. Kincên Safter, bi gotina Pelikan, "sportîv" in. Di esasê xwe de, tu ferq di navbera kincên wan ên do û yên îro de nîn in. Do jî, wan, li bajarê piralî, pirçandî Stembolê, dîsan, kincên ewrûpayî li xwe dikirin. Kinc û lixwekirina wan nêrîn, fikir, hîs û dîtinên wan jî diyar dikin; ew ne dûrî cîhan û medeniyeta ewrûpayê ne. Rabûn û rûniştina wan herçend ya kurdan û welatê rojhilatê ye, ewçend jî ya ewrûpayê ye. Terbiye, xwendin û perwerdeyiya ku wan wergirtiye, ew kirine pirên navbera du cîhan û medeniyetên ji hev pir cihê. Ji lixwekirina wan diyar e ku ew bi qasî cîhan û medeniyeta rojhelatê, aîdê cîhan û medeniyeta rojava ne jî. Loma jî, meriv dikare bibeje, di fotografê de, kenê wan boş, rawestana wan rehet, tevgera wan serbest e.

Fotograf li ser kolanekê tê kişandin. Welê dixuye ku ew li rê ne, ber bi derekî derin. Li pey birayan çend xaniyên ku bi lêkirina germenî ava bûne, dixuyin. Li ser dîwarê xaniyê hema li pey wan, di nav lewheyeke biçûk de, bi tîpên latînî yên germenî, Galeristrasse, dinivîse. Li pey xaniyan jî, dêrek û birca wê dixuye. Ken, rawestan û tevgera birayan ne li dijî van avahî û perçên din ên wênê ne, ji bervajiyê, ew hevûdu temam dikin.

Birayên Bedirxanî, neviyên rêberê kurdan, ji welatê xwe pir dûr, li ser kolaneke Munîxê rawestane û bêyî ku li rojên bê bifikirin, bi çavên germ, li hevûdu dinihêrin û dikenin...

2 Birayên Bedirxanî, Celadet û Kamuran, neviyên rêberê kurdan, ji welatê xwe pir dûr, li aşxana Unîwersîta Munîxê rûniştine û bêyî ku li rojên bê bifikirin, bi coş, li hevûdu dinihêrin û dikenin. Herduyan jî îmtihanên xwe bi serfirazî dane û derbasî sinifeke nû bûne. Celadet dersên ziman, çand û siyasetê dixwîne, Kamuran jî doktora xwe ya hukukê çêdike. Roj bi roj, ew dikevin nav civat û çanda Alemanyayê, şirîtiyeke bikêr bi ziman, medeniyet û çanda Alemanî re tînin pê. Her çar bira jî dixwînin.

Safter, birayê biçûk, xwendina xwe ya kîmyayê xelas kiriye û dest bi îhtîsasê kiriye. Tewfîk bûye muhendîsê daristanê, dest bi doktorayê kiriye û niha li ber xelaskirinê ye. Kamuran ku hê li Stembolê awikat bû, niha, bi xurtî ketiye nav refên kitabxanên Munîxê û li hukuka enternasyonal û ya medenî ya Ewrûpayê hûr dibe. Celadet ku ji bêgaviyê terkî welêt kiribû, bi xurtî ketiye nav rûpelên çand, felsefe û edebiyata alemanî û zimanê alemanî û îlmê zimên hîn dibe.

Ew îro, di dewreke gelekî kambax de, bi xeberên baş, rojeke çê derbas dikin. Celadet simbêlê xwe, hinekî, gurtir berdaye. Lê rû û bedena wî ya hinekî gir, niha, jartir dixuye. Kamuranê ku her jar bû, niha simbêlekî zirav jî, li jariya xwe zêde kiriye. Xwarina li ber wan gelekî basîd e; çend serî kartol, çend tîke goştê dewêr ku bi zehmetî tê cûtin û du şûşe bîra Bayernê.

– Ab'brühen, Herr Doktor, Celadet dibêje û qedeha bîrayê radike.

– Noş, birayê ezîz, noş, Lê hê tu li ku, doktorî li ku.

– Na, na zêde nema, bi xêr, ber bi serê salê, ez ê bi nameyeke xweş, mizgîniya doktoriyê bi bavo û kek Sureya bigihînim.

– Eger tu rastiyê bixwazî, bawer bike, ez naxwazim doktor bim jî. Ez ê li ku û çawan doktorî û awikatî bikim? Ez vê doktoriyê ji bo welêt dikim. Lê ka welat li ku ye? Em ê çawan herin welêt û li wir bixebitin?

– Kamuran, birayê min ê hîstenik... ma dinya dê her weha bimîne, çerxa felekê dê her weha bizîvire? Şaş mebe, ronahî li pey vê perda tenik a reşahiyê ye, wîcdan ê bi ser keve, mêjî dê, ji xewa kûr, hişyar be.

– Xwezî... xwezî... heşê min jê tişekî nabire, lê ez dîsan bibêjim xwezî...

– Bila heşê te jê bibire, ji bîr meke, rojekê ne bi tenê ji şevê, lê ji roj û şevê tê pê. Dawiya dawîn, em ê di rojeke pîroz a Xwedê de, tevî van zanîn, tecrube û serpêhatiyên xwe, tevî keser û kêfxweşiyên xwe, vegerin mala xwe... De binoşîne, ji bo te û me.

Piştî vexwarina bîrayê, Kamuran saeta xwe ya bi kostekê ji berîka êlega xwe derdixe, lê dinihêre û bi lez radibe,

– Mixabin, ez divê herim, ez dereng mam...

– Bi ku de? Ji Sureya Abê nameyek hatiye, min ê ew ji te re bixwenda, bi ku de derî?

Kamuran bi tenê dikene û dibêje, "mepirse... çavşînê lê, lê..." û dizîvire, dere. Celadet wan çend dilopên dawîn ên bîrayê jî wedixwe û li şêniyên li maseyên doralî dinihêre.

Çaxa min ew gotin ji Kamuran re digotin, di esasê xwe de, min xwe jî bi wan teselî dikir. Ma gotinên qelaw ên li ser xurtî û baweriyê, ji xwediyê gotinan pê ve, dikare kê bixapîne? Rewşa me, ne tu rewş bû. Rewşa me şerpeze, halê me pêrîşan, neçarî û kambaxiya me bêpayan bû. Roj ji rojê xirabtir, bûyer ji bûyerê kirêtir bû. Alemanya bi leza birûskê ber bi geliyekî bêbinî gêr dibû. Aboriya Alemaniyayê mîna hûtekî, mîna geremola lehiyekê her çi dihate berê dadiqultand. Diravê Alemanyayê mark, mîna pelê ber bayê, berfa ber tavê, her roj, her saet, her deqîqe, qîmet winda dikir. Dolar, bêpayan buha û bilind dibû. Li Alemanya jihevketî û hilweşiyayî tu kar û şixul jî nîn bûn ku meriv bi dest xista. Li milekî, li Alemaniyayê rewş weha kambax bû.

Li milê din, bav û diya min, tevî Mezo, ji Stembolê û Tirkiyê derketibûn û çûbûn Misirê, nik kekê min Sureya. Em bi vê yekê kêfxweş bûn; wan xwe ji şûrê ruhistinê ko xelas kiribûn. Lê bi çûna wan, kahniya pereyên ku ji me re dihatin şandin jî miçiqîn. Carina Saadet Abla û merivên me yên din ji me re hin dolar dişandin, lê ew jî, ji ber aloziya aborî û bankeyên Alemanyayê, nediketin destê me. Di ser de û tiştê herî xirab, em nikaribûn vegeriyana Stembolê. Li gora nameyên ku dihatin, rewşa siyasî li wir jî gelekî xirab bû. Name weha xelas dibûn; gidî, hûn bin, hûn fikir li vegerê nekin...

Me dê çi bikira? Em mîrên kurdan li Munîxê şerpeze bûbûn. Navekî giran û mezin li gundekî wêran bû. Me dê

xwe bi ku de bavêta? Kî dê bihata hawara me? Felek bi girane û zompan ketibû ser me, mêjî, heş, dil û zikê me dihenciqand. Bi taybetî jî zik, zikê bêşerm û teres ku her birçî bû...

Celadet ji berîka pantolonê xwe pereyên xwe derdixe û lê dinihêre. Piştî ku wî heqê xwarin û herdu bîrayan da, pere têra du, te nizanîbû, sê rojan dikir. Piştî du-sê rojan? Xwedê kerîm e. Bi bîhntengî ew ji berîka çaketê xwe pakêta cixarê derdixe û cixareyekê vêdixe. Digel neçarî û xizaniyê, bêguman, jiyana xwendevaniyê, xwendevaniyeke weha ku cîhaneke nû li berê vedike, hemû mêjî û dilê wî vedigire, xweş e. Lê heta kengê ew ê bikaribe xwe rabigire? Ew bi destê xwe yê çepê jî bi kêra li ser masê dilîze û li pirsiyarên weha bingehîn ên jiyana xwe ya Munîxê difikire.

– Der prinz BedirKhan?

Celadet serê xwe ji ber masê radike û li aliyê deng dinihêre. Jineke ciwan a porzer û çavşîn, bi ken, lê dinihêre. Mîna ku Celadet ew dîtiye, lê ew nikare wê derxe.

– Hûn ne Mîr Celadet in?

Jina ciwan, bi alemanî, jê dipirse. Celadet bi serî bersiva wê dide û li çavên wê dinihêre. Wî ev jina hanê ku çavên wê mîna zeryayekê stûr û şîn in, li ku dîtiye, ew wê ji ku dinase?

– Monîka... jinik dibêje.

Celadet, ji nişka ve, radibe pê û diqîre,

– Fräulein Karlfeld... Monika Karlfeld!

3 Fräulein Karlfeld... Monika Karlfeld.

Gava Celadet û Monika ji trênê peya dibin, ew wê bi Safter û Pelîkana ku li hêviya wan in, dide nasîn.

– Monîka li unîwersîtê doktora felsefê çêdike... serpêhatiya min û Monikayê gelekî balkêş e. Ez ê ji we re behs bikim.

Di rojeke pir xweş a havîna 1923-an de, Celadet û Monika, li istasyona trênê ya Dikerteyê peya dibin. Çaxa ew ji trênê peya dibin, tîrêjên xurt û rengîn ên tavê çavên wan digirin. Piştî hevûdunasîn, hembêz û silavan, Celadet û Safter radihîjin walîzan û ew bi rê dikevin. Celadet û Monika dê, ji bo çend rojan, mêvanên Safter û Pelikanê bin da ku ji keft û lefta bajêr û zehmetiyên xedar ên jiyana rojane, piçkekî, bi dûr kevin. Safter û Pelikan li gundekî biçûk û şêrîn dijîn. Ji ber nexweşiya Safter, wan xwe ji bajarê mezin, lez û beza jiyana bajêr vekişandine û hatine li gundekî bêdeng û aram ku nêzîkê bajêr e, bi cîh bûne. Safter, hema çi bigire, hertim, nexweş e. Carina ew bi zekemê dikeve, carina serma digire, carina bi kuxikê dikeve. Digel ku ew gelekî girs û lihevhatî ye, bedena wî mîna şitila ber avê, zîz û tenik e.

Celadet û Safter li kêleka hevûdu, Monika û Pelikan jî, çend gav, li pêşiya wan, li ser riyeke pir xweş û hêşîn, dimeşin. Herdu aliyên rê bi daran tijî ne. Rê mîna tabloyeke resamekî hoste li ber wan dirêj dibe û dere. Dar, tîmsala dem, dewr û heyaman, ku piraniya rojên salê tazî û stûxwar in, niha, bi hemû bedewiya xwe ya havînê, bi hemû hêşinahî û zelaliya pelên xwe yên spehî û bi comerdî, rê nîşanî wan dide. Tav û tîrêjên wê, bi şewqeke rengîn, li ser eniya Celadet û Safter dibiriqe. Bîhneke xweş ji hawirdor difûre; tabîatê kirasê xwe yê rengîn li xwe kiriye û direqise.

– Celadet Abi, tu westiyayî? Tu dixwazî, em hinekî bîhna xwe berdin?

– Na Safter, Celadet dibêje. Eger tu newestiyayî, ez newestiyame. Jixwe ez bawer im, riya me jî zêde nema.

– Na, piştî vê riyê, em xwe digihînin erebê.

– Safter, min kitabên şiîrên fransizî jî bi xwe re anîne, eger me keys hebû, em li ser hinan bixebitin.

– Bêguman... bi rêberiya te, em ê gelek şiîrên hêja wergerînin zimanê kurdî ku pir hewcedarê vejîn û nûjeniyê ye...

Dawiyê, te gotin anî ser wan rojan... dawiya dawîn, te gotin bir û anî û li dora mirinê gerand, gotina edebî bi mirinê gîhand...
Safter mir...
Sê sal bi dû wan rojên ku tu niha bi gotinên edebî taswîr dikî re, li nexweşxaneyeke Munîxê, di odeyeke sar de, serê wî li ser çoga Pelikanê, Safter çavên xwe, bêveger, girtin. Ji Pelikanê pê ve tu kes li nik wî nebû. Ne ez, ne birayên min ên din, ne xweha min, ne bav û diya min û ne jî ji malbata me ya bêhesab mezin kesek... Hingî ez û Kamuran li Lubnanê, kekê min Sureya li Misirê, dê û xweha min li Stembolê û bavê min jî... bila gotin, gotinê veneke, gotin li gotinê zêde nebe...
Safter, bira, heval û alîgirê min ê jînê, bi qewlê Amojna Sitî, roniya çavê min, di wê xortiya xwe ya bedew de, çû, -bêyî ku xatir bixwaze, bêyî ku li me, nemaze li min bifikire. Nexweşiyeke zirav û teres ew bir diyarê rehmetê. Mirina Safter ez jî kuştim. Tê gotin ku meriv carekê dimire. Na, ev ne rast e. Meriv du caran, mîna min, pir caran, car bi car jî dimire. Bi dû mirina Safter re, ez gelek carên din jî mirim. Lê cara yekemîn, ez bi Safter re mirim, nîvê dilê min jî pê re çû axa axretê.
Safter ku ewçend li ser xwe, ewçend lihevhatî bû, ewçend ji sporê, boksê, hespan, nêçîrê, masî û masîvaniyê hez dikir, ewçend dilê wî ji bo kurdan, welatê wan, zimanê wan davêt, ewçend ji însan û însanetiyê hez dikir, nikarîbû xwe li hember nexweşiyên basîd û biçûk, mîna serma û bronşîtê, rabigirta. Wî agir bi dilê me xist û çû. Di rojeke şilî ya çila Alemanyayê de, Pelikan, bav û diya wê û du hevalên Safter ên alemanî, bi tenê ev merivên bi qasî tiliyên destekî, bedena Safter a çeleng, bi bêdengî, li bin axa şil û sar a Heidelbergê veşartin.
Mirin li kal û pîrîtiyê tê. Kal û pîrîtî heyama pêşîn a mirinê ye. Gava beden, gav bi gav, xwe ji xewa ebedî re hazir dike, kal û pîr bi deng û pejnên mirinê dihesin. Lê ya yekî nola Safter ku ewçend ji mirinê dûr bû?.. Ez çi bibêjim?
Di wan rojên ku tu niha behs dikî de, birayê me Tewfîk xwendin û doktora xwe temam kiribû, ji me xatir xwesti-

bû û vegeriyabû Stembolê. Wî riyek, li gora xwe, dabû ber xwe. Safter jî xwendina xwe temam kiribû. Lê ew venegeriyabû. Mîna niha tê bîra min, Safter weha gotibû; "ez ê çawan kekên xwe Celadet û Kamuran terk bikim û herim? Em ê, bi hev re, ji bo ziman, çand û edebiyata kurdîbixebitin." Ew û Pelikanê mabûn. Lê xwezî ew biçûna Stembolê, heye ku hawa Stembolê lê bihata...

Herwekî ku te jî got, di wan rojan de, Safter û Pelikan li gundekî gelekî xweş dijiyan. Bîhna min jî teng, zikê min birçî, dilê min bi kul bû. Pere nîn bû, nan û xwarin nîn bû, araq û vexwarin nîn bû, cixare û qelûn nîn bû, kar û şixul nîn bû, xeber û nûçeyên baş nîn bûn. Tu tiştekî ku hinekî bîhna min veda, ez kêfxweş bikirama, nîn bû. Dolarekê hilkişiyabû duwanzdehezar markan. Xwarin û vexwarinê jî li gora vê nispetê kirasekî ji agir li xwe kiribû. Xwarina min jî, li gora rewşê, daketibû vî halî; nan û kartol, av û kartol, kartol û av, kartol û kartol!.. Û min dest pê kiribû cil û berg û kincên xwe difirotin da ku min bikaribiya ew kartol jî peyda bikira. Çakêt û pantolên min, roj bi roj, kêmtir dibûn.

Di halekî weha de, çaxa min keys didît, ez diçûm gund, nik Safter û Pelikanê da ku min hinekîbîhna xwe berda. Di wan rojên gund de, ez û Safter her li ser çand, edebiyat û zimanê kurdî dipeyivîn. Ji bo dewrên bê, me plan û proje çêdikirin. Safter her dixwest ku me şiîrên fransizî wergerandina zimanê kurdî. Me hin rêz, bi hev re wergerandin, lê wî tu carî wergerên weşiyayî, şiîrên fransizî bi kurdî, nedîtin. Ev daxwaza wî jî bû kulekî û kete hundirê min.

Mîna gelek aliyên jîna me, keser û bextiyariyên me jî cêwî ne. Bi kesera Safter û daxwazên wî yên qurmiçî, min ew şihîrên ku me bi hev re dixwendin, wergerandin kurdî û di kovarên xwe de weşandin. Çaxa min kovara xwe Hawar di destpêka salên 30-an de, weşand, di hejmarekê de, li ser wergera şiîrekê (eger ez ne şaş bim, hejmarek ji yên 30-an bû), min weha nivîsî;

"Sefdo, lawecan! Di sala hezar û neh sed û bîst û didowan de em hatibûn Mûnîxê. Ez û kekê te Kamiran. Em şikiyabûn. Zora me çûbû. Felekê poşikê reş kêşabû ser

qedera Kurdistanê. Êdî di warê siyasetê de tu hêvî nemabû. Me tev de digot: Ziman, xwendin û nivîsandina zimanê me; bi tîpên xweser, bi tîpên kurdî. Belavkirina kitêb, kovar û rojnaman. Min ji çiyayên Refanê ji te re elfabeke kurdî anîbû. Tu hînî wê dibûyî. Te digot; 'ez gelek kêfa xwe ji şiîreke Elfred de Vinyî re ditûnim: Mirina Gurî. Rojekê ez ê wê wergerînim kurmanciyê û wê belav bikim.' Ev deh, diwanzdeh sal in, kitêb û kovar bi zimanê kurdî û bi tîpên kurdî têne belavkirin. Lê felekê tu beriya wan belav kirî. Feleka bextreş, mîna Kurdistanê poşîke reş û tarî kişande ser canê te yê tenik û çeleng jî. Bi hêviya ku giyanê te yê pak pê bihese û pê şa bibe, ev e, min 'Mirina Gurî' wergerande kurdmanciyê û pêşkeşî giyanê te kir..." Min, gotin bi gotin, weha nivîsî û ew pêşkeşî tevî şiîrê weşand. Hingî, bi tenê hingî, min xwe, bi qasî mistekê, bextiyar hîs kir. Lê bi dû re, dîsan bîhna mirinê dor li min girt.

4 Bîhna mirinê dor li Munîxê girtiye. Bajarê huner û musîkê, die weltstad mit herz, niha dilê xwe ji kîn û nefretê, ji mirin û kuştinê re vekiriye. Bajarê kêfê, niha, bûye bajarê keserê. Tava ku jixwe pirî caran winda ye, niha, yekcar ji bajêr xatir xwestiye, Bajar, avahî, qesr, dêr, birc, heykel, kolan û navendên wî yên çand û hunerê, di bin ewrên tarî û girtî de, niha, şahîdî li esebiyetê dikin. Bîhna xwîn û mirinê dor li avahiyên spehî yên barok û gotîkê digire. Bajarê kevnar ku bi rengekî qurşûnî xwe xemilandiye û bûye navenda hunera germenî, niha, kesertijî û bêhuzûr e.

Cîhan, Alemanya, Munîx û Celadet rojên pir dijwar derbas dikin. Bîhn li wan çikiyaye. Alemanya ku ji ber krîza nedîtî ya aboriyê li ber întixarê ye, bi bûyerên siyasî û civakî diçelqe. Alemanya, navenda Awrûpayê, li pey riyên nû û çareyên saxbûnê ye. Herkes ji hev dipirse; wohin? Bi ku de? Alemanya bi ku de diçe? Çare?

Digel ku hê çare ne xuya ne, alemanî didin pey tevgereke nû; nasyonal sosyalîzm. Nasyonal sosyalîzm ku bi kurtî jê re dibêjin "tevgera nazîst", bi fikir û gotinên nû, bi tevger û awirên ecêb, bi çavsorî û cesareteke dînî bala hemû alemanan dikişîne. Li mezintirîn bajarên Alemanyayê, Berlîn û Munîxê ku bingehên wan ên herî qaîm în, ew pêl bi pêl fireh dibin. Tevî ku dewlet û dezgehên wê yên kevn li ber xwe didin, li Munîxê, ev tevgera nû, pêl bi pêl bajêr vedigere.

Îro, nehê meha dehan a 1923-an e. Bajar hê jî radizê. Berbang hêdî hêdî zora şevê dibe û stêrkan bi dûr dixe. Hûnikahî, bayê ber destê sibê, xwe bi oda biçûk a Celadet jî digihîne. Celadet ranezaye. Paltoyê wî yê reş li ser milên wî, ew li ber masa biçûk rûniştiye û bendeke biçûk, ji bo rojnameyeke alemanî, dinivîse. şûşa şarabê ya li ser masê vala ye. Qelûneke reş a vemirî, stûxwar, mîna şûşê bêkêr, di nav xwelîdankê de ye. Ferhengeke mezin a alemanî-fransizî, deftera ku Cananê dabûyê û çend kitabên din, tiştên serê masê temam dikin.

Mîna bajarê Munîxê, Celadet jî esebî, bêhuzûr, eciz û bêgav e. Wî ji oda xwe ya biçûk a li ser Galeri Strassê bar kiriye û hatiye vê oda biçûk. Odeyên biçûk, teng, bêhewa û bêronahî bûne para wî. Oda wî, na ne oda wî, mala wî, bi tenê çar gav in. Mîna çira Aladdîn, cîhaneke pir fireh ketiye nav vê oda çargavî; cil û bergên wî, kitab û defterên wî, jiyan û tecrubên wî hemû di nav vê oda teng, nizm, sar û tarî de ne. Ew di vê odê de xwe mîna şêrekî ku ketiye nav qefesekê hîs dike. Lê ew dikare çi bike, çi ji destê wî tê? Ew, derketiyê welêt, roj bi roj, dikeve, mîna ku ew di nav bîreke bêbinî û tarî de be, ew her ber bi jêr dibe.

Xeberên Stembolê yekcar nexweş û kirêt in. Berî niha bi çendekê, Saadet Abla jê re nameyeke dirêj a dilsoj şandibû û tê de weha gotibû; "Bu satırları gözyaşlarıyla yazıyorum..." û nama xwe bi van rêzên tarîxî ku jiyana Celadet û berê rûpelên Bîra Qederê bi aliyekî nû dida, xelas kiribû; "mixabin, hezar mixabin, êdî riya te girtiye..." Rejîma nû ya Tirkiyê, serekiya Mistefa

Kemal Paşa, vegera Turkiyê li wan qedexe kiriye. Mistefa Kemal Paşa, xebat û tevgerên Emîn Alî Beg û gera Celadet û Kamuran a welêt ji bîr nake, bav û herdu birayan li dijî xwe tehlûke dibîne û bi tu şertî li vegera wan razî nabe. Mistefa Kemal Paşa îro desthilat e û desthilatî bi zimanê xwe yê taybetî dipeyive.

Li milekî ev... lê li milekî jî Canan, nebûn û windabûna wê... Mîna ku ew ketibe heft qat binê axê, Canan bi carekê winda bûbû. Jê ne deng û hes, ne nivîs û nameyek dihat. Berî ku ew li Stembolê ji hevûdu veqetin, wan gotina xwe kiribû yek; heta ku rewşa Celadet baş diyar bûya, ew ê ji hev veqetî bijiyana. Lê gava ku rewş diyar bû, wan ê, îlam, xwe bigihandina hev. Heta hingî jî wan ê, hertim, name ji hev re binivîsa. Çaxa navnîşana Celadet kifş bû, wî dê nameyek ji wê pansiyona Cağaloğluyê re bişanda. Hevalê Celadet, kurê xwediyê pansiyonê, dê name bi Cananê bigihanda. Bi vî awayî, haya wan ê ji hev hebûya. Bi kurtî, qewlê wan weha bû. Celadet ne bi tenê nameyek, gelek name nivîsîn, lê wî tu bersiv wernegirtin. Wî ji nas, heval û dostên xwe yên Stembolê jî alîkarî xwestibû ku ew şopa Cananê hildin. Lê Canan winda bû. Ew hew diçû xwendegehê, hew li mala bavê bû, hew li wan cîhên nas bû. Ew nûn bû, lê gotin li serê gelek bûn; hinan digotin ku wê daye pey zabitekî tirk û pê re çûye Ankarê, navenda rejîma nû ya Tirkiyê. Hinan digotin, ew bi yekî boşnak re zewiciye û bi hev re çûne Saraybosnayê. Li gora hin xeberên din jî, ji bo xwendina bilind, ew çûbû Parîsê. Bêxeber û şop, wê xwe winda kiribû... Celadetê ku pirî caran bi xewnên Cananê ji şevên sar ên Munîxê hişyar dibû, dikir, nedikir, nikarîbû riya ku diçû nik yara şevên spî yên Stembolê, bidîta.

> Bîhntengî ne bi tenê ev bûn, heta qirikê ez ketibûm nav bîhntengiya derd û keseran. Ez kotî bûbûm... Di wê gera me ya welêt de ku êdî jîn û qedera min xistibû ser riyeke nû; vegera mala germ, ocaxa hebûn û jînê li min qedexe kiribû, rojekê, li gundekî Kilîsê ku em jê dibihurîn, pîrejinekê, li ser halê kurdan weha gotibû; Ce keran şamî dike, mesqel şûran misrî dike, xizanî mêran kotî dike. Bi qewlê

vê jina porspî ya dûrbîn, xizaniyê ez kotî kiribûm... Bila yeqîna te ji Xwedê hebe, min ew oda çargavî jî, bi hezar zehmetî peyda kir û bi hezar zehmetî heqê wê dida. Tunebûn û windabûnê dor li min girtibû û roj bi roj cîh li min tengtir dikir. Ez, derketiyê welêt, roj bi roj diketim, dibûm kotî û ketî. Rewş ewçend xirab bûbû ku min êdî nikarîbû cixare jî peyda bikiriya. Min cixare dijmartin û dikêşandin. Kêşana cixarekê bûbû kêfxweşî û serfiraziya herî mezin. Di wan rojan de, tiştê ku herî zêde min dixwest, wexwarin bû, vexwarina araqê. Lê ew jî bi dest nediket.

Min dixwest vexwara, heta serxweş bûma, her tiştî ji bîr bikira, vexwara. Ew rojên me yên peşîn ên Munîxê, rojên xwarin û vexwarin, konser û restoranan, bûbûn xewneke mijdar. Wê şeva ku ez heta sibê rûniştim, min şûşeyeke şarabeke nexweş a sor peyda kiribû. Heta sibê, min ew hêdî hêdî, dilop bi dilop, vexwar. Lê min tu tişt ji bîr nekirin, ji bervajiyê, tiştên nexweş ku min ji bîr kiribûn, hatin bîra min. Şarabê ez ji derd û keseran rizgar nekiribûm, bîlakîs, ez kiribûm girtî û dîlê wan.

Min hal û hewalê xwe yê zîz, roj bi roj, carina bi kitekitan, derbasî wê deftera ku Cananê dabû min, dikir. Ew çend rêzên biçûk ên wê defterê têra salixdana wan rojên dûjehê dikirin.

Min debara xwe bi çi dikir? Min hin bendên biçûk dinivîsîn, carina heftê saetek-du saetan dersên zimanê kurdî û tirkî didan, tevî Kamuran, ji Stembolê mehfûr û xalîçe didan anîn û ew difirotin. Ez rojnamevan bûm, dilê min pê re bû û li Alemanyayê tê de, herçî ne zêde bû jî, qezenc hebû. Ji bo kovar û rojnameyên alemanî, min carina li ser çîrokên Mele Nesredîn, tarîxa kurdan, edet û ûsilên wan ên kevn, neçîr û nêçîrvaniya wan, bendin dinivîsîn.

Li vir ez serpêhatiyeke xwe jî bibêjim; di wan rojan de, carekê, ez bûm milyoner jî. Na, ne milyoner, milyarder. Na, ne milyarder jî, bilyoner... Saadet Abla û nasekî min ê din çend dolar ji min re şandibûn û piştî xebateke dijwar, min ew dolar wergirtibûn û qulipandibûn ser markê. Û ew çend dolarên min bûbûn çend bilyon! Ez bûbûm bilyoner, lê bilyonerekî neçar û xizan!

Deriyê oda Celadet, bi hêdîka, du caran, lêdikeve. Kî ye? Di vê destê sibê de, kî tê oda wî? Safter? Kamuran? Monika? Ew derî vedike. Hevalekî wî yê aleman, di destan de rojnameyekê, bi heyecan, li ber derî rawestaye. Hevalê wî dibêje, "gotten morgen", rojnama destê xwe dide Celadet û derbasî hundir dibe. Celadet li rojnamê dinihêre. Xebereke tarîxî, bi tîpên germenî, nîvê rûpelê dagirtiye; Hîtler hikumeta alemanî hilweşandiye û hikumeteke nû ya neteweyî ava kiriye. Celadet, bi heyecan, xeberê dixwîne. Hitler, demançe di destan de, alîgirên wî li pey, bi darê zorê, meclîs û hikumet têk biriye û desthilatiya xwe îlan kiriye.

Alemanya dikele.

Celadet û hevalê wî ji odê derdikevin. Di rojeke weha de Celadet ê di oda teng de çi bike? Celadet dere unîwersîtê. Unîwersîte dikele, xwendevan di nav heyecaneke bêpayan de ne. Ders rawestane, mamosta nehatine, yan jî nexuyane. Celadet li wir Kamuran, birayê xwe yê şoreşger, dibîne. Kamuran tevî xwendevanan bûye, bi heyecan ji Celadet re, behsa serhildan û guherînên nû dike. Herdu bira ji xwendegehê derin Kahnihall'ê, warê şêniyan. Kahnihall jî mîna xwendegehê dikele. Ew li wir Safter, bi tesadufî, dibînin. Di rojeke weha de wî xwe ranegirtiye û daketiye bajêr. Hersê bira, bi du bisiklêtan, Celadet û Safter li ser bisiklêta Safter, Kamuran jî li ya xwe, li bajêr digerin. Tarîx li ber çavên wan tê nivîsîn, rûpeleke nû ya tarîxî li nik wan dest pê dike. Ew, zarokên serhildanan, naxwazin rû ji şahîdiya tarîxê badin. Bi qasî çend saetan ew li bajêr, bi hev re, digerin, paşê tên oda Celadet. Ji gotin û xeberdanê bêtir, ew rojnaman dixwînin da ku rûdana bûyeran baş têbigihên. Piştî nîvroyê, Kamuran û Safter derin. Celadet jî deftera xwe ya biçûk vedike û bûyerên danê sibê dinivîse. Lê bûyer neqediyane, ji bervajiyê nû dest pê dikin. Ew hê bi rêzên pir basîd bûyeran dinivîse, hevalekî wî yê din tê. Hevalê wî yê aleman bi heyecaneke mezin û kelgirî dibêje;

– "das blut... blut... xwîn diherike, li Odeonplatzê xwîn diherike..."

Celadet ku li ser xwarina xwe ya kartolan e, bi carekê radibe û berê xwe dide Odeonplatzê. Dor li Odeonplatzê hatiye girtin. Li hin aliyên meydanê kuştî li erdê dirêj bûne, li serê her kuçeyê otomobîlên eskerî yên bi zirx û mîtralyoz li hêzên Hîtler didin. Ordiya ku bi dewlet û hikumeta Alemanyayê girêdayiye, serhildana tevgera nazîstan dişkîne. Adolf Hîtler û hevalên wî li ber xwe didin, lê wan şikestên xedar xwarine, ew mîna pelên payizê ji hev dikevin û hildiweşin. Teqîn e, Odeonplatz bi dengê çek, mîtralyoz û topan olan dide. Dûman û bîhna barûdê ji meydên radibe.

Celadet li kêleka koşeyeke kolaneke teng radiweste û li meydên û xaniyên doralî dinihêre. Tevgereke boş a mirin û kuştinê, bi dengên boş, dor li meydên girtiye. Bi qasî pêncî mîtro ji Celadet dûr, li ber devê koşeyekê, eskerekî, bi qîrîn, hildiweşe û dikeve. Esker li erdê xwe dilivîne. Kes naçe ser wî. Ji xaniyê jor ê li ser kolana Celadet dengê musîkeke klasîk, pir bilind, tê. Di nav hemû dengan de, Celadet guh dibe ser dengê musîkê jî.

5 Di nav dengên nalîn û şehwetê de, Celadet guh dibe ser dengê musîka klasîk a Gustave Mahler jî. Dengê musîka Mahler, bedew, bi dûzan û awazeke xweş, hêdî hêdî, bilind dibe. Hemû deng, hemû awaz, hemû aletên musîkê, di nav ahengeke pir xweş lihevhatî de ne. Hemû bi hev re musîkeke bêpayan tînin pê ku heş dike sermest, dil dike aram.

Celadet bi hêdîka çavên xwe vedike û li çavên mezin ên Monikayê dinihêre. Çavên wê, kahniya hez û hezkirinê, mîna du stêrkan dibiriqin. Çav mîna zeryayekê ku bi tîrêjên tavê dibiriqe, ewçend boş û xweş dikenin. Di çavên Monikayê de kahniya heyecanê, zerya hezkirinê dixuyin. Celadet, bi germahiya ruh û dilê agir pêketî, bi kûrahiya heyecana hezê, li sîng û berê ciwan, porê zer, çavên zerya û lêvên xurme dinihêre.

– Paseratta mia, mia... Celadet bi nalîn dibêje.

Monika bêdeng dikene, xwe li ser Celadet xwar dike û lêvên wî dixe nav lêvên xwe. Agir bi lêvan dikeve, agirê ku bi lêvan dikeve, xwe pêl bi pêl, bi hemû bedenê digihîne. Dilê Celadet ê agir pê ketiye, niha diçirûse, jê çirûsk difirin. Bedena Monika ya germ û nerm Celadet radipêçe, vedigire. Agir ji bedena Celadet radibe. Monika tiliyên herdu destên xwe, pihêt, dixe nav tiliyên Celadet û wan diguvişîne. Monika, jina bexçê evînê, yara coşên bilind, dixwaze herdu bedenan bike yek, hilm, bîhn, deng û pejnên bedenan bi hev ve girêbide.

Tîrêjên tava danê êvarê yên mor ji serê Çiyayên Alpê xwe digihînin oda wan. Ode di nav ronahiyeke sor de ye. Pencera odê heta dawiyê vekiriye û bayekî sivik ê paqij tevî germahiya odê dibe. Monika û Celadet, ji bo hefteyekê, hatine gundekî tenha, sakîn a Swisrê ku di nav gelî, lehî, dahl, gol û çiyan de ye; Sils Maria. Dinya germ, heyam havîn e. Lê hawa paqij a zozanan hênik e. Monika ku felsefe xwendiye û li ser riya feylesofiyê ye, Celadet jî wergirtiye û bi hev re hatine warê filîzofekî mezin; Friedrich Nietzsche. Monika ku hemû berhemên Nietzsche xetim kirine, ne bi tenê li pey bîr û dîtinên wî ye, lê ew ketiye pey şopên jiyana wî jî. Niha ew hatine gundê biçûk ku Nietzsche havînan dihatê. Wan odeyek li maleke pensiun private ku pişta xwe daye çiyan û xwediyê bexçeyekî xweş û bîreke lêkirî ye, kirê kirine û rojên xwe, ji bilî xwendina berhemên Nietzsche, guhdarîkirina musîka Mahler û yekkirina bedenan, bi gera nav dar û daristan, dahl û newal, gol û çeman ku Nietzsche car bi car ziyaret kiribûn, derbas dikin.

> Me dabû pey şopa Nietzsche, hem bi bîr û bawerî hem bi can û dil. Nietzsche, nivîskar û feylesofê siûdxirab û keserkûr, piştî salên dirêj ên bêdeng û tarî, di destpêka salên 20-an de, bi carekê, bûbû stêrka esmanên filîsofiyê û çirûska heviyê ku meriv li peyê bûn. Nietzsche, xwediyê bedena ecêb jar û fikra ecêb xurt, mîna gelek kesên din, pir tesîr li min jî kir. Her gotinekî wî mîna lehiyekî gur, her

dengê wî yê ku ji nav rûpelan bilind dibû, mîna newaleke kûr, her fikreke wî mîna Çiyayên Alpê bilind bû. Nietzsche, qedera wî ya keserkûr, tenêtiya wî ya bêpayan, derketî û ketîbûna wî ya bêtaswîr, armanc û hedefên wî yên bilind, pir bilind, li min û qedera min dihat. Mîna gelek kesên din, min jî digot; Nietzsche ji bo min, qedera min, welat û gelê min nivîsiye. Wî "Ecce homo", "Also sprach Zarathustra" û eserên xwe yên din ji bo min, bi tenê ji bo min nivîsîbûn. Ma gotina Nietzsche ya fransizî ku wî her digot, décadent, ketî, ne gotina umrê min û qedera miletê min bû? Ma rûpelên "Also sprach Zarathustra" ez nedigîhandim reh û rêçên min ên windabûyî? Ma gotinên wî huwiyeta min a piralî, ruhê min ê peregende nedidan ber zompan?

Nietzsche ez bûm, ez Nietzsche bûm... çaxa rûpelên wî, tevî musîka Mahler, ez dibirim serê çiyayên cîhana wî ya taybetî, rengîn û dîn, ez weha difikirîm.

Mahler, musîka Mahler, pêwendiya dengê musîkê û dengê ruh û dil jî dîsan, bi xêra Nietzsche, bûn pardarên jîna min. Mahler, heval û hostayê Nietzsche, dijmin û vajiyê wî, ruhê min ê pêldar, bi saya Nietzsche, hînî aramî û ahengê kir. Her çawan tiliyên min ên qelaw û bipirç pişta nerm a mîna masiyan difirkand, musîka Mahler jî ruhê min difirkand.

Ez, neviyê Mîr Bedirxan, şagirtê Ovidius, xwendevanê edebiyat û medeniyeta fransizî, hîn dibûm, min dîsan dest bi şagirtiyê kiribû; ez hînî ketî û kotîbûnê, neçarî û xizaniyê, ruhê daketî û şikestî yê alemanî, bedena nerm a genimî û daristanên wê yên şil û zer, felsefe û edebiyata comerd a germenî dibûm. Ne bi tenê Nietzsche, tevî wî, min Goethe û Bîsmark jî dixwendin. Nietzsche, Goethe û Bîsmark di wan rojan de, ji her tiştî bêtir, ji her kesî zêdetir, dibûn alîgirê min, dibûn dermanê ruhê min ê birîndar. Gotinên Nietzsche mîna şûrê ji kalanan kişiyayî, bi hêz, bi dîsîplîn, her bi xof û hilawestî bû. Gotinên Goethe, yên mîna "uns umspülen hunderttausend wogen, alles reizt uns, mancherleri gefaellt", mîna hewreşîma herî nerm û tenik, bi stranên bedew ên xewnan, dilê min difirkandin.

Heçî gotinên bîranîn û tecrubên Bîsmark bûn, wan ez dibirim nik bapîrê min, mîrê welatê bav û kalan, mîrê welatê min ê xewnan. Min hersê jî diviyan. Hersiyan jî ruhê min ê şerpeze dicebirandin.

– Fürst, mein fürst, Monika, bi nalîn, dibêje.

Mûyên simbilê Celadet ên reş li ser mûyên tenik ên Monika yên zer, giran giran, digerin. Bedena Monika ku bi bîhna hez û xwîdanê, bi hêdîka, dilive, xwe, bi hemû comerdiya xwe, teslîmî tiliyên girs û mûyên sert dike. Li gora simbêl û lêvan, beden radibe û dadikeve, mîna ku beden jî guh dide musîkê û bi ahenga wê xwe dilivîne.

– Av, dikarî hinekî av bidî min, ez tî bûm, Monika dibêje.

Piştî bîhnekê, Celadet xwe ji bedena nerm dide alî, ji ser cîhan radibe û ber bi masa biçûk ku li kêleka pencerê rawestaye, dere. Sîtileke biçûk tijî av ku Celadet ji bîra bexçê kişandiye û tasek li ser masê ye. Celadet dere ber pencerê, hinekî rûyê xwe ber bi Monika ku serrû dirêj bûye, dizîvirîne û li wê û bedena wê dinihêre. Bi qasî kêliyekê, ew welê lê dinihêre, bi dû re, ji pencera vekirî, li bexçê, bîrê û çiyayên bilind ên hember dinihêre. Bayekî henik rû, sîng û xwîdana ser pirçên sînga wî mist dide.

6 Bayekî hûnik rûyê Celadet mist dide. Keştî bi hêdîka xwe dilivîne û bi rê dikeve. Celadet, cara dawîn, li ser keştiyê, li Trieste'yê, bajarê Îtalî, bajarê dawîn ê Awrûpayê dinihêre. Celadet, tevî biraziyê xwe, lawê kekê wî Sureya, Heqî, Awrûpa terk dike û dere Misirê, nik kekê xwe, bav û diya xwe, nik xwişka xwe ya dengşalûr.

– Bi xatirê te Awrûpa, Celadet dibêje, ji bo vê carê evçend xizanî têr dike. Yezdanê pak ji careke din re kerîm e... heta careke din, di xweşiyê de bimîne.

Îro, rojeke xweş, 22'ê gulana 1925-an e. Bi qasî sê salên Celadet li vî aliyê dinê derbas bûn. Niha ew rûyê xwe dide aliyekî

din ê dinê. Ev aliyê dinê, Awrûpa, mîna hêlekaneke bêserî, di nav aloziyan de dere û tê. Awrûpa avis e, guherînên nû dê, li her alî, biqewimin. Li Alemanyayê Hitler û hevalbendên wî şikesteke mezin xwarin, lê ew ji nû ve xwe didin hev da ku hikum bi dest xînin. Li aliyên din ên Awrûpayê jî tevgerên weha, roj bi roj. xurttir dibin. Ev alî weha, lê aliyê dinê ku Celadet niha ber bê dere? Hema çi bigire, Celadet tiştekî nizane. Digel ku ew berê jî çûbû Misirê, haya wî ji guherînên dawîn ên Misirê nîn e. Wî esas dil hebû, mîna birayê xwe Tewfîk, vegeriya Stembolê, bajarê xwe yê qedîm ku her xewnên wî dineqişandin. Lê veger îro ne mumkin bû. Jê re, ji Stembolê weha nivîsîbûn; vegera te, mirina te ye. Loma ew niha berê xwe dide aliyekî din ê dinê. Lê wî pir bêriya bav û diya xwe yên pîr jî kiriye. Kekê wî Sureya di nama xwe ya dawîn de jê re behsa nexweşiya bavê wî jî kiribû. Nexweşiya ku Sureya Beg bi "intérmatterce parsuit d'arteras chlorose origine cardiaque" bi nav dikir, roj bi roj, xirabtir dibû. Celadet dixwest bavê xwe bibîne, li kêleka wî rûne, li rîh û rûyê wî binihêre, li dengê wî yê kûr û gotinên wî yên kîbar guhdarî bike.

Dinya ronî û germ e. Rojê çavên xwe vekirine, ro bi qasî çend bihustan hilhatiye. Celadet serê xwe hinekî radike û li bajêr dinihêre; xaniyên reş û boz li pişta hev siwar bûne, esman bi keskahiyeke vekirî çend ewrên spî hembêz kirine û bi nazdarî li jêr dinihêre.

– Ewrûpa, bi xatirê te, Celadet dîsan dibêje.

Hevalên rê yên Celadet û Heqî, hema çi bigire, hemû cihû ne. Cihûyên Rûsyayê ku koç dikin û derin Filistînê.

> Em rêwîyên bêwar û welat, ketî û derketiyên cîhanê, kurd û cihû, di keştiyekê de gihîştibûn hev. Ez ji welatê xwe yê xewnan hinekî din bi dûr diketim, ew ber bi welatê xwe yê xewnan diçûn. Ew ji Rûsyayê dihatin, li Warşowayê, Yekîtiya Derketiyên Cihûyan ew werdigirtin û bi 2.5 lîrayê îngilizî, bi keştî, ew dişandin Filistînê. Cihûyan ji

ders û tecrubên xwe derdixistin ku cîhan dîsan li wan teng dibû. Ew li pey stariyekê, warekî bi huzûr û axake rehmetê bûn.
Heçî ez bûm, mûna pêlên ku keştiya me li pey xwe danîn pê, ber bi jor û ber bi jêr bûm. Ji bo roj û dewrên bê, ne fikreke min, ne jî zanîneke min hebû. Gerçî min plan û projeyên siyasî, çandî û edebî hebûn. Lê kengî, li kû û çawan?.. Min bi van yekan nizanîbû. Ewrûpa ku ez jê gelek tiştên nû hîn bûm, êdî li pey min dima. Ewrûpayê ez fêrî tenêtiyê û birçîbûnê kirim. Ez ku ji bo her tiştî, her, hewcedarê kesan û tiştan bûm, bi xêra Ewrûpayê, fêrî xweseriyê bûm. Min êdî bi xwe dikarîbû qîma xwe bi xwe bianiya. Ez hew hewcedarê qerwaş û berdestan bûm, hew li pey xizmet û xizmetkaran bûm. Ez fêrî ders û tecrubên germenî, rabûn û rûniştina wan, edet û ûsilên wan bûm. Li edet û ûsilên kevn ên kurdî, mîr û mîrîtî, osmanî, bîr û baweriyên şoreşgerî yên fransizî, Rousseau, Voltaire, Diderot, yên alemanî zêde bûn.
Lê di wê roja xweş a gulanê de, bayê felekê ez ber bi deverên din dibirim. Heqî, biraziyê min ê ku pir li bavê xwe dişibû, bi min re bû. Ew ji bo xwendinê hatibû Alemanyayê. Lê xwendin êdî ji Alemanyayê bi dûr ketibû. Safter, roniya çavên min, Pelikan, Monika ku min jê re şiîrên Omer Xeyam û çîrokên Şehrezada Hezar û Şevekê bi fransizî dixwendin, oda min a biçûk a tarî û bêhawa, kartolên min ên çelmisî, şûşeyên vala yên bîrayên Bayernê, qelûn û xwelîdanka min, derpiyên min ên pînekirî, êdî li pey diman... Lê min deftera biçûk a yadîgara yara Stembolê ku winda bûbû, dîsan, xistibû bêrîka xwe, ew bi min re bû.
Cihûyên ku bûbûn hevriyên me, merivên neçar, bêdeng û bi terbiye bûn. Gava ew hîn bûn ku em kurd bûn, gelekî kêfa wan hat. Wan gelekî qedrê me girtin. Lê tiştê ku herî zêde bala min kişand, daxwaza wan a zimanê hebrî bû. Wan bi vî zimanê ku zimanê wan ê rojên bê, hêviyên wan bû, nizanîbûn. Lê daxwaza wan a hînbûnê bêsînor bû. Heta em gihîştin Misirê, wan her, bi deng, mamosteyekî li ser wan, xwendin. Wan digot, "ziman

ruhê me cihûyan e." Vê yekê gelekî tesîr li min kir. Û gava min Hawar weşand, di hejmarekê de, min serpêhatiya cihûyan û zimanê wan nivîsî û ew yek ji bo kurdan ku ji zimanê xwe bi dûr diketin, mîna mîsaleke baş pêşkêş kir.

– Bavo dê li îstasyona trênê ya Kahûrê li hêviya me be, Heqî dibêje.

Celadet ji berîka xwe deftera xwe ya biçûk derdixe û berî ku ew li ser kursiyê rûne, bi dengekî pir nizm ku bi zehmetî seh dibe, bersiva Heqî dide,

– Ez dixwazim, em zû, zûtirîn wext, bigihên Misirê. Min bêrî kiriye, bêriya bavê te, bapîrê te, dapîra te, meta te kiriye...

FOTOGRAF 9

Xoybûn... hebûn, heyî, heyîtî xwebûn, xweyî, xweyîtî...

1 Fotografa nehan a romana Bîra Qederê ji welêt û Stembolê dûr, li welatê Mixribê, Misirê, tê kişandin. Ev fotografa hanê, di eynî wextê de, fotografa dawîn a Emîn Alî Beg û bermaliya wî Samîha Xanimê ye. Di pey vê fotografê re, ew hew di fotografên Bîra Qederê de dixuyin. Fotografên ku rû û rûçikan dikin nemir, hew dikarin wan vebiguhezînin dewr û dewranên bê. Ji ber ku fotograf rû û rûçikên jîndar dikin nemir...

Ev fotograf li mala Sureya Beg, kurê Emîn Alî Beg û kekê Celadet, tê kişandin. Sureya Beg ku ji mêj ve ye li Misirê dijî, li gundekî Kahîrê, Zeytûniyê cîwar bûye. Zeytûnî, gundê dewlemend, xwedîmal û xwedînavan e. Kesên navdar û xwedîpirsiyariyên mezin xwe ji teşqele û xirecira rojane ya bajarê mezin Kahîrê dane alî û hatine li vî gundî dijîn. Gundekî basîd ê ereb qulipiye ser wargehekî girîng ê siyaset, çand û aboriyê.

Piştî ku Emîn Alî Beg, tevî jin û keça xwe, hatiye Misirê, ew li mala Sureya Beg dijîn. Mala Sureya Beg xaniyekî kevn ê mezin e. Ew ne bi temamî qesr e, lê jê ne zêde bi dûr e jî. Çav û odeyên xênî bêhejmar in. Bexçeyekî fireh û direj ku hertim bi rengê kesk û hêşîn, bi ber û fêkî ye, bi xweşiya xwe jiyana aram a gund û malê direngîne. Sureya Beg, jina wî ku ji malbateke mezin e û keça begzadeyekî navdar ê Misirê ye, lawê wan Heqî û keça wan Kudret, ji zû ve ye, li vê mala mezin dijîn. Emîn Alî Beg, Samîha Xanim û Meziyet jî, ji çend salan û vir ve ye, bûne pardarên jiyana mala mezin û gundê xweş.

Ev fotograf li ser daxwaza Meziyetê tê kişandin. Meziyet ku êdî bûye keçeke xama, fotografên mal û malbatê dicivîne. Gava ew hê li Stembolê bû, wê li Kadıköyê, ji atoliya Mr. Xandemian, deftereke rengîn û neqişî yê wêne û resiman kirîbû û fotografên bav, dê, bira, ap, met, pismam û dotmamên xwe têdixistê. Wê ji fotografan, germahiya ku ji kaxizên sar direşiyan, hez dikir. Bi alîkariya defterê, ew her li ku bûya jî, nas û nêzên wê li nik wê bûn. Wê hertim defter vedikir û li sûretên bêzar, bêdeng dinihêrîn. Deftera bêziman bûbû zimanê jiyan û bîranînên wê. Bi taybetî niha, li welatekî ji Stembol û Kadıköyê gelekî bi dûr, tevî Kudretê, albuma wê bûbû hevala wê ya nêzîktirîn. Meziyetê, di rûpela yekemîn a defterê de, rêzeke bavê xwe, bi tîpên xweş û neqişkirî nivîsîbû; dewra felekê li ser me kîn e... Wê gotina bav û kalan, nîşana umrên bêmiraz û derketî dubare dikir.

Li gundê Zeytûnî jî, wê ji bavê kal û diya pîr her dixwest ku ew bi hev re xwe bidin ber kameraya wênan. Li ser daxwaza Meziyetê, Sureya Beg ji Kahîrê fotografkêşekî hoste daye anîn û ew li malê fotografên malê dikişîne. Fotografkêş çend dîmenên malbatê, bi hev re, kişandine. Niha jî ew di vê fotografa nehan a Bîra Qederê de, ya Emîn Alî Beg, Samîha Xanim û Meziyetê dikişîne.

Belê, li ser vê wênê ku li salona mala Sureya Beg tê kişandin, ew hersê hene; Emîn Alî Beg û Samîha Xanim rûniştî, Meziyet jî li pey wan, li piyan. Ji lixwekirinên wan dixuye ku dinya sar e. Paltoyekî reş ê dirêj li ser Emîn Alî Beg e. Samîha Xanim jî di nav cil û bergên germ ên reş de ye. Meziyet ku bejna wê ne ewçend dirêj e, mantoyeke reş li xwe kiriye. Wê serê xwe bi tûleke reş girtiye. Samîha Xanimê jî bi dolbendekî reş. Li ser serê Emîn Alî Beg jî fesekî reş ê Osmanî heye. Digel ku wan welat, dewr û dewran guherîne, cil û bergên wan mîna berê, mîna yên Stembolê ne. Ne bi tenê lixwekirin, lê awir, rûniştin û nêrîna Emîn Alî Beg û Samîha Xanimê jî her mîna xwe ye. Di hemû fotografan de, ew bi eynî celeb awir û nerînê li kamerayê mêze dikin, bi eynî celeb

rûniştinê rûdinin. Lê hin aliyên taybetî yên vê fotografê jî hene. Ew aliyên ku vê fotografê ji yên din vediqetîne, meriv dikare bibêje, ev in; west û keser, digel her hewldan û dilkirinê, west û kesera ku dixuye. Hem Emîn Alî Beg hem jî Samîha Xanim westiyayî, pir westiyayî dixuyin. Emîn Alî Beg, mîna her carî, serê xwe hinekî bilind kiriye, herdu destên xwe danîne ser çogên xwe û bi giramî li çavika kamerayê dinihêre. Rî û simbêlê wî çikspî ne. Tevî ku ew hewl dide bi xurtî binihêre, lê nerîna wî giran e, çirûska nerînê vemiriye. Çavên wî bi zehmetî vebûne, ew bi zehmetî dinihêre. Samîha Xanim jî hewl dide da ku şên û bi ken li kamerayê binihêre. Lê ew jî nikare west û kesera li ser rû û çavan in, veşêre.

Nabe.

Ew nikarin şopên umrên kal û serencamên keserkûr ji nerîn ê awirên xwe bi dûr xînin. Çav dipeyivin, kesera ku hatiye û li ser bîbikan veniştiye her tiştî dibêjin. Hewce bi gotin û salixdanan nîn e. Çavên ku ji nav kaxiza zerbûyî li pêşiyê, kamarayê dinihêrin, jixwe, hal û hewalê dibêjin. Çavên wêneya nehan a romana Bîra Qederê; şahîdên jiyanên peregende, stranên welatê xerîbiyê, nerîna umrên sirgûn, şîn û taziyên bêrawest, hesreta bêrawest, lorînên dirêj ên şevên reş ku her û her ji welatê bav û kalan bi dûr bihurîne...

Ma meriv dikare çi bibêje? Li cîhê ku çav bipeyivin, gotin xelas dibin.

2 Ma meriv dikare çi bibêje? Li cîhê ku çav dipeyivin, gotin xelas dibin. Celadet li çavên bavê xwe dinihêre. Çavên Emîn Alî Beg ketine kortê, helqeyên li dora çavan zêde û kûrtir bûne. Fera çavan vemiriye.

– Kurê min, Emîn Alî Beg dibêje, her destpêkekê kutahiyekê, her umrekî mirinekê heye. Ev, rastiya jîn û cîhanê ye ku tu kes nikare biguherine. Ez jî nikarim...

Emîn Alî Beg bîskekê radiweste, çavên xwe ji Celadet dizivîrîne, li kulîlkên nûbişkovî yên kêleka bîrê dinihêre û bi kurdiya xwe ya kîbar û nerm gotina xwe didomîne.

– Em ji ku hatin ku! Bala xwe bidiyê, ez li welatê xerîbiyê hatim dinê. Tu li welatê xerîbiyê hatî dinê. Niha jî me ji welatê xerîbiyê koç kiriye û em hatine welatekî hîn xerîb... di dawiya umrê xwe de, ez ji welatê bav û kalên xwe hinekî din jî bi dûr ketim. Min nedît, lê rehma Xwedê li wan be, Yadê Rûşen, Amojna Sitî, mamên te Tellî û Elî Şamil Paşa behs dikirin. Gotineke Mîr Bedirxan, kalikê te yê rehmetî, hebûye. Ji roja ku osmaniyan ew birine Girîtê û heta mirinê, wî hertim ew gotin dubare kiriye. Wî hertim gotiye; xerîbî ne tu çek e, piyê xwe tê re meke... Lê hezar heyf ku çekê xerîbiyê bû kincên me, cil û bergên me. Xwedê şahîd e, min her xwest ku ez vî çekê kambax ji xwe û ji zarokên xwe bikim û bi qasî bihustekê be jî, axa bav û kalan bi dest xînim. Lê nebû... Helbet te şîret navên, lê belê gotina kalikê xwe ji bîr meke...

Emîn Alî Beg dîsan radiweste, li Celadet û Samîha Xanimê dinihêre. Samîha Xanim ku li kêleka wî rûniştiye, ji masa biçûk a li ber wan perçeyekî biçûk ê portakaleke qaşkirî digire û dide Emîn Alî Beg. Ew purtaqalê werdigire û bi hêdîka dixwe.

> Bavo ji portakal û mandarînan hez dikir. Di wextên wan de, ew ji malê kêm nedibûn. Hebûna wan, qaşilandina wan, xwarina wan kêfeke malê bû. Gava em zarok bûn, me ji destê Bavo portakal dixwarin. Lê li Misirê êdî wî ji destê me ew werdigirtin û dixwarin. Bavo kal bûbû, bi gotina te, fera çavên Bavo vemirîbû.
> Diya min a rêzdar û bêdeng, her roj, purtaqal û mandarîn diqaşilandin, ew dixistin nav firaqên pahn ên neqişkirî û danên êvaran, gava Bavo derdiket bexçê malê û li kêleka bîrê rûdiniştt, Dayê ew, yek bi yek, hêdî hêdî, didayê. Bavo ji malê dernediket. Ew her li malê bû, dixwend dinîvisî û radiza. Mîna berê ew nedipeyivî jî. Ew hertim di nav fikir û gumanan de bû. Lê gava kekê min Sureya jê re, carina,

rojnameyên tirkî dianîn, hingî ew fera ku vemirîbû, dîsan vedigeriya û Bavo ew bi heyecan, rêz bi rêz, dixwendin. Ji wan rojnaman pê ve, Bavo hejmarên kevn ên kovara Kurdistan ku birayên wî Mîqdet û Evdirrehman li Misir û Awrûpayê derxistibûn, dixwendin. Wî kitabên kevn ên tarîxî û yên li ser welatê kurdan, mîrekiya Cizîra Botan dixwendin. Di wan rojên bi keser û di wî umrê kal de, Bavo, bi alîkariya kovar û kitaban, vegeriyabû cîhana windabûyî ya zaroktiya xwe, ya xewn û xeyalên xwe.
Bavo nexweş bû, dilê wî diguvişî. Wî kes nedidîtin, lê carina nas, dost û ehlê me dihatin ziyareta wî. Eger dinya xweş bûya, ew li bexçê, li kêleka bîrê rûdiniştin. Bavo ji bexçê û nemaze bîra bexçê pir hez dikir. Bîra bexçê kekê min Sureya bîra mala me ya Kadıköyê dihanî bîra wî...
Bavo li bexçê, li kêleka bîrê rûdiniştû purtaqal dixwarin.

Bexçe hêşîn dike, gul û kulîlk dibişkivin. Meziyet û Kudret av dane wan. Di vî danê êvarê de bîhneke xweş ji bexçê difûre.

– Kurê min, Emîn Alî Beg, dîsan bi hêdîka û bi kurdiya xwe ya paqij, dibêje. Em dawacî ne. Bi neheqî axa me, mal û mulkên me, ji me hatine standin. Em ne mûrên kesekî din, lê mîrên erd û axa xwe bûn. Em doza axa xwe dikin. Rehma Xwedê lê be, umrê kalikê te, gelek mamên te li ser riya vê dozê borî. Ew îro, her yek li derekî, peregende, di bin axa sar de, çavvekirî, dinivin. Qebr û gorên wan jî li welatên xerîb in. Ji ber bêgaviyan, em îro nikarin herin qebrên wan jî ziyaret bikin. Ji te û birayên te, bi tenê, du daxwazên min hene. Yek; hûn jî, mîna bav, kal û mamên xwe dawacî bin, bi îlim û îrfan li ser riya dawe û dozê bin. Royên kiçik lê herikî ji avên mezin lê sekinî her çêtir in. Dudo; eger we rojekê bihusteke axa bav û kalan bi dest xist, min ji bîr mekin, hestiyên min bibin û nêzîkê qesra bav û kalan, Birca Belek, li kêleka çemê Dîjlê, min veşêrin. Şitileke dara çinarê jî li ber serê min biçînin... Daxwaza min, hesreta min, bi tenê ev e.

Emîn Alî Beg, dîsan, çavên xwe direvîne. Celadet deng nake, tu bersivê nade. Ji çavên Celadet çend hêstir, bi hêdîka, ber bi

jêr dibin. Samîha Xanim jî digirî. Samîha Xanim dixwaze libeke purtaqalê din bide Emîn Alî Beg, lê ew naxwaze. Ew, bi nerîneke zîz, li kulîlkan dinihêre. Bêyî ku ew nerîna xwe ji ser kulîlkan bizivirîne, mîna ku ji ber xwe bipeyive, ew dibêje;

– Xwedê alîkarê we be, kurê min. Îşê we çetin, riya we dirêj e...

Celadet, çavşil, lê dinihêre, bêyî ku tiştekî bibêje yan jî bike, bi tenê lê dinihêre.

3 Celadet lê dinihêre. Hevalê wî yê Stembolê, dostê wî yê şevên Pera û Galatayê, Memduh Selîm Beg her mîna xwe ye. Tu guherîn li ser rû û rûçikên wî naxuyin.

– Mîrê min, tu neguheriyî, Memduh Selîm Beg bi ken dibêje.

– Min ê jî eynî tişt ji bo te bigota, Memduh Beg.

Piştî çar salan, di rojeke vekirî û zelal a Lubnanê de, herdu dostên kevn li salona oteleke mezin a Beyrûdê hevûdu dibînin. Ji navberê çar sal bihurîne. Çar salên gelekî girîng û bûyertijî ku gelekî tesîr li herduyan jî kiriye. Herdu li kêleka pencera fireh û dirêj a salonê, li ser kursiyên çermîn, li hember hevûdu, rûniştine. Ji der, tirêjên tava ku li ser deryayê rawestaye û hêdî hêdî diçe ava, di pencerê re, xwe bi coş digihînin hundir. Dinya germ e. Pencerên salonê li derya dinihêrin. Derya bi şinahiyeke vekirî, heta û heta, dibiriqe.

– Celadet Beg, ma kê dizanîbû ku me dê li vir hevûdu bidîta!

– Jîn, Memduh Beg, jîn... Ma te bi xwe navê kovara xwe ya Stembolê nekiribû Jîn?.. Jînê em avêtin van deran, em ketin ber pêlên xurbetê, bi qewlê dengbêjên me, felekê kumê xwe li serê me xwar kir, Memduh Beg.

Garsonekî, di nav siniyeke spî yê zîvîn de, du qedeh û vexwarina ku wan xwestiye, tîne, qedehan heta nîvî tijî dike û dere.

– Celadet Beg, min dil kir em hevûdudîtina xwe bi qedeheke şampanya pîroz bikin, bi vê qedehê dest bi êvara xwe bikin.

Şampanya li vir hem xweş e hem ji avê erzantir e. Ev şûşe bi deh frankan e, yanê bi pênce, şêşt qurîşên Osmanî. Loma min şampanya xwest. Ez hêvîdar im, ew ê bi dilê te be...

– Bê şik.

– Mîrê min Celadet, min bêriya sohbetên me, rojên me yên Stembolê kiribû... Em ê îşev, hemû şev, bi hev re bin. Xelîl Ramî Beg û Mewlanzade Rifat Beg ê jî heta saetekê, saetek û nîvê werin. Tiştên ku em bipeyivin, em bikin, pir in.

Tav û tîrêjên tavê hawirdor bi rengên mahşerê neqişandibûn. Tav li ser deryayê, wî aliyê din ê aso, bi rengên jîndar û germ, diçû ava. Aso kiras diguherî. Ji kiraxên Beyrûdê, di salona otêlê de, ji jor, me, min û dostê min, dostê bav û birayên min, Memduh Selîm Beg li guherîna rengan dinihêrî. Tîrêjên royê li ser rûyê me, bi germahî, digeriyan û rûyên me mist didan.

Memduh Beg ji Stembolê dost û nasê me bû. Ew jî yek ji serekên tevgera kurdî, zane û têgihîştiyên civata kurdî bû, gerînende û semivîskarê kovara Jîn'ê bû. Wî jî, mîna me, ji bêgaviyê, dev ji Stembolê berdabû û nikarîbû vegeriya Tirkiyê. Rêber, ronakbîr û zanayên kurd ji hev ketibûn û li cîhanê belav bûbûn. Hinên wan li Awrûpayê bi cîh bûbûn, lê piraniya wan derketibûn Rohilata Navîn, welatên cîranên Tirkiyê. Gelekên wan li Lubnan, Sûriye û Antaqyayê ku di bin destê fransizan de bûn, dijiyan. Hinên wan jî çûbûn Kurdistana Iraqê ku di bin destê îngilîzan de bû. Memduh Beg jî li Antaqyayê bi cîh bûbû.

Rewşa wî jî mîna rewşa yên din bû; nebaş, belê nebaş... ma hewce ye meriv gotinê dirêj bike?

Rewşa min?

Mîna ku feylesofekî gotibû; siwarekî nezan û nehoste çawan li ser pişta hespê rûdine, ez jî li ser pişta jînê welê rûniştibûm. Eger ez ji ser hespê jînê nediketim, ew ne ji hostehiya min, lê ji esaleta hesp bû... Di wan rojan de, min xwe gîhandibû Rohilata Navîn. Min serê hespê xwe di wê axa germ a şewitî de berdabû. Hesp çargavî diçû, ji ber esaleta xwe, wî rê li ber xwe rast dikir.

Xelîl Ramî Beg û Mewlanzade Rifat Beg, herdu bi hev re, ji deriyê salonê dikevin hundir û ber bi Celadet û Memduh Beg tên. Pêşî Celadet wan dibîne, ew bi kêf radibe ser piyan. Memduh Beg jî pê re. Herdu, bi hev re, ber bi mêvanên nû derin. Celadet ku heyecana wî ji rû dixuyê, dere rûyê Mewlanzade Rifat.

– Rıfat Bey, üstad!..

– Bıyıkları kesmişsin Celadet Bey!

Mewlanzade Rifat Beg wî ber bi xwe dikişîne û hembêz dike. Herdu, bi qasî kêliyekê, hevûdu, pihêt, hembêz dikin. Piştî çend salan, Celadet û Mewlanzade Rifat hevûdu, nû dibînin. Hemû bi hev re vedigerin cîhê xwe, Celadet û Memduh Selîm Beg cîh nîşanî wan dikin û ew rûdinin.

– Belê, min simbêl jêkirin, lê min dil heye dîsan berdim. Li van deran bê simbêl hîç nabe, Celadet dibêje û ji aliyekî ve jî, bi dest, bang garson dike.

– Lê weha jî li te hatiye. Tu ciwantir û çelengtir dixuyî. Tu çawan î? Min bihîst ku tu li mala Xelîl Ramî Beg dimînî. Sureya Beg, Kamuran Beg, ew çawan in? Min bihîst ku ew ê jî werin...

– Mala me dê şên be, mamê Celadet, Xelîl Ramî Beg dibêje. Jixwe ji niha ve Celadet mal şên kiriye, ew ê şêntir be.

– Mîrên min, hûn bi xêr hatin, Memduh Selîm Beg dibêje û bêyî ku li bersiva wan bisekine, didomîne, piştî bi sedan zehmetî, me hevûdu dîsan dît... tiştên ku em bipeyivin, em bikin, pir in. Em êdî zû bi zû dev ji hev bernadin...

4 – Mîrên min, tiştên ku em bipeyivin, em bikin, pir in. Memduh Selîm Beg dibêje, em êdî zû bi zû dev ji hev bernadin...

Celadet Beg, birayên wî Sureya û Kamuran, mamê wî Xelîl Ramî Beg, hevalên wî û bavê wî Mewlanzade Rifat, Memduh Selîm, Dr. Mehmed Şukrî Segban, Haco Axa û hin kesên din li bajarê biçûk ê Lubnanê Cuniyê, li mala Xelîl Ramî Beg civiyane. Cuniye, bajarê biçûk ê file ku li kêleka Beyrûdê ye, îro mazûba-

niya rêber û ronakbîrên kurdan dike. Ronakbîrên kurd li hev civiyane û ew ê li ser rewşa kurdan û welatê wan bipeyivin. Li welêt her tişt tevîhev bûye; welat bi destên dewletên biserketî perçe bûye, ji perçê herî mezin ku li nav tixûbên dewleta nû, Tirkiyê maye, dûman bilind dibe. Ew perçe di nav şewateke xedar de ye. Perçê Iraqê ketiye bin destê ingilîzan, ê Îranê di bin destê farisan û yê Sûriyê jî di bin destê fransizan de ye. Xelkê westiyayî ku di şer de li ber lingan çû, niha, bêquwet, bêtaqet û bêhêvî, hewl dide da ku rojên kambax biqedîne. Tevger û serhildanên kurdan bi ser neketine. Gelek rêber û ronakbîr hatine kuştin, piraniya yên mayî bi derine xerîb reviyane. Bûm û kund li ser kavilên welatê kurdan veniştine û dixwînin. Welatê kurdan qulipiye ser gor û goristanê.

Di rewşeke evçend kambax û zîz de, meriv dikare çi bike?

– Mîrên min, em divê ji vê çûyina malwêran re bibêjin bese! Lê çawan? Ji kerema xwe, bila herkes gotin, dîtin û pêşniyara xwe bibêje. Lê berî ku em dest bi gotinê bikin, eger bi dilê we be, ez dixwazim, em ji bo ruhê pak ê Emîn Alî Beg û şehîdên me fatîhayekê bixwînin.

> Belê, Bavo wefat kiribû. Di rojeke germ a 1926-an de, li bexçê mala kekê min Sureya, danekî germ ê êvarê, Bavo di xew re çûbû. Û ew hew ji xewê hişyar bûbû. Çavên ku bi hêdîka hatibûn girtin, hew vebûbûn.
> Bavo, Dayê, Mezo û Kudret li bexçê, li kêleka bîrê rûniştibûn. Mîna her carê, Dayê purtaqalên yekta yên Îskenderiyê dabûn Bavo. Wî ew hêdî hêdî xwaribûn û li ser mala me ya Stembolê, bexçê, darên bexçê û bîra ku li bexçê bû, peyivîbû. Li gora ku Dayê digot, berî ku Bavo bikeve xewa kûr û bêveger, wî weha gotibû; "Bi xêr, gava em vegeriyan, divê em bexçê malê paqij bikin, zêdehiya dar û beran jêkin, bîrê ji nû ve lêkin û ava wê paqij bikin..." Bi dû re Bavo di xew re çûbû. Mezo û Kudret derketibûn û çûbûn gund û Dayê jî şalekî tenik avêtibû ser Bavo û vegeriyabû hundir. Bîra bexçê, Bavo û purtaqalên wî bi tenê mabûn...

Heta kengî Bavo di xewa jînê de bû? Kengî wî gav avêtibû aliyê din ê xewê, yanê mirinê? Ew êşiyabû? Wî di xewa xwe de çi xewn dîtibûn, di xewnên dawîn de çi daxwaz kiribûn? Mixabin, kes bi van nizane, lê çaxa Dayê, ji bo şîva êvarê çûbû ku Bavo hişyar bike, Bavo hişyar nebûbû. Bêdeng û bi kîbariyek ku gelekî lê dihat, wî xatir xwestibû û çûbû.

Bavo, stûna mal û malbata me, tîmsala tarîx û hebûna me, çûbû. Bavo, ew însanê ronakbîr, xwendî û dîtî, xwediyê kitabxana mezin, nivîskarê zarên kurdî, farisî û tirkî, tarîxnas, hosteyê kuliyata "Tarîh-î Cewdet", hostayê tarîxa Mîr Bedirxan, çûbû... Bavo li welatekî pir dûr, li Misirê çûbû. Safter, birayê min ê biçûk, roniya çavên min, li welatekî dûr, li Alemanyayê çûbû. Li welêt ku êdî ji me bi dûr bû, li Diyarbekirê, gelek pêşewayên kurdan, dost û hevalên Bavo û me, bi dar ve bûbûn û çûbûn: Mirinê bi ser me de girtibû. Gotina Bavo rast bû; dewra felekê li ser me kîn bû. Ne bi tenê derd û keserên xurbet û derketinê, lê mirinê jî dest pê kiribû û bi girane û zompên xwe dilê me yê birîndar dihinciqand.

Gotinek ku Bavo her digot li Bavo jî dihat; mêrê çê li navê xwe tê. Mîna her kirin, tevger û gotina wî, mirina Bavo jî li her alî deng da. Dost, nas û nêz giriyan û li şînê rûniştin. Dijmin, kirêt û hesûd jî keniyan û rabûn govendê.

Ez niha çi bibêjim? Min diviya li ser Bavo, jîn û tecrubên wî, pêwendiya min û wî gelek tişt binivîsanda. Ne niha di nav van rûpelên Bîra Qederê de, lê heye ku di nav romaneke din de ku li dora jîna Bavo bihata hûnandin. Lê mîna pir tiştên din, min ev yeka hanê jî nekir. Min ne ew wext û quwet, ne jî ûmkan û destek hebû. Min ê Bavo û jîna wî ji kê re, çawan û li ku binivîsa? Lê eger min kitaba Bavo binivîsa, min dizanîbû, min ê çawan dest pê bikira. Destpêk ê, kêm-zêde, weha bûya;

Bavo, mamostayê jîna min, hosteyê riya qedera min. Bavo, lawê sirgûnê, kurê Mîrê sirgûnkirî, bavê zarokên li sirgûnê bûyî. Bavo, nobedarê roja yekemîn a umrê min, stêrka çirûsî ya zaroktiya min. Bavo, hevalê xeyalên min, şirîkê pênûsa min, siya rêzên min, hêza gavên min, hêviya şevên min. Bavo, lawê asîl, bavê serbilind, dostê ziravbihîstiyar. Bavo, bavê min...

– Em divê li rê û riyan bigerin, weha nabe, weha nikare dewam bike, Memduh Selîm Beg dibêje û dest bi axaftina xwe ya dirêj dike.

Axaftina wî li ser rewşa Turkiyê û kurdan, serhildana 1925-an a kurdan, encamên serhildanê û rewşa wî bi xwe ye. Mîna ku ew li gotina bigere û wan hilçîne, ew hêdî hêdî, gotin bi gotin, dipeyive. Berî ku ew gotina xwe xelas bike, bi qasî bîskekê, ew radiweste û li hevalên xwe dinihêre, paşê dîsan bi pênûsa destê xwe li ser kaxizê li berê çend xêzan dikişîne û gotina xwe temam dike,

– Ji Awrûpa, Iraq û deverên din gelek xeber û name ji min re tên da ku kurd kirasê çavpahniyê li xwe nekin, perda nizmahiyê nekişînin ser xwe, çavên xwe negirin, bêdeng nemînin û dest bi tevgereke nû bikin... Êdî gotin ya we ye.

Piştî ku Memduh Beg gotina xwe xelas dike, Celadet ji cîhê xwe radibe,

– Spas Memduh Beg, ew dibêje, gotinên te sedî sed rast in. Roj, roja şixul û xebatê ye. Cîhan li hêviya dengê me ye, herkes li benda tevgerê ye. Qet nebe, divê em nîşan bidin ka em kî ne...

5 Tu kî yî, xanima delal? Celadet ji keçika ku derdikeve ber derî dipirse.

– Ez Rûşen im, keçik dibêje.

– Rûşen, keça Mihemed Salih Beg?

– Belê, keça Mihemed Salih Begê Bedirxanî...

– Tu dizanî ka ez kî me?

Keçik, bi qasî bîskekê, bi dîqet, li Celadet dinihêre û paşê serê xwe di mana "na" de, dihejîne. Keçik wî nas nake.

– Ez Celadet im, kurmamê te Celadet...

– Celadet Amca! keçik, bi nîda, bi tirkî, dibêje û serê xwe dizîvirîne aliyê hundir û gazî diya xwe dike; Yadê, Celadet Amca hatiye, were...

Belê, eynî welê bû. Ji bo hin civîn û hevûdudîtinan, ez çûbûm Şamê. Gava ez li Şamê peya bûm, min berê xwe da taxa Salihiyê, Cisirî Abdî, nik Hemama Efîf, mala Salih Beg, kurê mamê min Mehmûd. Ji mêj ve bû ku Salih Beg wefat kiribû, lê mala wî, jina wî Samiye Xanim, ku dotmama min bû û keça wî Rûşen, li Şamê dijiyan. Min navnîşana wan ji mamê xwe Xelîl Ramî Beg wergirtibû.

Rojeke germ a havîna welatê Sûriyê bû. Xwîdan ji min diçû. Min çaketê xwe yê reş ji xwe kiribû, qumçika stû yê gomlegê vekiribû û qirawata belek sist kiribû. Hema çi bigire, min hîç bi erebî nizanîbû. Min Şam û axa welatê Sûriyê nas nedikir. Me dest bi xebatê kiribû, roj bi roj, diyartir dibû ka me çi dixwest û em ê biketina pey çi. Dijmin û kes û hêzên nedost li dora me bûn. Em diviya bi tevdîr bûna. Loma min xwest ku ez pêşî herim mala Salih Beg wan.

Min Rûşen di zaroktiya wê de carekê, li Stembolê dîtibû. Gava min li deriyê mala wan xist û ew derket ber derî, hingî min cara yekemîn ew mîna keçeke xama dît. Keçikeke hufde–hîjde salî, kin, qut, zirav û eger ez rastiyê bibêjim, nexweşik, derketibû ber derî. Porê wê kurt, çavên wê biçûk, lêvên wê zirav, stûyê wê kurt û destên wê biçûk bûn. Lê poz û eniya wê nîşan dida ku ew Bedirxanî bû. Welê dixuya ku ew li diya xwe çûbû. Ji ber ku bavê wê, Salih Beg ku min ji salên 1910-an, ji Stembolê dinasî, dirêj, girs û lihevhatî bû. Salih Beg ku hingî li Stembolê sernivîskarê kovara Rojî Kurd bû, bi çelengiya xwe nav dabû û çavên gelek ji metên min li serê bûn. Lê ew li Stembolê nema û çû. Paşê, eger ez ne şaş bim, sala 1915-an, me bihîst ku Salih Beg li Şamê wefat kiriye. Wî dil hebûye, bi dizî, vegere Cizîra Botan, welatê bav û kalan. Lê berî çûyina xwe, wî wefat kiriye.

Agahî û zanînên min ên li ser Salih Beg û mala wî, bi tenê, ji van çend rêzan dihate pê. Ne zêde... Lê wê roja leylanên welatê ereban, di nav xwîdanê de mayî, bîhnçikyayî, ez li ber deriyê wan bûm. Û Rûşen ku ji jinên ku min nas kiribûn, Şehrîban, Saadet Abla, Canan, Monika, pir cihê bû, li ber derî, li hember min bû. Pêlên felekê, yan jî em

bibêjin qederê, îcar jî ez avêtibûm ber mala wan. Û Rûşenê ji min re digot "Celadet Amca..."
Paşê çi bû?
Ma wê çi bibûya? Felekê her karê xwe berdewam kir û qedera min, bi huner û hostehî, hûnand...

– Celadet Amca, biferme, were hundir, keçik dibêje, -bêyî ku li hatina diya xwe bipê.

Keçik rê nîşanî Celadet dide û herdu bi hev re derbasî aliyê hundir dibin. Li paş derî sewkiyeke fireh û hinekî bilind, li pey jî hewşeke fireh a malê heye. Sewkiya serîgirtî bi bahlîf û doşekan raxistî ye. Gava keçik li ser sewkiyê cîh nîşanî Celadet dide, diya wê jî tê nik wan.

– Celadet Beg, tu bi xêr û xweşî hatî, ser seran, ser çavan, diya keçikê dibêje. Fermo, rûne, bîhna xwe vede...

– Ma hûn nikarin taseke ava hênik bidin min, Celadet xwîdana eniya xwe paqij dike û dibêje. Ez fetisîm, ji tîna bihecîm.

Keçik dilezîne hundir. Diya wê jî tê û li ser doşega kêleka Celadet rûdine. Celadet diya Rûşenê nas nake û cara yekemîn e ku wê dibîne.

– Samiye Xanim, heye ku di zaroktiyê de me hevûdu dîtiye, lê nayê bîra min. Min navê we gelekî bihîstibû, lê heta niha qismet nebû ku em hevûdu bibînin...

– Me jî, hem min hem Rûşenê, pir dixwest te bidîta. Berî niha bi çend rojan, Apê Xelîl Ramî xeberek şandibû û gotibû ku tu dê werî Şamê. Çavê me li rê bû... Bila serê te, serê me sax be, em hemû pir li ber wefata mamê min Emîn Alî Beg ketin. Ew hîmê hebûna me bû...

Keçik, siniyek di destan de, dilezîne û tê nik wan. Ew tasa avê dide Celadet û tebaxa ku bi zebeşê dûlimkirî tijî ye, datîne ber wî. Celadet radihêje tasê û bi carekê wê vedixwe. Piştî ku ew avê xelas dike, ew taseke din dixwaze.

– Zêde av ne baş e, Celadet Amca, keçik jê re dibêje. Hinekî şûtî bixwe, ew ê tiya te bişkîne.

6 – Hevalên ezîz, xelk tî ye, ji serfirazî û bi serketinê pê ve, tu tişt tiya xelkê naşkîne, Xelîl Ramî Beg, kalê civînê, dibêje û gotina xwe didomîne. Ev xelkê belengaz her bindest e, her darbe dixwe, her dibe dîlê xelkê. Bi sedan sal e ku qedera vî xelkê weha kambax e. Kevirên Xwedê hemû li ser vî miletê stûxwar û bêkes barîne. Ma ne wext e ku ev qeder biguhere? Partî, Xoybûn divê bi vî karî rabe, divê vê qederê êdî biguherîne.

Kurdên derketî yên Tirkiyê û kurdên Lubnan, Sûriye û Iraqê gihîştine hedefa xwe ya yekemîn. Wan bi hev re, li Lubnanê, partiya xwe ya siyasî, partiya Xoybûnê, damezrandine. Hemû kurdan, axa, beg, şêx, serekeşîr, ronakbîr, zana, nivîskar, rojnamevan, esker, zabît, kumandar, bijîşk, mamoste, karker, gundî, rêncber, mêr, jin... hemûyan xwe li dora Partiyê girtiye. Bi gotina Xelîl Ramî Beg, wan bi hev re çirûska hebûn û rabûnê pêxistine. Partî bûye stêrka şevên reş, hêviya heyamên tarî. Partiyê ji niha ve deng daye. Lê kêmanî hê pir û pir in. Ji partiyê re rêxisineke têkûz ku li welêt xurt e, divê. Jê re pêwendiyên xurt yên navneteweyî divên. Jê re îmkanên aborî divên, xelk û eşîr, çek û pûsat, esker û kumandar, rêber û pêşewa, çûyin û hatin, xwendin û nivîsîn divên.

Jê re liberxwedaneke qehîm, serîhildaneke xurt divê.

Loma, îro, di vê roja xweş a bihara Lubnanê de, mîna gelek carên din, rêber û damezrevanên partiyê li hev rûniştine û li pirs û hedefên partiyê hûr dibin. Mîna her carî, mezintirînê civatê Xelîl Ramî Begê Bedirxanî, mamê Celadet, mutesarifê kevn ê Malatyayê, civînê bi rê ve dibe. Ew li saloneke biçûk a pansiyonekê rûniştine. Ev civîn, civîna dawîn a serekatiyê ye. Piştî vê civînê, ew ê, ji bo kar û şixulê partiyê, belav bin û heryek ê bi derekî de here. Civatê di nav xwe de hin karên esasî belav kirine; Celadet û Memduh Selîm Beg bûne berpirsiyarên giştî yên gerandina karên rêxistinî û îdarî. Kamuran bûye berpirsiyarê malî. Sureya Beg, Mewlanzade Rifat Beg û hin kesên din ku ne li civînê ne, bûne berpirsiyarên pêwendiyan. Û Îhsan Nûrî Paşa ku di ordiya Osmaniyan de zabitekî navdar bû û niha li çiyayê Agi-

riyê rêberiya serhildaneke kurdan dike, bûye kumandarê giştî yên hêzên çekdar ên partiyê.

Em li taxeke derveyî Beyrûdê, di salona biçûk a pansiyonekê de civiyabûn. Tevdîrên me temam bûn. Li der ji malbata Haco Axa û Şahîn Began çend kesên çekdar li nobetê bûn. Li pansiyonê jî, ji me pê ve, tu kes nîn bû. Xwarin û vexwarina me ya çend rojan hazir bû. Civîn gelek girîng bû. Em her yek ji dereke dûr hatibûn... Eger heşê min min nexapîne, ez bawer im, civînê du roj û nîv dewam kir. Me gelek pirs zelal kirin, kar û bar diyar kirin û hîmên esasî yên partiyê ava kirin.

Kî di civînê de hebûn? Mixabin, hemû niha nayên bîra min. Lê ez, simbêlqusandî, li wir bûm! Kekê min Sureya, simbêlbadayî, ji Misirê hatibû û li wir bû. Kamo, birayê min ê nû simbêlberdayî ku doxtora xwe li Munîxê temam kiribû û dabû pey min, hatibû, li wir bû. Em hersê bira, bi xurtî, bi dil û can, ketibûn nav refên pêşîn ên tevgera nû ya kurdî. (Eger tu xwişk û birayên min ên din, Tewfîk û Hîkmet bipirsî, ew li Stembolê bûn û hema çi bigire tu pêwendiya me bi wan re nîn bû. Bi dû wefata Bavo re, diya min û Mezo, li ser daxwaza wan bi xwe, vegeriyabûn Stembolê, mala me ya Kızıtoprakê. Ji bo selameta wan, me nedixwest tu pêwendî bi wan re daniya.) Mamê min Xelîl Ramî Beg ku ji aliyê rejîma nû ya Tirkiyê ji welêt hatibû derxistin, tevî vi umrê xwe yê kal, li wir bû. Yek ji nêzîktirîn dostên min ên Stembolê Memduh Selîm Beg, mîna her gavê xweşlixwekirî û porşehkirî, li wir bû. Xwediyê rojnama me ya Stembolê Serbestî, hostayê min ê rojnamevaniyê Mewlanzade Rifat Beg ku mîna mamê min, hatibû bi dûrxistin, westiyayî û heşê wî li dereke din, li wir bû. Yanî birekî girîng ê jîna min a Stembolê koç kiribû û hatibû Lubnanê.

Ji kurdên Sûriyê Mistefa û Bozan Şahîn Beg, ew herdu birayên qedirbilind, simbêlbadayî, li wir bûn. Haco Axa, serekê eşîreke mezin û dostê malbata me, li wir bû... Û hîn gelek kesên din ku niha nayên bîra min. Me gotibû "Destê bi tenê deng jê nayê" û xwe dabû hev. Îcar me dil hebû, bi qewlê mamê min, tiya xelkê belengaz bişikanda û qedereke xirab û kambax a sedsalan biguheranda.

Heçî ez bûm, belê, gava ez ji Misirê daketibûm Lubnanê, mîna nîşana dem û heyamên nû, min simbêl jêkiribû. Lê mîna pirî caran, ez di vê fikra xwe de jî şaş ketibûm. Mîrê kurdan bê simbêl nedibû! Kurdan mîrên xwe bi rîh û simbêl dizanîbûn... Min dîsan dest pê kiribû û simbêl berdida. Ev yek.

A diduyan, min dîsan dest pê kiribû û deftera ku Cananê, yara min a nemir ku min dikir, nedikir, nikarîbû şopa wê hilda, dabû min, ji nû ve, piştî wefata Bavo, vedikir. Defter ji bo xulase û kitekitên rojên germ ên partiyê diviya. Min ew ji çanta biçûk a textîn derxistibû û xistibû paşla xwe. Jê bîhna Cananê dihat. Defter û xeyalên yara windabûyî êdî li nik min bûn.

A sisiyan, min dest pê kiribû û rûyê xwe ji Ewrûpa dizîvirand û ber bi welêt dikir. Monika name dişandin da ku ez biçûma ziyareta wê. Piştî wefata Safter, Pelikanê çend name nivîsîn da ku ez vegeriyama Alemanyayê û min ew û qebra Safter ziyaret bikira. Hevalbendên me yên partiyê, ji Parîsê, name dinivîsîn da ku ez biçûma ziyareta wan. Lê ez diviya li Rohilata Navîn bimama. Xebat û şixul li navçê pir bû û li navçê girîngtir bû. (Min pir dixwest biçûma ser gora birayê xwe yê siûdxirab û bêkes, lê min keys nedidît.) Min xwe spartibû şevên spî yên Lubnanê û gav bi gav, nêzîkî li dilê Rohilata Navîn dikir, tula li ser rûyê wê radikir.

– Partiya Xoybûnê hebûna me ye, heyîn û heyîtiya me ye, Haco Axa li ber xwe dinihêre û dibêje. Me hemûyan pir şaşî kirin. Dijminan jî ev şaşiyên me bi kar anîn. Û dewletên serketî, nemaze Ingilîstan û Franse, mîna ku mesûlê şerê cîhanê em bûn, welatê me perçe kirin, pişta me şikandin... Doza me mezin e. Bila Xoybûn bibe xwediyê me, xwediyê doza me.

Piştî ku Haco Axa gotina xwe xelas dike, Xelîl Ramî Beg radibe ser piyan û dibêje,

– Birano, ev bûn çend saet ku em li ser van kursiyên hişk rûniştine, em qerisîn... em westiyan... birayên me li jêr xwarin hazir kirine, em dakevin û pariyekê bixwin.

FOTOGRAF 10

Aş çûye; kurd li çeqçeqokê dipirsin...

1 Ev fotografa dehan a Bîra Qederê ku sê kesan nîşan dide, fotografeke taybetî ye. Ev fotograf di nav hemû fotografên romanê de xwedî cîhekî xas e. Fotograf, ya şoreş û şoreşgerî, çek û çekdariyê ye.

Fotograf, ya heyama tevger û rêkxistina Xoybûnê ye.

Fotograf nîşana kel û best, daxwaz û coşa rabûn û serhildanê ye.

Li fotografê sê kes dixuyin; Celadet Alî Bedirxan, lehengê vê romanê, Qedrî Cemîlpaşa û Ekrem Cemîlpaşa, pismamên hev ên man û nemanê, dostên Celadet Beg, rêberên nû yên Partiya Xoybûnê. Hersê heval, hersê rêber, li kêleka maseyeke dirêj rûniştine. Li ber wan, li ser masê nexşeyek heye. Wan nexşe vekirine û bi dîqet lê dinihêrin. Celadet Beg li kêlekeke masê, Ekrem Beg jî li kêlekeke din rûniştine. Qedrî Beg di navbera herduyan de ye. Hersê li kêleka hev rûniştine û li nav û xêzên nexşê dinihêrin.

Kincên ku li ser wan in, kincên heyama Xoybûnê ne; kincên çekdaran. Li ser milê Qedrî Beg çaketek heye. Wî çaket li xwe nekiriye, lê avêtiye ser milên xwe. Celadet û Ekrem Beg bi tena qutik in. Çend qumçikên jor ên sîngê yên Celadet Beg vekirî ne, porê wî kin qusiyayî, simbêlê wî hatî ye. Welê dixuye ku ew, ji çend rojan û vir ve ye, kur nebûye. Kincên herdu pismaman, Qedrî û Ekrem Began, bi şal û şepikên kurdan dişibin. Şal û şepikên ku di lec, pêveçûn û şeran de kincên herî baş in. Qutikên wan jî, ji qutikê bêtir bi kiras dişibin û heta qirikê, bi qumçikan, girtî ne. Serê Celadet

Beg vekirî ye, porê wî tevîhev e, lê yên Qedrî û Ekrem Began bi kolozek û şarekê li dor pêçayî girtî ne. Simbêlê wan ê badayî pir xweş li cil û bergên wan tê.

Heta vê derê, tevî kincên Qedrî û Ekrem Began, fotograf tiştekî zêde nabêje. Meriv dikare bawer bike ku ew li seyrangehekê ne û li nexşeyeke, em bibêjin, welatekî Awrûpayê dinihêrin... Yan jî ew li ser riya nêçîrê ne. Lê du tiştên din ên fotografê hemû fotograf îzeh dike; çek û pûsatên Ekrem Beg û mohra li ser masê. Belê, Ekrem Beg bi çek û rext e. Tifingeke zîvhêlî ya şeşxana helqedar di navbera herdu lingên wî de ye. Tifing ber bi jor, ber bi aliyê navlûyê rawestaye. Wî destê xwe yê rastê daniye ser lûla tifingê û bi wî awayî li nexşê dinihêre. Wî rexteke bi kespikan neqişkirî li pişta xwe girêdaye, çenteyeke reş a eskerî û cewdikekî biçûk jî xistine milê xwe. Tifing, kemera tifingê, çanta eskerî, cewdik û rext, bi qumçikên zîvîn, bi neqş û xemil, dibiriqin. Ekrem Beg hemû tevdîrên xwe stendine; ew, ji bo çiyayên asê, warê serhildanan, amade ye!

Mohra li ser masê jî mohra Partiya Xoybûnê ye. Mohr hertim li nik serekan e û serek hertim kar û şixulê xwe bi mohrê dibînin û digerînin. Çek, rext, mohr û bala wan nîşan didin ku ev hersê heval bi karekî girîng ê eskerî rabûne, belê, bi şixulê serhildaneke kurdan ku Partiya Xoybûnê li pey e, mijûl in.

Fotograf li ku û kengê tê kişandin? Ne fotograf bi xwe, lê destnivîsa xwar û xweş a Celadet Begê ku li pişta fotografê ye, vê yekê diyar dike; Hasiçe, Temmuz, 1930.

Bi vê nav û nîşana cîh û wextê êdî fotograf bi her awayî diyar dibe; fotograf, a heyama dijwar a şoreş û serhildanan e. Salên dawiya 1920-an û destpêka 1930-an, ji bo kurdan, salên gelekî aloz, tevîhev û dijwar in. Kurdan şikest li ser şikestê xwarine. Serhildana wan a 1925-an têk çûye û serekên serhildanê li bajarê herî mezin ê kurdan Diyarbekirê, bi dar ve bûne. Serhildanên wan ên 1926-27-28-an jî bêhavil mane. Pêlên serîhildanan, ji ber gelek sebeban, şikestine. Lê serhildan didomin, bi gotina Par-

tiya Xoybûnê, hêvî neçilmisiye. Niha, di dawiya salên 20-an de, kurdan ala serhildanê, îcar, bi rêberiya Partiya Xoybûnê, li dora çiyayê Agiriyê hildane. Lê serîhildana ku di destpêkê de xurt û geş bû, niha, nikare bi pêş keve. Dor lê tê girtin û nefes lê diçike. Rejîmên Tirkiye û Îranê li hev hatine; serhildana kurdan divê biperçiqe...

Serhildan û serfirazî, perçiqîn û bindestî... jiyana kurdî ya salên 30-an li dora van gotin û kirinan hatiye rapêçandin. Û di navenda vê jiyanê de jî, ev hersê rêberên kurd li odeyeke bêtekber, vala û rût, li dora masayekê, rûniştine û hewl didin ku mêzîna qedera kurdî ber bi serfiraziyê dakeve. Celadet Beg bi destê xwe yê rastê, li ser nexşê, cîhekî nîşan dide. Herdu pismam jî bi hizr li eynî cîhî dinihêrin. Herdu destên Qedrî Beg li ser masê ne, di destê wî yê rastê de pênûsek heye. Destê rastê ber bi destê Celadet Beg çûye.

Welê dixuye ku haya wan ji fotografkêş nîn e. Ew ne bi fotografê, lê bi şixulekî cidîtir mijûl in. Lê digel vê yekê, fotograf, bi gotina fransizan "theatral" e. Tê de jîn heye, ew jîndar e. Gerçî ew li fotografkêş nanihêrin, lê mîna ku haya wan jê heye ku ev fotograf dê, rojekê, bibe fotografa salixdana salên 30-an û bibe behsa romanekê! Mîna ku ew dixwazin awir û nêrîna xwe, ked û lebata xwe, bi alîkariya fotografê, vebihuhezînin nifşên nû. Mîna ku wan dil heye ku ew vê kurtedema bîhnekê ku tarîxî ye, bikin tarîx! Ew li nexşa ber xwe dinihêrin, lê mîna ku ew li pêşerojê, li nifşên nû dinihêrin. Belê, ji fotografê baş diyar e ku ew bi dûrbînî li nexşê dinihêrin...

Fotograf mirî ne; bêzar û bêziman, bêdeng û bêpejn in. Kesê ku li wan dinihêre, li gora xwe, jiyanekê û dengekî dide wan. Lê ev fotografa dehemîn a Bîra Qederê dijî, tê de jîndariyeke xurt heye. Awir û nêrîna wan a cidî, rûniştin û rawestana wan a qaîm, cil û bergên wan ên deşt û zozanan, nexşe û mohra li ber wan, çek û rextên neqişandî, ev hemû tişt, jiyaneke taybetî dide vê fotografê. Nêrevan, bivê-nevê, bi heyecan lê dinihêre.

Şoreşgerên heyama dijwar û fotografa şoreşgeran heyecan dide nêrevan.

2 Hawirdor heyecan dide Celadet Beg. Ew bi heyecan li tûrêjên tavê ku li hember wî hiltên, li çiyayên asê û li refê teyrên ku difirin dinihêre. Ro, bi rengekî helesor, li pey çiyan, hêdî hêdî, hiltê. Ji dûr ve, dengê dîkin tê. Dinya zelal û hinekî sayî ye. Dinya kirasê belek ê havînê li xwe kiriye. Hawirdor bi rengên têvel xemiliye. Dinya hişyar dibe û haziriya rojeke nû dike.

Rojeke nû ya havîna 1929-an dest pê dike. Celadet Beg bi hêdîka derî bi piştkî digire û derdikeve ber derî. Ew li welatê bav û kalan, li deverên Behdînanê ye. Ji bo gerandina kar û xebatên Xoybûnê, ew û çend hevalên wî, bi hev re, hatine nav kurdan, welatê Iraqê. Ew xwe dide hev, çakêt û pantolê xwe hinekî rast dike û dere çend mîtro ji derî bi dûr, li ber dîwarê xênî, li ser totikan rûdine.

Ev aramî, ev bêdengî! Ev zelalî, ev paqijî! Di cîhaneke dîn û har de ev bihuşt!..

> Belê, min jî di deftera xwe de welê nivîsî. Bi kurdî; ev bihuşt... Tiştên ku min dinivîsîn, bîr û hizrên min, hîs û dengên min bûn. Gava ez bi tenê dimam û difikirîm, ew tiştên ku min dixwestin ji xwe re bigotina, min li ser kaxiz dinivîsîn. Wê rojê jî welê bû; aram, bêdeng, zelal û paqij. Cara yekemîn bû ku ez li heremê Behdînanê bûm. Ez hatibûm dilê welatê kurdan. Zarê bav û kalên min, devoka Cizîra Botan û Hekaran, li wir, bêrawest, dihate peyivîn. Zimanê kurdî, zimanê jîn û civatê bû! Kal û pîr bi kurdî dua dikirin, sond dixwarin. Jinebî bi kurdî nifir li dora xwe dibarandin. Şivan û gavan bi kurdî naxir û keriyên xwe diçêrandin. Zarok bi zimanê maderî digiriyan û dikeniyan. Dê zarokên xwe yên dergûşê bi kurdî dilorandin. Civat bi zimanê kurdî radibû û rûdiniştû digeriya. Dengbêj û çîrokbêj gotinên kurdî, mîna almas,

yaqût û ziberced, li hev digerandin. Zimanê kurdî jî, mîna wê roja nû, zelal û paqij bû.
Ev yeka hanê, ji bo min, kurdê muhaceretê, mehkûmê zimanên biyanî, bûyereke girîng bû.
Lê berî ku ez gotina xwe bidomînim, min divê ku ez şaşiyeke te rast bikim. Ew roja ku tu niha behs dikî, rast e, rojeke havînê bû, lê ne ya 1929-an. Ya 1928-an bû. Ev yeka baş tê bîra min, ji ber ku ez bi tenê sala 1928-an çûm Iraq û Îranê. Ji destpêka tîrmehê heta dawiya salê, ez li wan deran mam. Gera min û çîroka min û wan rojan dirêj e. Min hin bûyerên muhîm ên wan rojan di deftera xwe ya biçûk de, di deftera Cananê de, nivîsîne. Gelekî di ser re û bi çend gotinan... (Heye ku weha hîn çêtir bû.) Tiştên ku min hingî nenivîsîn, ne hewce ye ku ez niha jî bibêjim. Tiştên ku min di defterê de nivîsîn, ne hewce ye ku ez niha dubare bikim. Bi kurtî, ez weha bibêjim; Xoybûn, hebûna kurdan xurt dibû. Partî çêbûbû, bi rê ketibû, li her alî deng dabû. Bi gotina kurdan, me mû bi mû rîhek çêdikir. Ji her alî kurdan dixwestin bi me re pêwendî ava bikirana. Herweha ji Iraq û Îranê jî. Li Iraqê perçeyekî mezin ê miletê kurd dijiya. (Jixwe heta salên 1920-an, welatekî bi navê Iraqê nîn bû, ew dever jî perçeyekî dewleta Osmanî bû û perçeyekî mezin ê welatê kurdan jî tê de bû...) Li ser tixûbên Îranê, li aliyê Tirkiyê, kurdan bi rêberiya partiyê û kumandarê kurd Îhsan Nûrî, serhildanek li dar xistibûn. Partiyê diviya xwe bi wan deveran bighanda. Loma ez wê roja ku tu qal dikî, li wir bûm. Ez li rê bûm û ber bi Îranê diçûm.
Min ê hem li Iraqê hem li Îranê gelek kes bidîtina, gelek tişt bikirina û xwe bi tixûbên serhildanê bigihanda...

Celadet Beg ji berîka xwe pakêta cixarê û heste derdixe û cixareyekê vêdixe. Ew li gund û xaniyên gund dinihêre. Xaniyên mîna xirbe, bi kevirên reş, peregende, lêbûne. Li pêşiya wî, bi qasî pêncî mîtro jê bi dûr, meydana gund û kahniya gund xweşiyeke aram dide gund. Celadet Beg li xuşexuşa ava kahniyê guhdarî dike. Ew nefesekê ji cixara xwe dikişîne û li çiyayên

hember xwe dinihêre. Çiya mîna şerîdekî, mîna zincîreke reş li ber wî rêz bûne.

– Çiya û kurd, ew bi deng difikire û dibêje... Çiya û kurd... Ma Ksenefonê yewnanî, berî niha bi hezar salan, negotibû ku kurd û çiya aşiqê hev in?..

– Celadet, ew didomîne û dibêje, Celadet, Ceco... Te pişta xwe daye ku? Te berê xwe daye ku? Umir ji sîhî diqulipe ser çelî. Jîn diqulipe ser xewneke tevlîhev. Bav çû, yar çû, welat çû, jîna Stembolê çû, xeyala vegerê çû... Dûmahîka vê riyê çi ye, li ku ye?

Hingê deriyê xaniyê kêlekê vedibe û jê keçikeke 6-7 salî derdikeve. Keçik li Celadet Beg dinihêre û bi şermokî jê rû badide. Celadet Beg bang keçikê dike,

– Delalê, metirse, were, were nik apê xwe.

Keçik bi hêdîka tê ba wî. Ew bi destê keçikê digire û bi destê rastê porê wê dide hev. Keçik porzer û çavşîn e.

– Navê te çi ye, delalê, kezîzerê?

– Rûşen e, keçik li pêşiya xwe dinihêre û dibêje.

– Wey... navê te pir xweşik e. Navê bapîra min jî Rûşen bû. Navê dotmameke min jî Rûşen e. Tu rû bi şên bî, keça min...

– Mamo, tu dê li gundê me bimînî?

– Ma tu dizanî ez kî me, Rûşena delal?

– Erê, babê min gote min... Tu mamo yî, Mîr Ceca... ced...

Celadet Beg dikene û keçikê hembêz dike.

– Tu dê li gund bimînî? Mîr Ceca... ced hatiye me xelas bike?..

3 – Berî çûyina min, navê min li dewerên ku ez ê biçûmayê, belav dibû, Celadet Beg dibêje. Xelkê belav dikir û digot, "Mîr Celadet hatiye welat xelas bike..." Loma jî ez diçûm ku derî, li wir zabit, eskeriye û mixaberat li pey min bûn.

Celadet Beg, li Şamê, li mala Samiye Xanim û keça wê Rûşenê ye. Wan Celadet Beg ezimandine şîva êvarê. Celadet Beg jî tevî çend dostên xwe, Haco Axa, Bozan Şahîn Beg û çend kurdên din

ên Sûriyê hatiye malê. Ew li oda rûniştinê ya malê li ser doşekan rûniştine. Samiye Xanim, Rûşen û du hevalên Rûşenê bi haziriya xwarinê mijûl in. Rûşen û diya wê di navbera odeyan û mitbaxê de derin û tên. Carina jî Rûşen tê û li ber deriyê odê, li ser kursî rûdine û guhê xwe dide sohbeta odê.

– Em bi heviyên mezin çûbûn wan aliyan, Iraq û Îranê, Celadet Beg ji hevalên xwe re dibêje. Lê kurdan bi xwe, bi gotin û nezaniya xwe, rê li me girtin. Kurd hînî xebatên nehînî û rêkxistinî nebûne, hê jî bi awayê eşîrî li meselan dinihêrin, ji mêvanperwerî, dilsozî û fedakariyê re bêpayan in. Lê heçî xebata modern e, ew jê bi dûr in. Ew hê nizanin teşkîlat çi ye! Min bi hezar zehmetî xwe ji destê rejîma Îranê xelas kir.

– Mîrê min, tu hê kurdan nas nakî, Haco Axa bi ken dibêje, te hê tiştekî wan nedîtiye!..

– Me dil heye ku em sifrê li vir, li erdê, raxînin, Rûşen dikeve hundir û dibêje. Gelo bi dilê we ye? Yan na, em divê derbasî aliyê mitbaxê bin.

– Heyra ev der çêtir e, Haco Axa dibêje, me mebin û mexin mitbaxa teng û me li dora kursiyan rêz mekin. Em ê li vir, li erdê, li gora edetên xwe bixwin.

– Jixwe me jî, ji bo Apo Celadet û we, şîvên bav û kalan çêkirine. Rûşen dibêje û dibeze aliyê din ê malê.

Jin, bi hev re, di kêliyekê de, sifrê hazir dikin, xwarinan, yek bi yek tînin ser sifrê, firaqan li ber mêvanan datînin. Celadet Beg û hevalên wî li ser sifrê rûdinin. Her texlît xwarin li ser sifrê heye. Ji sifrê bîhneke germ a şîvên têkel difûre.

– Ev, kutilkên melakê ne, Rûşen, li pê sekinî, dibêje. Li gora gotinan, Mîr Bedirxan jê gelekî hez dikir û heta li Girîtê jî ev kutilk didan çêkirin. Ev jî sawara kerengê ye ku kalikê min Bedrî Paşa jê gelekî hez dikir. Ev jî kipe ye ku diya min dibêje, mamê me Emîn Alî Begê rehmetî jê gelekî hez dikir. Ev jî helise û metfînî ne ku Apo Celadet ji wan gelekî hez dike... û xelas! Sifra me ya feqîr bi tenê hewqas e!..

– Mala we ava be, Bozan Beg dibêje, ma ji van şîvan xweştir çi heye? We em xenî kirin. Hûn jî werin, em bi hev re bixwin?

– Na, spas, hûn bixwin, piştî xizmeta we, em ê li aliyê din bixwin.

– Rûşen tu were, rûne, Celadet Beg dibêje. Te behsa bav û bapîrê min kir. Tu were rûne, ez jî hinekî behsa wan bikim.

> Wê êvarê, belê wê êvarê germahî û dilsoziya Rûşenê bala min kişand. Amojna Sitî ku bi xwarinên xwe yên Cizîra Botan meşhûr bû, hertim digot, "Mastê payizan deynin ber ezîzan, mastê biharan bidin neyaran. Şîv û xwarinên Cizîra Botan deynin ber mîr û ezîzan..." Wê êvarê jî Rûşen û diya wê şîvên Cizîra Botan danî bûn ber me...
> Ji ber ezîziya xwe, germahî û dilsoziya xwe... Ez ji Îran û Iraqê nû vegeriyabûm û hatibûm Lubnan û Sûriyê. Min rojên pir dijwar li pey xwe hiştibûn. Bi rastî jî ez hewcedarê germahî û dilsoziyê bûm...

– Rûşen, te, diya te, hevalên te, we em îşev îhya kirin. Te ez birim rojên min ên zaroktiyê... Te dizanîbû ku ez li qonaxa kalikê te Bedrî Paşa hatime dinê? Te dizanîbû ku ez di hembêza dapîra me Rûşen Xanimê de, cara yekemîn, qîriyame û wê ez li pêçekan gerandime? Te dizanîbû ku bavê te jî, li Şamê, li ber destê dapîra me Rûşen Xanimê mezin bûbû? Tu li vî îşê felekê binihêre!... Mîna ku ew jî, Mîr Bedirxan, Rûşen Xanim, Bedrî Paşa, bavê min, bavê te jî, vê êvarê, li nik me ne. Mîna ku ev jî, niha, bi me re, ji van şîvên me yên bav û kalan dixwin. Tu bijî, Rûşen!..

4 – Tu bijî Mezo!.. Li Lubnanê, li mala Xelîl Ramî Beg îro kêf heye. Nameyekê ji Stembolê, ji Meziyetê hatiye. Wê nameyeke çar rûpelî nivîsiye û bi dostekî malbatê re, ji kekên xwe

re şandiye. Name di navbera wan de narin û nayên. Celadet û Kamuran Beg, herweha Xelîl Ramî û Sureya Beg, gelekî bala xwe didinê ku zirarekî bi xizm û meriyên malbatê yên Stembolê neyê. Malbata ku di bin çavnêriya rejîmê de ye, bi tu awayî, pêwendî bi endamên malbatê yên derveyî welêt re danayine. Lê ev name ku ji Celadet û Kamuran Began re hatiye nivîsîn, bi carekê, ji nişka ve, gihîşte wan, -mîna pêriyekê, mîna melayika hez û paraziyê.

– Ev rêzên Mezo, ji bo ruhê min ê bedbîn, bûn dermanê herî baş, Kamuran Beg rûpelan bîhn dike û dibêje. Tu her bijî Mezo!

Nama Meziyetê, çar rûpelên mezin, bi tirkî, bi tîpên pir biçûk lê pir xweş ku mîna ji destê hetadekî derketiye, tijî xeber in; siheta Yadê baş e, lê ew pir bêriya Celadet û Kamuran dike û navê Safter hertim li ser lêvên wê ne. Birayên wan Tewfîk û Hîkmet baş in. Herdu jî li ber deriyê dewletê, di cîhên bilind de, dixebitin. Mîna gelek kesên din ên malbatê, ji tirsan tu deng ji wan dernakeve. Rejîma nû ya Tirkiyê paşnaveke nû li malbatê kiriye, "Çinar" Pismamê wan Wasif Beg bûye "muşawîrê" serokê komarê Mistefa Kemal û Mistefa Kemal ew kiriye wezîrê perwerdeyiyê. Li gora Wasif Beg, Mistefa Kemal bi xwe ev paşnav daye malbatê û gotiye, "Bedirhanpaşazade ailesi bir çınar gibi tarihi ve güçlüdür. Çınar ismi onlara yakışır..." Zordariya li ser kurdan roj bi roj zêdetir dibe. Her tiştê kurdî qedexe dibe. Herkesê ku bi kurdî bipeyive, tê girtin û jê ceza tê birîn. Kurd, eşîrên kurdan ji welatê xwe, ber bi aliyê Anatoliyê, nefî dibin. Tirs û bêdengiyê esmanên Tirkiyê vegirtine. Herçî Stembol, bajarê hezkirî ye, bêdeng e. "Eqeliyetên Stembolê" ermen, rûm, ewrûpayî di nav tirseke mezin de ne. Rûmên Stembolê, ji tirsan, bar dikin û koçî Yewnanistanê dikin. Lê belê, Stembol hê jî xweş e, hê jî di şevên sayî de diçirûse, hê jî di her demsalê de xwe bi rengekî nû dixemilîne, hê jî Bospor, yanê Boğaziçi, bi awirê nazenînan, bi hêdîka xwe dilivîne û diherike. Eger ew behsa Kadıköyê bike, divê ew bibêje ku xelkê nû ji Anatoliyê û ji Trakyayê tên û li wir cîwar dibin. Ew Ka-

dıköya kevn a rengîn û nerm ku warê merivên rengîn û nerm bû, diguhere. Tirkiyekî ecêb ku wan tu carî nebihîstibûn, hêdî hêdî li Kadıköyê bi cîh dibe. Herçî mala wan e, Meziyet û Yadê li malê bi tenê mane. Tewfîk û Hîkmet zewicîne û bar kirine, çûne aliyê din ê Stembolê. Tewfîk çûye aliyê Şîşlî, warê mamê wan Evdilrezak Beg. Hîkmet jî aliyê Cağaloğluyê, warê Celadet Abi. Jina Hîkmet Abi keçikeke xweş, lê "şerût" a boşnak e. Bi alîkariya keçikê ku navê wê Nûriye ye, Meziyetê li Cananê daye pirsîn. Dawiya dawîn, ew hîn bûne ku Canan bi yekî boşnak re zewicî ye û wan mal bar kirine, çûne Ankarê, merkeza rejîma nû. Li gora ku Meziyetê bihîstiye, mêrê Cananê dîplomat bûye... Belê, ew li malê bi tenê mane. Lê mam, met, pismam, dotmam, nas, xizm û dost hertim tên. Nemaze Saadet Abla û xweha wê hertim li malê ne û li Celadet û Kamuran "abiler" dipirsin. Şehrîban bi xizmekî malbatê re zewicî ye û li Kadıköyê dijî. Ew jî hertim tê malê û alîkarî dike. Mixabin ew nikarin li bexçê binihêrin. Gerçî bexçewanekî, heftê carekê tê û bexçe dide hev, lê kar pir e. Bîra bexçê miçiqiye, ew nikarin lê binihêrin. Wan çend darên bexçê dane birîn. Lê ew dara ku Safter, Sefo Can lê kolabû, maye. Ew xêzên ku Safter kolabûn, hê jî dixuyin. Çaxa dinya xweş dibe û ew li der, mîna berê, li kêleka bîrê rûdinin, zebeş dixwin, purtaqal û mandarîn qaş dikin, hingê, carina Yadê dere û destê xwe li ser wan xêzan digerîne û wan radimûse... Bîra bexçe bûye remza roj û dewrên bihurî. Bîr dewranên berê bi bîr tîne. Gava kulîlkên spî yên darên behîfan û rengîn yên darên hinaran dibişkovin, ew mase û kursiyan derdixin bexçê, kêleka bîrê û rojên derbasbûyî yad dikin. Bi xêra bîrê, ew ji dema nû bi dûr dikevin, dewr û dewranên bihurî dibe stariya wan... Ew li malê bi tenê mane, lê siya Bavo, Sureya Abî, Celadet Abî, Kamuran Abî û Sefo hertim bi wan re ye. Bedena wan ne li malê ye, lê ruhê wan, siya wan, li wir e. Hertim, her gav... Hê jî li mal, kes li ser kursiyên Emîn Alî Beg rûnane, kes destê xwe nade kitab, kovar û defterên wî.

Kaxiz û defterên Celadet Abî di berkêşkên masa oda kitabxanê de veşartî ne. Meziyet li nivîsar û bendên Celadet Abî yên rojnama Serbestî jî pirsîne. Ew ê wan jî bide hev. Şîîrên Kamuran Abî yên abadîn ku bi fransizî hatine nivîsîn, di nav dosyekê de, li nik Meziyetê ne... Albuma Meziyetê ji destê Yadê, Saadet Abla û yên din nakeve. Ew her lê dinihêrin. Ew bi fotografan re dipeyivin, fotograf jî bi wan re. Herkes li wan, li Sureya, Celadet û Kamuran "abiler" dipirsin... Û xebereke yan jî mizgîniyeke xweş; li gora ku tê gotin, rejîma nû û serekê rejîmê Mistefa Kemal li efûyeke gîştî difikirin da ku quweta tevgera derveyî welêt ku li dijî dewletê ye, daxînin. Yadê û Meziyet bi tenê vê yekê, bi tenê efûya Sureya, Celadet û Kamuran "abiler" ji Xwedayê Alemîn dixwazin. Heke rojekê ew Sureya, Celadet û Kamuran "abiler" li Stembolê, li Kadıköyê, li mal, dîsan mîna berê li mitbaxê, li kêleka hev, li hember hev rûniştî bibînin, ew ê hezar hemd û spasiyên xwe pêşkeşî Yezdanê mezin bikin...

– Tu her bijî Mezo, xweha min a jîr...

> Kamuran, birayê min ê ziravbihîstiyar, welê digot û bi kêfxweşî name bîhn dikir, -bi çavên tijî hêstir. Ziravî û bihîstiyariya wî, kêfxweşî û hêstirên wî ne bê sebeb bûn. Em li Rohilatê bûn, li hespên rewan ên aloziyê siwar bûbûn û me di ser çal, kort, gelî û newalan re gav dikir. Dora me bi zehmetî, dijwarî, alozî û bêgaviyê rapêçayî bû. Rojeke Rohilatê bi rojeke din nedima, her roj tiştekî nû ku ne di hesabê de bû, diqewimî. Her roj ji tiştekî nû re avis bû. Stêwrî li navçê nîn bû! Min hê jî bi best Bismark û Nietzsche dixwendin û li dengê gur ê Nietzsche guhdarî dikir. Nietzsche digot, kesê ku wî dixwîne, tevî gotinên wî hildikişe lûtkeyên çiyayên bilind û sar, lê belê ez li Rohilatê, warê herî germ ê cîhanê bûm. Ne Bismark, ne Nietzsche, ne Ovidius û ne jî hosteyekî min ê din dikarîbû alîkariya min bikira. Ji birîn û kulên jînê û merhem û dermanên tecruban pê ve tu kesî, tu tiştî nikarîbû alîkariya min bikira.

Em bi xurtî ketibûn nav xebata tevgerî ya siyasî û çekdarî. Mesele, mesela xîret û namûsê, man û nemanê bû. Welat li ber lingan çûbû, kurd û kurdanî hew hêjayî tiştekî bûn. Welat bûbû welatê bûm û kundan, sipir û qijikan. Me diviya tiştekî mezin bikira, cendekê li erdê vejanda, ruhê, bi gotina Nietzsche "décandant", bihejanda. Lê çawan?..
Herçend xelkekî pir û eşîrên mezin li dora me diciviyan, ewçend jî bar girantir dibû. Merivên me yên têgihîştî û ehlê karê xwe kêm bûn, îmkanên me, tevî ku navê me mezin bû, pir kêm bûn. Me nikarîbû rê li dijîtî û berberiyên axa, beg, şêx, şexsiyet û eşîrên kurdan bigirta û ji bo alîkariya me, tu dewletê xwe nedida ber. Fransizên ku hakîmê Lubnan û Sûriyê bûn, dixwestin rê li kar û şixulên me bigirin. Ew bi rejîma Tirkiyê re li hev hatibûn û nedihîştin ku em gav bavêjin. Wan li min, Kamuran, Memduh Beg û gelek kesên din ên serekên partiyê qedexe kiribûn ku em hilkişiyana welêt, axa kurdan. Mîna mîsal, ez nikarîbûm ji Şamê û pê ve biçûma, qedexe bû. (Ez bi dizî, bi hênceta nêçîrê, diçûm.)
Û li ser van hemû zehmetiyan jî, derdê me yê ebedî, belayê serê me, nêperetiyê, dîsan, nefes li me diçikand. Tevî ku tevger geş bû, bi hezaran, deh hezaran meriv li dorê bûn, me îmkan nîn bûn ku me debara hefteyekê bikira! Carina pere nîn bûn ku ez pê biçûma Şamê. Dengê gumûna daholê ji dûr xweş dihat! Li milê din jî hesret hebû... Hesreta kambax, tevî ku me xwe radigirt, dilê me diheland, laş û bedena me dikizirand. Loma Kamuranê ziravbihîstiyar, li welatê xerîbiyê, di nav keft û lefta xebatê û dijwariyan de, mîna me hemûyan, ziravtir û bihîstiyartir bûbû...
Û Canan... Canana ku her di bîr û heşê min de bû, niha, bi destnivîsa zêrîn û xemilî ya Mezo, dîsan, şevên min ên Lubnanê, xewnên min ên têkel diherimand. Şeva vê roja ku min û Kamuran li mala mamê me Xelîl Ramî Beg nama Mezo xwend, min di deftera biçûk de, rûpeleke nû vekir û tê de weha nivîsî; "Canan, nebixêrê... Tu li ku yî?.." Min bi tenê welê nivîsî, lê paşê, min ew rûpel jêkir û çirand... Ez ji Ovidius hîn bûbûm; meriv diviya dilê bi tûrên eşqê birîndar bûyî nede ber agirên xeyalan.

5Meriv divê dilên ku bi tîrên xedar ên zulmê birîndar bûne, nede ber bayê seqem ê teresî û çavpahniyê, Qedrî Begê Cemîlpaşa dibêje. Jixwe dil şikestî ye, hingî dil dibe dîl. Û dilê ku hînî dîlîtiyê bibe, êdî meriv nikare wî zû bi zû, ji dîlîtiyê rizgar bike. Şert û merc dikarin merivan dîl bixînin, lê gidî, bila dil dîl nekeve! Eger dilê miletekî jî dîl ketibe, hingê ew milet li ser riya windabûnê ye. Em divê welê qebûl bikin. Niha kurd jî ketine ser riya dîlbûnê û dilê wan jî, mixabin, pê re. Me divê ku em rê lê bigirin, çi dibe bila bibe, em rê lê bigirin...

Qedrî û Ekrem Cemîlpaşa û Celadet Beg li gundekî Heseçê ku nêzîkî tixûbên Tirkiyê ye, li maleke du qatî, li qata jor, li oda mêvanan, kêleka maseyeke dirêj, li ser kursiyan, rûniştine û li haziriyeke mezin a Partiya Xoybûnê hûr dibin. Roj, rojeke germ a tîrmehê ye. Sal, 1930 ye. Meha tîrmehê, îsal, li navê xwe hatiye; tîrên rojê yên vê mehê, rasterast xwe bi bedena merivan digihînin. Dinya germ e, pir germ. Lê ew li hundir, li oda tazî û bêtekber de ne. Karê ku ew pê rabûne, ji her tiştî girîngtir e. Rûyê wan cidî, awirê wan germ e, mîna tava tîrmehê. Qedrî û Ekrem Cemîlpaşa pismamên hev in, kurdperwerên navdar, ronakbîrên bihîstiyar in. Herdu jî li Tirkiyê, di kêliya dawîn de, ji mirinê rizgar bûne û reviyane hatine, bi gotina kurdên Sûriyê, "binê xetê", yanî aliyê Sûriyê. Gelek ji heval û hevriyên wan di serhildana 1925-an de (yan jî piştî serhildanê) hatine kuştin. Bajar û gundên wan xira bûne, mala wan wêran bûye. Ew jî, bi qasî çend salan, li zîndanan mane, tevî zar û zêç, kal û pîrên xwe, sirgûnî aliyê Anatoliyê bûne. Ew ji wir, bi dizî, reviyane û hatine li Suriyê xwe bi Partiya Xoybûnê gîhandine. Ruhê wan şikestî, gotinên wan pêt û çirûsk in, dilê wan bi şewat, birîna wan germ e.

Heval û hogirên wan mirine, ew dijîn. Qedirgir û qedirgiranên wan, li ber çavên wan, çûne bin sêdara mirinê. Ew dijîn...

– Xwezî em jî tevî wan bimirina, bihatina kuştin, bi dar ve bûna, Ekrem Beg dibêje. Celadet Beg, birayê hêja, ez çawan bibêjim, bi kîjan gotinan? Niha her rojeke me mirinekê ye. Dilê

min liyan e. Rûyên heval û dostan ku niha bûne gorbehîşt, her li ber çavên min in... Ev êrîşa ku em ê bikin, divê bi ser keve, em divê miyeser bin, divê tova gorbehîştan bê hildan, hesaba tarîxê bê dayin...

Hersê heval li nexşeya li ber wan hûr dibin. Nexşe, nexşa tixûbên di navbera Tirkiyê û Sûriyê de ye. Hevalekî wan ê partiyê, bi dizî, ev nexşe ji qerergeha eskerî ya bajarê Diyarbekrê, li Tirkiyê, wergirtiye û aniye. Wan, car bi car, li nexşe nihêrîne, lê ew divê niha biryar bidin; serhildaneke nû.

– Miyeseriya vê serhildanê bi kurdên li Tirkiyê girêdayî ye, Celadet Beg dibêje. Heke ew ji wir alîkarî nekin, dest navêjin çekê û ji paş ve li ordiyê nexînin, em ê nikaribin miyeser bin. Ji lewre, "artçiyên" me divê qaîm, eşîrên me yên welêt hazir bin. Ew destê xwe datîne ser niqteyekê û gotina xwe didomîne; eşîrên van navçeyan di navbera me û dewleta tirk de derin û tên. Me çend qedirbilind û giregirên navçê şandine nik wan.

– Jixwe welê ye, Qedrî Beg dibêje û bi pênûsa destê xwe cîhekî li ser nexşê nîşan dide, eger eşîrên kurdan ranebin û aliyê me nekin, ne em bi ser dikevin ne jî serhildana Serhadan, Araratê, dikare dewam bike. Li gora xeberên tên, eşîr li van minteqeyan hazir in ku rabin.

– Çend şêx û begên van navçeyan jî gihîştine hev, Celadet beg dibêje û bi tiliya xwe cîhekî nîşan dide. Wan şêxekî hêja şandibûn nik me. Ew jî amade ne, lê çekên wan nîn in. Me welê li hev kir ku hin eşîrên aliyê Iraqê, tevî çekan, xwe bi wan bigihînin û ew bi hev re quwetekê bînin pê.

– Li bajarên mezin ên kurdan, Diyarbekir, Xarpit, Riha, Wan, Bêdlîs û yên din jî berxwedaneke bêdeng heye. Ekrem Beg bi lûleya tifinga destê xwe dilîze û dibêje. Xelk ji rewşê ne razî ye. Rejîmê qifil û kelemçe li zimanê xelkê xistiye, esker û merivdewletên rejîmê dibêjin "Vatandaş Türkçe konuş" û zimanê xelkê qedexe dikin. Xelk bi hêvî ye, li hêviya hin tiştan e. Lê tirs jî heye. Hem hêvî hem jî cêwika hêviyê tirs heye. Ku tirs bê şikestin, hêviyê miyeser be.

– Serekiya serhildana Agiriyê nameyek şandiye û dixwaze ku Xoybûn şixulên xwe, zûtirîn roj, bi ser xîne û dest bi rabûnê bike, Celadet Beg cixare dikişîne û dibêje. Heke rabûn ji vir dest pê bike, ew ê jî, ji jor, êrîş bînin...

Hey gidî!.. ew roj, ew wext!.. Me tovek diçand, -bêyî ku me bizanibûya ka kî dê wê rakira. Ew wext, wexta tevger û xîretê hatibû. Wextên weha tarîxî di rojekê de nayên pê. Ew mîna pêlên avê ne, gav bi gav, hêdî hêdî, ber bi qiraxa avê dibin. Di demeke dirêj de ew tên pê, lê çaxa wan a ku ew li qiraxa avê dikevin û winda dibin, kurt e, pir kurt e. Di wan rojên gundê Hesiçê de, pêlên tevgera Xoybûnê li qiraxa avê diketin; me dê êrîş bibira ser Tirkiyê. Me biryar li ser biryar distandin. Bi lez. Bi kel û coş. Bi heyecan û meraq. Gelo tov ê hêşîn bihata? Kî dê wê biçanda?
Em li gundekî ji gundên kurdan ên doraliya Hesiçê bûn. Doraliya me hemû kurd bûn. Me merkeza partiyê veguhestibû warê kurdan. Em gelek bûn. Ne bi tenê ez û Qedrî û Ekrem Beg, lê hevalên me yên din jî li wir bûn. Memduh Beg hertim dihat. Mistefa û Bozan Beg dihatin. Haco Axa û kurên wî dihatin. Û gelek kesên din. Hatin û çûyin boş bû; me dê gaveke tarîxî bavêta. Lê gotina te ye, kesên ku her li wir bûn û dixebitîn, ez, Qedrî Beg û Ekrem Beg bûn. Min Ekrem Beg baş dinasî. Divê bête bîra te, em bi hev re, ez û Ekrem Beg, sala 1919-an, tevî Major Noel û birayê min Kamuran, çûbûn welêt, aliyê Meletiyê. Min Qedrî Beg jî, çend caran, li Stembolê, dîtibû. Ev herdu pismam bi nav û deng bûn. Ew hê nû daketibûn Sûriyê û bi xebata tevgerê rabûbûn. Haya wan baş ji welêt hebû. Ew zimanşêrîn û xweşsohbet bûn. Mîna min, wan jî li Stembolê û welatên Awrûpayê xwendibûn. Me ji zimanê hevûdu fahm dikir...
Mala ku em lê bûn, bi du qatan lêbûbû. Di navbera herdu qatan de ji aliyê hewşê, nêrdewaneke bi kevir lêbûyî, hebû. Gava em li hundir diwestiyan û me bîhnvedanek diviya, em derdiketin û li ser pêpilikan rûdiniştin. Me li ser pêpilikan jî, bi şeweyê sohbetê û piraniya caran tevî

zebeş û meyweyên sar, xebata xwe didomand. Nemaze bi şevê, gava stêr dinya ronî dikirin, em bi kêfeke bêpayan li ser pêpilikan rûdiniştin. Stêr, komika sêwiyan, kerwan-kuj, çerx û felek û yên din, bi rengên taybetî û germ diçirûsîn û kela dilê me bi firê dixistin. Di wan şevan de, bîrayên Löwenberg û konyakên Martel cognac û Courtoise ku Mistefa û Bozan Begên Şahîn, hertim, bi xwe re, ji Helebê, Centrale Hotelê, dianîn, şevên me xweştir dikirin. Carina jî di wan şevan de, şewqa heyveronê û awazên dengbêjên navdar dostiyeke edebî û ebedî dianîn pê.

Hewşeke fireh a malê hebû. Di hewşê de bîreke bi aveke boş hebû. Di danên sibê û êvarê de gavan û şivanên malê dewar û pezên xwe dianîn û av didanê. Ev yeka hanê jî, ji bo min, însanê bajarên mezin, bergeheke nû û xweş bû. Jîn li gund bi celebeke din dimeşiya...

Çaxa Qedrî û Ekrem Begên Cemîlpaşa daketibûn Sûriyê, Ekrem Beg bi xwe re kamerayeke fotografê anîbû. Kamera wî di wan rojan de jî, li nik wî bû. "Mîrê min" wî digot, "ev gavên tarîxî ne. Sibê roj jê re îspat divên. Wext mîna hespekî rewan e, diherike û dere. Lê ev resmên ku em niha dikişînin, ê îspat bikin ku me xwestiye, em zikê şeva reş a avis biqelişînin..." Geh wîbi xwe resmên me dikişandin geh jî wî kamera dida hinên din da ku ew resmên me, tevî Ekrem Beg, bikişînin.

Ez dinihêrim ku min dîsan dirêj kir. Ez çend gotinên din jî li vir bi rêz bikim û gotina xwe biqedînim; şeşxane, şeşxana nêgizî, cehferî, sîhre, çeper, cewdik, şax, dîkik, ling, çifte, qerebîne, şeşderb, êrîş, parêzgeh, siwar, liq, pî, qol... û hwd. Tu dê niha meraq bikî û bipirsî ka ev çi ne? Ev gotinên eskerî û yên tifing û debancan in. Jîna min a Xoybûnê, roj bi roj, bi van gotinên eskerî dihate rapêçandin. Min kurdiya van gotinan nizanîbû. Lê bi alîkariya hevalên min ên partiyê ku li welêt hatibûn dinê û mezin bûbûn, di nav civata kurdî de jiyîbûn, alîkarî kirin... Di wan rojan de, yek ji tiştên ku Celadet Alî Bedirxan, şagirtê gotinên Xeyam, Xanî û Ovidius, hevalbendê gotinên Goethe, Lamartine û Baudelaire, dikir, ev bû; wî gotin û termên eskerî, çek û cebirxanan, bi kurdî, dinivîsîn...

– Hevalên me yên Lubnanê nivîsîne, Celadet Beg dibêje, wan belavokek, bi zimanine ewrûpayî û erebî nivîsîne, gava êrîş dest pê bike, ew ê herin sefaretên welatên Awrûpa û Amerîka ziyaret bikin û belavokê bidin wan.

– Min li Helebê, Qedrî Beg cixara xwe ya pêçayî bi heste vêdixe û dibêje, li Hotel Baronê çend dostên me yên ermen dîtin. Ew ê jî xeber bişînin ermenên Tirkiye û Îranê da ku ew werin yardima me.

– Welê dixuye ku şêxên neqşîbendî û qadirî jî dê bên aliyê me, Ekrem Beg dibêje, helbet gava ew bibînin ku em dikarin zora zulmê bibin...

– Kekê min Sureya jî xeber bi rê kiriye. Rewş niha li Awrûpa û Amerîkayê ne xirab e. Hingî birano, wext hatiye.

Wexta biryara wexta êrîşê hatiye.

6 Kî çi dibêje bila bibêje, wexta êrîşê ne di cîh de bû. Ji bo êrîşê, me wexteke şaş, gelekî şaş hilbijart.

– Biryara partiyê bi lez bû, hazirî ne temam bûn, me bi xurtî bawerî nedabû eşîran.

– Îşê me kurdan her weha ye; aqilê kurdan paşê tê serê wan. Çima me ji vir hin hêzên qewî û çekdar amade nekirin û pişta xwe bi hêz û eşîrên hundir girêda? Mesûlên vî karî kî ne?

– Şev radizên, dijmin ranazên... Hevalên me yên mesûl ev gotina kevn ji bîr kirin. Ma qet wan bîr nebir ku dijmin ranazê, ew ê jî tevdîrên xwe bistîne? Li min biborin, lê partiyê xwe lewitand, me jî bi xwe re...

– Me bawerî, dîsan, bi eynî kes û eşîrên ku li Şêx Seîd Efendî û serhildana wî ya 1925-an îxanet kiribûn, anî. Ew teres û segbav dîsan bi karê xwe rabûn û îxanet kirin. Lê sûc ne ya wan bênamûsan e, ya kesên ku bi bênamûsan bawer kirin e.

– Ehlê partiyê li serê çiyan tî û birçî bûn, lê hin hevalên mesûl bi şampanye û konyakê xwirîniya xwe dikirin...

– 300 lîrayên partiyê winda ne, ez ji hevalê mesûl dipirsim, ka ev pere li ku ne? Kê ev pere xwarine?

– Tu behsa çi dikî, birayo! Ma ji şevên Berûdê re pere qîm dikin? Hele tu here ji gazîno û meyxanên Berûdê bipirse!..

– Hevalên ku di nav kurdan de nejiyane, kurdan nas nakin, nikarin hereka kurdî bi miyeserî îdare bikin. Ew bi aqilekî din li herekê dimezînin û tiştan disinifînin. Ma kurd û fransiz yek in? Ma bi xwendina kitabên fransizî, meriv kare kurdan îdare bike?

– Ma îxaneta axa, beg û şêxên kurdan ne meşhûr e, vê îxanetê li hemû dinê nav nedaye? Çima, ez dipirsim, çima me bi tenê ew dîtin, çima çavên me yên kor venebûn?

– Me gereg e, em li xwe mikur werin; gelek ji hevalan ji bo şan û şohreta xwe ketin nav vî îşî. Hin jî ji bo mal û mulk, erd û ax... Lê çi bû bi me bû; ku agir bi çiyê ket, ter û hişk tev de dişewitin. Tiştekî bi xwedanşan û şohretan nabe, lê em şewitîn.

– Tu behsa çi dikî birayo! Hê êrîşê dest pê nekiribû, ewraqên partiyê û planên êrîşê di destê waliyê tirkan ê Mêrdînê de bûn! Ji bo bihusteke erd û pariyeke malê dinê em hatin firotin...

– Bila xwarzî û birazî li min negirin, lê hin rêberên partiyê jî, ne ji bo welatekî aza, ji bo mîrekiya bav û kalên xwe, bi vî karî rabûn. Wan bi dil û can xwe nedan kar, bi pêwendiyên sefaretan, doza erdên xwe kirin.

– Min ji we re behsa eşîrên navçê nekir? Min navê wan yek bi yek ji we re negot? Min navê tirsok, dexsod û fesadkaran nedan we?

– Ev bênamûsê simbêlqît... ma min negot, bila haya hevalan jê hebe, ew ê eşîra xwe raneke, me bixapîne?

– Ya ew rîhdirêjê segbav! Çaxa wî bi çavên xwe yên pahn li ber xwe meyzinand, min fahm kir ku ew ê murîdên xwe raneke û neyê aliyê me.

– Tirkan em neşikandin, lê kurdan em şikandin! Ger rojekê tarîx van rojan binivîse, divê, bi tîpên mezin, weha bête nivîsîn; kurmê darê ji darê ye, kurd kew e, neyarê qewmê xwe ye.

– Me nikarîbû çare li berberî, dijîtî, hesûdî, çavnebarî û rika eşîrên kurdan bigirta û yekîtiya wan çêkira...

– Ya nezanî, nezaniya sedsalan? Çara nezaniyê çi ye?

– Min gotibû, eger we bi ya min bikira weha nedibû.

Belê, belê... gotin vala ye, bêkêr e. Em ji pênc qolan, di şeveke tarî de, ketibûn nav tixûbên Tirkiyê, – bi hêviyên mezin... Min û Haco Axa û lawên wî jî dirêjî xeta Cizîra Botan kiribû. Lê heyhat! Piştî rojekê, mîna hevalên din, em jî, dîsan, vegeriyabûn binê xetê. Me şikesteke nû xwaribû. Çima?

Çîrok dirêj e, ne tu bipirse, ne jî ez bibêjim... Bila ev çîrok jî, mîna gelekî tiştên me yên din, di nav rûpelên tarî û jibîrbûyî yên tarîxê de razê... Ev gotinên ku tu niha li romanê tînî û dinivîsînî, di civîna me ya dawîn a Xoybûnê de dihatine gotin. Na, ne di "civîna ME" de, di civîna MIN a dawîn de. Ji ber ku piştî wê civînê, ez hew çûm civînên partiyê. Êdî min serê hespê xwe ku di meydana siyasetê de taw dida, kişand û ji wê meydanê bi dûr ketim... Wê roja civîna min a dawîn, li gundekî Lubnanê, min bi derd û kesereke bêpayan, bi dilekî pir şikestî, li hevalên min ên man û nemanê nihêrîn û li gotinên wan guhdarî kirin. Min dengê xwe nekir, bi tenê li wan guhdarî kir... Min ê çi bigota?

Bi tenê min bi pênûsa destê xwe, li ser kaxizê ber xwe, car bi car, heta kaxiz tijî bû, weha nivîsî; aş çû, kurd li çeqçeqokê dipirsin... aş çû, kurd li çeqçeqokê dipirsin... çû, kurd li çeqçeqokê dipirsin... kurd li çeqçeqokê dipirsin... li çeqçeqokê dipirsin... çeqçeqokê dipirsin... dipirsin... çeqçeqok... çeqçeqokê...

Dîsan aş çûbû, kurd ketibûn pey çeqçeqokê, dîsan xelkê aş biribû, kurdan li çeqçeqokê dipirsîn...

FOTOGRAF 11

Hawar; hawara gel û welat, hawara dil û can,
hawara Bedirxan, hawara canan

1 Rojeke germ a 1932-an e. Celadet ku êdî jê re "Celadet Beg" dibêjin, li ber maseyekê rûniştiye. Pênûseke dirêj, zirav û reş di nav tiliyên wî de, ew li pêş, li kamarayê dinihêre. Ser masê tijî ye; li koşeyekê çend kitab li ser hev, li kêleka wan sê defter, dido mezin, yek biçûk, li ser hev, li kêleka defteran jî komeke rojname peregende ne. Li koşa ku Celadet Beg li berê rûniştiye, xwelîdankek û li kêlekê jî sê kitabên gelekî stûr, li ser hev in. Li pêşiya Celadet Beg jî deftereke vekirî, dirêj û mezin heye. Destê wî û pênûsa nav tiliyan li ser rûpela vekirî ya defterê ne. Ew bi karê nivîsînê mijûl e.

Ew li pêş, li kesê ku vê fotografa yanzdan a romana "Bîra Qederê" dikişîne, dinihêre. Gelo ew dikene? Yan na, ew bîhnteng e? Bîhnfireh? Kêfxweş? Bi keser?.. Ev yek ji fotografê naxuyin. Celadet Beg bi tenê, bi rûyekî aram, bi çavên ramantijî, dinihêre. Kes nikare ji fotografê derxe ka Celadet Beg di çi haletê de ye, çi difikire, çi hîs dike. Na, meriv jê fahm nake.

Ew dinivîse, bi tenê dinivîse.

Çavên wî yên stûr û reş ku her vekirî ne, di vê fotografê de, hinekî girtî ne. Welê dixuye ku wî ji ber hêza tîj û tîra tavê, çav hinekî girtine da ku bikaribe li kamerayê binihêre. Rûyê wî yê gulover û fireh jî hinekî jar û zirav dixuye. Mîna ku ew hinekî jar ketiye. Lê ev jarî lê hatiye, bedena wî ya dirêj û girs xortir û

xurtir dixuye. Simbêl her mîna xwe ne; reş, kin û zirav. Simbêlê qerqaş, tevî eniya fireh, hinekî dibiriqe. Tav û tîrêjên tavê li ser simbêl, hinarik û enî dilîzin.

Herçî bîvil e, beranî ye; Bedirxanî ye.

Tiştekî nû li rûyê dirêj û aram zêde bûye; rîh... Celadet Beg rîh berdaye. Hinekî, bi qasî mistekê... Ne li gora ûsila osmaniyan, lê li gora ûsila ronakbîr û nivîskarên ewrûpî, bi dîqet, bi dûzan. Li gora ûsila osmaniyan ku bav, mam û pismamên wî jî her li gora wê ûsilê rîh berdidan, rîh rû vedigire. Rû dibe rîh. Ji cênîkekî heta yê din hemû çenge, heta hinarikan hemû rû, rîh e. Rîh mîna palikekê bi rû ve dizeliqe û wî vedigire. Rû di nav boşahiya rîh de winda dibe, rîh derdikeve pêş. Di saraya Osmanî, Dolmabahçe û Çiraxanê de, hemû kesên ku karên dewletê digerandin, padîşah, wezîr, aqilmend, pispor, paşe, zabît, rîhpalik bûn. Saraya Osmanî, xizmên Celadet Beg jî tê de, derya rîhpalikan bû.

Lê Celadet Beg bi wê celebê rîh bernedaye. Wî bi ûsila zane û têgihîştiyên aleman û fransizan rîh berdaye; bi tenê li dora çengê, kin û bi qasî kulmekê. Li pişta wêna yanzdan a vê romanê, bi tîpên latînî û bi jimarên erebî cîh û tarîx hatine nivîsîn. Bi tîpên latînî "Sham", bi jimarên erebî jî hatiye nivîsîn. Yanê tarîxa kişandina vê fotografê 1932 ye. Yanê ji ser 1893-an re ku rûpelên pêşîn ên romana "Bîra Qederê" pê dest pê kiribû, sîh û neh sal bihurîne.

Umrê ku li welatekî nû yê xerîbiyê, ketiye ser riyeke nû û ber bi salên xwe yên çilan dere, welê dixuye, rîh divê... Lê her çi be jî, ji ber çi sebebî be jî, rîh lê hatiye; rû pê ziravtir û bêtir lihevhatî dixuyê, rengekî alîm û zanayan pê dikeve. Rîh awayekî europé didiyê.

Defter, kitab, rojname, kovar, pênûs û rîh... Li Şamê, navenda medeniyeta erebî, kurdekî zane û europé...

Celadet Beg û masa ku ew li berê rûniştiye, li kêleka çardaxek û bîrekê ne. Li paş Celadet Beg, li milê rastê, dîwarê gulover ê bîrê dixuye. Bîr lêbûyî ye, bi dîwêr. Bi qasî mîtro û nîvekê, bilind

bûye. Ji bo kişandina avê, dolabek li dîwêr zêde bûye. Sitîleke ne ewçend mezin li ser dîwêr dixuye. Siya Celadet Beg û masê li dîwarê bîrê xistiye. Siya wî li ser dîwarê bîrê ye. Hema li nik bîrê, çardax, bi caxên fireh û paralel, bilind dibe. Çend mêw çardax rapêçane û di navbera çavên caxan re hildikişin jor. Bîr û çardax aliyê paş ê fotografa yanzdan tijî dikin.

Rîh li Celadet Beg tê. Bîra lêkirî li "Bîra Qederê" tê...

Meriv ji fotografên "Bîra Qederê" jî derdixe ku fotograf texlît bi texlît in. Hinên wan dipeyivin, taswîr dikin û salix didin. Hin diqîrin, diqîjin. Hin jî bêdeng û aram in. Fotografên bêdeng û aram bi tenê hene û li benda dîtin û nêrîna nêrevan in. Dewsa ku ew bipeyivin, hewcedariya wan bi gotin û nêrînên kesên ku li wan dinihêrin, heye.

Ev fotograf jî di vê texlîdê ye; bêdengî û aramî jê hildibe, zelalî û ronahî tê de dixuye. Germahî tê de heye. Ev fotograf napeyive, ji ber ku Celadet Beg tê de dinivîse.

Wî dest bi nivîsînê kiriye.

2 Min qirara xwe daye, Celadet Beg dibêje, ez ê binivîsim, dest bi nivîsînê bikim. Min dil bi cerîdeyekê, cerîdeyeke kurdî heye.

Mîna her carê, vê êvarê jî, dîsan, li Şamê, taxa kurdan, li mala fireh a Elî Axayê Zilfo, civata kurdî geriyaye. Êvar, êvareke sar a zivistana 1932-an e. Kesên ku li odê rûniştine, gelek in; ji Celadet Beg pê ve, Haco Axa, tevî hersê kurên xwe Hesen, Çeçan û Cemîl, Ekrem û Qedrî Begên Cemîlpaşa, Elî Axayê Zilfo, Bozan Begê Şahîn, Osman Sebrî, hevalên Celadet Beg ên Stembolê Memduh Selîm Beg, Hemze Begê Muksî û hîn çend kesên din. Şîva ku hertim bi beroşan li ser êgir e, hatiye xwarin, firaq rabûne. Civat qahwa piştî şîvê vedixwe. Qutiya cixarê ji destekî vediguheze destekî din. Ji oda germ dûman radibe. Wexta behs û gotinê hatiye.

Tûrê derd û kul, birîn û keserên kurdan vebûye, wexta qiseyên dijîtî û berberiyên nava wan, xwestek û hedefên wan ku tu carî bi cîh nabin, hatiye.

Celadet Beg li kesên odê dinihêre, ji fîncana qahwê qultekê vedixwe û dibêje,

– Me cerîdeyekê, na ne yek, cerîdenin, divên... Milet bi zimanê xwe, bi xwendin û nivîsîna xwe dibe milet. Bi vî terhî, milet xwe bi medeniyet û miyeseriyê digihînin.

Ew bi hêdîka, gotin bi gotin, dipeyive. Mîna ku ew nivîsareke nivîskî dixwîne, yan jî bendekê dinivîse.

– Belê, milet bi zimanê xwe hene. Yekîtiya milet bi zimên çêdibe. Yekîtiya zimên jî bi xwendin û nivîsînê, bi yekitiya herfan çêdibe. Ka ev yekîtiyên me, ka yekîtiyên zimanê me? Ka xwendegeh, mekteb, kitab, cerîde û rojnameyên me ku dê van yekîtiyan bînin pê? Ka?.. Em şikest li ser şikestê dixwin, hertim bi hev dikevin, çima? Çima birano?

– Mîrê min, gotinên te rast in, Elî Axayê Zilfo, xwediyê malê, dibêje. Kes nikare bibêje ku ev gotin ne di cîh de ne, lê cerîde û rojname jî bi quwetê, bi dirav û zanînê, bi cemaat û nivîsevanan derdikevin. Îcar ez ê jî bipirsim, ka ev li ku ne?.. Em hemû bi çîroka xwe dizanin, kurd fêrî tiştên weha nebûne...

Ekrem Begê Cemîlpaşa cixareyeke pêçayî dirêjî Celadet Beg dike û dibêje,

– Bi gotina Elî Axa ye. Fikra cerîdê xweş e, pîroz e. Lê ew ê çawan derkeve? Mebesta min cerîdeyeke kamil û xurt e. Cerîdeyek ku bikaribe her û her derkeve û bi wî awayî alîkarî li ziman û hebûna me bike. Ez ê çi bikim bi cerîdeyeke welê ku bi tenê hejmarek, du hejmar derketine, lê paşê hêviya xelkê qurmiçandiye û winda bûye!.. Ez dibêjim, gerek e, meriv serê xwe baş bi van pirsan biêşîne, deh caran bifikire û paşê gavekê bavêje...

> Gotina Ekrem Beg bû, gotina dostê dilsoz Elî Axa bû; ez ê deh caran bifikiriyama û min ê paşê gavek bavêta... Lê ez ne bi tenê deh caran, heye ku bîst caran, sîh caran, çil

caran, pêncî caran, sed caran fikirîbûm. Li Stembolê, li mala xwedî bîr û bexçe ya bavê xwe, gava min rojname û kovarên mamên xwe dîtibûn; li Stembolê, gava ez li rojnama "Serbestî" xebitîbûm; di keştiya Kadıköyê de, gava min deftera biçûk a Cananê xistibû berîka hundir a çakêtê xwe û ew dabû ber dilê xwe; li Munîxê, gava min bi çend kartolan roj biribûn serî û Bîsmark, Goethe û Nietzsche xwendibûn; li wî gundê Munîxê, gava min û Safo, birayê axretê, şaîrên frensizî xwendibûn; Li Misirê, li bexçê kekê min Sureya, gava min li çavên westiyayî û kesertijî yên bavê xwe yê nexweş nihêrîbûn û li wesiyeta wî guhdarî kiribû; Li ser tixûban, gava me direjî Tirkiyê kiribû û piştî donzdeh saetan, destvala, fedîkar, dîsan, vegeriyabûn; li Lubnanê, di civîna min a dawîn a partiyê de, gava min li lec û şerên bêkêr ên hevalên xwe temaşe kiribû, hingî, her car, ez fikirîbûm.

Ez fikirîbûm û bi tecrubên xwe jî hîn bûbûm; dermanê cehaletê ne laqelaq û gotinên qelaw ên fiş û paşgotiniyên der û dorê bûn. Derman berhem û eser, afirîn û avahî bûn. Tariya şevê bi qîreqîr, xirecir û teşqele nediqulipî ser ronahiya sibê. Bi zanîn û huner, bi herf û hevoka nivîskî dibû.

Ez fikirîbûm...

Loma jî gava min kovara xwe weşand, di hejmarek ji yên pêşîn de, min bang li xortên kurdan kir û weha nivîsî; "Xorto! Bi ser kela me de girtine. Ji der ve dijmin direjî me kiriye. Ji her milê êrîş. Di hundirê kelê de şerekî din, bê eman û ji yê pêşîn mezin û dijwartir heye. Şerê me bi hevûdu re. Di mal de jî dijmin. Herê Xorto! Birîna me a mezin û xedar dexs e (hesûdî), berberî ye, jana dexsê ye. Em sîngjar in. Ji der ve serma li me dixe. Li hundir em bi janê dikevin..."

Ez fikirîbûm... Me dîsan şikest xwaribû, em dîsan bi hev de ketibûn, dîsan dexesî û berberiyê bîhn li me çikandibû. Fransizan, desthilatên welatê Sûriyê jî, li ser daxwaza Tirkiyê, em hemû, axa û beg, şêx û giregir, mîr û rêberên kurd, dabûn hev, ji doraliyên tixûb bi dûr xistibûn û em hemû li Şamê civandibûn. Kurdên Şamê dîsan, bi mêvan-

perweriyê rabûbûn û malên xwe ji derketî û nefiyan re vekiribûn. Elî Axayê Zilfo jî deriyên mezin ên mala xwe ya mezin ji giregirên kurdan re vekiribû. Rewş weha nexweş bû. Heçî ez bûm, li ber min du rê mabûn; ya min ê ji welatê rohilatê rû bada û berê xwe, dîsan, bida welatê roava. Yan jî, digel her tiştî, ez ê li Lubnan û Sûriyê bimama, min ê singê konê xwe yê koçer li axa qiraç a welatê ereban daçikanda. Ji welatê roava, Monikayê bang min dikir, name li ser name dinivîsî û dixwest ku ez vegeriyama Alemanyayê. Pelikana pepûk a dilşewitî jî name dişandin.
Lê ez fikirîbûm... min ê kovareke çandî û edebî ya xwerû kurdî biweşanda...

Tevî ku êdî derengê şevê ye, civata kurdî hê jî germ e. Heval û dostên Celadet Beg, yek bi yek, li ser kovarê dipeyivin, dîtin û pêşniyarên xwe dibêjin. Lê bi tenê Haco Axa bêdeng e. Ew tu tiştî nabêje, bi tenê guhdarî dike. Çaxa Haco Axa radihêje cixareyekê, Celadet Begê ku li kêleka wî rûniştiye, hingê, bi heste cixara wî vêdixe û jê dipirse,

– Mamê Haco, tu mezinê me yî. Tu ji me çêtir bi hal û hewalên îmkan û zirûvan dizanî. Ev bû çendîn car ku em vê meselê dipeyivin. Lê ez bala xwe didimê, tu her bêdeng î... Ma tu dîtin, nêrîn û pêşniyazên te nîn in?

– Mîrê min, ev eşq û daxwaza te, best û kela te zimanê min kilît dike. Ez hew dizanim ka ez ê çi bibêjim...

– Helbet, hin tiştên ku tu bibêjî, hene. Çima em ê ji nêrînên te yên hêja bêpar bimînin?

– Mîrê min, tu mîrê me yî, ezîzê dilê me yî. Bav û kalên te mîrên ehl û eşîrên me bûn. Bi serê bavê te, tu divê bizanibî ku ez dikarim, bêyî ku çavên xwe biqirpînim, van hersê lawên xwe li ber te serjê bikim. Tu bi vê bawer be. Lê heçî cerîde ye, heke ez di dewsa te de bim, ez ê dest bi cerîde-merîdan nekim. Tu mîrê kurdan î, lê tu wan nas nakî. Heke tu bi karê kaxiz û cerîdan rabî, ew ê hezar navî bi te ve kin... Aha, tirsa min ev tirs e.

– Lê çima? Ez ê vê cerîdê, ji bo wan, derxim, vî karî ji bo wan bikim. Ez ê cerîdê bikim kursiya wan... Çima?

– Naxwe min got, tu wan nas nakî. Bilûra li ber ga çi ye? Çira li ber kora çi ye? Ezbenî cerîde jî bilûr û çire ye. Yek-do dostên te yên têgihîştî dê werin, te pîroz bikin û bibêjin, "aferîn, tu her bijî", lê bi sedan, heye ku bi hezaran kesên cahîl û nîvcahîl jî dê li dijî te bipeyivin. Cerîde dê bibe sebeba gotin û zimandirêjiyê û em ê jî pê qehr bin... Yan na, ez dizanim karê ku tu pê radibî, pîroz e. Ji niha ve, ez te pîroz dikim...

3 – De ka em piyanan ji bo Celadet Beg û kovara wî Hawar'ê rakin. Pîroz be, Celadet Beg!

Di destpêka êvareke meha gulanê ya 1932-an de, li Şamê, li mala Celadet Beg, heval û dostên wî civiyane û derketina kovara Hawar'ê pîroz dikin. Ji rojan 15'ê gulanê ye, dinya germ û vekirî ye. Hê êvara ronî ya Şamê dest pê nekiriye. Li esmanan tu ewr naxuyin. Mêvan, nas û dost, bi cil û bergên tenik ên havînê, li hewşa malê, li ser piyan in. Ne xanî bi xwe, ne jî hewş mezin e. Lê hewş serrast e; di navenda hewşê de bîreke xweşlêkirî heye. Devê bîrê bi çend qor kevirên nehît ên ferişî lêbûye. Dora bîrê, mîna bexçeyekî biçûk, rengîn e. Giya hêşîn dike, kulîlk û gul vebûne. Li pey bîrê jî, çend mêw xwe li dora caxên textîn ên kepirekî rapêçane û ber bi jor bûne. Pelên mêwan, mîna reqaseyeke welatê ereban, bi hêşînahiyeke tarî, li text, cax û dîwêr piçikîne.

Hejmara yekemîn a kovarê îro derketiye, jê hê bîhna çap û çapxanê difûre. Hin ji mêvanan rûpelên kovarê diqulipînin û lê dinihêrin. Li ser masa ku li kêleka bîrê ye, desteke kovar li ser hev in. Li ser masê çend şûşe araq, hin qedeh û di nav firaqine biçûk de penêr, zeytûn û çerez hene.

– Navê kovarê jî pir xweş e, yek ji mêvanan dibêje, Hawar... ev nav pir xweş li halê me û welatê me hatiye. Nav, hawara me ye, qîrîn û gazîna me ye, eger hin bibihîsin!

– Bira, li vê çarîna rûpela sisiyan binihêrin, yekî din dibêje, ev çiqas xweş lêbûye; Hawar hawara we ye/Deng û gaziya we ye/Jîn û zanîna we ye/Werin hawara xwe bin...

– Kovareke kurdan jî, êdî, heye, bi herfên paqij î kurdî. Êdî kurd jî ketin defteran.

Belê, gotina Yunis Axayê Sasonê û Mistefa Şahîn Begê bû, êdî kurd jî ketibûn defteran: Min hejmara yekê ya Hawar'ê derxistibû. Ew roj, ew roja hanê!.. Ma ev gotinên te yên qels û ji hîsiyata wê rojê pir bi dûr dikarin wê rojê vejînin? Wê rojê ez ji nû ve hatim dinê; zaroka min a yekem hatibû dinê, bavê min, mamên min, birayê min Safo ji xewa mirinê rabûbûn. Kalikê min Mîr Bedirxan li nik bîrê bû, (wî araq venedixwar), dikeniya û simbêlê xwe badida. Xewna min a salan bûbû rastiya wê rojê; Hawar derketibû...

Di her jînekê de hin roj û wextên nemir hene. Her jîn û qeder xwedî rengên xas in. Panzdehê gulana 1932-an ku bi rengekî çîkesor dibiriqî, rojek ji wan rojên nemir ên jîna min bû. Ez bi ser ketibûm; zaroka xewn û xeyalên min li ser masa kêleka bîrê li min dinihêrî û dikeniya. Ewçend xweş, ewçend paqij...

Min serê hespê xwe dîsan berdabû, ew taw dida. Hespê min dipekiya, lê îcar ne li çoleke xalî.. Ez ketibûm nav cîhana kitab û kovar, xwendin û nivîsînê... Hingî, piştî civîna min a dawîn a partiyê, min xwe hinekî da alî. Min guhê xwe girtin û xwe da karê nivîsîn û xwendinê. Bi zanîn, min xwe kerr kiribû, paşgotinî û xirecirên kurdan ku hîç xelas nedibûn, hew digihîştin min. Cîhana min a germ a kitab û kovaran ji cîhana bêkêr a gotin, xirecir û dexsan gelekî dewlemend bû. Wê cîhanê, heyinên wê cîhanê, eşq û afirîna edebî û çandî ruhê min ê şikestî û aloz aş dikirin.

Min bi tenê dev ji partiyê berneda, herweha dev ji Bêrûdê û şevên wê yên spî jî berda. Ez hatim Şamê û li wir, li taxa ku Rûşen û diya wê lê rûdiniştin, bi cîh bûm. Rûşena qedirgir dîsa gihîşte hawara min, wê xaniyekî biçûk ê

dutebeqe ku jê re mendere digotin, bi kirêyeke erzan, peyda kir. Xanî biçûk bû, tê de hema çi bigire, hîç têkber nîn bûn. Lê çi xem! Wî têra min, xewnên min û cîhana min a dewlemend a kitêban dikir... Tevî koça min a biçûk û nexuyayî ya Şamê, min şêweyê jîna xwe jî guhert; ez bûm hevalê şevê, bûm dostê jîna şevên dirêj û tarî. Xewnên min di hembêza şevên tarî de stariyek dîtin. Tariya şevê bû ronahiya wan, ew qulipîn ser herfan, di bin çirayeke qels û fedîkok de, min ew reşandin ser kaxizên spî... û ew kaxizên spî bûn rûpelên qewldayî yên Hawar´ê.
Gava min ew hemû rêzên şevên dirêj ên Şamê li hev anîn û rûpelên kovarê amade kirin, bi mebesta hedefên kovarê, min pêşgotineke dirêj, bi navê "Armanc, awayê xebatê û nivîsandina Hawar´ê" nivîsî. Hingî ew gotinên hanê ku hin ji hemû ew gotinên ku li dora roniya qels a çirê difiriyan û diçirûsîn bûn, hatin û mîna destpêka benda dirêj, li ser kaxizê spî veniştin; "Hawar dengê zanînê ye. Zanîn xwe nasîn e. Xwe nasîn ji me re riya felat û xweşiyê vedike. Her kesê ko xwe nas dike, dikare xwe bide naskirin. Hawara me berî her tiştî heyina zimanê me dê bide naskirin..."
Di wî danê êvarê yê panzdehê gulanê de, can û ruh ketibû wan gotinên şevên tenê û ew rabûbûn govendê. Wan li nas û hevalên hatî tika dikirin ku nas û dost li wan guhdarî bikin...

Celadet Beg, cixare di nav tiliyan de, bi rûyê geş û çavên biken, dere nik Haco Axa ku li kêleka masê rawestaye û bi du hevalên xwe re dipeyive.

– Ez hêvî dikim, cerîde bi dilê te ye, Celadet Beg dibêje.

– Çawan ne bi dilê min e, mîrê min ê ezîz, Haco Axa dibêje. Te bi ya xwe kir û tu bûyî xwedanzarok. Lê... berî ku tu niha werî nik me, em di nav xwe de dipeyivîn... Te êdî zarokên bi beden û gowde jî divên...

Celadet Beg dikene, kêfa wî ji gotinên Haco Axa re tê û ew bi dengekî bilind dikene.

– Na, na... eve zaroka min hate dinê. Eve têra min dike, ew dibêje, hele bila ev zarok bijî, bi ser lingan keve...

– Mîrê min, ji bîr meke; mala zarok tê de şeytan naçe tê de.

– Xwedê mezin e, Celadet Beg dibêje û dikene.

4

– Xwedê mezin e, Celadet Beg dibêje û dikene. No, no, monsieur Bedir-Khan, Colonel Rambot dibêje, weha mefikire. Tu pêwendiya vî îşî bi Xwedê tune. Em divê bi tevdîr bin, hûn divê bi tevdîr bin... Ma we kurdan bi xwe negotiye, "l´ennemi du perè ne devient pas l´ami du fils"?

– Mr. Kolonel, hûn bijîn... di demeke weha kurt de, hûn hînî gotinên kurdî jî bûne! Hûn bijîn... Ez nizanim ka hûn pê dizanin, lê proverbeke me ya din jî heye; "le poltron meurt a chaque instant, le brave, une seule fois..."

Celadet Beg li Helebê, li oda serekê duwemîn ê Istîxbaratê Colonel Rambot e. Digel ku serek bi xwe daxwaz kiriye ku Celadet Beg were Helebê, nik wan, ew tune, ji bo karekî girîng û acîl, çûye Fransê. Serekê duwemîn Mr. Rambot ku berî niha bi qasî salekê hatiye Sûriyê û malbata Bedirxaniyan baş dizane, xebera girîng bi Celadet Beg digihîne; rejîma nû ya Tirkiyê çend zabit şandine Lubnan û Sûriyê da ku muxalifên rejîmê bidin kuştin.

– Me ev îstîxbarat ji cîhekî pêbawer wergirtiye, Mr. Bedir-Khan, Colonel dibêje. Rejîma nû ya Tirkiyê lîsteyeke bi qasî bîst kesan çêkiriye da ku bikuje û bide kuştin. Navê we, navê yekemîn ê lîstê ye. Ew deh hezar lîra ji bo serê we didin... Hûn dikenin, lê bawer bikin ku weha ye. Berî niha bi sê salan, wan xebereke weha di rojnama Cumhuriyetê de jî belav kiribûn. Hingî hevalên me yên berpirsiyar pê ne bawer bûn, lê îro em pê bawer in...

– Est-ce que je peux fumer ici, chez vous? Celadet Beg ji Colonel dipirse ka ew dikare cixare bikişîne.

Li ser pirsa Celadet Beg, Colonel ji nişka ve, ji cîhê xwe radibe, tê nik wî û bi xwe cixareyek îkramî wî dike.

– Bien sur, ew dibêje, bêguman... li min biborin ku min ji bîr kir... Mr. Bedir-Khan, em naxwazin tiştekî bi we bibe... em naxwazin pêwendiya me û tirkan xira bibe, em naxwazin pêwendiya me û kurdan jî xira bibe û Sûriye tevîhev bibe, em naxwazin aştiya ku me bi hezar zehmetî aniye pê, xira be.

– Baş e, kolonel Rambot, ez çi bikim, çi dikarim bikim? Hûn ji min çi dixwazin?

– Bêguman, em nikarin tiştekî taybetî ji we bixwazin. Lê me diviya vê îstîxbaratê ji we re bigota û rewşa we careke din bi bîra we bianiya... Mr. Bedir-Khan, binihêrin ka hevalên me yên berpirsiyar, berî sê salan, li ser we çawan nivîsîne, Colonel dibêje û ji çavika masê dosyekê derdixe, jê kaxizeke berê hazirkirî dide ber xwe û jê dixwîne; "Celadet Alî Bedir-Khan rêberê tevgera kurdî û yek ji rêberên tevgera muxalif a tirkan e. Eger ne weha be jî, rejîma nû ya Tirkiyê weha dizane û dihesibîne. Navê Bedirkhanan aleke sor e û Mr. Celadet Ali alemdarê vê aleyê ye..."

Celadet Beg dîsan dikene û pirsa xwe dubare dike,

– Belê, lê we negot ka ez dikarim çi bikim?

– Belê min got... em nikarin şîretan li we bikin... lê hûn divê bi tevdîr bin... Ya herî baş, bêguman, ew e ku hûn Lubnan û Sûriyê terk bikin. Lê em dizanin ku we niyeteke weha nîn e. Em jî naxwazin we mecbûrî vê yekê bikin. Ez çi bibêjim?.. hertim nerin eynî cîh û deran, hertim ji eynî riyan merin û meyin, bi tenê megerin, ji bo tiştên ku hûn dikin, bila wext û saetên we yên diyar nîn bin, nehêlin kesên ku hûn nas nakin, nêzîkî we bin, bila mala we ji aliyê kesekî neyê zanîn, mal biguherînin, jixwe hûn nikarin ber bin aliyê Cizîrê û tixûbên Tirkiyê ve herin, eger hin kes bang we bikin jî, çûyinê ji heşê xwe derxin... Ez çi bibêjim? Lê,

> Kolonel gotinên xwe gotibûn... Bi zimanekî nerm û dîplomatîk. Kurd ketî bûn, bêgav ketibûn, jîn û cîhana wan bûbû hepisxaneyek, li her derî serdestên wan, efendî û xwediyên wan hebûn. Li Lubnan û Sûriyê jî fransizan

"xwedîtî" dikirin. Fransizan dixwestin bi nermahî karê xwe bimeşînin, ne zêde me biêşînin ne jî Tirkiyê eciz bikin. Lê bandûra rejîma nû ya Tirkiyê her li ser me bû. Rejîmê em ji fransizan dixwestin, xebat û kirinên me protesto dikirin, bi pere, dek û dolaban axayên nezan ên kurd dikirîn û bi wan fransiz eciz dikirin, casûs û sîxurên wan her li pey me bûn. Wan bawer dikir ku em bi karên gelekî mezin radibûn! Dengê defê ji dûr ve xweş dihat!.. Ji ber vê yekê jî fransizan rê li me, li her tiştê me digirtin, bernedidan em xwe bilivînin.

Kovara min Hawar bû stirîheke nû ya çavên neyaran. Kurdan qîmeta kovarê fahm nekiribûn û nîvcahîlên ku li der û dora me bûn, dev davêtinê. Lê neyaran girîngiya wê baş fahm kiribûn, ew pê gelekî eciz bûbûn. Kovarê dengê fetisî yê kurdî bilind dikir û di warê ziman û edeba kurdî de gavên nû, pêwist û girîng davêtin, bîhn û nefeseke nû dida kurdî. Ev deng diviya bihata birîn. Hesab û plan ev bû...

Kovar ne bi dilê fransizan jî bû. Wan sansoreke dijwar li ser kovarê danîbûn, tevî ku kovar ji siyasetê gelekî bi dûr bû, wan her hejmara kovarê, rêzên wê yên ku di şevên dirêj de li hev hatibûn, kontrol dikirin û piraniya caran hin rêz, hevok, gotin jê derdixistin. Ji bêyî bêdeng qebûlkirinê, min dikarîbû çi bikira? Şêrê girtî û ketî yê qefesê dikare çi bike?.. Lê niha, bi gotinên Mr. Rambot, tehdît girantir bû. Mirina ku jixwe her li dora min bû û her carê ezîzekî dilê min dibir diyarê rehmetê, niha ketibû pey min. Gava fransizan bangî min kirin û ez, tevî du hevalên xwe, li trênê siwar bûm û hatim Helebê, min fahm kir ku tiştekî gelekî cidî li pêşiya min e. Li Helebê, bajarê xweş ê spî, ez çûm û li Hotel Centralê bi cîh bûm. Berî ku ez herim nik fransizan, min hin giregirên kurd, asûr û ermenan dîtin. Wan haya min bi tehdîtê gîhandin. Berî ku fransiz bibêjin, wan hevalan, di şîveke yekta ya aşxaneyeke navdar a Helebê de, daxwaza dilê xwe gotin; ez diviya ji Lubnan û Sûriyê derketima û biçûma Awrûpayê... Rast e, eger ez biçûma Awrûpayê, ez ê, heye ku, ji tehdîdan rizgar bûma, ez ê ji xirecir û berberiyên bêwest û bêrawest ên kurdan bi dûr ketima, lê ma min ê bikaribûya

kovareke mîna Hawar'ê li wan deran biweşanda? Eger min bikaribûya biweşanda jî, kî dê ew bixwenda?.. Û umrê min gihîştibû çilî. Min ê bikaribûya, careke din, li hember pûk û seqemên bayên xerîbiyê xwe rabigirta? Û di ser de, tevî dersên dil û ruh, ez ji Ovidius, yek ji mamostayên jîna min a mihacir, vê yekê jî hîn bûbûm; jîna însan û însaniyetê bi xewn û xeyalan girêdayî bû. Eger însan û însaniyet hê jî, tevî her celeb misûbetê, dijiyan, ew bi xêra xewn û xeyalan bû. Şam û şevên dirêj ên Şamê bûbûn kozika xewn û xeyalên min ên afirîn û avakirinê. Min hê gotina xwe ya dawîn negotibû, xewn û xeyalên min hê nemiçiqîbûn...

– Çavê me, bi teqdîr, li ser xebata we ya li ser zimanê kurdî ye, Colonel Rambot dibêje û gotina xwe temam dike.

– Merci, Mr. Rambot, ez jî alîkarî û nermahiya we teqdîr dikim.

– Mr. Bedir-Khan, sala bê, em ê li hemû dinê salvegera şoreşa Fransê pîroz bikin. Bi wê munasebetê, em ê li Lubnan û Sûriyê jî hin tiştan li dar xînin. Em dizanin ku hûn dilsozekî yekta yê şoreşên Franse û ronesansê ne. Em ê haya we pê bigihînin û em hêvîdar in ku hûn ê jî bên alîkariya me.

– Bi kêfxweşî...

5 – Bi kêfxweşî... Şev e, şeveke dirêj û çiksayî ya taxa Salihiyê ye. Şam, bajarê kevnare yê Rohilatê rojeke bi keft û left li pey xwe hiştiye û ketiye xewê. Perda bêdengiyê bi ser Şamê de girtiye. Ji dengê dengbêj pê ve, bi tenê dengê bayê tenik, ji der ve, tê. Kengê ye? Kîjan wexta şevê ye?.. Kî pê dizane! Şev gihîştiye nîvî, heye ku jê qulipiye jî. Lê tiştekî heye; stêrkên Kerwankuj û Qurux hê neçûne ava, ji pencerê, hê roniya wan dixuye. Û ezana destê sibê hê dest pê nekiriye. Yanê hê bajar hişyar nebûye û wexta xewê nehatiye; hê jî Celadet Beg, di oda jorîn a xênî de, li pey gotinên ku xwe li hilbîna çira biçûk girtine, ye.

– Bi kêfxweşî, ez ê careke din lê guhdarî bikim, ew dibêje û xwe hinekî dide hev. Lê tu jî, hinekî girantir, bibêje. Ez pê re nagihêm...

Celadet Beg û dengbêjê wî Ehmedê Fermanê Kîkî, di wextên razanê yên bajêr de, hê jî rûniştine û li stranên kurdî hûr dibin. Ehmedê Fermanê Kîkî dibêje, gotinên kevn ên kurdî, mîna mercan, li pey hev rêz dike, Celadet Beg jî dinivîse, wan dike tîp, hevok, rêz. Ehmedê Fermanê Kîkî, bi awaz û dengê xwe, gotin, dewr û dewranên jibîrbûyî yên kurdî bi Celadet Beg digihîne. Ew ê jî wan, mîna rêzên nivîsandî, di Hawar'ê de, bi kurdên heyama salên 1930-an bigihîne.

Ehmedê Fermanê Kîkî, dengbêjê dewr û dewrandîtî, xwediyê dengê mîna qedîfe, çavên xwe digire, serê xwe, bi hêdîka, dihejîne û dibêje; Dilo lo!... Vê sibekê xelkê min î delal çû welatê xerîbiyê... Kesek li mala tu nîn e, w'ezê sebra dilê xwe pê bînim... Derdê dilê min pir in, şevê kanûna şevine dirêj in... Ez ê rabim lêwik li dergûş xînim... Ji derdê dilê xwe re rebenê, bilorînim, bilorînim, bilorînim... Hêstirê xwînê, ser sê biskê dişê, hinarê rûka bibarînim... De bajo emrê dilê min pê re...

– Hêstirê xwînê... ez pê re nagihêm... ji kerema xwe, wan herdu rêzên dawîn dubare bike...

Dengbêj dibêje; hêstirê xwînê...

Celadet Beg pişta xwe daye dîwêr, çogên xwe ber bi sînga xwe kişandiye û li ser textê xwe yê razanê rûniştiye. Wî defter eke mezin daniye ser çogên xwe û bi pênûseke zirav û dirêj gotinên dengbêj dinivîse. Çavên wî li ser defterê, guhên wî li ser dengbêj e. Deng û gotinên dengbêj, beden û ruhê wî vedigire, ew pê re dere. Mîna pêlên derya, deng, car bi car, bi ser wî de tên. Mîna qiraxên avê, beden û ruhê wî pêlên dengan werdigirin. Hemû dîqet, hemû bihîstiyariya wî li ser dengan e. Ev deng divê winda nebin, tu kitekitên wan ji bîr nebin. Celadet Beg divê wan qult bi qult vexwe, sîng û bedena xwe bide ber pêlên wan da ku bikaribe bikeve nav cîhana wan, bi wan re bibe yek, bikaribe yekîtiyeke abadîn, ebedî û edebî bîne pê.

Dengbêj li ser textê razanê ku li hember textê Celadet Beg e, rûniştiye, çavên xwe girtine û bi dengekî zîz û nerm, dibêje; dengan ew li hespekî rewan ê mîrên kurdan kiriye û ew birine berî, deşt û zozanên welêt, nik konên eşîr û koçerên kurdan. Ew ji şeva reş a Şamê çûye şeveke ronî a welêt. Di bin şewqa heyveronê de, li ser hespê çîrokan, ew difire. Wî çavên xwe girtine, guhê xwe daye ser pejn û dengên dewr û dewranên eşîran. Bayekî sivik ê destê sibê rûyê wî mist dide, bîhnên wext û heyamên koçeran di navbera mûyên simbêlê wî re xwe bi difnên wî digihûnin.

Dengbêj dibêje; li ser hespekî rewan, bi leza bayê sibê, di bihur, gelî û newalên tarîxê re derbas dibe...

Celadet Beg jî dinivîse; bi hemû quwet û dîqeta xwe hewl dide da ku leza bayê sibê yên dewr û dewranên bihurî biqulipîne ser gotinên nivîskî...

> Şev bû, me bang şevê kiribû. Şev hatibû, -ji bo dîlana keserkûr a tarîxê, nalîna dewr û dewranan û serhildana ruhê şikestî. Ba bû, şevê bang ba kiribû. Ba hatibû, -ji bo hevaltiya dengbêjê Hawarê, şahîdiya deng û gotinên kevnare û hevkariya vejandina gotinên mirî. Ba û şev ji kûrahiyên tarîxê, ji pêlên behrên spî û reş û bilindahiyên zozanan hatibûn û mîna reqasa herî bedew a çîrokên erebî, xwe li dora dengê Ehmedê Fermanê Kîkî li ba dikirin. Stêrk hê jî diçirûsîn û bi kêfxweşî li best û hesta ba, şev û Ehmedê Fermanî Kîkî temaşe dikirin. Ronahiya wan, bi qasî mistekê bûya jî, ji pencerê, xwe bi rûyê dengbêjê min, hevalê min ê nû yê qederê, digihand. Rûyê wî, bi ronahiya saf û paqij a stêrkan, mîna rûyê zarokekî dergûşê dixuya. Yan jî mîna rûyê lehengekî wan stran û destanên ku wî digotin.
> Ehmedê Fermanê Kîkî ku di kovara min de, bi navê "Dengbêjê Hawar'ê", bi nav dibû, bi rastî jî, lehengekî ji dinya lehengên stranan bû. Haya wî ji dinê, ji bayê kambax ê felekê nîn bû. Wî nizanîbû ka pere çi ye. Çavê wî ne li mal û mulkê dinê, ne jî li hebûn û mîratên însanan bû.

Dinya wî stran bû, gotinên stranan bû.
Hê di gera min a yekemîn a 1919-an a welêt de, min navê wî bihîstibû. Ew dengbêjekî yekta yê eşîr û malmezinên kurdan bû. Lê gava ku min koçî Şamê kir, kozika xewn û xeyalên xwe li wê mala dutebeqe veda û dest bi weşîna kovarê kir, min biryarek stend; min û Hawar'ê dengbêjek diviya... Çend dengbêjên ku dikarîbûn bibûna dengbêjê kovarê hebûn. Lê ji Ehmedê Fermanê Kîkî çêtir nûn bû. Gava 1929-an, Qedrî û Ekrem Begê Cemîlpaşa ji Tirkiyê daketin bin xetê, wan ji min re, behsa Kîkî kirin. Min dîsan navê Ehmed hildabû... Min da ser şopa wî. Mîna dengbêjên navdar, wî jî xwe spartibû çiyan. Wî dev ji dengbêjiyê berdabû û çûbû li ser xetê, yanê li aliyê Tirkiyê, li gundekî di quntara çiyan de cîwar bûbû. Piştî ku min şop hilda, di şeveke reş de, bi dizî, tevî du xortan, ez hilkişiyam jor, aliyê Tirkiyê û çûm gundê wî.
Ew şaş mabû, nizanîbû çi bigota! Mîrekî kurdan, neviyê Mîr Bedirxan, ketibû pey wî, tevî hemû tehlûkan, hatibû aliyê Tirkiyê û jê dixwest ku ew pê re biçûya Şamê!.. Îşê Mîr Celadet ne îşê aqilan bû! Di nav çend saetan de, digel her kitekitê, min jê re behsa hal û hewalê xwe, daxwaz û mirazên xwe kirin. Wî bêdeng li min guhdarî kir. Piştî ku xeberdana min a hinekî dirêj û hinekî hîsî qediya, wî kumê xwe da serê xwe, kulavê xwe avêt nav milên xwe, pêlavên xwe yên qawcik pê kirin û ji min re got, "De fermo mîrê min, em bikevin rê..." Gava em ê ji derî derketina, wî rahijt bilûra xwe, ji malê bi tenê bilûr girt. Berî ku tav li me hil were, di eynî şevê de, em dîsan daketin binê xetê, aliyê Sûriyê... Hevaltiya min û Ehmedê Fermanê Kîkî welê dest pê kir û heta koça dawîn a axretê dewam kir. Ji wê şevê û pê ve, gotinên kevn û bijarte yên Kîkî, tevî musîka Osmanî, Mahler û Emû Qalsûmê bûn neqşên jîna min.
Ew gotinên Kîkî... ew gotinên zêrhêlî ku diçirûsîn, ku ji xewna sedsalan hişyar dibûn û vedijiyan. Ez ê behsa wan jî bikim, behsa wan û bilûra Kîkî... belê bêyî wan, Bîra Qederê nayê hûnandin...

– Em divê li wan çend rêzên dawîn ku te dubare kirin, dîsan, vegerin...

– Bavê min, kalikê pîrika min, Ehmedê Fermanê Kîkî çavên xwe vedike û dibêje, bîhna min çikiya, te bîhn li min çikand... De bisekine, ez hebkî bîhna xwe berdim.

6 Mr. Bedir-Khan, de bisekine, ez hinekî bîhna xwe vedim, Madame Rambot bi ken dibêje, merci...

– Merci pour vous Madame, Celadet Beg dibêje û Madame Rambot heta nik mêrê wê dibe.

– Mr. Bedir-Khan, hûn pir xweş dans dikin, Mr. Rambot dibêje, heta niha me ev aliyê we nizanîbû...

– Heyret! Îstîxbarata Fransê bi nav e, min jî welê bawer dikir ku hûn bi her tiştê min dizanin!..

– Non, non, ne welê ye, zêde dikin... Her çi be jî, em, ez û xanima min, hevalên din, bi hatina we pir kêfxweş in. Em dizanin ku hûn gelekî qîmet didin şoreş û fikrên şoreşên fransizî.

– Na, ez qîmet nadim wan... ew perçeyên jîna min in, ez, xwih û birayên min, em bi wan fikran mezin bûn, perwerde bûn. Li Stembolê, li mala me, hem dengbêj û çîrokbêjên kurd hebûn hem jî murebiye û mamosteyên fransiz. Em bi çîrokên Mîr Mihemedê Hekqarî û yên Lafontaine diketin xew. Na, ez qîmetê nadim wan, ew xewnên min in; xewnên siyasî û civakî yên biserketin û serfiraziyê, hebûn û însanbûnê... Merci...

Celadet Beg qedeheke nû ya tijî ya şampanyayê ji garson werdigire û dîsan li koma zabitên fransizan û jinên wan vedigere,

– Bi musada we, ji bo fikrên şoreşên fransizî...

Li ser kolana mezin a Salihiyê, di salona herî mezin a Sûriyê de, desthilatên Sûriyê, fransiz, salvegera şoreşa Fransê bi baloyeke mezin pîroz dikin. Tevî ku baloyê hê nû dest pê kiriye, salon heta dev tijî ye. Zabitên fransiz bi kincên xwe yên paqij ên eskerî; dîplomatên welatên dinyê yên li Lubnan û Sûriyê, bi smokîn

û kincên dîplomatîk ên reş; tucar, karbidest, zane, ronakbîr, nivîskar, şêx, beg û merivdewletên Sûriyê, bi taximên kincên nû, hazir in. Jin û xanim ên baloyê ku piraniya wan ewrûpayî ne, bi cil û bergên rengîn ên salonên moda yên Awrûpayê, rengekî taybetî didin baloyê. Her çar aliyên salonê bi rengên ala Fransê xemiliye. Orkestrayeke fransizî musîka valsên fransizî lêdixe. Garsonên ereb û kurd, di destên wan de siniyên biçûk ên xwarin û vexwarinan, li dora mêvanan digerin.

Celadet Beg, bi kincên nû yên reş, gomlegeke spî û qirawateke xweş a reş, bi porê biriyantîn û şehkirî, hinekî serxweş, hatiye baloyê û şoreşên fransizî pîroz dike.

– Gava ez zarok bûm, Celadet Beg dibêje, hingî kekê min Sureya ku niha li Kahîrê dijî, li Galatayê, li Mekteb-î Sultaniyê, bi fransizî, dixwend. Rojekê wî du afîşên fransizî anîn û dan min û birayê min Kamuran ku niha li Parîsê dijî. Min afîşa xwe hilda ser dîwarê oda xwe. Li ser afîşê wêneyeke J.J. Rousseau hebû. Di bin wêna Rousseau de jî darekî mezin û dirêj hebû. Li ser gowda darê bi herfên fransizî, peregende, weha hatibû nivîsîn; liberté, force, verité, justice, union... Hê jî ew tên bîra min. Hê jî ew xewnên min in, hê jî xewnên jîna min in.

Piştî gotinên xwe, ew qedeha xwe dîsan dibe devê xwe û wê heta dawî wedixwe. Bi qasî kêliyekê, ew li dora xwe, şêniyên baloyê dinihirê û li zabitekî û jina wî ku li hember wî sekinîne û lê guhdarî dikin vedigere û bi kîbarî, dîsan bi fransizî, ji jinikê dipirse,

– Madame Krovere, gelo hûn dansekê bexşî min nakin?

– Avec plaisair, jinik dibêje û tê, dikeve milê wî.

Ew herdu, bi hev re, ber bi aliyê cîhê dansê derin.

> Wê êvarê tu kêmaniyên min ji mêvanên din nîn bûn; bejn û bala min dirêj (1.85!.. hinekî dirêj!), kinc û lixwekirina min xweş, nû û lihevhatî, serê min, bi bîhna misk û embera jinan û bi konyak û şampanyê, hinekî, mest bû. Min dans dikir, tevî jinên fransiz ên nerm, li gora ahenga

musîk û dansa ku min ewçend jê hez dikir, bedena xwe, bi ûsil, dilivand. Min bêriya dansê û şevên welê kiribûn. Lê wê şevê, di wê baloya şên û geş de, ez ne bawer im ku haya kesî ji rewşa min a kambax hebû. Bêgavî û neçariyê dîsan nefes li min çikandibû. Ez mîr bûm, "prince" bûm, (di rûpela dawîn a kovarê de jî weha nivîsîbû; Emir Djeladet Aali Bedir-Khan), gerînendeyê kovara yekta ya kurdî Hawar'ê bûm. Lê di berîka min de, pirî caran, pereyê cixarê nîn bû. Pere nîn bû, ji bo hîç tiştekî nîn bû. Min hemû bendên kovarê, di şevên dirêj de, bi qelama reş dinivîsîn. Agir bi pêçiyên min diketin, pêçî hemû dibûn birîn. Lê çare çi bû? Daktîloyeke nû, bi navê Smith Premier, hatibû bazara Salihiyê. Her cara ku ez û hevalên bi min re, daketana sûkê, ez ê biçûma û min ê li wê daktîloyê binihêrta. Her car... Lê pere nîn bû ku min ew bikiriya. Rêzkirina rûpelên kovarê gelekî biha bû. Ji ber ku kovar, bi piranî, bi tîpên latînî dihate weşandin û li Sûriyê, kesên ku bi tîpên latînî bizanibûna, nîn bûn. Da ku min bikaribûya buhayê rêzkirina rûpelan hinekî kêmtir bikira, ez bi xwe diçûm çapxanê û bi rojan dixebitîm. Min tîp, li gora nivîsaran, yek bi yek, hildiçandin, dianîn nik hev û rûpel rêz dikirin. Carina deh saet, donzdeh saet... Çapxana Tereqî ku bi xîret û dilsozî kovar diweşand, bûbû mala min a duwemîn.

Piştî ku kovar diweşiya, keft û lefteke nû dest pê dikir, dîsan ji bo ku pere nîn bûn...

Wê rojê, berî ku ez biçûma baloyê, dîsan, heta êvarê, bêyî ku tiştekî bikeve gewriya me, me lezandibû. Hejmareke nû derketibû. Her hejmara me di navbera 500-1000 libî de derdiket. Me nikarîbû ew bişanda kitabfiroş û kitabxanên Lubnan û Sûriyê. Fransizan ev li me qedexe kiribûn... Jixwe kesên ku bikaribûna bi kurdî û di ser de jî, bi tîpên latînî, bixwendana, pir kêm bûn. Me kovar, piranî, bi dizî, dişandin kurdên aliyê Tirkiye û Iraqê. Lê pere nîn bû ku me bikaribûya zerf û zamk bikirîna û kovar pê bişandina. Ji lewre, me ew dixistin tûr û kîsên cawîn devê wan didurûn û dişandin. Wê rojê jî, ez, Rûşen ku bi xortekî ereb, Omer Malik re, bûbû destgirtî, lê hê jî dest û piyê min bû, du xortên kurd ên hêja û jîr ku hem di kovarê de

dinivîsîn û hem jî aliyê min dikirin, Osman Sebrî û Qedrî Can û dengbêjê kovarê Ehmedê Fermanê Kîkî, li hewşa malê, li kêleka bîrê, bi şerpezetî, karê kovarê bir serî. Şengê, sega min a gurêx, jî li me nobedarî kir!
Lê kesên ku bi vê şerpezetiya me dizanîbû, pir kêm bûn. Xelkê, nemaze hesûd û dexesên ku li der û dora me bûn û dev davêtin kovarê, welê bawer dikirin ku bi telisan pere, ji min re, dihat! Min ê çi bikira? Çiyayên bilind bê berf nedibûn, newalên kûr bê av nedibûn...

Celadet Beg û Madame Krovere, guhê wan li ser orkestrê, li gora musîkê gavên xwe davêjin. Ew napeyivin, musîk û dans tevgera wan bi rê dixe. Ling, tevgera dansê, libabûna bedenan, hilm û germahiya kesên ku dans dikin, birûyên zirav, çavên kilkirî û lêvên sor ên Madamê Celadet Beg bêdeng dihêle. Ew naxwaza bipeyive, bedena wî bi xwîdan, kirasê wî yê spî yê hewrêşîmî bi bedena wî ve zeliqî, ew bi dansê re dere...

Lê musîk radiweste.

– Mixabin, Madame Krovere dibêje... Pir spas, ez ê van demên dansê ji bîr nekim...

Celadet Beg, bîhnçikyayî, bi çavan spasî wê dike û wê dibe nik koma zabitan, nik mêrê wê. Koma zabitan û mêrê Madamê li çepikan dixînin... Celadet Beg ji garsonê ku derbas dibe, qedeheke nû ya şampanyayê werdigire, bi qedehê silav li wan dike û ji şampanyê vedixwe. Merivekî navsal, hinekî porweşiyayî, simbêlqît û zerik, li nik wan e. Ew jî, bi serî, silav dide Celadet Beg.

– Ez Wehbî Beg bi we bidim nasîn, Loynant Krovere dibêje. Charge d´affairê Tirkiyê... katibê yekemîn ê balyozxana Komara Tirkiyê... û Mr. Djeladet Aali Bedir-Khan...

– Memnun oldum, Wehbî Beg dibêje û destê xwe dirêjî Celadet Beg dike. Demek ünlü Celadet Bey sizsiniz...

– Ben de memnun oldum, Celadet Beg dibêje.

– Ha, işte bizim hanım da geldi, katibê yekemîn dibêje, onu sizinle tanıştırayım, Celadet Bey...

Ji nişka ve, jinikeke gelekî xweş, pordirêj, li kêleka Celadet Beg dixuyê. Celadet Beg lê dinihêre. Çav... çavên reş... Ew van çavan dinase, van ji derekî dinase... Lê ji ku? Bejn, bejn û bal... Na! Nabe!.. Celadet Beg serxweş e, çewt dibîne... Lê... Belê... belê... ew e;

– Canan!

– Celadet!

– Canan!..

FOTOGRAF 12

Evîn; xewna abadîn, bihuşta ruh, lê dûr û nediyar...

1 Sal 1935 e. Li pişta fotografa donzdan a Bîra Qederê, bi jimarên erebî, hatiye nivîsîn; Belê, sal 1935, ji mehan sibat, ji rojan yekşemî ye.

Sal diqulipin, umrê Celadet Alî Bedirxan û rûpelên romana Bîra Qederê, mîna her umrê têkel û kozmopolît, carina bi lez, carina aram, digihîjin navenda salên sîhan.

Salên sîhan; heyamên nû, gavên nû, hêviyên nû û derd û keserên nû.

Salên sîhan; dirêjahiya şevên reş, bêdengiya tariya şevê, karkeriya gotinên mirî û windabûyî yên kurdî.

Û tenêtî... di nav xelk, şênî û xisman de tenêtî...

Salên sîhan; biryarên bingehîn ên jiyanê.

Di fotografa duwanzdemîn a Bîra Qederê de du kes hene; Celadet Alî Bedirxan û dotmama wî Rûşen. Herdu, li kêleka hevûdu, li ser riyekê sekinîne. Celadet Beg, cixare di destan de, li dûr dinihêre. Rûşen Xanim jî, bi ken, li wî. Dunya sar û seqem e. Ji ber ku hema li pey wan, tiştekî ku zû bi zû li Rohilata Navîn nayê dîtin, berf dixuyê. Belê, berf... Ew li kêleka rê sekinîne. Rê reş e, lê li pey rê, hemû hawirdor spî ye.

Berfê hawirdor vegirtiye. Tevî ku dinya sar e, ronahiya berfê germahiyekê reşandiye ser fotografê. Ronahî û germahî ji fotografê dixuyin.

Lê rûyê Celadet Beg tu tiştî nabêje. Ew bi awirê xwe yê ku êdî ji bo xwendevanên Bîra Qederê nas e, li dûr dinihêre. Vala û kûr. Û hinekî jî pojinî. Ew li çi dinihêre? Li çi difikire? Çi hîs dike? Bêguman, eger zimanê wênê hebûya, wê dê bersîva van pirsan bida. Lê fotograf, mixabin, bê zar û ziman e. Celadet Beg rawestaye, di nav pêçiyên destê rastê de cixareyeke vêxistî, destê wî yê din di berîka pantolê wî de, hinekî stûyê xwe, mîna piraniya caran, xwar kiriye û li dûr dinihêre. Heye ku şaş be, lê meriv ji rawest, awir û nêrîna wî dikare derxe ku hîsên wî têkel in. Ew difikire, lê ne li tiştekî, li pir tiştan.

Celadet Beg, merivê xwediyê jiyan û xewnên têkel, di nav hîsên têkel de ye.

Rûşen Xanim, serê xwe hinekî bilind kiriye lê dinihêre. Bi hez û bi ken. Ji fotografê baş dixuyê ku Rûşen Xanim ji rewşê razî ye. Ew kêfxweş e. Wê destên xwe, ji herdu aliyan, ber bi jêr kirine, lingê xwe yê rastê hinekî derxistiye pêş, stûyê xwe bilind kiriye û li pismamê xwe dinihêre. Çavên wê dikenin, ne bi tenê dikenin, ew dibiriqin jî.

Ew ji ku tên û derin ku? Eger meriv bi çîroka vê fotografê nizanibe, meriv nikare bersiva vê pirsê bide. Fotograf, bi tenê, kurte-dema kişandina fotografan nîşan dide, wê kurte-demê dike nemir, lê çi mixabin e ku fotograf nikare serpêhatiya wê kurte-dema kişandina fotografê bibêjê. Loma jî meriv divê bi çîroka fotografê bizanibe da ku bikaribe fotografê vejîne û zimanekî nû bidiyê. Da ku fotograf bikaribin bijîn û dest bi salixdanê bikin.

Pismam û dotmam li ser riyekê rawestane, ew ji dereke tên û derin dereke din. Belê li pişta fotografê tarîxa kişandina vê fotografê nivîsîye, lê eger ew nehata nivîsîn jî meriv dikaribû ji berfê û kincên wan fahm bikira ku wext çile ye, dinya sar e.

Kincên wan; nîşana wext, dem û salan; nîşana hez, tahm û pîvanên wan; nîşana edet û ûsilên wan, nêrîn û pêwendiyên wan.

Celadet Beg paltoyeke boz û giran, Rûşen Xanimê jî mantoyeke spî yê hinekî vekirî li xwe kiriye. Palto û manto dirêj in, heta ber lingan dadikevin. Celadet Beg pêşiya paltoyê xwe vekiriye

û destê xwe yê çepê xistiye berîka pantolê xwe. Pêşiya mantoyê Rûşen Xanimê, heta qirikê, girtiye. Ji bin paltoyê Celadet Beg, taximê kincên reş, kirasê spî û qirawatê reş dixuyin. Mîna her carê, Celadet Beg, bi gotina fransizan "kostymeke" reş, gomlegekî spî li xwe kirine û kirawatê xwe yê reş jî pê ve kiriye. Rîha wî jî mîna xwe ye; kin, kurt û qut. Porê ber bi paş şehkirî, simbêl, rîh, kincên taxim, kirawat û palto, hemû, pir xweş, li hev hatine. Hemû bi hev re tiştekî nîşan didin; rewşenbîrekî heyama xwe, ronakbîrekî şareza, bîrbir û ehlî kêf, merivekî têgihîştî û serhildar ê kozmopolît ku ruhê wî bi rengên têkel hatiye hûnandin.

Herçî Rûşen Xanim e, rawestin, nêrîn, por û cil û bergên wê jî, lihevhatî ne. Nerîna wê nerm, rawesta wê xweş, lixwekirina wê nû û kincên wê nûjen in. Bejn, bal û bedena wê, li gora ya Celadet Beg, gelekî kin û hûr e. Lê nerîna wê, bi taybetî nerîna wê, germ û bi şefqet e...

Germahî û şefqeta ku Celadet Beg di welatê xerîbiyê de li pey e, gelo di nerîna van çavên ciwan de ne?..

2 Germahî û şefqeta ku Celadet Beg di welatê xerîbiyê de li pey e, gelo di nerîna van çavên ciwan û reş de ne?..

– Canan!

– Celadet!

– Canan!..

Celadet Beg Cananê, hevala rojên Stembolê, ber bi xwe dikişîne û wê hembêz dike. Car bi car. Pihêt. Bi coş û hez.

– Canan, ew dibêje û bi xurtî li çavên wê dinihêre, Canan, çima tu napeyivî? Ev çi hal e, Canan? Ev çi qeder e, çi qedereke teres e!

– Ez çi bibêjim, Celadet, Cecoyê ruh û bedena min? Ma gotin qîma her tiştî dikin?

Celadet Beg ji stûyê wê radimûse. Lêvên wî yên qelew û şil li ser stû derin û tên. Destên wî li ser bedena tazî, hêdî hêdî, dige-

rin. Mîna ku dest dixwazin bedenê, ji nû ve, keşf bikin. Beden jî, li gora tevgera lêv û destan, xwe dilivîne. Hêdî hêdî, bi dûzan, bi hostehî.

– Canan, yara xewnan... Celadet Beg, bêyî ku serê xwe rake, dibêje. Tu divê bizanibî, herçend tu dûrî min bûyî, ewçend jî tu nêzî min bûyî. Hertim, li her derî. Li Alemanya û Munîxê, li Misir, Lubnan û Sûriyê, li her derî, tu li nik min bûyî. Çavên min bi xeyala çavên te yên reş û şêrîn dihatin girtin. Çavên min bi xeyala bedena te ya spehî vedibûn.

Celadet Beg xwe hinekî rast dike, serê xwe radike û li Cananê, li bedena zirav, xweş û spî dinihêre. Bi qasî kêliyekê, ew, bê hereket, lê dinihêre, ji serî heta jêr, ji jêr heta jor. Paşê, ew bi destê xwe yê rastê lehîfên li ser textê razanê, bi hêdîka, dadixîne erdê.

– Piştî evçend wext, evçend hesretê... tu tişt divê bedena te veneşêre... tu tişt... nêzîkahî û dûrahiya bedena bêrîlêkirî... Ma tu dizanî ew çi agir e, ew çi pizot e ku bi bedena merivan dikeve?..

Celadet Beg, cîhê xwe rast dike, xwe hinekî din nêzîkî Canana ku dirêj bûye, dike, li kêlekê rûdine û bi destê xwe yê rastê bedena wê mist dide, destê xwe, hêdî hêdî, li ser bedenê digerîne. Û ew li çavên wê, li kûrahiya çavan dinihêre.

– Min tu ji çavên te nas kirî... Tevî ku konyak û şampanyayê ez sermest kiribûm û ewçend xelk li dora me bû, min tu nasî... Ji çavên te yên reşik... Gava min çavên te yên ku mîna heyveronê dibiriqîn, dîtin, min tu nasî. Te şekl û şemala xwe guhertiye, por guhertiye, lixwekirina xwe guhertiye, lê çavên te yên kildayî her mîna xwe ne, ew neguherîne... Lê piştî evçend salan, ma me dê weha hevûdu bidîta?.. Tu, jina dîplomatekî dewletekê ku li pey qesta min e. Ez, neviyê Mîr Bedirxan, kurê Emîn Alî Bedirxan, prince Djeladet Aali Bedir-Khan, ku bûye derketî û li welatên xerîb li pey stariyeke biçûk û dozên mezin e!

Welê bû, doza ku ez pê rabûbûm, mezin bû, lê ez muhtacî stariyeke biçûk bûm. Neçarî, feqîrî û bêgavî, dîsan, li dora min bûn. Û Canan jî, mîna gula topa axirzemanê, bêxeber, bêhay, hatibû û di navenda mal, war û jîna min de teqiyabû! Ez û Canan, li welatekî xerîb, li Sûriyê... Çîrok dirêj e, pir dirêj. Rûpelên Bîra Qederê têra vê çîroka balkêş nakin. (Rojek ji rojan, eger tu, dîsan, li wan rojan vegeriyayî, hingî tu dikarî romaneke xweser li ser vê çîroka me binivîsî.) Lê çîroka me di nav kor-dîplomatîka Sûriye û Lubnanê û kurdên Sûriyê de belav bûbû... Heke ez kitekitan li aliyekî bihêlim û werim ser esasê, kurtebiriya çîrokê weha bû; min ji hin heval û dostên xwe hin pere deyn kirin û piştî gelek zehmetiyan, Canan hilda û çûm Lubnanê, Bêrûdê.

Du xortên kurdên Lubnanê ku li Bêrûdê, li Uniwersîta Amerîkayê dixwendin û gelekî jîr bûn, ji bo me, min û Cananê, li taxa herî xweş a Bêrûdê, Sursokê ku li ser girê Eşrefiyê bû, di otêleke gelekî xweşik de, odeyeke xweş kirê kiribûn. Sursok û Eşrefiye hem pir xweş hem jî pir sakîn bû. Ehlê wan deran jî file û Marûnî bûn. Wan em nedinasîn û haya wan ji me nîn bû. Em li odê bûn, ji bo qesta felekê û fahmkirina dolab û çerxa ku felekê li dora me badabû, em li odê, li ser textê razanê, di nav nivînan de bûn. Me pişta xwe dabû çiya û zinaran, berê xwe jî dabû av û deryan û me hevûdu û bedenên hevûdu, ji nû ve, dinasîn...

– Canan, tu bide qedrê Xwedê, çima hîç deng ji te derneket? Ji Alemanyayê, min nameyên bêhejmar şandin, qesîd şandin... çima te bersiva min neda? Çima tu winda bûyî?

Celadet Beg nefeseke kûr ji cixara xwe dikişîne, dîsan, li çavên Cananê dinihêre û jê dipirse, pirsan li pey hev dibêje.

– Ma qewlê me ne welê bû ku me dê xwe bigîhanda hev, -digel her tiştî, tevî her celeb musîbet û belayê?

– Mon cher, Canan balîfa Celadet Beg jî dixe bin serê xwe û dibêje, niha ez çi bibêjim jî vala ye... Qeder...

– Cananê, delalê... çawan qeder? Bi qasî ku ez te dinasim, ez dizanim ku tu ewçend bi qederê ne bawer î... Qedera çi, Canan?

– Sevgili Ceco... her tişt bi leza birûskê hat. Sala ku tu û Kamuran çûn û we terkî Stembolê kir, 1922 bû. Piştî çûyina we, rejîma nû ya Mistefa Kemal Stembol jî bi dest xist. Di 1923-an de jî fermana we a te, birayên te Sureya û Kamuran û bavê we rabû. Deriyê vegerê li ser rûyê we hate girtin, riya vegera we hate birîn. Ez zaroka sirgûnê me, tu dizanî, bav û diya min muhacîr in. Çavê min ji sirgûnê, ji welatên dûr û xerîb, ji jiyaneke nenas ditirse. Tu jî xwediyê dozên mezin û şoreşger bûyî. Paşiya te birî, pêşiya te nediyar bû. Ez boşnak, tu kurd, zimanê me tirkî, welatê me nediyar... Ez tirsiyam Ceco, ez tirsiyam... Min bi tîrên xedar ên tirsê evîna dilê xwe kuşt... kuşt...

Canan herdu destên xwe dibe rûyê xwe û digirî, bi deng, bi qîrîn, digirî...

3 Canan herdu destên xwe dibe rûyê xwe û digirî, bi deng, bi qîrîn, digirî...

– Megirî delalê, Celadet Beg, bi xwe jî kelgirî, dibêje.

– Sevgili Ceco, ma tu bawer î ku meriv dikare her roj bi taya evînê bikeve, her roj ji yekî nû hez bike? Ez bi taya evîna te ketim, min ji te hez kir û hew... hew... Piştî te jî min jiyaneke hebû; ez jiyam, zewicîm, ketim nav refên şêniyan, bedena min nêzîkî li bedeneke din kir, destê yekî din li ser bedena min geriya, bîhn û hilma yekî din ji dora min fûriya... lê evîn li min heram bû, hezkirineke evînî ji min bi dûr bû, taya evînê, careke din, ruh û bedena min venegirt. Ji ber ku tu hebûyî, di kûrahiya beden, can, ruh û dilê min de tahm, deng û pejnên te hebûn... Ceco... bi dû te re, min fahm kir ku evîn xewneke abadîn e, bihuşta ruh e. Bi dû windabûna wan re, min ev yek fahm kirin...

– Çima, tu çima zewicî, Celadet Beg ji qahwa xwe qultek vedixwe û dibêje, çima?.. û çima bi yekî dîplomat re?

Canan bi destınalê hêstirên çavên xwe paqij dike, bi qasî bîskekê, bi nalîn, li wî dinihêre û paşê nêrîna xwe jê dizivirîne û li derya û pêlên spî yên deryayê dinihêre.

– Ma tu Tirkiyê, welatên şerqê nas nakî? Ez ê çawan bi tena serê xwe bûma û rehet bijiyama? Ma di civata mêran û simbêlboqan de, jin dikarin weha serbest û tenê bijîn? Min teseliya xwe ji te birîbû, hew baweriya min bi pêşeroja me hebû. Min kozeke agir berda dilê xwe û biryara zewacê da... Wehbî nasê bavê min bû, boşnak bû, têgihîştî, nerm, bêdeng û medenî bû... û wî evîn û hezkirineke xurt jî, ji min, nedipa. Wî tiştekî ji jiyana min a bûrî, ji min, nedipirsî. Loma ez pê re zewicîm. Û min her tişt, ne bi tenê tu, her tiştê jiyana xwe ya berê terk kir. Weha hîn çêtir bû, ji bo her kesî, her tiştî. Eger tu, di wê şeva baloyê de derneketiyayî pêşiya min, ev jiyana nû dê, di keser û bêdengiya xwe de, dewam bikira. Lê tu derketî û hatî!..

– Tu dibêjî ku Wehbî Bey merivekî nerm, bêdeng û medenî ye... Lê ew dixwazin min bikujin, bidin kuştin. Wan lîsteyeke kesên muxalif hazir kirine da ku van kesan bidin kuştin. Û di rêza yekemîn a lîstê de navê min heye...

– Na, Canan li Celadet Beg dinihêre û dibêje, na, ez ne bawer im. Ne Wehbî ne jî yên din tiştekî weha nakin. Ne ji vê lîsta ku tu behs dikî, lê haya min ji lîsteyeke din heye; lîsta kesên muxalif ku diviya biketina ber efûya ku Mistefa Kemal û hevalên wî difikirîn. Navê te tê de hebû, tunebû, ez nizanim. Lê lîsteyeke wan a weha hebû.

– Çîroka efûya wan jî, mîna çîrokên Lafontaine in; derew bû, jê tiştek derneket, Celadet Beg bi ken dibêje û rûyê xwe ber bi deryayê dizivîrîne û li dûr dinihêre.

Di rojeke xweş a bihara Lubnanê de, danê êvarê, Celadet Beg û Canan, bi dizîka, ji otelê derketine û hatine restoraneke navdar a Bêrûdê. Restoran li ser girê Minete el Husin e. Ji rojan pêncşemî ye. Celadet Beg û Canan li bexçê hênik ê restoranê rûniştine. Bexçe sakîn e, ji wan pê ve, çend kesên din, ji wan dûr,

peregende, rûniştine. Ji dûr ve dengê tîz ê keştiyan tê. Derya şîn, pêlên spî yên derya, lengergeha boş a Bêrûdê û keştiyên têvel, ji dûr ve, dixuyin. Celadet Beg û Canan ji bo şîva êvarê hatine. Li milekî ew dipeyivin û li hev dinihêrin, li milekî jî ew li bergehên yekta yên bihara Bêrûdê dinihêrin; derya mîna xalîçeyeke yekrengî yê şîn li ber lingên wan raxistî ye. Şînahiyeke pir xweş, pir boş hawirdor vegirtiye. Dar, daristan û dehl, bi keskahiyeke boş, hildikişin serê zinar û çiyayên ku dor li pişta Bêrûdê girtine. Esmana bê ewr, mîna perdeyekê li ser şinahiya deryayê, bi rengekî şîn ê vekirî, dibiriqe. Lengergeh, navenda cîhana Lubnanê, mîna dayikeke dilsoz, keştiyên cihê û pirrengî hembêz dike, -yan jî wan bi rê dike.

Lengergeh; navenda çûyin û hatinê, oxir û xatirê, nêzîkî û dûrahiyê... Celadet Beg û Canan, zarokên heyamên çûyin û hatinê, hem dipeyivin, hem jî li lengergehê dinihêrin.

> Nêrîna me ne bêsebeb bû. Canan ê biçûya, wê dê, ji lengergehê, xatir ji min bixwesta û biçûya...
> Rast e, ji rojan rojeke pêncşemiyê bû. Ew jî ne bêsebeb bû. Her roja pêncşemiyê, keştiyeke nazenîn, spî û dirêj, bi nazdarî, av diqelaşt, pêl didan ber xwe û dihat, li lengergehê, lenger davêt û disekinî. Navê wê keştiyê Pierre Loti bû. Belê, xwediyên keştiyê, bi bîrbirineke yekta, navê Pierre Loti, nivîskarê fransiz, dostê welatê Osmanî û yên rohilatê, xwediyê romana "Aziyade" ku min hê di zaroktiya xwe de xwendibû, li keştiyê kiribûn.
> Keştiya Pierre Loti, her pêncşemî, ji Stembolê, ji bajarê min ê ku êdî li min qedexe bû, dihat. Pierre Loti Stembol dianî, bîhna bîra bexçê mala me ya Kızıltoprakê dianî, tahma masiyên Bospor û Xalîçê dianî, kena Mezo û nêrîna kesertijî ya Dayê dianî. Wê zaroktî û xortiya min, şev û rojên wan û siya jîna min dianî.
> Her cara ku ez li Bêrûdê bûm, roja pêncşemiyê, ez dadiketim lengergehê da ku tiştên ku Pierre Loti anîbûn, werbigirim... û piştî çend saetan jî, dîsan, pê re, silavên xwe yên germtirîn ji Stembola xwe ya germ re bişînim...

Wê roja ku ez û Canan li bilindahiyên Minet ul Husn rûniştibûn û me li lengergehê dirûhêrî, dîsan, çavê me li Pierre Loti bû. Wê dê, îcar jî, piştî hefteyekê, Canan bibira. Ez û wê, bi temamî, sîh û sê rojan, li oda xwe ya otêlê, bi hev re bûn. Me xwe dabû alî. Herkes li me digeriya tirk li wê, kurd li min, fransiz jî li me herduyan. Kesên ku dizanîbûn, em li wê otêlê ne, bi tenê sisê bûn; ew herdu xortên kurd ên jîr û dostekî min ê ermen, Mr. Papaziyan ku dostê min ê man û nemanê bû... Bêguman, wan ji kesekî re nedigotin. Heta ji Rûşenê re jî.
Rûşen ê bi wî xortê hunermend ê ereb, Omer Malik re bizewiciya û ez ê jî di zewac û daweta wan de hazir bûma. Min jê re soz dabû. Lê ez winda bûbûm!.. Rûşena reben! Ew ketibû pey min, Celadet Amca (yan jî Abî) yê xwe. Wê cîh nehîştibû, li min pirsîbû. Lê erd qelişîbû û ez ketibûm binî. Loma jî, gava ew zewicî, ez ne li nik wê bûm... (Xwedê dizane, ka hingî min di oda me de çi dikir!...) Xortan xebera zewaca wê bi min gihandibûn. Min, ji dil, serfiraziya wê dixwest. Û min dizanîbû ku gava ez ne li Şamê bûm, ew diçû mala min a Şamê, mal dida hev, gul û kulîlkên dora bîra hewşê av didan, xwarina Şengê jê kêm nedikir û danê êvaran Ehmedê Ferman, dengbêjê min ê ku min bêrî lê kiribû, dibir, digerand.
Me, min û Cananê çi dikir? Em li odê bûn... Bi tenê carina, ji bo xwarinê, em derdiketin der, yan jî, gava bîhna Cananê teng dibû, em diçûn Meydana Şehîdan, taxa ku hemû sînema lê bûn, û me li fîlmên nûhatî temaşe dikirin. Berî ku em ji otêlê derkevin, me li kovara "Réveil" dinihêrî, tê de fîlmeke nû hildibijart û paşê jî, bêyî ku kes me bibîne, em diçûn û diketin salona tarî ya sînemayê. Piraniya caran, me fîlmên Marlene Ditrecht û Greta Garbo hildibijartin. Ji ber ku Canan bi wan dima! Fîlma "Love" gelekî tesîr li me kir. Garbo tê de di rola Anna Karenina´yê de bû. Garbo bûbû Canan, Canan bûbû Anna Karenina!.. Piştî fîlmê, bîskeke dirêj, Canan giriya. Fîlmeke din ku tesîr li me kir, "Mata-Hari" bû. Serpêhatiya Mata-Harî û bûyerên fîlmê ku di ode û korîdorên dîplomatan de derbas dibûn, dîsan, li jîn û qedera me dihat!..

Ez çi bibêjim?.. Canan ê biçûya, êw ê li keştiya Pierre Loti siwar bûba û terkî min, mêrê xwe Wehbî Bey, Şam, Bêrûd û welatê germ ê rohilatê bikira...

– Canan, ev defter tê bîra te, Celadet Beg dibêje û ji berîka çakêtê xwe deftera reş û biçûk derdixe. Te ev dabû min, li Stembolê, li bajarê xortiya me...

– Celadet... Sevgili Ceco... Tu agir bi kezeba min dixînî...

– Ji roja ku te ev defter daye min, ew hertim li nik min e, ew şahîda jîn û hesreta min e. Tê de gotinên min, gotinên qels ên serpêhatiyên min û gotinên yekta yên Ovidius hene. "Para evîndaran bi tenê ev e; dilsojiyeke bêpayan û kêfxweşiyeke kin û kurt..." Ovidius weha dinivîse, Canan...

– Xwezî her tişt di destê meriv de bûya, xwezî meriv bi xwe bikaribûya qedera xwe binivîsiya!.. Lê nabe... em çi jî bikin, nabe... Loma jî weha hîn çêtir e.

– Ez ne bawer im ku weha hîn çêtir e... û ez dizanim tu dê paşê poşmam jî bibî... lê heke tu niha weha hîn çêtir dibînî, bila mîna te be.

– Nabe, Ceco, nabe, ez hew dikarim ji te re bibim yar, hew dikarim li van deran bimînim, hew dikarim ji bajarê xwe Stembolê derkevim... nabe... evîndarê ruhê min, nabe...

Celadet Beg bersivê nadiyê, bi tenê ew li dûr dinihêre û guhê xwe dide ser dengê keştiya ku hêdî hêdî ji lengergehê vediqete.

4 Celadet Beg bersivê nadiyê, bi tenê, ew ji pencerê li dûr dinihêre û guhê xwe dide ser dengê bilûra ku hêdî hêdî bîr û heşê wî ji Şamê vediqetîne û dibe welêt, welatê xeyalan...

– Ev awaza strana Memê Alan baş e? Ehmedê Fermanê Kîkî bilûra devê xwe, dîsan, dide alî û ji Celadet Beg dipirse, baş e? Bi dilê te ye?

– Pir baş e, pir bi dilê min e, Celadet Beg dibêje û dîsan vedigere ser deftera ku li ser çogên wî ye.

Şeva Şamê dest pê kiriye. Roj û êvar qulipîne ser şevê. Stêrkên qels şevê, çiraya reben oda kata jorîn a Celadet Beg ronî dikin. Şam radizê, taxên kêf û henekê yên Şamê vala bûne, însan radizên, însaniyet radizê. Di vê wext û dema razanê de, du însan, du kurdên derketî, mîrekî kurdan û dengbêjê wî, di hembêza şevê de, bi lorîna bayê bakur ê Zerya Spî, di bin ronahiyeke pir qels û neçar a çirayeke kevn de, li bilûra hezar salan a kurdan dixînin, li bilûra çiya û zozanên welêt guhdarî dikin û bilûra ku nîşana tarîxeke kevnare ye, dinivîsin.

Dengbêj li bilûrê dixe; bilûra dirêj, zirav û narîn tê ziman, evîn û evîndariyê, hez û hezkirinê, veqetîn û hesretê, derd û keserê tîne zimên. Pêçiyên dengbêj, bi hostehî û hunermendî, li ser qulikên bilûrê digerin; dijîtî û berberî, dexesî û hesûdî, dek û dolab, fîtne û fesadî di navbera qulikan de derin û tên. Mirin di navbera pêçiyan de digere.

Mîrê derketî, gerînendeyê kovara Hawar'ê, guhê wî li ser dengê nerm ê bilûrê, pênûs di destan de, li ser kaxizê spî dinivîse; Bilûra min a şîrîn / Tu di sariya sibehê / Û hingûra êvarê de / Hevalê bêhevalan, / Destbirayê şivan û dilketiyan î. / Dengê te, / Hêstirên dilên xemgîran, / Silava ji hev-veqetiyan. / Girîn û zarîna dilketiyan / Tîne bîra min. / Bilûra min tu yî, / Xemrevîna terkeserên dinyayê!.."

Dengbêj û bilûrvan devê bilûrê dibe aliyê rastê devê xwe, herdu lêvên xwe vedikişîne û bi nefeseke dirêj li bilûrê dixe; dengê bilûrê mîrê tenê û dengbêjê wî dibe kûrahiyên dewr û dewranan, nik beg û mîran, dawet û dîlanan, şer û pevçûnan, nêçîr û nêçîrvanan, egîd û şervanan... Dengê bilûrê wan davêje ser pişta mûyekî ji çîrokên "Hezar û Şevekê" û wan dibe welatê xewn û xeyalan, bav û kalan.

Mîr ji qedeha xwe ya araqa Lubnanê çend qult vedixwe, ji cixara xwe nefeseke kûr dikişîne, serê xwe ber bi jor dike, bi qasî kêliyekê, çavgirtî, difikire û dîsan vedigere ser kaxizê spî û dinivîse; "Dengê bilûra min, / Çiya û zozanên bilind, / Kaniyên

bi gul û rihan dorgirtî, / Guhê şikeft û serê zinaran / Guhdarên te ne! / Û sura bayê xerbî / Te di nav pelên darê de digerîne."

Bilûrvan nefeseke kûr dikişîne û dîsan bilûrê dibe devê xwe û lêdixe; mîr û bilûrvan, tevî dengê bilûrê, li xweşiyên cîhanê, bedewiyên bihuştê û xezebên dûjehê dinihirên. Deng, pêl bi pêl, bilind dibe. Axîna evîna qurmiçî, mirazên şikestî, pêl bi pêl, dil û ruh vedigirin. Porê direj, çavên reş ên kilkirî, awirê nerm, bêdengiya evîn û evîndarê, gav bi gav, bi dûr dikevin. Agir bi dil dikeve, pêl bi pêl. Çav tên girtin, xwîn, pihêt, di damaran de diherike. Dengê bilûrê mîr û bilûrvanê wî hildigire û dibe, bi firê dixîne.

Mîr rûpeleke nû ya deftera li ser çogên xwe vedike û dinivîse; "Bilûra min, were em ê / Bi wî çiyayê bilind re / Bi hewa kevin / Û bibin cîranê bayên xurt / Û hevalê kimtên wan / Yên bi mij û dûman, / Û tê de dengê xwe berdin / Û zarîna dengê me / Bikeve nav kortal û geliyan / Û bêcaniya erdên jêrîn bihejîne; / Û pêlên ava heftreng / Ên xemzebaz / Nalîna me bigihîne / Deşta Sirûc û Diyarbekrê; / Û beriya mêrxasên Berazan; / Û kalîna berxan, / Tev şehîna hespan / Li me vegerînin."

Bilûrvan dev ji bilûrê berdide, bi evîn û rêzdarî, mîna ku zarokekê deyne, bilûrê datîne kêleka xwe, ser textê razanê. Bilûrvan westiyaye.

> Ax, ew rojên hanê! Ax, nivîskar! Ax, nivîsandin!.. Ax nivîsandina bilûrê! Ez niha çi bikim? li ber bûyerên wan rojan bikevim? Yan jî ez wan rêzên şihîra min "Bilûra Min" bi bîr bînim û kêfxweş bim?
> Rêz xweş, lê bûyer, pêwendî û hîsên ku ew rêz diafirandin, nexweş bûn. Mirin dîsan li dora min bû. Bîhn û hilma mirinê ji nav rûpelên defterên min û rûpelên Hawar'ê bilind dibû; mamê min Xelîl Ramî li Lubnanê wefat kiribû, dostê min, hostayê rojnamevaniya min Mewlanzade Rifat Beg li Helebê miribû. Dostê min ê ezîz, hezkarê welêt, Şêx Evdirehmanê Garisî, li ser nimêjê, bi

destê nokerên dijmin, hatibû kuştin. Mamê min Evdirehman, xwedî û gerînendeyê rojnama yekemîn a kurdan "Kurdistan", li Stembolê, di nav bêdengiyeke dilsoj de, miribû. Hin dost û nasên min ên din li Stembol, Paris, Bêrûd, Serê Kahniyê, Iraq û Îranê miribûn. Evîna min, "donna mia" min miribû. Xewnên min ên rojên bê ku bi neqşên evîna evîndara min ve hatibûn neqişandin, miribûn. Deftera ku evîndara min dabû min û min kurtenotên xwe tê de dinivîsîn, winda bûbû û miribû. Ez bûbûm pasevanê mirinê, dilê min bûbû geliyê mirinê. Û karê min jî, jixwe, diyar bû; bi gotinên kevn û mirî yên kurdî mijûlbûn! Gava şev dihat û perda xwe ya reş davête ser wextên razan û mirinê, min jî, di bin perdê de, miriyên xwe ji bîran derdianîn û dianîn heş û bîran... bi peyv, gotin û qiseyên mirî...

Peyv, gotin û qiseyên mirî...

Ez nizanim çima, lê te heta niha tu carê qala hal û hewalê gotinên kurdî nekir. Te qala karê min ê wan gotinan jî nekir. Lê belê, derketin û weşandina kovara Hawar'ê bi xwe, ji bo wan gotinan bû. Her çawan zêrîngerekî, bi kitekit, li karê xwe hûr dibe, ez jî, welê, bûbûm zêrîngerê gotinên windabûyî, jibîrbûyî û mirî yên kurdî. Ez, zarokê muhaciriyê, lawê muhaciran, stemboliyekî kozmopolît ku ji welatê kurdan û kahniya zimanê kurdî bi dûr, di nav ziman û çandên cuda de, mezin û perwerde bûbûm, li Şamê, bajarê şevên dirêj, ketibûm pey gotinên kurdî yên bav û kalan...

Niha nayê bîra min ka kî bû, lê di wan rojên min ên Alemanyayê de, min ji feylesofekî xwendibû, feylesof weha digot; em hatin dinê û jiyan da ku van gotinên ku li ber xeterê ne, ji bo we, xelas bikin. Ev gotin bûbûn qedera min û heval û alîgirên min ên Hawar'ê. Ez, kurdê welatê xerîbiyê ku min nikarîbû bi kurdî nameyekê binivîsanda, li Şamê, bajarê şevên bêxew, bûbûm pasevanê gotinên kurdî ku li ber xetera mirinê bûn.

Ew diviya nemirana. Gotinên kurdî, zimanê kurdî, diviya winda nebûna. Pir tişt û heyinên kurdan winda bûbûn û miribûn, bi qewlê Nietzsche, kurd bûbûn jihevketî û der-

ketî. Kurdan bi zimanê xwe nexwendibûn, nenivîsîbûn û perwerde nebûbûn. Ji bilî klasîkên kurdî û hin eserên din, zimanê kurdî neketibû defteran... Û li Tirkiyê, rejîma nû zimanê kurdî, yekcar, qedexe kiribû... Lê ziman, zimanê kevnare yê rohilatê, diviya nemira. Loma jî, hê di rûpelên pêşîn ên kovarê de min weha nivîsî; yekbûna kurdan bi yekîtiya zimanê kurdî çêdibe. Yekîtiya ziman jî bi yekîtiya herfan dest pê dike. Û min di dûmahîkê de jî weha dewam kir û nivîsî; miletên bindest heyîna xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi qeweta du çekan diparêzin. Ol yek. Ziman dudo. Lê heke ola miletê serdest û bindest yek bibe, hingî çek bi tenê ye û bend tenê ziman e... Loma jî ez di wan şevan de ketibûm pey gotinên kurdî; armanc, bendewar, erdnîgarî, bingeh, ciyok, dehker, dîrok, Jînenîgarî, pronivîs, ferhengok, zimanazîn... û bi sedan, hezaran gotinên din ku yan winda bûbûn û miribûn, yan jî di kûrahiyên stran, çîrok û destanên Ehmedê Fermanê Kîkî de veşartîbûn... Loma jî ez ketibûm pey alfabeyeke têkûz, gramereke têkûz û zimanekî têkûz.
Loma jî ez bûbûm pasevanê şevê, mirinê û gotina kurdî ya li ber xetera mirinê û min li stran û bilûra dengbêjê xwe guhdarî dikir.

Dengbêj, dîsan, bilûrê dixe destê xwe, wê dibe ber lêvên xwe û dibe bilûrvan; dengê zîz, nerm û xweş ê bilûrê wextan dixe nava hev, dewr û dewran dikevin zikê hev. Wext, dewr, tarîx, bûyer, însan û însaniyet li ser baskên stêrkên hezar salan ên şevên Şamê derin û tên.

Mîr du rêzên rûpela nû ya deftera li ser çogên xwe xêz dike, li derve, li stêran dinihêre û dinivîse; "Bilûra min, binêre û bibihîse! / Roj çû ava, / Stêra êvarê bû geş / Kolosên çiyan ên gewr / Û hewraniyên wan ên sor û zêrîn / Bûne cûn; / Û pêlên ava şevê ên reş / Ketine deşt û newalan, / Heta rûyê gir û kepezan. / Di qeraca de / Kevir piyê şevgera dixapînin, / û bêdengiya şevê de / Pêjna lingên mêrxasan tên.

Bilûrvan simbêlê xwe yê spî ba dide, zimanê xwe li ser lêvên xwe dibe û tîne, bi xwezî gewriya xwe şil dike, çavên xwe digire, qirika xwe xwar dike û vedikişîne û bi nefeseke têr, bi aheng, li bilûrê dixe; geh deng bilind dibe, geh nizm. Dengên cihê yên bilûrê, perde bi perde, xwe digihîne ruhê mîr.

Mîr, çav li ser rêzên nivîsî, bi tenê li bilûrê guhdarî dike. Bi tenê dengê bilûrê xwe digihîne wî. Mîr qedeha nîvçe ya araqê vedixwe, rîh û simbêlê xwe paqij dike û dinivîse; "Bilûra min, dengê xwe berde!! / Dinya, mîna zarokekî berşîr / Ket dergûşa xwe; / Dengê xwe berde bilûra min / Û jê re bilorîne, xema wê birevîne!! / Bilûra min tu yî!..

Stêr qelstir dibin, rojeke nû li ber zayinê ye. Hê ezanê dest pê nekiriye, hê li wan nebûye sibe, lê ji derve deng tên. Di ser dengan re, dengê bilûrê, dîsan, bilind dibe; dengê kesên ku terkî welatê xwe kirine, terkî evîn û evîndarên xwe kirine, di heyamên tarî re derbas bûne, bê cîh û şûn, war û welat mane, xwe spartine şevan, belê dengê wan û siya dengê wan, bi alîkariya Mîr, vediguhezin ser kaxizên spî. Dengê bilûrê li ser kaxizên Mîr difire; "Xemrevîna terkeserên dinyayê; / Û li rohelatî dema ku dinya hişyar dibe / Ji me re / Strana azadî û serbestiya Kurdistanê binehwirîne / Û dengê wê stranê, bila / Mîna tîrêjên rojê yên pak û zêrîn / Bikeve nav dil û guhên me / Bilûra min / Tu yî xemrevîna dilketiyên welêt...

5 Mîrê min, Mîr Bedirxan, tu yî xemrevîna dilketiyên welêt, Haco Axa dibêje û bi rêz û rêzdarî kevirê turba Mîr Bedirxan radimûse.

Yên din, Celadet Beg, kekê wî Sureya Beg, Memduh Selîm Beg, Mistefa û Bozan Begên Şahîn, Osman Sebrî, Qedrî Can, Husên Axayê Îbiş, Mihemed Zilfo Axa, Mele Ehmedê Şûzî, Husnî Berazî û hin kesên din, yek bi yek, tên û turbê tewaf dikin.

Rûşen Xanim û diya wê jî tevî wan in. Rûşen Xanimê keça xwe ya berşîr daye diya xwe û li pey mêran, bi tûlekî reş pêçayî, tê û li ser turbê radiweste.

Danê sibeyekê yê bihara 1934-an, neviyên Mîr Bedirxan û hezkarên wî hatine serdana wî. Mîr Bedir Xan di goristana kurdên Şamê, Ruknedîn de veşartî ye. Bermaliya wî Rûşen jî, li kêleka wî, li dereke, veşartiye. Mîna her ciyên din, li Şamê jî kurdan xwe spartine çiyan, hilkişiyane sîngên çiyan, pişta xwe dane çiyan û wan li quntarên çiyan, ji Salihiyê, navenda bajêr, hinekî bi dûr, taxek ava kirine. Tax ber bi gopikên çiyê bilind dibe, xanî li ser hev in. Xanî bêdûzan in, mîna koxikan, bi lez ava bûne. Ew ji xaniyan bêtir dişibin konan, konên koçeran ku dê di demeke kin de, dîsan, ber bi deverên din, koç bikin.

Li taxê gor û goristanek heye. Tax li miriyên xwe xwedî derdikeve, wan li nik xwe vedişêre. Hemû mezinên kurdan li goristanê, peregende, bêdûzan, veşartî ne. Ji şêxê terîqeta Neqşîbendî û şaîrê navdar Mewlana Xalid heta Mîr Bedirxan, hemû di quntarên çiyayên kurmancan de, di xewa ebedî de ne.

– Mîrê me, pîrê me, Memduh Selîm Beg dibêje û li kêleka gorê, li ser totikan, rûdine. Binihêre, em, neviyên te, hemû hatin. Berî niha bi şêşt û şeş salan, te ji vê dinya kambax xatir xwest. Lê ji wê rojê û vir ve, giyanê te yê pak hertim li ba kurdan e, bi wan re ye, ji wan re rêberî dike. Hemû kurd, her kurdekî, dixwaze mîna te be, li ser riya te be. Zane û têgihîştî, mîr û serekeşîr, axa û beg, mele û şêx, gundî û zehmetkêş, têkoşer û şervan, jin û pîr, herkes dixwaze li ser şopa giyanê pak ê mîrê xwe be. Tu rehet bijî.

Ji Rûşen Xanim û diya wê pê ve, yên din jî li kêleka gora Mîr Bedirxan rûdinin. Celadet Begê ku li nik kevirê gorê rûniştiye, bêdeng, bi destê xwe yê rastê, giya û nefelên ku li ser gorê hişîn hatine, jêdike. Kekê wî Sureya ku êdî por û simbêlê badayî spî kirine û westiyayî dixuyê, li hember wî rûniştiye û bi destê xwe axa gorê rast dike.

– Mîrê min ê ezîz, Haco Axa dibêje, bav û kalên min, eşîra Hevêrkan, ehlê Cizîra Botan, bi te re bûn, di xizmeta te de bûn... Bav û kalên min digotine min; tu bi quwet bûyî, xurt bûyî, hêza te qewîn, qilafetê te di şûnê de bû. Rîha te dirêj û şehkirî bû. Tu merivekî sade bûyî, te her gotiye, "Bila ehlê min ziktêr, gundiyên min xwediyê bixêriyên vêxistî bin. Bila şorba nîskan li ser êgir, nan li ser tenûrê, mîh û beran, berx û kahr li ber derî bin. Bila teyr û tûrên me azah bifirin, şêr û pilingên me serbest bipekin... daxwaza me ji Xwedayê Alemîn bi tenê ev e..." Bav û bapîrên min digotin, te ji bilûrê hez dikir, kitabxana te hebû, Birca Belek, qesra te ya navdar, ji alîm û zaneyan re vekirî bû.. Cihû û file, keldanî û êzîdî jî ehlê te bûn. Li ber çemê Dijlê, li qiraxên ava zelal, hertim dawet û dîlan bû. Agirê newrozê ji serê çiyayê Herekolê kêm nedibû. Tu bi şeref û heysiyet bûyî, te ji xwe, ji jin û zarokên xwe, ji ehl û şêniyên xwe, ji war û axa xwe hez kiribû. Te ji Rebê Alemîn û qasîtê wî hez kiribû, tu bendewarê wan bûyî. Tu ji gotina xwe re xurt, ji destê xwe re sivik û şûrê xwe re giran bûyî. Haya te ji dinê û bayê felekê nîn bûye, lê tu mîrê kurdan ê nemir bûyî, mîrê min...

Haco Axa, hinekî, radiweste, li dora xwe dinihêre, ji berîka çakêtê xwe qutiya cixarê derdixe, cixareyeke pêçayî dibe devê xwe û bi hestê vêdixe. Û ew dîsan, çavên wî li ser Celadet Beg, xeberdana xwe, bi hêdîka, didomîne, -mîna ku ew li ber xwe bipeyive,

– Mîrê min ê cîhbihuşt, em bi çîrok û efsaneyên te mezin bûn, me zariyên xwe bi çîrok û efsanên te mezin kirin. Hê jî gundiyên botî li ser te rîwayetan derdixin. Ew dibêjin, tu û Xocê Xizir hevalên hev in, hûn bi hev re li hespên kihêl siwar dibin û derdikevin seyrana welatê kurdan. Hûn li ser çem û behran derin, hûn dibin hevalên teyrên eylo û sêmîr. Tu li ser hespê xwe yê spî, bi kirasê xwe yê spî, mîna melayke û fêrîştan dixuyî. Tu hê jî têyî xewna me. Ji bilî me, neviyên te Sureya û Celadet jî li vir in. Gerek e ku tu bizanibî, em li ser riya xewna te ne...

Em li wir, li ser gorê,welê dipeyivîn... Gotinên me xweş û bêşik di cîh de bûn. Lê te dê halê gora Mîr Bedirxan jî bidîta! Kevirên gorê xwar bûbûn û yek jî şikestî bû. Axa gorê jê çûbû û hema çi bigire gor bi erdê ve bûbû yek. Hezar şahîd jê re diviya ku meriv bikaribûya di nav wê goristana biçûk de gora Mîr Bedirxan bidîta... Rêberê kurdî û kurdaniyê bi erdê ve bûbû yek... û kurdekî, ji bo Xwedê kurdekî, aqil nekiribû û gor çênekiribû...

Ez çi bibêjim?..

Heçî ez bûm, min dikir, nedikir, nikarîbû ew perên pêwist bidana hev, da ku gor bida çêkirin. (Min nedixwest, ji bo vê yekê, ji kesekî jî deyn bikira.) Dawiyê min gor da çêkirin; axa pîroz ji Cizîra Botan da anîn, kevirên nehît dan şehkirin, mermerên fireştî dan anîn, hosteyên yekta peyda kirin û li dora gorê xaniyekî biçûk ava kir. Gor bû ziyaret, bû meclîs... û roja ku lêkirina gorê temam bû, min jî wesiyeta xwe kir; eger rojekê ez bimiriyama û îmkan nîn bûya ku kurdan ez li Cizîra Botan, nik Birca Belek veşartima, hingî nas û xizmên min diviya ez li ber lingên bapîrê min, Mîr Bedirxan, veşartima... (Mixabin, me gora dapîra min Rûşen Xanima ku, li Stembolê, gava ez hatibûm dinê, bi destên xwe ez şuştibûm, nikarîbû peyda bikira.)

Kî dizane, heye ku rûpelên Bîra Qederê heta wan rojan jî herin?

Em vegerin ser wê roja serdana Mîr Bedirxan. Kekê min Sureya ji Misirê hatibû. Ew demeke dirêj, bi qasî çend salan, li Amerîkayê jî mabû, çûbû û hatibû. Wî, li wir, kitabek li ser kurdan, bi ingîlîzî, weşandibû. Wî bêrî li me kiribû û hatibû. Memduh Selîm Beg ji Antaqyayê hatibû. Haco Axa ji welêt hatibû. Yên din jî her yek ji derekî hatibûn; em bûbûn peregende û roj bi roj, ji hevûdu, bêtir, bi dûr diketin. Gerçî, bi qewlê kalemêran, cer di riya avê de dişkiya, lê bi min welê dihat ku em, hêdî hêdî, winda dibûn. Gotinên wê rojê, bêguman, xweş bûn û me pê hewcedarî jî hebûn. Lê belê, qal û behsa xewnên Mîr Bedirxan, bi tenê hêvî bû. Mîr Bedirxan, di gora xwe ya basîd de, bûbû nemir û hêvî. Ew bûbû bedewî û spehîtiya hêviyan. Lê belê ew bi tenê hêvî bû. Hêviyên pêşerojê.

Helbet her mirovî, her kesî, her gelî hêviyên rojên bê divên. Lê hêviya min bi xwe, roj bi roj, ji hêviyên rojên bê nedima. Kurdan, hal û rewşa wan cîh li hêviyan teng dikirin, ew difetisandin. Kurdan hevûdu dixwarin, di nav behra dijîtî, berberî, hesûdî û dexesiyê de, nefes li hev û hêviyan diçikandin. Çi mixabin ku hêviyên rojên bê jî bi vê edeta hevûduxwarinê û zihniyeta hesûdiya bêmane girêdayî bûn. Loma jî xewn û hêvî, bi tenê, mîna xewn û hêvî diman...

Wekî din?.. Wekî din hîç tiştekî nîn bû. Min dinivîsî, kovara xwe derdixist, rojê sê-çar qedeh konyak û du şûşe araq vedixwarin, bi qasî sîh îskanan qahwe vedixwar û du pakêt cixare dikişandin. Tiştekî din nîn bû... Lê tiştekî ku di wan rojan de ez kêfxweş kirim, zaroka Rûşenê bû. Belê, Rûşenê zarokeke mîna topa nûrê anîbû dinê. Keçikek, keçikeke şêrîn. Navê keçikê Huseyma bû. Wê rojê, Huseyma jî bi me re bû, wê jî, cara yekemîn, bapîr û dapîra xwe ziyaret kiribû.

Kesên ku hatine gorê ziyaret bikin, radibin, ji Mîr Bedirxan xatir dixwazin û ji goristanê derdikevin. Rê teng û kort in. Ew, kom bi kom, bi dîqet, ji riyên fetloke, ji çiyê dadikevin. Celadet Beg, Haco Axa, Rûşen Xanim û diya wê li pey hemûyan in. Haco Axa dikeve milê Celadet Beg da ku bikaribe bimeşe.

– Mîrê min, Haco Axa dibêje, weha nabe, em ê, paşê jî, biştexilin, lê weha nabe...

– Çi weha nabe, Mamo? Celadet Beg, bi ken jê dipirse.

– Mîrê min, te dît, kurd dibêjin; mêr bê xweyî dibin, jar dibin; jin bê xweyî dibin, har dibin. Tu pirî jar bûyî. Weha nabe... Tu dê heta kengî bê xweyî bijî? Heta kengî tu dê bi Ehmedê Ferman û Şengê re bijî? Weha nabe! em ê te bizewicînin!

– Dîsan çîroka zewacê! Celadet Beg, bi ken dibêje. Naxwe min, gelek caran, gotibû, ez naxwazim bizewicim. Şaîrê Sûriyê Ebu'l Alâ gotiye; ez îro bûme qurbanê wan kesên ku ez anîme dinê, lê kesekî din ê nebe qurbanê min."

– Ezbenî, tu Xwedê, dev ji van gotinan berde, dev ji felsefê berde. Çîroka sefîre xanimê jî êdî xelas... Salê te li ser çilan e, tu mûrekî kurdan î, tu ne li Ewrûpayê, lê li Şamê dijî.

Rûşen Xanim ku li kêleka wan dimeşe, piştgirtiya Haco Axa dike.

– Mam Haco rast dibêje, ji erdê heta ezmanan. Celadet Abî, em divê te bizewicînin. Li der û dorên me keçên zaf rind hene. Ez ê, bi xwe, ji bo te, lê bigerim. Hevalên min hene, nas û xizmên me hene. Ez ê yeka rind, xwende, biesil û biterbiye bineqînim. Eger ew ne bi dilê te be, em ê li yeka din bigerin. Lê tu divê bizewicî.

6 – Tu divê bizewicî... Berî ku Rûşen Xanim bikeve erebê, ew gotina xwe ya dawîn jî dibêje. Piştî Rûşen Xanimê, Celadet Beg jî dikeve erebê. Bi dû Celadet Beg re, dostê wî Husniyê Berazî jî dere û li aliyê pêş, nik şofor rûdine. Ereba nû bi rê dikeve. Dinya sar e, çilê 1935-an dest pê kiriye. Tiştekî ku zû bi zû li deverên Beyrûd û Şamê naqewime, îcar, îsal, qewimiye; berf bariye. Berfeke boş hemû doralî vegirtiye. Dinya spî dike û berf jî, hûr bi hûr, dibare.

Bayê danê sibê kuliyên berfê dide ber xwe û wan li hawê dizîvirîne. Kulî tên û li pencerên erebê dikevin û dihelin. Celadet Beg ji hundir li kuliyên der ku bi lez dixuyin û winda dibin, dinihêre. Rûşen Xanim jî li wî.

– Celadet Abî, em çi bikin? Tu bi vê qayil nabî, bi wê qayil nabî... de bibêje em çi bikin?

– Ka te kes nedît...

– Tu bi kesî qayil nabî.

Celadet Beg bersiv nadiyê, bi tenê dikene û kuliyên berfê nîşanî wê dide.

– Li min bibore, lê jîna merivan ne mîna ya kuliyan e. Ji merivan re mal, mulk, pêwendî, zar û zêç divên, Rûşen Xanim dibêje.

Erebe hêdî hêdî dikeve ser riya Bêrûdê û dere.

Em li ser riya Bêrûdê bûn. Min û Husnî Beg Rûşen dibir nexweşxana Amerîkayê ya Bêrûdê. Çavên wê nexweş bûn. Demînine kurt ew li wir mabû û niha jî her çar mehan carekê diçû kontrolê. Îcar em jî pê re çûn. (Diya wê hingî ne li Şamê bû, ew çûbû Baxdayê.) Jixwe ez mîna bavê wê bûm! Jixwe gelek kesî welê bawer dikir ku ez bavê wê bûm! Ma enî û bîvilên me jî ne wekî hev bûn?.. Min biryara xwe dabû; ez ê li Şamê bimama û bizewiciyama. Lê Rûşenê hê nizanîbû ka bi kê re.

Tevî ku kincên germ ên zivistanê li wan in, ew dihejin. Sar e, seqem e. Dengê ba ji der ve tê. Rê vekirî ye, lê ji bilî riyê, her der bi perda spî ya berfê hatiye vegirtin. Rûşen Xanim, hinekî din, mantoyê xwe diguvişîne ser hev.

– Rûşen, kızım... Celadet Beg, ji nişka ve dibê. Min qerara xwe da, ez ê bizewicim...

– Celadet Abi! Rûşen bi kêf dibêje, pir baş, pir baş...

– Kızım, ma tu dê nepirsî ka bi kê re?

– Bi kê re?

– Gava em, li Stembolê, zaro bûn, tu dizanî, me amojnek hebû; Amojna Sitî. Amojna Sitî her weha digot; şûr Şam, xencer mam û jin dotmam...

– Celadet Abî, pir baş, pir baş... Bi kê re, tu dê bi kê re bizewicî?

– Bi te re!

– Bi kê..... bi min re? Bi min re?

– Belê bi te re... Lê ji bo gerandina karên zewacê, min kaxiza te ya huwiyetê divê.

– Bi min re? Te gote, bi min re?..

– Heye ku çend fotograf jî pêwist bin. Ji kerema xwe, çend fotografan jî hazir bike...

– Bi min re? Bi cariyet-ul mitbax re? Bi min re?

FOTOGRAF 13

"Romana min divê bi kurdî be, mîna 'hezar û şevekê' vebêje, mîna misk û emberê, bîndar be û mîna pelên gulekê, rengîn be bibişkuve..."

1 Ew, qehremanê romana Bîra Qederê, li ber masê rûniştiye û destê xwe dirêjî kamerayê dike. Rûyê wî tirş, awirê wî sar e. Wî devê xwe vekiriye, tiştekî dibêje. Çi?

Kî dizane? Heye ku ew dibêje; bes e, bes e êdî, ev fotografên ku dibin şahîdên jîna min, ê heta kengî li pey min bin û mîna siya min her bi min re bin?

Heye ku ew dibêje; bes e, bes e bikişînin, ez westiyame, min taqet nîn e, dev ji min berdin, bihêlin, ez hinekî bîhna xwe berdim, hinekî bi tenê bimînim.

Heye ku ew weha dibêje; bes e, ji bo Yezdanê Pak, bes e, ma ev kamera, fotograf û fotografkêşî ji bo min û umrê min ê peregende îcad bûye? Ma her gava ku ez davêjim ê bibe fotografek? Ma we dil heye ku hûn bi fotografan jîna min, ji nû ve, vejînin? Ma hûn çima ji min napirsin ka ez dixwazim?

Wî destê xwe ber bi kamerayê û kesê ku fotograf dikişîne, kiriye û diqîre. Ji fotografê dixuye ku ew naxwaze ev fotograf bête kişandin. Lê fotografkêş pê li qumçika kamerayê kiriye, di nav kêliyekê de, hunera nemiriyê bi cîh hatiye, fotograf hatiye kişandin. Êdî Celadet Beg çi jî bike vala ye.

Ew li ber masê rûniştiye. Xwendevanên Bîra Qederê masê dinasin; maseyeke biçûk, hinekî dirêj, basîd. Li serê kaxiz, defter,

kitab û kovar tijî. Mîna her carê deftereke mezin û dirêj vekirî ye, pênûseke reş û dirêj li ser rûpelên vekirî ye. Çend hejmarên Hawar'ê li kêleka defterê ne. Mase mîna xwe ye. Lê hin tiştên nû li ser masê ne; şûşêyeke dirêj a konyaka yewnanî Metaxa'yê, qedeheke nîvtijî, xwelîdankeke tijî, pakêteke cixarê ya Lucky Strike, qutiyeke kibrîdê û demançeyek.

Belê, demançeyek jî, demançeyeke reş û dirêj.

Heye ku ji ber vê bergehê, ew eciz e û naxwaze fotografkêş pê li qumçikê bike. Kî dizane?

Rû, por, cil û bergên wî jî tevîhev in. Porê wî yê ku hertim ber bi paş şehkirî ye, niha, di vê fotografa 13-an a romana Bîra Qederê de tevîhev e. Rîha wî hatiye û zêde bûye, simbêl dirêjtir e. Çavên wî di kortê de ne, qermîçokên eniya fireh û yên binçavan, niha, kûrtir û pirtir in.

Herçî cil û berg in, bi tenê kirasekî dirêj ê spî dixuyê. Bi tenê ew lê ye. Bi tenê di vê fotografê de, meriv Celadet Beg bê gomleg, bê qirawat dibîne. Qumçikên pêşî yên kiras, heta ber zikê wî, vekirîne. Pirçên sîngê dixuyin.

Heye ku ji ber kiras e ku ew destê xwe dirêjî kamerayê dike û dixwaze rê li kişandina vê fotografê bigire. Kî dizane?

Her çi be jî, Celadet Beg ji vê fotografê eciz e. Bêyî ku haya wî jê hebe, fotograkêş vê fotografê dikişîne û wê kurtedemê jî dike nemir. Vê wênê ew bêhazirî "pêgirtiye." Wêne hin aliyên wî yên şexsî ku zêde naxuyin yan jî nayên zanîn, nîşan dide. Demançe li ser kovaran e, "Hawar" û demançe bi hev re ne. Şûşa dirêj vala ye, konyak hatiye vexwarin. Cixara Lucky Strike ji yên basîd û erzan e. Xwelîdanka tijî dema bihurî û cixarên bêhejmar yên kişandî nîşan dide. Mirin, fikr, nivîsîn, afirîn, xewn, xeyal, bîhntengî, esebiyet, tenêtî, sebir, daxwaz, hêvî û bîranîn li ser masa Celadet Alî Bedirxan in.

Heye ku gava ev fotograf tê kişandin, Celadet Beg li van tiştên ku jiyana wî rapêçane, difikire û loma naxwaze ku kes wî eciz bike. Ew dixwaze bi tenê bimîne, di nav fikr û gumanan de,

bi serê xwe be. Heye ku ew tiştên li ser masa wî huzûr û aramiyê didinê, di wan de ew abadînî û ebediyetê dibîne? Heye ku tenêtî û têkberên tenêtiyê, pênûs, defter, konyak, cixare û bêdengiya şevê, xewn û xeyalên wî tînin pê û jiyaneke din a taybetî ya wî, bi tenê ya wî, ava dikin? Heye ku ew pênûs, ew defter, şûşe, îskan û xwelîdank bi hezaran, sedhezaran pêlên ku di hundir û ruhê wî de radibin, hêdî hêdî, aş dikin? Heye ku ew derman in? Heye ku bi alîkariya wan, ew mîna teyrekî dikeve nav ewr û esmanên dewr û dewranan, wextan li hev tîne, ji hev dike, wan dineqişîne û ji wan, mîna wêneyên vê romanê, wêneyên taybetî derdixe? Heye ku ew hewl dide, li welatekî xerîb, di nav tenêtiyeke sade de, bibe hostayê xewn û xeyalan?..

Kî dizane?

2– Kê dizanîbû ku dotmama wî, bi gotina dotmamê, "cariyetul mitbaxa" wî, dê bibûya bermaliya wî?

– Min dizanîbû, Haco Axa dikene û dibêje. Na, ne ku min dizanîbû, lê min texmîn dikir. Te mal û hal diviya. Ji Rûşen Xanimê pê ve, kî dikare mala te ava, halê te geş bike?

Hemû bi hev re dikenin. Celadet Beg û Rûşen Xanimê Haco Axa û Husnî Begê Berazî, herdu kesên ku alîkarî li zewaca wan kirin, ezimandine mala xwe ya nû. Ehmedê Fermanê Kîkî, dengbêjê malê û kovarê jî, di salona mezin a mala nû de, li nik wan rûniştiye. Pencerên mezin ên salonê ku vedibin hewşa fireh a malê, heta dawî, vekirî ne. Tevî ku êdî êvarê dest pê kiriye û bayekî sivik xwe, bi hêdîka, dilivîne, dinya germ e, pir germ. Destpêka tebaxa 1935-an e. Şam germ e, dûmana tîna tavê ji Şamê û deştên doraliyên Şamê radibe. Hema çi bigire hemû golên biçûk zuwa bûne, kahnî û bîr miçiqîne. Havîneke germ a nedîtî nefesê li Şamê û merivên bajêr diçikîne.

Lê li salonê germahiyeke din heye. Kesên ku li salonê, li ser kursiyên ku ji destên hosteyên yekta yên necarên Şamê derketi-

ne, rûniştine, bi ken, bi hev re dipeyivin. Li erdê tu tişt ne raxistî ye. Rûşen Xanimê hemû xalîçe û mehfûr rakirine û wê salon şuştiye da ku hinekî hênik be.

– Mîrê min, Memduh Begê gote me ku te şiîrek nivîsiye û pêşkeşî min kiriye, Haco Axa qahwa xwe vedixwe û dibêje. Gelo rast e?

– Naxwe Memduh Beg xeber bi we gihand? Celadet Beg dibêje û dikene. Min dixwest ku ez wê, bêyî ku haya we jê hebe, di vê hejmara nû ya Hawar'ê de biweşînim, bi qewlê fransizan surprisekê bikim.

– Ma tu nikarî wê nîşanî me bidî?

– Çima na, lê heke dotmam rê bide, Celadet Beg dibêje û bi ken li Rûşen Xanima ku li ser kursiya kêleka Haco Axa rûniştiye, dinihêre. Hûn ji min çêtir dizanin, bermaliya malê, xwediya malê ye. Herçend ew dibêje ku ew "cariye-ul mitbax" e, lê ew kebaniya malê ye.

Rûşen Xanim dikene û radibe ser piyan,

– Berî ku Celadet Abî tiştekî din bibêje, ez herim, ew dibêje. Jixwe cîhê min mitbax e.

Berî ku ew ji salonê derkeve, Celadet Beg, bi ken, gotina xwe digihîne wê,

– Naxwe, te fahm kir ka ez ê çi bibêjim? Ma ne rast e? Mêr xulamê mala xwe, mêrxas xulamê ala xwe ye... Ma ne welê ye?

Ew dikenin. Celadet Beg radibe û dere ji ser refekî ji refên salonê yên kitaban defterekê werdigire û vedigere cîhê xwe. Ew rûpelên defterê vedike û di rûpelekê de radiweste û serê xwe jê radike, li Haco Axa dinihêre,

– Rast e, min ev şiîr pêşkeşî we kiriye. Navê şihîrê "Were Dotmam" e. Berî ku em bizewicin, min ew, mîna nesîrê, nivîsîbû, lê min qalê nedikir. Niha êdî wexta wê û çapê hatiye.

– Mîrê min, ma tu nikarî wê ji me re bixwînî?

– Heke hûn ê eciz nebin? Celadet Beg dibêje û bêyî ku li bersiva wan bipê, dest bi xwendinê dike; Dotmam welê ye, heta

mirov xwe nas dikit, mirov umrê xwe xelas dikit... Ez pîr bûme. Di derxika canê min de çil buhar bişkivîne. Qurma bedena min çil zivistan dîtine. Bi sedan ba û bahozan ew hejandine, bê hejmar berf û baran tê re çûne... Herwekî dibêjin; ciwanî bizaniya, pîrî bikariya. Lê pesn ji Xwedê re ko hêj ewçend ne pîr im ko nikarim... Wekê ez jî ciwan bûm, simbêl hêj nû avêtî bûn ser lêvên min, dilê min bi hevîniya delalan hildavêt, hon ne yek, ne dudo, ne deh, ne bîst bûn. Kej û gewr, esmer û genimî, bejnbilind û navîn, kinên we jî hebûn... Hon hemî ji min, ji me re bûn, me kîjan bixwesta, ne ew ê, ne mamên me, nedigotin no. Lê min, me hemiyan nizanîbûn. Çavên me bi we, bi bedewiya can û giyanê we nediket... Bîhna we ya xweş, rengê we yê geş û birewş tu dibêjî qey ne ji me re bûn. Em pê nedihesiyan. Me ew nedidîtin... Rojekê, me hew dît, gulistan bê gul, daristan bê bilbil maye... Em di hembêza jinên biyanî, hon di bin çengê mêrên nenas de...

Celadet Beg li wir radiweste, serê xwe ji defterê radike, bi qasî kêliyekê, bêdeng dimîne, paşê ji pencerê li der, hewşê dinihêre û dibêje,

– Ez serê we neêşînim, şiîr weha dom dike...

Hê wî gotina xwe xelas nekiriye, Rûşen Xanim dikeve hundir û bang wan dike da ku ew herin aliyê mitbaxê, ji bo şîva êvarê.

> Gelo di saloxdana wî danê êvarê de, tu, niha, hinekî, ne şaş bî?.. Ez bawer im, welê nebû. Rast e, min serê xwe ji xwendinê rakir û got, "ez serê we neêşînim..." Lê Rûşen hema hingî nehate hundir. Heke ez ne şaş bim, piştî gotina min, Haco Axa ku gelekî ji xwendina şihîrê memnûn mabû, weha got,
>
> – Serî êşandina çi, Mîrê min, bilakîs, dewam bike, em ê kêfxweş bin...
>
> Ez bawer im, Husnî Beg jî ew testîq kir. Min jî dîsan dest pê kir û şiîr xwend. Ne bi tenê carekê. Piştî ku xwendina yekan xelas bû, Haco Axa xwest ku ez wê dîsan bixwînim. Min ew dîsan, xwend. Û jixwe, piştî demeke kurt, ew di hejmara 26-an a kovarê de weşiya.

Ez û Rûşenê zewicîbûn. Me tu dawet û dîlan nekiribû. Ne me quweta diravî hebû ne jî daxwazeke welê. Heçî ez bûm, mûna ku min di şiîrê de gotibû, min çil zivistan dîtibûn, çil bihar di canê min de bişkivîbûn. Heta çil û yek!.. Min tu dawet nediviya! Lê wê şiîrê îlan kir ku em zewicîbûn. Loma ew girîng bû. Heye ku hemû şihîr li romanê nayê û tu jî, ji ber wê yekê, naxwazî wê, bi temamî, vebiguhezî ser rûpelên Bîra Qederê. Lê ez tiştekî bibêjim; ew şiîr neynika qedera min bû, yek ji neynikên qedera min bû. Di dawiya şiîrê de jî, min weha digot; No! no! dotmam, heyraniya pismam, êdî bes e, hew bibe jina xelkê... vegere, were himbêza pismamê xwe, paxila kurmamê xwe... "Vegere" ev ne gotineke rast e. Em nikarin ji te re bibêjin "vegere". Ji ber ko tu neçûyî, me tu rêkirî. Me bi destê xwe tu hinartî mala xelkê. Himbêza xwe veke, ez ji te re têm. Min hembêz bike. Min wek mêr, pismam û her tiştê xwe maço bike... Dotmam min ji te re got, ez pîr bûme. Lê pîriyê ez hişyar kirim... Buhar ciwanî ye, zivistan pîrî. Zivistan piştî buharê têt. Di zivistanê de buharên veşartî hene... Herê dotmam were, xwe berde hembêza pismamê xwe. Ez ê ji te re, ji zivistana xwe ya sar, buhareke germ çêkim...
Herê, şiîrê weha dom dikir... Min hinekî dirêj kir, lê vê şiîrê her tişt digot, êdî ne hewceyî gotinên zêde bûn. Di dawiyê de, piştî ku umrê min ji çilan jî qulipîbû, ez gihîştibûm yek ji dotmamên minên bêhejmar. Heye ku xwendevanên Bîra Qederê niha meraq bikin û bipirsin ka zewaca me çawan bû? Û ew bibêjin, "ma Rûşen Xanim ne zewicî bû, ne xwedî zarok bû?.." Belê welê bû. Lê zewaca wan bi ser neketibû. Piştî ku Huseyma hatibû dinê, wan hew dikarîbû zewac bimeşanda. Omer Malik xortekî hêja û ziravbihîstiyar bû, lê ne li gora Rûşenê bû. Çend mehan bi dû Huseymayê re, wî xwest dev ji Sûriyê berde û here Parîsê bixwîne. Min bi xwe alîkariya wî kir. Çaxa ew bi rê ket jî, min nameyek ji bo Kamuran nivîsî û dayê da ku Kamuran li Parîsê alîkarî lê bikira. Kamuran ku li Parîsê bû, alîkarî lê kir û ew li yek ji xwendegehên hunermendî yên herî baş ên Parîsê, "l'ecole de Boux Arts" da xwendin. Bi çûyina Omer re, Rûşen, tevî keça xwe Huseymayê, bi tenê ma. Hingî diya Rûşenê jî çûbû Baxdayê, nik mêrê xwe yê nû!.. Jineke ciwan, tevî zarokekê, li Şamê... ne xweş bû.

Hingî min jî dest pê kiribû û êdî bîr bi qîmet û hêjahiya dotmaman dibir; 99 zarokên bapîrê min Mîr Bedirxan hebûn. Belê, te çewt nebihîst, 99. Gelek ji wan keç. Bi sedan zarokên van 99 bira û xwehan çêbûn. Piraniya wan keç. Hejmara kesên mala Mîr Bedirxan gihîşte hezaran. Piraniya wan keç. Lê tevî vê, mal û malbata Mîr Bedirxan winda dibû. Ji ber ku em diçûn bi keçên nenasan re dizewicîn. Kesên nenas jî dihatin bi keçên me re dizewicîn. Loma min "Were Dotmam" , bi terhekî ku gelekî bi yê Baudelaire dima û bi devoka Botî, nivîsî û tê de qala 99-an, keç û dotmaman, Saadet Abla û Rûşenê kir. Hemû dotmam çûbûn, jîna geş a Stembolê çûbû, yar û evîndar çûbûn... Lê li Şamê dotmameke têgihîştî, dilsoz û fedekar hebû, mabû. Ma min nikarîbû di zivistana umrê xwe de hêlîneke germ a buharê pêşkeşî wê bikira, pê re hêlîneke weha ava bikira?

Rûşen Xanimê xwarinên taybetî yên erebî çêkirine. Gava Celadet Beg, Ehmedê Fermanê Kîkî û mêvan tên mitbaxê, her tiştê xwarina êvarê, li ser masê, hazir e. Taxima teyfikên zêrhêlî ku Rûşen Xanimê bi mieşa xwe ya yekemîn a mamostayî kirîne, bi ûsil, li ser masê, li gora pênc kesan, rêzkirî ne. Rûşen Xanim cîh nîşanî wan dide. Celadet Beg û Haco Axa li kêleka hev, Husnî Beg û Ehmedê Fermanê Kîkî jî li hember wan rûdinin.

–Bira Mîrê min, halê cerîdê çi ye? Haco Axa, gava ku ew rûdine, ji Celadet Beg dipirse.

– Halê cerîdê ne tu hal e, Celadet Beg dibêje, hal, halê gor û goristanan e. Heke weha here, cerîde dê bimire.

3 Naxwe, min gotibû, heke weha here, cerîde dê bimire. Cerîde mîna şitilan e, ji şitilê re av divê, ax û tav divê, hunera destên hoste divê. Cerîde jî welê ye; jê re nivîsevan û xwendevan divê, mewzû û babet divê, belavkirin û firotin divê, bazar divê... De ka ji min, rebenê Xwedê re bibêjin, ev hemû pêdivî li ku ne?

– Gotina te ye, mîrê min, lê heyf bû, alîkarî û xizmetên Hawar'ê bêhejmar bûn, bi gotina we, ew kursiya milet bû.

– Ma heyf û hew! De werin ji min bipirsin... Mîna ku min zarokeke xwe, bi destê xwe xistibe gorê... Hawar'ê ewçend tesîr li min kir. Lê min hew dikarîbû bidomanda, hew dibû...

Celadet Beg, Memduh Selîm Beg, Haco Axa, Mistefa û Bozan Begên Şahîn û hin kesên din li Helebê, li salona fireh û kevnare ya Hotel Baronê rûniştine. Mistefa û Şahîn Began ew ezimandine gund. Piştî bîskekê, ew ê bi hev re herin gundekî ji gundên Çiyayê Kurmênc ku gelekî nêzîkê Helebê ye. Çiyayê Kurmênc ku ereb jê re dibêjin "Cebel el Ekrad" devereke kurdî ye. Zana û rêberên kurdan ê, ji bo çend rojan, bibin mêvanê malên mezin ên Çiyayê Kurmênc, mala Dîko, mala Reş Axa û mala Seîdê Mamo.

Gava derd û keser, yan jî kosp û girêkên rojane bîhna Celadet Beg teng dike, mîna îro, ew xwe davêje derveyî Şamê, ber bi gund û çiyan. Heval û dostên ku ew dibîne û dixwaze bibîne, gelekî kêm in. Tevî ku ew, bi temamî, li Şamê bi cîh bûye, zewiciye û bûye xwedî mal jî, ew hê jî xwe xerîb û derketî dihesibîne. Loma jî hevalên wî, kesên mîna wî derketî û kesên ku ji deverên wî yên kevn hatî ne.

– Lê belê, tiştê ku herî zêde ez diêşandim, kurt û pistên kurdan bû, Celadet Beg cixara xwe vêdixe û dibêje. Hemî zehmetî û dijwarî li milekî, lê berberî, hesûdî, nezanî û paşgotiniyên kurdan li milekî. Zehmetî û dijwarî li ser seran û çavan bû, lê hê jî ez tênagihêm çima kurd ewçend li hember hevûdu kurt û pist dikin? Mîna ku min tiştekî xirab dikir yan jî tiştekî xirab bi wan dikir... Xebata min, keda min, xwîdana min, şevên min ên bêxew ji bo wan bû, ji bo alîkariya wan bû...

– Mîrê min, guhê xwe mediyê, Mistefa Beg dibêje. Benîştê mêrê pîs, çîroka mêrê qenc e. Tu bi karekî pîroz rabûyî, eger îro eva hanê fahm nebe, ew ê sibê fahm be.

– Herê welê ye, ez jî pê bawer im. Jixwe loma min karî karê xwe bidomanda. Lê çima ev bedbînî, zikreşî û dilxirabiya kurdan a li hember hev? Çima?

Haco Axa ku hinekî ji Celadet Beg dûr rûniştiye, ji cîhê xwe radibe û tê, li kêleka Celadet Beg, li ser kursiyeke fireh a çermîn, rûdiṇe. Ew destê xwe dide ser çoga Celadet Beg û bi ken jê re dibêje,

– Mîrê min, naxwe, min berê jî gotibû, tu kurdan nas nakî. Hin gotinên kurmancan hene ku welê vala û bêsebeb nehatine holê. Ew gotin jîna kurmancî ne. Mesela kurmancan bi xwe gotine, giyayê hewşê ji xwediyê malê re tahl e. Aha ev gotina hanê hemî derd û kulên kurmancan ên sedan salan şanî dide. Heke tu yekî xerîb bûyayî û te ev kar ji bo kurmancan bikira, hingî te dê bidîta wan ê çi qîmet bidana karê te. Lê hezar heyf ku tu kurmanc î! Ma çima kurmanc tu carê bi ser nakevin? Tu alîm î, gerek e, tu pê bizanî. Heke ez li gora tecrubên xwe bibêjim, sebeb ew e ku kurd dijminê hev in, giyayê hewşê ji wan re tahl e... Sala 1925-an, gava, rehma Xwedê lê be, Şêx Seîdê gorbihîşt li dijî Jon Tirkên nû ku hatibûn ser hukim serî rakir, em hemû li dijî wî bûn. Dewsa ku em jî pê re rabûna, me û gelek eşîrên din ên kurmancan alîkariya tirkan kirin. Tevî ku serhildan fireh û bi quwet bû, ew şikiya. Ji ber ku giyayê hewşê ji me re tahl bû û me xwe dabû aliyê tirkan! Paşê, piştî ku Şêx Seîd Efendî û hevalên wî li Diyarbekirê, di berbangeke hênik de, li pey hev, hatin xeniqandin, heşê me hate serê me, lê çi feyde! Aha çîroka me kurmancan ev e.

> Çîroka kurmancan direj bû û min jî hê nû, deriyên girtî yên vê çîroka dilsoj vedikirin. Derî girtî bûn, derî li kurdan hatibûn girtin. Ronahî diviya, lê ronahî li pey deriyan bû. Mîna ku Goethe, berî mirina xwe, gotibû; mehr licht! Hinekî din ronahî... Lê li ku, ji ku, çawan? Li cîhanê, her miletekî, wext û heyamên cihê hene. Her wext û heyam xwediyê rengekî taybetî û cihê ye. Lê belê, ji bo kurdan ev ne welê ye. Wan her, bi tenê, wextek û heyamek heye; nezanî û berberî. Wext û heyama nezanî û berberiyê, bi rengê xwe yê reş, bûye qedera kurdan. Û vê qederê jî kurd

xistine bin qeyd û zincîran, kirine bindest û xizan, jihevketî û derketî.

Kurd bi derd û keser bûn, lê wan bi kirinên xwe, bi rengê reş ê nezanî û berberiyên xwe, derd û keserên xwe zêde dikirin. Min jî, bi derd û keser, di rûpelên HAWAR'ê de behsa derd û keseran dikir û her digot; ronahî. Yanê mehr licht... (Ma tu dizanî ku behsa derd û keseran kirin û gotina wan, derd û kesereke çawan kambax e?..) Lê rûpelên Hawar'ê têr nedikirin. Ma Hawar li hember vê dîrok, wext û heyama reş, qedera xirab, ji bêyî dilopeke hûnik a bîreke miçiqî, çi bû? Hîç... Lê min ew dilop jî, bi hezar û yek zehmetî derdixist; dirav nîn bû, nivîskar nîn bû, xwendevan nîn bû, kiriyar nîn bû, dibistan nîn bû, xwendegeh û kitabxane nîn bû, meraq û heza xwendin û nivîsînê nîn bû. Heke ez niha bi tenê behsa tiştên tunebûyî bikim, ew ê ne rast be, hin tişt jî hebûn; sansora fransizan, kurt û pistên kurmancan, dijwariyên belavkirinê, (carina hin kurd ji Iraq û Tirkiyê dihatin, me jî kovar didan wan da ku bi dizî, bibin wan deran), daxwazên bêhejmar ên kurmancan... Herê, Hawar di bîreke miçiqî de dilopeke ava hênik bû. Lê min û hevalên min, Rûşen jî tê de, hew dikarîbû. Hejmara dawîn a 26-an ku tê de şiîra min "Were Dotmam" jî weşiya, tu yeqîn bike, bi zêrên Dotmamê, derket. Wê rojê, li Hotel Baronê, min şerm kir ku ez qalê bikim, lê heke Rûşenê, bi fedakariyeke mezin, zêrên xwe nefirotina û heqê çapê neda, hejmara dawîn ê derneketa. Hatina me nîn bû, em ne dewlemend bûn. Carina min diçû û di dadgehan de awukatî dikir. Carina jî tercumevaniya fransizî. Rûşenê jî mamostahiya erebî dikir. Hatina me bi zehmetî têra malê dikir. Zêdeyê wê nîn bû. Nav mezin bû, lê tiştekî li ber destan nîn bû. Ji ber vê yekê, min têkberên malê û zêrên Rûşenê difirotin da ku kovar derbiketa. Axir... Roja ku kovar derket û min ew anî malê, ez mîna zarokan, dîsan, şên û kêfxweş bûm; zarokeke nû jî hatibû dinê. Min ew nîşanî Rûşenê da. Rûşenê lê nihêrt û ez pîroz kirim. Lê wê weha jî got; Celadet Abî, heta kengî? Heta kengî tu dê bikaribî li ber xwe bidî?..

Me, bi şîn û keser cîhek, di dilê xwe de, veda û Hawar xiste gorê. Çîroka Hawar'ê ku sê sal, sê meh û sê rojan domandibû, mixabin, mîna gelek çîrokên din ên qedera kurdî bi dawî hatibû... Aha, çîroka Hawar'ê jî weha bû ku gelekî li çîroka Haco Axa dihat.

– Mîrê min, kî çi dibêje, bila bibêje, te bi ya xwe kir û mucela xwe derxist, Memduh Beg ku taximekî kincên nû, tevî kirasekî spî û qirawetekî hewrêşîmî, li xwe kiriye, destê xwe dibe ser simbêlê xwe û dibêje. Ma te nedixwest ku xewna xwe biqulipînî ser rastiyê? Ma te her nedigot ku xewnên me rastiya jîna me ye? Heta te bi xwe li dereke weha nenivîsîbû; bi tenê xewn dikare zora wextê bibe, gava şevên me, xewn û xeyalên şevên me xelas bin, êdî hûn bizanibin ku em jî xelas in?

Hingê, hê xeberdana Memduh Beg neqediyaye, Bozan Begê ku ji bo kêliyekê ji hotêlê derketibû, dikeve salonê û tê nik wan. Li pey wî jî du kesên din ên bi şal û şepik hene.

– Em divê rabin, Bozan Beg, bêyî ku rûne, li pê, dibêje. Rêberên me jî hatine. Cîp li ber deriyê hotêlê hazir in. Berî ku êvar dakeve, divê em herin. Li gora ku rêber dibêjin, xezal û bet jî li doraliyên Kurdaxiyê hatine dîtin. Eger wergî be, em ê herin seyd û nêçîra wan jî.

4 Niha jî dora seyd û nêçîra hevok û cimla kurdî ye. Hevok û cimla kurdî ku Celadet Beg jê re navekî nû dîtiye; komek... Wext, wexta lihevanîn û rêzkirina komekan e. Êdî wext hatiye ku Celadet Beg komekên kurdî yên qedexekirî bîne zimên û wan bide axaftin, ruh û jiyaneke nû bide wan.

Hawar hew derdikeve, ew di kûrahiya dilê Celadet Beg de û li ser refên mala wî radizê. Heye ku ew, careke din, ji xewê hişyar be. Celadet Beg li hêviya wê rojê ye. Lê niha ew di xeweke şêrîn de ye. Tevî vê yekê, Celadet Beg dixebite, dinivîse, lê digere. Bi

alîkariya kovarê, ew gihîşte hedefên ku wî dabûn ber xwe. Wî kovareke xwerû bi zimanê kurdî derxist, tê de alfabeya xwe ya nû ya latînî ceriband û hêdî hêdî ew kir bingeha nivîsîna kurdî, qayideyên nivîsîna kurdî anîn pê, folklor û zargotina kurdî berhev kir û berhemên edebiyata devkî di kovarê de weşandin, hîn şaîr û nivîskarên nû yên zimanê kurdî derxistin, bendên celebên cihê nivîsîn, şiîrên xwe weşandin, ayet û hedîsên ola îslamê, bi wergera birayê xwe Kamuran, di rûpelên kovarê de weşandin... Û wî hîn gelek tiştên din ên nivîsîna kurdî serast kirin.

Niha jî wext hatiye ku ew komekên kurdî, bi neqş û rengên cihê, bi hev ve girêde, wan bihûnîne. Yanê ew dixwaze romaneke binivîse û romana kurdî ava bike. Wext li vê xwestekê tê. Tevî ku ewrên reş esmanên dinyayê vegirtine, dinya hê jî aram û sayî ye. Barana reş hê dest bi barînê nekiriye. Piştî Hawar'ê, wî niha bêtir wext jî heye. Û ya herî girîng, zarokek li rê ye. Gerçî kovar ketiye gorê, lê Rûşen Xanimê mizgînahiya zarokekî nû daye wî; ew li hêviya zarokekî ne.

Celadet Beg ê bibe bav. Zirbavê Huseymayê dê di demeke kurt de bibe bav jî û tevî Rûşen Xanimê, ew ê bira yan jî xwehekê yadîgarî Huseymayê bike. Piştî ku Rûşen Xanimê xebera pîroz bi Celadet Beg gihandiye, wî jî Rûşen Xanim û Huseyma wergirtiye û hatiye Lubnanê. Ew niha li Bêrûdê ne, li taxa Qesra Mezin ku li ser girekî Bêrûdê ava bûye, li pansiyoneke paqij û bêdeng. Zerya Spî û hemû Bêrûd li ber lingên wan e. Ji wan hinekî bi dûr Qesra Mezin ku navenda karên siyasî yên Lubnanê ye û dilê fransizan li wir hildavê, bi hemû bedewiya xwe, dixuyê. Dar û ber, dahl û daristan, mîna xalîçeyekê, raxistî ne. Bêrûd, gencîneya Rohilatê, ku hemû dewr û dewran, hemû rengan, ziman û olan hembêz dike, mîna her carê, niha jî, hembêza xwe ji Celadet Beg û mala wî re jî vedike.

Celadet Beg, Rûşen Xanim û Huseyma di qata duwemîn a pansiyonê de ne. Ji ber tevdîrên ewlehiyê, wan qata diduyan xwestiye. Qata wan ji du jûran, mitbaxeke biçûk û saloneke teng

û direj tê pê. Lê şaneşîna qatê, bi serê xwe, hêjayê her tiştî ye. Bergeh û dîmenên şaneşînê bêpayan in.

Mîna vî danê êvarê.

Ji der û dor bîhna axê û dar û ber difûre. Li milê çepê yê şaneşînê, li ser çiyan, keskesoreke zêrhêlî, bi hemû rengên xwe, dibiriqe. Berî niha bi bîstekê, baraneke boş bi ser girê Qesra Mezin de hat, bi qasî kêliyekê barî û winda bû. Niha çiya bi rengên keskesorê diçirûsin.

Lubnan û Bêrûd bi rengên keskesorê diçirûsin. Hêvî ji Lubnanê difûre. Ew grewên karker, esnaf û parêzgeran, serhildanên qesab, goşkar û necaran, şer û pevçûnên gel û terîqetan rawestaye. Jiyana aborî hêdî hêdî bi ser xwe ve tê. Jiyana siyasî nermtir dibe. Li Fransayê, piştî helbijartina giştî, hikumeteke nû ya Êniya Gel, bi serekiya Leon Blum, hatiye ser hikum. Piştî guherîna hikumeta Fransayê, li Lubnanê jî hilbijartin çêbûye û serekekî nû yê lubnanî, (ne fransiz), Emile Eddé hatiye hilbijartin. Tevî ewr û baranê, dinya nerm û germ dibe. Rengên keskesorê dixuyin.

Celadet Beg ê, di dara dinê de, cara yekî, bibe bav, bibe xwedî zarok. Ji niha ve, wan nav jî hazir kirine; eger zarok kur be, nav ê bibe Safter, eger ew keç be, navê bibe Sînemxan.

Ma ji wê rojê xweştir roj heye ku meriv dest bi romana kurdî bike? Celadet Beg li şaneşînê rûniştiye û weha difikire. Wî masa portatîf vekiriye, pêşgîrekî fireh avêtiye serê, teyfikeke tijî meywe daniye ser masê, devê şûşa araqa lubnanî vekiriye, îskan dagirtiye û difikire; niha jî hûnandina gotin û komekên kurdî divê, romaneke ronî divê.

> Berî ku ez gotinê bînim ser romanê, divê ez çend tiştên biçûk ku te ji bîr kirin, bibêjim û bi bîra te bînim.
> Yek; me hin tiştên din jî di Hawar'ê de li dar xistin; kitêbxana Hawar'ê û di rûpelên kovarê de beşekî fransizî. Di bin sernavê "Kitêbxana Hawarê" de, min hin kitêbok weşandin û belav kirin. "Rêzana Elfabiya Kurdî" û

"Rûpelnine Alfabê" dudo ji wan kitêbokan bûn. Bi alîkariya wan, kurmanc xwendin û nivîsîna zimanê xwe yê madêrî hîn dibûn. Heçî beşê fransizî bû, min gelekî bala xwe dida pêwendiya zimanê kurdî û cîhanê. Min dixwest fransiz û ewrûpayî jî di warê ziman, edebiyat, çand û heyinên kurdî de serwext bûna. Bi xêra wî beşî, me gelek pêwendiyên hêja û bikêrhatî anîn pê.

Dudo; di wê navberê de min du kitêb nivîsîn. Yek bi fransizî, yek bi tirkî. Yek bi navekî mustear, yek bi navê min. Ya fransizî ku min hê di sala 1930'î de, gava ez yek ji serekên Xoybûnê bûm, nivîsî, li Kahîrê, bi alîkariya kekê min Sureya, derket. Kitêbê ku navê wê "La question kurde, ses origines et ses causes" bû, tê de gelek agahiyên bingehîn hebûn û min bi navê "Dr. Bletch Chirguh" nivîsîbû, ez bawer im, gelekî alîkarî kir ku dinya kurdan, hinekî, ji nêz ve, binase. Kitêba diduyan ku min nivîsî, di esasê xwe de, nameyeke dirêj bû ku min ji serekê Komara Tirkiyê Mistefa Kemal Paşa re şandibû. Min ew kitab jî sala 1933-an, piştî ku min dev ji Xoybûnê berda, nivîsî. Rejîma nû ya Tirkiyê siyaseteke ecêb dimeşand. Li milekî wê her tiştê kurdî û kurdaniyê qedexe dikir û kurd jî mîna tirkan dihesiband, lê li milekî jî behsa efûyeke giştî dikir. Ev celeb siyaset şaş bû, nêrîn vajî bû. Li ser daxwaza heval û dostan jî, ez rûniştim û min nameyeke dirêj ji Mistefa Kemal Paşa re nivîsî. Min û wî hevûdu baş dinasî. Wî mal û malbata me jî baş dinasî. Ji malbata me ya fireh hin kes jî bûbûn mişawir, wezîr û berdevkên wî yên girîng. Min nama xwe, bi tirkiyekî paqij û ûslibeke nerm, bi navê "Türkiye Reisicumhuru Ġazi Mustafa Kemal Paşa Hazretlerine", nivîsî û jê re şand. Name nerm, lê rexneyên tê de gelekî hişk bûn. Min di namê de, tevî hebûn û dewlemendiyên ziman û heyina kurdî, şaşiya siyaseta "turkizasyonê" nîşan dida û weha digot; "Paşa hazretleri, heke hûn dixwazin girêka kurdî çareser bikin, hingê rê heq û hiqûq e, ne kuştin, qedexekirin û înkar e." Wê nama ku min di heyştê kanûnîsaniya 1933-an de xelas kir, di nav kurd û tirkan de deng da. Lê li milê din wê riya vegera welêt û Stembolê, yekcar, li min girt. Ez hew dikarîbûm, bi keştiya Pierre Loti biçûma Stembolê, min careke din,

Bospor, Kadıköy û Galata bidîta. Min xewnên weha hew diviyan... (Lê kî dikare rê li xewnan bigire? Min biryar dabû, lê xewnan li min guhdarî nedikirin, ew dihatin, wan ez dibirim Bospor, Kadıköy, Kızıltoprak û Galatayê...) Niha em vegerin ser romanê. Piştî van kitêbên ku min qal kirin, Hawar û kitêbxana wê, êdî wext hatibû ku min bikaribûya romaneke kurdî jî binivîsa. Hê li Alemanyayê, gava Monikayê, piştî şeveke dirêj, serê xwe datanî ser sînga min û di xew re diçû û ez jî vedigeriyam nav rûpelên "Janên Wertherê Xort" a Goethe, hê hingî, min ji xwe dipirsî; "Ma kurd ê kengî dest bi nivîsîna romaneke weha bikin? Ma ez nikarim biceribînim?.." Piştî salên dirêj û şevên bêhejmar ên dirêj, êdî wexta ceribandinê hatibû. Min ê dest bi romana xwe bikira. Min ê çi binivîsa, qala çi bikira? Min, bi qewlê kurdên behdînî, bi misogerî, nizanîbû. Lê min dixwest ku romana min bi kurdî bûya. Ew ronî bûya. Wê qala derd û keserên dîrokî yên kurdan bikira, lê ronî û bi hêvî bûya. Wê, mîna çîrokên Şehrezadê yên "Hezar û şevekê" vebigota, jê bîhnên cihê yên misk û emberan bihata, mîna keskesora wê rojê rengîn û pirengî bûya. Û mîna pelên guleke sor, ew, pel bi pel, bibişkoviya. Roman geşî û dewlemendiya zimanan, bîhn û tahma civatan bû. Zimanên ku xwe bi romanan gihandibûn, hew dimirin. Roman, heke ez bi gotina bav û kalan bibêjim, hespê rewan û beza yê edebiyatê bû. Min roman diviya.

Celadet Beg qedehê dibe devê xwe û heta dilopa dawî, wê, bi carekê, lê hêdîka vedixwe. Paşê jî ew serê xwe radike û li doralî dinihêre. Hemû tiştên ku nivîskarekî dikare bibîne, li ber wî ne; keskesoreke yekta û rengên wê yên cihê û jîndar, yekîtiya esman û ava şîn, aso û hingûra ku hêdî hêdî diqulipîn ser rengê sor, zincîra çiyayên li pişt bajêr, avahiyên bajarekî heftrengî. Hemû tiştên ku dikarin bên guhê nivîskarekî, li doraliyên wî ne; feşafeş û gujîna avê, vîçevîça teyr û çivîkan, qepqeba kewan, şihîna hespan, kalîna berxan, dengên dûr ên şêniyan û teptepa dil, deng û pejnên nexuyayî yên dil...

Celadet Beg deftera li ser masê, hinekî, ber bi xwe tîne, wê vedike û bi pênûsa xwe ya reş û dirêj, di rûpela yekemîn de weha dinivîse;

Nav: Heyveron

Gengre (çeşn): Roman

Destpêk : Ronî, ronahî... Mehr licht, yanî hinekî din ronahî...

5 Ronî, ronahî, hinekî din ronahî. Lê ji kû, çawan? Tarî ye, her der tarî ye, mîna binê bîrê tarî ye. Bi qasî misqalekî be jî, ronahî naxuyê. Xeberên ku tên, reş in; bûyerên ku diqewimin, reş in; gavên ku tên avêtin, gavên bêgaviyê ne. Celadet Beg li mala nû, li oda xwe ya xebatê, cixare di dêv de, li ber masê rûniştiye û li der dinihêre.

Bi hêviyên mezin, Celadet Beg û Rûşen Xanimê mal guhestibû taxa Muhacîrînê. Wan li wir maleke li gora dilê xwe, bi kirêyeke erzan, peyda kiribû. Ev mala nû jî, mîna mala Salihiyê, duqat, lê pirjûre bû. Tê de hewşeke fireh û di hewşê de jî, mîna mala din, bîreke avî hebû. Ew bi mehan li Şamê geriyabûn da ku maleke weha bibînin. Malek ku dê fireh û pirode bûya, tê de hewşek hebûya û di hewşê de jî bîr. Maleke weha hewce bû, -ji ber ku Safter an jî Sînemxan ê bihata, ber bi êvaran, Celadet Beg ê li hewşê, kêleka bîrê, rûnişta û romana xwe Heyveron binivîsa. Heval û dost ê bihatina, bira û xweh ê bihatina û li mala wan mêvan bûna Ehmedê Fermanê Kîkî û dengbêjên din ê, di şevên dirêj de, mal bi dengên tarîxî yên jiyana kurdî tijî bikirana. Gava herkes radiza, ew ê rabûya û wî dê rêzên şiîr û romana xwe hişyar bikira. Di berbangên rojên nû de, wî dê Şengê û Bêlenê, tajiya nû ku kurdên Çiyayê Kurmênc diyarî wî kiribûn, bigirtana û biçûya seyd û nêçîran. Di bin perda rengê sor ê hingûrên Şamê de, wî dê li qepqeba kewên xwe yên ribat guhdarî bikira, mêkew û mariyên xwe bifiranda û li wan binihêriya.

Lê eger bûyerên ku wan nehesibandibûn, neqewimana.

Dirêj meke, Xortê halnas, dirêj meke. Bûyerên reş bêhejmar, mûsîbet pir bûn. Tu dê behsa kîjanê bikî û kîjanê nekî? Dev jê berde, ne tu serê xwe pê biêşîne, ne jî xwendevanên Bîra Qederê xemgîr bike. Heke te dil heye ku tu gotinê bînî ser Heyveronê, hema bi carekê, ez bibêjim te ku min taqet nîn bû ew binivîsa. Ji ber ku bûyerên reş û mûsîbetên kambax pir bûn. Ne hewce ye ku ez jî niha, yek bi yek, behsa wan bikim. Lê ez ê bi tenê û pir bi kurtahî, behsa hin ji wan ku ez ji taqetê xistim, bikim.

Safter li nexweşxana fransizî ya Şamê hate dinê. Kêfa me bêpayan bû. Safterê biçûk, bi rastî jî, bi Safter dima. Min ê Safter, mîna Safterê bira, mezin bikira. Jixwe min ê roman jî, bi bîranîna Safterê mezin, ji bo Safterê biçûk binivîsa. Safter hat, lê yanzdeh roj bi dû hatina xwe re, ew dîsan çû. Berî ku Safter bê dinê, Rûşen ji apandisîtê emeliyat bûbû. Emeliyata wê zêde biserketî nebû. Û wê emeliyatê tesîr li Safterê biçûk kiribû. Ew nexweş hate dinê, lê me hêvî hebû ku ew ê sax bûya. Deh roj û deh şevan, ez li ser serê wî bûm. Roja dawîn, ji bo karekî, ez derketibûm der. Çaxa ez derketibûm, wî jî, bêzar û bêziman, xatir xwestibû û çûbû...

Mezo û Saadet Ablayê nameyeke kurt, li Stembolê, nivîsîbûn û bi alîkariya dostekî, bi min gîhandibûn û tê de behs dikirin ku wan haziriya hatina Şamê dikir. Ew ê bihatina Şamê! Min ê xweh û dotmama xwe bidîta! Bi heyecanê, ez li hêviya wan bûm. Lê ew nehatin. Dewsa wan, nameyeke din ku ji ya berê kurtir bû hat; Saadet Abla bi qezayeke kambax miribû. Gava wê xwestibû ji bîrê av bikişîne, lingê wê şemitîbû û ew ketibû bîrê. Serê wê li kevirên bîrê ketibû û ew bêheş, di bîrê de, fetisîbû û malbatê Saadet Abla, yek ji neqşên rengîn ên jîna min, di goristana Usküdarê de veşartibû...

Kekê min Sureya çûbû Parîsê. Ji Parîsê jî, ew ê bihata Şamê û demeke dirêj li nik me bima. Heta rojekê, ez ji postaxanê, bi telefonê, bi wî û Kamuran re jî peyivîm. Wî hal û hewalê me pirsîbû, Rûşen meraq kiribû û ji Rûşenê re, ji cil û bergên Lucien Lelong taximekî kinc kirîbû. Dengê wî hê di guhê min de ye; "Celadet, birayo, min pir

bêriya te kiriye, gava ez hatim, em ê bi têra xwe biştexilin..." Lê ew nehat, ew gotinên wî yên telefonê, bûn gotinên dawîn ku min bihîstin. Wî, kekê min ê simbêlbadayî yê qeda û belayê, mamostayê min ê xwendin û nivîsînê, hevalê min ê dilsoz ê Pera û Galatayê, ji sekteyî dil wefat kir. Kamuran û heval û dostên kurd û fransizan ew li wir defn kirin.

Di navbera van mirinan de, tiştekî din, mirineke din, qewimî ku ez pê gelekî êşiyam; qetîama Dêrsimê. Dêrsim, yanî deriyên sîm, deverekî xweş û çiyayî yê welatê kurdan bû, cîhê alewiyên kurdan bû. Her aliyê wê dar û ber, newal û gelî, zozan û çiya, çem û lehî bû. Kurdên Dêrsimê li hember rejîma Tirkiyê serî netewandibûn. Tirkiyê êrîşekî gelekî xedar biribû ser Dêrsimê. Dêrsimiyan li ber xwe dabûn, bi qasî du salan. Lê dora wan girtî bû û eşîrên din ên kurd ku li der û dorên Dêrsimê dijiyan, neçûbûn alîkariya wan. Dêrsimî bi tenê mabûn, li ber çavên dinyayê û eşîrên din ên kurdan, rejîma Tirkiyê Dêrsim şewitandibû, Dêrsimî qir kiribûn. Li gora hin agahiyan deh hezar dêrsimî hatibûn kuştin, li gora hinên din çil hezar û hinên din jî sed hezar. Sêdar, dîsan, li dar ketibûn, serekên eşîrên Dêrsimê bi dar ve bûbûn. Qetlîameke mezin hatibû pê, lê kesî tiliya xwe nelivandibû, ji kesî dengekî derneketibû. Ne heq û hiqûq, ne jî wîjdan û ehleq, dinya û kurdên din bi tenê temaşe kiribûn.

Ez çi bibêjim? Ma mirov dikare bi kîjan gotinan mirinê û êşên wê vebêje?.. Mirinê, bi kêrekî ko, rehên min dibirîn. Mirinê dinya kiribû goristaneke mezin û em tê de, li vir, li wir, vedişartin. Mirinê tayên spî yên porê min zêde dikirin, rengê por, rîh û simbêlê min diqulipî ser rengê kefenê...

Vala ye, Celadet Beg destê xwe bi kû de davêje, bi tenê valahî tê destê wî. Ronahî naxuyê. Rast e, romana ku wî dê binivîsa, dê behsa şevê bikira. Lê ronahî dê di tariya şevê de hebûya, heyv ê hebûya. Heyveke ronî dê ronahî bireşanda ser romanê. Lê ka, ronahiya jînê li ku ye, hema hinekî, bi qasî mistekê?

Celadet Beg deftera Heyveron'ê digire, berkêşka masa xebatê dikişîne, defterê têdixê, devê berkêşkê digire û ji oda xebatê derdikeve.

6 Celadet Beg herdu nameyên ku jê re hatine, ji resepsiyona otêlê werdigire û ji resepsiyonê derdikeve. Ew ber bi aliyê salona otêlê dere. Nameyek ji Parîsê hatiye, ya din ji Stembolê. Nama ku ji Parîsê hatiye, ji Kamuran e. Celadet Beg destnivîsa wî ya bedew dinase. Lê ya din ji kê ye?

Salona otêlê tenha ye, bi tenê çend kesên ewrûpayî, li aliyê din ê salonê, li quncika herî dawî, rûniştine. Berî ku ew rûne, ew ji garson qahweyek dixwaze û paşê, dere, li ber pencera mezin, li ser kursiyeke fireh a çermîn rûdine. Resepsiyon û salon, herdu jî, di qata duwemîn a otêlê de ne. Ji salona otêlê meydana Salihiyê û piştî meydanê jî kolana Salihiyê ku hertim tijî şênî ye, dixuyin.

Celadet Beg westiyaye, bêxew e. Heta sibê, ew bê xew maye, bi alîkariya pakêta cixarê û şûşê, wî rêzine têvel nivîsîne, rêzine şiîreke fransizî vergerandine kurdî, gotinine kurdî ku bi tîpa "F" dest pê dikin, nivîsîne, rûpeline têkel ên hin kitêban tev dane, di nav fikir û gumanan de çûye û hatiye û li ber destê sibê, gava Rûşen Xanim hişyar bûye, ew ketiye nav nivînan. Rûşen Xanimê xebereke nû jê re gotiye; ew li hêviya zarokekî nû ye.

Celadet Beg cixara xwe dikişîne û li der dinihêre. Evçend însan, evçend şênî!.. Piştî kêliyekê, ew li nameyên li ser masê vedigere û pêşî nama Kamuran vedike. Name ne dirêj e. Kamuran tê de behsa şerê nû yê Ewrûpayê dike, "Welê dixuyê ku dinya dê dîsan, bikeve ber pêla şerekî dijwar û fireh..." Kamuran biryar daye ku vegere Rohilatê, Lubnanê. Ew niha şixulên xwe dide hev û wan serast dike, paşê ew ê vegere Bêrûdê. Û paşê jî silav, dîsan silav...

Zerfa nama din ku ji Stembolê hatiye, boz e. Xetên li serê jî, bervajiyê ya Kamuran, bi erebî ne. Lê Celadet Beg xetan nas nake.

Ew bi hêdîka namê vedike; "Mon cher Ceco..." Name bi fransizî hatiye nivîsîn. Ceco... Kê ew nivîsiye? Celadet Beg li binê namê dinihêre. Canan! Cananê ew nivîsiye. Celadet, bi lez, nama ku ne ewçend dirêj e, dixwîne; halê Cananê baş e, na, ne baş e, lê ne xirab e jî. Dinya guheriye, kesên nas kêm bûne, ew kesî nabîne, ber bi danên êvaran, carina, ew bi wapûrê, dere Galatayê, berî ku ew vê namê binivîse, bi çendekê, ew çûye restorana Belvu, restorana ku ew diçûnê û wan lê dans dikirin. Restoran vala bûye, dinya pir biha bûye. Rojname bi hewadîsên şer tijî ne. Tirkiye jî haziriya şer dike. Pera û Galata jî guherîne, koça "eqeliyetan" dewam dike, cihû, îtalî, ermen û rûmên taxê, dev jê berdidin û derin Awrûpayê. Navê Cade-yî Kebîr, yanî Rue de Pera, guheriye û bûye İstiklâl Caddesi.

Cananê bêrî li Celadet, hevalê xwe yê ebedî, kiriye. Lê pasaporta wê nîn e ku ew bikaribe were ziyareta wî. Ew ê hewl bide da ku bikaribe pasaporteke nû derxe. Eger ew bi ser ket, ew ê bê Lubnanê, ziyareta Celadet, şagirtê Ovidius... Û paşê silav û hembêz û ramûsan...

> Piştî ku keştiya Pierre Lotî Canan ji Bêrûdê wergirtibû û biribû Stembolê, yekemîn car bû ku min jê tiştekî dibihîst. Sal derbas bûbûn. Dewran diguherîn. Hêlîna teyrê kor, Xwedê çêdikir. Em, her yek, li derekî, li gora edet û usilên dewranan, dijiyan. Rê ji hev vediqetiyan û te didît, dîsan, ji nişka ve, ew digihîştin hev. Niha jî Kamuran ê bihata. Canan ê, belkî, bihata. (Deftera ku wê dabû min li kû bû? Min ew li kû winda kiribû?)
> Zarokeke nû dê, belkî, bihata... Wê rojê, gava ez ketibûm nav cîhan û Rûşen li rê bû ku biçûya dibistanê, ser karê xwe wê li ber devê derî gotibû, "Celadet Alî..." min jî lê vegerandibû û gotibû, "Söyle kızım..." Û hingê wê gotibû û bi lez derketibû û çûbû, bêyî ku li hêviya min bisekine. Zarokekî nû li rê bû... Heye ku kurekî pozberan yan jî keçeke çavreş ê bihata... Kê dizanîbû?..

Piştî ku Celadet Beg qahwa xwe vedixwe, ew cixareyeke din vêdixwe. Nûçeyên ku ji cîhên cihê tên, eynî ne; şerekî nû yê xedar li ber derî ye. Welê dixuyê ku dinya dê dîsan tev li hev be. Kurd? Ya kurd ê çi bibin? Kî dizane?

Berî ku Celadet Beg rabe, ew nama Cananê diçîrîne û dixe xwelîdanka li ser masê, nama Kamuran jî dixe berîka xwe ya çakêt û ew radibe.

FOTOGRAF 14

Hawar û sê zarokên din; Sînem, Cemşîd û Ronahî... û hinekî din ronahî!..

1 Wêneya 14-an a Bîra Qederê wêneyeke ronî ye. Celadet Beg û Rûşen Xanim, li ser kursiyan, li kêleka hev, rûniştine. Herdu jî li kamerayê dinihêrin. Rûşen Xanim bi ken e, rûyê wê dikene. Celadet Beg jî bi ken e, lê bi tenê çavên wî dikenin. Di vê fotografê de ken heye.

Du zarok, keçek û kurek, li ser herdu çogên Celadet Beg rûniştine. Navê keçikê Sînem, navê lêwik Cemşîd e. Li pişta fotografê, bi destnivîseke erebî, weha hatiye nivîsîn; Celadet, Rûşen, Sînemê, Cemo. Sînemê û Cemo, yanî Sînem û Cemşîd zarokên wan in. Cara yekemîn, di vê fotografê de, Celadet Beg, mîna bav û xwedî zarok, dixuyê. Ew bûye bav, bavê keçekê û lawekî. Celadet Beg, çakêtekî sport lê, porşehkirî, herdu destên xwe di pişta zarokên xwe re birine, ew hembêz kirine û hinekî maxrûr, li çavika kamerayê dinihêre. Zarok jî dikenin. Keçik, devê wê vekirî, çavên wê hinekî girtî, dikene. Lawik, devgirtî, mîna bav, por ber bi paş şehkirî, li kamerayê dinihêre û dikene.

Keçik hinekî li diya xwe lawik jî li bavê xwe çûye. Lawik eynî Celadet Beg e. Mîna ku Celadet Beg bûye zarok û dîsan bûye Ceco, Cecoyê dapîra xwe Rûşenê. Cemşîdê Rûşenê û Cecoyê Rûşenê... Keçik 3-4 salî, lawik 1-2 salî dixuyin. Herdu jî bêpayan xweş, bêpayan geş in; mîna heyva çardehê şevê ronî ne. Keçik

hinekî gulover, lawik zirav û dirêj e. Lêwik serê xwe daniye ser milê bavê xwe, keçikê herdu destên xwe vekirine, mîna ku ew li çepikan dixe.

Ev fotografa ku pir xweş hatiye kişandin, rengekî nû li rengên jiyana Celadet Beg û rûpelên nû ku bi rengê nû tên rengandin, li romana Bîra Qederê zêde dike. Eger meriv fotografê mîna rûpelên wextê û jiyanê bihesibîne, ew fotograf rûpeleke nû û roniya wexteke dirêj a umrekî balkêş e. Ev fotografa ronî, di eynî wextê de, îspata ronahî û kenê ye jî. Ev nîşan dide ku di hin cîh, wext û heyamên wî umrê balkêş de, ken jî hebûye. Di hin rûpelên romana Bîra Qederê de ken jî heye.

Ev fotograf û kesên fotografê îspat dike ku Celadet Begê ku ewçend ji jiyana mal, malbat û zarokan direviya, bûye xwedî mal, malbat û zarok; Sînemê û Cemo di hembêza wî de dikenin. Ev fotograf, îspata bergeheke, bi qewlê Rûşen Xanimê, famîlyer e. Famîlye, mal, malbat û zarok, bêguman, wêne û fotograf divê. Kamera divê, îspata wext û dewranên ku zarok tê re derbas dibin, divê. Her du yan jî sê mehan carekê, Rûşen Xanim li zarokan dinihêre û dibêje; wext hatiye. Zarok mezin dibin, diguherin. Guherîn divê îspat be. Zarok ê, sibê roj, li fotografan, li şopên xwe yên jiyanê, binihêrin û rojên bihurî bi bîr bînin û li zaroktiya xwe binihêrin. Wext hatiye... Ma mal û zarok bê fotograf, kamera û îspatan dibe? Nemaze gava mal, maleke Bedirxanî be û li ber xetera windabûnê be...

Lê Rûşen Xanim tu kamera navên, -ji ber ku fotografkêşê herî baş ê Şamê dostê malbatê ye. Malik Tahir û birayên wî ku li hemû navçê mîna fotografkêşên hoste tên zanîn, carina, her dusê mehan carekê, tên taxa Muhacîrîn, mala Celadet Beg û Rûşen Xanimê û fotografên zarokan dikişînin. Mîna vê fotografa 14-an a Bîra Qederê, carina tevî fotografên zarokan, yên Celadet Beg û Rûşen Xanimê jî. Herçend Mr. Xandemian li Stembol, Kadıköyê, dost û hevalê malbatê bû, Malik Tahir û birayên wî jî ewçend, li Şamê dost in. Eynî mîna Mr. Xandemiyan, Malik Tahir jî carina,

bi xwe, tê û dixwaze fotografên malê bikişîne. Malik Tahir û birayên wî ji kurdên Şamê, Eyubiyan in. Studyoya wan a fotograf û gravuran li cîhekî xweş û şên, li ser kolana Salihiyê ye. Tevî ku fotograf, sûret û kişandina wan, li gora dînê îslamê, ne di cîh de ye û ew li Şamê navenda çanda Îslamê, dijîn, studyoya wan hertim tijî ye. Her celeb meriv, ereb, fransiz, cihû, ermen, suryan û kurd tên û fotografên xwe dikişînin. Fotograf ji gelek tiştê din girîngtir e, ji ber ku ew îspata dewr û dewranê, umir û jiyanê ye.

Lê herçî kişandina fotografên Sinemê û Cemo ye, Malik Tahir bi xwe dere mala wan û fotografan dikişîne. Çawan ew ê mîrên kurdan bînin studyoyan?.. Mîr, mîr in. Do jî, îro jî, sibê jî...

Li pişta vê fotografa 14-an, li bin navan, bi xet û neqşên gelekî xweş û bi fransizî, "Photogravure - Eyoubiye Fréres" nivîsiye. Di vê fotografa birayên Eyûbiyan de, Celadet Beg gelekî li bavê xwe Emîn Alî Beg dişibe. Ew jî mîna bavê xwe rûniştiye; pişta wî rast, sîng û rûyê wî li pêş, serê wî hinekî hildayî. Kenê çavên wî jî, mîna ya Emîn Alî Beg, kîbar û bi pîvan e. Gelo tarîx dubare dibe, bi guherîna wext û dewranê, tarîx vedijê? Di vê fotografa ku Malik Tahir kişandiye de, mîna ku Celadet Beg ketiye dewsa bavê xwe Emîn Alî Beg û Cemşîd jî ketiye dewsa bavê xwe Celadet Beg. Di fotografên Mr. Xandemian de, Celadet Beg zarok bû û li ser ajnûya bavê xwe rûdinişt, lê di fotografên Malik Tahir de, ew bav e û lawê wî li ser ajnû rûdine.

Stembol, Kadıköy. Şam, Muhacirîn... Du qonaxên qederekê ku bi rengên cihê hatine hûnandin. Stembol, Kadıköy; qonaxa yekemîn. Şam, Muhacirîn; qonaxa çendan? Ya dawîn?

2- Qonaxa çendan? Ya dawîn? Na, Celadet Beg dibêje, ne qonaxa dawîn, lê qonaxa diduyan... Jixwe di vê hejmara destpêkê de, min bendek bi navê "Sê tarîxên Hawar'ê" nivîsiye û tê de qala vê yekê dikim. Qonaxa yekemîn Hawar bû, weşandina wê û alfaba latînî bû. Me qayideyên nivîsîna kurdî, ji nû ve, anîn

pê, xwendin û nivîsîna kurdî, hêsan kir, ziman sivik kir, gencineyên zimanê kurdî weşandin. Niha jî, di vê qonaxa diduyan de em ê van şixulên xwe yên bingehîn firehtir û kûrtir bikin. Jixwe min di benda xwe de jî nivîsiye; hîmê zimanekî li ser sê hêmanê bingehîn sekiniye: Alfabe, gramer û ferheng. Alfabe temam, niha dora gramer û ferhengê ye. Heçî xwendevan e, qonaxa nû, jê re weha dibêje; hîn bin, hîn bin, hîn bin, hîn kin, hîn kin hîn kin...

– Prins Bedir-Khan, min artîkila we, bi leza kêliyekê, xwend, Roger Lescot, yek ji dîplomatên navdartirîn ê fransizan, bi kurdî, dibêje. We Hawar baş presente kiriye. Beşê fransizî jî ne xirab e. Ez we pîroz dikim û umrekî dirêj, ji Hawara nû re, dixwazim...

Dîsan bihar e, bihara 1941-an. Gulên sor ên hewşa Celadet Beg û Rûşen Xanimê, bi rengekî xwînî, bişkovîne. Hechecîk, dîsan, hatine. Bajarî, kurdên Şam û Helebê haziriya zozanan dikin. Dîsan hewşa Celadet Beg e. Lê ya mala nû ya Taxa Muhacirînê. Dîsan heval û dostên wî civiyane, – li kêleka bîrê. Lê bîra mala nû. Hawar dîsan, ji nû ve, derketiye. Hejmara yekê, na, ne hejmara yekê, hejmara 27-an, îro, 15'ê nîsanà 1941-an, nû ji çapê derketiye. Du şagirtên çapxana Sebatê, bi lez, çend tomar kovar, anîne malê. Ew li kovara ku hê jê bîhna çap û çapxanê difûre, dinihêrin. Kesên ku hatine, dîsan, yên berê ne. Rûşen Xanim, Elî Axayê Zilfo, Mihemed Axayê Zirkî, Emer Axayê Şemdîn, Silêman Efendiyê Qotreşî, Arif Ebas Beg, Husnî Berazî Beg, Muhsîn Berazî Beg, Memduh Selîm Beg, Nîzametîn Kubar Beg, Osman Sebrî, Dr. Nazîf Beg, Ehmedê Fermanê Kîkî. Lê vî danê êvarê, li hewşê, navên nû jî hene; Kamuran Beg, Roger Lescot, Qedrî Can, Cegerxwîn, birayê biçûk ê Dr. Nazîf, Nûredîn, Qedrî, Ekrem, Mîqdad û Bedrî Begên Cemîlpaşa. Ji vê civata ku pirî caran ji hev dûr in, lê îro, bi hênceta pîrozbahiya kovarê hatine mala Celadet Beg, merivek kêm e; Haco Axa... Haco Axa wefat kiriye, lê dewsa wî, lawê wî Hesen Axayê Haco hatiye.

Celadet Beg? Hal û hîsên wî yên îro?

Tevî ku ba û bahozên şer hawirdor vegirtibû, bihar, demsala geşiyê, dîsan, hatibû. Rojeke nû ya pîroz a biharê, hêdî hêdî, ber bi êvarê, diçû. Wê rojê, gelekî zû, ez bi dengê tajiya xwe ya belek ku min navê wê Belên, yanî soz, yanî ehid, lêkiribû, hişyar bûm. Dinya hê baş ronî nebûbû. Jixwe, hema çi bigire, xew neketibû çavên min; Hawar, zaroka min, ezîza ber dilê min, ê, ji nû ve, biweşiya! Bêyî ku ez Rûşenê hişyar bikim, bi hêdîka, ez ji textê razanê, peya bûm, ji odê derketim û çûm oda zariyan. Sînem û Cemo, mîna du melaykan, diniviyan. Cemo tiliyên destê xwe xistibûn devê xwe û ew dimêtin. Xweha wan a nû dê, wê rojê, bihata. Ez derketim hewşê. Bayê dinya çiksayî, hinekî, ez, hejandim. Ez çûm nik lîsên kewên xwe û bi qasî çendekê min li wan, bedewiya wan û rengên wan ên birdikî, reş, belek, spî û sor nihêrî. Min teyfik dîsan, tijî qût kir û danîn ber wan. Paşê jî ez çûm nik Belênê. Belên hişyar bû, zimanê xwe derxistibû û dinihwirî. Ez çûm ser bîrê, min sitîlek av kişand, tasika ava Belênê tijî kir û ew da ber wê. Paşê jî, heta zarok û diya wan hişyar bû, ez bi gul, kulîlk û çiçekên hewşê daketim. Kulîlk dibişkovîn, mêşên hingivîn, bi ûsil û vizeviz, vediniştin ser gul û kulîlkan. Hingê, çaxa çend ref quling, li pey hev, di esmanê vekirî yê şîn de, firiyan û derbas bûn, min serê xwe rakir û bi kêf, li wan nihêrî. Şer bû, ba û bahozên şer dinya dabû ber xwe. Lê wê rojê, digel her tiştî, dinya xweş bû, tu tişt û kesê ku ez hêrs yan jî eciz bikirama, nîn bû, kesê ku derd û kederên min bi bîra min bianiyana, tune bû. Derd û kederên ku bîhn li min diçikandin, hesreta ku ez carina dikirim mejnûn, xirabiyên ku bi min bûbûn, kurt û bistên ku li dijî min dihatin gotin, wê rojê, ji min, gelekî, bi dûr bûn. Mala germ, xaniyê bi dengê zarokan şên, bîr, yanî kahniya avê, dengê textên bîrê, dilopên hûnik ên ava bîrê ku li ser kevirên bîrê, mîna çirûskan, dixuyan û winda dibûn, hêşinahî, rengên biharê, esmanê spehî, hemû, her tiştê xweş wê rojê li dora min bû.

Û Hawar wê li wan zêde bûya.

Xewna min, xwesteka min a herî mezin, dîsan, bi cîh dihat. Diviya gotinên kurdî nemirana, diviya ew bihatina

vejandin... Berî ku tu yan jî xwendevanên Bîra Qederê bipirsin, çima "diviya", ez, bi carekê, bibêjim; Pierre Loti, ew keştiya mezin û spî, ku her roja pêncşemiyê, ji Stembolê derdiket, Zerya Marmara û Zerya Spî û pêlên wan dida ber xwe û dihat Bêrûdê, her carê, bi xwe re, hin rojname û kovarên tirkî jî dianîn. Pêşî ew weşanên ku hinekî kevn bûne, li Bêrûd û Lubnanê digeriyan, paşê jî ew, hinekî din kevntir, dihatin Şamê. Gava ew dihatin, min her tişt ji destê xwe berdida û tî û birçî, bi hesreta salan, xwe davêt ser wan û ew dixwendin. Heta rêza dawîn, heta xeberên sporê, heta xaçerêzên wan. Lê her carê jî, ez dilşikestî, xemgir û bîhnteng ji ser wan radibûm. Ji ber ku ew tijî xeberên reş bûn û berdevkên siyaseteke vajî û neînsanî bûn. Rojnameyên Cumhuriyet û Vatan'ê dihatin, Kovarên Ülkü, Kadro, Bozkurt, Türkçü Dergî, Yurt ve Dünya dihatin. Ji Yurt ve Dünya pê ve, ew rojname û kovar, hemû, kursî û organên siyaseta "tirkîzasyonê" bûn. Li gora wan, li Tirkiyê, bi tenê tirk hebûn, zimanê tirkî hebû, heyin û çanda tirkî hebû... Gel û miletên din? Ziman û çandên din? Ji bo wan, bi tenê, riyek hebû; tirkbûyin... Heçî heyin û zimanê kurdî bû, qedexe bûn. Nav diguherîn; navên hezar salan ên meriv û malbatan, bajar û gundan, deşt û zozanan diguherîn û dibûn tirkî. Navên dar û ber, gul û kulîlkan diguherîn. Binevş dibû menekşe, beybûn dibû papatya, stêrgul dibû yıldızçiçegi... şan û şoret, nav û nîşanên mirovan diguherîn, paşnavekî tirkî, mîna pîne, bi huwiyeta kurdî ve dizeliqî û dikete pey kurdan. Navê mal û malbatên kurdî dibûn Öztürk, Cantürk, Korutürk, Soytürk... Em, Bedirxaniyên sedan salan jî bûbûn Çinar. Bedirxaniyên ku bi sedan sal mîrên Cizîra Botan bûn, tesîr li navçê û dewleta Osmanî kiribûn, bi carekê, bûbûn Çinar, yanî hîç, vala, pûç. Kê dizanîbû ka Çinar kî bûn!

Zimanê kurdan hatibû jêkirin. Kilîd li zimanê wan ketibû... Û ew rojname û kovarên berdevk, her û her, bi xeberên vê yeka kambax, tijî bûn. Ew xeber dibûn tîr û bi dil û canê min diketin. Ez dibeicîm, diteqiyam. Carina ez ji xewê vediciniqîm û diqîriyam; na, nabe, divê zimanê

kurdî nemire!.. Belê, welê bû, ez welê difikirîm; gotina Amojna Stî û Bavo ku ez pê rabûbûm, mezin bûbûm, diviya nemira. Zimanê min, gotinên min ên şevên tarî ku bêdeng li ser kaxizan direşiyan, diviya kilîd bişkanda. Gotinên şevên Şamê diviya birînên zimanê kurdî yên xedar bicebirandina...
Wê rojê, danê êvarê, merhem dihat, HAWAR derdiket!

– Sed heyf ku Haco Axa ev roj nedît, Memduh Selîm Beg, kovar di destan de, ji Hesen Axayê Haco re, dibêje. Ew ê gelekî kêfxweş bûya. Ne wisan e, mîrê min?

– Bêguman, Celadet Beg, destê xwe dibe rîha xwe ya spî û dibêje. Lê ez welê texmîn dikim ku ew û miriyên me yên din, îro, di gorên xwe de, rehet, dinivin. Me mucele derxist, niha jî me şixulekî heye; domandina wê...

Celadet Beg, Roger Lescot, Kamuran Beg, Memduh Selîm Beg, Qedrî Beg, Elî Axayê Zilfo û Hesen Axayê Haco, li kêleka bîrê, li ser lingan, sekinîne û dipeyivin. Kovar di destê hinekan de ye. Piştî bîskekê, ew ê bi hev re, ji bo şîva êvarê, herin aşxaneyeke kevnar ku li kêleka Meydana Merce ye. Bi hênceta derketina kovarê, Hesen Axayê Haco ew ezimandine. Hesen Axa ku pir bi bavê xwe dişibe, çavê wî li ser kovarê, bêyî ku li Celadet Beg binihêre, jê dipirse,

– Mîrê min, ji bo domandinê çi divê?

– Gelek tişt divên, lê berî her tiştî pere û kiryar...

– Kiryariya salekê bi çi ye?

– Bi pênc lîrayên Sûrî ye...

– Mîrê min, heke tu eciz nebî, min dil heye, ez hinekî alîkariya cerîdê bikim... Berî ku ez bêm vê derê, min bazareke nexirab li dar xist û jê perene baş qezenc kirin. Para cerîdê jî tê de heye. Ez dixwazim 400 lîra bidim cerîdê...

– Mala te ava, Celadet Beg dibêje... heye ku ev alîkariya te rê veke...

– Belê, Memduh Beg dibêje, ew ê rê veke, lê me 400 lîra nîn in, em çi bikin?.. Ez ê deh lîra alîkarî bikim... herkes bi qasî quweta xwe.

– Ji min jî pêncî lîra, Elî Axayê Zilfo dibêje.

– Ji aliyê min û Nûredîn jî, Dr. Ehmed Nafîz Beg dibêje û ber bi aliyê wan tê.

– Ez jî, li ser navê hemû Cemîlpaşayan şêst lîra didim, Ekrem Beg dibêje.

Yên din jî ber bi wan, kêleka bîrê, tên û her yek, li gora quweta xwe, tiştekî dibêje.

3 Ehmedê Fermanê Kîkî, kalê malê, bi destê Sînem û Cemşîd digire û ber bi Celadet Beg û Rûşen Xanim, diya wê û Huseymayê ku li hewşê, li kêleka bîrê sekinine, tê. Dinya hê nû hişyar dibe. Destê sibê ye. Roja germ a havîna 1941-an hê nû dest pê kiriye. Celadet Beg û Rûşen Xanim bi dengan hişyar bûne û derketine hewşê. Diya Rûşen Xanimê û Huseyma jî dane pey wan.

Ji dûr ve deng tên, dengên tanq û topan...

Şerê nû yê cîhanê ku li ser kavilên şêrê yekemîn ê cîhanê, li Awrûpayê, bilind bûye, îro, xwe gîhandiye deverên Sûriye û Lubnanê. Bayên şer ku ji Ewrûpa tên, îro, mîna pêlên derya, li qiraxên Lubnan û Sûriyê dikevin. Xeberên ku wan dibihîstin, bi van dengên topan, îro, rast derdikevin. Şer li ber deriyê wan e.

– Bavo, ev çi ye? Ev dengê çi ye? Sînem dipirse û ber bi Celadet Beg tê.

– Metirse delala min, Celadet Beg dibêje û xwarî keça xwe dibe û wê hembêz dike. Ev dengê tanq û topan e, lê metirse.

– Bavo, ev deng pîs e, pir pîs e, Cemşîd dibêje.

– Herê, pîs e, kurê min...

Deng dihatin, dengê şer û mirinê, agir û şewatê gihîştibûn me jî. Agir bi dinê ketibû, tu çare nîn bû, gulokên êgir, hêdî hêdî, ber bi me jî dihatin. Agir bi Rohilatê jî ketibû.

Ev şer bi tu şerên din nedima. Bi gotina alîm û feylesofan, ev şerê nû diya hemû şerên cîhanê bû. Aleman, bi serekiya Hitler û nazîstan, ketibûn pey tolhildanê. Di şerê yekemîn de ku hingî ez jî li aliyê Qefqesan, di nav refên şer de bûm, alemanan şikestên dijwar xwaribûn, zora wan çûbû û ew ji hev ketibûn. Lê aleman, nijadê cermen, dîsan, di wexteke kurt de, xwe dabû hev. Hîtler û tevgera wî ya Nasyonal Sosyalistan, yanî nazîstan, ku min jî li Munîxê, di destpêka salên bîstan de, şahîdiya tevgera wan kiribû, dewlet bi dest xistibûn û ketibûn pey heyf û tolhildanê; ew bi Nemsê re bûbûn yek, dewleta Çekoslawakyayê ji ortê hildabûn, dirêjî Polonyayê kiribûn û Polonya û Danzîg tevî nifûseke têr bi sîh û du milyon rûniştemanan, vegirtibûn, bi îtalî û japonan re peymaneke biratiyê anîbûn pê, bi ûrisan re li hev hatibûn, êrîş biribûn ser Danmark û Norvejê û ew der jî bi dest xistibûn, paşê berê xwe dabûn Holanda û Fransê, çaxa tanqên wan ketibûn Parîsê, hingî wan, bi balafiran, dirêjî Ingilterê kiribûn. Ji ber ku Ingiltere giraveke mezin bû, çarkinarên wê av bû û nedigiha beja Awrûpayê, alemanan bi noqar û balafiran li Îngiltere, nemaze Londrayê, xistibûn. Paşê hevalbendê Alemanyayê îtalya jî ketibû şer. Wan jî dirêjî Afrîka Bakur kiribûn, Misir, Somalistan, Trablusgarb vegirtibûn. Ji wir jî, îtalî dîsan vegeriyabûn Awrûpayê û ketibûn erdên Yewnanistan û Ernewidê û ew der zemt kiribûn. Alemanan jî Mecaristan, Romanya, Yugoslavya û Bilgaristan vegirtibûn...

Lê li her derî îngilîzan û hevalbendên wan li ber xwe didan û li hember êrîşên aleman û îtaliyan disekinîn, -heta di gelek cîhan de jî bi ser diketin. Şer bi vî terhî dewam dikir.

Tu bibêje, heta havîna 1941-an jî, me şer ji rojname, kovar û radyoyan dibihîst. Gulokên agirê şerên nû negihabûn peravên Lubnan û Sûriyê. Lê destpêka havînê, tiştê ku me hemûyan dipa, qewimî; li Iraqê hikumet guherî, mîrê Iraqê Evdililah reviya Filistînê û Reşîd Elî Begê Kêlanî hukim xiste destê xwe. Reşîd Elî Beg bi ser alemanan bû, şer di navbera wî û ingilîzan de derket. Aleman hatin

hawara Reşîd Elî Begî, bi balafiran ku di ser esmanên Lubnan û Sûriyê re difirîn, li ingilîzan xistin. Lê dawiya dawîn ingilîz ketin Baxdayê, Mîr Evdililah û hevalên wî anîn û hikum xistin destê xwe. Gulokên agirê şer êdî ketibû Rohilatê. Niha jî dor hatibû Lubnan û Sûriyê. Fransiz, karbidestên Lubnan û Sûriyê, bûbûn du bir; birê hikumeta resmî ya Fransê ku bi ser Hîtler bû û birê General De Gaule ku azadîxwaz û hevalbendê ingilîzan bû. Dihate gotin ku alemanan bi alîkariya hevalbendên xwe yên fransiz, esker derxistine Lazkiyê û balafirên xwe li Şam, Heleb û Riyaqê bi cîh kirine. Loma jî ingilîzan, bi alîkariya hevalbendên xwe yên fransiz, yanî golîst, avêtin ser balafirgehên Şam, Heleb û Riyaqê û ew der bombebaran kirin. General Denz, serekamîrê Lubnan û Sûriyê, di radyoyê de da zanîn ku ew ê li dijî ingilîzan, dest bibin xwe. Lê ingilîz û fransizên hevalbend êrîş birin ser hêzên fransiz ên hikumeta Vişiyê û ew ji aliyê bakur ketin erdê Sûriyê û dirêjî Tîdmir û Dêra-Zorê kirin.

Şerê ku min baş dinasî, hatibû, dengê tanq û topan digihîştin Şamê. Bajarê medeniyeta îslamê, bajarê şev û xewnan, êdî ne bi dengê ezanê, lê bi dengên tanq, top û balafiran hişyar dibû... Heçî mala me bû, şên bûbû, pêşî Sînem, paşê jî Cemşîd hatibû. Piştî ku em têgihîştibûn ku navên ku li ber dilê me pir ezîz bûn, Bedirxan û Safter, li me nedihatin û me ew li xwe qedexe kiribûn û biryar dabû ku heke zarokekî nû were dinê, em ê navekî din lê kin, hingê ez bûbûm bavê keçeke çavreş û lawekî enîfireh. Bi hatina zariyan, her tiştê malê û jîna min, ji binî ve, guherîbû; em, ez û Rûşenê, nema bi tirkî dipeyivîn, zimanê malê bûbû kurdî. Nema alkol dikete malê, carina ez diçûm nik heval û dostan û min li ba wan, hinekî, vedixwar. Hejmara cixarên rojekê ji du pakêtan ketibû deh-donzdan. Êdî ez bêtir li malê bûm. Ji malê dengê girî û kena zarokan, dengê bilûr û awaza Ehmedê Ferman û qebqeba kewan bilind dibû. Ji malê bîhna zarokan difûrî. Li malê dermanê derd û keserên min hebû...

Lê şer hatibû, bi çirûsk û pizotên xwe agir bi dinê xistibû.

Celadet Beg, guhê wî li ser dengan, serê xwe ber bi jor dike û li esmên dinihêre. Ji rengê şîn û çend ewrên boz pê ve, tu tişt naxuyin. Lê deng tên. Ew pişta xwe dide kevirên dîwarê bîrê û li ser totikan rûdine û herdu zarokên xwe dixe hembêza xwe.

– Bavo, ev çi ye, dengê çi ye? Cemşîd destê xwe dibe rîha Celadet Beg û dipirse.

Celadet Beg bersiv nadiyê. Ew, bi dîqet, guhê xwe dide ser dengan. Deng, hêdî hêdî, nêzîktir dibin. Gelo ev dengên nû ku nêzîk dibin, yên çi ne?

– Rûşen, kızım, çêtir e ku tu zariyan bibî hundir, ew dibêje û dîsan radibe ser piyan.

Deng nêzîktir dibe. Niha ew deng dinase; dengê balafiran... Rûşen Xanim radihêje destên zarokan û wan ber bi aliyê hundir dibe. Diya wê jî bi destê Huseymayê digire û dide pey wan. Lê berî ku ew bikevin hundir, di ser hewşê re, refekî balafir, bi leza birûskê, difirin û derin.

– Ew çi bû, ew çi ye, Cemşîd bi qîrîn dibêje.

4

Bavo, ev çi ye, Cemşîd, li oda xebatê ya Celadet Beg, li ser çogên Celadet Beg rûniştî, bi ken dibêje.

– Ev Ronahî ye, kurê min...

– Ronahiya kê ye?

– Ronahiya me kurdan e.

– Ka çima ew ronî nake?

– Ronahî di nav rûpel û rêzên wê de ye.

– Mîna Hawar'ê?

– Herê, mîna Hawarê.

– Bavo, ew xweha Hawarê ye?

– Herê, ew xweha Hawar'ê ye û xweha te û Sînemê ye. Navê wê Ronahî ye.

– Bavo, de bixwîne.

– Na Bavo, mexwîne, Sînema ku li kêleka kursiyê Celadet Beg, li ber lingên bavê xwe rûniştiye û li wan guhdarî dike, dibêje. Mexwîne, lê behsa resiman bike. Resimên Ronahî'yê pir xweşik in. Ev jinik kî ye? Bêje min Bavo, ev kî ye?

– Were berxa min, tu jî were, Celadet Beg dibêje û dixwaze Sînem jî li ser çoga wî rûne.

Lê nabe, zarok êdî mezin bûne, herdu bi hev re, nikarin li ser çogan rûnin. Celadet Beg Cemşîd datîne erdê û bi xwe jî ji kursiyê peya dibe û li kêleka kursiyê rûdine. Ew li zarokan dinihêre û paşê vedigere ser kovara nû ku bi navê Ronahî derketiye.

– Ev peyayê dirêj ku kincên eskerî lê ne, general De Gol e, ew serkanê Fransa aza û fermandarê ordiya aza ya Fransê ye. Ev xanima kinik ku li kêlekê ye û serê xwe rakiriye û li General dinihêre, xudantaca Ingilîstanê, Qralîçe Elîsabet e. Heçî ev sûreta çar kesên rûken e, ew balafirvanên Ingilîstanê ne, kincên wan yên balafirvanan e. Ev sûreta kêlekê jî vapor û filûqeyên ingilîzî nîşan dide. Ew nêzîngî li noqareke birîndar a îtalyanî dikin da ku wê hêsîr bigirin.

– Bavo, pir xweş e, Bavo, dom bike, Cemşîd dibêje...

Resim û sûretên hejmara yekemîn a Ronahî'yê, yên şer, yên agirê tofanê bûn. Lê kêfa Cemo ji wan re dihat! Ji bo wî, ew bi tenê resim bûn, ne tiştekî din. Ji resiman ne dengê topan dihat ne jî bîhna xwîn û barûdê. Lê şer, bi hemû xurtiya xwe, dewam dikir. Hilweşîn û şewat ku bi ser ketibûn û zora heş û mantikê biribûn, li govendê bûn. Herwekî şerê yekemîn ê cîhanê, dinya, dîsan, mîna hêlekanekê, di nav agirên şer de, diçû û dihat. Bîhna mirin, agir û şewatê ji cîhanê dihat.

Heçî Lubnan û Sûriye bû, ketibû destê ingilîz û fransizên golîst. Li Lubnan û Sûriyê, li der û dorên Şamê, şûrê ruhistîn, bêrawest, li dar bû. Li Derhe, Xebaxib, Çiyayê Qesyûn, Mezê, Hims, Dêra-Zor, Reqe, Qamîşlok û Şamê pêveçûnên dijwar hatin pê. Şam bombebaran bû. Çend bombe li taxa me, Muhacirînê jî, hema çend sed mîtro ji

me bi dûr, teqiyan. Hin bombe jî li dora Mizgefta Emewî û tirba Selehedînê Eyûbî teqiyan. Ji bîstan zêdetir xanî hilweşiyan, nêzîkî sed kesî hate kuştin. Rojek ji wan rojan, danê êvarekê, Huseyma, di destan de çend berikên tifing û mîtralyozan, hate oda min a xebatê û gote, "Bavo, li van binihêre..." Wê ew li ser banê cîranan dîtibûn. Min jî ew berikên vala, xatireyên şer, danîn nik berikên tijî yên demança xwe. Şamî rojên bi tirs û lerz derbas kirin. Lê dawiyê hêzên Mareşal Vişy ji mintiqê kişiyan û General De Gol û serekwezîrê Ingilîstanê Mr. Çorçîl îstîklala Lubnan û Sûriyê îlan kirin.

Em kurd li kû bûn û me çi dikir? Bê guman e ku cîhê me li nik cîhana aza û demokrasiyê bû. Hem min hem jî kurdên din, bi xurtî, alîkariya hêzên demokrat kirin. Tevî zabitên fransizên aza û ingilîzan, ez, çendîn caran, çûm aliyê Cizîrê, welatê kurdan û li wir me ji kurdan hêzên çekdar anîn pê da ku bi alîkariya hêzên aza rabin. Ma şerê me kurdan ne ji bo demokrasiyê bû? Ma daxwaz û doza me ne ji bo wê bû? Ma derd û belayên me yên sedsalan hemî ne ji kêmanî û tunebûna demokrasiyê bûn?.. Piştî ku dinya hinekî li Sûriye û Lubnanê aram bû, min dest bi kovareke nû kir. Bi alîkariya fransiz û îngilîzan. Ez ê paşê bêm ser alîkariya wan û sebebên wê, lê me îmkan hebû ku me bikaribûya kovareke din jî derxista; gotinên kurdî ku winda bûbûn, ji goristanê hatibûn derxistin, bi rengên keskesorê hatibûn xemilandin, alfabeyeke hêsan û rewan bi cîh bûbû, xortên ku ji zimanê xwe hez dikirin û pê dinivîsîn, êdî, bi hez û coş, radihiştin pênûsê... Li vir divê ez navê wan bibêjim û keda wan jî berpêşî xwendevanên bi sebir ên Bîra Qederê bikim. Kamuran, birayê min ê qederê, ji Parîsê hatibû û li Bêrûdê bi cîh bûbû. Hema çi bigire her hefte me hevûdu didît. Zimanê wî paqij û rewan, bîr û dîtinên wî kûr û balkêş bûn. Wî ayetên dînê îslamê, yên mîna "Tefsîra Quranê û Hedîsên Cenabê Pêxember", bi zimanekî gelekî xweş, werdigerandin kurdî. Roger Lescot, dîplomat û orîyentalîstê fransiz ku min jê re digot "Lezgîn Axa", hebû. Ew gelekî dostê me bû û dilê wî gelekî bi rewşa kambax a ziman û edebiyata kurdî

dişewitî. Wî bi fransizî û kurdî bendên hêja dinivîsîn û folklora kurdî vediguhezand ser kaxizan. Rûşen, dotmama min a jînê, alîkara jîna min, kumandara mala min, hebû. Wê, bi navê "Rewşen Bedirxan" li ser jina kurd bendên balkêş dinivîsîn. Benda wê "Kebanî û Mamoste" deng dabû. Osman Sebrî hebû, lawê eşîran, maxrûr û bi xwe bawer. Ji herkesî bêtir, wî, bi zimanê xwe yê paqij, pênûsa xwe ya zelal, alîkariya min dikir. Xortekî nûgihîştî, Nuredîn Usif hebû, birayê kiçik ê Dr. Nazîf, xortê çeleng ê bi bejn û bal, bi zar û ziman. Nûredîn ku di pêşa min de sunet bûbû û gava kêr lêketibû, serê xwe zîvirandibû û ji min re, bi ken, gotibû, "Mamo kirîv, ez natirsim", gelekî serwext û ziman û edebiyathez bû. Wî çîrokên gelekî xweş dinivîsîn û loma jî min jê re digot, "Çexovê kurdan..." Xortekî din hebû; Qedrî Can, derketiyê Dêrika Mazî, şaîrê zimanê birîndar. Çend seyda û meleyên me hebûn; Cegerxwîn, Mele Hesenê Hişyar, Ehmedê Namî, Mele Enwer... Wan jî, bi şihîrên xwe, rûpelên edebiyata kurdî yên neçar dewlemend dikirin. Seyda Cîgerxwîn ku her carê bi qasî deh şiîran, bi destnivîsa xwe ya ku bi xaçeriyên herî dijwar dişibiyan, dişandin, pênûsa xwe mîna şûr ji kalan kişandibû û bi kar dianî. Û niha navê wan nayê bîra min, lê hîn gelek kesên din hebûn ku dihatin alîkariyê... Hîngê çima me dê dest bi kovareke din nekira û dilopeke din li behra miçiqî ya edebiyata kurdî zêde nekira?

Û dîsan rojeke biharê, yekê nîsana 1942-an, xweha Hawar'ê, xweha Sînem û Cemşîd, Ronahî hate dinê. Ez, yanî Celadet Alî Bedirxan, yanî neviyê Mîr Bedirxanê derketî û kurê Emîn Alî Bedirxanê li welatê xerîbiyê wefatkirî, yanî lawê welatên xerîb ku mîna Goethe, min di xewnên xwe de jî digot, "mehr licht", hewcedarê tîrêjên ronî bûm. Min hewcedarî bi ronahiyê hebû. Me, kurdên jihevketî û derketî, hewcedarî bi ronahiyê hebû. Jîna kurdî ku ketibû binê bîreke kûr û tarî, hewcedarî bi ronahiyê hebû. Gotinên kurdî ku birîndar û stûxwar bûn û di bin axa reş de mabûn, hewcedarî bi ronahiyê hebûn.

Mehr licht... yanî hinekî din ronahî. Yanî xweha nû Ronahî.

Di tariya şevê ya şer de, Ronahî zabû...

Bi weşandina Ronahiyê me di tarîxa çapa kurdî de gaveke nû avêt. Kovara nû bi sûret û resim bû. Resimên ku Cemşîd û Sînemê jê hez dikirin, rûpelên wê dineqişandin. Bi vê kovara nû dilop dibûn dudo. Du dilopên behreke miçiqî. Lê digel her tiştî, du dilopên zelal û hênik ku hinekî tîna mirovan dişikan... du dilopên ku hebû ku rê li dilopên nû vekirina... Ku hebû ku rê li min jî vekira ku min dîsan deftera romana xwe Heyveronê ji berkêşka masê derxista, kes û şexsan, dewr û dewran, war û wêran, tahm û rengan bixistina nav hev û çîroka şevê ku bi tîrêjên heyveke ronî diçirûsî, binivîsa...

– Bavo, Cemşîd ji vî hez dike, Cemşîd dîsan destê xwe davêje rîha Celadet Beg û dibêje. Bavo, ev çi ye?

– Ev sîwanvanekî aza ye. Vî eskerî xwe ji balafirê avêtiye, sîwana xwe vekiriye û pê hêdî hêdî dadikeve erdê. Te niha fahm kir?

– Himmm, Cemşîd serê xwe dihejîne û destê xwe îcar dibe berçavikên bavê xwe.

Celadet Beg lawê xwe hembêz dike, wî radimûse û paşê berçavikên xwe ji çavên xwe derdixe û wî davêje erdê û pê dilîze. Bav û law, li erdê, li ser mehfûran, dilîzin. Cemşîd dikene. Sînem jî tê hawara Cemşîd û xwe davêje ser bavê xwe. Lê bav zora wê jî dibe. Celadet Beg zarokan mist dide, bîhn dike, hembêz dike, guh, bîvil, enî û çavên wan maç dike. Bîhna xweş a zarokan, çermê tenik ê bedena wan a mîna şitila rihanê, kenê wan ê paqij, gotinên wan ên mahsûm...

– Bavo, bes e, bes e, Cemşîd dikene û dibêje. Min got, bes e, Cemo dibêje te, bes e...

5 – Bes e, spas. Garsonê bejndirêj ku bi ûsil qahwe tijî dike, bi serê xwe, silav dide û pêlepaş dere.

Celadet Beg, Kamuran Beg, Roger Lescot û Yusif Malik, li Lubnanê, li navçê Rasel Metn ku li kêleka geliyên kûr û benderên çiyan e, di aşxaneyeke kevnar a durzî de rûniştine û qahwa piştî

şîva êvarê vedixwin. Yusif Malik, nivîskar û rojnamevanê nas û bedengirs, ku bi eslê xwe asûrî ye û li Bêrûdê dijî, dostekî nêzîk ê Celadet û Kamuran Began e. Wî dil heye, bi navê "Alhurrya-The Liberty", bi erebî û ingilîzî, dest bi rojnameyeke hefteyî bike. Wî hewcedarî bi alîkariya hevalên xwe heye. Bi vê munasebetê, wî hevalên xwe, di dereke sakîn de, ezimandine şîvê.

– Alhurrya dê bibe dengê hemî miletên bêkes û bindest, ew, bi destê xwe yê rastê, porê xwe yê ber pi paş şehkirî, rast dike û dibêje. Celadet Beg herdu kovarên xwe li Şamê diweşîne. Kamuran Beg li vir dest bi kovara xwe Roja Nû kiriye û du hejmar, bi kurdî û fransizî, derxistine. Bi xêr, çaxa em jî Elhurrya bi erebî û ingilîzî derxin, hingî ev hemî dê hevûdu temam bikin. Ew ê hemî, bi hev re, bibin kursiya jibîrbûyiyan.

Aşxana ku bêtir cîhê mal û malbatan e, hêdî hêdî, vala dibe. Garsonên ku cil û bergên rengîn ên durzî li xwe kirine, di navbera masan de digerin û mase vala dikin. Li ser masa Yusif Malik û hevalên wî jî, ji çend teyfikên meze, meywe, fûl û humusê pê ve, tiştek nemaye. Çima fûl û humus li ser masê ye? Kes pê nizane. Tevî ku kesî destê xwe nedaye wan, ew hê jî li ser masê ne. Mase li kêleka pencereyên pir fireh e. Der di nav tariya şevê de ye, bi tenê stêrk ji esmanan diçirûsin. Û carina ronahiya lampeyên ereban ji dûr ve dixuyin. Ji penceran jî agirê findên ku li ser masê ne û êdî ber bi xelasbûnê derin, dixuyê.

– Şer hê dewam dike, Yusif Melik dibêje, lê dinya westiyaye, ez welê bawer im, dawiya şer jî, mîna van findan, tê. Lê em, kurd, asûrî, ermen, çerkez, cihû, filistînî, durzî, elewî, marûnî, dîsan, bêzar û bêziman, bêxwedî û bêkursî ne. Me jî heq û hiqûq, maf û doz lazim e. Kî dê bi doza me rabe? Heşê min tiştekî ji dinya kambax a westiyayî nabire...

> Bi gotina dostê min ê dilşikestî, lê ziravbihîstiyar, bû. Ma wexta kê, di nav agirê şer de, ji bo milet û gelên biçûk û bêkes, hebû? Dinyayê "Strana Mirinê" ku min ji Lamartine

wergerandibû kurdî û di hejmareke Hawar'ê de weşandibû, dinihwirand; "Yê ku tê mîna şev û roja borî ye / Carna êş û xebat û kêf û şahî / Carna ax û of û girîn / Carna di nav gul û gîhê / Carna di nav ax û herî / Û dawî... şeva tarî bi ser me de tê..." Di heyama strana mirinê de gel û komên ku şelpa mirinê xwarine dikarin çi bikin? Tu bi lihîstina setrencê dizanî... Di wan rojan de, dinya bûbû textê setrencê; şah û fîl û ferzîn rabûbûn hev, ew bi rim, gurz û şeşperiyan ketibûn nav hev, birc hildiweşiyan, ferzîn hêsîr diketin, siwar ji hespan, peyar ji newalan diketin û esker jî li ber lingan diçûn. Heçî miletên bêpişt û bindest bûn, di vê lehîstika setrencê de, esker bûn. Şah û ferzînan ew dajotin pêş.

Di vê lehîsteka mirinê de, qîmeta kurdan jî, li gora awirê Tirkiyê diguherî. Di destpêka şer de, Tirkiyê bi dewletên hevalbend re peymaneke dostiyê anî pê. Hingî buhayê kurdan ket. Lê demên dawiyê, Tirkiye vegeriya ser siyaseta xwe ya kevn a Osmanî û bi alemanan re tifaqeke dostiyê îmze kir. Hingî jî qîmeta kurdan li nik hevalbendan zêde bû. Bi gotina kalemêran, kela şorbê rabûbû û hewcedarî bi heskê hebû!.. Di heyama strana mirinê de, qeyideyên setrencê derbas dibûn, ne tiştekî din. Gava buhayê kurdan dîsan zêde bû, ingilîz û fransizan, mîna dewlet, nêzîkî li me kirin. Sansora tûnt hilanîn, rê li me vekirin ku em bi karên rêxistinî û çapemeniyê rabin, hin îmkanên çapê dan me. Hevalên me yên siyasî şixulên xwe yên siyasî xurttir kirin. Me jî dest bi weşanên nû kirin. Kamuran jî li Bêrûdê dest bi weşandina rojnameyeke hefteyî Roja Nû kir. Dîsan wî û hevalên wî yên kurdên Lubnanê, dest bi radyoyeke kurdî kirin. Radyo heftê du rojan, roja çarşemb û înê, li ser pêlên kurt û navîn, diweşiya. Wan ji min jî alîkarî xwestibûn. Min bendên sereke yên Roja Nû dinivîsîn û nûçeyên şer ku min ji bo Hawarê jî hazir dikirin, didan radyoyê. Loma, hema çi bigire her hefte, ez diçûm Bêrûdê. Gava ez digiham Bêrûdê, min hejmara telefona Kamuran, 84 41, dizivîrand û xebera hatinê bi wî digihand da ku ew jî bihata sûkê. Ji ber ku her cara ez diçûm Bêrûdê, min kaxizên çapê jî bi

xwe re dibirin. Kamuran dihat, me para Roja Nû ya kaxizan hildida û yên din jî di sûkê de difirot. Hêzên hevalbend ew kaxiz didan me da ku me kovarên xwe biweşandina. Lê me nîvê kaxizan bi kar dianî û nîvê din jî di sûka reş de, ji bo debara xwe, difirot. Tevî ku Kamuran awikatî dikir, Rûşenê mamostahî û min jî awikatî û tercumanî, çu carê, perê me, bi qasî qîma me, çênedibû û mesrefa weşanan jî bêpayan pir bû.
Loma, belê bi tenê loma, qorîna quling ji derdan bû...

– Mixabin, ne ez, ne kekê min Celadet û ne jî Mr. Lescot dikarin bi erebî û ingilîzî binivîsin, Kamuran Beg, bi destmaleke spî, lêvên xwe û simbêlên xwe yên zirav paqij dike û dibêje. Jê pê ve, yanî ji vê kêmaniya me pê ve, te çi daxwaz hebe, em bi te re ne û em ê pê rabin... Ma ne welê ye?

Celadet Beg û Mr. Lescot jî serê xwe dihejînin û wî tesdîq dikin.

– Hingî ez ê tavilê dest bi xebatê bikim, Yusif Melik bi kêfxweşî dibêje, bi tenê navê we, hebûna we, ji bo rojnamê quweteke mezin e. Û paşê jî ew destê xwe hildike û ji garson hesabê dixwaze.

Di wê navberê de, Celadet Beg ji berîka çakêtê xwe kaxizekê derdixe û dide Kamuran Begê ku li hember, kêleka Mr. Lescot rûniştiye.

– Benda min e, Celadet Beg dibêje. Ji bo hejmara sisiyan a Roja Nû. Min dil heye, ez îşev vegerim Şamê. Min bêriya zariyan kiriye. Tu wê werbigire û li gora dilê xwe rast bike.

Kamuran Beg kaxizê ber bi findê dike, lê dinihêre û pê re dixwîne.

– Abi, te şiîra Bavo nivîsiye, ew dibêje. Şiîra ku Bavo ji Mamê me Mîqtet re şandibû.

Paşê jî Kamuran Beg kaxiz datîne, rûyê xwe ber bi Mr. Lescot dike û şiîra dirêj, ji ber, dixwîne; pêrûz ji te re hezar cara, ev deng e niha li nav yara, mizgîniya vê cerîdeya qenc, şabaş dibîtin

çiqa hebit genc... Piştî ku ew xwendina şiîrê xelas dike, ew dîsan kaxizê dixe destê xwe û lê dinihêre û bi tenê dibêje, "şiîra Bavo, şiîra Bavo..."

Celadet Beg, bi ken, li birayê xwe dinihêre, dilopên dawîn ên qedeha xwe ya konyaka courtoise vedixwe û li Mr. Lescot û Yusif Melik vedigere û dibêje,

– Birayo Kamuran... birano... tarîx dubare dibe, qedera me Bedirxaniyan hertim yek û eynî ye... Sala 1898-an, mamê me Mîdhet li Kahîrê rojnameya xwe Kurdistan'ê diweşîne. Ew ji birayê xwe yê mezin Emîn Alî Beg ku hingî li Stembolê dijî û me mezin dike, nivîsan dixwaze. Bavê me nikare bi navê xwe binivîse, lê ew li mala me ya Kızıltoprakê, li oda xebatê, rûdine û jê re, bi navê "Lawê Şêx E. Fetah" vê şiîra hanê dinivîse û dişîne. Niha jî birayê min ê kiçik, 45 salan bi dû nivîsîna şiîra Bavo re, ji min, ji bo rojnameya xwe, nivîsan dixwaze. Ma ji vê şiîrê xweştir çi xwençe heye ku ez bikaribim bidim birayê xwe yê kiçik?.. Kî çi dibêje, bila bibêje, tarîx her dubare dibe...

6 Kî çi dibêje, bila bibêje, tarîx her dubare dibe, Monîka, kelgirî, li ber xwe dinihêre û dibêje. Tiştê ku di şerê yekemîn de bi me alemanan qewimî, dê îcar jî, bi me biqewime. Tê bîra we, gava Nietzche rexne li alemanan digirt, wî digot; her mirovî, her miletî du alî hene, aliyê ronî û aliyê tarî. Çaxa aliyê tarî zora aliyê ronî bibe, hingê jiyan ji bo wî kesî û miletî dûjeh e... Qedera me alemanan jî weha ye; tariya dûjehê, xelekên agirên dûjehê... Şewat, hilweşîn, xirbe û kavilkirin, mirin û kuştin... Ez çi bibêjim?.. şerm dikim, bi tenê şerm dikim...

– Schatz Monika, li van deran, haya me zêde ji bûyeran nîn e, tiştên ku em pê dihesin, ji destê çaran, pêncan digihên me, Kamuran Beg li Monikayê dinihêre û dibêje. Gotinên te me mat dike... Çawan dibe?.. Miletekî mîna yê aleman ku hertim bi mantiq û heşliserî bûye, çawan dikare evçend nizm be?

– Ez nizanim, ez nizanim... Na, ez dizanim, ez dizanim, lê taqeta min a gotinê nîn e. Jixwe li hember van bûyerên şer û kirinên me alemanan tu qîmeta gotinê jî nemaye... Felaket e, bi tenê felaket e... do jî weha bû, îro jî weha ye... Felaketê mohra xwe li eniya me alemanan xistiye, tu rizgarî, tu xelasî nîn e...

– Monika, xwe mewestîne, Celadet Beg ku li kêleka wê rûniştiye, destê wê yê çepê dixe nav herdu lepên xwe û dibêje. Hinekî bîhna xwe berde, were ser xwe. Paşê em ê bipeyivin...

– West? Bîhnberdan?.. nein, nein, mein fürst... Tu behsa Monika berê ya Munîxê dikî. Ez hew ew Monika me. West, bîhnberdan, îsrehet... evana ji bo mirovên normal in. Vî şerî tu tiştê normal nehiştiye. Haya we jê nîn e, ji tiştekî nîn e. Ev xeberên ku hûn dibihîsin, dixwînin, tu tiştî nabêjin. Haya we ji kampên êsîran, hemamên gazê, firûnên şewitandina merivan, çalên kuştiyan, qirkirina bi milyonan cihûyan heye?.. Mein Gott, mein Gott!..

Monîka hatibû. Hevala min a rojên Munîxê, hevriya min a dersên Nietzche û evîna min a roj û şevên birçî, ji nişkekê ve, hatibû Bêrûdê. Haya min û Kamuran ji tiştekî nîn bû. Wê rojê, danê sibê, gava telefona Kamuran lêket, ez jî li mala Kamuran, li salona wî niviyabûm. Ez û Kamuran saet sisiyê şevê vegeriyabûn malê û heta ber destê sibê, li ser gramera kurdî ku em lê hûr dibûn, xebitîbûn. Lê bi dengê tîz ê telefonê, ez jî hişyar bûm. Telefon ji balyozxana Amerîkayê bû. Dîplomatekî Amerîkayî behsa banûyeke alemanî, Monika Karlfeld, dikir. Banû li Bêrûdê bû û li Mr. Kamuran Bedir-Khan dipirsî... Mala Kamuran li navenda bajêr, li ser kolana Weygandê bû. Bi lez, me xwe da hev û em ji malê derketin. Tevî ku rê ne dirêj bû, me texsiyek ji rê vegerand, em lê siwar bûn û çûn balyozxanê. Piştî demeke çûn û hatinê, eskerên çekdar em birin hundir. Li wir jî dîplomatekî navsal û bejndirêj em birin odeyekê ku li bexçê dinihêrî. Monika, di nav kincên reş de, tûlekî reş li serî, li odê,

rûniştibû. Çaxa çavê wê bi me ket, wê xwe, bi carekê, avêt ser me. "Mein fürst, Celadet, du auch!" wê got û dest bi giriyê kir... Welê dixuya ku wê nizanîbû ku ez ê jî li Bêrûdê bûma.
Monîka reben... Ew bi qasî mistekê mabû. Cil û bergên wê jê diketin. Qermîçokên enî, binçav û rû pir kûr bûn. Çav ketibûn kortê. Ji ew Monika min a çavşêrîn, bejndirêj, gerdan û bedenxweş tu tişt nemabû. Monika ku, li odê, xwe avêtibû hembêza min, pîrejineke jar, kin û reben bû... Monika digiriya, mîna ku zelzele bi bedena wê ketibe, ew welê diheziya û bi qîrîn digiriya... Kamuran navnîşana xwe nivîsî, da dîplomat û ez ketim milê Monikayê û em ji wir derketin û dîsan hatin malê.
Monika ji goristanê, ji zeviyên mirinê, ji bêndera ruhistîn dihat. Wê alîkarî li tevgereke arîstokrat a alemanî kiribû da ku Adolf Hitler, bi siûîkastekê, bikujin. Lê tevger bi ser neketibû. Tevî ku gelek kes miribin û Hîtler jî birîndar bûbû, tevgera arîstokratan têk çûbû. Piraniya kesên tevgerê ku ji zabitên bilind, arîstokratên kevnare û karbidestên gelekî dewlemend bûn, hatibûn girtin û kuştin. Monîka jî, tevî du hevalên xwe, bi hezar zehmetiyên ku nayên heşê mirovan, xwe gîhandibû girava Maltayê. Hevalên wê li wir mabûn da ku ji wir jî herin Amerikayê, ew jî, bi alîkariya Amerikayiyan, ji bo me, hatibû Bêrûdê. Kê digot ku dinya mezin e? Tu bibêje, hema piştî bîst salan, ji nişka ve, guherî, pir guherî, em gihabûn hev.
Lê tiştên ku Monikayê behs dikirin ne îşê aqilan bû. Li Rohilatê kesî behsa wan bûyeran nedikir. Bûyerên şer, li Rohilatê, bi çend rêzên nivîskî vediguhezîn şêniyan. Hema çi bigire, haya kesî ji qirkirina miletekî, cihûyên derketî yên hezar salan, nîn bû. Monikayê behsa mirovan, şexsan, ruh, heş, êş, jan, pejn û dengên însanan dikir, ne ya rêzên nivîskî yên xeberên şer... Dilê min, bi her gotina Monikayê, bi her hêstira ku ji çavên wê dibarî, diguvişî. Ji bilî "na, nabe, çawan dibe" me nizanîbû ka me dê çi bigota. Li gora ku Monikayê digot, li her aliyên welatê alemanan û cîhên ku wan vegirtibûn, kampên mirinê hatibûn pê û di wan kampan de, her roj, bi hezaran cihû, dihatin

şewitandin. Belê, şewitandin!.. Bi sed hezaran, heye ku bi milyonan cihû hatibûn kuştin. Ne bi tenê cihû, lê kesên ji miletên din û nemaze qereçî jî, bi deh hezaran, dihatin kuştin. Min û Kamuran bi birînên qetlîam û qirkirinê dizanîbû. Di salên me yên xortiyê de, milyon û nîvekê ermen û sê sed hezar kurd qir bûbûn. Me bi bîhna hilma mirinê dizanîbû. Loma jî her gotineke Monikayê dibû kozeke agir.

Cihû... Hê di sala 1942-an de, di şeveke pûk û seqemê de, min bendeke dirêj, bi gotinên nîvmirî yên kurdî, bi navê "Zilamek û Zimanek" nivîsî û tê de qala serpêhatiyên cihuyan, Tewrat, zimanê wan ê mirî, vejandina zimanê wan û Elyêzer bin Yehûda, mêrxasê ku ziman vejand, kir. Ew bend, yek ji nivîsarên min ê herî baş e. Ji ber ku min ew, di şevên tarî de, bi hevaltiya kuliyên spî yên berfê, bi hemû hîs û kela xwe, nivîsî. Hê niha jî tê bîra min, tê de, min weha digot; "Yehuda ferhenga miletê xwe çêkir û bêjeyên ko di zimanekî mirî de nîn in, ew jî pêk ve anîn. Zimanê îbranî jî di nav cihiyan de belav bû. Di sala 1922–an de, gava Elyêzer bin Yehûda mir, zimanê îbranî yê ko berî 30-40 salî zimanekî mirîbû, bûbû zimanê miletekî. Ev ziman îro di Felestînê û di rex erebî û inglîzî de zimanekî resmî, zimanê dewlet û hikumetê ye jî..." Û paşê jî min tê de weha digot, "îro hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê mader ji bo her miletî êdî ne bi tenê wezîfeyeke şexsî lê wezîfeke milî ye jî. Heçî bi vê wezîfê ranebûne wezîfa xwe ya milî pêk ve neanîne û bi kêrî miletê xwe nehatine" û min li kurdan şîret dikir ku ew ji Elyêzer bin Yehûda dersan werbigirin... Me dê çi bigota? Me bi tenê li Monika xemgir, hevala min a comerd ku di nav bîst salan de bûbû pîrejineke porspî, guhdarî dikir... Xelekên agirê şer bi canê cihiyan ketibû. Cihû dişewitîn, dûmana ku ji cendekên wan bilind dibû, bi esmanan digihîştin...

Monika ava ku Kamuran Beg aniye vedixwe, ew çend tayên porê xwê yê kin û spî ku bi ser çavên wê ketine, dide alî, serê xwe radike û li hevalên xwe yên salên bîstan dinihêre. Ew, bi

nêrîneke kûr, lê vala, dixwaze bikene. Lê nabe. Qermîçokên rûyê Monikayê halê wê dide dest. Ji der ve, dengê erebe û şêniyan tê. Kamuran Beg radibe û pencerê digire. Monika çavên xwe yên werimî li salona biçûk digerîne. Çavê wê bi hersê fotografên ku li ser masa xebatê ya Kamuran Beg e, dikeve. Yek ji fotografan a Emîn Alî Beg, Samîha Xanim û Meziyetê ye. Emîn Alî Beg û Samîha Xanim rûniştine, Meziyet jî li paş wan, li pê sekiniye. Fotografa dudiyan a malbata Celadet Beg e; ew, Rûşen Xanim, Sînem û Cemşîd bi hev re ne. Sînem û Cemşîd li ser çogên bavê xwe rûniştine. Fotografa din jî ya Safter e. Di nav çarçeweke zêrhêlî ya biçûk de, Safter li pê sekiniye, lingê xwe yê rastê daniye ser darekê, xwe xwar kiriye, destê xwe daniye ser çoga xwe ya rastê û dikene.

– Cara dawîn, min Safterê rûken di bihara sala 1941-an de ziyaret kir, Monika bi destmaleke fireh, bîvila xwe paqij dike û dibêje. Ez û Pêlikanê ku bi rojnamevanekî nas re zewicîbû, bûbû xwedî du zarokan û navê lawê xwe Safter lêkiribû, çûn Haidelbergê, ser tirba Safter. Ew şitilên sorgulan ku Pêlikanê çandibûn, mezin bûbûn. Sorgulan bîhn didan... Piştî wê rojê, min hew Safter û Pelikan dîtin. Paşê min bihîst ku Gestapo Pelikan jî girtiye, lê ez nizanim ka xeber rast bû yan na. Eger rast be jî çi bi serê wê de hat? Ez pê nizanim. Misîbet, misîbetên ku li me qewimîne, nayên gotin... Ez şerm dikim... ez... ich...

Monika nikare gotina xwe dewam bike. Ew dîsan dest bi giriyê dike. Bi qîrîn û zarîn. Celadet Beg dixwaze jê re tiştekî bibêje, lê Kamuran Beg nahêle, ew bi destan îşaret dike da ku ew bihêlin, Monika bigirî.

FOTOGRAF 15

Ela bela bin mehmûdî... Her yer karanlık...
Je t'entende toujour, son tour... Ka banê me yê ezîzan, kanî war,
kanî lo lo, lê lê li ku, kanî deng...

1 Xezal... Çavên wê...

Fotografa 15-an a Bîra Qederê gelekî biçûk e. Heye ku ew biçûktirîn

wêneya hemû romanê ye. Di vê fotografê de çar kes hene; Celadet Alî Bedirxan, du eskerên reşik ên fransiz û yekî din. Serê kesê çaremîn ê fotografê ku kincên siwîl lê ne, nexuyaye. Roger Lescot, fotografkêşê vê fotografê, serê kesê çaremîn dernexistiye. Hemû bedena girs heta qirikê di fotografê de ye. Lê serî nîn e. Ew kî ye? Çima serê wî derneketiye?

Kî pê dizane! Lê di vê fotografa biçûk a reş û spî de, tiştê herî balkêş xezaleke biçûk e. Xezaleke biçûk ku di nav destên eskeran de, li ser erdeke qiraç, bi çavên gelekî balkêş, li kamerayê dinihêre. Esker jî li ser totikan rûniştine û bi kêfxweşî li kamerayê dinihêrin. Ew dikenin. Ew bi ser ketine; xezal, bi saxî, hatiye girtin. Ew xezala girtî, bi serfirazî, nîşan didin.

Heçî Celadet Beg, rengê rûpelên Bîra Qederê, ye, li pê ye. Lê ew li ser xezalê xwar bûye û xezal, ji stirîhan, pêgirtiye û li kamerayê dinihêre. Ji rawestê dixuye ku kesê çaremîn ê bêserî jî li kamerayê dinihêre. Xezal navenda vê fotografê ye. Heye ku loma, yanî ji bo ku xezal baş bixuyê, kesê çaremîn bêserî derke-

tiye. Roger Lescot ku ji hal û hewalê fotograf û fotografkişandinê nizane, çavika kamerayê di ser xezalê de rawestandiye.

Pêwendiyeke xurt di navbera kesên vê fotografê û kamerayê de heye. Hemû bi dîqet li kamerayê dinihêrin. Xezala biçûk jî, matmayî, li kamerayê dinihêre.

Lê xezal û nêrîna wê... Xezal di nav destan de ye. Destên ecêb, xerîb û nenas ew ji qiloç û lingan girtine. Kesên nenas li dora wê civiyane û wê, maxrûr û serfiraz, nîşan didin. Ew girtî ye. Di vê kurtedema kişandina fotografê de ew çi hîs dike? Kî dizane! Xwezî zimanê wê yan jî zimanê vê fotografê hebûya û bikaribûya hîsên wê, ji bo xwendevanên Bîra Qederê, bigota. Lê mixabin, fotograf napeyivin, ew bi tenê nîşan didin. Ev fotografa ku Mr. Lescot bi kameraya xwe ya biçûk, bi lez û ji bo Florens û Rewşen Xaniman, kişandiye, du çavên germ, şêrîn û reş ên xezalekê nîşan dide. Nêrîna xezalê ecêb germ e, bêpayan kûr e. Lê di eynî wextê de, nêrîna wê sar e, pir sar e.

Xezal ditirse. Xezal dîl e, bêgav û bêçare ye.

Nêrîna wê nêrîna dîl, bêgav û bêçaran e. Fotografa ku dê bibe xatirayeke biçûk a salên ber bi 1950-an, nêrîneke zîz berpêş dike.

Herdu eskerên reşik, di nav kincên xwe yên boz ên eskerî de, li dora xezalê rûniştine û dikenin. Di nêrîna wan de, biserketin heye, serfirazî û kêfxweşiya gihîştina hedefan heye. Lê di nêrîna Celadet Beg de ku di navbera herdu eskeran de rawestaye û bi destan ji qiloçên zirav ên xezalê girtine, ew kêfxweşî û serfirazî naxuyê. Ew xwar bûye û li kamerayê dinihêre, bi tenê dinihêre. Nêrîna wî ne mîna nêrîna xezalê ye ne jî mîna ya eskeran. Bi tenê aram û nerm e. Kincên ku li ser wî ne, yên seyd û nêçîran e. Ew jî mîna yên eskeran, boz in. Porê wî yê ku ji pêşiyê hinekî weşiyaye, ketiye ser eniya wî û eniya fireh girtiye. Porê wî spî dike. Herweha simbêl û rîha wî jî. Qelîşek û qermîçokên rûyê wî gelekî kûr in. Rengê spî yê payizê ku hew germ dike, bi ser Celadet Beg de girtiye. Celadet Beg kal û westiyayî dixuyê. Nêrîna wî nêrîneke kal û westiyayî ye.

Di vê wênê de baş dixuyê; kalîtiyê rengê Celadet Beg guherandiye û bi rengê xwe yê taybetî yê spî ew, ji nû ve, neqişandiye. Mr Lescot ku vê fotografê, bi serfirazî, ji bo bermaliya xwe û ya Celadet Beg dikişîne, bêyî ku haya wî jê hebe, nêrîna west û kederê jî dikişîne. Ew, bi nezanî, şahîdiya west û kedera çavan jî dike. Herwekî ku hatiye gotin, di neqşên her fotografekê de çend alî û çend reng hene, -wekî vê fotografa nû ya Bîra Qederê.

Nêrîna germ û sar a xezalê û nêrîna westiyayî û kal a Celadet Alî Bedirxan. Nêrînên du qederan. Na, heye ku nêrînên qederekê... Kî dizane?..

2 Kî dizane? Heye ku nêrînên Celadet Beg û Ehmedê Fermanê Kîkî, nêrînên du qederên cihê yên kurdî, mîna hev in. Heye ku ew mîna hev difikirin jî.

Şev e, bêdengiya şevê ye. Di nav bêdengiya şevê de dengê nerm û tenik ê bilûra Ehmedê Fermanê Kîkî ye. Şam e, goristana belengaz a Taxa Kurdan a bajarê îslamê ye. Tirba Mîr Bedirxan, bapîrê Celadet Beg e. Celadet Beg û bilûrvanê wî, demançe li piştan, hatine ser tirba Mîr. Mîna gelek caran, îcar jî, Celadet Beg hatiye nik kalikê xwe da ku pê re li ser hal û hewalê xwe bipeyive. Tiştên ku ew nikare bi kesî re bipeyive, ew tê û bi bapîrê xwe re dipeyive, jê re dibêje.

Wî gora bapîrê xwe daye çêkirin. Gor bûye mîna maleke biçûk, her çar aliyên wê bi qorên keviran, bi dîwaran lêbûye, banekî biçûk jî rakişiyaye ser. Gor bûye ziyaretgah, cîhê xwestek û mirazan, gazin û armancan. Îşev, di vê bêdengiya şevê û şewqa stêrkan de, Celadet Beg çiraya biçûk a gazê ya tirbê vêxistiye, li ber serê Mîr rûniştiye û geh li kaxizên ser çoga xwe, geh li tirbê, geh jî li bilûrvanê xwe dinihêre. Bilûrvan jî li ber lingên Mîr rûniştiye, geh dibêje, geh lêdixe.

Bilûrvan li bilûrê dixe û difikire; li jiyana xwe ya kal, li qedera xwe ya bi bal difikire, li gundê xwe, li xaniyê xwe yê gund

difikire. Xanî bi qorên kevirên reş lêbûbû. Mîna hemû xaniyên gund. Reşahiya dîwaran di bin tîrêjên royê yên danên êvaran de, mûna pişta şûr, dibiriqî. Hundirê malê, ji karîte û mertekan heta rojîn û teqan, bi rengê spî, siwaxkirî bû. Ji rojîn û teqan, hertim, çend kulm ronahî direşiha hundirê malê. Her du salan carekê, ji bo temamkirina ahenga rengên reş û spî, mal siwax dibûn. Mal, malên jiyana kurdî ya neçar bûn. Axur li kêleka malan bûn, pez û dewar, hesp û mehîn, mirîşk û dîk, seg û tajî, her, bi wan re bûn. Li malê mehfûrên ku ji aliyê jinebî û pîrejinên gund hatibûn hûnandin, raxistî bûn. Ew rengên wan ên germ! Zerahî û sorahiya wan a şewatê! Ew neqşên wan ên basîd, lê yekta! Çima ev nivîskar, zane û alîmên ku tên mala Mîr Celadet rojekê narin wan gundan? Ew hertim behsa rengan, neqşan dikin, lê çima ew narin gundê ku xwediyê xaniyên reş û spî ye û pişta xwe daye çiyan? Çima? Argûn û bixêriyên malê hertim ronî û germ bûn. Gulok û xêlekên agirê êzingan ji wan ber bi jor dibûn. Ferşên doraliyên argûnê, ji agirê sor, sor dibûn. Di şevên zivistanan de agirê gur govend digirt. Govendeke bêpayan ku çavê merivan tu carî jê nedibû. Paşê, li dîwarên malê, tifing, xençer, qiloçên xezal û pezkoviyan û bilûr hilawestîbûn. Tifingê ew diparastin, xençerê riya tarîx, bav û kalan, qiloçên xezal û pezkoviyan jî riya zozan, gelî û çiyan nîşanî wan didan. Herçî bilûr bû, jiyana wan bû, dengê dewr û dewranên wan ên jibîrbûyî bû. Bilûr sir û sihêrên wan bû. Herçend xaniyê wan li ser hûm, stûn, kutek û karîteyan ava bûbû, jiyana wan a gund jî ewçend li ser deng û awazên bilûr û bilûrvanan ava bûbû.

Dengê bilûrê; dostê teyr û tilûran, hevalê bayê çiya û zozanan. Bilûr; stûna şevbihurkên mîran, beg û giregiran, yara bêpayan a şevên dirêj ên zivistanan ku li dora agirê argûnê dibihurîn.

Celadet Beg, neviyê Mîr, li bilûrê guhdarî dike û difikire û bi hêdîka "werin" dibêje; heş û bîr, deng û pejn, bîranîn, bîranînên jîneke peregende werin, werin dora min, ew dibêje. Rojên zarokiya min a germ ku niha bûne siya min, hûn werin. Kızıltoprak,

Moda, Kadıköy, Cağaloğlu, Pera, Galata, Cadeyî Kebir, hûn werin. Bîrên cihê yên qedera min, bîra bexçê mamê min Bedrî Paşa, bîra mala Kızıltoprakê, ya pansiyona Cağaloğluyê, yên Munîxê, yên Safter û Bedirxan, ya mala kekê min Sureya, yên Bêrûd, Şam û Helebê, yên ku niha nayên bîra min, hûn werin, hemû werin. Şehrîban, Saadet Abla, Canan, Monika, yên din ên şevên ronî û geş ên Stembol, Munîx, Parîs, Bêrûd û Şamê, hûn werin. Rûşen, pîrika min, Rûşen, bermalî û hevriya jîna min, hûn werin. Amojna Sitî, Madam Stella, metên min, beg û banû, madam û musyoyên ku niha nayên bîra min, hûn werin. Mamên min, pismamên min, hûn werin. Safter, Sureya, birayên min ên gorbehîşt ku li diyarên xerîb radizên, hûn werin. Bavo, hûm û stûna bingehîn a bîranînên min, bavê min ê ruhşad ku li welatekî xerîb dinive, tu were. Dayê, Meziyet, çi dibe, hûn werin, ji Stembolê siwar bin û werin. Heval û dostên min ên mirî û kuştî, hûn werin. Hûn hemû bi hev re, ji gor û tirbe, war û şûnên xwe rabin û werin nik min, nik bapîrê min Mîr Bedirxan û ji min re bibêjin ka Celadet Alî Bedirxan kî ye... Ez ketime bextê we, werin û bibêjin.

> Ew nedihatin, mixabin. Lê bîr û heşê min, tevî dengê bilûra kalemêrê delal Ehmedê Fermanê Kîkî, diçû nik wan. Ez diçûm nik bapîrê xwe, ser tirba wî da ku ji wir jî biçim nik kesên ku te li jor qal kirin. Serdanên min, roj bi roj, zêdetir dibûn, hema çi bigire her hefte, ez diçûm nik bapîrê xwe, li ber serê wî rûdiniştim û bi saetan difikirîm, -yan jî min dinivîsî. Min çûyina şevê tercîh dikir. Ji ber ku hingê kes nîn bû, ji deng û pejnên windayî û mirî pê ve, tu deng nedihat. Jixwe goristan ji mala me zêde ne dûr bû. Gava bajar bi temamî dikete xewê, ez radibûm, min xwe dida hev, berik dibir devê demançê û ew girêdida, dadiketim hewşê, diçûm oda Ehmed û ew jî hişyar dikir û em bi hev re diketin rê. Na, min çewt got, em nediketin rê, em, nefesçikyayî, hildikişiyan kaşên taxa kurdan. Gora Mîr mîna mezeleke biçûk bû, çend cîhên rûniştinê û çira-

yeke biçûk a gazê tê de hebû. Min çira vêdixist û li kalikê xwe yê ku min tu carî nedîtibû, lê hertim bihîstibû, dinihêrî.
Tirba Mîr bûbû mala min a diduyan. Herwekî ku hatiye gotin, di kalîtiyê de, ling mirovan dibin gor û goristanan. Lingên min jî ez dibirim nik bapîrê min. Jê pê ve, cîhê ku ez biçûma nûn bû. Ji wan carên pir pêwist pê ve, ez danediketim bajêr. Hem pere nûn bû hem jî xeter bû. Hem jî ma min ê li bajêr kî bidîta? Der û dora min, dîsan vala bûbû. Şer bi milyonan kuştî, bi milyonan sêwî, bi hezaran gundên kavil, bi sedan bajarên şewitî, Austwich, Nagazakî, Hîroşîma li pey xwe hîştibû û xelas bûbû. Hîtler, Musolînî, nazîst, faşîst çûbûn. Dewletên hevalbend û Yekitiya Sowyetê bi ser ketibûn.
Belê, şer xelas bûbû, lê em jî xelas bûbûn. Êdî hew hewcedarî bi me hebû. Kurd dîsan ketibûn ber lingan. Êdî ew ne eskerên lîstika setrencê bûn jî. Kela şorbê çûbû, bihayê heskê bûbû perekê... Dinya dîsan, ji nû ve, par dibû. Lê dîsan ji bo kurdan tu cîh û war, di vê parkirina nû de, nîn bû. Dîsan Tirkiyê nêzîkî li serdestan, ingilîz û fransizan, kiribû. Pêwendiyên wan dîsan baş bûbûn û kurd ji bîr bûbûn. Min ji tecruban dizanibû; jibîrbûyin mirin bû. Mirinê dîsan dor li kurdan girtibû. Li Iraqê ingilîzan, bi tanq û balafiran, dirêjî kurdan kiribûn û ew şikandibûn. Li Îranê, ingilîz û rûs li hev hatibûn, piştgirtiya rejîmê kiribûn da ku rejîm komara biçûk a kurdan ku li der û dorên bajarê Mihabadê hatibû pê, bişkîne. Rejîmê komar şikandibû, gelek kes kuştibûn û serekên komarê jî bi dar ve kiribûn. Li Tirkiyê jî bi tenê tirs û tarîtî hebû. Tu kesî nikarîbû behsa kurdan û mafên wan bikira.
Heçî em, welatê Sûriyê û kurd bûn, mirin, tirs û tarîtiyê bi ser me de jî girtibû. Fransiz çûbûn. Wan qewlê xwe yê 1941-an bi cîh anîbûn û îstîqlal dabûn Lubnan û Sûriyê. Hêzeke biçûk a siwîl û çekdar mabû, lê yên din, her tiştên fransizî, çûbûn. Hukim ketibû destê ereban, ordiyeke milî ya bi quwet dihate pê. Bîr û baweriyên nasyonalist yên Michel Eflak, filîsofekî ereb ku bi eslê xwe file bû, fireh dibû. Cîh li kurdan, roj bo roj, teng dibû.

Rewşa min? Ez nizanim ka ez çi bibêjim...Tu dizanî, sîh û sê kilamên hirçê hene, hemû li ser dara hirmê ne. Çîrokên min jî welê bûn; hemû li ser neçarî û bêgaviyê bûn. Ez mîr bûm, law û neviyên mîran bûm, lê her û her neçar û bêgav bûm. Herwekî kurdan, cîh li min jî teng dibû. Piştî ku îngiliz, fransiz û tirk nêzîkî hev bûbûn, hew me dikarîbû weşanên xwe bidomandina. Îmkan nemabûn û rê li me hatibû girtin. Bi dilekî şikestî û bi hêstirên çavan ku tu carî bi gotinan nayê îzehkirin, me deriyên Hawar, Ronahî û Roja Nû girtibûn. Me ew danîbûn ser refan. Radyo jî hatibû girtin. Û bira, heval û dostên min jî, yek bi yek çûbûn. Pêşî Monika, dosta min a zirav û bihîstiyar ku bi tenê hestî û çerm mabû, çûbû. Piştî çend mehên xweş, lê kesertijî yên Bêrûdê, wê berê xwe dabû Amerîkayê û çûbû. Digel ku şer xelas bûbû û ew dikarîbû vegeriya welatê xwe, wê "Ez hew pê li wan erdên bi xwîn dikim" gotibû û riya Amerîkayê dabû ber xwe. Paşê jî piraniya dostên min ên fransiz, tevî Pierre Randot û Peder Thomas Bois, çûbûn. Piştî wan jî Kamuran, heval û hevriyê min ê daîm, gotibû, "Mirov hew dikare li van deran bijî" û çûbû Fransê. Kirîvê min Nuredîn jî ku li Unîwersîta Fransizî ya Bêrûdê dixwend, riya Lozanê dabû ber xwe û çûbû. Heval, dost û nasên mayî jî, her yek, bi derekî de pekiyabû. Kewên me yên hewşê ku şênahiya zariyan bûn, jî çûbûn. Min ew azad kiribûn. Dido ji wan vegeriyabûn, lê yên din çûbûn. Sar û seqema mirinê û zivistanê bi ser me de girtibû. Legleg û hechecîk jî çûbûn.
Herkes çûbû. Wext, wexta koçê bû.
Kî mabû? Eger em min, Rûşen, diya wê, Huseyma, Sînem û Cemşîd nehesibînin, kal û pîr û mirî mabûn. Kesên bêquwet û bêtaqet mabûn. Û Mîr Bedirxan mabû.

Bilûrvan gewriya xwe, bi xweziya xwe, şil dike, zimanê xwe li ser lêvan digirîne, bîhna xwe berdide û dîsan bilûrê dibe devê xwe û lêdixe û difikire; umir gihîştiye sedî, sed salên rengîn ji ser wan rojên zaroktiyê bihurîne... ew difikire... li gundê zaroktiya xwe, li bêriyên gund difikire. Xaniyên gund, mîna lat û zinaran,

pişta xwe dabûn çiyayê asê û bilind. Di şevên aram ên gund de, çiyê bi heyv û stêran re hevaltî dikir. Serê çiyê warê teyrên eylo û bazan bû. Hêlînên wan li ser tehtên asê yên çiyê bûn. Ji çiyê dengê ba û baranê, eylo û bazê dihat. Di danên êvarê yên biharan de, gava şivanan keriyên pêz ji çêrê dianîn, teyrên eylo û bazan jî, mîna mûyekî, xwe ji tehtan berdidan jêr. Wan xwe nedilivandin, nedidan per û baskan, bê hereket, hêdî hêdî, xwe berdidan jêr. Pez dihatin. Wexta bêriyê bû. Keçên xama yên gund, ew keçên bedew ku her nêrîneke wan bi umrekî bû, elb û sitîl di destan de, ber bi wan diçûn. Guhanên miyan tijî şîr bûn. Bêrîvanên ku memikên wan mîna sêv û purtaqalan bûn, diçûn ber guhanên miyan... Dengê teyran, mî û bêrîvanan dikete nava hev. Û dengê bilûrê. Bilûra şivan û bilûrvanan...

Celadet Beg, begzadeyê Stembolî, lê bavê Sînem û Cemşîdê Şamî, li dengê bilûra Ehmedê Ferman guhdarî dike û rûpeleke kovara xwe Hawar'ê ku hew derdikeve, vedike û bi hêdîka çend rêzên şiîreke dirêj dixwîne; kanî Cûdî, ka Herekol, ka Kepir? Ka zozanên Mîr Bedirxan, bavê Têlî, ka kê bir? Ka banê me yê ezîzan, kanî war? Kanî lo lo, lê lê, li kû, kanî deng?.."

Ew hêdî hêdî, mîna ku di xewnê de dipeyive, şiîra xwe dixwîne. Piştî ku ew şiîrê dixwîne, ew dîsan rûpela kovarê digire, kovarê datîne ser çogên xwe û li gora kalikê xwe dinihêre û dibêje; kalo, Garîbaldiyê kurdan, mîrê asî û serhildar, serekê dîlketî û derketî, tu bibêje, ez ketime bextê te tu bibêje ka ez kî me, ez li van deran çi dikim, jîna min ber bi kû de diçê? Bibêje, ji bo Yezdanê Pak bibêje, ka Cizîra Botan, welatê te, warê bav û kalan? Tu li vir dinivî, bavê min, yanî lawê te li Kahîrê, neviyê te Sureya li Parîsê, Safter li Heidelbergê, law û keçên te li Stembol, Üsküdarê... ya ez, bibêje min, ya ez ê li kû binivim? Wesiyeta Bavo ew bû rojekê ew bigihê welatê xwe û li kêleka Çemê Dîcle, di bin axa welatê xwe de binive. Wî gotibû min ku ev wesiyeta te bû jî... Lê ka? Lê ya ez? Axa reş a kîjan welatî dê min veşêre. Ez dizanim, wext tê, sîha reş a çûyinê ber bi min tê, ez nêzîkî li we dikim, lê tu bibêje min, kîjan ax, kîjan erd û welat? Kîjan...

Ew nikare gotina xwe bi dawî bîne. Ew bi hêdîka diheze û digirî. Bi hêdîka, bi şermîn. Di bin perda dengê bilûrê de, dengê giriya wî nayê bihîstin. Lê ew digirî.

3 Canan digirî. Di bin perda dengê musîka Mahler de, dengê girîna wê nayê bihîstin, lê ew digirî. Girîna Cananê jî dibe perçeyekî ji rîtm û melodiya musîka Mahler. Celadet Beg, bi tenê, bêdeng, lê dinihêre. Ew ji birayê xwe Kamuran hîn bûye; gava yek digirî yan jî dixwaze bigirî, ew hew rê lê digire. Ji bervajiyê, ew dihêle ku girî bibin hêstir û ji çavan derên. Celadet Beg li rû û porê yara xwe ya rojên Stembolê dinihêre, li çavên reş ên yekta dinihêre. Çav û rû neguherîne. Çav dîsan mîna çavên xezalan xweş û germ in. Rû hê jî ciwan û spehî ye. Bi tenê tayên spî bi porê wê ketine. Lê tayên spî jê tu tişt nebiriye, ji xweşiya wê tu tişt kêm nebûye. Tayên spî ew kiriye xanimeke kamil.

Canan, yara xewnan, ji xewnan derketiye û dîsan hatiye. Qederê, yan jî felekê, yan jî meriv dikare bibêje tarîxê ew, dîsan, pergî hev anîne. Piştî şanzde salên dirêj, bi taybetî ji bo dîtina Celadet Beg, Canan hatiye Bêrûdê.

– Derew e, kî dibêje ku ew bi xwe û bi qedera xwe dikare, derewan dike, Canan bi zehmetî dibêje û digirî. Ne em, lê qeder e ku bi me dilîze. Ne em, lê qeder e ku bi pêşerojê dizane.

Hêstir ji çavên wê tên. Tevî hêstiran bîvila wê jî tê. Ew destê xwe davê çanta xwe ya kêleka xwe, lê paşê bi destê xwe bîvila xwe paqij dike. Celadet Beg li dora xwe, li têkberên mala Kamuran a Bêrûdê dinihêre. Li ser masa xebatê, li kêleka fotografa Emîn Alî Beg, Samîha Xanim û Meziyetê, çend destmalên kaxiz li ser hev in. Ew radibe û radihêje yekê û wê, bêdeng, dide Cananê.

– Meziyetê pir silav dikirin, wê dixwest ku ez, ji aliyê wê, rû û eniya te, çav û bîbikên çavên te ramûsim, Canan bîvila xwe paqij dike û dibêje. Wê, wan, herkesî pir bêriya te kiriye. Meziyet jî haziriya hatinê dike. Eger pasaport bidinê, ew ê were

ziyareta te. Celadet, ax Ceco, hevalê min ê abadîn!.. Tu bizanibî ka me çi kişandiye! Em neketibûn şer, lê rewş ji ya şerê xirabtir bû... pere nîn bû, îmkan nîn bû, xwarin û vexwarin nîn bû, zor û zilum, tirs û xof bêpayan pir bû. Min li aliyê Kadıköyê, di lîsekê de mamostahiya fransizî dikir. Lê xwendevan kêm bûn, der û dor girtî bûn, aşxane û qahwexane vala bûn. Deng ji kesî dernediket. Xweliya mirinê li ser Stembolê reşiyabû. Şev reş û tarî bûn. Ecnebî jî winda bûbûn. Dewletê, bi navê "vergi kanunu", tiştekî nû derxistibû û pê ecnebî pir diêşandin. Ax Ceco, hevalê jîna min... Ceco...

Ew weha dibêje û digirî.

– Sevgili Canan, ağlama, sakinleş, Celadet Beg dibêje. Bîhna xwe berde, em ê hêdî hêdî bipeyivin. Sakîn be, megirî...

Lê ew digirî, ji pencerê li xaniyên doralî, li pencereyên wan dinihêre û digirî. Dengê senfoniya nehan a Mahler, bi rîtm û aheng, bilind dibe. Musîka Mahler ku bi bi ruhiyeteke nû ya sedsalan bîstan hatiye pê û hîtabî ruhê însanê sedsala bîstan dike, niha dibe pardara girîna Cananê ku dilşikestî û poşmam vegeriyaye Bêrûdê.

> Heye ku dilşikestî û poşmam ne gotinên rast ên haletê ruhiya Cananê bin. Tu dizanî, gotin divê di cîhê xwe de bi kar werin. Ew ne zêde bin, ne jî kêm. Ne pir germ, ne jî pir sar. Ne pir dûr, ne pir nêzîk. Ne comerdiya wan, ne jî çûkosiya wan di cîh de ye.Tiştê ku ez di umrê xwe yê peregende de, hîn bûm, ev bû; hostahiya gotinên kurdî yên winda û perçiqî. Gava ez ketim nav derya gotinên kurdî û noqî kûrahiyên wê bûm, hingî min dît ku her gotinekê jî can û ruhek hebû. Gotin jî mîna min û te bûn. Ew jî dizan, dijiyan û dimirin. Lê gotinên kurdî, mîna yên xelkên din, nedimirîn. Ew dihatin kuştin. Gelek ji wan hatibûn kuştin. Gelekên wan hatibûn birîndarkirin. Zimanê kurdî birîndar bû, birînên wî xedar bûn. Çaxa min, mîna hekîmekî, birînên wan derman kirin û merhem danîn ser, min dît ku ew jî, mîna min û te, digirîn, dinalin

û dinehwirin. Loma ez dibêjim, mirov divê bi qedir û qîmet, bi rêz û rêzdarî nêzîkî li wan gotinên muqedes bike, li wan hûr be û wan di cîh de lêke.
Gotin jî mîna şitilên gulan in; ji wan re hawayê paqij, tava geş, ava zelal, axa nerm, erdê avî û nêrîneke rêzdar divê. Eger ez vegerim ser wan rojên ku Canan, dîsan, ji nişkekê ve, hatibû, ez ê bi tenê bibêjim ku Canan zîz bû. Gotina zîziyê li wê û wan rojan tê. Ew hertim kelgirî bû, serê her gavê digiriya. Hêviyên wê şikestibûn, hedef û mirazên ku wê dabûn ber xwe, yekcar, winda bûbûn. Ew jî, mîna gelekên me, bi ser neketibû. Wê hê nû fahm kiribû ku jîn bi xwe têkçûn bû, ne tiştekî din...
Ew çawan û çima hatibû? Ma hewce ye ku ez dirêj bikim? Ew ji bo min hatibû. Wê dev ji Tirkiyê berdabû û li ser riya Parîsê bû. Lê wê riya xwe li Bêrûdê jî xistibû da ku min bibîne û bi min re bipeyive: Wê dixwest ku em bi hev re biçûna Parîsê, ji cîhê ku me terk kiribû, ji nû ve, dest pê bikira... Canana min ku hê jî digot "Ceco..."
Heçî çawan hatina wê bû, rojeke havînê ya germ, serê sibê, telefonek hat. Telefon ji otêla ku min mîna navnîşan bi kar dianî, dihat. Ez li Şamê, li malê bi tenê bûm, bîhna min teng, nefesa min çikiyayî bû. Wî danê sibê, min defter a romana Heyveron'ê ku min dixwest binivîsa, ji çavika masê derxistibû û danîbû ser masê. Lê pênûs nedigeriya. Min dikir, nedikir, gotin nedihatin. Ew gotinên ku bûbûn zariyên min, wê rojê, ji malê û oda xebatê reviyabûn. Min bi tenê li rûpela spî û vala a defterê dinihêrî... Li milê din, pere nemabû. Rûşenê zarok hildabûn û ew çûbûn aliyê Latzkiyê, gundekî biçûk ku jê re digotin Banias. Li wir havîngeheke dostê me Elî Axayê Zilfo hebû. Rûşen û zarok çûbûn wir. Lê pereyên wan xelas bûbûn û wan xeber şandibû da ku min hinekî pere peyda bikira û bişanda. Min ji dostekî xwe tika kiribû ku hin pere bida min. Gava telefon hat, min welê bawer kir ku ew dostê min bû. Lê na, ne welê bû. Ji Bêrûdê telefokeneke girîng, ji bo min, hatibû, resebsiyonîstê otêlê dil dikir ku ez biçûma otêlê. Otêl li kêleka Meydana Salihiyê bû. Ez çûm otêlê. Lê li wir jî ez hîn nebûm ka kê ji Bêrûdê telefon

kiribû. Jinek ku ji Stembolê hatibû, telefon kiribû û daxwaz kiribû ku ez, zûtirîn wext, biçûma Bêrûdê. Kî bû? Jinek ji Stembolê? Heşê min çû ser diya min û Meziyetê. Heye ku ew bûn... yan jî yek ji wan... Yan jî meteke min, yan jî dotmameke min. Kela heyecanekê bi min girt; naseke min, bi bîhna Stembolê, ji Stembola min hatibû!

Min qet bi bîra Cananê nebir. Ez divê li xwe mikur werim; min Canan ji bîr kiribû. Piştî çûyina wê, min xwe gelekî êşandibû da ku min wê û êşa çûyina wê ji bîr bikira. Jixwe min deftera ku wê li Stembolê dabû min û min tê de dengên doraliyên jîna xwe reşandibûn ser kaxizên spî, winda kiribû. Min hewl dida ku Canan û xeyalên Cananê jî winda bûna. Bi wextê, bi zewac, hatina zarokan, weşîna kovaran û keft û leftên jîna rojane, hêdî hêdî, Canan jî, mîna deftera xwe, winda bû... Wext dermanê her birîn û êşê bû.

Lê Canan di wexteke welê de ku min hîç nedipa, dîsan, hatibû. Gava danê êvarê yê eynî rojê, piştî ku min ew pereyên ku dostê min ê bidana min, jê wergirtin û ez çûm Bêyrûdê, dewsa dê û xweha xwe, min Canan dît. Canan, di nav cil û bergên xweş û reş de, li buroya dostê min Yusif Melik, rûniştibû. Meziyetê hemû telefon û navnîşanên min û dostên min dabûnê. Çaxa min derî vekir û ketim buroyê, berî her tiştî, min çavên wê dîtin. Ew çavên ku mîna çavên xezalan dibiriqîn, yên Cananê bûn. Bêyî Cananê kesekî din ne xwediyê çavên welê bû. "Canan" min got, "Canan, Canan!.." Wê jî bi tenê gote "Ceco!.." û giriya. Min ew hilgirt û bir mala Kamuran. Kamuran çûbû û li Parîsê, zanîngeha Sorbonê bûbû mamostayê ziman û edebiyata kurdî, lê mala wî ya Bêrûdê, bi xêra pereyên ku wî dişandin, hê li ber destê me bû. Carina, gava zarokan nefes li min diçikand, ez diçûm û li wir dimam. Carina jî heval û dost li wir diman. Min Canan bir wir.

Canan hatibû. Heçî dûr bû, bi nûr bû. Yanî car jî wê dixwest ku me dilên xwe yên şikestî bida nik hev. Lê dil şikestî bû, cebara wî zor bû, umir kal bûbû, geşkirina wî zehmet bû, beden pîr bûbû, kel jê ranedibû.

Celadet Beg radibe ser piyan, dere aliyê gramofonê, rûyê plakê diguherîne, wê dîsan datîne ser û vedigere cîhê xwe. Dewama senfoniyê, bi hêdîka, dest pê dike. Celadet Beg cixareyek ji pakêtê derdixe û vêdixe. Ew jê çend nefesan dikişîne û li Cananê dinihêre; ew keça ku dilê wî yê xort, li Stembolê, bi fîrê xistibû, ev bû. Wê dilê xort ji tirsa evîn û bedenên germ rizgar kiribû, di dilê xwe de stariyekê dabûyê, şevên tarî qulipandibûn ser bihuştên ronî, find û çira vêxistibûn, di bin ronahiya wan de, bedena xwe ya ciwan vekiribû, agir bi dilê xort xistibû, jê çirûsk firandibû, bi bêdengî, bi keneke zarîf, çav ramûsîbûn, lêv gez kiribûn...

Belê ev bû, Canan bû ku bi hêdîka lehîf ji ser xwe davêt, bedena xwe ya tazî, bi comerdî, nîşan dida û dest dikir, "were, Ceco, were..." Ev bû ku bi hêdîka ji nivînan derdiket, çarşef li xwe digerand, diçû ber pencerê û porê xwe yê dirêj ber bi paş davêt, dizîvirî û bi ûsil dikeniya. Belê, ev bû ku piştî şevên dirêj ên ronî û bêxew, bi hêdîka, serê xwe datanî ser sînga bi pirç û mîna xezaleke biçûk, di xew re diçû. Ev bû ku gava dil germ dibû, lehî lê radibû, ji binî, çavê xwe vedikir, bi daxwaz, bi coş, li çavan dinihêrî û digot, "Ceco, ax, Ceco, toujour..."Ev bû, belê, ev jina hanê ku niha kilên çavan, tevî hêstirên çavan ji rû û hinarikê wê ber bi jêr dibin, bû ku, bêdeng, bêyî ku bipeyive, xewn dineqişandin, jîn bi rengên keskesorê, dihûnand û xeyal direngandin... Belê, belê, ev bû ku wî jê hez dikir, bi hemû dil û canê xwe, bi hemû coş û kela xwe...

– Herkes te meraq dike, Canan, hinekî sakîn, dibêje. Herkes bi hêvî bû ku tu dê, rojekê, vegeriyayî.

– Ez jî bi hêvî bûm, Celadet Beg herdu destên xwe vedike û bi keneke xemgir, dibêje.

– Herkes li te û halê te dipirse. Herkes te, Celadet Alî Bedirxan, pir meraq dike...

– Kîjan Celadet Alî Bedirxan, Celadet Beg, dîsan, bi ken, dibêje, kîjan ji wan? Yê Kadıköy û Stembolê ku di nav ziman û

çandên têkel de hatiye dinê û perwerde bûye û dilê xwe daye ber agirê dilê keçeke boşnak? Neviyê Mîr Bedirxan û lawê Emîn Alî Beg ku mîna bav û kalê xwe jîna xwe bi ruhê kurdîtî û selametiya kurdaniyê neqişandiye û loma jî, mîna wan, dilşikestî, berê xwe daye gorê? Celadetê Alemanya û Awrûpayê ku prins bû, ruhê xwe bi îlmê fransizî û alemanî perwerde dikir û Bîsmark, Goethe, Nietzsche dixwend, lê rojên xwe bi du serî kartol derbas dikirin? Yê Lubnan û Sûriyê ku di nav hêlekana dijwarî, nediyarî û bêgaviyên Rohilatê de, hê jî, dere û tê? Kalê ku tu îro dibînî û rîh, simbêl û por spî kiriye û bûye bavê Sînem û Cemşîd e? Kîjan, Canana delal, kîjan Celadet Alî Bedirxan dipirsin? Kîjan?

4 – Kîjan? Bibêje kurê min, tu kîjanê dixwazî?

– Bavo, ez wî apê ermenî dixwazim, ew pir xweş lêdixe, bavo.

– Baş e, kurê min, ez ê wê ji bo te bikirim. Ew li Bêrûdê heye.

– Wî apoyî bi awaza stranên kurdî lêxistiye, ne welê bavo?

– Herê kurê min, wî dengê bilûra kurdî kiriye musîkeke yekta.

– Bavo... ez bibêjim? Ez tiştekî din jî dixwazim...

– Bibêje kurê min, bibêje...

– Ma quweta me heye?

– Herê kurê min, quweta me heye tu bibêje, tu çi dixwazî ji bavê xwe re bibêje, metirse û şerm meke.

– Bavo, li dibistanê... tu zanî, li dibistanê hevalên min hene. Ereb, kurd, ermen û suryan... Bisiklêtên wan hene. Bavo ew bi bisiklêtan tên dibistanê.

– Tu bisiklêt dixwazî, kurê min? Bibêje, tu wê dixwazî?

– Bavo, tu zanî, Abîd û Şêrko hene. Te dît, ew tên mala me jî. Bavo, bisiklêtên wan pir xweş in. Bisiklêta Abîd belek e û dibiriqe. Xelekên rengên bisiklêta wî dikevin nava hev. Gava ew lê siwar dibe û dere malê yan jî pê tê dibistanê, bisiklêt dibiriqe. Bavo ew çanta xwe jî datîne pişta bisiklêtê...

– Bavê te dê yekî welê ji te re bikire. Tu meraq meke. Bi xêr, tu ji vir derkeve, ez ê bisiklêtek ji ya Abîd jî xweştir ji kurê xwe re bikirim.

– Ma quweta me heye? Ma tu dikarî bikirî?

– Herê kurê min, ez dikarim, çima nikarim... ez ê bisiklêtekê ku dibiriqe, bikirim...

– Bavo, ez tiştekî din jî bêjim?

– Bêje kurê min, bibêje...

– Bavo, Sînem şerm dike bibêje... çanta wê kevn bûye, çavikên çantê çîriyane... li bazara Mercê, wê û Huseymayê li dûkanekê çanteyên rind ên çerm dîtine...

– Ez ê bi Sînem û Huseymayê re bipeyivim, kurê min.

Niha, tu, bi hêsanî, gotinên wê rojê vediguhezinî ser kaxizên spî û dinivîsî. Pênûs bi hesanî wan li hev tîne. Lê tu were û ji min bipirse ka min hingê çi dikişand û çi hîs dikir... Cemşîd, lawê min ê yekane, zuriyeta min, newêrîbû daxwaza dilê xwe yê zarok bigota! Wî behsa quweta me dikir û nikarîbû behsa daxwaza xwe ya bisiklêtekê bikira! Tu dê bav bî, di ser de mîr bî û lawê te dê, ji ber rewşa kambax û teres, ji neçariyê, ji te tiştekî nexwaze! Tu dê nikaribî jê re bisiklêtekê bikirî... Ma mirin jê ne çêtir bû? Eger Cemşîd ne li nexweşxanê bûya, ez ne bawer im ku wî dê behsa bisiklêtê jî bikira. Cemşîd li nexweşxanê bû, bedena wî ya biçûk bi taya nexweşiyeke xedar ketibû. Me ew biribû nexweşxana fransizî ku min ê jî paşê, piştî hilweşîna bîrê, ziyaret bikira. Cemşîd diviya li nexweşxanê bima û tedawî bûya. Lê quweta me nîn bû ku me bikaribûya mesrefên nexweşxanê bida! Me nikarîbî dermanên pêwist bikirîna! Lê bi hêviya ku min ê, dîsan, ji dostekî xwe deyn bikira û mesref bidana, me Cemşîd li nexweşxanê razand. Ez her roj, piştî nîvroyan diçûm nik wî û li ber serê wî rûdiniştim û pê re dipeyivîm. Diviya tiştekî bi Cemşîd nebûya, piştî herdu Safteran, min nema dikaribû xwe rabigirta. Cemşîd ku hê zarokê dergûşê bû, bi avejeniyê hîn bû, pêncsalî bû li hespan siwar bû, heyşt-

salî bû, bi min re hate seydê, diviya bijiya û li ser riya bav û kalên xwe bimeşiya, navê me bidomanda...
Lê rewş ne tu rewş bû, teres û kambax bû. Ez nikaribûm biniviyama, xew nediket çavên min. Ev gotina hanê ya kalemêran ku min tu carî bawer nedikir ku ew ê ewçend bibûya rastiya jîna min, mixabin, bûbû rastiya min; xewa miriyan tê, xewa birçiyan nayê. Rast e, berê jî, ez gelekî birçî mabûm, min gelek rojên birçî derbas kiribûn. Lê hingê ez bi tenê bûm. Nanê tisî, du serî kartol, pariyeke penêr têra min dikir. Niha zarok hebûn, barê malê hebû, navê mezin hebû, hatin û çûyina boş hebû. Loma çaxa ez diketim nava ciyan, hemû dijwarî, zehmetî û bêgavî li dora min diciviyan. Bêçare, ez dîsan ji nav nivînan derdiketim, min cixareyek vêdixist, li Rûşena ku çavê xwe vekiribû û bêdeng li min dinihêrî, mêze dikir û diçûm oda xebatê. Tu dê bipirsî ka min li wir çi dikir? Hîç. Ji vexwarina araq, kişandina cixarê û guman û pojandinê pê ve, hîç tiştekî. Pênûs nediliviya, gotinan koç kiribûn. Dinya bûbû tarî, tu çilka ronahiyê ji derekî nedixuya. Ne pêtek ne jî çirûskeke hêviyê...
Û di ser de jî jîna rojane, keft û leftên wê, dijwarî û mesrefên wê. Mesref pir bû, lê hatin nîn bû. Nav, şan û şoret mezin bû, lê dirav û dewlemendî tune bû. Ez çawan bibêjim, çawan bi te bidim fahmkirin? Mesela Canan û hatina wê. Canan, bi xewnên xweş, xeyalên mezin, hatibû û bi qasî sê heftan li Bêrûdê mabû. Lê piştî ku wê jî fahm kiribû ku êdî dereng bû, êdî payizê bi ser umir û bedenê de girtibû, ew, bi girî, çavên wê li min, li keştiya fransizî siwar bûbû û berê xwe dabû Marsîlyayê. Ew hatibû, agirê dilê min ê ku vemirîbû, ji nû ve, vêxistibû û çûbû.
Heye ku gotin ne di cîh de be, lê mesrefên me yên sê heftan bi qasî hatina şeş mehên Rûşenê bûn. Xwedê şahîd e, min tiştek ji yara xwe ya rojên bajarê min ê abadîn Stembolê texsîr nekiribû. Lê her tişt bi deyn bû û roj bi roj, deyn zêde dibûn. Rûşena reben gelekî xwe diêşand da ku alîkarî bike. Wê mamostahî dikir, li zarokan dinihêrî, zarok û Huseyma didan xwendin û hemû karên me dimeşandin. Min jî dixwest, pir dixwest ku alîkarî bikira.

Lê ji destê min zêde tiştek nedihat. Mixabin ez bi kêrî şixulên tîcarî û diravî nedihatim. Kamuranê me, ji min jîrtir bû. Wî hem şixulê xwe yê ziman û edebiyatê dimeşand hem jî yê tîcaret û aboriyê. Min nikarîbû, ez bi tenê bi kêrî gotinên birîndar ê kurdî dihatim. Lê wan jî pere nedikir, mîna ku Xanî, şaîrê mezin ê kurdan, mamosteyê evîndariya welêt ê bav û kalên min, gotibû, bazara wan kesat bû. Ez ji malbata ezîzan, mîrekên Cizîra Botan bûm. Karbidestên dewletên Rohilatê nas û dostên me bûn. Giregir mêvanên me bûn. Keça kekê min Sureya bi birayê Qiralê Urdinê re zewicîbû û bûbû bûka Sarayê. Damat Ehmed Namî Beg ku reîsê cumhurê Sûriyê bû, nas û xizmê Bedirxaniyan bû. Mala qiral Evdillah dostê malbatê bû. Serekwezîrê Sûriyê Husnî Zaîm dostê mala me bû. Di wextên Osmaniyan de, gava mamên min Bedrî Paşa, Xelîl Ramî Beg, Elî Şamil Paşa û yên din li Rohilatê karên dewletê digerandin, wan gelekî çêyî bi van mal û malbatên ku niha Rohilat îdare dikirin, kiribûn. Lê tu carî, min rûyê xwe ber bi wan nedikir... Min nedixwest ku ez Lala Paşa bûma, birçîbûn ji Lala Paşatiyê çêtir bû.

Heçî ew apê ermenî ku Cemşîd, bi zimanê xwe yê şêrîn, behs dikir, Aramê Xaçaturyan, musîkjenê mezin ê Ermenistanê, bû. Min du plakên wî yên kevirîn ji dostên xwe yên ermen ên Bêrûdê deyn kiribûn û anîbûn Şamê û li wan guhdarî kiribûn. Li malê gramofoneke baş ku Rûşenê, ji bo Huseyma û Sînemê kirîbû, hebû. Bi qasî du heftan, plakên yekta yên Xaçaturyan her li ser bûn. Navê plakan "Gayaneh" bû. Gayaneh keçikeke ermen bû, navê birayê wê Ermen bû ku ji keça kurd Eyşê hez dikir... Plakên ku pir xweş li hev hatibûn û li ser musîka kevnare ya ermen û kurdan lê bûbûn, du heftan mala me şên kiribûn. Li nexweşxanê, oda spî ya siwaxkirî, Cemşîdê ku rojên berşîriyê heta rojên nexweşxanê, her û her, li dengê bilûra Ehmedê Ferman guhdarî kiribû, ew plak dixwestin. Xûyê şîrê heta pîrê bû!..

– Bavo, ez tiştekî bibêjim?
– Bibêje berxê min.

– Perên Axa Delalê min, Kalo Ehmed pir in. Ew wan pereyên ku tu û mêvanên ku tên malê, didinê, vedişêre. Wê şeva hanê, bavo, gava ew apoyên fransiz hatibûn û Axayê Delal ji wan re li bilûrê xistibû... ew şev tê bîra te, bavo?

– Herê, kurê min, tê bîra min...

– Wê şevê, bavo... tê bîra te, te pere dan wî. Wî ew pere wergirtin û birin veşartin... Ew perên xwe dixe nav doxîna xwe. Zêrên wî jî hene, bavo.

– Kurê min, ew heqê wî ne...

– Lê bavo, ew peran winda jî dike...

– Çawan, kurê min?

– Gava ew dere avdestxanê û doxîna xwe vedike, pere jê dikevin û ji qulikê derin. Bavo, gerek e, ew perên xwe bide te.

– Çima kurê min, çima ew ê bide min?

– Ew wan ji bîr dike û paşê dixîne, winda dike... û Axayê Delal dibêje ku quweta te nîn e, destê te teng e. Gerek e, ew wan bide te...

5 Zînê, Zînê, gerek e, tu bidî min...

Bi vê gotina Muslîm Axa, hemû meclisa Husên Axayê Îbîş dikene. Bi qasî kêliyeke dirêj, herkes, bi dengekî bilind, dikene. Bi tenê Celadet Beg nakene. Ew cixara xwe dikişîne û li wan dinihêre.

– Naxwe, we fahm kir ku ez ê çîroka Xelîl Axa û qerwaşa wî bêjim, Muslîm Axa dibêje û dîsan dikene.

Civat jî pê re. Di vê şeva çiksayî de, meclîsa Husênê Îbîş hem şên e, hem jî germ. Bi qasî deh kesan, kurdên Şamê û çendên aliyê Cizîrê ku bi mêvandarî hatine Şamê, ji bo şevbihurkê, civiyane. Dûmana soba ku li ber devê derî ye û dûmana cixarê dikeve nava hev. Derî û pencere girtî ne, hawa odê gelekî giran e. Celadet Begê ku hînî hawa paqij bûye û sal donzdeh meh pencerên malê vedike, ji hawa odê eciz dibe. Lê ew dengê xwe nake,

çaya ku jê re hatiye, vedixwe û mîna yên din, cixarê dikişîne. Ode sade ye. Li erdê mehfûrin û xalîçeyeke basîd raxistî ye. Li ser mehfûran jî doşek. Mêvan li ser doşekan rûniştine. Husên Axayê Îbîş ne li odê ye. Ew heta dereke çûye

– Mîrê min, eger te îzin hebe, ez ê ji cemetê re çîroka Xelîl Axa bêjim, Muslîm Axa ji Celadet Beg dipirse.

– Rîca dikim, Muslîm Axa, Celadet Beg, bi hêdîka dibêje. Fermo...

Muslîm Axa li civata odê dinihêre, simbêlên xwe ba dide, dikene, "Hûn dizanin, Xelîl Axa heye" dibêje û dest bi çîroka xwe dike,

– Hûn dizanin, Xelîl Axa elimiye ku xizmetkara wî, Xaltiya Zînê, her dem aliyê wî bike û bi misînê dest û lingên wî bişo...

Muslîm Axa ku xwediyê çend jinan û çend gundên aliyê Çiyayê Kurmênc e, li vir, radiweste û dîsan li Celadet Beg dinihêre. Bala Celadet Beg ne li ser Muslîm Axa ye, ew li sobe û dûmanên ku jê radibe, dinihêre.

– Mîrê min, li qisûrê menêre, Muslîm Axa dibêje, dîsan dikene û çîroka xwe didomîne, belê, Xaltiya Zînê aliyê Xelîl Axa dike. Rojekê... Xelîl Axa... ewê xwe... yanî qamîşê xwe rep dike... û banî Zînê dike, dibêje, "Zînê, de were, aliyê min." Dema Zînê dere ba wî, ew ewê xwe... yanî ewê xwe yê rep derdixe û dibêje, "Zînê, de were, carekê jî vî rebenê ha bişo... ma tu vî jî carekê bişoyî, kevir ê bibare!"

Çîrok xelas dibe. Muslîm Axa dikene, gava ew dikene, hemû bedena wî ya girs diheje. Yên din jî dikenin. Welê dixuye ku kêfa wan gelekî ji çîrokê re hatiye. Ew, bi deng, dikenin.

Celadet Beg, bi tenê, cixare dikişîne û li Muslîm Axa, rûyê wî yê fireh, kenê wî yê bêperwa dinihêre, carekê li Muslîm Axa, carekê jî li yên din dinihêre. Bi hênceta çi vî axayî ev çîrok got? Çima? Ev ên din çima evçend dikenin? Çima ev çîrok evçend xweş û balkêş bû? Celadet Beg hê weha difikire, yekî din ê kal, bejndirêj, jar û rîhdirêj ku Celadet Beg berê hîç nedîtiye, dest bi axaftinê dike.

– Eger Mîrê me rê bide, ez ê çîrokekê bibêjim, ew dibêje, lê ya min ne mîna ya Muslîm Axa bê edeb e.

Bêyî ku ew li bersiva Celadet Beg bipê, ew dest bi çîroka xwe dike û dibêje,

– Rojekê Hezretî Miheme Eleyselam ji Cebrail dipirse, dibêje, "Ya Cebrail eleyselam, tu ayetan ji min re tînî. Baş e, kî wan dişîne? Kî ye?" Cebraîl dibêje, "Ez nizanim. Ez derim qata Xwedê, li wir ayetan werdigirim û têm. Kesê ku ayetan dide, li paş perdekê ye. Ez wî nabînim." Hezretî Miheme ji Cebraîl dixwaze ku ew careke din li paş perdê bimeyzîne, ka kî ye ayetan dişîne. Cebraîl wekî Hezretî Miheme dike, dere û perdê vedike. Lê çi bibîne? Hezretî Miheme bi xwe ye, li wir rûniştiye. Ew poşmam dibe, vedigere, tê ba Hezretî Miheme. Miheme Eleyselam bi meraq jê dipirse ka kî ye li paş perdê rûniştiye. Cebraîl dibêje, "Ya Miheme, kesê paş perdê û pêş perdê jî eynî ye, yanî tu hem li vir î û hem jî li wir î..."

Civat dîsan dikene. Dîsan, ji Celadet Beg pê ve, hemû bi hev re dikenin.

– Seyda te ev çîrok bi hênceta çi got? Celadet Beg ji kalê rîspî dipirse. Bibore, ez baş tênegihîştim.

– Min ew bi qesta mele û şêxên me got, mîrê min, xwediyê çîrokê dibêje. Tu dizanî, mele û şêxên me...

Wî hê gotina xwe xelas nekiriye, Husên Axayê Îbîş dikeve hundir. Civat radibe ser piyan. Husên Axa silav li wan dike û tê nik Celadet Beg û destê xwe didiyê.

– Mîrê min, min efû bike, haya min ji hatina te nebû, ew bi ken dibêje. Zariyan xeber bi min gihandin, ez bi lez hatim. Fermo, em rûnin.

– Na, gelek spas, eger te hinekî wext hebe, min dil hebû, em hinekî bipeyiviyana, Celadet Beg, li pê, dibêje.

– Fermo, Husên Axa dibêje û bi destan rê nîşanî Celadet Beg dike.

Celadet Beg ji civatê xatir dixwaze, pêlavên xwe yên ku li ber derî ne, dixe lingên xwe, Husên Axa jî yên xwe, dîsan, dixe lingên xwe û herdu bi hev re, ji odê derdikevin.

Di wan rojan de ku tu niha behs dikî, ez bi dûr ketibûm; ji xwe, ji hebûna xwe, ji welatê xwe, ji dem û wextên xwe yên zaroktî û xortiyê yên Stembolê, ji bîr û hîs, ji nas û dost, ji xwendin û nivîsîn, ji gotin û qiseyên birîndar dûr bûbûm. Ez dûrketî û derketî bûm. Her tişt di nav bêdengiyeke kûr de xerîbî min bû. Ez, xerîbê welatên xerîb, bûbûm xerîbê her tiştî.

Neçarî û bêgaviyê nefes li min çikandibû, ez ji her tiştî bi dûr xistibûm. Bi tenê seyd û nêçîr mabû. Bi tenê nêçîr û seydê ez ji derd û keseran, neçarî û bêgaviyan bi dûr dixistim. Dostên min Roger Lescot, Husên Axayê Îbîş û çend fransizên din ku ji nêçîr û seydê hez dikirin, bûbûn hevalên min ên revê. (Belê, nêçîr û seyd rev bû.) Sey û nêçîrê ew valahiya boş a Hawar û Ronahî'yê dagirtibû... Hema çi bigire her hefte, em diçûn seydê. Tu kêmaniyên kinc, taxim û tifingên min ên nêçîrê nîn bûn. Kinc û taximan Kamuran ji Parîsê şandibûn, tifing jî ya Hesen Axayê Haco bû. Gava berbanga sibê, berî ku ro hilhatibe, hevalên min, bi jîpê, dihatin, ez hazir bûm. Di êvarê de, min berik hazir kiribûn û berî ku ew werin, min kincên xwe yên boz li xwe kiribûn û rext girêdabûn. Û bi hatina wan, em bi rê diketin. Gerçî ne Şengê û ne jî Belênê mabûn. Şengê li kuçê di bin erebeyekê de mabû û me jê re, bi hêstirên Sînem û Cemşîd, şîneke nedîtî li dar xistibû. Belêna ku êdî pîr bûbû jî çûbû gundê xwe. Piştî ku min kew azad kirin, min Belênê jî şand gund. Jixwe seg û tajiyên min ên wefakar nebûna jî dibû, ji ber ku êdî jîp hebûn, bi jîpên Mr. Lescot û Husên Axayê Îbîş, em diketin pey nêçîrên xwe. Em diçûn nêçîra xezal û betan ku di her derên Sûriyê de hebûn. Li Cizîrê, Serê Kaniyê, navbera Dêr û Hesiçê, li doraliyên Tidmûr û Risafê, li Nasriyre û Cêrûdê... Xezal kerî bi kerî digeriyan. Carina karên wan rastî me dihatin, carina jî nêrî. Carina jî kewroşk. Di berbangên sibehan û hingûrên êvaran de, xezalan xwe li

zeviyên garisan digirtin. Gelek caran bi xezalan re bet jî dihatin dîtin.
Ji sibê heta êvarê, em li pey wan bûn. Min bîr û heşê xwe didayê, ji sibê heta êvarê, heşê min li ser wan bû, -da ku heşê min ji jîna min bi dûr keta. Lê rastiyê hertim zora xewnê dibir. Derengê êvaran, ez, tevî xezal û betên kuştî, vedigeriyam malê. Zarok li dora min diciviyan, wan û Rûşenê heywanên ku min anîbûn, dibirin mitbaxê. Sînemê dilezand û diçû plaka tirkî "Her Yer Karanlık" datanî ser gramofonê. Wê dizanîbû ku min gelekî ji şiîra wê stranê hez dikir. (Lê wê nizanîbû ku stran qulipîbû ser qedera min û wê hîsên min jî vedigotin...) Cemşîd jî textê setrencê danî da ku min pê re bilîsta.
Wê şeva ku ez çûm mala Husên Axayê Îbîş, dîsan, ez ji seyd û nêçîrê hatibûm. Îcar ez destvala bûm. Me bi tenê karikek, sax girtibû û ew jî dabû Lezgîn Axa, yanî Mr. Lescot da ku ew wê diyarî xanima xwe Florensê bike. Wê şevê, piştî ku Sînemê plak danî serê, ew hate nik min û li erdê rûnişt. Wê dil dikir tiştek bigota. Min ew pê da gotin; wê cil û bergên nû diviyan... Tavilê min xwe da hev û bi kincên seydê, ez derketim, tevî ku şev êdî dereng bû, çûm mala Husênê Îbîş. Li wir jî, her mîna ku tu behs dikî, ew şêx û axayên me rûniştibûn û çîrokên xwe ji hev re digotin! Îş û karê wan hertim çîrok bû. Bîr û heşê wan her li ser çîrokan bû. Xwendin, nivîsîn, afirîn, avakirin, eser, medeniyet... ev tişt dûrî wan bû. Şeb û şekir li nik wan yek bû. Bi pîqepîq, ew dikeniyan û mîna her carê, şevbihurka xwe li dar dixistin. Wexta leglegê diçû bi leqleqê... Eger yekî ku ew nas nekirina, li wir bûya, wî dê bawer bikira ku dostî û samîmiyeta wan kesên rûniştî bêpayan bû. Lê min dizanîbû ku ne welê bû. Ew bi hev re dikeniyan û çîrokên mele û şêxan digotin. Lê li pey hev jî dijminê hev bûn û hezar û yek tiştî li dijî hev digotin. Herweha li dijî min jî... 24-25 salên min ên Rohilatê hînî min kiribû; kurd ne yek bûn, yekîtiya wan pir dijwar bû û wan gora hevûdu dikolan. Dinya dijminê wan bû, ew jî dijminê hev bûn. Her cara ku min civatên wan didîtin, gotinên Ovidius, mamosteyê rojên min ê Stembolê, dihatin bîra

min; mirov gurê hev in... Lê kurd ne bi tenê gurê hev, ew ruhistînê hev bûn jî. Dinyayê nefes li wan çikandibû, wan jî, bi dijîtî, berberî, hesûdî, dexesî, teşqele û xirecirên biçûk û pûç, her roj, her saet, her deqe, nefes li hev diçikandin. Dinyayê rê li wan girtibû, wan jî li hev... û li min... li min... Hingê li parlamentoya Sûriyê şanzdeh wekîlên kurdan hebûn. Min hemû dinasîn, hemû dihatin û diçûn mala me. Lê me dikir nedikir, me nikarîbû ew bianiyana nik hev da ku wan ji bo gelê xwe yê reben û bêmaf tiştin çê bikirana. Ew nedihatin nik hev, -ji ber ku ew li dijî hev bûn, na ne li dijî hev, dijminê hev bûn. Ew diçûn û bi dijminên ziman û çanda kurdî re dibûn yek, lê ne bi yên xwe re!.. Dev jê berde, em gotinê zêde nekin. Tu vegere ser romanê, ser bîrê, bîra qederê...

– Mîrê min, fermo, emrekî te? Husên Axa, li ber derî, ji Celadet Beg, bi meraq dipirse. Xizmetek ku ez bikaribim pê rabim?

– Husên Beg, ew zeviyên te yên gund... Celadet Beg ji pakêta cixarê cixareyek derdixe, wê vêdixe û bêyî ku li Husênê Îbîş binihêre, dipeyive. Tê bîra te, te behsa wan zeviyan kiribû...

– Belê, tê bîra min.

– Gelo ew ji bo pembû nabin? Niha herkes behsa pembû dike herkes pembû diçîne... Mirov nikare li wir pembû biçîne?

– Belê, çima na. Erd gelekî rind e. Lê av divê...

– Ma mirov nikare bîrekê bikole û jê av derxe?

– Belê, çima na... Av pir e, meriv dikare avê derxe.

– Husên Beg, min biryara xwe daye, ez divê dest bi şixulekî bikim ku hinekî pere bîne, hinekî halê me çêtir bike. Eger bi dilê te be jî, mi dil heye, em pembû biçînin...

– Mîrê min, siheta te xweş. Ne hewce ye ku em gotinê rakin û daynin. Ji niha pê ve, ew zevî yên te ne...

– Husên Beg, em ê pembû biçînin, em ê bîreke yekta bikolin, jê aveke boş derxin û em ê pembûyeke baş rakin...

6 – Me pembû çandiye, bîrek kolaye û em bi hêvî ne ku em ê jê aveke boş derxin û pembûyeke baş rakin... Xweha min a delal, halê me dê baş be, halê te jî, yê me hemûyan...

Meziyet hatiye.

Xewna bîst û çar salan bi cîh bûye. Piştî wexteke dirêj, gelekî dirêj, ew gîhane hev. 24 sal, salên dirêj, dijwar û kambax. Salên bi bêrî û tijî hesret. Meziyet, Mezoya malbata Bedirxaniyan, tevî mêrê xwe, hatiye Şamê, serdana kekê xwe.

– Celadet Abi, Huseyma û Sînemê ez îro li bajêr gerandim, Meziyet destê xwe davêje porê Sînema ku li kêleka wê rûniştiye û dibêje. Em çûn ser tirba Selehedînê Eyûbî. Sînemê her tiştî, bi kitekit, bi min da zanîn.

Êvar e, ew li ser şîvê rûniştine. Xwarinên ku ji bo wê êvarê çêbûne, yên Cizîra Botanê, yên Amojna Sitî ne. Rûşen Xanim û Meziyet, bi hostehî, ew çêkirine. Bîhnên cihê yên rojên kevn ji xwarinan difûrin.

– Abî, ev xwarin divê bêtin bîra te. Amojna Sitî û Dadê ew çêdikirin. Tê bîra te? Gava mam û metên me mitbaxa me ya mezin tijî dikirin û bi qise û kenên xwe mitbax geş dikirin, eynî ev bîhn bûn ku ji mitbaxê difûrîn. Tê bîra te?

– Çawan nayê bîra min? Lê tu qet behsa dayê nakî...

– Bavo tu zanî me çi kirîn, Sînem dibêje û gotina bav û meta xwe dibire. Tu dê ji wan gelekî hez bikî, ez dizanim.

– We çi kirîne, keça min?

– Me plakaAida kirî... Metê wê pir xweş dibêje... û me plakeke din jî kirî...

Celadet Beg bi ken li keça xwe dinihêre û li hêviya bersiva wê dimîne. Lê Sînem bi tenê dikene û li meta xwe dinihêre. Met jî dikene.

– De ka tu nabêjî? Celadet Beg ji qedeha xwe ya araqê çend qult vedixwe û dipirse.

Sînem serê xwe dihejîne. Wê dil nîn e ku bersiv bide. Çavên wê li ser meta wê, ew dibêje, "yek, dido û sisêêê... " û ew û Me-

ziyet, bi hev re, dest bi stranekê dikin; Je t'entend toujour, son tour, toujour...

Belê, "Je t'entend toujour, son tour, toujour..." Strana mala me ya Kızıltoprakê, strana ku her rêzeke wê, bi dengê Mezo, dibû yakûd û lûlû. Strana danên êvarên bexçê mala me ya duqatî. Mezo û Sefo ew digotin. Me jî, min, bavo, dayê û birayên min din ên, bi ken, li wan guhdarî dikir. Lê kê dizanîbû ku keça min jî dê piştî 40-45 salan, li Şamê ew bigota!..

Yek ji wan stranên pêşîn ku Sînem hîn bû, ew strana fransizî bû. Hê zimanê wê baş nedigeriya, wê dest bi vê stranê kiribû. Ji bo wan salên min ên Stembolê û xweha min a zimanşêrîn, min ew hînî Sînemê kiribû... Û niha jî Mezo û Sinemê, bi hev re, ew digotin. Çavên min ên westiyayî ji kêfan dibiriqîn.

Mezo hatibû. Dinya bûbû ya min, ez dîsan vegeriyabûm dinyayê. Mezo rojên min ên zaroktiyê anîbûn, Stembol anîbû, tahm û bîhnên ku min ewçend bêrî kiribûn, anîbûn. Mezo, xweha min a esmer û çavreş, xweşsohbet û samîmî, stêrk û şevên ronî, tav û tîrêjên germ li payiza umirê min vegerandibûn.

Gava ew hate, ez ne li malê bûm. Min xwe dabû karê xwe, çandina pembû. Ez hertim li gund, li ser zeviyan bûm. Me bîreke mezin, li kêleka zeviyan, dikola. Rojekê, gava ez ji gund vegeriyam, Rûşenê gote min, "Celadet Abî, Meziyet hatiye..." Pêşî ez tênegihîştim ka wê çi digot, paşê hêdî hêdî ez têgihîştim. Min li dora xwe nihêrî. "Ka, ew li kû ye", min gotê. Ew hê nehatibû Şamê, li Bêrûdê bû. Wê telefonî malê kiribû û bi Rûşenê re peyivîbû. Wê û Rûşenê hevûdu nas nedikirin, hevûdu nedîtibûn. Rûşenê, bi carekê, xwe dabû hev û bi rê ketibû, çûbû û ew li Bêrûdê dîtibû. Paşê jî ew dîsan vegeriyabû. Bi rojan, ez li gund dimam. Gava ez vegeriyam û Rûşenê xebera hatina Mezo da min û got ku ew hê li Bêrûdê ye, ez gelekî eciz bûm. Çima wê ew neanîbû? Paşê min fahm kir, çima. Ez kal bûbûm, esebiyetê ez xistibûm. Nemaze piştî şikesta

Komara Mahabadê ya kurdî, xewa şevan li min heram bûbû. Û çaxa bi qasî kêliyekê xew biketa çavê min jî, ez ji xewê vediciniqîm û hişyar dibûm. Eger min xweha xwe, ji nişkekê ve, li hember xwe bidîta, heye ku tiştekî bi min biqewimiya. Rûşen û Mezo weha fikirîbûn.

Ma hewce ye ku ez hîsên xwe yên dîtina piştî bîst û çar salan, niha, bibêjim? Wê, bi girîn, xwe avêt hembêza min. Ew li min piçikiya û rû, rîh, gum, çav û eniya min ramûsî. Ne ji min, ne ji wê deng derdiket. Ew digiriya... Ji çavên min jî çend hêstir gêr bûn... Paşê, hêdî hêdî, em dîsan hînî hev bûn. Mezo, dîsan, eynî Mezo bû; şên, bi henek, zimanxweş, dengbedew û bihîstiyar. Lê neçarî li dora wê bû jî. Jînê li wê jî xayintî kiribû. Dengê wê, xwendin û perwerdeyiya wê nema bi kêrî tiştekî dihat. Wê li Stembolê atolyeke terzîtiyê vekiribû û cil û bergên jinan didirû. Xweha min a bîrbir ji Rûşen, Huseyma û Sînemê re jî kinc dabûn dirûn û anîbûn.

Li pey kena wê ya hertim endîşeyeke diyar hebû. Qermîçokan li ser rûyê wê jî rê vekiribûn. Herçiqas ne mîna min porspî bûya jî, tayên spî porê wê jî vegirtibûn. Xweha min a ku mîna şitilan bû, gelekî qelew û fireh bûbû, rûyê wê gilovertir bûbû, di bin çavên wê de kîsikên biçûk hatibûn pê... Jîn bêşop derbas nedibû. Tevî vê, tevî ew qeda û belayên ku bi serê me de hatibûn, em hê jî mêvanê jînê bûn!.. Mezo jî, mîna min, ji araqê hez dikir. Gava Rûşen, zarok û mêrê wê ku yekî nenas bû, diçûn û radizan, min û wê dest bi sohbeta xwe dikir. Min dipirsî, wê digot. Mam û met, nas û xizm, kes û şexs, cîh û war, reng û tahm, mal û tax, cade û kolan, deng û pejn, yek bi yek, dihatin û dibûn mêvanên sohbetên me. Çaxa serê me hinekî xweş dibû, wê ji min dipirsî, "Abî, ez wan stranên ku te jê hez dikirin, bibêjim?.." Min ê çawan bigota na... Wê dest bi stranên mala me ya zaroktiyê dikir, em herdu bi hev re, difiriyan û diçûn Stembolê, mala me ya bi bexçe û bîr.

Lê wê bi tenê behsa Dayê nedikir. Her cara ku qala Dayê dibû, wê gotin diguherî. Min rewşê fahm kiribû, lê min xwe li nezaniyê datanî. Lê heta kengê?

– Mezo, sevgili kızkardeşim, xweha min a delal, Celadet Beg ji teyfika ber xwe, tîkeyekî goştê biraştî yê xezalan, jêdike, dibe devê xwe û bi ken dipeyive, xweha min, mixabin, em hew zarok in... Tu ji kekê xwe re bibêje... Dayê... çawan wê wefat kir?

Bêdengiyek bi ser sifrê de tê. Kes napeyive. Celadet Beg bi gotina xwe poşmam dibe. Lê tîrê ji kevanê firiyayî hew vedigere. Ew qedeha xwe dibe devê xwe û li xwişka xwe dinihêre. Meziyet li birayê xwe dinihêre, li çavên wî, li bîbikan dinihere.

– Destpêka salên sîhan bû, ew çavên xwe ji kekê xwe direvîne û dibêje. Destpêka havînê bû. Danê êvarekê bû. Wekî her carî, wê rojê jî, dayê dolbenda xwe avêt serê xwe û derket bexçê, nik bîrê û li bîrê û daran nihêrî. Piştî wefata bavo, dayê jî guherî. Ew zêde nedipeyivî. Gava ew dipeyivî jî, ne bi me re, lê bi bavo, Safter û we re dipeyivî. Wî danê êvarê jî, ew li ber masa kêleka bîrê rûnişt û hin tişt gotin, peyivî. Min jî, di nav teyfikeke fireh de, purtaqal û mandarîn birin û danîn ser masê. Min jê re purtaqalek û mandarînek qeşilandin. Wê ew, hêdî hêdî, xwarin, yek ji bo xwe, yek jî, ji bo bavo... tu dizanî, bavo çiqas ji purtaqal û mandarînan hez dikir... Wê hûn pirsîn, xeberên we yên dawîn pirsîn. Em hinekî li ser we peyivîn. Paşê jî wê xwest hinekî razê. Min ji hundir şûlek anî û avêt ser sînga wê û ez vegeriyam hundir. Çûyin, ew çûyin bû... Ew ket xewa kûr û nema vegeriya. Sakîn û bêdeng, eynî mîna bavo... Me ew li goristana Üsküdarê defn kir, nik mam û metên me. Me nexwest ku hûn pê bihesin. Jixwe derdê we têra we dikir...

Deng ji kesî dernakeve. Celadet Beg li qedeha pêşiya xwe dinihêre, bi tiliyên xwe, wê dizîvirîne. Meziyet, bêdeng, çavên xwe paqij dike. Piştî kêliyekê, Celadet Beg, bêyî ku serê xwe rake, bi dengekî pir nizm, dibêje,

– Çok yazık oldu... Çok yazık oldu...

Ew çend caran gotina xwe dubare dike.

– Anne, annem, yadê, dayê, ew, pêşî bi tirkî, paşê bi kurdî, dibêje. Reh û rêçên jîna min, zarokiya min, sebeba hebûna min, kîbara min, bêdenga min, bextreşa min, dayê, dayê...

Celadet Beg hew dikare xwe rabigire, dest bi giriyê dike. Pêşî giran, pir giran, paşê bi deng... Ew digirî, serî û rûyê xwe dixe nav herdu destên xwe û digirî...

FOTOGRAFA DAWÎN

Bîr; bîra qederê, bîra mirinê... heş û bîr... bîrbirina qederê... bîr, kaniya umir û jînê, warê pêşîn û dawîn...

1 Belê, rûpelên romana Bîra Qederê, hêdî hêdî, digihên dawiyê. Her destpêkekê dawiyek heye; Bîra Qederê jî fotografeke dawîn heye. Fotografa dawîn a çûyinê ye; çûyina dawîn a bêveger...

Fotograf a mirinê ye. Ev fotografa dawîn a romanê ku gelekî ronî ye, tarîtiya çûyin û mirinê nîşan dide.

Sal 1951 e, ji rojan 15'ê tîrmehê ye.

Germ e, tevî ku danê êvarê ye, dinya dikele. Bajarê Şamê û taxa kurdan a bajêr, bi xebera reş, dikele; mirina ku ji lehengê vê romanê pê ve kesî nedipa, hatiye û ber bi axa reş, şûn û warê vegera dawîn, bi rê ketiye.

Çare nîn e, li hember mirinê tu çare tune.

Di fotografê de, li pêş cenaze dixuye. Li ser milên çar kesan, cenaze bi rê ketiye û dere. Li pey cenazê jî xelkekî pir, bi gavên giran, di kolaneke fireh de, dimeşe. Seriyê dawîn ê xelkê naxuye. Kevirên kolanê, bi şewqa tîrêjên tavê, dibiriqin. Esman vekirî û zelal e, ne ewrek, ne jî tarîtiyek dixuye. Dinya ecêb ronî ye.

Şênî, hêdî hêdî, serê wan li ber wan, dimeşe. Ew kî ne? Kesên ku nasên xwendevanên Bîra Qederê ne, tê de kêm in. Di navenda rêza pêşîn de, Cemşîd duxiye. Li herdu kêlekên wî jî Husnî Begê Berazî û Yusif Melik dixuyin. Herdu ketine milên Cemşîd û dimeşin. Bi qasî ku ji fotografê dixuye, kes napeyive.

Koça dawîn bêdeng tê pê. Bajarê rengîn ê îslamê, bêdeng, li vê çûyina dawîn a mûrekî kurdan şahîdî dike. Û fotografa dawîn a Bîra Qederê, bêdeng, şahîdî li roja dawîn a umrê Celadet Alî Bedirxan dike.

Celadet Beg dere.

Cemşîd ku hê nû ketiye donzdehan, li pey bavê xwe dimeşe. Serê wî li ber wî, di navbera mamên xwe de, li pey bavê xwe, cara dawîn, dere. Piştî vê roja germ a havînê, ew ê hew li pey bavê xwe here. Ew ê hew pê re be, hew pê re bipeyive, jê re bibêje, "Bavo, bavo binêre, ez mezin bûme, ez bûme Mîr Cemo..."

Cemşîd çi difikire, çi hîs dike? Ma meriv li pey mirinê çi hîs dike?

Keser, bi tenê keser.

Mîna şitilekê, dirêj û zirav, Cemşîd dimeşe û bavê xwe bi rê dike. Kî çi dibêje, bila bibêje; mirin ecêb e, çûyin û koça dawîn kambax e. Mirin keser e. Ew nayê qebûlkirin. Cemşîd li pey bavê xwe dere û wî bi rê dike, lê ew ê çawan qebûl bike ku bavê wî dê hew vegere malê, hew bi dengê xwe yê gur bipeyive û hew jê re bibêje, "Cemo, kurê min, ez ketime bextê te, tu min, bavê xwe yê kal, şermezar dernexînî?.."

Fotografa dawîn a romanê, bergeha dilsoj a veqetînê ye; Celadet Beg ji jiyana rengîn, lê pirî caran kambax, vediqete, ji Cemşîd vediqete, ji heval û dostên ku di wênê de dixuyin, vediqete, ji Rûşen Xanim, Huseyma, Sînem û Ehmedê Ferman vediqete, ji zimanê xwe yê birîndar û rûpelên kovarên xwe vediqete. Ew ji dinê vediqete.

Celadet Beg, li ser milên çar kesan, di xewa ebedî de razayî, ji dinê xatir dixwaze û dere. Piştî vê fotografê êdî tu kes ê nikaribe fotografên wî bikişîne. Tu kes ê nikaribe wî li ser kitab, kovar û kaxizan bibîne. Tu kes ê nikaribe wî di kêf û henekan de, şîn û taziyan de, seyd û nêçîran de bibîne. Îro, yanî roja 15'ê tîrmeha 1951-an ku ev fotografa dawîn hatiye kişandin, roja dawîn e. Îro roja veqetînê ye. Piştî îro êdî bi tenê valahî, xewn û xeyal hene. Ji îro pê ve êdî rastî dê biqulipin ser xewn û xeyalan...

Di fotografa yekemîn a Bîra Qederê de merivek hebû. Di bihara 1893-an de ku dinya û jiyan, ji nû ve, dest bi geşbûnê dikir, merivekî, li ser giraveke biçûk li kamerayê dinihêrt. Meriv navenda wê fotografê bû. Di fotografa dawîn de jî, dîsan, meriv navend e. Fotografên Bîra Qederê bi merivekî û hebûna wî dest pê dikir û bi merivekî û çûyina wî xelas dibe.

Hatin û çûyin; du haletên herî însanî yên cîhanê. Fotografa dawîn a Bîra Qederê strana veqetîn û çûyinê, bêdeng, bêzar, dinehwirîne.

2

Kurê min, guhdarî bike, ev strana bêdeng a veqetîn û çûyinê ye, lê guhdarî bike, Celadet Beg li Cemşîd dinihêre û dibêje.

– Na bavo, ez naxwazim lê guhdarî bikim, Cemşîd serê xwe dizivîrîne û li bavê xwe vedigerîne. Ez bi wê dizanim, min berê jî lê guhdarî kiriye. Ez wê naxwazim.

Celadet Beg ku li ber serê kurê xwe rûniştiye, dikene, destê xwe yê rastê dibe ser serê lawê xwe û porê wî mist dide. Saet deh û nîvê êvara 14'ê tîrmeha 1951-an e. Di oda Cemşîd de, bi tenê çira biçûk a li ber serê Cemşîd vêxistiye. Mal bêdeng e. Ehmedê Ferman, Huseyma, Rûşen Xanim û Sînem, herkes, çûye oda xwe. Dinya jî germ e, tevî ku hemû pencerên malê vekirî ne, germahiyeke giran bi ser malê ketiye. Mîna ku ew gelek caran dike, vê êvarê jî Celadet Beg hatiye oda kurê xwe û jê re tiştine edebî, bi kurdî, dixwîne. Umrê Cemşîd êdî mezin e, ew bi xwe jî, gelek caran, tiştên edebî, ji bo bavê xwe dixwîne, lê vê êvarê Celadet Beg dil heye, jê re, ji rûpelên Hawara ku hew derdikeve û hew kes behs dike, hin tiştan bixwîne.

– Berxê min, Celadet Beg dibêje, tu guhê xwe bide vê stranê. Lamartine, şaîrê mezin ê fransizî, ev nivîsiye. Bavê te jî ew wergerandiye. Şiîreke gelekî zîz e, guhê xwe bidiyê.

– Na bavo, ez naxwazim...

Lê Celadet Beg lê guhdarî nake, ew berçavikên xwe dibe ber çavên xwe, rûpelên kovarê hinekî ber bi çirê dike û dest bi xwendinê dike, hêdî hêdî;

> Çûyin; bê girîn û zehmet e; / Ez ê herim... / Mîna pelekî sivik / Ko ba ji darê diweşîne... / Ez ê herim bê ax û zarîn; / Bê şîn û girîn. / Girîn û hêstir ji bona çi? / Ez ê herim! / Mîna ba û bablîsokê, mîna av û ronahiyê... / Xwedê dilê min / Li ser sindiyana jiyînê danî; / û bi girane û zompên qehr û xweşiyê lê da...

– Bavo ez naxwazim... Cemşîd, bi hêrs, dibêje û destê xwe davêje rûpela ku Celadet Beg dixwîne. Ez naxwazim li vê guhdarî bikim... Eger tu dê bixwînî, hingê ji min re çîrokeke Şehrezadê ya Hezar û Şevekê bixwîne...

Celadet Beg, dîsan, li kurê xwe ku di nav ciyan de dirêj bûye, dinihêre. Cemşîd jî, hinekî bi heyret, li bavê xwe dinihêre. Çavên reş ên mîna hev, bi qasî kêliyekê, li hev dinihêrin. Di bin ronahiya qels a çirê de, çavên Cemşîd, mîna du lib yakûd, dibiriqin. Germahiyekê bi ser Celadet Beg de tê, dilê wî diguvêşe.

– Kurê min, ew dibêje û xwar dibe, ji çavê kurê xwe maç dike. Kurê min... lawê min, pêşeroja min...

Ew çend caran ji çavê Cemşîd maç dike, wî hembêz dike û radibe ser piyan.

– Ez herim nik eta te Sînemê û ji wê re jî bibêjim "şevbaş", ew dibêje û ji odê derdikeve.

> Şev dadiket. Ez û şevê, hevalên hev ên umrê derketî, dê dîsan, bi tenê, bimana. Şevê dê dîsan ez hembêz bikirama û aliyên xwe yên nû û veşartî nîşanî min bida. Lê berî ku min xwe berda hembêza şevê, min diviya ji zarokan xatir bixwesta. Hema çi bigire, min ew hew didîtin. Ez li gund, li ser pembûyan bûm. Pirî caran li wir dimam û bi tenê ji bo tiştên pêwist dadiketim bajêr. Ez û Husên Begê Îbîş li hev hatibûn; me dê, bi rêdana Yezdanê Pak, pemboyeke

baş rakira... Wî texsîr nedikir û ew ji tu mesrefê nedireviya. Min jî texsîr nedikir û ez bi roj û şev dixebitîm.
Divê bête bîra te ka min çawan xwe bi dil û can dabû karê weşandina kovaran. Her welê, niha jî, min xwe dabû karê çandiniyê. Cemşîd diviya, bi keser û xemgînî, li bisiklêtên hevalên xwe nenihêriya, diviya, mîna hevalên wî, bisiklêtên wî jî hebûna. Sînema min ku bûbû keçikeke xama diviya, bi dilê xwe li xwe bikira... diviya ew neketa pey hesabên qurişan... Min diviya siûda teres a neçariyê biqulipanda ser heyinê. Ne ji bo xwe, lê ji bo zariyan... Lê mîna her tiştî qayideyên vî şixulî jî hebûn; heçî diket govendê, diviya çepilkên xwe bihejanda. Yanî ez diviya li gundê Husên Beg, Hêcanê, bimama û li ser şixul bûma.
Meziyet, xweha min a bextreş ku mîna birayên xwe yên derketî, her bi derd û kul bû, çûbû. Wê agir bi dilê min xistibû û vegeriyabû Stembolê. Tevî mêrê xwe yê serserî ku min hîç jê hez nekir. Em dîsan ji hev veqetiyabûn. Lê îcar, veqetandina me ebedî bû. Hem min hem jî wê fahm kiribû ku me dê nema hevûdu bidîta. Riyên jînê, bêveger, ji hev vediqetiyan. Berî çûyina wê bi du rojan, ez ji gund vegeriyam û hatim malê. Çawan çavê wê bi min ket, wê dest bi giriyê kir. Di nav wan du rojan de, ew her giriya. Şeva dawîn, min jê re çend rêz, bi tirkî, nivîsîn, tê de jê xatir xwest û ji malê, nîvê şevê, bi dizîka derketim û çûm gund. Gava min ew çend rêz nivîsîn, min dil kir ku oxira wê bi xêr bûya, -tevî ku min dizaníbû, oxira wê ne bi xêr bû...
Tu dê niha bipirsî ka çima ez welê bi dizîka ji malê çûm, bêyî ku xweha xwe hembêz bikim û pê re heta Bêyrûdê herim... Min taqet nebû. Ne hêz, ne taqet, ne jî quwet mabû. Min hew xwe li hember veqetînên zîz radigirt. Ji vê pê ve, ez çi bibêjim? Barên giran ên kurdbûnê û şopên kambax ên salên dirêj ez xistibûm. Rast e, sebir û metanet hîmên esasî yên merivan, nemaze yên merivên demên nû û têkoşer in. Rast e, ev herdu meziyet mirovan li ser piyan digirin. Lê belê hest, bîr û bedena min a pîr ku ji xwe bi sebir û metanetê hatibû hûnandin, hew dikarîbû xwe bi sebir û metanetê bineqişanda û eybên pîrîtiyê veşarta. Sebir û metanet jî, ji hestên westiyayî û bedena kal, bi dûr ketibûn.

Li gund, halê min ne xirab bû. Gundiyên Husên Beg qedrê min digirtin. Cîh û mala min hebû. Gund, çandinî û pembû jî li jîna min a peregende zêde bûbû. Lê min bêriya zariyan dikir.

– Berxa bavo, tu niviyayî? Celadet Beg li ber deriyê Sînemê radiweste û dibêje.

– Na bavo, Sînem ji hundir dibêje, bavo were, binêre ka ez çi dixwînim.

Celadet Beg derî vedike, bi ken, dikeve hundir û dere li ser kursiye ku li kêleka textê razanê yê Sînemê ye, rûdine û ji Sînemê dipirse,

– Tu çi dixwînî keça min?

– Ez defterên ku te ji bo min û Cemo nivîsîne dixwînim.

– Min ew defter ji bo van rojên ku hûn bikaribin bixwînin, nivîsîn, keça min, Celadet Beg, bi ken, dibêje. De ka ji bavê xwe re bixwîne, ka bavê te çi nivîsiye...

Sînem, hinekî din, serê xwe ber bi çirê dike û rûpela vekirî ya defterê dixwîne; "Kurê min, keça min!.. Carinan ji we re hin tiştan dibêjim. Hûn bi wan bendewar dibin. Ew bi kêrî we tê. Hûn hineka ji bîr dikin, hinekên din di bîra we de dimînin. Lê heke min ew ji we re nivîsandin û xistin deftera we, hûn tu car ji bîr nakin..."

Sînem serê xwe ji defterê radike û bi çavên pirsdar, li bavê xwe dinihêre.

– Çi bû keça min? Çima tu sekinî? ew jê dipirse.

– Bavo, ew, bi hêdîka dibêje, heke tu eciz nebî, ez dixwazim tiştekî bipirsim...

– Bipirse keça min, çima ez ê eciz bim.

– Bavo, min li rûpelên nû yên van rojên dawîn jî nihêrîn...

– Herê?

– Di van rûpelên nû yên defterê de, tu hertim behsa mirin, şîn û taziyê dikî... Çima?

Celadet Beg dikene û bi qasî çendekê bêdeng dimîne. Ew nizane çi bibêje.

–Heke tu rastiyê bixwazî, ez jî nizanim ka çima ez welê dinivîsim. Lê tu dizanî, bawerî bi mirin û melayka mirinê nabe. Ew ji nişkekê ve tên. Armanca min bi wan rêzan, heye ku, ev be; heke sî û hilma mirinê bi ser mala me de girt, şîn û taziya mala me divê li gora edet û usilên mîran be, li gora rabûn û rûniştina bav û kalan be. Gerek e ku hûn bi van edet û usilan bizanibin...

– Bavo, çima tu weha dipeyivî?

– Tu guh mede bavê xwe yê kal, keça min... de bavê xwe maç ke û razê...

3 Şev daketiye, Celadet Beg Cemşîd û Sînem maç kirine û ew kirine xew. Rûşen Xanim û yên din jî razane. Celadet Beg û şev bi tenê mane. Na, ew ne bi tenê ne. Stêr jî hene. Celadet Beg li salonê, li erdê, ser xalîçê, xwe dirêj kiriye û dinivîse. Rojeke nû dest pê kiriye. Lê hê şev e, saet li dora diduyên şevê ye. Ronahiya stêrkan xwe ji pencerên vekirî yên salonê digihîne hundir. Xwelîdanka li ber Celadet Beg nîvtijî ye. Dora wî tijî kaxiz e; kovar, rojname, kitab, defter, rûpel, resim û ansîklopedî, peregende, li ser xalîçê ne. Ji gramofonê jî dengê Emû Kalsûmê tê; ela bela bin mehmûdî... welatê min ê delal were, min werbigire û bibe...

Celadet Beg nameyeke dirêj, bi tirkî, ji jina xwe Rûşen Xanimê re ku li oda kêlekê razaye, dinivîse. Ew jî nizane ka çima ew ne bi kurdî yan jî fransizî, lê bi tirkî dinivîse. Wî bi "Yavrum Rûşen" dest pê kir û welê bi tirkî didomîne. Piştî çûyina Meziyetê zîziyeke boş hemû heş û bedena Celadet Beg vegirtiye. Hest û hîsên wî teniktir, guman û endîşeyên wî kûrtir û bîr û heşê wî jî ziravtir bûne. Ji roja çûyina Meziyetê û vir ve, ew her li Rûşen Xanimê û zarokan difikire. Li hember wan, ew xwe çê hîs nake û wîjdanê wî ne rihet e. Loma ew ger bi nameyan ger bi notên

ku ew di defterên Sînem û Cemşîd de dinivîse, her vê nerehetiya xwe diyar dike.

Mîna îşev.

"Rûşena Delal..." Wî weha dest bi nama xwe ya îşev kiriye û wê, hêdî hêdî, didomîne. Tevî cixare û konyakê. Ew ji cixara xwe nefeseke dirêj dikişîne û dîsan li nama ku li ber xelasbûnê ye vedigere û weha dinivîse; "Ez dixwazim, berî mirina xwe, ku ne dûr e, tiştekî biçûk ji we re bihêlim. Ma ev ne hewce ye?.." Pênûs bi lez nalive, naherike. Ka ew rojên çûyî ku pênûsê mîna hespekî rewan serî digirt û diçû, mîna lehiyek biharê diherikî? Ew kî bû ku ev kitab, kovar, rojname û defter nivîsîn? Ka ew Celadet Begê berê? Gelo ew xewn bûn? Ew jiyan, ew evîn, ew bajar û welat, bûyer û serpêhatî, ew hemû xewn û xeyal bûn? Ew bi tenê xewn û xeyalên romana Bîra Qederê bûn? Niha, mîna ku Celadet Beg ew nejiyane, her tişt jê bi dûr ketiye, perdeyeke reş a windabûn û bîrbûnê di navbera wî û jiyana wî de hatiye rakêşandin. Mîna ku Celadet Beg, niha, di nav xewnekê de dijî.

Ew ji qedeha xwe jî çend qultan vedixwe û gotinên xwe yên dawîn ku bi hezar zehmetî tên heşê wî, bi hêdîka, bi destnivîsa xwe ya xwar ku hê jî spehî ye, dinivîse; "...Ez welê bawer dikim ku ez bi wezîfeyên xwe, ji bo milet û welatê xwe, bi awayekî baş û heye ku hîn çêtir jî, rabûm... û niha divê ji bo mala xwe jî tiştekî bikim..."

> Ji aliyekî ve, gotina te rast e. Ew şeva ku tu niha vedibêjî, bi rastî jî, şeveke gelekî taybetî bû. Ez di nav xewneke kûr de diçûm û dihatim. Rast e, min ew name nîvê şevê nivîsî. Heye ku saet jî li dora diduyan bû. Lê belê, berî namê, ez derketim der û çûm bajêr. Heye ku te jî bi vê yekê nizanîbû?.. Wê şevê min du tiştên nû kirin; bi tenê derketim derve û gava ez derketim, min qirawat girêneda. Min qedeha calvadosê qedand, berik bir devê demançê, ew girêda, tevî ku pir germ bû, çakêtê xwe li xwe kir û ez derketim. Em, ez û şev, nasên hev bûn. Di wê germahiya şevê de, ez ji taxa Muhacirîn daketim sûka Salihiyê. Şevê

perda xwe kişandibû ser bajêr. Bajar diniviya. Hin çirayên qels, li vir, li wir, dixuyan. Lê şev ronî bû, stêrkên ku hevaltiya min dikirin, ronahî direşandin ser bajarê kevnar. Li ber hin avahiyên mezin pasevanên çekdar hebûn. Hin zabît, bi lez, diçûn. Hin serxweş, bi hêdîka, xwe dilivandin. Ji şeva bêdeng a germ jî dixuya ku bajar di bin hukmê eskeran de bû. Lê ez xerîb bûm, tevî salên min ên dirêj ên bajêr, ez hê jî derketiyekî bûm. Min hê jî li welatekî ne welatiyek hebû, ne jî pasaportek. Min silav da wan û di ber dûkanên Salihiyê re borîn. Çi karê min bi wan ketibû? Xerîb diviya di riya xwe de biçûya! Carina ji hin derên dûr hin deng dihatin. Qîrîn? Gazîn? Bang? Olana şehwetê? Ma kê dizanîbû! Şev bû, di pêsîra xwe de bi hezaran dizî û sir vedişartin... Ez heta meydanê çûm. Bi qasî kêliyekê, min xwe da ber dîwarê xaniyekî û li meydanê nihêrî. Çendîn rojên min li wir derbas bûbûn, min çendîn kes li doraliyên wê dîtibûn, çendîn caran dilê min, li wir, bi heyecan, coş û keserên bûyeran, tiştan, hilavêtibû... Lê dil niha kal bûbû. Li meydanê, careke din, ez bi vê yekê hesiyam.
Paşê jî, paşê jî ez dîsan hilkişiyam jor, nik kalikê xwe. Mîr Bedirxan li goristana bêdeng, di nav qebra xwe de, mîna her carê, li hêviya min bû. Dapîra min Rûşen ku ji mêj ve ye, ne te qal kir, ne jî min, li kêleka Mîr Bedirxan, tevî ku gora wê ne diyar bû, veşartî bû. Min, dîsan, herwekî ku tu û xwendevanên romanê pê dizanin, dest bi gotinê kir û bi bapîrê xwe re peyivîm. Lê îcar ez hinekî bi dapîra xwe Rûşenê re jî peyivîm. Niha nayê bîra min ka ez bi wan re çi peyivîm. Her tişt mîna xewnekê bû, di nav mij û dûmanê de bû. Lê gava ez ji wan veqetiyam, min weha got; "Kalo, pîrê, ez derim, lê ez ê di nêzîk de, pir nêzîk de, vegerim..." Herê, welê bû; şeva tarî di êvarê de kifş bû.

Piştî ku Celadet Beg nama xwe dinivîse û wê datîne ser masa xwe ya xebatê, ew vedigere ser fotografan. Fotografên wî yên salan jî, mîna umrê wî, peregende ne. Wan albumek jî nîn e! Ew di nav zerf û rûpelên kitab, kovar û defteran de, hêdî hêdî rengê xwe winda dikin û diqulipin ser rengê zer. Îşev wî hemû wêne, ji cîhên wan ên bêhewa, derxistine û dixwaze li wan binihêre. Bav

û diya wî, li kêlekê, di nav wêneyekê de ne. Herduyan jî destên xwe danîne ser çogên xwe û lê dinihêrin. Meziyet li pey wan, li pê ye. Safter di nav wêneyeke din de dikene. Di yeka din de, her çar bira, Celadet, Kamuran, Tewfîk û Hîkmet, bi ken, li hev dinihêrin. Ev herdu sûretên Stembolê, Galata û Bospor, girî dixin çavên wî. Ev çek û pûsatên vê wênê Xoybûn û Araratê tînin bîra wî. Monika, evîna çavşîn û porzer lê dinihêre û dikene. Ev porê reş ê bipêl ê Cananê ku ji vê fotoya kêlekê jê re dest dike, dilê wî diguvişîne. Ecêb e... Celadet Beg ev hemû nas kirin, bi wan re mezin bû, bi wan re jiya, umrekî dirêj bi wan re derbas kir, lê niha, di şeveke germ a Şamê de ew bi tenê ye, bi tenê li wêneyên wan dinihêre. Ecêb e, ev hemû dewr û dewran hatine û çûne, umrekî 57 salan di nav van dewr û dewranan de çûye. Ew niha çiqas jê bi dûr in! Ecêb e, tevî ku hin ji wan mirine, hin ji wan, bêveger, jê xatir xwestine û çûne, tevî ku wan valahiyeke xedar li pey xwe hîştine, Celadet Beg dijî. Ew çûn, lê Celadet Beg hê jî maye. Ecêb e ku jiyan evçend metîn e. Lê dîsan ecêb e, tevî ku ew dijî, wî nikaribûye, tu carî, valahiya kes, dewr û dewranên çûyî dagire. Ecêb e, ew dijî, lê di navbera xewt, dewr, dewran û kesên mirî û çûyî de...

Celadet Beg dizane ku êdî dereng e, yan na, di esasê xwe de, wî romanekê diviya. Romaneke nû ku wext, dewr, dewran û kesên mirî û çûyî bigihanda hev, ecêbiya hatin û çûyinê, jiyîn û mirinê vebigota. Romanek ku tê de behsa bîrên wî jî hebûya. Belê romanek ku li ser qederê bûya, li ser bîra qederê bûya.

4 "Nav: Bîra Qederê
Gengre (çeşn): Roman
Tarîxa destpêka nivîsînê 15 Tîrmeh 1951
Destpêk û rêza yekem: Herkes dimire; bira û birazî, yar û evîndar, heval û dost, hogir û rêger, nêz û nas... hemû wefat dikin. Dora min jî hatiye, niha jî dora min e..."

Saet li dora 5'ê şevê ye. Stêrk çûne ava, ronahî hiltê. Rojeke nû ya havînê dest pê dike. 15'ê tîrmehê bi hêdîka hişyar dibe. Celadet Beg hê jî li salonê, li ser xalîçê dirêj bûye û li deftera nû ya li pêşiya xwe dinihêre. Ji gramofonê dengê dengbêjeke tirk tê; her yer karanlık... her der tarî...foto, kovar, rojname, kitab û rûpelên peregende hê jî li erdê ne. Lê tiştekî li wan zêde bûye; deftera li pêşiya wî. Wî deftereke nû vekiriye û tê de rêzên destpêkê yên romaneke nû nivîsîne. Wî navê romanê jî lêkiriye; Bîra Qederê... Pênûs di destan de, defter li pêşiyê, ew difikire. Rêzên pêşîn ên romana nû ew birine dewr û dewranên kevn û windabûyî. Xwezî ne dereng bûya û wî bikaribûya vê romanê binivîsanda!.. Lê pênûs nalive, dereng e, pir dereng.

Ji nişkekê ve, deriyê salonê vedibe û Rûşen Xanim di nav kirasê şevê de, tê nik wî. Ew ji xewê hişyar bûye. Celadet Beg li jina xwe dinihêre, bi ken û xew li ser çavan, jê re "rojbaş" dibêje.

– Rojbaş, Rûşen Xanim dibêje û tê li ser Celadet Beg disekine û li rûpela vekirî ya deftera li pêşiyê dinihêre -bêyî ku ew bikaribe rêzan ji hev derxe.

– Min çend rêz nivîsîne, Celadet Beg, çavê wî li ser defterê, dibêje, çend rêzên romaneke nû. Ne yên Heyveron'a ku min dil hebû binivîsa, lê yên yeka nû...

– Bi xêr be... Te navê romanê jî lê kiriye?..

– Herê, Bîra Qederê... nav wê Bîra Qederê be...

Ew bi destê Rûşen Xanimê digire û li ba xwe dide rûniştin. Ew ji cixara xwe nefesek dikişîne, rûpela yekem ku wî dest pê kiriye, bi hêdîka, ji Rûşen Xanimê re dixwîne û paşê jî gotina xwe didomîne,

– Eger min keys bidîta û bikaribûya dest bi romanekê bikira, destpêk wê mîna van gotinên min bûya; Herkes dimire... Min ê qala mirin û çûyinê bikira. Min ê pêşî xatir bixwesta û paşê dest bi romana xwe bikira... Pêşî mirinê bihata, paşê jîn, xaçeriyên jînê û bi dû re jî dîsan mirin... Lê êdî dereng e, hertişt li pey ma. Wext dereng e. Şev dereng e. Hêvî şikestiye, umir kal e. Û... û rêwîtî li ber derî ye... Mein Gott, mein Gott...

Rûşen Xanim di cîhê xwe de vediciniqe, dilê wê pihêt hildavê. Ev çi gotin in? Çima?.. Ew, bi hêdîka, hîn zêdetir xwe nêzîkî Celadet Beg dike û eniya wî maç dike. Bi dû re jî ew, bi hêdîka, lê vedigerîne,

– Çima tu weha dipeyivî? Herkes dizane ku tu mutefekîrekî yekta û nivîskarekî jêhatî yî...Tu dê romana xwe binivîsînî, bi îzna Xwedê, bi rêdan û dilovaniya Yezdanê mezin, tu dê dest pê bikî û wê xweşik binivîsî û her tiştê ku tu dixwazî, tu dê bikî... Ma te ev yeka hanê, sebir û înada xwe, pirî caran, îspat nekiriye? Ez bi vê bawer im, bi te bawer im, ez bi hêvî me.

– Rûşenê, êdî pir dereng e... lê min ê navê Bîra Qederê li romana xwe bikira... Bîra Qederê... ev nav ê baş li romana min bihata. Quelle titre pour un roman, pour un destin...

Celadet Beg, mîna ku ew di xewê de be, dipeyive, hem bi Rewşen Xanimê re dipeyive hem jî bi dengekî berz difikire. Ew difikire, di nav xewn, xeyal, bîranîn û rojên bihurî de dere û tê. Digel ku pencerên salonê vekirî ne, ode bi dûman û bîhna cixarê tijî ye. Cixare her di destê Celadet Beg de ye.

– Min ê tê de behsa bîrên xwe bikira. Ev bîrên ku me li gund nû kolane jî tê de. Wan ez westandim, lê ew ê jîn bidin erd û çolê, pembû dê mîna berfê bibişkovin...

– Tu dê behsa bîrên xwe jî bikî...

– Ruşencîk, Diya Cemşîd, diya Sînemxana delal... Verba volant, littera scripta manet... Min piraniya kaxiz û defterên xwe yên nivîskî, çirandine, şewitandine, lê min ê ev roman binivîsiya, min ê tê de qala bajarên xwe bikira, Stembol, kaderîm, benî hîç bîr zaman terk etmeyen o müthîş şehîr Munix, Also sprach Zarathustra... Kahire, Bêrut, Şam, Heleb, Di her destpêka biharê de, em ê hevûdu li Helebê, li meydana Babulferecê bibînin... Paris, la ville des villes... Cizîra Botan a xewnan, warê bav û kalan, keleha hebûn û bihîstiyariya min, Kanî Xanî, Feqeh-Teyran û Melayê Cizerî, ne jî Batê, kes nema ...

Celadet Beg, mîna ku ew nû ji xewê hişyar bûbe, li ser xalîça rengîn û mezin a salonê dirêjbûyî, bi germahiyeke bêpayan, li çavên nepixî yên Rûşen Xanimê dinihêre. Hingê, Rûşen Xanim jî nizane çima, lê xofeke mezin dikeve dilê wê. Gelo?.. Di bin ronahiya çira li ser maseya li kêleka Celadet Beg, rûyê herduyan jî gewr dixuyin. Rûşen Xanim, bi dilsojî, li rû û çavên wî yên westiyayî dinihêre. Rûyê wî, digel west û bêxewî, keser û esebiyetê, hê jî, ji xweşî û esaleta xwe tu tişt winda nekiriye. Rû hê jî mîna rûyekî ji dem û dewrên Yewnanên Antîk, yan jî ji ya keysarên farisan e. Çav mîna du lib komirên reş, du libên tiriyê reş in, mîna du perçe lûlû ne. Rîh êdî spî bûye, lê ew esalet û xweşiya rûyê Celadet Begê hîn xweştir dike.

– Tu dizanî, min ê rûpelên romanê bi çi bineqişanda?.. Bi evîn û hêviyê. Bi van herdu cêwikan. Celebên evînê dê, mîna neqşên Mîr Şerefxanê Bêdlîsî, rûpel spehîtir bikirana. L'amour fatale, l'amour douze... Hêvî, xwişka evînê, dê ji rûpelan binihêriya. Û min ê ev yeka hanê bi hevaltiya musîkê bikira. Bilûr, ew dengê wê yê yekta, dê hevaltî li min bikira. Bilûra min, Dengê xwe berde!.. Dinya, Mîna zarokekî berşîr, Ket dergûşa xwe; Dengê xwe berde bilûra min, Û jê re bilorîne, Xema wê birevîne! Bilûra min tu yî... Û Mahler, Gustav Mahler... min ê hevaltiya musîka Mahler ji bîr nekira, Langsam, schleppend; im Anfang sehr gemächlich. Kräftig bewegt, doch nicht zu schnell...

Roniya çirê Celadet Beg eciz dike. Ew rûyê xwe ji aliyê Rûşen Xanimê badide û çavên xwe digire. Sînga wî ya ku tijî pirçên spî ye, hêdî hêdî, bi nefesê, radibe. Rehên qirik û gewriyê, mîna ku derketibin derve, reş dikin. Bedena wî westiyayî ye. Mêjî kal bûye. Demeke dirêj ew, çavgirtî, difikire, mîna ku ew ji wir çûbe dereke din... Rûşen Xanim jî, bi tenê, bêdeng, lê dinihêre. Piştî bîskeke dirêj, gava şev êdî baş diqulipe ser rojeke nû, ew çavê xwe, giran giran, vedike. Niha jî, ji dengê strana tirkî pê ve, bêdengî, bi tenê bêdengî heye. Rûşen Xanim dixwaze bikene, lê ken

li ser rûyê wê nîvçe dimîne; mîna ku mirin hatibe û li kêleka wan rûniştibe... Rêzên şiîrekê, tevî ku ew di hêlekana xewa xem û xeyalan de dere û tê, tên bîra Celadet Beg. Ew, dîsan, bi dengekî pir nizm, dest bi gotinê, gotina rêzên şiîra "Le poete mourant" ya Lamartine, dike; "Ah Ruşen... Dotmamê... Sîha mirinê bi ser serê min de tê; Saeta min a dawîn lêdide; Mirinê nêzîkî li min kiriye; Xuya ye, ez ê bibim mêvanê ax û qebrê; Ma ez çi bikim?.."

Bi dû van çend rêzan re, ew li zarokên xwe, Sînemxan û Cemşîd dipirse, hinekî xwe dilivîne, li rûyê Rûşen Xanimê dinihêre û weha dibêje; "Ew pir delal û jîr in, bi saya te..." Paşê, hêdî hêdî, gotina wî dîsan tê ser nivîsîna romanê.

– Hevaltî û bervajiyê wê, îxanet wê tê de hebûna. Bira û xweh, ap û birarzî, xal û xwarzî dê tê de hebûna. Têkoşîn û şoreşgerî, xwestek û hesret, deng û pejn, ken û girî, tahm û xwîdan û bîhna kaxiz û çapxanê dê tê de hebûna. Anliyor musun? Ev hemû dê tê de hebûna. Û min ê ew bi kurdî, bi zimanê bav û kalan, bi zimanê welatê bindest û belengaz binivîsiya. Yekîtiya kurdan bi yekîtiya zimanê kurdî çêdibe... Miletên bindest heyina xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi qeweta du çekan diparêzin. Ol yek. Ziman dudo. Lê heke ola miletê serdest û bindest yek be, hingî çek yek bi tenê ye û bend tenê ziman e... Ma min di nav rûpelên Hawar'ê de weha nenivîsîbû? Belê, min ê bi kurdî binivîsiya...

Piştî van gotinên wî, Rûşen Xanim hew xwe radigire, ew dest bi qîrînê dike û bi qîrîn lê vedigerîne,

– Na, na... Çima tu weha dipeyivî? Çi bi te hatiye? Tu xewnan dibînî? Kabûs bi ser te de tên? Ev çi hal e? Min hîç tu weha nedîtibûyî... Ezbenî, ezbenî. Ez ketime bextê te, dev ji erd, pembû, çandin, bîr û kolandina wan berde. Dev ji romanê, Bîra Qederê jî berde. Me tiştek navê, ne pere û dewlemendî, ne mal û mulk, ne jî kitab û roman. Me te divê, bi tenê te...

Piştî ku Rûşen Xanim dipeyive, ew radibe ser piyan û bi girî vedigere oda razanê.

Nayê bîra min, tu tişt ji wê berbangê nayê bîra min. Heye ku welê bû, min welê gotibû. Heye ku tu niha wan li hev tînî... Lê xew neketibû çavê min û çaxa Rûşen, xew li ser çavan, hatibû, ez pê re peyivîbûm û min ew rêzên destpêkê nîşanî wê dabûn. Min baş dizanîbû ku ew rêz ê welê bimana. Min ne wext ne jî taqet hebû ku min ew bidomanda. Min ew nivîsîn, bi hêviya ku rojekê yekî din derketa û ew rêz bidomandina. Mixabin min Heyveron nenivîsî. Û mixabin min ê Bîra Qederê jî nikaribûya binivîsanda.
Lê belê, diviya ew roman, bi zimanê birîndar, bihata nivîsîn. Tevî ku ez li ser rê bûm û diçûm, ez bi hêvî bûm. Herçend ku jan, mîna filîsofekî gotiye, mamosteyê jînê ye, ewçend hêvî jî gelawêja jînê, yanî stêra rêber a jînê ye. Tevî ku ez bêhêvî mabûm, min dîsan jî hêvî hebû ku roman wê, rojekê, bihata nivîsîn. Şûr bi qenciya polayê xwe dibire û diçirûse, berhem û eser jî bi destpêk û gavavêtinê bi ser dikeve û diçirûse... Her çawan ku min şopa hinên pêşiya xwe hilda û ketim pey wan, hinên nû jî dê şopa Bîra Qederê hildana û biketana pey wê. Ma ne welê ye?...

Wext hatiye, Celadet Beg divê haziriya xwe û çûyinê bike. Ew radibe ser piyan, careke dawîn li wêne, kovar, rojname, kitab, defter û rûpelên li erdê raxistî dinihêre û dere serşokê. Piştî ku ew ji serşokê derdikeve, ew tê oda razanê, ba Rûşen Xanimê. Bêguman, xew ji Rûşen Xanimê bi dûr e, lê bi dû wan gotinên Celadet Beg re, ew li oda wan herduyan, di nav nivînan de digirî.

Celadet Beg tê û li ser textê razanê, li kêleka Rûşen Xanimê rûdine. Ew, bi hêdîka, porê wê yê kin mist dide. Rûşen Xanim rûyê xwe di nav lehîfan de vedişêre, naxwaze ku Celadet Beg wê çavgirî bibîne. Ev çi saw e ku li dora wan dere û tê?..

– Rûşenê, de serê xwe rake, li min binihêre, çavên xwe veke, Celadet Beg dibêje û serê Rûşen Xanimê ber bi aliyê xwe dizîvirîne.

Ken li ser rûyê Celadet Beg dixuye. Wî xwe daye hev, kur bûye, rîha xwe çêkiriye û niha bi çavên ronî li Rûşen Xanimê dinihêre. Kincên rojane yên kar û şuxil lê ne. Ya girîng, ya ku herî

zêde niha bala Rûşen Xanimê dikişîne, ev e; Celadet Beg bi ken e. Mîna ku wî, berî bîskekê, ew gotinên goristanan negotibin, behsa mirin û çûyinê nekiribe, mîna ku ew, niha, ne ji kabûsekê, lê ji xewneke şêrîn hişyar bûye, ewçend ew guherî dixuye...

– Ez ê herim ser erdan, îro gelek karê me heye, Celadet Beg dibêje; em ê avê berdin bîrê.

– Ma ew gotinên berî bîskekê?

Ji wan gotinan pê ve, tu tişt nedihatin bîra Rûşen Xanimê. Gotinan ew êşandibû. Saw û xofeke ecêb mezin ruh û hîsên wê, ji binî ve, leqandibûn.

– Rûşencîk, tu wan gotinan ji bîr bike. Ew, gotinên romana Bîra Qederê ne. Gotinên nerast, gotinên çêkirî... Tu pêwendiya wan û me bi hev re nîn in. Hem xewa min dihat, hem jî ez ketibûm nav dinya Bîra Qederê. Bila dilê te rehet be, serê xwe bi wan gotinan meêşîne...

– Naxwe, tu dê romana Bîra Qederê binivîsî? Ne welê, tu dê wê binivîsî? Divê tu wê binivîsî.

– Belê, ez ê wê binivîsim. Ez ê romaneke kurmancî jî yadîgarî kitabxana kurdî bikim...

– Ez di bextê te de me, baş li xwe binihêre. Ezbenî... bila gotinên welê neyên bîra te. Ez dizanim, bîhna te teng e, rewşa kurdan û halê Kurdistanê nexweş e. Lê ev roj ê derbas bin. Tu ji min çêtir dizanî...

Bi van gotinan re, Rûşen Xanim, dîsan, bêdeng, dest bi girî dike. Dengê wê tê birîn. Celadet Beg, bêdeng, serê Rûşen Xanimê datîne ser çoga xwe û destê xwe di nav porê wê de digerîne. Çendekê, herdu li dengê nefesên hevûdu guhdarî dikin, bêdeng, li daxwaza dilên hevûdu difikirin. Bîhn û hilma wan a nas rehetiyek, huzûrek dide Rûşen Xanimê. Wêlê dixuye ku ew naxwaze ku Celadet Beg here. Lê ew dengê xwe nake; ew dizane ku Celadet Beg ê here.

– Ez divê herim, ez dereng mam. Ji dêvla min ve ji çavên zariyan ramûse. Di xweşiyê de bimînin...

Gotinên herî dawîn ku Rûşen Xanim ji devê Celadet Beg dibihîse, ev in; di xweşiyê de bimînin...Gava Celadet Beg radibe ser xwe û diçe, Rûşen Xanim, bi girî, ji paş ve, lê dinihêre; bi çavên şil, li bejna dirêj, bedena lihevhatî, milên fireh û serî mêze dike. Ew, hêdî hêdî, bi gavên giran, ji ber çavên Rûşen Xanimê ku baş nabînin, winda dibe û dere. Ber bi gundê Hêcanê, ser erdan, ber bi bîrê, bîra qederê...

5 Bîra Qederê...

Ev bîra ku Celadet Beg niha li berê ye, dê bibe bîra qederê -herwekî ku Rûşen Xanim, car bi car, dibêje. Ev bîr ê di nav demeke kurt de qedera teres a neçariyê biqulipîne ser heyin û rehetiyê. Ev ê, niha, piştî bîskekê, av berde erdan û jiyan bide pembû. Bîr av e; av kahnî û geşî ye; geşî jiyan e. Pembû dê bi avê geş bin.

Celadet Beg cixareyeke nû ji pakêta xwe derdixe û vêdixe û ew li bîrê, li ava bîrê dinihêre. Saet heyşt û nîvê danê sibê yê 15'ê tîrmehê ye. Dinya germ, zelal û vekirî ye, li esmên tu ewr naxuyin, esman çikî şîn e. Bi tenê carina teyrin û refên teyran difirin. Ji dûr ve, ji gund dengê zarokan tê. Celadet Beg û serpaleyê wî Hesoyê Qado dê îro, av berdin erdan. Erd di nav keskahiyeke bêpayan de ne. Seranser keskahî ye. Pembû serî hildaye, şitil mezin bûne, çiqil dirêj bûne û bi pelên kesk û mezin hawirdor vegirtine. Rengê çîkî kesk û yê çîkî şîn erd û esman gîhandine hev.

Di nav van rengên germ de, îro, av ê ji bîrê derkeve, biherike û xwe bi coyên biçûk, bi şitilan bigihîne da ku rengê kesk biqulipe ser rengê qerqaşî spî yê pembû. Îro girîng e. Loma Celadet Beg bi hevalên xwe re neçûye seyd û nêçîrê û ew hatiye ser zeviyan.

– Em ê îro pişta felekê bişkînin, Celadet Beg ji cixara xwe çend nefesan dikişîne û dibêje, îro jîn wê geş be.

– Mîrê min tu dizanî, serpaleyê ku li kêleka wî sekiniye, dibêje. Tu dizanî, lê eger ez bûrna, ez ê bisekiniyama.

– Na Hesoyê bira, na. Me wext nîn e. Em divê avê berdin. Bi îzna Yezdanê pak tu tişt nabe.

– Husên Begê Îbîş jî do êvarê hate gund û ez temî kirim ku ez ji mîrê xwe re bibêjim; bîr ne qaîm e...

– Ez pê re peyivîm, vê sibê em bi hev re hatin. Ew çûn seydê, ez mam... Na, na tiştekî nabe, em ê motorê bişixulînin...

Tevî ku min welê digot, ez bi gotina xwe ne bawer bûm. Lê min, jê pê ve, tu çare jî nîn bû. Me av diviya, pembûyan av diviya. Ji ber sebebê ku tu û xwendevanên romanê êdî baş dizanin, min dest bi çandina pembû kiribû... Berî ku ez dest bi çîroka çandina pembû bikim, min dil heye ku ez bavê xwe bi bîr bînim û sebebeke din jî bibêjim.

Rojekê ku hingê umrê min ne zêdeyî dehan bû, li Stembolê, li bexçê mala me, li kêleka bîrê, bavê min bang min û Kamuran kir. Em çûn nik wî. Danê êvarê bû. Wî ji purtaqalên ku diya min a dilsoz jê re qaşilandibûn, hinekî dan min û Kamo. Me ew xwarin. Paşê jî, wî destê xwe avêt rîha xwe, pê lîst û li me vegeriya û got, "Kurên min, min li we şîretek heye..." Mîna niha tê bîra min, piştî ku wî weha dest bi gotinê kir, wî serê xwe ber bi daran kir û bi qasî çendekê li daran û pelên wan ên kesk nihêrî. Ew difikirî. Piştî kêliyeke dirêj, ew dîsan li me vegeriya û wî got, "Zarokno, ev şîreta min li guhê we guhar; hûn bin, tu carî li ber deriyê dewletê mebin qûl, mebin mehkûmê dewletê, mebin Lala Paşayê ku bi pereyên dewletê zikê xwe mezin kiriye, lê di eynî wextê de mehkûmê wê ye... Bila tu carî mineta dewletê li ser we nîn be... Vê şîreta min ji bîr mekin."

Ji ber vê şîreta bavo bû ku ez tu carî nebûm memûr, min nanê dewletê nexwar û jê tiştekî daxwaz nekir. Ne ji osmaniyan, ne alman û fransizan, ne jî ji ereban. Tu carî. Dewsa vê yekê, min kar û şixulên din kirin. Û di payiza umrê xwe de jî, ji bo debar û pêşeroja zariyan, min dest bi çandiniyê kir.

Niha em vegerin ser zevî, çandin û pembû... Gundê Hêcanê nêzîkî Şamê bû, bi hêsanî mirov diçû û dihat.

Erdên gund avî û biber bûn. Gava min biryara xwe ya çandiniyê da, pembû di heşê min de bû. Pembû hê nû ketibû Sûriyê û herkes bi karê pembû radibû -ji ber ku tê de pere pir bû û karekî paqijtir bû. Min ne ji çandiniyê, ne ji pembû fahm dikir. Lê ne xem bû. Ma ez, ji bo gotinên kurdî yên jibîrbûyî, bi rojan, bi mehan, gund bi gund, nedigeriyam? Ma min li kal û pîr, dengbêj û çîrokbêjan guhdarî nedikir? Ma bi vî terhî, ez nebûm hostayê nivîsîna zimanê birîndar? Herwekî wê, ez ê bi karê pembû jî rabûma û ez ê hînî wî bûma. Min kitab, ansîklopedî, kovar û rojnameyên li ser babetên çandinî û pembû xwendin. Ez li gundan geriyam. Min li pale û rençberan guhdarî kir, bi axa û began re li ser zevî û erdan geriyam. Bi roj û şevan, hefte û mehan, ez li gund, li ser erdan mam. Welê, bi vî awahî, ez dikarim bibêjim ku ez hînî karê xwe yê nû bûm.

Me tovên herî baş ên pembû hilçandin; Akala, G. Herbaceum a Linné. Ev tov zexm, qaîm û bi bereket bû, jê baş ber dihat hilanîn, ew ne bi tenê li erdên avî, lê li erdên bi kîlte û navçeyên hênik jî dihat. Berî ku em tov bikin, me erdên xwe, baş, cot kirin, giyajeng jêkirin, me erd hazir kirin. Meha adara 1951-an, ji hefta diduyan heta dawiya mehê, me tov çandin. Ji ber bextê çê, wê zivistanê dinya ne hişk bû. Baran hebû û bîhna nermahiyeke xweş ji erdan difûriya. Hewa tu carê neket binî 10... Û piştî sê çar heftan, şitilên pembûyan, hêdî hêdî serî rakirin. Jîn bi wan tovên ku me çandibûn, ketibûn, li her aliyê zeviyan zîl didan. Ez di nav zeviyan de, bi kêfxweşî, digeriyam. Şitilên zirav, dirêj û narîn mezin dibûn; deh cm, panzde, bîst, sî, çil, şest, heftê... Pembûyan mîna zarokekî qam didan. Barana mehên adar, nîsan û gulanê gelekî alîkarî kir. Dinya jî, pir xweş û bi dûzan, roj bi roj germ dibû. Şax û çiqil jî derketibûn û di rojên pêşîn ên tîrmehê de pelan jî dest pê kir û bişkovîn. Di nav çend rojan de, ji nişkevê ve, zevî, seranser, bûn kesk. Xwedayo ew çi xweşî bû! Dîlana rengê kesk bû...

Lê tiştekî, hinekî, bîhna min teng dikir; ji hezîranê heta navenda tîrmehê hîç baran nehat. Heke hinekî baran biha-

ta, rewş ê hîn çêtir bûya. Lê dinya pir germ, vekirî û zelal bû. Baran û av diviya. Mehên tîrmeh û tebaxê, mehên herî girîng ên pembûyan bûn. Wan serav û avdan diviya. Heke av hebûya, me dê bikaribûya ji her darê kêmanî bîst qepûşk hilda. Heke bextê çê dewam bikira, me dê heta sî qepûşkan jî hilda. Niha, bê av, me dikarîbû di hektarekê de sedûheyştê–dused kîlo pembû rabikira, lê heke av hebûya hejmar ê derketa pencsed–şeşsed kîloyan. Tu dizanî, bav û kalan gotiye; ken ji dilê geş, baran ji ewrê reş tê. Wê meha tîrmehê, herdu jî, gelekî, ji min û ji zeviyan bi dûr bûn.

Loma me dest bi kolana bîrê kir. Bi lez û bez. Zûtirîn wext, me av diviya. Jixwe erd avî bû, me bîr veda û bi hêsanî av peyda kir. Lê me diviya ew bi zeviyan jî bigihanda. Loma me co vedan, erq çêkirin, makîne û motor anîn û bi bîrê ve kirin. Bîra me ya arteziyenê temam bû. Makîne û motorên me pir bi quwet bûn. Gelekî perê me çûbû, lê me şixul jî serast kiribû. Lez û beza me Rûşen tirsandibû. Loma jî wê navê bîra me ya nû kiribû "bîra qederê..." Ma kê dizanîbû ku ew ê, bi rastî, bibûya bîra qederê!

Kêmaniyeke bîrê mabû; me dîwar qaîm nekiribûn û gava me av berda, bîr dikarîbû, her gav, hilbiweşiya. Hosteyê ku dê dîwar qaîm bikirina, nexweş ketibû û nikarîbû bihata. Wext jî li me pir teng bûbû. Ya me dê av berda û qeder biguherta, yan jî na, em ê bi qedera xwe razî bûna...

– Huso motorê bişixulîne.

– Mîrê min... em nepên?

– Na, me wext tune, em nikarin bipên, tu dest pê bike...

Piştî hewldana çend caran, serpale motorê dişixulîne. Motor, bi dengekî gur, dest bi şixulê dike. Av hildikişe, dengê avê tê. Celadet Beg, kêfxweş, tê nik motorê û ew li motorê û ava ku tê, dinihêre... Av tê, aveke boş, zelal û hênik. Ew cixareyeke din vêdixe û li kêleka motorê, ser bîrê, li ser totikan, rûdine.

Av; kahniya umir û jînê.

– Binihêre, bû, bû, me bi ser xist... piştî hefteyek-deh rojan, bejna pembûyan dê bigêhê esmanan...

Ji kêfa Celadet Beg re payan nîn e. Ji erq û coyan, av, hêdî hêdî, xwe bi zeviyan digihîne. Erdên zuha dê avê vexwin, rehên pembûyan ê geş bin. Belê, bû...

Lê ji nişkekê ve, dengekî kûr û giran ji bîrê tê. Çi bû? Çi diqewime? Celadet Beg hinekî xwarê bîrê dibe, lê ew tiştekî nabîne. Motor jî, ji nişkekê ve, disekine. Lê ew dîsan dest bi şixulê dike. Dîsan motor dişixule û avê dikişîne. Celadet Beg, bi ken, cixara xwe dikişîne. Lê hê cixare di devê wî de ye, îcar, dengekî gurtir û berztir tê. Û tevî deng, ji motorê jî dengê teqînekê tê.

– Mîrê min, mîrê min, serpale diqîre, mîrê min xwe bide alî.

Celadet Beg nagihe ku xwe bide alî, hê ew ranebûye ser piyan, ew aliyê bîrê ku Celadet Beg û motor lê ne, hildiweşe. Pêşî Celadet Beg û di pey re jî motor, bi leza birûskê, gêrî bîrê dibin.

6 – Monsiuer Bedir-Khan, hûn gêrî bîrê bûn, serekdoktorê nexweşxana fransizî dibêje, gundiyan hûn ji bîrê derxistin û anîn nik me... Hûn niha li nexweşxana me ne.

Celadet Beg, bi hêdîka, çavê xwe vedike. Her tişt li ber çavê wî, mîna ku di bin perdeyekê de be, di nav reşahiyekê de ye. Li ber serê wî çend kes hene. Ew kî ne? Celadet Beg nikare rûyê wan baş bibîne. Ew li wan dinihêre. Jinikek di nav kincên spî de tê û bi destmalekê eniya wî paqij dike.

– Monsiuer Bedir-Khan, hûn birîndar in, birînên we... hene. Em dizanin, karê me ne hêsan e, lê em ê her tiştî bikin. Em ê, niha, we bibin emeliyetxanê. Em hêvîdar in ku em ê bi ser kevin.

Celadet Beg bi bîhneke giran a derman û nexweşxanan dihese. Ew têdigêhê ku ew li ser textekî dirêjkirî ye. Ew diêşe. Hêdî hêdî ew bîr bi êşa bedena xwe dibe. Her aliyê wî di nav êşeke bêpîvan de ye. Ew dixwaze devê xwe veke û tiştekî bibêje. Lê nabe, lêvên wî, gewriya wî zuwa ye. Ew zimanê xwe derdixe û çend caran li ser lêvên xwe digerîne. Tahma devê wî, mîna ya jahrê, tahl e. Ew dixwaze rabe. Lê çaxa ew hewl dide ku xwe

bilivîne, hemû bedena wî dişewite, mîna ku agir pê ketibe, yan jî zelzeleyek tê de hatibe pê. Ew nikare xwe bilivîne.

– Monsiuer Bedir-Khan, doktor li serê xwar dibe û dibêje, gelo hûn dixwazin hinekî xwe rast bikin?

Celadet Beg pêşî bi çavan bersiv dide, paşê jî ji devê wî gotinek derdikeve,

– Oui...

Doktor, jinika kincspî û du kesên din ku li ser serê Celadet Beg in, bi hêdîka, pir bi dîqet, radihêjin wî û pişta wî ber bi dîwêr dikin. Jinik çend balîvan datîne ber pişta wî. Êş... êş... êşa bêpayan, êşa ku nayê gotin, nayê teswîrkirin. Xwîdan jê dere. Eniya wî, qirika wî, rû û berçavên wî di nav xwîdanê de dimîne. Jinik, dîsan, bi destmalê enî û rûyê wî paqij dike. Kincên wî jê bûne, bi tenê derpî lê ye. Jê xwîn neçûye, di tu dereke wî de xwîn naxuye. Hingê ev êş ji kû tê? Ew, niha, hinekî bêtir, bi cîhên êşê dihese. Ji doraliyên mil û stû, sîng û kêlek û zik û şeqan êşeke zirav, lê xedar, dertê.

– En peu... en peu de l'eau, hinekî av, Celadet Beg dibêje, hinekî... hinekî..

Jinik dilezîne û jê re qedeheke av tîne, serê wî hinekî rast dike û avê dibe devê wî. Av û hênikahiya avê tî û tîna hundirê wî, hinekî, dişkîne.

– Cixareyek, cixareyekê bidin min, Celadet Beg, bi dengekî ku bi zehmetî tê bihîstin, dibêje.

– Monsiuer Bedir-Khan, hûn cixare nekişînin çêtir e, serekdoktor dibêje. Em ê herin emeliyetxanê.

– Hûn cixareyekê bidin min û dev ji emeliyetê berdin... Le temp est venu... wext êdî hatiye. Ez, niha, bi birînên xwe dizanim, dev jê berdin... û telefonî Madame Bedir-Khan bikin, ji kerema xwe. Berî ku ez herim, ez wê bibînim.

Ez bi birînên xwe hesiyabûm; ez li rê bûm û diçûm. Jîna min li kêleka bîrekê dest pê kiribû û niha jî li kêleka bîreke din xelas dibû. Bîr bûbû qedera min. Tu dizanî, gotina bîrê

di zimanê kurdî de tê du maneyan; yek av û kahnî, dudo heş... Bîra gundê Hêcanê herdu jî, ji min, bi dûr xistibûn. Kahniya jîna min dimiçiqî, tevî ku min hewl dida xwe, heşê min bi derine din diçû û ez jî pê re dibirim.
Kesin li dora min bûn, kesin diçûn û dihatin. Bîhna taybetî ya dermanan doraliyên min rapêçabû. Hilma mirinê li dora min bû. Ez, şahîdê wext, dewr û dewranan, şahîdê du şerên cîhanê, bolşewîzm, nasyonal sosyalîzm û faşîzmê, ez, hevalê şevê û zimanê birîndar, diçûm. Dengên têkel ên jibîrbûyî dihatin guhê min. Dengê nas û xizmên min, bav û diya min, bira û xweha min, yar û dostên min. Wan bang min dikirin. Dengê miriyên min li ber guhê min dinehwirandin û gazî min dikirin.
Di nav êşeke xedar de, ez diçûm. Wexta min a xatirxwestinê jî nemabû. Bila Sînemxan û Cemşîd, Huseyma û Ehmedê Ferman, nas û dost li min biboriyana ku ez weha, bêxeber, diçûm. Lê beriya ku perda xewa ebedî bi ser min de bihata rakêşandin, min dil hebû Rûşen bidîta. Bi alîkariya destên Rûşenekê ez hatibûm û min dixwest, bi alîkariya destên Rûşenekê jî ez biçûma.

– Cixareyeke din jî bidin min, Celadet Beg, bi xirexir, dibêje.

Deng, pir bi zehmetî, jê derdikeve. Dilopên xwîdanê ji eniya wî ya fireh kêm nabin. Her ku dere, êş zêde dibe. Çavên wî tên girtin. Kesên ku li doralî ne, li ber çavê wî, hêdî hêdî, hîn tarîtir dixuyin.

– De zûkin, serekbijîşk dibêje, emeliyetxane hazir e.

Jinik û du kesên din, bi hêdîka, Celadet Beg li ser text dirêj dikin û çar kes, her yek ji aliyekî text digire û Celadet Beg ber bi aliyê emeliyetxanê dibin. Ew bi rê dikevin û derin. Celadet Beg çavê xwe vedike. Bi tenê ew rengê spî yê banê nexweşxanê dibîne. Bi tenê rengê spî hevaltiya wî ya çûyinê dike.

Celadet Beg dere, di nav rengê spî de, heşê wî, wî dibe bexçeyekî û bîra bexçe ronî ye, çend zarok li bexçê, dora bîrê dilîzin. Zarok li dora bîrê dizîvirin. Darên qaîm ên çinarê bi pelên xwe, bi esmanan ketine. Kulîlkên dareke henarê rengên germ ên

keskesorê tînin pê. Gul û kulîlk bişkovîne. Mêş û moz li gulên nûbişkovî vedinijin. Çend çivîk li ser daran dixwînin. Ji hinekî dûr ve, dengê pêlên zeryayê tê. Kevirên bîra ku zarok li dorê çerx dibin, xwîdan dane, dilop, yek bi yek, ber bi bîrê gêr dibin. Zarok, bi gavên revê, dizîvirin. Yek ji zarokan, mezinê wan, bi çend gavan li pêş zarokên din dizîvire. Zarokê pêşî hem dizivîre hem jî carina vedigere û li yên din dinihêre. Ew dest li wan dike. Ew dizivire, ronahî hîn bêtir dibe, gewrahî hawirdor vedigire. Kêfa zarokê li pêş bêpayan e, "mehr licht", ew dibêje û çerx dibe.

Li dora bîrê, di nav ronahiyê de, ew dizîvire...

Bîra Qederê ji şanzdeh fotografên binemaliya mîrê kurd Bedir-Xan pêk tê û bi mirinê dest bi vegotinê dike. Piştî mirina Celadet Beg êdî fotografên ku li pey wî mane dipeyivin. Jiyana wî ya ku di destpêkê de qurmiçî bû, bi carekê ve jîndar dibe û vediguheze jiyaneke têkel û rengîn. Di serê sedsala bîstemîn de, Stembola ku kozmopolît e, her texlît milet û mirovî di paxila xwe de dihewîne; dibe warê Celadetê pêşîn ê jiyanê. Paşê, ew jî mîna gelek welatî, nêz û nasên xwe dibe mişextî, ji welatê xwe bi dûr dikeve, dibe sirgûn. Saraya Osmanî û Bab-i Alî, Pira Galatayê û Taxa Kadikoyê, Şerê Cîhanê, kovara Hawar û Ronahiya ku dengvedana wan li Şamê deng vedide û dengê zimanê kurdî digihîne çar aliyê dinê, dibe yek ji wan fotograf û sûretên berbiçavtirîn ên romanê. Seranserê jiyana Celadet Beg, bi her awayî ve dibe navenda têkoşîn û zanîn, trajedî û evîn, warê keser û berxwedanê.

ISBN: 978-605-772-869-2
9 786057 728692

40 TL (KDV'den muaftır.)
selyayincilik selyayin selyayincilik
www.selyayincilik.com